KURDİSTAN

ROJNAMA KURDÎ YA PÊŞÎN * İLK KÜRD GAZETESİ

1898—1902

Cild I

Wergêr
ji tîpên Erebî
bo tîpên Latînî:

Arap harflerinden
Latin harflerine
çeviren:

M. EMÎN BOZARSLAN

www.netewe.com

www.netewe.com

KURDİSTAN

ROJNAMA KURDÎ YA PÊŞÎN ✻ İLK KÜRD GAZETESİ

1898—1902

Cild I

Wergêr
ji tîpên Erebî
bo tîpên Latînî:

Arap harflerinden
Latin harflerine
çeviren:

M. EMÎN BOZARSLAN

www.netewe.com

www.netewe.com

KURDİSTAN

www.netewe.com

WEŞANXANA DENG
P. O. Box 3050
750 03 Uppsala
Sweden

DENG YAYINEVİ
P. O. Box 3050
750 03 Uppsala
Sweden

© M. Emîn Bozarslan, 1991

Tarîxa çapê:
Çirîya Paşîn 1991

*

Baskı tarihi:
Kasım 1991

*

Fyris-Tryck AB
Storgatan 30, Uppsala—Sweden

ISBN 91-88246-01-9

www.netewe.com

M. EMÎN BOZARSLAN

P Ê Ş K Ê Ş Î

www.netewe.com

BALKÊŞÎYEKA GİRİNG

Jibo ku mirov bikare rojnama "**Kurdistan**" bi hêsanî bixwîne û jê mefadar bibe, divê ku mirov berê, beşê 3'yan ê vê "Pêşkêşî"yê bixwîne; ew beş di binê sernivîsara "Nasandina Çapa Nû" da hatîye nivîsîn û di rûpelên 47-49'an da hatîye çapkirin. Ew beş, jibo xwendin û karanîna rojnama "**Kurdistan**" wek mifteyek, wek rêbirek e. Bê rêbirîya wî beşî, mirov nikare rojnama "**Kurdistan**" bi hêsanî bixwîne û jê mefadar bibe.

www.netaje.com

BEŞ I

HAYDARÎYÊN GİŞTÎ
Lİ SER ROJNAMA "KURDİSTAN"

BELAVBÛNA FİKRA NETEWEYÎ
Dİ NAVA ÎMPERATORÎYA OSMANÎ DA

Bîr û bawerîya neteweevînî û welatevînîyê, ku di sala 1789'an da bi Şorişa Fransiz ra hatibû dinê û hin bi hin di nava gelên Ewrupayê da belav bûbû, di dûwayîya sedsala XIX. da êdî gîhîştibû nava sînorên împeratorîya Osmanî. Di nava rewşenbîrên gelên cure cure yên binê kargêrîya Osmanîyan da ew fikir hêdî hêdî belav dibû. Rewşenbîrên Ereban, Arnawudan,(1) Yunan û Bulgaran, bere bere bîr bi huwiyeta xwe ya neteweyî dibirin û jibo desxistin û parastina huwiyeta xwe ya neteweyî li ser havilan difikirîyan, li havilan digerîyan.

Ji alîyekî dî ve, rewşenbîrên Tirkan bi xwe jî ketibûn binê te'sîra fikra welatevînî û neteweevînîyê; alaya neteweevînîya Tirk bilind kiribûn û dixwestin ku dewleteka Tirk a xwerû saz bikin, hemî Tirkên cîhanê di nava sînorên wê dewletê da bicivînin. Pêşrewên(2) wê fikrê li welatên Ewrupayê belav bûbûn û bi civînan, bi sazkirina vêkxistinan,(3) bi weşandina kovaran ji alîyek ve jibo belavkirina wê fikrê dixebitîn, ji alîyek ve jî li dijê rejima Sultan Evdilhemîdê 2'yan têkoşîn dikirin.

Di wê rewşê da û di nava wan mercan da rewşenbîrên Kurd jî ji wê fikrê para xwe girtine; di dilê wan da jî fikra neteweevînîya Kurd û welatevînîya Kurdistanê cî girtîye; ew jî li ser rewşa Kurdistanê û neteweyê Kurd fikirîne, dest bi xebat û nivîsînê kirine.

---

(1) Arnawud: Neteweyekî Ewrupî. Ji welatê wî ra tê gotin "Arnawudistan", ku li jêrê Ewrupayê, li qeraxê deryaya Adrîyatîk dikeve. Di hin zimanan da ji wî neteweyî ra tê gotin "Alban", ji welatê wî ra jî tê gotin "Albanya".

(2) Pêşrew: Kesê ku dest bi tevgerek bike û di wê tevgerê da li pêş birewe, li pêş bimeşe û rê nîşanê kesên li pey xwe bide; kesên li pey wî jî jê ra dibin "peyrew".

(3) Vêkxistin: Koma mirovan a ku jibo pêkanîna karekî giştî hatîye sazkirin û li gora hin bingehokên qebûlkirî xebata xwe ya tevayî dimeşîne. Ji "vêkxistin"ê ra bi Erebî tê gotin "tenzîm", bi Tirkî tê gotin "örgüt", bi Înglîzî jî tê gotin "organization".

MÎQDAD MÎDHET BEDİRXAN Û ROJNAMA KURDÎ YA PÊŞÎN

Yek ji wan rewşenbîrên Kurd ên neteweevîn û welatevîn Mîqdad Mîdhet Bedirxan bûye, ku di sala 1898'an da gaveka dîrokî avêtîye û di dîroka gelê Kurd da cara pêşîn dest bi weşandina rojnameyeka Kurdî kirîye, navê rojnama xwe jî **"Kurdistan"** danîye; bi peyveka dî, navê welatê xwe li rojnama xwe danîye. Bi weşandina rojnama **"Kurdistan"**, Mîqdad Mîdhet Bedirxan hem di jîyana gelê Kurd da rûpeleka nû vekirîye, hem jî ew bi xwe bûye rojnamevanê Kurd ê pêşîn.

Jimareya pêşîn a rojnama **"Kurdistan"**, roja pêşemê di tarîxa 22'yê Nîsana 1898'an da derketîye.(4) Rojname li Misrê di "Çapxana El-Hîlal" da hatîye çapkirin. Li jorê rûpela pêşîn navê rojnamê **"Kurdistan"** bi tîpên gir hatîye nivîsîn. Hema li binê navê rojnamê jî tarîxa Hîcrî ya wê salê cî girtîye. Ew tarîx hingê 1315 bûye. Sazkarê rojnamê Mîqdad Mîdhet Bedirxan, bi wî awayî daye zanîn ku rojnama **"Kurdistan"** li gora tarîxa Hîcrî di sala 1315'an da hatîye sazkirin. Ew tarîx, heta jimareya paşîn li binê navê rojnamê hatîye nivîsîn.

*

Di jimareya pêşîn da li binê navê jornamê, bi zimanê Tirkî ev peyv hatîye nivîsîn:

"Jibo ku Kurdan hişyar bike û bihewisîne(5) desxistina pîşeyan,(6) nuha di pazde rojan da carek tê weşandin, rojnama Kurdî ye".

Di jimareya 3'yan da û ji wê pê ve, di navbera navê rojnamê û wê peyva Tirkî da, vê peyva Kurdî jî cî girtîye:

"Pazde roja de carekê têt nivîsandin, cerîdeya Kurdî ye".(7)

Di jimareya 24'an da û ji wê pê ve, di peyva Tirkî da guhartineka biçûk çêbûye û ew peyv weha derketîye:

"Ji mehê carek tê weşandin, rojnama Kurdî ye".

Di jimareya 25'an da û ji wê pê ve, di peyva Kurdî da jî ew guhartina biçûk çêbûye û peyv weha hatîye çapkirin:

"Heyvê carekê derdikeve, cerîdeya Kurdî ye".

Li alîyê rastê navê rojnamê navê sazkar û xwedîyê wê bi Kurdî hatîye nivîsîn; dîsa bi Kurdî vê peyva ha cî girtîye:

"Her car du hezar cerîdeya bê pere ez'ê rêkim Kurdistanê, de bidin xelkê".

---

(4) Hingê di nava sînorên dewleta Osmanî da tarîxa Romî dihat karanîn. Ji ber wê yekê, tarîxa rojnama **"Kurdistan"** li gora tarîxa Romî, "9 Nîsan 1314" hatîye nivîsîn. Li gora tarîxa Mîladî, ew dibe 22 Nîsan 1898.

(5) Bihewisîne: Hewes bide wan, di dilê wan da hewes çêke, hewes têxe dilê wan, wan teşwîq bike.

(6) Pîşe: Karê ku li ser maddeyan tê kirin û jê ra hostatî pêwîst e; wek hesinkarî, sazkirin û karanîna karxanan, çêkirin û karanîna makîne û sazgehan.

(7) Cerîde: Rojname, nûçename.

Li alîyê çepê navê rojnamê jî ev peyva jorîn bi Tirkî digel navê sazkar û xwedîyê rojnamê hatîye nivîsîn; her weha bi Tirkî hatîye ragîhandin ku heqê abonetîya rojnamê ya salewext 80 quriş e.

Li binê wan nivîsaran jî di navbera du xêzan da tarîxa jimareyên rojnamê li gora tarîxên Hîcrî û Romî cî girtîye. Mesela tarîxa jimareya pêşîn weha hatîye nivîsîn:

"Roja pêncşemê de, 30 Zulqe'de sene 1315; pencşenbe fî 9 Nîsan sene 1314".

Tarîxa 30'yê Zulqe'deya 1315'an a Hîcrî û tarîxa 9'ê Nîsana 1314'an a Romî, li gora tarîxa Mîladî weha ye: 22 Nîsan 1898.

AMANCA ROJNAMA "KURDİSTAN"

Sazkarê rojnama **"Kurdistan"** Mîqdad Mîdhet Bedirxan, di despêka jimareya pêşîn da ragîhandîye ku di dinyayê da çi qas Musulman hebin di gund û bajarên hemîyan da dibistan û rojname hene, bûyerên ku di dinyayê da diqewimin di wan rojnaman da tên nivîsîn, lê mixabin ku Kurd ji rojnaman bêpar in û nizanin di dinyayê da çi diqewime, cîranê wan Mosqof çawa ye û dê çi bike; paşê amanca rojnamê weha daye zanîn:(8)

"Loma di rîya Xwedê da min ev rojnama ha nivîsî. Bi îzna Xwedê teala ji nuha pê ve di her pazde rojan da carek ez'ê rojnameyek binivîsim. Min navê wê kirîye **"Kurdistan"**. Di vê rojnamê da ez'ê qala qencîya zanyarîyê û têgîhîştinê bikim; li kuderê mirov fêr dibe, li kuderê xwendegeh û dibistanên qenc hene, ez'ê nîşanê Kurdan bidim; li kuderê çi şer dibe, dewletên mezin çi dikin, çawa şer dikin, tîcaret çawa dibe; ez'ê qala hemîyan bikim".

Mîqdad Mîdhet Bedirxan, piştê ragîhandina amanca rojnamê, bala xwendevanan kişandîye ser wê yekê ku **"Kurdistan"** rojnama Kurdî ya pêşîn e. Li ser wê yekê weha nivîsîye:

"Heta nuha kesek rojnameyeka weha nenivîsîye; ev rojnama min a ha, ya pêşîn e. Loma dê gelek kêmayî hebin. Ez hêvî dikim kêmayîya rojnamê ji min ra binivîsin. Hemî tişt dema nû çêdibin kêm in, paşê hingî diçe dikeve rê".(9)

---

(8) Hem di vê parçenivîsarê da, hem jî di parçenivîsarên hatî da, ku em'ê ji rojnama **"Kurdistan"** biguhêzin, gelek peyvikên Erebî û Farisî hene. Me di wergerandina jimareyên rojnamê da ew peyvik wergerandin tîpên Latînî û maneyên wan li jêrên rûpelan bi jêrenotan dan zanîn. Lê belê di "Pêşkêşî"yê da me nevîya em xwendevanan bi jêrenotên zêde mijûl bikin. Ji ber wê yekê, ev parçenivîsar û hemî parçenivîsarên ku em'ê di "Pêşkêşî"yê da wek numûneyan nîşan bidin, me gişt wergerandin Kurdîyeka xwerû û bi wê Kurdîya xwerû guhastin.

(9) **Kurdistan,** jimare 1, rûpel 1.

Dema mirov li demên derketina **"Kurdistan"**ê dinêre, mirov dibîne ku di despêkê da ji 15 rojan carek derketîye; lê paşê carna ji mehê carek, carna jî ji çend mehan carek derketîye. Ji alîyê naverokê ve jî ku mirov bala xwe bid'ê, mirov dibîne ku, gerçi hin xeber li ser hin bûyerên Kurdistanê û welatên dî tê da derketine jî, naveroka wê bi piranî ji nivîsaran pêkhatîye.

Ji ber van her du semedan, mirov dikare bêje ku **"Kurdistan"** di eslê xwe da ne rojname ye, lê kovar e. Lê belê her du xwedîyên wê Mîqdad Mîdhet Bedirxan û Evdirehman Bedirxan jê ra gotine "cerîde" û "gazete". Mana wan her du peyvikan(10) jî di Kurdî da "rojname" ye. Ji ber vî semedî, em jî jê ra dibêjin "rojname" û wê wisa dinasînin.

ZİMANÊ ROJNAMA "KURDİSTAN"

"Kurdistan" di despêkê da tenê bi Kurdî hatîye nivîsîn û sê jimareyên pêşîn tenê bi Kurdî hatine çapkirin. Di jimareya 4'an da û ji wê pê ve, hin nivîsarên bi zimanê Tirkî jî di rûpelên rojnamê da cî girtine. Ew nivîsarên Tirkî, di jimareyên 4, 5, 6, û 7'an da bi awayê daxwaznameyan(11) ji Sultan Evdilhemîdê 2'yan ra hatine nivîsîn. Piştê wan jimareyan, hin jimare dîsa tenê bi Kurdî derketine; ew jî jimareyên 8, 9, 11, 15 û 16'an in. Di jimareyên dî da nivîsarên Kurdî û Tirkî pêkve cî girtine.(12)

Di hemî nivîsarên Tirkî da rexneyên dijwar li rejima Evdilhemîd hatine xistin û dijwarîya wan rexneyan hin bi hin zêdetir bûye.

Kurdîya **"Kurdistan"**ê ne Kurdîyeka xwerû ye; gelek peyvikên Erebî û Farisî di nivîsarên Kurdî da hatine karanîn. Jixwe wê demê di nava rewşenbîrên Kurd da adet bû ku peyvên xwe û nivîsarên xwe bi peyvikên Erebî û Farisî bixemilînin; wan, têkilkirina Kurdî bi peyvikên Erebî û Farisî wek serbilindîyek qebûl dikir; wisa dizanîn ku karanîna peyvikên Erebî û Farisî nîşana zanatîyê û rewşenbîrîyê ye.

Herçî nivîsarên Tirkî yên ku di rojnamê da cî girtine, ew hemî bi Tirkîya wê demê ne, ku jê ra dihat gotin "zimanê Osmanî". Zimanê Osmanî ji zimanên Tirkî, Kurdî, Erebî û Farisî pêkhatibû. Ji ber wî semedî jî jê ra dihat gotin "zimanê Osmanî".

Di rojnamê da du nameyên Erebî jî derketine. Yek ji wan nameyên Erebî ji Mêrdînê, ji alîyê Elîyê kurê Huseynê Amedî ve hatîye şandin û di jimareya 8'an da derketîye. Nameya Erebî ya dî jî ji Lubnanê, ji bajarê Trablusê, ji alîyê Şêx Hesen ve hatîye şandin û di jimareya 16'an da derketîye.

Hemî jimareyên **"Kurdistan"**ê ji 4 rûpelan pêkhatine.

---

(10) Peyvik: Dengê ku ji devê mirov derdikeve û tenê yek maneyek dide; wek "jîn", "hatin", "ba", "baran", "pirtûk", "hat", "diçe", "xwendin", "xwarin" û wd. Ji "peyvik"ê ra bi Erebî tê gotin "kelîme", bi Tirkî tê gotin "sözcük", bi Înglîzî jî tê gotin "word".

(11) Daxwazname: Nameya ku tê da daxwazeka resmî tê nivîsîn û ji kargêrên dewletê ra, ji meqamên resmî ra tê pêşkêşkirin.

(12) Wek ku em'ê li pêş jî qal bikin, ji rojnama **"Kurdistan"** tenê yek berhevokek gîhaye dewra me; di wê berhevokê da jimareyên 10, 12, 17, 18 û 19'an tunin. Ji ber wê yekê, em nizanin ku ew jimare tenê bi Kurdî derketine, yan bi Kurdî û Tirkî derketine.

ROJNAMA GEROK

Rojnama **"Kurdistan"** li derê welêt, li Misrê dest bi derketinê kirîye û sê jimareyên wê yên pêşîn di "Çapxana El-Hîlal" da hatine çapkirin. Jimareyên 4'an û 5'an jî dîsa li Misrê, di "Çapxana Cerîdeya **Kurdistan**" da hatine çapkirin.

Misir hingê gerçi bi rastî di binê nufûza Înglistanê da bû, lê di eslê xwe da eyaletek ji eyaletên dewleta Osmanî bû û hukmê Padîşahê Osmanî li wir direwîya;(13) bi kêmayî, bi qasê ku rê li derketina rojnameyek bigire yan weşandina wê biwestîne,(14) hukmê wî li wir hebû. Sultan Evdilhemîdê 2'yan jî wisa kirîye û nehîştîye ku rojnama **"Kurdistan"** li Misrê weşandina xwe bidomîne. Sazkar û xwedîyê rojnamê Mîqdad Mîdhet Bedirxan, hem ji ber zordestîya rejima Evdilhemîd û rêgirtina wî ya li domandina derketina rojnamê li Misrê, hem jî ji ber nexweşîya xwe, kargêrîya rojnamê sipartîye birayê xwe Evdirehman Bedirxan û vegerîyaye Stanbolê. Ew yek ji nivîsara Evdirehman Bedirxan a bi Tirkî tê zanîn, ku di serê jimareya 6'an da derketîye.(15)

Evdirehman Bedirxan di jimareya 6'an da û ji wê pê ve kargêrîya rojnamê girtîye destê xwe û rojname ji Misrê guhastîye(16) bajarê Cenewreyê li Swîsrayê.(17) Digel wê guhastinê, çapxane û navnîşana rojnamê tev hatine guhartin; ji jimareya 6'an pê ve rojname di "Çapxana Komela Hevgirtin û Qencîya Musulmanan" da hatîye çapkirin.(18)

Di jimareya 20'î da û ji wê pê ve rojname dîsa vegerîyaye Misrê.(19) Digel wê vegerê çapxane û navnîşana wê dîsa guherîne. Jibo navnîşanê li Qahîrê qutîyeka postê ya bi jimara "679"an hatîye nivîsîn. Lê belê navê çapxanê di rojnamê da cî negirtîye, tenê di dûwayîya jimareyên 20 û 21'ê da bi Kurdî û Tirkî hatîye nivîsîn ku rojname li Misrê hatîye çapkirin. Di dûwayîya jimareyên 22 û 23'yan da jî tenê bi Tirkî hatîye nivîsîn ku rojname di "Çapxana Hindîye" da hatîye çapkirin. Tê zanîn ku ew çapxaneyeka Misrê bûye.

Ji jimareya 24'an pê ve rojname careka dî hatîye guhastin û vê carê çûye Înglistanê û navnîşana wê li Londrayê hatîye nîşandan, di serê rojnamê da jî ev ragîhana ha bi Kurdî derketîye:

---

(13) Direwîya: Dimeşîya, dibuhurî, derbas dibû.

(14) Biwestîne: Bisekinîne, bide sekinandin. Maneyeka dî jî ji vê peyvikê ra heye, lê li vir maneya wê ev e.

(15) **Kurdistan,** j. 6, r. 1—2.

(16) Guhastîye: Neqil kirîye.

(17) Swîsra: Welatekî Ewrupa Navîn. Jê ra bi Tirkî tê gotin "İsviçre", bi Înglîzî jî tê gotin "Switzerland".

(18) Navê wê komelê yê orîjînal ê ku di rojnamê da derketîye, weha ye: "Cem'îyeta Tefaq û Qencîya Musulmana".

(19) Wek ku me di jêrenota 12'an da jî da zanîn, ew berhevoka tenê ya ku ji rojnama **"Kurdistan"** gîhaye dewra me, jimareyên 17, 18 û 19'an tê da tunin. Ji ber wê yekê, em nizanin ku ew her sê jimare li kêderê derketine. Peyva me ya ku em li vir dibêjin "di jimareya 20'î da û ji wê pê ve rojname dîsa vegerîyaye Misrê", li gora jimareyên heyî hatîye nivîsîn.

"Ev pêlek e min ji Cenewreyê neqlê Londrayê kir. Loma min nekarî rojnama xwe biweşînim. Ez hêvî dikim ku ji nuha pê ve ez'ê ji mehê carek rojnama xwe bi dûzen biweşînim".(20)

Ragîhaneka wek vîya bi Tirkî jî di wê jimareyê da derketîye.

Li vir tiştê balkêş ev e ku gotîye "min ji Cenewreyê neqlê Londrayê kir". Di jimareya 23'yan da jî navnîşana rojnamê li Qahîrê hatîye nîşandan. Vêca çima gotîye "min ji Cenewreyê neqlê Londrayê kir"? Gelo ji jimareya 20'î heta jimareya 23'yan Evdirehman Bedirxan bi xwe li Cenewreyê bûye û rojname li wir amade kirîye û şandîye Misrê, li wir daye çapkirin? Ev îhtîmal ne dûrê aqil e. Îhtîmaleka dî jî ev e ku piştê derketina jimareya 23'yan li Qahîrê, xwedîyê rojnamê dîsa ew guhastîye Cenewreyê û xwestîye ku li wir derxe; lê belê mecal nedîtîye, paşê derbasê Înglistanê bûye û jimareya 24'an li wir derxistîye.

Westana(21) li Londrayê jî pirr dom nekirîye; rojname tenê yek jimareyek li wir derketîye, ew jî jimareya 24'an e. Ji jimareya 25'an pê ve rojname careka dî hatîye guhastin û vêca çûye jêrê Înglistanê û li bajarê Folkstone derketîye. Di jimareya 25'an da ragîhaneka kurt bi zimanê Tirkî hatîye nivîsîn û tê da hatîye ragîhandin ku jibo weşandin û belavkirina rojnamê fêde di guhastinê da hatîye pêjnkirin û kargêrîya **"Kurdistan"ê** neqlê wê navnîşanê hatîye kirin; ji xwendevanan tika hatîye kirin ku nameyên xwe bişînin wê navnîşanê.(22)

Lê belê Folkstone jî ji rojnama **"Kurdistan"** ra nebûye cîyekî timî; rojname heta jimareya 29'an li wir hatîye weşandin, paşê dîsa vegerîyaye Cenewreyê û her du jimareyên paşîn, yanî jimareyên 30'yî û 31'ê li Cenewreyê derketine.

Di wan guhastinan da rojname gelek caran pirr dereng derketîye, navberên dirêj ketine navbera hin jimareyên wê. Mesela tarîxa jimareya 5'an 4 Hezîran 1314 ye(17 Hezîran 1898), tarîxa jimareya 6'an 28 Îlon 1314 ye(11 Çirîya Pêşîn 1898). Tarîxa jimareya 15'an 22 Nîsan 1315 ye,(5 Gulan 1899), tarîxa jimareya 16'an 24 Tîrmeh 1315 ye(6 Tebax 1899). Tarîxa jimareya 23'yan 11 Sibat 1315 ye(24 Sibat 1900), tarîxa jimareya 24'an 19 Tebax 1316 ye(1 Îlon 1900). Tarîxa jimareya 25'an 18 Îlon 1316 ye,(1 Çirîya Pêşîn 1900), tarîxa jimareya 26'an 1 Kanûna Pêşîn 1316 ye(14 Kanûna Pêşîn 1900), tarîxa jimareya 27'an 28 Sibat 1316 ye(13 Adar 1901), tarîxa jimareya 28'an jî 1 Îlon 1317 ye(14 Îlon 1901). Jimareya 29'an di wextê xwe da derketîye, tarîxa wê 1 Çirîya Pêşîn 1317 ye(14 Çirîya Pêşîn 1901). Lê jimareya 30'yî pênc meh paşê derketîye, tarîxa wê 1 Adar 1318 ye(14 Adar 1902). Jimareya 31'ê di wextê xwe da derketîye, tarîxa wê 1 Nîsan 1318 ye(14 Nîsan 1902).(23)

(20) **Kurdistan,** j. 24, r. 12.

(21) Westan: Sekin. Maneyeka dî jî ji vê peyvikê ra heye, lê li vir mana wê ev e.

(22) **Kurdistan,** j. 25, r. 2.

(23) Ev tarîxên ku me li jor nivîsîne, dibe ku di nihêrtina pêşîn da ji xwendevanan ra hinek xerîb bixuyin. Jibo ku xwendevan şaş nebin, divê em bala wan bikişînin ser vê yekê ku, li gora teqwîma Romî ku di **"Kurdistan"**ê da hatîye karanîn, meha paşîn a salê meha Sibatê ye, despêka sala nû jî l'ê meha Adarê ye.

Li vir pirseka weha tê aqilê mirov: Gelo ew qas guhastin çima qewimîne? Bi peyveka dî, gelo Evdirehman Bedirxan çima rojnama **"Kurdistan"** ew qas car guhastîye û cîyê derxistina wê ew qas car guhartîye? Gelo çima di navbera Misrê û Swîsrayê û Înglistanê da çûye û hatîye, çûye û hatîye?

Gelek mixabin ku em nikarin bersîva vê pirsê bidin. Cara pêşîn ku Evdirehman Bedirxan rojname ji Misrê guhastîye Swîsrayê, di jimareya 6'an da daye zanîn ku ji ber zordestîya rejima Evdilhemîd birayê wî Mîqdad Mîdhet Bedirxan nekarîye weşandina rojnamê li Misrê bidomîne û ji neçarî vegerîyaye Stanbolê, ji ber wê yekê jî wî kargêrîya rojnamê girtîye destê xwe û ji Misrê ew guhastîye Swîsrayê, da ku bişê rojnamê derxe û bi wî awayî jibo qencîya Kurdan bixebite.(24) Lê guhastinên dî? Gelo semedên wan çi bûne? Mixabin ku di destê me da çu belge û wesîqeyeka wisa tune ku bersîva vê pirsê ronî bike.

Gelo Evdirehman Bedirxan ji rûyê taluka ajanên Evdilhemîd xwe di ewletîyê da nedîtîye, loma ew qas car cîyê xwe guhartîye û rojnama xwe guhastîye? Ev îhtîmal ne dûrê aqil e. Ji nivîsarên rojnamê û ji nameyên vekirî yên ku ji Evdilhemîd ra hatine nivîsîn, bi awayekî eşkera tê famkirin ku Evdilhemîd û karbidestên dora wî nevîyane ku rojnameyek bi navê **"Kurdistan"** derkeve; qedexe kirine ku rojname bi taybetî têkeve Kurdistanê û bi giştî têkeve nava sînorên dewleta Osmanî. Lê belê digel ku Evdilhemîd li dijê rojnama **"Kurdistan"** bûye jî, Evdirehman Bedirxan ji doza xwe venekişîyaye û derxistina rojnamê domandîye, bi wî awayî ji Evdilhemîd ra adeta meydan xwendîye. Bi derxistina rojnamê jî newestaye, zordestî û zulma rejima Evdilhemîd di rûpelên **"Kurdistan"**ê da li ber çavan raber kirîye. Bi wê raberkirinê jî qîma xwe nanîye, deng li gelê Kurd kirîye û jê xwestîye ku li dijê wê zordestîyê rabe û di ber xwe bide; bi wî awayî gelê Kurd hewisandîye berxwedan û serhildanê.

Ji ber wê yekê, mirov dişê texmîn bike ku Evdirehman Bedirxan xwe di ewletîyê da nedîtîye û ji ajanên Evdilhemîd dilbitirs bûye, ketîye tatêlê; ji ber wê tatêlê ew qas cîyê xwe guhartîye, ew qas rojnama xwe guhastîye.

*

Li vir tiştê giring û balkêş ev e ku, digel wan alûzîyên ku ji wan guhastinan tên famkirin, Evdirehman Bedirxan dev ji doza xwe bernedaye û ji doza xwe venekişîyaye. Tam çewtê wê yekê, bi vîn(25) û biryardarî sînga xwe daye pêşberê hemî alûzîyan û weşandina rojnama xwe domandîye; wek bavekî dilovan ê ku zarûkekî xwe ji ber bagêr û bapûkê direvîne û ji vir dibe wir, ji wir

(24) **Kurdistan,** j. 6, r. 2.

(25) Vîn: Hêza hundirîn a ku di dilê mirov da li ser karek daxwazeka qutûbirr diafirîne, îrade.

dibe wir, ji cîyek dibe cîyekî dî, ji wî cîyî jî direvîne cîyekî ewletir, Evdirehman Bedirxan wisa bi dilovanî rojnama **"Kurdistan"** hembêz kirîye û cî bi cî gerandîye, derxistina wê çar sal domandîye. Kî dizane ku di wê rê da çi qas azar(26) dîtîye, çi qas zehmet kişandîye, çi qas fîdakarî kirîye! Semedê wê fîdakarîyê jî, bê guman bawerîya wî ya xurt û temam bûye. Hêja ye ku mirov li ber bîranîna wî bi qedirnasî û rêzdarî serê xwe bitewîne, ji dil û can je ra sipas bike!

DENGANA "KURDİSTAN"Ê Lİ KURDİSTANÊ(27)

Wisa tê zanîn ku derketina rojnama **"Kurdistan"** li Kurdistanê û di nava Kurdên derê Kurdistanê da denganeka fire daye, kêfxweşî û dilşayîyeka mezin afirandîye. Hin name û teqrîzên(28) ku ji rojnamê ra hatine şandin û di hin jimareyên wê da hatine çapkirin, ew dengan û kêfxweşî bi awayekî zelal ji wan dixuye.

Du teqrîzên Kurdî ji Şamê hatine şandin, di jimareya 3'yan da derketine. Yek ji wan dûznivîsar e, bi awayê nameyek hatîye nivîsîn û şandin. Şandoxê wê, ku navê xwe N. H. nivîsîye, daye zanîn ku dema rojname gîhaye Şamê di nava Kurdên wî bajarî da kêfxweşî û şayîyeka mezin çêkirîye, dema Kurdan zanîye ku navê wê **"Kurdistan"** e û xwedîyê wê Mîqdad Mîdhet Bedirxan e, bi peyva wî "mîrê me" ye, ew maç kirine û bi derketina wê gelek dilşa bûne.(29)

Teqrîza dî ya ku ji Şamê hatîye şandin, helbeskî ye, yanî wek helbestek hatîye nivîsîn. Şandoxê wê, ku navê xwe Lawê Şêx E. Fetah nivîsîye, di despêka teqrîza xwe da weha gotîye:

"Pîroz be ji te re hezar cara
ev dengê nuho li nav yara(30)

Mizgînîya vê cerîdeya qenc(31)
şabaş dibitin çi qas hebit genc".(32)

---

(26) Azar: Eziyet, zehmet, êş.
(27) Dengan: Dengê ku li tiştên wek zinaran dikeve û li dora xwe belav dibe û vedigere. Ji peyvika "dengan" ra bi Erebî tê gotin "seda", bi Tirkî tê gotin "yankı", bi Înglîzî jî tê gotin "echo".
(28) Teqrîz: Nivîsara ecibandinê, nivîsara ku li ser kovarek yan pirtûkek tê nivîsin û tê da ecibandina wê kovarê yan pirtûkê tê dîyarkirin.
(29) **Kurdistan,** j. 3, r. 3.
(30) Li nav yara: Li nav dostan.
(31) Cerîde: Rojname.
(32) Genc: Xizne, xezîne, defîne.

Şandoxê vê teqrîzê jî daye zanîn ku derketina **"Kurdistan"**ê di nava Kurdên Şamê da kêfxweşîyeka gelek mezin afirandîye, di paşîya teqrîza xwe da jî ji Mîqdad Mîdhet Bedirxan ra weha gotîye:

"Rûhanîya bab û kal û ecdad
pey vê hunerê, te kir nuho şad

Beybûnîya dewleta te geş bit
Qasê tu hebî, dilê te xweş bit".(33)

Nameyeka Kurdî jî ji Edenê hatîye şandin. Navê şandoxê wê Seyid Tahirê Botî ye. Wî daye zanîn ku derketina rojnama **"Kurdistan"** Kurdên Edeneyê gelek kêfxweş kirine. Seyid Tahirê Botî di nameya xwe da, ku di jimareya 5'an da derketîye, nivîsîye ku Kurdên Edeneyê di du-sê rojan da heqê 20 rojnaman berhev kirine; ji Mîqdad Mîdhet Bedirxan pirsîye: "Ez rêkim kuderê?"(34)

Ji Mêrdînê jî nameyeka Erebî ji alîyê Elîyê kurê Huseynê Amedî ve hatîye şandin û di jimareya 8'an da derketîye. Şandoxê wê nameyê gelek pesnê **"Kurdistan"**ê daye û di cîyek da weha gotîye:

"Ez bi umrê xwe sond dixum ku, ev rojname wisa qenc e ku hêja ye qala wê bê kirin û li ser wê sipas bê kirin".(35)

Nameyeka Kurdî ya balkêş jî ji bajarê Amed(Dîyarbekir) hatîye şandin û di jimareya 13'an da bi sernivîsara "Kaxizek ji Kurdistanê hatî" derketîye. Şandoxê wê, navê xwe "ji eşrafên Dîyarbekrê Ş. M." nivîsîye. Wî daye zanîn ku karbidestên dewleta Osmanî yên li Kurdistanê nahêlin ku gel rojnama **"Kurdistan"** bixwîne û wê di destê kî da bibînin wî kesî digirin, davêjin girtîxanan, lê belê dîsa jî Kurd meyla rojnamê dikin û ji wê nabûrin. Ş. M. gotîye "di vê rê da em'ê gelek tiştan fîda bikin", paşê nivîsîye ku karbidestên dewleta Osmanî yên li Kurdistanê gelek zalim û bêînsaf in, ji ber zulma wan gelek Kurd cîhil bûne, hin ji wan çûne nava Ecem, hin jî çûne nava Tirkan; ji Evdirehman Bedirxan tika kirîye ku di rojnamê da bi Tirkî ji Padîşah ra li ser rewşa Kurdan binivîse û jê bixwaze ku me'mûrên rast û adil bişîne Kurdistanê.(36)

Dîsa di jimareya 13'an da hatîye nivîsîn ku ji alîyê hin Kurdan ve ji rojnamê ra alîkarîya diravî hatîye şandin û lîsteyek li ser wê yekê cî girtîye. Li gora wê lîsteyê jibo alîkarîyê ev dirav hatine şandin:

Ji Dîyarbekrê	: 200	quriş
Ji Silêmanîyê	: 121	"
Ji Edeneyê	: 120	"

Nameyeka Kurdî jî ji Mêrdînê, ji alîyê Mela Salihê Cizîrî ve hatîye şandin. Şandoxê wê nameyê di serê nameya xwe da weha gotîye:

---

(33) **Kurdistan,** j. 3, r. 4.
(34) **Kurdistan,** j. 5, r. 3—4.
(35) **Kurdistan,** j. 8, r. 2—3
(36) **Kurdistan,** j. 13, r. 1—2.

"Mîrê min, ew rojnama ku we dest pê kirîye hun ji pazde rojan carek derdixin, carna tê welatê me û kêm caran digîje destê me, em dixwînin".

Mela Salihê Cizîrî paşê pesnê Mîr Bedirxan û zarûkên wî daye, qala xizmeta wan a ji Kurdan ra kirîye, peyv anîye ser şola xwendin û zanînê, di wî babetî da weha nivîsîye:

"Ez benî, tu me dihewisînî xwendin û zanînê. Qencîya xwendin û zanînê tiştekî wisa ye ku kes nikare înkar bike. Xwendin ronayîyeka wisa ye ku kor bi wê xwedîçav dibin. Lê belê çi çare ku rê û îmkanên xwendinê li nik me tunin. Kes tune li me bipirse. Çavê xayinan kor bibe. Herçî ku Evdilhemîd e, vêca me zanî ku herçîyê jibo qencîya Kurdan e wî navê".

Mela Salihê Cizîrî paşê gazin ji Evdirehman Bedirxan kirîye ku çima dereng maye û bîst sal berê ew rojname dernexistîye, daye zanîn ku rojnama **"Kürdistan"** ji alîyê rejima Evdilhemîd ve li Kurdistanê hatîye qedexekirin, rexne li rejima Evdilhemîd xistîye ku guh nade Kurdistanê, ragîhandîye ku dê li ser rewşa Kurdistanê ji Evdirehman Bedirxan ra binivîse.(37)

ZORDESTÎYA REJÎMA EVDÎLHEMÎD LÎ SER ROJNAMA "KURDÎSTAN"

Rojnama **"Kurdistan"** li Kurdistanê û di nava Kurdên derê Kurdistanê da çi qas kêfxweşî çêkirîye û denganeka erîn(38) daye, di Koşka Sultan Evdilhemîdê 2'yan da û bi gişt̂î di nava kargêrên dewleta Osmanî da jî ew qas kêfnexweşî çêkirîye û denganeka neyîn(39) daye.

Hema di despêkê da, di dema derketina rojnamê da, ew zêhnîyeta Osmanîyan a req û qedexekar ketîye kar û qedexe kirîye ku **"Kurdistan"** bi awayekî gişt̂î têkeve nava sînorên dewleta Osmanî, bi taybetî jî têkeve Kurdistanê. Wezîrîya Karên Hundirîn belavokeka resmî ji wezîfedarên dewletê ra şandîye û bi wan daye zanîn ku rojnama **"Kurdistan"** di nava sînorên dewleta Osmanî da hatiye qedexekirin, ji wan xwestîye ku wê biryara qedexekirinê pêkbînin.

Li ser wê biryarê, Mîqdad Mîdhet Bedirxan di jimareya 4'an da ji Evdilhemîd ra bi zimanê Tirkî daxwaznameyek nivîsîye û tê da fêda rojnama **"Kurdistan"** daye zanîn, jê tika kirîye ku ferman bide hukumetê da ku wê biryara qedexekirinê rake û rê bide belavbûna rojnamê.(40)

Lê belê wê daxwaznameyê fêde nedaye. Tam çewtê wê, zordestî li xwendevanên rojnamê jî hatîye kirin; kesên ku **"Kurdistan"** di destê wan da hatîye

---

(37) **Kurdistan,** j. 14, r. 2.

(38) Erîn: Tişt yan karê ku li gora amanc û daxwazê be, li amanc û daxwazê bê, fêde bide û bê qebûlkirin, mefadar bê dêran. Ji peyvika "erîn" ra bi Erebî tê gotin "îcabî", bi Tirkî tê gotin "olumlu", bi Înglîzî jî tê gotin "positive".

(39) Neyîn: Tişt yan karê ku li çewtê amanc û daxwazê be, li amanc û daxwazê neyê, fêde nede û neyê qebûlkirin, bêmefa bê dêran. Ji peyvika "neyîn" ra bi Erebî tê gotin "selbî", bi Tirkî tê gotin "olumsuz", bi Înglîzî jî tê gotin "negative".

(40) **Kurdistan,** j. 4, r. 1—2.

dîtin, hatine girtin. Ji alîyekî dî ve jî bi rîya hin karbidestên Misrê bi awayekî ne resmî xeber ji Mîqdad Mîdhet Bedirxan ra hatîye şandin û jê hatîye xwestin ku zû-zûka weşandina rojnamê biwestîne û vegere Stanbolê; eger na, dê di heqê wî da sûcek bê lêkanîn(41) û bi wasita dadgehek teslîmkirina wî ji kargêrên Misrê bê xwestin, ew kargêr jî dê bi zorê wî teslîm bikin. Li ser wê gefa karbidestên Osmanîyan, Mîqdad Mîdhet Bedirxan di jimareya 5'an da daxwaznameyeka dî bi Tirkî ji Evdilhemîd ra nivîsîye û hem ew tevgera bêqanûnî pê daye zanîn, hem jî dîsa jê tika kirîye ku biryara qedexekirina **"Kurdistan"**ê bide rakirin.(42)

Piştê jimareya 5'an Mîqdad Mîdhet Bedirxan rojname teslîmê birayê xwe Evdirehman Bedirxan kirîye û vegerîyaye Stanbolê. Wek ku me li jor jî da zanîn, Evdirehman Bedirxan rojname ji Misrê guhastîye Swîsrayê. Di jimareya 6'an da wî jî ji Evdilhemîd ra daxwaznameyek bi zimanê Tirkî nivîsîye; di wê daxwaznameyê da daye zanîn ku karbidestên dora Evdilhemîd, jibo ku Mîqdad Mîdhet Bedirxan mecbûr bikin ji westandina weşandina rojnamê ra û vegera Stanbolê ra, gef li birayên wî yên li Stanbolê xwarine û birayê wî Emîn Bedirxan(43) bi hin kesên pêgirtîyên rejimê dane lêdan, birayê wî Elî Bedirxan jî girtine û çar roj di girtîxanê da hîştine. Evdirehman Bedirxan di dûwayîya wê daxwaznameya xwe da ragîhandîye ku ew'ê êdî venegere nava sînorên dewleta Osmanî û ew'ê têkoşîna xwe bidomîne.(44)

Evdirehman Bedirxan di eynê jimareyê da nivîsareka Kurdî jî nivîsîye û tê da qala daxwaznameya xwe ya Tirkî kirîye û weha gotîye:

"Min di vê rojnamê da kaxizek Romî(45) ji Padîşah Evdilhemîd Xan ra rê-

---

(41) Lêkanîn: Anîna tiştan li hev, ku mirov tiştan li hev bîne, lêk bîne, li hev dayne û çêke. Ji peyvika "lêkanîn" ra bi Erebî tê gotin "tesnî", bi Tirkî tê gotin "uydurmak", bi Înglîzî jî tê gotin "to make up".

(42) **Kurdistan,** j. 5, r. 1—2.

(43) Bavê her du zimanzan û nivîskarên navdar Celadet Bedirxan û Kamran Bedrixan.

(44) **Kurdistan,** j. 6, r. 1—2.

(45) Romî: Tirkî, zimanê Tirkî. Ji ber ku berê di nava Kurdan da ji dewleta Osmanî ra hatîye gotin "Rom", nivîskar li vir ji zimanê wê dewletê ra gotîye "Romî". Semedê ku Kurdan ji dewleta Osmanî ra gotîye "Rom" ev bûye ku, ew cîyê ku dewleta Osmanî tê da hatîye sazkirin, yanî Anadol, wextek di destê împeratorîya Romayê da bûye û herêmek ji herêmên wê dewletê bûye. Hingê Kurdan ji wê dewletê ra gotîye "Rom". Paşê ew împeratorî parçe bûye û li hêla wê ya Rojhilat împeratorîya Bîzans hatîye sazkirin, ku jê ra hatîye gotin "Roma Rojhilat" jî û Anadol jî beşek ji wê bûye; hingê jî navê wê dewletê di nava Kurdan da "Rom" bûye. Paşê li herêma Anadolê dewleta Osmanî hatîye sazkirin û ketîye şûna împeratorîya Bîzans; hingê jî Kurdan ji wê dewletê ra gotîye "Rom". Ehmedê Xanîyê nemir jî di **"Mem û Zîn"**ê da ji dewleta Osmanî ra gotîye "Rom". Yek ji peyvên Xanî yên di heqê dewleta Osmanî da weha ye:

"Emma ji ezel Xwedê wisa kir
ev Rom û Ecem li ser me rakir"

Piştê ku dewleta Osmanî hatîye hilweşandin û di şûna wê da "Komara Tirkîyê" hatîye sazkirin jî, navê "Rom" di nava Kurdan da jibo wê dewletê hatîye karanîn. Li hin hêlên Kurdistanê jî ji dewleta Tirkan ra hatîye gotin "Roma reş" û gelê Kurd bi peyvika "reş" zulm û zordestîya wê dewletê daye zanîn. Di peyveka pêşîyan a Kurdî da jî tê gotin "bextê Romê tune". Di straneka gelî ya Kurdî da jî tê gotin "Rom xayin e".

kirîye. Ez tê da dibêjm ji ber ku wî nehîşt birayê min rojnama xwe di milkê wî da derxe, ez ji milkê wî derketim, da ez bi vê rojnamê ji qencîya Kurdan ra bixebitim û setîya mirovên dora wî jê ra binivîsim".(46)

Wisa tê zanîn ku biryara Evdirehman Bedirxan li ser domandina weşandina **"Kurdistan"**ê û guhastina wî ya wê bo Swîsrayê, Evdilhemîd û karbidestên dora wî gelek hêrs kirine, bûye semedê zêdebûna rika wan. Jibo ku Evdirehman Bedirxan ji doza wî vegerînin û mecbûrê westandina rojnamê bikin, zordestîya xwe dijwartir kirine. Hingê pênc birayên wî xwestine ji Stanbolê biçin Kurdistanê. Lê belê hatine girtin û li wan îşkence hatîye kirin. Evdirehman Bedirxan li ser wê bûyerê di jimareya 7'an da bi Tirkî ji Evdilhemîd ra daxwaznameyek nivîsîye û tê da qala wê tevgera bêqanûnî kirîye, paşê weha gotîye:

"Eger amanc ji îşkencekirina birayên min ew e ku ez dev ji fikra xwe û vîna xwe berdim û bêm Stanbolê, ez bi Xwedê sond dixum ku ev tedbîr, ji bil zexmkirina vîn û sebata min ji tiştek ra xizmet nake".

Evdirehman Bedirxan, paşê ji Evdilhemîd ra weha meydan xwendîye:

"Ebulhudayê Cengene(47) yê ku te ew kirîye taca serê xwe, ev tedbîrên weha dibe ku li tirsonekên wek wî te'sîr bikin; lê belê ew qehremanê ku li dijê bavê te yê cîbihişt şer kiribû,(48) ev tedbîr li kurê wî qet nikarin te'sîr bikin".(49)

Evdirehman Bedirxan bi wê vînê weşandina rojnamê domandîye. Lê belê Evdilhemîd jî zordestîya xwe zêdetir kirîye; dadgeheka taybetî daye sazkirin û di heqê Evdirehman Bedirxan da ji wê dadgehê biryara cezayê xiyabî daye derxistin. Evdirehman Bedirxan li ser wê biryarê di jimareya 26'an da bi Tirkî nameyeka vekirî ji Evdilhemîd ra nivîsîye û careka dî jê ra meydan xwendîye, ragîhandîye ku di oxira welêt û netewe da biryarên wisa dibin semedê pesinînê. Paşê dîsa rexneyên dijwar li rejima Evdilhemîd xistine û Evdilhemîd bi zalimîyê gunehkar kirîye.(50)

REJİMA PADÎŞAHAN ÇÛ REJİMA PAŞAYAN HAT

Qedexekirina rojnama **"Kurdistan"** ji alîyê rejima Evdilhemîd ve, dibe ku di nihêrtina pêşîn da piçek xerîb bê dîtin. Di dewra Osmanîyan da zimanê Kurdî ne qedexe bû, bi zimanê Kurdî xwendin û nivîsîn dihat kirin û ders dihat dayin, pirtûk jî dihatin çapkirin, Kurd û Kurdistan bi navên xwe dihatin naskirin, navê gelê Kurd resmen "Kurd" bû, navê welatê wî gelî jî resmen

(46) **Kurdistan,** j. 6, r. 2.
(47) Yek ji şêwirdarên Evdilhemîd bûye.
(48) Mexsed ji vî qehremanî, Mîr Bedirxanê Botî ye, ku bavê Evdirehman Bedirxan bûye. Wî di salên 1840'an da jibo serxwebûna Kurdistanê li dijê dewleta Osmanî şer kirîye.
(49) **Kurdistan,** j. 7, r. 1.
(50) **Kurdistan,** j. 26, r. 1—2.

"Kurdistan" bû. Ne tenê gelê Kurd, hemî gelên bindestên Osmanîyan di wê rewşê da bûn. Ji ber ku dewleta Osmanî împeratorî bû û rejima Osmanî ne rejimeka neteweyî bû, li dijê gelên nava sînorên împeratorîyê sîyaseta nejadperestîyê û rehkarîyê nedajot; her gelek û her welatek bi navê xwe dihat naskirin, ziman û çandeyên hemî gelan jî azad bûn.

Li gora wê rewşê, gelo çima rejima Evdilhemîd rojnama **"Kurdistan"** qedexe kirîye û li dijê wê jî, li dijê xwedîyê wê jî tedbîrên wisa dijwar standine?

Bi dîtina me semed ew bû ku rejima Evdilhemîd ditirsa ku rojnama **"Kurdistan"** li Kurdistanê bibe mêledeyeka(51) hişyarîyê û rewşenbîrîyê. Peyveka pêşîyan a Kurdî heye, dibêje "hûr e, lê devê şûr e". Ev peyv li ser kes û tiştên wisa tê gotin ku bi telê(52) xwe ne ew qas berçav in, lê hunerên mezin nîşan didin. Mirov dişê vê peyva pêşîyan li rojnama **"Kurdistan"** jî bîne. Ew jî bi çavdîtin biçûk bû û tenê ji çar rûpelan pêkdihat. Lê belê dixebitî ku gelê Kurd "wek neteweyek" hişyar û serwext û têgîhîştî bike; hêz dida xwe ku gelê Kurd bike xwedîyê huwiyeta wî ya neteweyî û rîya azadîya neteweyî li ber wî ronî bike, pê nîşan bide. Rejima Evdilhemîd jî ji wê yekê baş haydar bû û ditirsa ku ew gel bîr bi hebûn û huwiyeta xwe ya neteweyî bibe û bi ronayîya wê rojnamê rîya azadîyê bibîne, bide ser wê rê û tê da bimeşe, belkî jî ew rê di dûwayîyê da gelê Kurd bigîhîne gîhaneka(53) serxwebûnê.

Tiştê ku xewa Evdilhemîd û rejima wî direvand, aha ev tirs bû. Evdilhemîd jî, hemî padîşahên Osmanîyan jî dixwestin ku gelê Kurd xwedîyê navê xwe be, lê belê xwe wek xizmetkarekî tebîî ji Osmanîyan ra bibîne û pêjn bike, wisa bizane ku jîyana tebîî jibo wî tim û tim ew xizmetkarî ye. Wan digot "Kurd heye, Kurdistan jî heye; lê belê divê ku Kurd di binê hukmê me da nezan û xizan û ji dinyayê nehaydar bimîne, Kurdistan jî tim û tim meydana hespê Osmanîyan bimîne". Peyveka pêşîyan a Tirkî heye, weha dibêje: "Serê xwe bihejîne, meaşê xwe bistîne".(54) Padîşahên Osmanîyan jî bi awayê kargêrîya xwe û bi hemî tevgerên xwe bi gelê Kurd weha didan famkirin: "Bila tu hebî, lê bindestê me bî".

Ji wî semedî jî nedivîyan ku gelê Kurd hişyar bibe û "wek neteweyek" bîr bi hebûna xwe bibe, "wek neteweyek" bibe xwedîyê huwiyeta xwe. Lewra dizanîn ku gelek dema bîr bi huwiyeta xwe ya neteweyî bibe û huwiyeta xwe ya neteweyî qazanc bike, rojek dê rabe û bêje "min divê ez hebim û malxoyê mala xwe bim".

Zêhniyeta padîşahên Osmanîyan bi giştî û ya Evdilhemîdê 2'yan jî bi taybetî, aha ev bû. Ku mirov wê zêhniyetê binase, famkirina semedê qedexekirina Evdilhemîd a rojnama **"Kurdistan"** êdî hêsan dibe.

---

(51) Mêlede: Çovek e ku di serê wê da maddeyek ditevişte û pêtî dide, ew pêtî ronayî li dora xwe belav dike. Ji peyvika "mêlede" ra bi Erebî û Tirkî tê gotin "meş'ale", bi Înglîzî jî tê gotin "torch".

(52) Tel: Cîsim. Tîpên "t" û "l" stûr tên xwendin.

(53) Gîhanek: Cîyê ku mirov digîj'ê. Ji peyvika "gîhanek" ra bi Erebî tê gotin "merhele", bi Tirkî tê gotin "aşama", bi Înglîzî jî tê gotin "phase".

(54) Ew peyva pêşîyan bi zimanê Tirkî weha ye: "Salla başını, al maaşını".

20 sal piştê derketina rojnama **"Kurdistan",** di sala 1918'an da dewleta Osmanî di Şerê Cîhanî yê Pêşîn da zorbirî bû û ket sekerata mirinê. Jixwe navê wê berê bûbû "Zilamê Nexweş". Şerê Cîhanî yê Pêşîn nexweşîya wê girantir kir û di dûwayîya wî şerî da êdî hêz tê da nema ku li ser lingan bimîne. Ji ser lingan ket û ket sekerata mirinê. 5 sal paşê, di sala 1923'yan da jî paşayek ji paşayên wê dewletê dûwayî li jîyana wê anî û ew xist gorê, di şûna wê da rejimeka nû saz kir û navê wê "Komara Tirkîyê" danî.(55)

Navê wî paşayî Kemal Paşa bû.(56) Lê ew ne tenê bû. Gelek paşayên hevalbendên wî jî hebûn. Mesela Îsmet Paşa, Fewzî Paşa, Kazim Paşa, Elî Fuad Paşa, Rafet Paşa, Fexredîn Paşa, Cafer Teyyar Paşa, Asim Paşa û wd. Kemal Paşa bû Serekkomar, Îsmet Paşa jî bû Serekwezîr.

Bi wî awayî rejimeka eskerî hat sazkirin. Mirov dikare bi hêsanî ji wê rejimê ra bêje "Komara Eskerî ya Tirkîyê".(57) Digel sazkirina wê rejima eskerî, rejima padîşahan çû, di şûna wê da rejima paşayan hat. Bingehê wê rejimê nejadperestîya Tirk bû. Peyva Kemal Paşa ya meşhûr vê yekê baş nîşan dide. Ew peyv ev e: "Yek Tirkek bedêla hemî dinyayê ye".

Sazkirina "Komara Eskerî ya Tirkîyê" jibo gelên bindest, xasma jibo gelê Kurd, bû despêka felaketeka neteweyî û belayeka nedîtî. Padîşahên Osmanîyan digotin "Kurd û Kurdistan hene, lê divê ew di binê destê me da bimînin". Lê belê rejima eskerî ya ku bi destê Kemal Paşa û paşayên hevalbendên wî hat sazkirin û navê "Komara Tirkîyê" lê hat danîn, tewr hebûna gelê Kurd jî înkar kir. Amanca wê rejimê, "afirandina neteweyekî Tirk ê yekbûyî û yekziman û yekçande û yekhuwiyet" bû. Jibo ku bigîha wê amancê jî biryar da ku gelê Kurd di nava Tirkan da bipişêfe û bihelîne. Jibo ku wê biryara xwe jî pêkbîne her tiştê gelê Kurd qedexe kir; ji zimanê Kurdî heta edebiyata Kurdî, ji çandeya Kurdî heta stranên Kurdî gişt ji alîyê wê rejima eskerî ya zalim û nejadperest ve hatin qedexekirin. Tewr peyvika "Kurd" jî di çavê wê rejima eskerî da bû strîyeka beloq; rejimê ew jî qedexe kir û navê gelê Kurd kir "Tirkên çîyayî", navê Kurdistanê jî kir "Anadola Rojhilat".

Bi wî awayî, wê rejima gunehkar ne ku tenê li dijê gelê Kurd sûc kir; lê her weha li dijê mirovîyê, li dijê tarîxê û li dijê cografyayê jî sûcekî giran kir. Lewra bi qedexekirina ziman û edebiyat û çande û stranên Kurdî li dijê mirovîyê

---

(55) Navê wê bi Tirkî "Türkiye Cumhuriyeti" ye.

(56) Ji ber ku ew di nava gelê Kurd da bi navê "Kemal Paşa" hatîye naskirin û bi wî navî qala wî tê kirin, me li vir navê wî weha nivîsî. Belkî jî, ji ber ku ew nav bûye sembol û nîşana milîtarîzma Osmanîyan û milîtarîzm û rehkarîya Tirkan, gelê Kurd bi "paşatî"ya wî ew nasîye û her bi vî navî qala wî dike. Nav û unwan û paşnavên wî yên dî yên wek "Mistefa Kemal", "Xazî" û "Kemal Ataturk", di nava gelê Kurd da cî negirtine. Lewra ew eskerekî wisa bû ku milîtarîzma Tirkan a ku di dûwayîya dewra Osmanîyan da êdî kevnar bûbû, nûjen kir; rehkarîya Tirkan jibo sîyaseta xwe û jibo Komara Tirkîyê kir bingeh; bi zora eskerîyê û bi qetlîamên hovkî berxwedanên gelê Kurd şikandin; pêwendî û muameleyên wî digel gelê Kurd, her bi singûyê bûn, bi agir û xwînê bûn. Ji ber van semedan, gelê Kurd tim û tim bi "paşatî" qala wî kirîye û her tim jê ra gotîye "Kemal Paşa".

(57) Rejimek ku di 66 salan da jê ra heşt serekkomar hatine bijartin û şeş ji wan general bûne; ma ew rejim ne "Komara Eskerî" ye, çi ye!

derket; bi qedexekirina navê "Kurd" û guhartina wî navî bi navê "Tirkên çîyayî", li dijê tarîxê derket û rastîyeka tarîxî înkar kir; bi rakirina navê Kurdistanê û guhartina wî bi navê "Anadola Rojhilat", rastîyeka hem tarîxî û hem cografî înkar kir.

Dema gelê Kurd serê xwe bilind kir û li dijê wê sîyaseta nemirovkî rawesta û heqê xwe xwest, Kemal Paşa bi top û tifingên xwe, bi firoke û tanqên xwe çû ser gelê Kurd û bi deh hezaran Kurd dan ber gule û bomba û singûyan, agir avêt bi hezaran gundên Kurdan, bi deh hezaran jin û zarûkên Kurdan digel gundên wan bi gîyanîtî şewitandin û tune kirin.(58)

Dema mirov rejima Osmanî û rejima Kemal Paşa ya ku navê wê yê resmî "Komara Tirkîyê" ye û di eslê xwe da "Komara Eskerî ya Tirkîyê" ye, ji alîyê şola gelan ve dide ber hev û qiyas dike, mirov bi awayekî zelal û vekirî dibîne ku "Komara Eskerî ya Tirkîyê" ji rejima Osmanî gelek xirabtir û barbartir û paşverûtir e.(59)

---

(58) Ew qetlîama barbarkî ya ku Kemal Paşa di sala 1925'an da piştê şikandina Şorişa Şêx Seîd li Kurdistanê kir, di dîroka gelê Kurd da bûye nuqteyeka kifşkirî, bûye nîşanek, bûye kevirekî kîlometreyê. Li Kurdistana Jorîn di nava gelê Kurd da navê sala 1925'an bûye "Sala Şewatê". Ew nav di nava gelê Kurd da bûye despêka tarîxek, bûye nîşaneka dîrokî. Zarûkên ku di wê salê da welidîne, ew sal jibo wan bûye tarîxa welidînê û hatîye gotin "filan kes di Sala Şewatê da hatîye dinê". Kesên ku di wê salê da welew bi ecelê xwe jî mirine, jibo wan jî hatîye gotin "filan kes di Sala Şewatê da wefat kirîye". Gelê Kurd bi wê navandinê, qetlîama hovkî ya Kemal Paşa û rejima wî di tarîxê da raçandîye û wisa kirîye ku ji bîr neyê kirin.

(59) Mîr Bedirxanê Botî jibo serxwebûna Kurdistanê li dijê dewleta Osmanî şer kir. Di sala 1847'an da dema zorbirî bû, Padîşahê Osmanîyan Evdilmecîd ew idam nekir; ew ji Kurdistanê derxist û li Grava Girîtê da bicîkirin. Di dewra Padîşah Evdilezîz da li ser daxwaza wî, destûra çûyina Şamê jê ra hat dayin; çû li wir bicî bû û di sala 1870'yî da li wir wefat kir.

Şêx Seîd jî jibo serxwebûna Kurdistanê li dijê rejima Kemal Paşa şer kir. Dema zorbirî bû, Kemal Paşa di şeva 28/29 Hezîran 1925'an da ew digel 46 hevalên wî li bajarê Amed(Dîyarbekir) di demek da û li cîyek bi hev ra idam kirin; yanî bi tevayî 47 kes bi hev ra û bi rêzê ra daleqandin û idam kirin. Barbarîyeka weha ne ku tenê di zemanê Osmanîyan da, di zemanê Cengîz û Teymûrê Leng da jî nehatîye dîtin. Di çu dewreka dinyayê da li çu cîyekî dinyayê ji alîyê çu rejimek ve 47 kes bi hev ra di yek demek da û li yek cîyek û li rexê hev nehatine idamkirin.

BEŞ II

NAVEROKA ROJNAMA "KURDİSTAN"

"MEM Û ZÎN" Dİ RÛPELÊN "KURDİSTAN"Ê DA

"Mem û Zîn"a Xanîyê nemir di nava gelê Kurd da ji berê ve gelek hatîye naskirin û denganeka mezin daye. Lê belê **"Mem û Zîn"**, berî derketina rojnama **"Kurdistan"** nehatibû çapkirin; tenê hin desnivîsarên wê di destê hin mela û rewşenbîrên Kurdan da hebûn. Ji ber wê yekê Mîqdad Mîdhet Bedirxan di rûpelên **"Kurdistan"**ê da hin parçeyên **"Mem û Zîn"**ê çap kirine. Di jimareya 2'yan da dest bi çapkirina wan parçeyan kirîye û bi çend rêzan giringîya **"Mem û Zîn"**ê daye zanîn û weha gotîye:

"Rehmeta Xwedê lê be, Xwedê gunehê wî bixefirîne, sala hezar û sed û pêncê(60) da li Cizîrê Ehmedê Xanî pirtûkeka helbeskî nivîsîye; navê vê pirtûkê kirîye **"Mem û Zîn"**. Ev pirtûk hemî helbest in; bi eşkeratî çîroka evîna du ciwanan e, lê di hundir da gelek amanc û par û hîkmet jê tên famkirin. Loma, divê mirov bi baldarî wê bixwîne. Di her rojnameyek da ez'ê ji wê pirtûkê hinek binivîsim, heta xilas bibe".(61)

Nivîskar di jimareya 2'yan da beşê pêşîn ê **"Mem û Zîn"**ê çap kirîye, paşê jî di piranîya jimareyan da parçena jê weşandine.

Piştê jimareya 5'an ku kargêrîya rojnameyê ketîye destê Evdirehman Bedirxan, wî jî weşandina parçena ji **"Mem û Zîn"**ê domandîye, bi wî awayî ew pirtûka giring û rûmetbilind bi gelê Kurd daye naskirin.

Mîqdad Mîdhet Bedirxan, di jimareya 2'yan da ragîhandîye ku ew dixwaze **"Mem û Zîn"**ê wek pirtûkek jî çap bike. Lê wisa tê zanîn ku jibo pêkanîna wê daxwaza xwe mecal û îmkan nedîtîye. Çapkirina **"Mem û Zîn"**ê wek pirtûkek, cara pêşîn, 21 sal piştê derketina rojnama **"Kurdistan"**, di sala 1919'an da ji "Komela Kurd jibo Belavkirina Zanînê û Weşanan"(Kürd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti) ra bûye nesîb. **"Mem û Zîn"** di wê salê da ji alîyê wê komeleyê ve li Stanbolê bi tîpên Erebî hatîye çapkirin.

---

(60) Pêncê: Pêncan, 5'an. Ev tarîxa Hîcrî ye. Li gora tarîxa Mîladî dibe 1695.
(61) **Kurdistan,** j. 2, r. 4.

Di rojnama **"Kurdistan"** da hin nivîsar li ser dîroka mîrên Botan jî derketine. Evdirehman Bedirxan di jimareya 8'an da dest bi weşandina wan nivîsaran kirîye û di despêkê da li ser wî babetî weha nivîsîye:

"Ez dizanim ku Kurd ji tarîxa Kurdistanê çu tiştek nizanin. Loma ez'ê di her rojnameyeka xwe da, bi kurtî piçek tarîxa Kurdistanê û ya bapîrên Azîzan binivîsim".(62)

Nivîskar paşê dest bi nivîsîna dîroka mîrên Botan kirîye û di serî da navê sazkarê dewleta Botan Mîr Silêmanê kurê Mîr Xalid nivîsîye; paşê jî bi rêzê ra cî daye qala Mîr Evdilezîz, Mîr Seyfedîn, Mîr Mecdudîn, Mîr Îsa, Mîr Bedredîn, Mîr Evdal û Mîr Îzedîn.(63)

Di jimareya 9'an da jî nivîskar nivîsîna wî babetî domandîye û cî daye navên Mîr Evdal, Mîr Îbrahîm, Mîr Şeref, Şah Elî Beg û Bedir Beg.(64)

Di jimareya 11'an da jî(65) qala Mîr Mihemedê kurê Mîr Mihemed, Mîr Ezîzê kurê Mîr Kek Mihemed û Mîr Mihemedê kurê Mîr Evdal kirîye.(66)

Di wî babetî da beşê giringtirîn di jimareya 13'an da cî girtîye.(67) Di wê jimareyê da li ser hukumdarê Kurdistanê yê paşîn Mîr Bedirxanê Botî nivîsareka dirêj hatîye nivîsîn. Ew nivîsar bi sernivîsara "Bedirxan Beg" derketîye.(68) Di wê nivîsarê da dûr û dirêj qala rewşa Kurdistanê ya wê demê, qala edalet û heqnasîya Mîr Bedirxan û rêzdarîya gelê Kurd jê ra, her weha qala êrîşa leşkerê Osmanî li ser Mîr Bedirxan û li ser Kurdistanê hatîye kirin.(69)

---

(62) Azîzan: Malbata mîrên Botan.

(63) **Kurdistan,** j. 8, r. 3—4.

(64) **Kurdistan,** j. 9, r. 3.

(65) Berhevoka rojnama **"Kurdistan"** a ku gîhaye dewra me, wek ku me li jor jî nivîsî, hin jimare jê kêm in û yek ji wan jî jimareya 10'an e. Dibe ku di wê jimareyê da jî tiştek li ser dîroka mîrên Botan hatibe nivîsîn.

(66) **Kurdistan,** j. 11, r. 3—4.

(67) Jimareya 12'an jî di berhevoka heyî da tune. Dibe ku di wê jimareyê da jî qala mîrên Botan hatibe kirin.

(68) Bi dîtina me, nivîsîna vê sernivîsarê di nivîsara Kurdî da şaşî ye. Lewra unwana "Beg" ne Kurdî ye, lê Tirkî ye. Hukumdarê Kurd ê navdar Bedirxan jî di nava gelê Kurd da bi unwana "Mîr" hatibû naskirin û li her derê Kurdistanê jê ra dihat gotin "Mîr Bedirxanê Botî". Ew qas bi unwana "Mîr" hatibû naskirin ku, gelek caran jî jê ra tenê dihat gotin "Mîr Bedirxan"; hingê jî her kesî dizanî ku qala kî tê kirin. Ji ber vî semedî, divîya ku li vir jî ev nivîsar bi sernivîsara "Mîr Bedirxan" bihata nivîsîn.
Her weha, di serê jimareyên rojnameyê da jî hatîye nivîsîn "Lawê Bedirxan Paşa"; bi dîtina me ew jî şaşî ye. Lewra unwana "Paşa" unwaneka Osmanî ye û dema destûra çûyina Şamê ji Mîr Bedirxan ra derketîye, ew unwan jibo dilxweşkirina wî ji alîyê Sultan Evdilezîz ve jê ra hatîye dayin. Lê belê di nava Kurdan da qet carek jî qala wî bi navê "Bedirxan Paşa" nehatîye kirin, tim û tim jê ra hatîye gotin "Mîr Bedirxanê Botî" yan jî tenê "Mîr Bedirxan". Ji ber vî semedî, divîya ku di serê jimareyan da jî bihata gotin "Lawê Mîr Bedirxan".

(69) **Kurdistan,** j. 13, r. 3—4.

Di jimareya 14'an da jî li ser dîroka Mîr Bedirxan nivîsareka Tirkî ya dirêj derketîye û tê da hatîye qalkirin ku Mîr Bedirxan di Kurdistanê da edaleteka çawa bicî kirîye û çawa gel ji zulma dewleta Osmanî û karbidestên wê parastîye, paşayên Osmanîyan çawa li dijê wî derketine û tirsane, leşkerê Osmanî çawa çûye ser Kurdistanê û Mîr Bedirxan çawa li dijê wî şer kirîye û çawa zorbirî bûye û paşê ji Kurdistanê hatîye derxistin û dûrxistin.(70)

HİŞYARKİRİN Û SERWEXTKİRİNA GELÊ KURD

Wek ku me di beşê pêşîn ê vê Pêşkêşîyê da jî da zanîn, sazkarê rojnama **"Kurdistan"** Mîqdad Mîdhet Bedirxan, hişyarkirin û serwextkirina gelê Kurd jibo xwe û rojnama xwe kirîye amanc, di jimareya pêşîn da jî ew amanc ragîhandîye. Rojnama **"Kurdistan"**, hem di her pênc jimareyên pêşîn da ku di binê kargêrîya Mîqdad Mîdhet Bedirxan da derketîye, hem jî ji wan pê ve ku ketîye binê kargêrîya Evdirehman Bedirxan, her ji wê amancê ra xizmet kirîye û li ser wê rê meşîyaye. Jibo hişyarkirin û serwextkirina Kurdan di rojnamê da gelek nivîsar hatine weşandin.

Hêj di jimareya pêşîn da Mîqdad Mîdhet Bedirxan deng li Kurdan kirîye û ji wan xwestîye ku zarûkên xwe bişînin dibistanan û bidin xwendin, cî daye hin ayet û hedîsên di heqê xwendinê da, ji melayên Kurdan daxwaz kirîye ku Kurdan bihewisînin xwendin û zanînê, ji mîr û axayên Kurdan jî daxwaz kirîye ku di gund û bajarên xwe da dibistanan ava bikin. Daye zanîn ku Misrî zarûkên xwe didin xwendin, di nava wan da gelek rewşenbîr û pîşekar(71) hene, Kurdên ku li Misrê ne jî ji Misrîyan ra dergevanî û xulamî dikin. Her weha qala şerê Çînê û Japonyayê kirîye, daye zanîn ku eskerên Çînê deh qatê eskerên Japonyayê bûne lê ji ber ku Çînî nezan û nexwendî bûne û Japonî jî zana û xwenda bûne, Japonîyan Çînî zorbirî kirine. Di şerê Misrê û Sûdanê da jî eynê tişt di leha Misrîyan da hatîye dîtin.(72)

Mîqdad Mîdhet Bedirxan, di serê jimareya 2'yan da jî weha nivîsîye:

"Di rojnama pêşîn da min piçek qala qencîya zanînê û têgîhîştinê kiribû. Ez vê rojnamê ji wî semedî dinivîsim da ez Kurdan hînê xwendinê bikim, da Kurd bizanin fêda xwendinê çi qas gelek e".

Paşê deng li mîr û axa û paşayên Kurdan kirîye û gotîye "ez ji we dipirsim: Kî ji we heta nuha ji welatê xwe ra çi kirîye, da em bizanin ku hun welatê xwe dievînin" û daye zanîn ku evîna welêt ew e ku mirov welatê xwe ava bike û tê da dibistanan çêke, ji dewlemendên Kurdan jî xwestîye ku dibistanan ava bikin û zarûkên bêdê û bav di wan da bidin xwendin.(73)

---

(70) **Kurdistan,** j. 14, r. 2—4.

(71) Pîşekar: Hostayê ku dikare li ser hin maddeyan bi hostatî bixebite; wek hesinkaran, sazkar û hostayên karxanan, çêkirox û hostayên makîne û sazgehan.

(72) **Kurdistan,** j. 1, r. 1—4.

(73) **Kurdistan,** j. 2, r. 1—2.

Mîqdad Mîdhet Bedirxan, di jimareyên dî da jî li ser mefayê xwendin û zanînê gelek tişt nivîsîne, dîsa cî daye gelek ayet û hedîsên di heqê xwendin û zanînê da.

Evdirehman Bedirxan jî, piştê ku kargêrîya **"Kurdistan"**ê girtîye destê xwe, li ser rîya birayê xwe meşîyaye û giringî daye babetê xwendin û zanînê. Hêj di jimareya 6'an da deng li mela û mîr û axayên Kurdan kirîye û weha gotîye:

"Divê mezinên Kurdan biçûkên binê destê xwe fêrê zanînê û huneran bikin. Wê demê mîr û axa jî sed car pirrtir dibin xwedîqedir. Şîret ji min, guhdan ji we".(74)

Di jimareya 7'an da li ser wî babetî weha nivîsîye:

"Bi vê rojnamê, qasê ku ji destê min hat ez'ê ji Kurdan ra binivîsim. Ez hêvî dikim ku Kurdên me piştê nuha dê fêrê pîşe û huneran bibin, da ku ew jî wek xelkê hemîyan dewlemend bibin, tim weha jar û xizan nemînin".(75)

Di jimareyên dî da jî li ser giringî û fêda xwendin û zanînê gelek nivîsar hatine nivîsîn, di wan da deng li mela û mîr û axayên Kurdan hatîye kirin da ku dibistanan bidin avakirin û gel bidin xwendin.

NETEWEEVÎNÎ Û WELATEVÎNÎ

Di rojnama **"Kurdistan"** da li ser neteweevînî û welatevînîyê jî hin nivîsar derketine; di hin nivîsarên li ser hin babetên dî da jî qala neteweevînî û welatevînîyê hatîye kirin. Tiştê balkêş ev e ku, dema qala neteweevînî û welatevînîyê hatîye kirin, neteweevînî û welatevînî wek tiştekî neberçav û xiyalî û tenê pêjnî(76) nehatîye danîn; lê belê wek şoleka berçav û bi jînê ve girêdayî hatîye pêşkêşkirin, bi hin şolên abûrî û sîyasî û komelî(77) ve hatîye girêdan.

Mesela Mîqdad Mîdhet Medirxan, di jimareya 2'yan da piştê ku cî daye hedîsa Pêxember a ku dibêje "evîna welêt ji îmanê ye",(78) weha deng li mîr û axa û paşayên Kurdan kirîye:

"Gelî mîr û axa û paşayan! Ez ji we dipirsim: Kî ji we heta nuha ji welatê xwe ra çi kirîye, da em bizanin ku hun welatê xwe dievînin! Evîna welêt ew e ku mirov nehêle dijminê mirov bikeve nava welatê mirov! Evîna welêt ew e ku mirov welatê xwe ava bike, dibistanan, xêretxanan çêke! Evîna welêt ew e ku mirov zarûkên welatê xwe bide xwendin, fêrê pîşe û zanînê bike".(79)

---

(74) **Kurdistan,** j. 6, r. 3.
(75) **Kurdistan,** j. 7, r. 2.
(76) Pêjnî: Tiştê sipartîyê pêjnê, tiştê ku berê xwe dide pêjnê. Bi Erebî "atifî", bi Tirkî "duygusal", bi Înglîzî jî "emotional".
(77) Komelî: Tiştê ku têkilîya wî bi komelê heye. Bi Erebî "îctîmaî", bi Tirkî "toplumsal", bi Înglîzî jî "social".
(78) Eslê vê hedîsê bi Erebî weha ye: "Hubbu'l-wetenî mîn'el-îman".
(79) **Kurdistan,** j. 2, r. 1.

Evdirehman Bedirxan jî di jimareya 6'an da li ser wî babetî weha nivîsîye:

"Evîna min a ji neteweyê min Kurdan ra, ez sewq kirim ku di vê rojnamê da rîya qenc nîşanê Kurdan bidim. Rom,(80) cîyê ku Tirk lê hebin, dibistanên mezin datîne. Hukumet diravan ji Kurdan distîne, ji Tirkan ra serf dike. Kurdên reben dîlên vê hukumetê ne".(81)

Di jimareya 8'an da ji zanyarên Kurdan daxwaz kirîye ku kesên nezan û nexwendî bidin xwendin, ji mîr û axayên Kurdan jî xwestîye ku di wî karî da bi diravên xwe ji zanyaran ra bibin alîkar, paşê weha nivîsîye:

"Wê hingê Kurd jî dikarin rojek bibin xwedîdewlet, xwedîhîkmet û zanîn. Eger na, welatê we dê rojek ji destê we derkeve, hun'ê bibin xulamê neyarên xwe. Haya Padîşah ji rewşa ve tune, yên dora wî jî Kurdan naevînin. Dê vêca eger hun mîr û axa guh nedin biçûkên xwe, xanîyê we dê ji destê we derkeve. Hêza we bi yên binê destê we ye. Eger ew tunebin, di destê we da çu hêz namîne".(82)

Di jimareya 9'an da jî di binê sernivîsara "Welat-Weten" da weha gotîye:

"Weten, yanî welatê mirov laşekî wisa ye ku, kesên ku ew laş tesîr li wan dike, xelkê wê derê ne. Dê vêca, mirovên welatek hingî bibin xwedîhêz, ax û berê wî welatî ew qas dibe xwedîhêz. Cirkî(83) bavê min ji Kurdistanê rabû, ew karbidestên ku hukumet rêdike serê gund û bajarên Kurdistanê, wek maran xwîna gelê Kurdistanê vedixun. Ne haya mezinan ji biçûkan, ne haya biçûkan ji mezinan maye. Welatê Kurdan wek laşekî birîndar bêhal maye".(84)

Di serê jimareya 27'an da rexne li Kurdan xistîye ku çima ji bîyanîyan ra xizmet dikin û weha pirsîye:

"Eve ev qas sal e hun xizmeta Tirkan dikin, we çi qencî dît? Li pêşberê ev qas zulma hukumetê, ku we nîşanek yan rutbeyek stand, hun mexdûrîyeta xwe ji bîr dikin. Di rîya vê hukumetê da ew qas Kurd di şer da hatin kuştin; lê belê heta nuha çu caran yek mirovekî Kurd ji welatê xwe ra çu xîret serf nekir. Goya ku(85) em li ser xizmeta bîyanîyan hatine afirandin. Berî 500 salan çu Tirkek li welatê me tunebû. Ev Tirk hemî ji Tûran hatin welatê me û di welatê me da hakimî li me dikin".

Paşê qala zordestî û zulma hukumeta Evdilhemîd kirîye, ji Kurdan xwestîye ku hevgirtî bin û şerê hev nekin, şerê Ermenîyan jî nekin, bi wan daye zanîn ku Ermenî jî wek wan bindest in, gotîye "êdî zeman e, divê em ji silametiya xwe û zarûkên xwe ra bixebitin", daye zanîn ku ew dê hin kesan bişîne nik Kurdan, ji Kurdan xwestîye ku ji wan kesan ra îtaet bikin, ragîhandîye ku ew bi xwe jî dixwaze ji alîyê Îranê ve here ser sînorê Kurdistanê, û weha gotîye:

---

(80) Li jêrenota 45'an binêrin.
(81) **Kurdistan,** j. 6, r. 2—3.
(82) **Kurdistan,** j. 8, r. 1.
(83) Cirkî: Ji wê demê vir ve, ji wê demê pê ve. Ji peyvika "cirkî" ra bi Erebî tê gotin "munzu", bi Tirkî tê gotin ". . .den beri", bi Înglîzî jî tê gotin "since".
(84) **Kurdistan,** j. 9, r. 1.
(85) Goya ku: Wek ku, mirov dibêje qey ku, ji mirov we ye ku.

"Bi îzna Xwedê wê hingê ez'ê Kurdan ji xulamîya Romê xilas bikim".(86)

Dîsa di jimareya 27'an da nivîsareka Tirkî bi sernivîsara "Ji Kurdan ra"(Kürdlere) nivîsîye û tê da qala pêwendîyên ferdan digel welatê wan û komela(87) wan kirîye; daye zanîn ku jîyana mirov bi wê axê ve girêdayî ye ku jê ra tê gotin "welat", nexu parastina welatê mirov wezîfa pêşîn e li ser milê mirov; xebata jibo bextyarî û pêşketina komelê jî wezîfa diduyan e, divê mirov tim û tim menfeetên neteweyî bide ber çavên xwe û manfeetên şexsî di menfeetên neteweyî da bibîne.(88)

NETEWEEVÎNÎ Û WELATEVÎNÎ DI NAVA SÎNORÊN OSMANÎYAN DA

Tiştê balkêş ev e ku, neteweevînî û welatevînîya ku di rojnama **"Kurdistan"** da cî girtîye û hatîye karanîn, ne ber bi amanca serxwebûna Kurdistanê bûyê; bi peyveka dî, amanc ji wê neteweevînî û welatevînîyê ne ew bûye ku Kurdistan ji dewleta Osmanî bê rizgarkirin û li ser axa Kurdistanê dewleteka Kurd a xweser bê sazkirin. Lê belê amanc ew bûye ku neteweyê Kurd di nava sînorên dewleta Osmanî da bibe xwedîyê azadîya xwe, li ser ax û ava xwe bi azadî bijî. Dewleta Osmanî, dewleta hemî Musulmanan hatîye qebûlkirin û hebûna wê hatîye parastin, başkirina wê û paqijkirina wê ji xiraban û xirabîyê hatîye daxwazkirin, di wê rê da têkoşîn hatîye kirin.

Evdirehman Bedirxan, di jimareya 16'an da weha nivîsîye:

"Herçîyê Musulman e, divê ku dewleta Osmanî jîyana xwe bidomîne. Dema me dît ku laşê dewletê ji ber xirabûna kargêrîyê nexweş e, divê em wî laşî derman bikin, semedên nexweşîyê ji holê rakin. Saxîya dewletê saxîya me ye, mirina wê mirina me ve".(89)

Nivîskar di jimareya 23'an da nivîsareka Tirkî di binê sernivîsara "Afirandina Xerîb"(Garabet-i Hilkat) da li ser xirabîyên Evdilhemîdê 2'yan nivîsîye. Di wê da daye zanîn ku Evdilhemîd ji malbata Osmanîyan a gewre ye, digel wê yekê jî tiştekî xerîb û ecêb e ku ew qas xirab û tirsonek û newêrek e; xirabî û newêrekîya Evdilhemîd bi mezinatîya bav û bapîrên wî ra qiyas kirîye û weha pesnê bapîrên wî daye:

"Evdilhemîd heta ku li ser textê seltenetê rûniştê, ew cîyê ku tê da hat gîhandin û hînkirin, ew koşka gewre û têrhêz bû ku ji 700 sal berê ve ew malbata seltenetê tê da hatibû gîhandin û hînkirin ku bi êrîşkarî û heybeta xwe Ewrupa yeker hejandibû. Ew koşkeka wisa bû ku ew padîşahên gewre yên ku tê da gîhabûn, hinekan ji wan li xerîta dinyayê nihêrtibû û goga Erdê biçûk dêrabû û ji padîşahek ra hindik dîtibû, hinek ji wan jî di wextê selteneta xwe da

(86) **Kurdistan,** j. 27, r. 1—2.
(87) Komel: Koma mirovan a ku mirov tê da dijî. Bi Erebî "mucteme", bi Tirkî "toplum", bi Înglîzî jî "society".
(88) **Kurdistan,** j. 27, r. 2.
(89) **Kurdistan,** j. 16, r. 1.

tim di meydana şer da şûrê tazî di destan da, wek neferekî adetî di pêşîya leşkerê xwe da xebitîbû, kefteleft kiribû, edalet anîbû cî û welatên xwe fire kiribûn".(90)

*

Bi dîtina me, pesindana padîşahên Osmanîyan bi awayekî weha, jibo mirovekî wek Evdirehman Bedirxan kêmayî ye. Li gora rewşa wê demê, ku dewleta Osmanî împeratorîyeka mezin bû û di nava sînorên wê da gelek netewe hebûn, mirov dikare fam bike ku hin rewşenbîrên wan neteweyan û digel wan rewşenbîrên Kurdan jî, li gora pîvekên(91) wê demê xwestine ku ew dewlet li ser lingan bimîne û di nava çarçove û sînorên wê da li azadîya neteweyên xwe gerîyane. Mirov dikare wê tevgera wan bi dîtina wan a sîyasî ve girêde û bêje "dîtina wan a sîyasî ew bûye". Lê belê mirov nikare qebûl bike û xweş bibîne ku rewşenbîrekî Kurd ê azadîxwaz û têkoşer, bi vî awayî pesnê padîşahên Osmanîyan bide û weha serên wan bilind bike.

Xasma ku mirov bîne bîra xwe ku ew padîşah hemî zalim û xwînxwar û barbar û birakuj bûne, hema-hema gişt dema çûne ser text birayên xwe yên mezin û biçûk, tewr ên sawa jî bi carek kuştine, di nava gelên bindestên xwe da jî qetlîamên mezin ên barbarkî kirine û bi sed hezaran mirovên êrî kuştine, bi sed hezaran jin û zarûk dane ber şûran û top û tifingan, mirov nikare xweş bibîne ku yek ji rewşenbîrên gelekî bindest pesnê wan mêrkûjên desbixwîn û devbixwîn bide.

Ji ber vê yekê, divê em bi dilekî fire bêjin ku ew pesindana padîşahên Osmanîyan jibo Evdirehman Bedirxan kêmayîyek e. Rêzdarîya me jê ra bêdûwayî ye û divê em tim bi rêzdarî wî bi bîr bînin; lê belê digel vê yekê jî, divê em vê kêmayîyê jî bibînin û bînin ber çavan.

*

Di jimareya 25'an da nivîsareka dirêj bi zimanê Tirkî bi sernivîsara "Ji Kurdan ra"(Kürdlere) nivîsîye. Di wê nivîsarê da li ser hin şolan dîtinên xwe dane zanîn, paşê weha gotîye:

"Wextek hun neteweyekî dewlementirîn û bextyartirîn bûn; îro wek hemî Osmanîyan hun di nava xizanî û belengazîyê da digevizin".(92)

Wek ku ji vê peyvê jî tê zanîn, Kurd jî wek gelên dî yên nava sînorên dewleta Osmanî, "Osmanî" hatine qebûlkirin û hevwelatên wê dewletê hatine têwkirin.

Di jimareya 28'an da nivîsareka Kurdî bi sernivîsara "Alayên Siwarên Hemîdî" derketîye. Di wê nivîsarê da, giringîya Kurdistanê jibo dewleta Osmanî ji alîyê stratejîya eskerî ve weha hatîye salixdan:

---

(90) **Kurdistan,** j. 23, r. 3.

(91) Pîvek: Tiştê pîvanê, tiştê ku bi wî hin tiştên dî tên pîvan. Bi Erebî "mîqyas", bi Tirkî "ölçüt', bi Înglîzî jî "criterion".

(92) **Kurdistan,** j. 25, r. 3—4.

"Kurdistan jibo dewleta me, li ser sînorên Rûs û Îranê herêmeka gelek fire û girng pêktîne. Li ser domandina jîyana hukumeta me, parastina Kurdistanê gelek pêwîst e".(93)

Wek ku tê dîtin, ji dewleta Osmanî ra hatîye gotin "dewleta me", giringîya Kurdistanê jibo wê dewletê hatîye dîyarkirin; bi peyveka dî, dewleta Osmanî wek dewleta Kurdan jî hatîye têwkirin û Kurdistan parçeyek, beşek ji wê dewletê hatîye dîtin.

Dîsa di jimareya 28'an da nivîsarek bi Tirkî jî li ser Siwarên Hemîdî derketîye. Di wê nivâsarê da jî giringîya Kurdistanê jibo dewleta Osmanî hatîye dîyarkirin û weha hatîye gotin:

"Kurdistan herêmeka fire û kûr e ku di sînorên rojhilat ên Dewleta Bilind(94) da, di cîranîya dewletên Rûsyayê û Îranê da û ji alîyê eskerî ve di cîyekî naziktirîn ê dewleta me da ye. Îro jibo yekerîya axa hukumeta me û jibo domandina jîyana wê ya sîyasî, girtina Rûmelîyê(95) di dest da çi qas îhtîyaceka qutûbirr e, ji herêma Kurdistanê ra jî eynê giringî û îhtîyac tê pêjnkirin".

Di wê nivîsara Tirkî da, xirabîyên ku ji Siwarên Hemîdî peyda bûne hatine jimartin û di nava wan da ev her du xirabî jî hatine nivîsîn:

"Şûrê Osmanî yê xwedîşan, dê bi xwîna êrîyan bê lewitandin; temamê ummeta Osmanî ya ku navê Hemîdî lê nebe, dê têkeve talukê".(96)

*

Divê em li vir jî bidin zanîn ku, salixdana şûrê Osmanî bi peyvika "xwedîşan", xetayekî mezin e û jibo Evdirehman Bedirxan kêmayîyek e. Lewra ew şûr, şûrekî xwînrêj bû; li Asyayê, Ewrupayê û Afrîqayê xwîna bi sed hezaran mirov bi wî şûrî hatibû rêtin, bi sed hezaran mirov ji gelên bindest bi wî şûrê xwînrêj û qatil gîyan dabûn. Yek ji wan gelên bindest jî gelê Kurd bû ku bi wî şûrê kirêt û xwînî gelek ewladên wî hatibûn şehîdkirin. Ji ber wê yekê, xeta û kêmayî ye ku Kurdekî xebatkar û têkoşer ê wek Evdirehman Bedirxan pesnê wî şûrê kirêt û xwînî weha daye.

*

Di jimareya 30'yî da nivîsarek li ser xebata papasên Cîzwîtan di Kurdistanê da derketîye. Di wê nivîsarê da hatîye qalkirin ku ew papas wek mîsyoneran hatine Kurdistanê û li wir gelek xirabî gîhandine gel, di navbera Kurdan û Ermenîyan da dijminî derxistine û her du gel li dijê hev fît kirine,(97) rê ji têkilî û zordana Rûsyayê û Fransayê ra vekirine. Piştê ku ew xirabî gişt hatine rêzkirin, weha hatîye gotin:

(93) **Kurdistan,** j. 28, r. 1.
(94) Dewleta Bilind: Dewleta Osmanî. Di dewra Osmanîyan da ji wê dewletê ra weha dihat gotin.
(95) Rûmelî: Axa Osmanîyan a li Ewrupayê.
(96) **Kurdistan,** j. 28, r. 2—4.
(97) Fîtkirin: Germkirina hin mirovan li dijê hin mirovên dî. Bi Erebî "tehrîd", bi Tirkî "kışkırtmak", bi Înglîzî jî "to provoke".

"Hasilî, çara van hemî belayan Qanûna Esasî ye.(98) Dema ku di welatê me da ev qanûn saz bû, êdî wê hingê gel hemî ji huqûqên xwe ewle dibe, desdirêjîya padîşahê dîktator û karbidestên wî namîne, êdî mîsyoner jî ji xirabkirina gel ra çu çare nabînin, tewr dewletên bîyanî jî têkilîya karên me nakin".(99)

GUHARTİNA QANÛNAN Lİ WELATÊN SERDEST NABE DERMANÊ DERDÊ NETEWEYÊN BİNDEST

Ew welatê ku di vê nivîsara jorîn da jê ra hatîye gotin "welatê me", mexsed jê împeratorîya Osmanî ye, ku Kurdistan jî hingê parçeyek ji wê bû. Wek ku dixuye, Qanûna Esasî jî wek dermanê hemî derdan jibo wê împeratorîyê û jibo gelê Kurd hatîye dîyarkirin. Divê em li ser vê nuqteyê jî piçek biwestin, piçek bifikirin û bûyerên ku paşê qewimîne piçek li wan binêrin:

Tarîxa jimareya ku ev nivîsara jorîn tê da derketîye, li gora tarîxa Romî 1 Adar 1318 ye, ku li gora tarîxa Mîladî dibe 14 Adar 1902; yanî ev nivîsar di sala 1902'yan da hatîye nivîsîn. Şeş sal piştê nivîsîna vê nivîsarê, di sala 1908'an da di nava sînorên dewleta Osmanî da Qanûna Esasî û rejima meşrûtî hat sazkirin.(100) Prensîp û sloganên rejima nû "azadî, biratî, wekhevî"(hürriyet, uhuvvet, müsavat) bûn; ev her sê peyvik wek tilîsma hemî derd û kulan, wek reçeta dermanê hemî derdan, wek mifta vekirina hemî dergehên girtî li her derê împeratorîyê belav bûbûn, wek benîşt ketibûn devê her kesî. Salek paşê, di sala 1909'an da Evdilhemîdê 2'yan jî ji textê dewleta Osmanî hat daxistin.

Lê belê demeka kurt paşê, di şûna dîktatorîya Evdilhemîd da dîktatorîya "Partîya Yekîtî û Pêşketina Osmanî"(Osmanlı İttihad ve Terakkî Fırkası) ya zalim hat sazkirin. Wê partîyê gelên dî jî, gelê Kurd jî bi xwînê vereşandin. Her sê paşayên li serê wê parîyê, yanî Enwer Paşa, Tel'et Paşa û Cemal Paşa, dîktatorîyeka xwînî ya wisa dijwar saz kirin ku gelên bindest jî, azadîxwazên Tirkan bi xwe jî heft xwezîyên xwe bi dîktatorîya Evdilhemîd anîn. Evdilhemîd di 33 salên padîşahîya xwe da qet kesek jî li Kurdistanê ji semedên sîyasî idam nekiribû. Lê belê hukumeta Partîya Yekîtî û Pêşketina Osmanî, di sala 1913'an da tenê di bajarê Bedlîsê da sê şev li pey hev sêpê rast kirin û 18 Kur-

(98) Qanûna Esasî: Serqanûn, qanûna bingehî ya ku awayê kargêrîya dewletek, heq û wezîfeyên hevwelatên wê dewletê sererast dike û kifş dike. Di dewra Osmanîyan da ji serqanûnê ra weha dihat gotin. Ji serqanûnê ra bi Erebî tê gotin "dustûr", bi Tirkî tê gotin "anayasa", bi Înglîzî jî tê gotin "constitution".

(99) **Kurdistan**, j. 30, r. 2.

(100) Rejima meşrûtî: Ew rejim e ku di binê serekîya hukumdarek da meclisek ji temsîlkarên gel tê pêkanîn, hukumdar û meclis pêkve kargêrîya welêt dikin, bi peyveka dî, kargêrîyê parve dikin

dên bijare idam kirin.(101) Dîsa wê hukumetê, dema Şerê Cîhanî yê Pêşîn bi sed hezaran Kurd ji Kurdistanê cîhil kirin û wek kerîyên pez ajotin bajarên cure cure yên li hêlên cure cure yên dewleta Osmanî. Bi hezaran jî ji wan li rîyan mirin.(102)

*

Paşê Kemal Paşa rabû. Wî jî got "kana hemî derd û belayan malbata Osmanî ye, çare û havila hemî derdan jî ew e ku em wê malbatê ji welêt biqewitînin û cumhûrîyet saz bikin". Wisa jî kir. Lê belê qetlîamên barbarkî yên ku wî di 15 salên dewra xwe da li Kurdistanê kirin, di 600 salên dewra Osmanîyan da nebûbûn. Eskerên wî yên hov û xwînxwar ên ku ji kuştina jin û zarûkên Kurdan zewqeka heywanî distandin, barbarîya xwe ew qas pêş ve birin ku zikên jinên Kurd ên ducan didan ber singûyan û godegên wan bi singûyan ji zikên wan derdixistin. Wek ku me berê jî nivîsî, tenê di bajarê Amed da û tenê di şeva 28/29 Hezîran 1925'an da û bi yek carek 47 Kurdên bijare bi destê cumhûrîyeta Kemal Paşa ya zalim hatin idamkirin.

Tiştê balkêş ev e ku Kemal Paşa, ew qetlîamên nebûyî gişt bi navê "medenîyetê û pêşverûtîyê" dikirin. Tiştê ji vê yekê jî balkêştir ev e ku ew kes û vêkxistinên Tirk ên ku ji xwe ra digotin "pêşverû û sosyalîst", wan jî di wan qetlîaman da piştgirîya Kemal Paşa û cumhûrîyeta wî ya eskerî dikir. Wan digot "cumhûrîyeta genc a pêşverû bi van tevgerên xwe yên li Rojhilat,(103) feodalîzmê tesfîye dike û ji holê radike; ji ber vê yekê em piştgirîya van tevgerên wê dikin".

Şewitandina gundên Kurdistanê, kuştin û şewitandina jin û zarûkên Kurdan jibo wan "tesfîyekirina feodalîzmê û tevgereka pêşverû" bû. Temsîlkarên wan ên ku di civînên navberneteweyî da beşdar dibûn, di wan civînan da jî piştgirîya qetlîamên "Komara Eskerî ya Tirkîyê" li Kurdistanê kirin û ew qetlîam bi "hevrê"yên xwe yên ji welatên cure cure jî wek "tesfîyekirina feodalîzmê û tevgereka pêşverû" dan qebûlkirin, piştgirîya wan jî ji Kemal Paşa ra û ji rejima wî ya faşîst ra û ji cumhûrîyeta wî ya eskerî ra qazanc kirin. Bi wî awayî, di şûna ku ew kes û vêkxistin û "hevrê"yên wan ên bîyanî piştgirîya gelê Kurd ê mezlûm û bindest di tevgera wî ya azadîxwazîyê û rizgarîxwazîyê da bikin, piştgirîya "Komara Eskerî ya Tirkîyê" kirin; di şûna ku bibin

(101) **"Jîn"**, Kovara Kurdî-Tirkî, Stanbol, 1918-1919, çapa 2'yan, cild IV, r. 752-757, wergêr ji tîpên Erebî bo tîpên Latînî: M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala-Swêd, 1987.

(102) Kurdên ku di wê cîhilkirinê da li rîyan mirine, çu kesek nizane jimara wan çi qas bûye. Lê belê Kurdên cîhil ên ku ji mirinê filitîne û bi saxîtî gîhane bajarên cure cure yên dewleta Osmanî û li wan bajaran belav bûne, jimara wan bi temamî 418.504 bûye(binêrin: **"Jîn"**, cild III, r. 517).

(103) Ji ber ku ew jî peyrewên Kemal Paşa bûn, nedigotin "Kurdistan" û nedixwestin peyvika "Kurdistan" bînin ser zimanê xwe; wan jî wek pêşrewê xwe Kemal Paşa rastîya dîrokî û cografî diguhart û ji Kurdistanê ra digot "Rojhilat".

hevalbendên gelê Kurd ê azadîxwaz û rizgarîxwaz, bûn hevalbendên Kemal Paşayê cînayetkar û xwînrêj û nejadperest û milîtarîst. Û bi wî awayî di cînayet û gunehkarîyên Kemal Paşa da beşdar bûn, li gelê Kurd ê mezlûm jî bêbextî kirin.

*

Ev bêbextîya li gelê Kurd ê bindest û mezlûm, û beşdarîya di gunehkarîya rejimeka zalim û xwînxwar da, li Kurdistana Jêrîn jî hat dîtin. Li wir jî kes û vêkxistinên sosyalîst û "hevrê"yên wan ên li welatên dî, li dijê gelê Kurd ê azadîxwaz piştgirîya faşîstên Ereban kirin. Ew piştgirîya wan ne wek piştgirîya ji Kemal Paşa ra tenê sîyasî bû, lê piştgirîyeka hem sîyasî û hem jî eskerî bû. Top û tanq û firoke û roket û bombayên ku faşîstên Ereban di salên 1970'yan da û 1980'yan da li Kurdistana Jêrîn li dijê gelê Kurd ê bindest û belengaz bir kar danîyan û gundên Kurdistanê bi wan bombaran û wêran dikirin, jin û zarûkên Kurdan bi wan didan ber gule û bombayan û dikuştin, qetlîam dikirin, ew bombayên napalm ên ku li ser gundên Kurdistanê dibarandin, gişt ji Rûsyayê û ji welatên sosyalîst ên dî dikirîyan.

Petrola ku ji Kurdistana Jêrîn derdikeve faşîstên Ereban ew petrol difirotin welatên kapîtalîst, dolarên ku ji wê petrolê qazanc dikirin didan welatên sosyalîst û bi wan dolaran ji welatên sosyalîst top û tanq û firoke û roket û bomba dikirîyan û ew gişt li dijê gelê Kurd bi kar danîyan. Bi wî awayî petrola Kurdan di destên faşîstên Ereban û kapîtalîstên welatên Rojava û sosyalîstên welatên Rojhilat da digerîya û dizivirî, dibû gule û roket û bombayên napalm, li ser serê Kurdan dibarîya!

*

Ew qetlîamên faşîstên Ereban û piştgirîya welatên sosyalîst ji wan ra, ew jî gişt bi navê "têkoşîna li dijê emperyalîzmê" û bi navê "sosyalîzmê" dihatin kirin. Kemal Paşa di salên 1920'an û 1930'yan da çawa bi navê "medenîyetê û pêşverûtîyê" gundên Kurdistana Jorîn dişewitandin, jin û zarûkên Kurdan didan ber singûyan, godegên Kurdan bi singûyan ji zikên dayikan derdixistin; faşîstên Ereban jî di salên 1970'yan û 1980'yan da bi navê "têkoşîna li dijê emperyalîzmê" gundên Kurdistana Jêrîn bombaran dikirin, bombayên napalm li ser serê gelê Kurd ê mezlûm dibarandin; welatên sosyalîst jî bi navê "sosyalîzmê û têkoşîna li dijê emperyalîzmê" top û tanq û roket û firoke û bomba didan faşîstên Ereban!

Hal ew bû ku xort û keçên Kurd ên xebatkar û têkoşer û dilpaqij, hêvîya xwe bi sosyalîzmê ve girêdabûn. Evdirehman Bedirxan çawa di despêka vê sedsalê da hêvîya xwe bi Qanûna Esasî ve girêdaye û gotîye "çara van hemî belayan Qanûna Esasî"ye, xort û keçên Kurd jî di nîvê paşîn ê vê sedsalê da digotin "dermanê hemî derdan sosyalîzm e"; li gora wê bawerîya xwe hin stranên xwe yên klasîkî jî gurhartibûn û weha distirîyan:

"Dilo yeman yeman yeman
Çîyan girtî berf û dûman
Me ra bişîn sosyalîzmê
Ew dermanê hemî derdan".(104)

Ew sosyalîzma ku xort û keçên Kurdan ji dilên xwe yên paqij û bi nîyeta xwe ya baş weha pesnê wê didan û jibo wê digotin "dermanê hemî derdan", belkî jibo faşîstên Ereban bû "dermanê hemî derdan"; lewra hemî derdê wan ew bû ku tevgera azadîxwazîya gelê Kurd biperçiqînin, bi çekên welatên sosyalîst ew derdê xwe derman kirin. Lê belê ew sosyalîzm jibo gelê Kurd ê mezlûm û bindest û beşxwarî jî bû "jêdera hemî derdan", bû "kana hemî derdan", bû "hêlîna hemî derdan". Ew qas bû "jêdera hemî derdan" ku, dema faşîstên Ereban di Adara 1988'an da bobmayên kîmyayî avêtin bajarê Helebçeyê û di pênc deqîqan da pênc hezar jin û zarûk û extyar û nexweşên Kurdan qetlîam kirin û kuştin, li her derê dinyayê li dijê wê qetlîamê pêleka protestoyê rabû û her kesekî xwedîwijdan û xwedîonur lanet li faşîstên Ereban anî, rojnama **"Pravda"** bê ku piçek şerm û fedî bike, di tarîxa 11/09/1988'an da nivîsarek weşand û di wê da piştgirîya faşîstên Ereban kir, îddîa kir ku Emrîka dixwaze zor bide İraqê û bi wê amancê Emrîka îddîa dike ku İraqê li dijê "îsyankar"ên Kurd bombayên kîmyayî bi kar anîne, lê belê di heqê vê yekê da ji bil "peyvên hin Kurdên revok" çu delîlên berçav tunin, Wezîrê Karên Derîn ê İraqê xebera karanîna bombayên kîmyayî derew derxistîye, lê belê kargêrên Emrîkayê guh nedane payva wî, lewra amanca wan ew e ku ji alîyê sîyasî û abûrî ve zor bidin İraqê.(105)

Peyveka pêşîyan a Kurdî heye, dibêje "şahidê rovîyê dûvê rovîyê ye". Şahidî **"Pravda"**ya sosyalîst jî Wezîrê Karên Derîn ê İraqê ye. Ji bil rojname û televîzyonên welatên sosyalîst, hemî rojname û televîzyonên hemî welatên dinyayê bi hezaran cendekên jin û mêr û zarûkên Kurdan li kuçe û kolanên bajarê Helebçeyê raxistî nîşan dan, jibo **"Pravda"**ya sosyalîst ew hemî "peyvên hin Kurdên revok" in û ne "delîlên berçav" in; lê peyva Wezîrê Karên Derîn ê İraqê "delîleka berçav" e û "bê guman rast e", çi fêde ku kargêrên Emrîkayê guh nadin wê "peyva rast" û wê "delîla berçav", guh didin "peyvên Kurdên revok û îsyankar"!

---

(104) Awayê eslî yê vê stranê, parçeyek ji straneka Kurdî-Tirkî ye ku ji alîyê têkoşer û hozanê Kurd ê şehîd Elîşêr ve hatîye afirandin û li herêma Dêrsimê ji alîyê şerkarên Kurdan ve di şerê li dijê leşkerê Tirkan da hatîye gotin. Di vê stranê da îmdad ji Hezretê Elî hatîye xwestin, ku jê ra tê gotin "Şahê Merdan". Awayê eslî yê vê parçeyê weha ye:

"Dilo yeman yeman yeman
Çîyan girtî berf û dûman
Me ra bişîn Şahê Merdan
Ew dermanê hemî derdan".

(105) Em fotokopîya wê nivîsara **"Pravda"**yê di dûwayîya vê Pêşkêşîyê da wek belgeyeka îbretê çap dikin. Em hêvîdar in ku hemî Kurd ji wê nivîsara kirêt ders û îbret bigirin û bizanin ku welatên sosyalîst hevalbendên faşîstên Ereban bûne, ji çekên xwe heta qelemên xwe bi her tiştên xwe piştgirîya wan faşîstan kirine.

Piştgirîya dewletên sosyalîst ji faşîst û qolonyalîstên Ereban ra ne tenê bi dayina çek bû; bi hezaran pisporên wan jî li wir dixebitîn û ji wê rejima faşîst ra dibûn alîkar, jê ra pispor digîhandin. Peyveka pêşîyan a Kurdî heye, weha dibêje: "Dizên bostanan, derdikevin zivistanan". Heta ku rejima İraqê ya faşîst di 2'yê Tebaxa 1990'î da Kuweyt dagir nekir û Meclisa Ewletîyê ya Neteweyên Yekbûyî biryara boyqotê li dijê wê rejimê neda û taluka êrîşa Emrîkayê li ser wê rejimê di asû da kifş nebû, kesek nedizanî ku bi hezaran pisporên Rûs li wir hebûne. Dema wê rejima faşîst, jibo ku pêşî ji êrîşa Emrîkayê bistîne, bîyanîyên li İraqê û Kuweytê rehîne girtin, wê demê derket meydanê û eşkera bû ku heyloooo, bi hezaran ji wan rehîneyan jî pisporên Rûs in û ew pispor heta hingê di binê fermana wê rejima devbixwîn û desbixwîn da xebitîne! Ne bi dehan, ne bi sedan, lê bi hezaran pisporên Rûs! Gelo çi kirine li wir? Şêwirdarî kirine, hostatî kirine, hosta gîhandine! Ji kî ra? Ji wê rejima faşîst û qolonyalîst ra ku qatilê gelê Kurd ê belengaz û bindest û mezlûm û beşxwarî ye!

*

Dibe ku hin hevalbend û dilxwazên wan dewletên sosyalîst hêj jî di nava Kurdan da hebin û ji van rêzên me yên jorîn dilgiran bibin, tewr hêrs bibin. Eger kesên weha di nava Kurdan da hêj jî hebin û hêj jî şurkêşên wan dewletên sosyalîst bin, em dixwazin bala wan bikişînin ser du nuqteyên giring.

Yek ji wan nuqteyan ev e: Emrîka çek dide dewleta Tirkîyê ya faşîst û qolonyalîst û barbar, ew jî bi wan çekan gelê Kurd li Kurdistana Jorîn dikuje; ev jibo Emrîkayê dibe gunehkarî û sûc û xirabî û cînayet; em ji ber vê yekê jî li dijê Emrîkayê ne. Baş e, Rûsya jî çek dide rejima İraqê ya faşîst û qolonyalîst û barbar, ew jî bi wan çekan gelê Kurd li Kurdistana Jêrîn dikuje; gelo navê vê tevgera Rûsyayê çi ye, em'ê ji vîya ra bêjin çi û çi nav lê daynin? Ev çima nabe gunehkarî û sûc û xirabî û cînayet? Em'ê çima ji ber vê yekê ne li dijê Rûsyayê bin û rexne lê nexin, gunehkarîya wê neynin ber çavan? Divê em tim û tim bînin bîra xwe ku çawa ji firokeyên "Fantom" bomba tên avêtin, ji firokeyên "Mîg" jî bomba tên avêtin, ne ku gul û kulîlk tên reşandin!

Nuqteya diduyan jî ev e: Şexsekî şorişgêr yan demoqrat, eger parîyek nan jî bide vêkxistineka faşîst yan dewleteka faşîst yan jî milîtanekî faşîst, ew şexis gunehkar û sûcdar dibe. Baş e, eger dewleteka sosyalîst ne ku parîyek nan jî, lê bi hezaran top û tanq û roket û bi sedan firoke bide rejimeka faşîst û qolonyalîst, gelo ew dewleta sosyalîst gunehkar û sûcdar nabe? Ma ev nabe semedê ku mirov wê dewleta sosyalîst gunehkar û mehkûm bike, lanet lê bîne!

Divê em li bûyeran binêrin, ne ku li peyvên birqok û xapînok! Divê em vê

peyva pêşîyan a Kurdî tim bidin ber çavê xwe: "Ez dibêjim hirç va ye, tu dibêjî rêç va ye". Dema em hirç bibînin, divê em êdî li pey rêçê neçin!(106)

*

Tevgerên dewletên sosyalîst di heqê hin gelên bindest ên dî da jî wek tevgerên wan ên di heqê gelê Kurd da neyîn bûn. Em dikarin wek numûne, qala sê bûyeran bikin.

Yek ji wan bûyeran rewşa gelê Tîbetê ye. Tîbet, welatekî paşvemayî ye û cîranê Çînê ye. Piştê ku li Çînê sosyalîst hatin ser kar û cîyê lingên xwe kirin, yek ji karên wan ên pêşîn dagirkirina Tîbetê bû. Hukumeta Çînê ya sosyalîst di sala 1959'an da leşkerê xwe xist Tîbetê û Tîbet bi zora çek dagir kir û da ser axa xwe.

Tîbet hêj jî di binê dagirkirina Çînê da ye. Gelê Tîbetê carna xwe dilivîne û azadîya xwe dixwaze; lê belê her car jî Çînîyên sosyalîst bi tanqan wî gelî diperçiqînin û daxwaza wî ya azadîyê difetisînin.

Bûyera diduyan, piştgirîya Çîna sosyalîst a Pakistanê ye li dijê gelê Bangladeşê. Bangladeş berê di binê dagirkirina Pakistanê da bû. Wek ku dewleta Tirkîyê navê Kurdistanê rakirîye û ji Kurdistanê ra dibêje "Anadola Rojhilat" dewleta Pakistanê jî navê Bangladeşê rakiribû û ji Bangladeşê ra digot "Pakistana Rojhilat". Di sala 1971'ê da gelê Bangladeşê dest bi tevgera serxwebûnê kir. Hingê hukumeteka eskerî ya faşîst û milîtarîst di Pakistanê da li ser kar bû. Wê hukumetê leşker şand ser Bangladeşê. Leşkerê Pakistanê bi fermana wê hukumeta faşîst û milîtarîst li Bangladeşê qetlîamên nebûyî kirin û bi deh hezaran Bangladeşî kuştin. Deh milyon Bangladeşî jî ji ber qetlîamên wî leşkerê faşîst revîyan û xwe avêtin Hindistanê. Aha di wê rewşê da Çîna sosyalîst, piştgirîya hukumeta Pakistanê ya faşîst û milîtarîst kir.

Ew rûreşanî û sosreteka mezin bû ku dewleteka sosyalîst li dijê tevgera azadîxwazî û rizgarîxwazîyê ya gelekî bindest û mezlûm, piştgirîya rejimeka eskerî ya faşîst û milîtarîst kir.

---

(106) Jêdera vê peyva pêşîyan a Kurdî ev e: Du heval zivistanê çûne nêçîra hirçan û di berfê da rastê rêça hirçek hatine û rêç gerandine. Demek paşê hirç dîtine. Lê belê rêç ji cîyê ku hirç lê bûye derbas bûye û dom kirîye. Hingê yekê ji her du hevalan pêşnîyaz kirîye ku hirç nêçîr bikin. Lê belê hevalê dî, xwestîye ku meşa xwe ya li ser rêçê bidomînin. Hevalê wî daye zanîn ku ew li hirç digerin, eva rastê hirç jî hatin, êdî ne pêwîst e ku rêçê bigerînin û meşa xwe ya li ser rêçê bidomînin. Lê hevalê dî ew peyv qebûl nekirîye û gotîye "madem ku em li ser rêçê ne, divê em gerandina rêçê bidomînin". Hevalê wî ku dîtîye ew naxwaze rastîyê bibîne û li ser înata xwe dimîne, gotîye "ez dibêjim hirç va ye, tu dibêjî rêç va ye"; ev peyv bûye peyveka pêşîyan a Kurdî ya meşhûr.
Ev peyva pêşîyan, li ser dîtina rastîyê û mayina bi awayan ve, li ser dîtin û qebûlkirina rewşa rastîn û girtina tewrê li gora wê rastîyê û mayina di nava qalibê teorî û awayan ê teng da tê gotin; dema hin kes rewşeka rastîn yan jî bûyerek dibînin, lê bi çu awayek navên wê rewşê yan wê bûyerê qebûl bikin û bi çu awayek navên ku ji nava sînorên teorî û awa û zanînên xwe yên qalibkî derkevin, rastîyê û bûyeran ji awayan ra û teorîyan ra fîda dikin û li ser wî tewrê xwe înat dikin, hingê ev peyva pêşîyan tê karanîn.

Bûyera sisîyan jî rewşa Erîtrê ye. Erître welatekî Afrîqayê ye û di binê dagirkirina Etyopyayê da ye. Gelê Erîtrê jî wek gelê Kurd li Kurdistana Jêrîn, di sala 1961'ê da li dijê Etyopyayê dest bi tevgera xwe ya azadîxwazî û rizgarîxwazîyê kir. Hingê Etyopya di binê rejima împeratorîyê da bû û Împerator Haîle Selasîye li ser text bû. Ew împerator hevalbendê Emrîkayê bû û çek ji Emrîkayê dikirîn, bi wan çekan gelê Erîtrê dikuşt, bi firokeyên Emrîkayê gundên Erîtrê bombaran dikirin û bi ser jin û zarûkên wan da hildiweşandin. Di sala 1974'an da leşkerê Etyopyayê li împeratorê xwe derbe çêkir. Haîle Selasîye hat wergerandin û Haîle Marîam hat ser kar. Wî ragîhand ku Etyopya dê bibe dewleteka sosyalîst. Bi wî awayî, kirasê reş ji Etyopyayê derxist û kirasekî sor lê kir. Di şûna çekên Emrîkayê da dest pê kir çek ji Rûsyayê kirî. Ji sala 1974'an vir ve, gelê Erîtrê bi çekên Rûs dikuje, di şûna firokeyên "Fantom" da bi firokeyên "Mîg" gundên Erîtrê bombaran dike û bi ser jin û zarûkên wan da hildiweşîne.

Kesên ku hevalbendîya dewletên sosyalîst dikin yan jî dilxwazên wan in, divê ji gelê Erîtrê bipirsin ka mirina bi bombayên firokeyên "Fantom" xweş bû, yan mirina bi bombayên firokeyên "Mîg" xweş e!

*

Ev bûyerên ha û gelek bûyerên dî yên ku ji dewra Evdirehman Bedirxan heta nuha li Kurdistanê û li dinyayê qewimîne, bi awayekî zelal ê ku ji çu gumanan ra cî nahêle îspat dikin ku guhartina qanûnan û serqanûnan û rejiman li welatên serdest û di nava neteweyên serdest da, ji derdê neteweyên bindest ra nabe derman; her weha, guhartina sîstemên sîyasî di dinyayê da jî nabe reçeteyeka hazir jibo dermankirina derdê neteweyên bindest.

Neteweyekî bindest, heta ku nebe xwedîyê ax û ava xwe û nebe xwedîyê biryara xwe li ser awayê jîyana xwe û li ser pêşedema xwe, heta nebe malxoyê mala xwe û nebe xwedîyê hêza xwe û bi wê hêza xwe nebe parêzdarê mala xwe, nikare xwe û pêşedema xwe di ewletîyê da bibîne.

BANGA TÊKOŞÎN Û BERXWEDANÊ LI DIJÊ REJIMA EVDILHEMÎD

Beşekî naveroka rojnama **"Kurdistan"** jî ew bangên têkoşînê û berxwedanê ne ku li dijê rejima Sultan Evbdilhemîdê 2'yan tê da cî girtine. Hema hema di hemî jimareyên rojnamê da bang li Kurdan hatîye kirin û ji wan hatîye xwestin ku li dijê rejima Evdilhemîd rawestin û têkoşîn bikin, di ber xwe bidin, heqên xwe biparêzin û karbidestên zalim ji Kurdistanê bavêjin der.

Bi dîtina me, ev banga têkoşînê û berxwedanê li dijê rejima Evdilhemîd gelek balkêş û giring e. Lewra gelê Kurd di binê nîrê dewleta Osmanî da bû û adeta hatibû tevizandin. Wê dewletê ji alîyek ve bi zordestî û zulma xwe gelê Kurd diperçiqand; ji alîyek ve jî padîşahên Osmanîyan îddîa dikirin ku ew

xelîfe ne û bi navê dînê Îslamê hukmê xwe dimeşînîn, bi fermana Xwedê û Pêxmber tevdigerin. Bi wî awayî gelê Kurd bi zulma Osmanîyan dihat perçiqandin, ji ber wê zulmê çavtirsayî û diltirsayî bûbû, nediwêrî serê xwe bilind bike, tewr nediwêrî xwe bilivîne jî; bi propagandayên wan ên dînî jî hatibû tevizandin û gêj bûbû, serî lê gerîyabû û bêhiş mabû, mejîyê wî adeta zeng girtibû.

Neteweyek, gelek ku di rewşeka wisa da be, berî her tiştî jê ra lazim e ku xwe bilivîne, cesaret bîne dilê xwe û hişê xwe bîne serê xwe, bîr bi hebûna xwe û huwiyeta xwe ya neteweyî û heqên xwe bibe, jibo desxistin û parastina wan heqan biwêre xwe bavêje meydana têkoşînê, bawerîya xwe bi xwe bîne ku dikare jibo heqên xwe bikoşe.

*

Aha Evdirehman Bedirxan ew rewş dîtîye û zanîye, bi wê amancê bang kirîye gelê Kurd û deng lê kirîye, jê xwestîye ku xwe bilivîne û jibo desxistina heqên xwe têkeve têkoşînê û berxwedanê. Bi peyveka dî, wî hêz daye xwe ku gîyanê têkoşînê û berxwedanê bide gelê Kurd.

Mesela di jimareya 7'an da ji Kurdan xwestîye ku ji hukumetê avakirina dibistanan bixwazin, qala Arnawudan kirîye ku di welatê wan da jî berê dibistan tunebûne, lê belê wan bi têkoşîn û berxwedana xwe hukumet mecbûrê avakirina dibistanan kirine, paşê ji Kurdan ra weha gotîye:

"Lê wan heta ew dibistan dan avakirin qiyamet rakirin, çi qas zehmet kişandin! Divê hun ji zehmetê netirsin".

Paşê daye zanîn ku hukumetê demek meaş nedaye mamostayên Arnawudan, gelê Arnawud ji Padîşah ra nivîsîye û gef lê xwarîye ku eger meaşên mamostayên wan neyên dayin, dê hemî karbidestên dewletê ji welatê xwe biqewitînin, eger neçin jî dê wan bikujin, li ser wan gefên Arnawudan hukumetê meaşên mamostayên wan şandine. Evdirehman Bedirxan piştê ku ew bûyer nivîsîye, weha deng li Kurdan kirîye:

"Dê vêca Kurdno, divê hun jî weha bikin! Eger guh nedan xeberên we, şûrê xwe hilînin, dê guh bidin şûrê we".(107)

Di jimareya 8'an da jî qala zulm û zordestî û xirabîya karbidestên dewletê kirîye, ji Kurdan xwestîye ku wan karbidestan ji welatê xwe derxin, rexne li hin axa û mîrên Kurdan xistîye ku jibo rutbe û nîşanan hevkarîya wan karbidestan dikin, daye zanîn ku ew hevkarî malxirabûn û rûreşanî ye, ji melayên Kurdan xwestîye ku ji nezanan ra bêjin bila dev ji wê hevkarîyê berdin, gotîye "ew tiştê ku ew hêvî dikin dewlet e,(108) ji wan ra eynê bela ye, mezinatî ne bi rutbe û nîşanan e", paşê weha nivîsîye:

(107) **Kurdistan,** j. 7, r. 3—4.

(108) Peyvika "dewlet" li vir bi mana "dewlemendî, serbilindî, yeqbal, pêşketin" e.

"Şivanekî qenc ji mîrekî xirab gelek bilintir e. Şivanê ku qenc li pezê xwe dinêre, gelek qenctir e ji mîr û axayê ku li mirovên binê destê xwe nanêre. Dê vêca kesê ku avarê bibe û li dijê hevalên xwe bipeyive, ji kûçik jî xirabtir e".(109)

Di jimareya 9'an da nivîsarek di binê sernivîsara Erebî ya "Sebat'ulMulkî bî'l-Edl" da(110) hatîye nivîsîn û tê da weha hatîye gotin:

"Gelî Kurdan, hun qenc bizanin ku eger di welatê we da karbidestên li serê we ji edaletê dûr ketin, welatê we di destê xwedî da namîne! Nuha Kurdistan jî wek welatên di binê Tirkan da, di binê destê Evdilhemîd da ye; karbidestên li serê we, Evdilhemîd wan rêdike. Lê belê xwedîyê Kurdistanê Kurd in! Eger neyarek hat ser Kurdistanê, Kurd dê xwe li ser bidin kuştin! Erdê wê derê Kurd dikolin, darên wê derê Kurd diçînin; karbidestên ku Padîşah rêdike serê we, diravên wan Kurd didin! Loma Kurdistan a we ye! Dê vêca ji we ra malûm be ku, eger karbidestên welatê we zulm bikin, welatê we dê ji destê we derkeve".

Paşê hatîye gotin ku Evdilhemîd guh nade Kurdistanê, rexne li sîyaseta wî hatîye xistin û ji Kurdan ra weha hatîye nivîsîn:

"Eger we divê Kurdistan tim di destê we da bimîne, eger we divê jin û zarûkên we reben û xizan nebin, divê hun karbidestên zalim ji wilatê xwe derxin".(111)

*

Wek ku dixuye, Evdirehman Bedirxan di despêkê da berê rexneyên xwe daye karbidestên Evdilhemîd ên di Kurdistanê da, ku wî ji wan ra gotîye "me'mûrên Evdilhemîd". Paşê dijwarîya rexneyên xwe hin bi hin zêde û bilind kirîye, hêdî hêdî berê rexneyên xwe yên dijwar daye şexsê Evdilhemîd bi xwe jî. Tewr carna padîşahên Tirkan bi giştî ji wan rexneyên xwe yên dijwar û giran ra kirine hedef.

Di jimareya 11'an da li ser rejima Evdilhemîd nivîsareka dirêj nivîsîye û tê da gotîye ku Evdilhemîd jî bertîlxur e, karbidestên rejima wî jî ji yên jortirîn heta yên jêrtirîn hemî bertîlxur in, çerxa dewleta Osmanî di Kurdistanê da bi bertîlan tê gerandin û gundîyên Kurd di binê wê çerxê da tên perçiqandin, hinek mîr û axayên Kurdistanê jî dikevin ber bayê nêzîkayî û dostanîya ku kesên li dora Evdilhemîd ji wan ra nîşan didin, ji ber wê yekê jî exlaqê wan xira dibe, Evdilhemîd hinek ji wan bi diravan kirîne û kirine ajan, bi wî awayî jî ew ji hev ra kirine dijmin.(112)

Di jimareya 24'an da bi munasebeta salvegera çûyina Evdilhemîd a ser textê

---

(109) **Kurdistan,** j. 8, r. 2.

(110) Yanî "sebata milk bi edaletê ye, hebûn û mayina welatek bi edaletê ye, welatek ancax bi edaletê dikare hebûna xwe bidomîne".

(111) **Kurdistan,** j. 9, r. 2—3.

(112) **Kurdistan,** j. 11, r. 1—2.

dewleta Osmanî nivîsareka Tirkî di binê sernivîsara "Daniştina Bêyom"(Cülûs-ı Şeametme'nûs) da nivîsîye û tê da Evdilhemîd bi xwînxwarîyê gunehkar kirîye, jê ra gotîye "mel'ûn" û "Yezîd", ji Xwedê hêvî kirîye da ku ji heqê wî derkeve û gîyanê wî bistîne.(113)

Di jimareya 25'an da dîsa nivîsareka Tirkî bi sernivîsara "Ji Kurdan ra"(Kürdlere) nivîsîye, di wê da qala lêkdana(114) Kurdan û Ermenîyan kirîye, ji Kurdan xwestîye ku êrîşê Ermenîyan nekin, daye zanîn ku Evdilhemîd û hukumeta wî zulm û zordestî li Kurdan û Ermenîyan pêkve dikin, pirsîye ku di şûna êrîşa li ser Ermenîyên bêçare da ma ne çêtir û heqtir e ku Kurd xîret bikin da ku zulma hukumetê bişikînin, paşê ji Kurdan ra weha gotîye:

"Hukumeta we bi xwe ye ku ji 25 sal berê ve bi topên xwe, bi tifingên xwe, bi diravên xwe, bi ajanên xwe, bi celladên xwe li we û li hemî ehlê Îslamê misalet(115) bûye".(116)

Di despêka jimareya 27'an da deng li Kurdan kirîye û rexneyên dijwar li hemî padîşahên Osmanîyan xistine, gotîye ku ew ne xelîfe ne û weha nivîsîye:

"Berî 500 salan çu Tirkek li welatê me tunebû. Ev Tirk hemî ji Tûran hatin welatê me û di welatê me da hakimî li me dikin. Padîşahên wan, ku hemî xwînrêj û dîktator in, unwana 'Xelîfe' li xwe datînin û bi vî halî çi qas tewirên zulmê hene dikin. Lê belê bi rastî ew ne xelîfe ne, padîşahên zalim in ku daxistina wan ji text pêwîst e. Hun vê rewşê nizanin. Lewra hun nezan in; hukumetê hun nezan hîştine, da ku hun ji rewşê haydar nebin".

Wek ku dîyar e, Evdirehman Bedirxan dijwarîya rexneyên xwe bere bere bilind kirîyê û di vê nivîsarê da berê rexneyên xwe bi gştî daye hemî padîşahên Tirkan. Paşê peyv anîye ser sîyaseta Evdilhemîd û îddîa kirîye ku Evdilhemîd Kurdistan ji Rûsyayê ra soz daye.(117)

Dîsa di jimareya 27'an da nivîsareka Tirkî di binê sernivîsara "Ji Kurdan ra"(Kürdlere) nivîsîye. Di wê nivîsarê da qala zulma Evdilhemîd û karbidestên rejima wî kirîye, ji Kurdan xwestîye ku li Ermenîyan nexin, daye zanîn ku Evdilhemîd dixwaze ji nezanîya Kurdan mefadar bibe(118) û hemî xirabîyên xwe bi wan tevgerên Kurdan bipoşe(119) û çend Kurdên kêmrûmet bi du rutbe û çend nîşanan tesellî bike û bi wî awayî çavê hemî Kurdan girêde. Jibo wan rutbe û nîşanên Evdilhemîd jî weha gotîye:

"Tewr kûçik jî êdî tenezzul nakin ku wan rutbe û nîşanan qebûl bikin".

Piştê wê heqareta ku berê wê daye rutbe û nîşanên Evdilhemîd, weha deng li Kurdan kirîye:

---

(113) **Kurdistan,** j. 24, r. 2—3.

(114) Lêkdan: Şerê hin kesan li dijê hev, ku hin kes li hev xin, li dijê hev şer bikin. Bi Erebî "qîtal", bi Tirkî "vuruşma", bi Înglîzî jî "to fight with one another".

(115) Misalet: Kes yan tiştê ku bela xwe di mirov bide û bi pêsîra mirov bigire û bernede, li serê mirov bibe bela. Ev peyvik Erebî ye û di Erebî da "musellet" e, ketîye Kurdî û di Kurdî da guherîye, bûye "misalet".

(116) **Kurdistan,** j. 25, r. 2—3.

(117) **Kurdistan,** j. 27, r. 1.

(118) Mefadar bibe: Îstîfade bike, fêde jê bibîne.

(119) Bipoşe: Binuxêfe, perde bike, veşêre.

"Kurdno, bawer bikin ku ew perda timakarîyê û çavbirçîtîyê ku bi te'sîra nezanîyê çavên we ji dîtina rastîyê digire, ew tiştên ku ji wan ra tê gotin rutbe û nîşan wek semedê şeref û serbilindîyê nîşanê we dide; lê belê ew rutbe û nîşan, ji bil vemirandina çiraya namûsa we ya neteweyî û ji bil wêrankirina bextê we û pêşedema we bi kêrê tiştek nayên! Hun nizanin ku hun bi wan parçeyên madenan, şeref û heysîyeta xwe ya xweyî(120) difiroşin; hal ew hal e ku bav û bapîrên we jîyana xwe, aram û hêsayîya xwe fîda kiribûn û ew şeref û heysîyet ji we ra peyda kiribûn û pêkanîbûn".

Paşê qala zulma Evdilhemîd kirîye, rexne li Kurdan xistîye ku çima hêj jî stûyê xwe li ber fermanên Evdilhemîd ditewînin û çima hêj jî tênegîhîştine ku ew padîşahekî zalim e, daye zanîn ku Evdilhemîd navê xelîfetîyê bi zulmên xwe dilewitîne; vêca ji Kurdan ra weha gotîye:

"Ew qas neteweyên biçûk hene ku di dûwayîka xebat û xîreteka timî da xwe ji zordestî û zulma hukumetên serdest rizgar kirine, gîhane rewşeka bextyarîyê. Lê belê hun, di şûna ku hun wan neteweyan ji xwe ra bikin numûne û di rîya wan da bimeşin û bextyarîya xwe, hêsayîya xwe, namûsa xwe, heysîyeta xwe biparêzin û têxin ewletîyê, hun hev dikujin û bi wî awayî hêza xwe dişikînin, bi wê yekê jî hun zêdetir meydan didin zulmên Padîşah ku dijminê we yê rastîn ew e; bi tevgereka koranî ya wehakî jî hun cînayeteka wisa dikin ku, wek ku hun xincera di destê xwe da bi destê xwe di dilê xwe da biçikînin".(121)

Lİ KURDİSTANÊ SAZKİRİNA SİWARÊN HEMÎDÎ

Di dewra Sultan Evdilhemîdê 2'yan da li Kurdistanê di binê serekîya hin serek'eşîrên Kurdan da hin birrên(122) nîv'eskerî hatine sazkirin, navê wan jî "Siwarên Hemîdî" yan jî "Alayîyên Hemîdî" hatîye danîn. Ji serekên wan birran ra jî ji alîyê Evdilhemîd ve rutbeyên paşatîyê hatine dayin, meaş hatîye girêdan û ji wan ra hatîye gotin "paşayên Hemîdî". Evdilhemîd, ew birrên nîv'eskerî ji alîyek ve wek hêzên milîs jibo parastina rejima xwe û jibo parastina Kurdistanê di destê xwe da bi kar anîne, ji alîyek ve jî xwestîye ku di şerekî hatî da wan li dijê Rûsyayê bi kar bîne.

Evdirehman Bedirxan li ser wan siwaran jî di rojnama **"Kurdistan"** da çend nivîsarên Kurdî û Tirkî nivîsîne. Yek ji wan nivîsaran di jimareya 26'an da bi zimanê Tirkî û bi sernivîsara "Kurd û Ermenî"(Kürdler ve Ermeniler) derketîye. Nivîskar di wê nivîsarê da daye zanîn ku ew Siwarên Hemîdî di destê rejima Evdilhemîd da bûne aletê zulmê, zulma ku di Kurdistanê da tê kirin gişt bi destê wan siwaran tê pêkanîn, ew jî ji alîyê Padîşah ve çekdar hatine kirin û bi navê Padîşah tên salixdan û bi wê yekê jî dipesinin.

---

(120) Xweyî: Xwî û xusûsîyet û xesletên ku bi awayekî tebîî di hin kesan da yan di hin tiştan da hene, aidê wan in, ji wan ra hatine veqetandin, xasê bi wan in. Ji peyvika "xweyî" ra bi Erebî tê gotin "xass", bi Tirkî tê gotin "özgü", bi Înglîzî jî tê gotin "special to".

(121) **Kurdistan,** j. 27, r. 2—3.

(122) Birr: Kom. Peyvika "birr" di beraberê "qit'e"ya Erebî, "birlik"a Tirkî û "unit"a Înglîzî da hatîye karanîn.

Nivîskar di wê nivîsarê da jibo numûne qala Serekê Eşîra Mîran kirîye, ku jê ra hatîye gotin "Mistefa Paşayê Dîyarbekrî", daye zanîn ku ew berê şivanek bûye, bi xirabîyên xwe ketîye çavê Evdilhemîd û ji alîyê wî ve hatîye ecibandin û rutba paşatîyê jê ra hatîye dayin, wî jî dest bi zulmê kirîye û gelek zordestî li gel dike. Paşê nivîsîye ku gel ji ber zulma wî û yên wek wî bêzar bûye û muraceetê Koşka Evdilhemîd kirîye, zordestîya wan zordestan daye zanîn, yanî gilîya wan kirîye; lê belê karbidestên Koşkê ji gilîkaran ra gotine "kesên ku navê Xelîfe yê meşhûr li wan hatîye danîn, ew jî wek xwedîyê wî navî ji cinsê milyaketan in, gilîya ku hun dikin dibe semedê dilgiranîya Padîşah".(123)

Di jimareya 28'an da nivîsareka Kurdî bi sernivîsara "Alayên Siwarên Hemîdî" nivîsîye û weha dest bi nivîsara xwe kirîye:

"Ev Alayên Siwarên Hemîdî, wek hemî îcraatên Padîşah, bi nîyeteka xirab hatine sazkirin. Ez'ê di vê rojnama xwe da vê meselê vekim û eşkera bikim. Li ser vê yekê, ez'ê berê qala giringîya cîyê Kurdistanê bikim".

Nivîskar daye zanîn ku cîyê Kurdistanê ji alîyê stratejîya eskerî ve gelek giring e, ji ber ku Kurdistan bi Rûsyayê ra hevsînor e, dema şerek di navbera dewleta Osmanî û Rûsyayê da derkeve Kurdistan dê bibe meydana şerekî gelek giran û dijwar, ji ber ku her derê Kurdistanê ji rûyê zulma Evdilhemîd wêran bûye û leşkerê Osmanî jî ne têrçek e, Kurdistan nikare di şerekî wisa da li dijê Rûsyayê xwe biparêze, siwarên Hemîdî jî ji mudafeeya welêt ra bi kêr nayên; paşê semedê eslî yê sazkirina wan siwaran weha daye zanîn:

"Amanca eslî ji sazkirina van siwaran ev e ku, dema Ermenî ji zulma hukumetê gelek bêzar bûn û edalet xwestin, Zekî Paşa tirsa ku Kurd jî ji zulma hukumetê xwe bidin milê Ermenîyan û her du netewe bi hevalbendî dest hilînin; loma muraceetê Padîşah kir û jibo sazkirina van alayan îzin xwest. Padîşah jî tim divê pevçûn têxe navbera netewe û ferdên binê destê xwe; loma fikra Zekî Paşa gelek munasib dît û jibo ku Kurdan ber bi xwe bikişîne û ji Ermenîyan dûr bixe, zû sazkirina van siwaran ferman kir".(124)

Dîsa di jimareya 28'an da li ser wê şolê nivîsareka Tirkî jî bi sernivîsara "Alayên Siwarên Hemîdî"(Hamidiye Süvari Alayları) derketîye. Nivîskar di wê nivîsarê da daye zanîn ku Ermenî li dijê zordestî û zulma rejima Evdilhemîd rabûne, Qumandarê Leşkerê Çaran Zekî Paşa tirsaye ku Kurd jî di pêşedemê da di tevgera Ermenîyan da beşdar bibin û jibo ku pêşî ji hevkarîya Kurdan û Ermenîyan bistîne, fikra sazkirina Siwarên Hemîdî li Koşka Evdilhemîd pêşnîyaz kirîye, Evdilhemîd jî bala xwe daye wê pêşnîyazê û dîtîye ku ew pêşnîyaz jibo peydakirina pevçûneka ebedî di navbera gelên cure cure da kêrhatî ye, ji ber wî semedî hema tavil ew pêşnîyaz qebûl kirîye û jibo rewandina(125) wê ferman daye.(126)

---

(123) **Kurdistan,** j. 26, r. 4.
(124) **Kurdistan,** j. 28, r. 1.
(125) Rewandin: Meşandin, xistina rewşa karanînê, pêkanîn.
(126) **Kurdistan,** j. 28, r. 3.

ÇAWA KURD Û ERMENÎ Lİ DİJÊ HEV RAKİRİNE?

Yek ji babetên ku di rojnama **"Kurdistan"** da cî girtine, mesela Ermenîyan û pevçûna wan û Kurdan e, ku di dewra Sultan Evdilhemîdê 2'yan da qewimîye. Nivîsarên ku li ser wî babetî hatine nivîsîn, di wan hemîyan da hatîye dîyarkirin ku ew mesele bi dek û dolabên rejima Evdilhemîd hatîye amadekirin; Evdilhemîd xwestîye Kurdan û Ermenîyan ji hev ra bike dijmin, karbidestên rejima wî yên li Kurdistanê jibo pêkanîna wê amancê xebitîne, tilîya dewletên mezin û xasma Rûsyayê jî di wê meselê da hebûye. Di wan nivîsaran da ji Kurdan hatîye xwestin ku Ermenîyan nekujin, li dijê rejima Evdilhemîd digel wan hevalbendî bikin; rexne li Ermenîyan jî hatîye xistin ku xwestine di Kurdistanê da dewleteka Ermenîyan saz bikin û hatîye dîyarkirin ku ew tevgera wan ji rejima Evdilhemîd ra û ji hesabên Rûsyayê ra xizmet dike. Tebîî ev nivîsar jî hemî ji qelema Evdirehman Bedirxan derketine.

Di jimareya 7'an da di binê sernivîsara "Leyse lîl-Însanî Îlla ma Sea" da(127) nivîsareka Kurdî nivîsîye. Di wê nivîsarê da li Kurdan şîret kirîye ku bixwînin, li ser rewşa xwe bifikirin, bibin xwedîpîşe û xwe ji nezanîyê derxin, bala wan kişandîye ser vê yekê ku eger wisa nezan bimînin dewletên mezin dê welatê wan ji wan bistînin û bidin Ermenîyan; paşê li ser pevçûna Kurdan û Ermenîyan weha nivîsîye:

"Ev çend sal e ji ber ku Ermenî gelek zulm ji destê karbidestên dewletê dibînin, dixebitin û hemî tiştan dikin, da ku xwe ji zulma karbidestên dewletê derxin. Heqê wan jî heyê. Karbidestên dewletê yên ku ji Stanbolê tên wan deveran, gelek xirabî bi Ermenîyan dikin. Divê Kurd jî Ermenîyan nekujin. Xwedê ji vî halî ne razî ye. Ermenî mezlûm e. Vêca divê mirov bi şûr neçe ser mezlûman. Hun jî wek wan mezlûm in".(128)

Di jimareya 9'an da jî li ser wê şolê weha gotîye:

"Ermenî ji zulma dewletê bêzar bûn; dengê xwe bilind kirin, destê xwe bilind kirin, heqê xwe dixwazin. Lê ji ber ku Kurd nezan in, dest bi kuştina Ermenîyan kirn. Kuştina wan li ser Kurdan guneh e. Hun ji wan mezlûmtir in; lê ji ber ku hun nezan in û haya we ji we tune, hun dengê xwe dernaxin. Nexu xirabîya ku li we dibe, li Ermenîyan nabe".(129)

Di jimareya 11'an da rexne li Kurdan xistîye ku çima jibo pêşxistina welatê xwe naxebitin, xwe ji nezanîyê û zulmê xilas nakin, paşê li ser pevçûna Kurdan û Ermenîyan weha nivîsîye:

"Binêrin, Ermenî çi qas xwedîhîmmet û xîretkar in! Ew jî wek Kurdan mezlûm in! Lê belê jibo azadîya xwe xwe fîda dikin! Cahilên Kurdan nezan in, Ermenîyan dikujin! Ev hal ji Kurdan ra gelek xirab e! Divê mela ji Kurdan ra bêjin ku ev hal qatilî ye! Divê Kurd xwe ji wî gunehî biparêzin! Divê Kurd

---

(127) Ev parçeyek ji ayeteka **Qur'anê** ye, mana wê weha ye: "Ji bil xebata mirov, ji mirov ra tiştek tune".

(128) **Kurdistan,** j. 7, r. 2—3.

(129) **Kurdistan,** j. 9, r. 2.

jî bibin hevalbendên Ermenîyan û wan karbidestên zalim ên ku Padîşah rêdike serê we, bavêjin! Di şûna ku hun biçin alîkarîya Ermenîyên mezlûm, hun diçin wan dikujin! Ev hal gelek guneh e û gelek fedî ye! Xwedê û Pêxember ji vî halî ne razî ne".(130)

Di jimareya 25'an da nivîsareka Tirkî bi sernivîsara "Ji Kurdan ra"(Kürdlere) nivîsîye. Di wê nivîsarê da vêca rexne li Ermenîyan xistîye ku çima dixwazin Kurdistanê ji dewleta Osmanî biqetînin û têxin binê destê xwe û jibo gîhana wê amancê jî çeteyên keleşan saz kirine; lê daye zanîn ku digel wê yekê jî heqê Kurdan tune ku teşebbusa lêkdanê bikin, di wî babetî da weha gotîye:

"Ermenî dixwazin ji koma gîştî ya Osmanîyan veqetin û bi çi dibe mal bila bibe welatê paqij Kurditanê ji xwe ra bikin seyrangeh. Di vê rê da çawa dixebitin, li Ewrupayê çi dikin, li Kurdistanê çawa çeteyên keleşan digerînin, di kîjan rê da fikrên xirabîyê dixin serê gundîyên dilsaf; ez van tiştan yeka-yek dizanim. Lê belê temamê van bûyeran, di heqê teşebbusa lêkdanê da heqekî eşkera nade we. Ne karekî rast e ku mirov bi îcraatên hukumetê ewle bibe. Eger li Tirkîyê her ferdek heqê xwe bi xwe bîne cî, dê tiştek bi destê xwe bixe. Lê belê di vî babetî da divê ku mirov xwe bispêre bingehek; yanî divê mirov qet bawer neke ku dê hukumetek bi navê Ermenistanê bê sazkirin".

Paşê daye zanîn ku, ji rûyê çend keleşên ku li Kurdistanê derketine, eger digel tedbîrên hukumetê Kurd jî dest bi tevgereka paqijkirinê bikin, hingê dê Rûsya têkilî bike û di Ewrupayê da jî di heqê Kurdan da dê nefreteka mezin peyda bibe.(131)

Di jimareya 26'an da nivîsarek bi sernivîsara "Kurda re" derketîye. Di serê nivîsarê da ragîhandîye ku bavê wî bi şûrê xwe jibo bextyarîya Kurdan xîret kirîye, ew jî bi qelema xwe wê xizmetê tîne cî, daye zanîn ku ji rûyê şola Ermenîyan ew tim bergazin dibe, û weha nivîsîye:

"Bi rastî ez dizanim ku hinek Ermenî divên Kurdistanê ji xwe ra bikin wîlayetek û ji milk(132) cuda bikin. Ji vî semedî, ez dizanim ku gelek ji wan di van welatên bîyanî da li dijê me dixebitin, gelek jî li Kurdistanê xirabî û cînayet dikin. Lê bêle hun qenc bizanin ku ev halên ha çu caran, çu zemanan heqê lêkdaneka gîştî nade we".

Paşê daye zanîn ku ew kesên ku şerê Ermenîyan kirine, ew Kurd bûne ku ketine ber bayê qencî û ciwamêrîya Evdilhemîd, weha deng li Kurdan kirîye:

"Lê belê hun qenc bizanin ku, çend mirovek di nava we da cînayet dikin, hun hemî ji rexne û gazinên neyaran ra dibin hedef! Erê, divê hun çu wextek razî nebin ku ji welatê we Ermenistanek peyda bibe! Lê belê divê hun cîranên xwe yên masûm jî biparêzin".

Paşê ragîhandîye ku Evdilhemîd e yê ku di navbera Kurdan û Ermenîyan da şer daye derxistin, daxwaza Evdilhemîd ew e ku Kurdan di çavê dewletên bîyanî da hov û yabanî nîşan bide, bi wî awayî jî xişm û nefreta wan dewletan

---

(130) **Kurdistan,** j. 11, r. 3.

(131) **Kurdistan,** j. 25, r. 2—3.

(132) Mexsed ji "milk", axa binê destê dewleta Osmanî ye.

bikişîne ser Kurdan; nivîsîye ku Ermenî jî wek Kurdan mezlûmên Evdilhemîd in, ji Kurdan xwestîye ku digel Ermenîyan hevalbendî bikin û pêkve bixebitin xwe ji destê wê hukumeta zalim rizgar bikin. Paşê ji Kurdan ra weha gotîye:

"Belê, di nava Ermenîyan da hinek hene ku neyarên we ne. Lê belê ew gelek hindik in, Ermenî jî ji wan ne razî ne. Lê qenc bizanin ku esil neyarê we Padîşah e; ew Padîşah e ku ev bû 25 sal ku bi diravên xwe û bi ajanên xwe ji xirabîya we ra dixebite".(133)

Dîsa di jimareya 26'an da nivîsareka Tirkî jî bi sernivîsara "Kurd û Ermenî"(Kürdler ve Ermeniler) nivîsîye. Di wê nivîsarê da jî daye zanîn ku Evdilhemîd jibo lişta(134) xwe gelek zulm dike, li gora bingehoka "parçe bike, bibe fermanrewa"(135) tim navbera dostan û birayan xira dike, kesê ku tovê fesadîyê avêtîye navbera gelên Kurd û Ermenî yên ku berê dost bûne, ew jî Evdilhemîd e, ji rûyê wî tovê fesadîyê Kurd û Ermenî li dijê hev rabûne. Paşê ev rewşa ha anîye ber çavan:

"Em bifikirin ku ji çend sal berê ve di rîya daxwazên cînayetkarkî û xwînrêjkî yên Padîşahê me da, bi te'sîra nezanîyê û bêhişîyê çi qas can hatin fîdakirin, çi qas mal hatin wêrankirin û çi qas xwîn hat rêtin! Gelo Ermenîyan xirabîyek ji Kurdan dîtibû? Na! Lê Kurdan ji Ermenîyan çi dîtibû? Qet!"

Nivîskar, piştê van pirs û bersîvan daye zanîn ku her du alî jî ji alîyê Evdilhemîd ve hatine xapandin û li pey dek û dolabên wî yên şeytankî çûne, ketine tarîtîyeka gurr, bê ku bifikirin li pêşîya wan nişîvên bitirs û gerînekên(136) mirinê hene, di wê tarîtîyê da bi lez û bez pêş ve diçin.(137)

Di jimareya 27'an da dîsa li ser wî babetî nivîsîye û weha deng li Kurdan kirîye:

"Evdilhemîd dibêje Ermenî neyarên we ne û bi vê peyvê we dixapîne. Ma hun nizanin ku Ermenî nikarin neyarîya we bikin! Neyarê we ew Padîşah e ku we hemîyan digel welatê we ji Mosqof ra wa'd dike".

Paşê qal kirîye ku berî çend salan jibo ku Ermenîyan bi Kurdan bidin kuştin li bajarê Wanê civînek hatîye çêkirin, Şêx Ubeydullah jî di wê civînê da hazir bûye. Şêx Ubeydullah li dijê wî emrê Padîşah derketîye û gotîye "eger îro em Ermenîyan bê sebeb bikujin, rojek neteweyekî dî jî dê bê û me bikuje".

---

(133) **Kurdistan,** j. 26, r. 2.

(134) Lişt: Menfeet, fêdeya ku mirov dixwaze ji hin kesan yan ji hin tiştan yan jî ji hin bûyeran bi destê xwe xe. Bi Erebî "meslehet", bi Tirkî "çıkar", bi Înglîzî jî "profit, interest".

(135) Fermanrewa: Kesê ku fermana wî direwe, dimeşe, kesê hakim. Bi Erebî "hakim, museytir", bi Tikî "egemen", bi Înglîzî jî "ruler, dominant". Ev peyveka meşhûr e di dinyayê da, awayê kargêrîya serdestan û zordestan nîşan dide, bingehoka kargêrîya wan tîne ber çavan. Ev peyv bi Erebî "ferrîq, tesud", bi Tirkî "böl, yönet", bi Înglîzî jî "divide and rule" tê gotin.

(136) Gerînek: Cîyê ku ava çemek tê da berê dicive, paşê çewt vedigere û paşê jî rast vedigere û rast diherike. Kesê ku têkeve gerînekek û li wir bikeve ber pêlên avê, taluka fetisandina wî heye.

(137) **Kurdistan,** j. 26, r. 3—4.

Piştê guhastina vê bûyera tarîxî, nivîskar dîsa deng li Kurdan kirîye û daye zanîn ku divê Kurd êdî jibo silametîya xwe û zarûkên xwe bixebitin, ew Kurdên ku ew qas bi mêranî û ciwamêrîya xwe navdar in ji wan ra şerm e ku xulamîya hukumeteka zalim bikin; nivîsara xwe weha domandîye:

"Berî çend zemanek em jî xwedîhukumet bûn, xwedîdîtin bûn. Lê belê xebînet e ku me ew bextyarî ji destê xwe berda, nuha em ketine destê sûtaran".(138)

Dîsa di jimareya 27'an da nivîsareka Tirkî jî bi sernivîsara "Ji Kurdan ra"(Kürdlere) derketîye. Nivîskar di wê nivîsarê da jî qala wê civîna Wanê kirîye, daye zanîn ku ew civîn bi emrê Evdilhemîd hatîye çêkirin û di wê civînê da ji Kurdan hatîye xwestin ku Ermenîyan bikujin, Şêx Ubeydullah jî li dijê wê daxwazê derketîye û ragîhandîye ku ew daxwaz ji emrê Xwedê ra çewt e, padîşahekî ku emrekî wisa bide zalim e û gunehkar dibe û daxistina wî ji text pêwîst e; Şêx wisa gotîye û ji civînê derketîye çûye.(139)

Di jimareya 29'an da nivîsarek bi sernivîsara "Wezîyeta Hazir û Musteqbel a Kurdistanê"(140) nivîsîye. Di wê nivîsarê da pevçûna Kurdan û Ermenîyan sipartîye çar nuqteyan: Nezanîya Kurdan, tevgerên Ermenîyan ên dijwar, hesabên Evdilhemîd, hesabên Rûsyayê. Rexne li Ermenîyan xistîye ku zulma ku li wan hatîye kirin, dînê Îslamê wek semedê wê zulmê nîşan dane û bi wî awayî gelên Musulman ji xwe ra kirine dijmin; dîsa rexne li Ermenîyan xistîye ku li çu derek ji Kurdan yan Tirkan ne zêdetir in û digel wê yekê jî doza serxwebûnê dikin, ew daxwaza wan wek xiyaleka bêmikûn nîşan daye û gotîye "li ser desxistina sewdayeka weha îftîrayên wan li ser Musulmanîyê û netewe, tiştekî gelek fedî ye"; eşkera kirîye ku Înglistanê bi hêvîya ku Ermenî jibo heq û edaletê rabûne, berê alîkarîya wan kirîye, lê dema dîtîye ku Ermenî li dijê gel in, dev ji wan berdaye.

Nivîskar di wê nivîsara xwe da qala hesabên Rûsyayê jî kirîye û ragîhandîye ku Rûsya ji alîyek ve dest li pişta Ermenîyan dixe, ji alîyek ve jî qonsolosên wê yên li Kurdistanê Kurdan li dijê Ermenîyan fît dikin û jibo ku welatê xwe ji wan ra dost nîşan bidin jî gelek qencî li Kurdan dikin û dîyarîyan didin wan; bala Ermenîyan kişandîye ser sîyaseta Rûsyayê û daye zanîn ku Rûsya tim bi qencî xwe nêzê neteweyan û welatan dide, da ku wan têxe binê destê xwe, dema ku neteweyek ket binê lepê wê jî êdî nejad û netewetîya wî neteweyî tune dike û çu azadî jê ra nahêle, gotîye "ev rastîyeka eşkera ye ku çu caran Rûsya naxwaze hukumeteka Ermenî ya serbixwe di ber milê wê da bê damezirandin".(141)

Ev nivîsara Kurdî, dîsa di jimareya 29'an da bi Tirkî jî hatîye weşandin. Tirkîya wê ji Kurdîya wê gelek dirêjtir e.(142)

---

(138) **Kurdistan,** j. 27, r. 1.
(139) **Kurdistan,** j. 27, r. 3.
(140) Yanî "Rewşa Nuha û Pêşedemê ya Kurdistanê".
(141) **Kurdistan,** j. 29, r. 1—2.
(142) **Kurdistan,** j. 29, r. 2—4.

Di jimareya 30'yî da jî nivîsarek bi sernivîsara "Kurdistanê de Esasa Nîfaqê" nivîsîye û tê da qala papasên Cîzwîtan kirîye, daye zanîn ku di pevçûna Kurdan û Ermenîyan da mîsyonerên wan papasan ên li Kurdistanê jî rol dileyzin, her weha tilîya hin dewletên Ewrupayê yên ku piştgirîya wan mîsyoneran dikin, xasma tilîya Fransayê jî di wê pevçûnê da heye.(143) Di wê jimareyê da nivîsareka Tirkî ya dirêj jî li ser wî babetî nivîsîye.(144)

TALUKA RÛSYAYÊ JÎ KURDİSTANÊ RA

Tiştekî balkêş jî ev e ku di rojnama **"Kurdistan"** da gelek caran îşaret bi alîyê taluka Rûsyayê ve û bi alîyê hesabên wê yên li ser Kurdistanê ve hatîye kirin. Hêj di jimareya pêşîn da Mîqdad Mîdhet Bedirxan lı ser wî babetî weha nivîsîye:

"Heyfa min tê ji Kurdan ra. Kurd ji gelek neteweyan zêdetir xwedîhiş û zeka ne, ciwamêr in, di dînê xwe da rast û qewî ne, xurt in; dîsa wek neteweyên dî ne xwenda ne, ne dewlemend in; di dinyayê da çi dibe, cîranê wan Mosqof çawa ye, dê çi bike, nizanin".(145)

Di jimareya 2'yan da jî Mîqdad Mîdhet Bedirxan ji mîr û axayên Kurdan xwestîye ku di Kurdistanê da dibistanan bidin avakirin û zarûkên welatê xwe bidin xwendin; paşê Rûsya wek dijminê Kurdan nîşan daye û weha gotîye:

"Xwedê neke, eger dijminê we Mosqof êrîşê welatê we bike hun'ê çawa şerê wî def' bikin! Mosqof xwedîyê top û tifingên wisa ecêb e, cîyên ku mirov ji wan wek teyran dixuye, gule û bombayên xwe digîhîne wan cîyan; topên wisa ecêb hene ku, dikare bi wan topan çîyan hilweşîne".(146)

Evdirehman Bedirxan jî piştê ku kargêrîya rojnamê girtîye destê xwe, bala gelê Kurd kişandîye ser taluka Rûsyayê ji Kurdistanê ra. Di jimareya 7'an da nivîsarek bi sernivîsara "Girîd" nivîsîye û tê da daye zanîn ku dewleta Osmanî alîkarî ji Musulmanên girava Girîdê(147) ra neşandîye, ji ber wê yekê jî ew Musulman li pêşberê Fileyên Girîdê zorbirî bûne; paşê rewşa Kurdistanê daye ber rewşa Girîdê û qiyas kirîye, daye zanîn ku Rûsya dixwaze Kurdistanê dagir bike; bala Kurdan weha kişandîye ser wê talukê:

"Dê vêca Kurdno, aqilê xwe bînin serê xwe! Wah, eger haya we ji we tunebe! Eger hun xwe hişyar nekin, gelek naçe, rojek dê ev rewş bê serê we jî! Dê vêca ma ne xebîneta Kurdan e ku Kurd jin û zarûkên xwe di binê destê eskerên Rûs da bibînin! Mosqof devê xwe vekirîye, dê rojek bê welatê we bistîne".(148)

---

(143) **Kurdistan,** j. 30, r. 1—2.
(144) **Kurdistan,** j. 30, r. 2—4.
(145) **Kurdistan,** j. 1, r. 1.
(146) **Kurdistan,** j. 2, r. 1.
(147) Girîd: Giravek e di Deryaya Sipî da, di destê Yunanistanê da ye.
(148) **Kurdistan,** j. 7, r. 4.

Di jimareya 9'an da nivîsarek bi sernivîsara "Welat-Weten" nivîsîye û tê da qala xirabîya karbidestên rejima Evdilhemîd li Kurdistanê kirîye, daye zanîn ku Kurdistan ji ber xirabî û zulma wan birîndar bûye, paşê bala Kurdan kişandîye ser taluka Rûsyayê û di wî babetî da weha gotîye:

"Welatê Kurdan wek laşekî birîndar bêhal maye. Eger Kurd, wê birîna ku karbidestên hukumetê di wî laşî da vekirine derman nekin, heyfa min tê ku ew laş, yanî Kurdistan û ax û berê wî welatî, ew dar û berên wî cîyê ku ew qas zarûk mezin kirine, ew qas mirov xwedî kirine, dê binax bibe; yanî Mosqof dê bê li ser wê axê rûnê, zarûkên wî welatî dê jar û reben bibin, Kurd dê bibînin ku ew axa ku zarûkên xwe ew qas bi delalî mezin kirine dê bikeve nava destê bîyanîyan, ew zarûkên ku li ser wê axê mezin bûne dê bibin dîlên bîyanîyan, ew bav û dayikên ku ji dilê wan nayê ji zarûkên xwe ra bêjin 'avek bide min' dê bibin xizmetkarên eskerê Mosqof, dê xizmeteka şerabê ji eskerê Mosqof ra bikin".(149)

Di jimareya 15'an da di heqê taluka Rûsyayê da ev xeber derketîye:

"Hukumeta Rûsyayê ji Padîşahê me ra nivîsîye: 'Hin Kurd desdirêjî li ser sînorên min dikin. Eger tu ceza nedî wan, ez'ê bi eskerê xwe ceza bidim Kurdan'. Belkî Kurdan desdirêjî nekiribe. Lê belê ji ber ku Rûsya bi qelsîya me dizane, li behanan digere da ku eskerê xwe bişîne Kurdistanê. Hun dizanin Rûsyayê çi bi Çerkezan kir, hun dizanin çi bi Efxanistanê kir; dê vêca dor hatîye ser Kurdistanê".(150)

Di jimareya 28'an da nivîsareka Tirkî ya dirêj bi sernivîsara "Alayîyên Siwarên Hemîdî"(Hamidiye Süvari Alayları) cî girtîye. Nivîskar di wê nivîsarê da jî qala taluka Rûsyayê kirîye û daye zanîn ku her cara ku şer di navbera dewleta Osmanî û Rûsyayê da derketîye, Rûsyayê berê xwe daye Kurdistanê û axa Kurdistanê ji êrîşên xwe ra kirîye amanc; nivîsîye ku Rûsya di pêşedemê da jî dê êrîşê Kurdistanê bike û Kurdistanê bide ber lingên xwe, bixwaze xwe bigîhîne Xelîcê Farisî û Anadolê.(151)

BABETÊN DÎ

Ji bil van babetên sereke yên ku me li jor rêz kirin û dan zanîn, hin nivîsar li ser hin babetên dî jî di rojnama **"Kurdistan"** da cî girtine. Ew jî, hin ji wan bi Kurdî ne, hin jî bi Tirkî ne; hin ji wan li ser hin şolên Kurdistanê û Osmanîyan in, hin jî li ser hin şol û bûyerên welatên dî ne.

Yek ji nivîsarên Kurdî li ser Selahedînê Eyûbî hatîye nivîsîn û di jimareya 15'an da derketîye. Di wê nivîsarê da hatîye qalkirin ku Selahedînê Eyûbî û apê wî Şêrko çawa xebitîne, paşê Selahedîn çawa dewleta Eyûbî saz kirîye, çawa bi heq û edalet çerxa dewleta xwe gerandîye.(152)

---

(149) **Kurdistan,** j. 9, r. 1.
(150) **Kurdistan,** j. 15, r. 2.
(151) **Kurdistan,** j. 28, r. 2—3.
(152) **Kurdistan,** j. 15, r. 3.

Nivîsareka Kurdî jî li ser Xalit Bedirxan û Şerê Transvaalê(153) di jimareya 21'ê da cî girtîye. Nivîskar di wê nivîsarê da daye zanîn ku birayê wî Xalit Bedirxan xwestîye digel çend hezar Kurdan biçe Afrîqa Jêrîn û di wî şerî da beşdar bibe, ji alîyê Înglîzan şer bike, bi wê amancê muraceetê Sefareta Înglistanê ya li Stanbolê kirîye û destûra çûyinê xwestîye, Sefîrê Înglistanê jê ra sipas kirîye û daye zanîn ku ji çûyina wî û Kurdên dî ra îhtîyac tune, paşê Evdilhemîd ji meselê haydar bûye û Xalit Bedirxan digel hin kesên dî dane girtin, piştê çend rojan li ser daxwaza Sefîrê Înglistanê ji girtîxanê hatine berdan.(154)

Yek ji nivîsarên Kurdî jî li ser têkoşîn û serhatîyên Serekwezîrê Osmanî yê azadîxwaz Mîdhet Paşa hatîye nivîsîn. Di wê nivîsarê da hatîye qalkirin ku Mîdhet Paşa digel hin hevalên xwe çawa Evdilhemîdê 2'yan anîye ser text û bûye serekwezîrê wî yê pêşîn, paşê Evdilhemîd çawa lê vegerîyaye û bêbextî kirîye, çawa bi dek û dolaban ew ji serekwezîrîyê derxistîye û ji Stanbolê dûr xistîye, paşê ew çawa daye girtin û daye dadgeheka taybetî û bi cezayê idamê daye mehkûmkirin, paşê jî ew şandîye girtîxana bajarê Taîfê yê ku li Hîcazê dikeve, di dûwayîyê da jî hin mirov ji Stanbolê rêkirine wir û Mîdhet Paşa bi wan daye xeniqandin. Ev nivîsar gelek dirêj e û di çar beşan da, di jimareyên 22, 23, 24, 25'an da derketîye.(155)

*

Di jimareya 24'an da nivîsareka Tirkî bi sernivîsara "Kurdistan û Kurd"(Kürdistan ve Kürdler) derketîye. Di wê nivîsarê da jî qala rewşa Kurdan a wê demê, bi kurtî qala cografya Kurdistanê û dîroka Kurdan, piçek jî qala rewşa wan a komelî hatîye kirin. Di wê nivîsarê da hatîye nivîsîn ku li gora texmîna pisporên Înglîz ên wê demê, nufûsa Kurdan çar milyon e.(156)

Yek ji serekwezîrên berîn ên dewra Evdilhemîdê 2'yan, ku navê wî Seîd Paşa bûye, bi munasebeta salvegera daniştina Evdilhemîd li ser textê dewleta Osmanî, jê ra bîranînokek(157) şandîye û tê da rexne li sîyaseta wî xistîye. Ew bîranînok, ku bi zimanê Tirkî ye, du beş e û di jimareyên 20'î û 21'ê da derketîye.(158)

Parçenivîsareka Tirkî jî bi îmza kesek ku navê wî Umer Fewzî ye, di jimareya 21'ê da hatîye çapkirin. Ew parçenivîsar, ku bi sernivîsara "Li Tirkîyê

(153) Ev şerê ha, di dûwayîya sedsala XIX. da li hêla Transvaalê li Komara Afrîqa Jêrîn a nuhayîn derketîye û di despêka sedsala XX. da jî dom kirîye.

(154) **Kurdistan,** j. 21, r. 1—2.

(155) **Kurdistan,** j. 22, r. 1—2. j. 23, r. 1—2, j. 24, r. 1, j. 25, r. 1—2.

(156) **Kurdistan,** j. 24, r. 3—4.

(157) Bîranînok: Nivîsareka ku ji kargêrek ra yan ji meqamekî resmî ra yan jî ji vêkxistinek ra tê pêşkêşkirin û tê da hin tişt bi bîra wan tên anîn, li ser hin şolan bala wan tê kişandin û hin daxwaz ji wan tên kirin. Ji peyvika "bîranînok" ra bi Erebî tê gotin "muzekkîre", bi Tirkî tê gotin "muhtıra" ku ew jî di eslê xwe da peyvika "muxtîre" ya Erebî ye, bi Înglîzî jî tê gotin "memorandum".

(158) **Kurdistan,** j. 20, r. 3—4, j. 21, r. 2—3.

Eskerî"(Türkiya'da Askerlik) hatîye weşandin, wisa tê texmînkirin ku ji kovarek yan jî ji pirtûkek hatîye guhastin.(159)

Yek ji nivîsarên Tirkî jî bi sernivîsara "Lêkanîna Kar û Haydarîya Paşîn"(İdare-i Maslahat ve İş'ar-ı Ahîr) di jimareya 22'yan da cî girtîye. Navê nivîskarê wê nivîsarê Rizayê Deryayî(Bahriyeli Rıza) ye.(160)

Nameyek ku paşayekî Osmanî, ku navê wî Reûf Paşa bûye, di wextê xwe da ji Serekwezîrê berîn Mîdhet Paşa ra nivîsîye, ew jî di jimareya 22'yan da hatîye çapkirin.(161)

Ev bîranînok û parçenivîsar û name, giştli ser bêrêtî û zordestîyên dewra Evdilhemîd hatine nivîsîn.

Helbesteka Tirkî jî bi îmza kesek ku ji xwe ra gotîye "Cegerxwînek"(Bir Ciğerhun) di jimareya 27'an da derketîye. Ew helbest ji devê Padîşahê Osmanî Sultan Muradê 5'an li ser rewşa wî hatîye nivîsîn.(162) Wek ku tê zanîn, ew padîşah demeka kurt li ser text maye, ji ber ku hişê wî ne temam bûye ew ji text daxistine û birayê wî Evdilhemîdê 2'yan kirine padîşah.

XEBERA WEFATA HACÎ QADİR Dİ ROJNAMA "KURDİSTAN" DA

Ji bil nivîsaran hin xeber jî di rojnama **"Kurdistan"** da derketine. Ew xeber jî wek nivîsaran, hin ji wan bi Kurdî ne, hin jî bi Tirkî ne û di jimareyên cure cure da cî girtine. Lê belê xeberên ku mirov dikare ji wan ra bêje tenê "xeber" in, ne gelek in. Gerçi di nava nivîsaran da jî xeber hene û her nivîsarek li ser xeberek hatîye nivîsîn; lê digel wê yekê jî mirov nikare ji wan ra bêje tenê "xeber" in, mirov dikare ji wan ra bêje "nivîsar-xeber" in. Xeberên tenê "xeber" jî ne ew qas zêde ne.

Xeberên ku di rojnamê da cî girtine, hin ji wan li ser hin şolên Kurdistanê ne, hin li ser şolên dewleta Osmanî ne, hin jî li ser şolên welatên dî ne. Mesela li ser şola Girîdê, li ser şerê Misrê û Sûdanê, di heqê şerê Çînê û Japonyayê da, di heqê şerê Emrîkayê û Îspanyayê da hin xeber derketine. Ew xeber hemî di jimareyên cure cure da ne, bi piranî jî kurt in.

*

Du xeberên giring jî hene ku divê mirov bi taybetî qala wan bike. Ew her du xeber jî di jimareya 3'yan da derketine.

Yek ji wan her du xeberan, çapkirina ferhenga Kurdî-Erebî ye, ku ji alîyê Yûsuf Ziyaeddîn Paşa ve hatîye nivîsîn û di sala 1894'an da bi navê **"El-Hedîyyet'ul-Hemîdîyye fî'l-Luxet'îl-Kurdîyye"**(163) li Stanbolê hatîye

(159) **Kurdistan,** j. 21, r. 3.
(160) **Kurdistan,** j. 22, r. 2—3.
(161) **Kurdistan,** j. 22, r. 3—4.
(162) **Kurdistan,** j. 27, r. 4.
(163) Mana navê vê pirtûkê bi Kurdî weha ye: **"Dîyarîya Hemîdî di Zimanê Kurdî da".** Ji ber ku hingê Sultan Evilhemîdê 2'yan li ser textê Osmanî bûye, nivîskar pirtûka xwe ji wî ra dîyarî kirîye û ev nav lê danîye.

çapkirin(164). Gerçi tarîxa çapa wê çar sal berî derketina rojnama **"Kurdistan"** bûye û di dema derketina **"Kurdistan"**ê da xebera derketina wê ne tiştekî nû bûye; lê belê digel wê yekê jî Mîqdad Mîdhet Bedirxan xwestîye ku wê bide naskirin, li ser wê xebereka kurt nivîsîye, ji nivîskarê wê Yûsuf Ziyaeddîn Paşa ra sipas kirîye, ew pirtûk wek "bingehek jibo zimanê Kurdî" daye naskirin û gotîye "gelek kitêbek qenc e", ji mela û mîr û paşayên Kurdan xwestîye ku wê peyda bikin, daye zanîn ku ji melayên Kurdan ra pêwîst e ku ew jî ji zimanê xwe ra tiştek binivîsin.(165)

Xebera giring a dî ya ku di jimareya 3'yan da cî girtîye, xebera wefata hozanê Kurd ê gewre û nemir Hacî Qadirê Koyî ye. Gerçi wefata wî salek berî derketina rojnama **"Kurdistan"**, di sala 1897'an da bûye û xebera wefata wî jî ne tiştekî nû bûye; lê belê digel wê yekê jî Mîqdad Mîdhet Bedirxan giringî daye wê bûyerê û pêwîst dîtîye ku di rûpelên **"Kurdistan"**ê da cî bide xebera di heqê wê da.

Nivîskar di wê xeberê da gelek pesnê Hacî Qadirê Koyî û xebata wî û helbestên wî daye, di paşîya xebera wefata wî da jî helbesteka wî çap kirîye û daye zanîn ku Hacî Qadir ew helbest bi destê xwe li pişta nusxeyeka **"Mem û Zîn"**a Xanîyê nemir nivîsîye. Hacî Qadirê Koyî di wê helbesta xwe da gelek pesnê **"Mem û Zîn"**ê daye û di heqê wê da weha gotîye:

"Eman qedrî bizane em kitêbe
Le dunya êstekey hemtay nemawe".

Paşê **"Mem û Zîn"** wek xizneyeka cewheran û wek kîsekî diravan nîşan daye, di dûwayîya helbestê da jî li ser xebata xwe û Xanî weha nivîsîye:

"Le Kurdan xeyrî Hacî-w Şêxî Xanî
esasî nezmî Kurdî danenawe".(166)

(164) Min ev pirtûk wergerand tîpên Latînî û beşên wê yên Erebî jî wergerandin zimanê Tirkî û bi wî awayî ew kir ferhengeka Kurdî-Tirkî û di sala 1978'an da li Stanbolê bi navê **"Ferhenga Kurdî-Tirkî"(Kürdçe-Türkçe Sözlük)** ji nû ve çap kir.

(165) **Kurdistan,** j. 3, r. 3.

(166) **Kurdistan,** j. 3, r. 3.

BEŞ III

NASANDİNA ÇAPA NÛ

XEBATA ME Lİ SER ROJNAMA "KURDİSTAN"

Wek ku tê zanîn, rojnama **"Kurdistan"** di despêkê da tenê bi zimanê Kurdî, ji jimareya 4'an pê ve jî bi Kurdî û Tirkî derketîye û bi tîpên Erebî hatîye çapkirin. Jibo ku neslên îroyîn û sibeyîn bikarin wê bixwînin, me hemî jimareyên wê yên di dest da heyî, Kurdîya wan bi Kurdî û Tirkîya wan bi Tirkî, ji tîpên Erebî wergerandin tîpên Latînî.

Lê belê wergerandina tîpan ne bes bû. Nivîsar û xeberên ku bi Kurdî hatine nivîsîn, di wan da gelek peyvikên Erebî û Farisî hatine karanîn. Jibo ku em têgîhîştina wan peyvikan ji xwendevanan ra hêsan bikin, me maneyên wan bi jêrenotan li jêrê rûpelan dan zanîn. Jimareyên jêrenotên her jimareyeka rojnamê, ji serê wê dest pê dikin û di dûwayîya wê da xilas dibin; di jimareya pey wê da ji nû ve dest pê dikin.

Lê herçî nivîsar û xeberên Tirkî yên ku di **"Kurdistan"**ê da cî girtine, gişt bi Tirkîya wê demê ne ku jê ra dihat gotin "Osmanî". Nivîsar û xeberên ku bi zimanê Osmanî derketine, me berê ew ji tîpên Erebî wergerandin tîpên Latînî, paşê jî me ew ji Osmanî wergerandin Tirkîya nû. Me wergeranên nivîsar û xeberên her jimareyek ên bi Tirkîya nû, di paşîya wê jimareyê da bicî kirin. Mesela ku mirov jimareya 25'an veke mirov berê wergeranên wê jimareyê yên bi Kurdî û Tirkî yên bi tîpên Latînî dibîne; piştê xilesbûna wan, mirov wergeranên nivîsar û xeberên Osmanî yên bi Tirkîya nû dibîne; piştê xilasîya wan, jimareya 25'an xilas dibe û jimareya 26'an dest pê dike.

Ji alîyekî dî ve, hem di nivîsar û xeberên Osmanî da, hem jî di wergeranên wan ên bi Tirkîya nû da hin babet, hin bûyer, hin Peyvik hebûn ku axiftin li ser wan û zelalkirina wan Pêwîst bû; yan jî hin şaşî hebûn ku raskirina wan lazim bû. Me jibo wan jî jêrenotên Tirkî nivîsîn.

Me jimareyên jêrenotan ne li gora zimanan, lê li gora jimareyên rojnamê nivîsîn; yanî jimareyên jêrenotên nivîsar û xeberên Kurdî û Osmanî û Tirkî yên her jimareyeka rojnamê, ji despêka wê jimareya rojnamê heta dûwayîya wê li pey hev dom dikin û di dûwayîya wê jimareya rojnamê da xilas dibin.

NİVÎSÎNA JİMAREYÊN RÛPELAN Û TARÎXAN

Jibo ku em rûpelên wergeranên bi tîpên Latînî û rûpelên wergeranên bi zimanê Tirkîya nû ji hev cuda bikin, me jimareyên rûpelên wergeranên bi tîpên Latînî li jêrê rûpelan di nîvî da, bi jimareyên adetî nivîsîn; wek "1, 2, 3, 4, 5. . ." Lê herçî jimareyên rûpelên wergeranên bi zimanê Tirkîya nû, me ew jî dîsa li jêrê rûpelan û di nîvî da, lê belê bi jimareyên Romî nivîsîn; wek "I, II, III, IV, V. . ."

Ji bil van jimareyan jî, jibo hemî rûpelên wergeranên bi tîpên Latînî û rûpelên wergeranên bi Tirkîya nû, me li goşeyên rûpelan ên jêrîn jimareyên zincîrkirî nivîsîn.

Bi vî awayî, rewşa rûpelan weha bû:

Jimareyên adetî yên ku li nîvên rûpelan hatine nivîsîn, di paşîya her jimareyeka rojnamê da xilas dibin û di jimareya pey wê da dîsa ji jimareya "1"ê dest pê dikin; jimareyên wergeranên bi zimanê Tirkîya nû jî di paşîya wergeranên her jimareyek da xilas dibin û di despêka wergeranên jimareya pey wê da dîsa ji jimareya "I"ê dest pê dikin. Lê herçî jimareyên goşeyên rûpelan, zincîrkirî ne û bi hev ve girêdayî ne û ji serê "Pêşkêşî"ya bi Kurdî heta rûpela paşîn a rojnama **"Kurdistan"** li pey hev diçin û dewam dikin.

*

Şoleka dî jî nivîsîna tarîxan e.

Dema rojnama **"Kurdistan"** derketîye, di nava sînorên dewleta Osmanî da tarîxa resmî tarîxa Romî bûye. Di despêka derketina **"Kurdistan"**ê da tarîxa Romî 1314 bûye, ku li gora tarîxa Mîladî dibe 1898; dema jimareya paşîn a rojnamê derketîye, hingê jî tarîxa Romî 1318 bûye, ku li gora tarîxa Mîladî dibe 1902.

Di rojnama **"Kurdistan"** da di serê hemî jimareyan da hem tarîxa Romî ya resmî cî girtîye, hem jî li rexê wê tarîxa Hîcrî ya neresmî hatîye nivîsîn. Lê belê di nava metnên nivîsaran û xeberan da tenê tarîxa Romî cî girtîye.

Jibo ku xwendevan bikarin bi hêsanî wan tarîxan li gora tarîxa Mîladî binasin, me hevberên hemî tarîxan bi jêrenotan li gora tarîxa Mîladî nivîsîn û dan zanîn.

JİMAREYÊN KÊM

Ji rojnameya **"Kurdistan"** di hemî cîhanê da tenê yek berhevokek gîhaye dema me. Ew berhevok jî li Almanyayê li bajarê Marburg di Pirtûkxana Dewletê da ye, ku bi zimanê Almanî jê ra tê gotin "Staatsbibliothek". Bi qasê ku em dizanin ji bil wê berhevokê çu jimareyên **"Kurdistan"**ê li çu cîyekî dî tunin.

Aha ew jimareyên ku di wê berhevokê da ne, me hûrfîlmên(mîkrofîlm) wan giştan girtin û anîn ser kaxid û em li ser wan xebitîn, me gişt wergerandin tîpên Latînî. Ji bil vê wergerandinê, me jimareyên orîjînal ên bi tîpên Erebî jî ji wan fîlman ji nû ve çap kirin. Bi wî awayî, wergeranên rojnama **"Kurdistan"** ên ku me wergerandin tîpên Latînî û jimareyên wê yên orîjînal ên bi tîpên Erebî li rexê hev tên weşandin.

Di wê berhevokê da 26 jimare hene. Jimareya paşîn a ku di wê berhevokê da ye, jimareya 31'ê ye. Lê belê gelek mixabin ku pênc jimare kêm in. Jimareyên kêm ev in: 10, 12, 17, 18, 19. Me salixê van jimareyan li çu cîyek negirt.

Wek ku me got, jimareya paşîn a di berhevoka Pirtûkxana Dewletê ya Marburgê da jimareya 31'ê ye. Li vir pirsek tê aqilê mirov, ew jî ev e: Gelo rojnama **"Kurdistan"** ew qas derketîye?

Gelek mixabin ku bersîva vê pirsê nayê dîtin. Lewra di heqê zelalkirina vê şolê da di destê me da çu belgeyek, wesîqeyek tune. Mirov texmîn dike ku rojnama **"Kurdistan"** piştê jimareya 31'ê jî jîyana xwe domandîye. Lewra di jimareya 31'ê da di heqê girtina rojnamê da tiştek nehatîye nivîsîn. Eger xwedîyê rojnamê biryara westandina weşandina wê bida û piştê jimareya 31'ê êdî ew dernexista, bê guman dê di jimareya paşîn da yanî di jimareya 31'ê da ew biryar eşkera bikira û bi xwendevanên xwe bida zanîn. Nayê texmînkirin ku wî hema ji nîşka ve û bê ku xwendevanên xwe haydar bike, rojnama xwe girtîye û dûwayî li weşandina wê anîye. Eger rojname piştê jimareya 31'ê derketibe, gelek mixabin ku jimareyên wê yên piştê 31'ê winda bûne û negîhane dewra me, neketine destê me.

Îhtîmaleka dî jî tê aqilê mirov, ew jî ev e: Dibe ku piştê jimareya 31'ê hin alûzî û rêgirên ne di hesab da derketibin pêşîya Evdirehman Bedirxan û rê li domandina wî ya weşandina **"Kurdistan"**ê girtibin. Eger mirov li ser vê îhtîmalê bifikire, hingê mirov dikare bêje ku ew li ser domandina weşandina rojnamê biryardar bûye, loma di heqê westandina wê da di jimareya 31'ê da tiştek nenivîsîye; lê belê piştê jimareya 31'ê neşîyaye weşandina wê bidomîne, êdî mecala ragîhandina girtina rojnamê jî jê ra nemaye, bi wî awayî weşandina rojnamê ji nîşka ve westîyaye, rê lê hatîye girtin û dûwayî lê hatîye.

*

Her çi dibe û çawa dibe bila bibe, rojnama **"Kurdistan"**, wek rojnama Kurdî ya pêşîn di dîroka neteweyê Kurd da cîyê xwe yê bişeref girtîye; di asîmanê Kurd û Kurdistanê da wek stêrek çar sal biriqîye, paşê jî wek stêreka ku dibizde û ji ber çavan winda dibe, ji ber çavan winda bûye çûye, lê belê şopeka ronî û zelal li pey xwe hîştîye.

Divê em li ber bîranîna wê û bîranîna her du xwedîyên wê Mîqdad Mîdhet Bedirxan û Evdirehman Bedirxan bi rêzdarî serê xwe bitewînin, tim û tim bi sipas û qencî û minetkarî wan bi bîr bînin.

11/11/1990
M. Emîn Bozarslan

Нажим на Ирак

ВАШИНГТОН, 10. (Соб. корр. «Правды»). «Высокая мораль» Вашингтона, которую он всякий раз ставит в пример остальному миру, часто оказывается на поверку упражнением в лицемерии.

Сенат конгресса США единогласно одобрил суровые экономические санкции в отношении Ирака, обвинив его в «грубом нарушении международных законов». Законодатели запрещают предоставление этой арабской стране кредитов, продажу оборудования для нефтяной промышленности, закупки иракской нефти, а также обязывают США выступать в международных финансовых организациях против предоставления Багдаду займов.

Чем же насолил Ирак американским сенаторам? Конкретно речь идет о весьма расплывчатых, туманных сообщениях, согласно которым он применил отравляющие вещества в военных операциях против курдских повстанцев. Эти сообщения основываются на показаниях неких курдских беженцев.

Никаких более существенных свидетельств у Вашингтона нет. Хотя госсекретарь Шульц, другие официальные лица в последние дни неоднократно выступали с обвинениями в адрес Ирака, здесь обратили внимание на то, что представитель внешнеполитического ведомства США Ч. Редмэн упорно отказывался обсуждать вопрос о том, на чем основываются подобные обвинения.

С таким же завидным упорством администрация и конгресс проигнорировали сделанное на пресс-конференции в американской столице заявление государственного министра Ирака по иностранным делам С. Хаммади, авторитетно и категорически опровергшего всякие домыслы насчет применения химического оружия. Его просто не захотели слушать, потому что преследуют совсем иные своекорыстные цели. Вряд ли будет ошибкой сказать, что одна из них — политико-экономический нажим на Ирак, попытка обеспечить его «сговорчивость».

Как бы то ни было, одобренная сенатом акция поступает сейчас на рассмотрение палаты представителей, которая, как ожидается, также ее поддержит. Инициаторы мер рассчитывают, что Ирак почувствует на себе эффект почти немедленно — страна накопила огромный долг в 60 миллиардов долларов. Экспорт иракской нефти в США минимален, но Багдад получает 800 миллионов долларов в виде кредитов.

В. ГАН.

Nivîsara rojnama **"Pravda"**, 11/09/1988.

TÊDAYÎYA PÊŞKÊŞÎYÊ

BEŞ I

HAYDARÎYÊN GİŞTÎ Lİ SER ROJNAMA "KURDİSTAN" RÛPEL(1)

Belavbûna fikra neteweyî di nava împeratorîya Osmanî da 7

Mîqdad Mîdhet Bedirxan û rojnama Kurdî ya pêşîn 8

Amanca rojnama **"Kurdistan"** 9

Zimanê rojnama **"Kurdistan"** 10

Rojnama gerok 11

Bawerîya xurt û temam 13

Dengana **"Kurdistan"**ê li Kurdistanê 14

Zordestîya rejima Evdilhemîd li ser rojnama **"Kurdistan"** 16

Rejima padîşahan çû, rejima paşayan hat 18

BEŞ II

NAVEROKA ROJNAMA "KURDİSTAN"

"Mem û Zîn" di rûpelên **"Kurdistan"**ê da 22

Dîroka mîrên Botan 23

Hişyarkirin û serwextkirina gelê Kurd 24

Neteweevînî û welatevînî 25

Neteweevînî û welatevînî di nava sînorên Osmanîyan da 27

Guhartina qanûnan li welatên serdest, nabe dermanê derdê neteweyên bindest 30

(1) Jimareyên rûpelên "Têdayî"yê, li gora jimareyên rûpelan ên zincîrkirî yên li goşeyên rûpelan hatine nivîsîn; ne ku li gora jimareyên li nîvên rûpelan.

www.neteweve.com

Banga têkoşîn û berxwedanê li dijê rejima Evdilhemîd 36
Li Kurdistanê sazkirina Siwarên Hemîdî 40
Çawa Kurd û Ermenî li dijê hev rakirine? 42
Taluka Rûsyayê ji Kurdistanê ra 46
Babetên dî 47
Xebera wefata Hacî Qadir di rojnama **"Kurdistan"** da 49

BEŞ III

NASANDİNA ÇAPA NÛ

Xebata me li ser rojnama **"Kurdistan"** 51
Nivîsîna jimareyên rûpelan û tarîxan 52
Jimareyên kêm 52

www.netewe.com

M. EMİN BOZARSLAN

SUNUŞ

Kürdçeden Türkçeye çeviren:

M. EMİN BOZARSLAN

www.netewe.com

ÖNEMLİ BİR ANIMSATMA

"Kürdistan" gazetesinin kolaylıkla okunabilmesi ve ondan yararlanılabilmesi için, önce, bu "Sunuş"un 3. bölümünün okunması gerekir. "Yeni Basımın Tanıtılması" başlığı altında yazılmış ve 103-105. sayfalarda basılmış olan bu bölüm, **"Kürdistan"** gazetesinin okunması ve kullanılması için bir anahtar, bir kılavuz niteliğindedir. O bölümün kılavuzluğu olmaksızın, **"Kürdistan"** gazetesinin okunması ve ondan yararlanılması kolay değildir.

www.nerwe.com

BÖLUM I

"KÜRDİSTAN" GAZETESİ ÜZERİNE GENEL BİLGİLER

OSMANLI İMPARATORLUĞU İÇİNDE ULUSALCILIK FİKRİNİN YAYILMASI

1789 yılında Fransız Devrimiyle birlikte dünyaya gelen ve giderek Avrupa halkları arasında yaygınlaşan ulusalcılık ve yurtseverlik fikri, XIX. yüzyılın sonlarında artık Osmanlı imparatorluğunun sınırları içine ulaşmıştı. Osmanlı yönetimi altındaki değişik halkların aydınları arasında, o fikir yavaş yavaş yayılıyordu. Arap, Arnavut, Yunan ve Bulgar aydınları, giderek ulusal kimliklerinin farkına varıyorlardı; ulusal kimliklerini elde edip korumak için çareler düşünüyorlar, çareler arıyorlardı.

Öte yandan, Türk aydınlarının kendileri de ulusalcılık ve yurtseverlik fikrinin etkisi altına girmişlerdi; onlar da Türk ulusalcılığının bayrağını yükseltmişlerdi ve Türklere özgü bir devlet kurmak, dünyadaki bütün Türkleri o devletin sınırları içinde toplamak istiyorlardı. O fikrin öncüleri Avrupa ülkelerine dağılmışlardı ve toplantılar yaparak, örgütler kurarak, dergiler yayınlayarak bir yandan o fikri yaymaya çalışıyolar, bir yandan da Sultan 2. Abdülhamid'in rejimine karşı mücadele ediyorlardı.

O durumda ve o koşullar içinde Kürd aydınları da o fikirden paylarını almışlardı; onların da gönlünde Kürd ulusalcılığı fikri ile Kürdistan'dan kaynaklanan yurtseverlik fikri yer etmişti; onlar da Kürdistan'ın ve Kürd ulusunun durumu üzerine düşünmüşler, çalışmaya ve yazmaya başlamışlardı.

MİKDAD MİDHAT BEDİRHAN VE İLK KÜRD GAZETESİ

O yurtsever ve ulusalcı Kürd aydınlarından biri de Mikdad Midhat Bedirhan'dı, ki 1898 yılında tarihsel bir adım atmış ve Kürd halkının tarihinde ilk kez bir Kürdçe gazete yayınlamaya başlamış ve gazetesinin adını da **"Kürdistan"** koymuştur; başka bir deyişle, gazetesini yurdunun adıyle adlandırmıştır. Mikdad Midhat Bedirhan **"Kürdistan"** gazetesini yayınlamakla, hem Kürd halkının yaşamında yeni bir sayfa açmış, hem de kendisi ilk Kürd gazetecisi olmuştur.

"Kürdistan" gazetesinin ilk sayısı, 22 Nisan 1898 perşembe günü çıkmış(1) ve Mısır'da "El-Hilâl Matbaası"nda basılmıştır. Birinci sayfasının üst tarafında, gazetenin adı olan **"Kürdistan"** iri harflerle yazılmıştır. Gazetenin adının hemen altında da o yılın Hicrî tarihi yer almıştır. O tarih o zaman 1315'ti. Gazetenin kurucusu Mikdad Midhat Bedirhan, öylece, **"Kürdistan"** gazetesinin Hicrî tarihe göre 1315 yılında kurulmuş olduğunu bildirmiştir. O tarih, son sayıya kadar gazetenin adının altında yazılmıştır.

*

İlk sayıda, gazetenin adının altında, Türkçe olarak şu söz yer almıştır:

"Kürdleri îkaz ve tahsil-i sanayiye teşvik için şimdilik on beş günde bir neşrolunur, Kürdçe gazetedir".

Üçüncü sayıdan itibaren, gazetenin adı ile yukarıdaki Türkçe sözün arasında şu Kürdçe söz de yer almıştır:(2)

"On beş günde bir yazılır, Kürdçe ceridedir".(3)

24. sayıdan itibaren yukarıdaki Türkçe söz, "ayda bir neşrolunur, Kürdçe gazetedir" biçiminde değiştirilmiştir. Kürdçe sözdeki o değişiklik ise, 25. sayıdan itibaren yapılmış ve gazetenin ayda bir yayınlanacağı bildirilmiştir. Aynı sayıdan itibaren, Türkçe sözdeki "Kürdçe gazetedir" ifadesi, "Kürdçe ve Türkçe gazetedir" biçiminde değiştirilmiştir.

Gazetenin adının sağ yanında, gazetenin kurucusu ve sahibinin adı Kürdçe olarak yazılmış; yine Kürdçe olarak şu söz yer almıştır:

"Her defasında iki bin gazeteyi, halka verilmek üzere parasız olarak Kürdistan'a göndereceğim".

Gazetenin adının sol yanında ise, yukarıdaki söz Türkçe olarak, gazetenin kurucusu ve sahibinin adıyle birlikte yazılmıştır; ayrıca, gazetenin bir yıllık abone bedelinin 80 kuruş olduğu Türkçe olarak belirtilmiştir.

Bu yazıların altında da, gazetenin sayılarının tarihi, Hicrî ve Rumî tarihlere göre iki çizgi arasında yer almıştır. Örneğin ilk sayının tarihi şöyle yazılmıştır:

"Perşembe günü, 30 Zilkade sene 1315; pencşembe fi 9 Nisan sene 1314". Hicrî 30 Zilkade 1315 ile Rumî 9 Nisan 1314 tarihleri, Milâdî tarihe göre şöyledir: 22 Nisan 1898.

---

(1) O zaman Osmanlı sınırları içinde Rumî tarih kullanıldığından, **"Kürdistan"** gazetesinin tarihi de Rumî tarihe göre "9 Nisan 1314" olarak yazılmıştır; o da Milâdî tarihe göre "22 Nisan 1898"dir.

(2) Buradaki Kürdçe sözü Türkçeye çevirerek alıyoruz. Bundan sonra da "Sunuş"a aktaracağımız bütün Kürdçe parçaları, Türkçeye çevirerek aktaracağız.

(3) Buradaki "ceride" sözcüğü, derginin aslında kullanılmıştır. Arapça olan ve Kürdçeye de, Türkçeye de geçen "ceride" sözcüğü "gazete" demektir.

"KÜRDİSTAN" GAZETESİNİN AMACI

"Kürdistan" gazetesinin kurucusu Mikdad Midhat Bedirhan, ilk sayının başlangıcında duyurmuştur ki dünyada ne kadar Müslüman varsa hepsinin köy ve kentlerinde okul ve gazete bulunur, dünyada meydana gelen olaylar o gazetelerde yazılır, ne yazık ki Kürdler gazetelerden yoksundurlar ve dünyada olup bitenleri, komşuları olan Moskof'un nasıl olduğunu ve ne yapacağını bilmiyorlar; sonra da gazetenin amacını şöyle bildirmiştir:

"Bu nedenle, Allah yolunda bu gazeteyi yazdım. Yüce Allah'ın izniyle bundan böyle her 15 günde bir gazete yazacağım. Adını ise **"Kürdistan"** koydum. Bu gazetede bilimin ve bilgilenmenin iyiliklerini anlatacağım; nerede öğrenim yapılabileceğini, nerede iyi okullar bulunduğunu Kürdlere göstereceğim; nerede hangi savaş yapılıyor, büyük devletler ne yapıyorlar ve nasıl savaşıyorlar, ticaret nasıl yapılır; hepsini anlatacağım".

Mikdad Midhat Bedirhan, gazetenin amacını açıkladıktan sonra, **"Kürdistan"**ın ilk Kürdçe gazete olduğu konusuna okuyucuların dikkatini çekmiş ve bu konuda şöyle yazmıştır:

"Şimdiye dek kimse böyle bir gazete yazmamıştır; benim bu gazetem, ilktir. Bu nedenle, birçok eksiği olacaktır. Gazetenin eksikliklerini bana yazacağınızı ümit ediyorum. Her şey ilk meydana geldiği zaman eksiktir, sonra gittikçe yoluna girer".(4)

"Kürdistan"ın yayınlandığı tarihlere bakıldığında, başlangıçta 15 günde bir, sonra da bazen ayda bir ve bazen de birkaç ayda bir yayınlanmış olduğu görülür. İçerik bakımından da dikkat edilirse, Kürdistan'da ve öbür ülkelerde meydana gelen bazı olaylara ilişkin bazı haberler de gazetede yer almışsa da, içeriğinin çoğunlukla yazılardan oluşmuş olduğu görülür.

Bu iki nedenden ötürü, **"Kürdistan"**ın aslında bir gazete değil de bir dergi olduğu söylenebilir. Ne var ki her iki sahibi Mikdad Midhat Bedirhan ile Abdurrahman Bedirhan, O'na "ceride" ve "gazete" demişlerdir. Bu nedenle biz de O'na "gazete" diyoruz ve O'nu öyle tanıtıyoruz.

"KÜRDİSTAN" GAZETESİNİN DİLİ

"Kürdistan" başlangıçta yalnız Kürdçe olarak yazılmış ve ilk üç sayısı yalnız Kürdçe olarak basılmıştır. 4. sayıda ve ondan sonraki sayılarda, Türkçe bazı yazılar da gazetenin sayfalarında yer almıştır. O Türkçe yazılar, gazetenin 4, 5, 6, 7. sayılarında Sultan 2. Abdülhamid'e dilekçeler biçiminde yazılmışlardır. O sayılardan sonra, bazı sayılar yine yalnız Kürdçe olarak yayınlanmışlardır; onlar da 8, 9, 11, 15. sayılardır. Öbür sayılarda ise Kürdçe ve Türkçe yazılar birlikte yer almışlardır.(5)

---

(4) **"Kürdistan"**, sayı 1, sayfa 1.

(5) İlerde de anlatacağımız gibi, **"Kürdistan"** gazetesinden günümüze bir koleksiyon kalmıştır; o koleksiyonda da gazetenin 10, 12, 17, 18, 19. sayıları bulunmamaktadır. Bu nedenle, bu sayıların sadece Kürdçe olarak mı, yoksa Kürdçe-Türkçe olarak mı çıktıkları konusunda bir bilgimiz yoktur.

Türkçe olarak yayınlanmış bütün yazılarda Abdülhamid rejimine sert eleştiriler yöneltilmiş, o eleştirilerin sertliği giderek artmıştır.

"Kürdistan"ın Kürdçesi duru bir Kürdçe değildir; Kürdçe yazılarda birçok Arapça ve Farsça sözcükler kullanılmıştır. Zaten o zaman, sözlerini ve yazılarını Arapça ve Farsça sözcüklerle süslemek, Kürd aydınları arasında gelenek olmuştu; onlar, Kürdçeye Arapça ve Farsça sözcükler katmayı bir yücelme olarak kabul ediyorlar, Arapça ve Farsça sözcükler kullanmayı aydın ve bilgili olmanın belirtisi olarak biliyorlardı.

Gazetede yer alan Türkçe yazılara gelince; onların hepsi, "Osmanlıca" denilen o zamanki Türkçeyle yazılmıştır. Osmanlıca ise Türkçe, Kürdçe, Farsça ve Arapçadan oluşmuştu. O nedenle de o dil "Osmanlıca" diye adlandırılmıştı.

Gazetede ayrıca iki Arapça mektup da yayınlanmıştır. Onlardan biri Mardin'den, Amed(Diyarbekir)li Hüseyin oğlu Ali tarafından gönderilmiş ve 8. sayıda yayınlanmıştır. Öbür Arapça mektup ise Lübnan'ın Trablus kentinden, Şeyh Hasan tarafından yollanmış ve 16. sayıda yer almıştır.

"Kürdistan"ın bütün sayıları 4'er sayfadan oluşmuştur.

GEZGİN GAZETE

"Kürdistan" gazetesi yurt dışında, Mısır'da yayınlanmaya başlamış ve ilk üç sayısı "El-Hilâl Matbaası"nda basılmıştır. 4. ve 5. sayılar da yine Mısır'da ve fakat **"Kürdistan** Gazetesi Matbaası"nda basılmıştır.

Mısır o zaman gerçekte İngiltere'nin etkisi altındaydı, ama aslında Osmanlı dewletinin eyaletlerinden biriydi ve Osmanlı Padişahının hükmü orada geçerliydi; en azından, bir gazetenin yayınlanmasını engelleyecek ya da yayınını durduracak kadar orada hükmü vardı. Sultan 2. Abdülhamid de öyle yapmış ve **"Kürdistan"** gazetesinin Mısır'da yayınını sürdürmesine olanak vermemiştir.

Gazetenin kurucusu ve sahibi Mikdad Midhat Bedirhan, hem Abdülhamid rejiminin baskısı ve gazetenin Mısır'da yayınını sürdürmesini engellemesi yüzünden, hem de hastalığı nedeniyle, gazetenin yönetimini kardeşi Abdurrahman Bedirhan'a bırakmış ve İstanbul'a dönmüştür. O durum da, Abdurrahman Bedirhan'ın 6. sayının başında yayınlanan Türkçe yazısından anlaşılmaktadır.(6)

*

Abdurrahman Bedirhan 6. sayıdan itibaren gazetenin yönetimini eline almış ve gazeteyi Mısır'dan İsviçre'nin Cenevre kentine nakletmiştir. O yer değişikliğiyle birlikte gazetenin matbaası ve adresi de değişmiş, 6. sayıdan itibaren gazete "Müslümanların İttifakı ve İyiliği Derneği Matbaası"nda basılmıştır.

---

(6) **Kürdistan,** sayı 6, s. 1—2.

20. sayıdan itibaren gazete yine Mısır'a dönmüş(7) ve o dönüşle birlikte gazetenin matbaa ve adresi yine değişmiştir. Adres olarak Kahire'de "679" numaralı bir posta kutusu gösterilmiştir. Matbaanın adı ise gazetede yer almamıştır; yalnız gazetenin Mısır'da basıldığı 20. ve 21. sayıların sonunda Kürdçe ve Türkçe olarak yazılmıştır. 22. ve 23. sayıların sonunda ise gazetenin "Hindiye Matbaası"nda basıldığı sadece Türkçe olarak belirtilmiştir. Sözü edilen matbaanın bir Mısır matbaası olduğu anlaşılmaktadır.

24. sayıdan itibaren gazete bir kez daha taşınmış ve bu kez de İngiltere'ye götürülüp adresi Londra'da gösterilmiş ve gazetenin ikinci sayfasında şu Türkçe duyuru yer almıştır:(8)

"Son zamanlarda Cenevre'den Londra'ya taşınma dolayısıyle, bir süredir ben âcizlerinin gazetesinin yayınını durdurmak zorunda kaldıksa da, dizgi işlerinin tamamlanması başarıldığı için, bundan böyle ayda bir kez olmak üzere, **"Kürdistan"**ın düzenli olarak basılıp yayınlanacağı duyurulur".(9)

Buna benzer bir Kürdçe duyuru da aynı sayının başında yayınlanmıştır.

Burada dikkati çeken şey, "Cenevre'den Londra'ya taşınma dolayısıyle" demiş olmasıdır. Oysa 23. sayıda da gazetenin adresi Kahire'de gösterilmiştir. O halde neden "Cenevre'den Londra'ya taşınma dolayısıyle" demiştir? Acaba 20. sayıdan 23. sayıya kadar Abdurrahman Bedirhan Cenevre'deydi de gazeteyi orada hazırlayarak Mısır'a gönderip orada mı bastırmıştır? Bu olasılık akla yakındır. Başka bir olasılık da şudur ki, 23. sayının Kahire'de yayınlanmasından sonra sahibi yine Cenevre'ye dönmüş ve gazeteyi orada çıkarmak istemiş; ancak buna olanak bulamamış ve o nedenle İngiltere'ye geçip 24. sayıyı orada yayınlamıştır.

Gazete Londra'da da fazla kalmamış, sadece bir sayısı orada yayınlanmıştır; o da 24. sayıdır. 25. sayıdan itibaren gazete bu kez de İngiltere'nin güneyindeki Folkstone kentine taşınmış ve orada basılmıştır. 25. sayıda taşınma konusunda şu Türkçe duyuru yer almıştır:

"Gazetemizin yayın ve dağıtımı yönünden duyumsanan yararlardan dolayı, **"Kürdistan"**ın yönetimi yukarıda yazılı yere taşınmış olduğundan, başvuruların oraya yöneltilmesi rica olunur".(10)

Ne var ki Folkstone da **"Kürdistan"** için kalıcı bir yer olmamıştır; gazete 29. sayıya kadar orada yayınlanmış, sonra yine Cenevre'ye dönmüş ve son iki sayısı olan 30. ve 31. sayıları orada yayınlanmıştır.

---

(7) 5 numaralı dipnotta da balirttiğimiz gibi, **"Kürdistan"** gazetesinden günümüze kalmış olan tek koleksiyonunda 10. ve 12. sayıların yanı sıra, 17, 18, 19. sayılar da yoktur. Bu nedenle, o üç sayının nerede yayınlanmış olduklarını bilemiyoruz. Buradaki "20. sayıdan itibaren gazete yine Mısır'a dönmüş" sözümüz, var olan sayılara göre yazılmıştır.

(8) Gerek bu duyuru ve gerekse gazetede yer alan tüm Türkçe yazılar, o dönemin Türkçesi olan Osmanlıca olarak yazılmıştır. Biz de, gerek bu duyuruyu ve gerekse bundan sonra "Sunuş"a aktaracağımız diğer Osmanlıca parçaları, bugünkü Türkçeye çevirerek aktaracağız.

(9) **Kürdistan,** sayı 24, s. 2.

(10) **Kürdistan,** sayı 25, s. 2.

O taşınmalarda gazete çoğu kez çok geç yayınlanmış, bazı sayılarının arasına uzun aralıklar girmiştir. Örneğin 5. sayının tarihi 4 Haziran 1314'tür(17 Haziran 1898), 6. sayının tarihi ise 28 Eylül 1314'tür(11 Ekim 1898). 15. sayının tarihi 22 Nisan 1315'tir(5 Mayıs 1899), 16. sayının tarihi ise 24 Temmuz 1315'tir(6 Ağustos 1899). 23. sayının tarihi 11 Şubat 1315'tir(24 Şubat 1900), 24. sayının tarihi ise 19 Ağustos 1316'dır(1 eylül 1900). 25. sayının tarihi 18 Eylül 1316'dır(1 Ekim 1900), 26. sayının tarihi 1 Aralık 1316(14 Aralık 1900), 27. sayının tarihi de 28 Şubat 1316(13 Mart 1901), 28. sayının tarihi ise 1 Eylül 1317'dir(14 Eylül 1901). 29. sayı zamanında çıkmıştır, tarihi 1 Ekim 1317'dir(14 Kasım 1901). Ancak 30. sayı beş ay sonra çıkmıştır, tarihi 1 Mart 1318'dir(14 Mart 1902). 31. sayı ise zamanında çıkmıştır, tarihi 1 Nisan 1318'dir(14 Nisan 1902).(11)

TAM VE SAĞLAM İNANÇ

Burada şöyle bir soru akla gelmektedir: Acaba bu taşınmaların nedeni neydi? Başka bir deyişle, Abdurrahman Bedirhan **"Kürdistan"** gazetesini neden bu kadar taşımış ve yerini bu kadar değiştirmiştir? Acaba neden Mısır ile İsviçre ve İngiltere arasında gidip gelmiş de gidip gelmiştir?

Çok yazık ki bu sorunun yanıtını veremiyoruz. Abdurrahman Bedirhan ilk kez gazeteyi Mısır'dan İsviçre'ye taşıdığı zaman, Abdülhamid rejiminin baskısı yüzünden kardeşi Mikdad Midhat Bedirhan'ın gazetenin yayınını Mısır'da sürdüremediğini ve İstanbul'a dönmek zorunda kaldığını, o nedenle kendisinin gazetenin yönetimini eline aldığını ve gazeteyi çıkarabilmek ve öylece Kürdlerin iyiliğine yönelik çalışmalar yapabilmek için gazeteyi Mısır'dan İsviçre'ye taşıdığını, 6. sayıdaki bir Kürdçe yazıda bildirmiştir.(12) Ya öbür taşınmalar? Onların nedeni neydi acaba? Ne yazık ki elimizde, bu sorunun yanıtını aydınlatabilecek bir belge yoktur.

Acaba Abdurrahman Bedirhan, Abdülhamid'in ajanlarından gelebilecek tehlikeden ötürü kendini güvenlik içinde görmemiş de o nedenle mi o kadar yer değiştirmiş ve gazetesini taşımıştır? Bu olasılık akla yakındır. Gazetedeki yazılardan ve Abdülhamid'e yazılan açık mektuplardan açıkça anlaşılıyor ki Abdülhamid ile çevresindeki yöneticiler, **"Kürdistan"** adlı bir gazetenin yayınlanmasını istememişler ve gazetenin özellikle Kürdistan'a, genellikle de Osmanlı devletinin sınırları içine girmesini yasaklamışlardır. Ne var ki Abdülhamid'in **"Kürdistan"** gazetesine karşı olmasına karşın, Abdurrahman Bedirhan davasından geriye çekilmemiş ve gazetesinin yayınını sürdürmüş,

---

(11) Yukarıda yazdığımız bu tarihler, ilk bakışta okuyuculara biraz garip gözükebilirler. Okuyucuların buna şaşmaması için dikkatlerini şu konuya çekmemiz gerekir ki, **"Kürdistan"**da kullanılmış olan Rumî takvime göre yılın son ayı Şubat ayıdır, yeni yılın başlangıcı da Mart ayıdır.

(12) **Kürdistan,** sayı 6, s. 2.

öylece Abdülhamid'e âdeta meydan okumuştur. Kendisi gazeteyi yayınlamakla da kalmamış, Abdülhamid rejiminin zulüm ve baskılarını da **"Kürdistan"**ın sayfalarında gözler önüne sergilemiştir. O sergilemeyle de yetinmemiş, Kürd halkına seslenerek o baskıya karşı ayaklanıp direnişe geçmesini de istemiş ve öylece Kürd halkını direnişe ve başkaldırmaya teşvik etmiştir.

O nedenle, tahmin edilebilir ki Abdurrahman Bedirhan kendini güvenlik içinde görmemiş, Abdülhamid'in ajanlarından korku ve kaygı duymuş, o kaygı nedeniyle de o kadar yer değiştirmiş ve gazetesini o kadar oradan oraya taşımıştır.

*

Burada önemli ve ilginç olan nokta, o taşınmalardan anlaşılan güçlüklere karşın Abdurrahman Bedirhan'ın davasından vazgeçmemiş ve geriye çekilmemiş olmasıdır. Tam tersine, tüm güçlüklere irade ve kararlılıkla göğüs germiş ve gazetesinin yayınını sürdürmüştür; tıpkı, bir çocuğunu fırtına ve tipiden kaçırıp şuradan şuraya, oradan oraya, bir yerden bir başka yere, oradan da daha güvenilir bir yere götüren şefkatli bir baba gibi, Abdurrahman Bedirhan öylece şefkatle **"Kürdistan"** gazetesini kucaklayıp bir yerden bir yere dolaştırmış ve yayınını dört yıl sürdürmüştür. Kim bilir o yolda ne kadar acı çekmiş, ne kadar zahmet görmüş, ne kadar fedakârlık yapmıştır! Hiç kuşku yok ki o da, kendisinin sağlam ve eksiksiz inancından gelmiştir. Anısının önünde takdirle ve saygıyle eğilinmeye ve kendisine can-ü gönülden teşekkür edilmeye lâyıktır!

"KÜRDİSTAN"IN KÜRDİSTAN'DAKİ YANKISI

Öyle anlaşılıyor ki **"Kürdistan"** gazetesinin yayınlanması, hem Kürdistan'da ve hem de Kürdistan'ın dışındaki Kürdler arasında geniş bir yankı yapmış ve büyük bir sevinç yaratmıştır. Gazeteye gönderilmiş ve bazı sayılarında yayınlanmış olan bazı mektup ve beğencelerden, o yankı ve sevinç açıkça görülmektedir.

"**Kürdistan**"da yer alan Türkçe yazı ve haberlere gelince; bunların tümü, "Osmanlıca" diye adlandırılan o zamanki Türkçe ile yazılmıştır. Osmanlıca olarak yazılmış yazı ve haberlerin hepsini önce Arap harflerinden Latin harflerine, sonra da Osmanlıcadan yeni Türkçeye çevirdik. Her sayının yeni Türkçe ile olan yazı ve haberlerini, o sayının sonuna yerleştirdik. Örneğin 25. sayı açıldığında, önce o sayının Latin harflerine çevrilmiş olan Kürdçe ve Türkçe çevirileri görülür; onların bitiminden sonra, Osmanlıca yazı ve haberlerin yeni Türkçe çevirileri görülür; onların bitiminden sonra 25. sayı tamamlanır ve 26. sayı başlar.

Öte yandan, gerek Osmanlıca yazı ve haberlerde, gerekse onların yeni Türkçe ile çevirilerinde, açıklanması gereken konular, olaylar, sözcükler ya da düzeltilmesi gereken yanlışlar vardı. Biz bunlar için de Türkçe dipnotlar yazdık. Dipnotların sıra numaralarını dillere göre değil, sayılara göre koyduk; yani her sayıdaki Kürdçe, Osmanlıca ve yeni Türkçe yazı ve haberlerin dipnotlarının sıra numaraları, o sayının başından sonuna kadar birbirlerini izleyerek sürer ve sayının sonunda sona erer.

SAYFA NUMARALARININ VE TARİHLERİN YAZILIŞI

Latin harfleriyle yapılan çevirilerin sayfaları ile yeni Türkçeye yapılan çevirilerin sayfalarını ayırt etmek için, Latih harfleriyle olan çevirilerin sayfa numaralarını sayfaların altında ve ortada, normal rakamlarla yazdık; örneğin şöyle: "1, 2, 3, 4, 5. . ." Yeni Türkçe ile olan çevirilerin sayfa numaralarını ise, yine sayfaların altında ve ortada, fakat Roma rakamlarıyle yazdık; örneğin şöyle: "I, II, III, IV, V. . ."

Bu sayılardan başka, Latin harfleriyle olan çevirilerin ve yeni Türkçe ile olan çevirilerin tüm sayfaları için de sayfaların alt köşelerinde sürüp giden zincirleme sayfa numaraları yazdık.

Böylece, sayfaların durumu şöyle oldu:

Sayfaların ortalarında yer alan normal sayfa numaraları, gazetenin her sayısının sonunda sona eriyorlar ve o sayıdan sonraki sayının başında yine "1" sayısından başlıyorlar; yeni Türkçe ile olan çevirilerin sayfa numaraları da, yine her sayının çevirilerinin sonunda sona eriyorlar ve bir sonraki sayının yeni Türkçe çevirilerinin başında yine "I" sayısından başlıyorlar. Sayfaların köşelerinde yer alan numaralar ise, zincirlemedir ve birbirlerine bağlıdırlar; Kürdçe "Pêşkêşî"nin yani "Sunuş"un başından **"Kürdistan"** gazetesinin son sayfasına kadar birbirini izleyerek sürüp gidiyorlar.

*

Başka bir konu da tarihlerin yazılışıdır.

"Kürdistan" gazetesi çıktığı zaman, Osmanlı devletinin sınırları içinde kullanılan resmî tarih Rumî tarihti. **"Kürdistan"** çıkmaya başladığı zaman Rumî tarih 1314 idi, ki Milâdî tarihe göre 1898 olur; gazetenin son sayısı çıktığı zaman ise, Rumî tarih 1318 idi, ki Milâdî tarihe göre 1902 olur.

"Kürdistan" gazetesinin tüm sayılarının başında hem resmî olan Rumî tarih kullanılmış, hem de onun yanında resmî olmayan Hicrî tarih yazılmıştır. Yazıların ve heberlerin içinde ise, yalnız Rumî tarih yer almıştır.

Okuyucuların o tarihleri Milâdî tarihe göre karşılıklarını kolaylıkla anlayabilmelerini sağlamak için, bütün tarihlerin Milâdî tarihe göre karşılıklarını dipnotlarla bildirdik.

EKSİK SAYILAR

"Kürdistan" gazetesinden, tüm dünyada yalnızca bir koleksiyon günümüze ulaşmıştır. O koleksiyon da Almanya'da Marburg kentindeki Devlet Kütüphanesinde, Almanca adıyle "Staatsbibliothek"te bulunmaktadır. Bildiğimiz kadarıyle, o koleksiyondan başka **"Kürdistan"** gazetesinin hiç bir sayısı başka bir yerde yoktur.

Biz, işte o koleksiyonda bulunan sayıların mikrofilmlerini alarak kâğıda geçirdik ve üzerinde çalışıp hepsini Latin harflerine çevirdik. Ayrıca o filmlerden, gazetenin Arap harfleriyle olan orijinal sayılarını da yeniden bastık. Böylece, **"Kürdistan"** gazetesinin bizim tarafımızdan Latin harflerine yapılan çevirileri ile Arap harfleriyle olan orijinal sayıları, yan yana yayınlanmış olmaktadır.

O koleksiyonda 26 sayı bulunmaktadır. Koleksiyondaki son sayı, 31. sayıdır. Ama ne yazık ki bazı sayılar eksiktir. Eksik sayılar şunlardır: 10, 12, 17, 18, 19. Bu sayılar hakkında hiç bir yerde bilgi edinemedik.

Marburg Devlet Kütüphanesinde bulunan koleksiyondaki sayıların sonuncusu, dediğimiz gibi 31. sayıdır. Burada akla şöyle bir soru gelmektedir: Acaba **"Kürdistan"** gazetesi bu kadar mı çıkmıştır?

Ne yazık ki bu sorunun yanıtı bulunamıyor. Çünkü bu sorunun aydınlatılması konusunda elimizde hiç bir belge yoktur. **"Kürdistan"** gazetesinin 31. sayıdan sonra da yaşamını sürdürmüş olduğu tahmin edilebilir. Çünkü 31. sayıda gazetenin kapatılması konusunda bir şey yazılmamıştır. Eğer sahibi, yayınını durdurmaya karar vermiş olsaydı ve 31. sayıdan sonra artık çıkarmasaydı, kuşku yok ki son sayı olacak olan 31. sayıda o kararını açıklayıp okuyucularına bildirirdi. O'nun ansızın ve okuyucularını haberdar etmeksizin gazetesini kapatmış ve yayınını sona erdirmiş olduğu tahmin edilmemektedir. Eğer gazete 31. sayıdan sonra da yayınlanmışsa, çok yazık ki 31. sayıdan sonraki sayıları kaybolmuşlar ve günümüze ulaşamamışlar, elimize geçmemişlerdir.

Başka bir olasılık da akla gelmektedir, o da şudur: 31. sayıdan sonra Abdurrahman Bedirhan'ın önüne hesapta olmayan birtakım güçlükler ve engeller çıkmış ve **"Kürdistan"** gazetesinin yayınını sürdürmesini engellemiş olabilirler. Bu olasılık üzerine düşünülürse, o zaman denilebilir ki kendisi gazeteyi yayınlamayı sürdürmekte kararlıydı ve o nedenle 31. sayıda yayınını durdurmak konusunda bir şey yazmamıştır; ne var ki 31. sayıdan sonra yayınını sürdürememiş, gazeteyi kapatacağını duyurması olanağı da kalmamış, öylece gazetenin yayını ansızın durmuş ve son bulmuştur.

*

Her ne ve nasıl olursa olsun, **"Kürdistan"** gazetesi, ilk Kürd gazetesi olarak Kürd ulusunun tarihinde şerefli yerini almıştır; Kürd ve Kürdistan semalarında bir yıldız gibi dört yıl süreyle parlamış, sonra da kayan ve gözden kaybolan bir yıldız gibi gözden kaybolup gitmiştir; ama arkasında aydın ve parlak bir iz bırakmıştır.

O'nun anısı önünde ve her iki sahibi Mikdad Midhat Bedirhan ile Abdurrahman Bedirhan'ın anıları önünde saygı ile baş eğmeliyiz ve onları her zaman şükranla, iyilikle ve minnettarlıkla anmalıyız.

11/11/1990
M. Emin Bozarslan

Нажим на Ирак

ВАШИНГТОН, 10. (Соб. корр. «Правды»). «Высокая мораль» Вашингтона, которую он всякий раз ставит в пример остальному миру, часто оказывается на поверку упражнением в лицемерии.

Сенат конгресса США единогласно одобрил суровые экономические санкции в отношении Ирака, обвинив его в «грубом нарушении международных законов». Законодатели запрещают предоставление этой арабской стране кредитов, продажу оборудования для нефтяной промышленности, закупки иракской нефти, а также обязывают США выступать в международных финансовых организациях против предоставления Багдаду займов.

Чем же насолил Ирак американским сенаторам? Конкретно речь идет о весьма расплывчатых, туманных сообщениях, согласно которым он применил отравляющие вещества в военных операциях против курдских повстанцев. Эти сообщения основываются на показаниях неких курдских беженцев.

Никаких более существенных свидетельств у Вашингтона нет. Хотя госсекретарь Шульц, другие официальные лица в последние дни неоднократно выступали с обвинениями в адрес Ирака, здесь обратили внимание на то, что представитель внешнеполитического ведомства США Ч. Редмэн упорно отказывался обсуждать вопрос о том, на чем основываются подобные обвинения.

С таким же завидным упорством администрация и конгресс проигнорировали сделанное на пресс-конференции в американской столице заявление государственного министра Ирака по иностранным делам С. Хаммади, авторитетно и категорически опровергшего всякие домыслы насчет применения химического оружия. Его просто не захотели слушать, потому что преследуют совсем иные своекорыстные цели. Вряд ли будет ошибкой сказать, что одна из них — политико-экономический нажим на Ирак, попытка обеспечить его «сговорчивость».

Как бы то ни было, одобренная сенатом акция поступает сейчас на рассмотрение палаты представителей, которая, как ожидается, также ее поддержит. Инициаторы мер рассчитывают, что Ирак почувствует на себе эффект почти немедленно — страна накопила огромный долг в 60 миллиардов долларов. Экспорт иракской нефти в США минимален, но Багдад получает 800 миллионов долларов в виде кредитов.

В. ГАН.

"Pravda" gazetesinin yazısı, 11/09/1988.

SUNUŞ'UN İÇİNDEKİLER

BÖLÜM I

"KÜRDİSTAN" GAZETESİ ÜZERİNE GENEL BİLGİLER

SAYFA(1)

Osmanlı imparatorluğu içinde ulusalcılık fikrinin yayılması 59

Mikdad Midhat Bedirhan ve ilk Kürd gazetesi 59

"Kürdistan" gazetesinin amacı 61

"Kürdistan" gazetesinin dili 61

Gezgin gazete 62

Tam ve sağlam inanç 64

"Kürdistan"ın Kürdistan'daki yankısı 65

Abdülhamid rejiminin **"Kürdistan"** gazetesi üzerindeki baskıları 67

Gitti padişahlar rejimi, geldi paşalar rejimi 70

BÖLÜM II

"KÜRDİSTAN" GAZETESİNİN İÇERİĞİ

"Mem û Zîn", **"Kürdistan"**ın sayfalarında 73

Botan beylerinin tarihi 74

Kürd halkının uyandırılması ve bilinçlendirilmesi 75

Ulusalcılık ve yurtseverlik 76

Osmanlı sınırları içinde ulusalcılık ve yurtseverlik 78

Egemen ülkelerdeki yasaların değişmesi, ezilen ulusların derdine derman olamaz 82

(1) Buradaki sayfa numaraları, sayfaların ortalarındaki numaralara göre değil, sayfaların köşelerindeki zincirleme numaralara göre konulmuştur.

www.metewe.com

Abdülhamid rejimine karşı mücadele ve direniş çağrısı 88
Kürdistan'da Hamidiye Alaylarının kurulması 92
Kürdlerle Ermenileri nasıl karşı karşıya getirmişler? 93
Kürdistan için Rus tehlikesi 97
Diğer konular 99
Hacı Kadir'in vefat haberi de **"Kürdistan"** gazetesinde 101

BÖLÜM III

YENİ BASIMIN TANITILMASI

"Kürdistan" gazetesi üzerine bizim yaptığımız çalışmalar 103
Sayfa numaralarının ve tarihlerin yazılışı 104
Eksik sayılar 104

www.netewe.com

KURDİSTAN

ROJNAMA KURDÎ YA PÊŞÎN ❊ İLK KÜRD GAZETESİ

1898—1902

Cild I

Wergêr
ji tîpên Erebî
bo tîpên Latînî:

Arap harflerinden
Latin harflerine
çeviren:

M. EMÎN BOZARSLAN

www.netewe.com

Sazkarê rojnama **"Kurdistan"**

MÎQDAD MÎDHET BEDİRXAN

"Kürdistan" gazetesinin kurucusu

MİKDAD MİDHAT BEDİRHAN

www.netowe.com

Heçî
kaxizek
vê rêke,
divê rêket
Misrê
ser navê
xweyîyê
vê cerîdeyê
lawê
Bedirxan Paşa
Mîqdad Mîdhet Begê

*

Her car
du hezar cerîdeya
bê pere ez'ê rêkim
Kurdistanê,
de bidin xelkê

*

Pazde roja carekê
têt nivîsandin

KURDİSTAN

1315

Kürdleri îkaz
ve
tahsil-i sanayiye
teşvik için
şimdilik
on beş günde bir
neşrolunur
Kürdçe gazetedir

Unvan:
Mısır'da
"Kürdistan"
Gazetesi
Sahib ve Muharriri
Bedirhan Paşazade
Mikdad Midhat

*

Her tab'ında 2000 nüsha
Kürdistan vülât-ı izamına
irsal ve vesatetleriyle
kura ve kasabâta
neşr-ü tamim olunacaktır

*

Kürdistan haricinde
her yer için
senelik abone bedeli
80 kuruştur
Kürdistan dahilinde
hususî isteyenlere
meccanen gönderilir

Roja pêncşemê de 30 Zulqe'de sene 1315 * Pencşenbe fi 9 Nisan sene 1314(1)

BÎSMÎLLAHÎRREHMANÎRREHÎM

Sed hezar şikir û hemd ji Xwedê teala re, em Musulman xelq kirin(2) û zanîna ilm û marîfetê re hiş û zeka da me. Derheqa elimandina ilm û marîfetê re gelek ayetên celîle û ehadîsê şerîfe henin.(3) Dinyayê de çi qas Musulman hebin, gund û bajêrên hemîya de mekteb û medrese û cerîde henin.(4) Dinyayê de çi dibe çi nabe, cerîde dinivîsin. Heyfa min têt ji Kurda re.(5) Kurd ji gelek

(1) 1315 tarîxa Hîcrî ye, 1314 tarîxa Romî ye; li gora tarîxa Mîladî 22 Nîsan 1898(1315 Hicrî tarihtir, 1314 Rumî tarihtir; Milâdî tarihe göre 22 Nisan 1898).
(2) Xelq kirin: Afirandin.
(3) Celîle: Gewre, mezin, qedirbilind.
Ehadîs: Piranîya "hedîs" e, yanî "peyvên Pêxember".
Şerîfe: Bişeref, pîroz, qedirbilind.
(4) Cerîde: Rojname.
(5) Heyf: Xebînet.

qewma zêdetir xweyhiş û zeka ne,(6) camêr in, dînên xwe de rast û qewî ne, xurt in; û dîsa weke qewmên dî ne xwenda ne, ne dewlemend in; dinyayê de çi dibe, cîranê wan Mosqof çawa ye, wê çi bike, nizanin. Loma, rîya Xwedê de min ev cerîdeya ha nivîsî. Bi îzna Xwedê teala paş nuho,(70) her pazde roja de carekê ez'ê cerîdekê binivîsim. Navê vê min kirîye **"Kürdistan"**.

Vê cerîdeyê de ez'ê behsa qencîya ilm û marîfeta bikim; li kuderê mirov dielime, li kurderê medrese û mektebên qenc hene, ez'ê nîşa Kurda bikim;(8) li kuderê çi şer dibe, dewletên mezin çi dikin, çawa şer dikin, tîcaret çawa dibe; ezê hemîya hîkat bikim(9).

Heta nuho kesê cerîdekê holê nenivîsîye. Ev cerîdeya min a ha, ya ewwulî ye.(10) Loma wê gelek kêmayî hebitin. Ez hêvî dikim kêmayîya cerîdeyê ji min re binivîsin. Hemî tişt wekî nû çêdibin kêm in,(11) paşê hingî diçe dikeve rê de.

Eve êdî ez'ê dest meqsedê bikim. We mînellahîttewfîq!(12)

*

Hezretê Pêxember, eleyhîssalatu wesselam, gotîye "el'ulemau weresetul'enbîyaî"; ango "ulema warisên enbîya ne",(13) ji terefê Xwedê de me'mûr in wa'z û nesîhetê bidin xelkê,(14) rîya qenc nîşa wan bikin. Loma, gelî ulemayên Kurda, çawa un wa'z û nesîheta nimêjê didin,(15) welê divê un mîr û axa û Kurmancên dinasin,(16) wan teşwîqa zanîna ilm û marîfetê bikin,(17) rîya qenc nîşa wan bikin. Heki un wê nekin,(18) gunehê hemîya stûyê we ye.

Dîsa Hezretê Pêxember, eleyhîsselam, gotîye "el-ilmu ilman, ilmul-ebdan we ilmul-edyan"; ango "ilm didu ne, yek jê ilmê bedena ye, yek jî ilmê dîn û îmanê ye". İlmê bedena, hekîmî ye.

---

(6) Xweyhiş û zeka ne: Xwedîhiş û xwedîzeka ne, hiş û zekaya wan temam e.
(7) Paş nuho: Piştê nuha, ji nuha pê ve.
(8) Nîşa Kurda bikim: Nîşanê Kurdan bidim, bînim ber çavên wan.
(9) Hîkat bikim: Hîkayet bikim, wek çîrokan qala wan bikim.
(10) Ewwulî: Ewilî, Pêşîn. Ev peyvik ji peyvika "ewwel" a Erebî hatîye guhartin.
(11) Wekî nû çêdibin: Dema ku nû çêdibin, wextê ku nû çêdibin.
(12) We mînellahîttewfîq: Lêkanîn ji Xwedê ye, tenê Xwedê dişê karê mirov lêk bîne, li hev bîne.
(13) Ulema: Piranîya "alim" e, ew jî bi mana "zanyar" e.
Enbîya: Piranîya "nebî" ye, ew jî bi mana "Pêxember" e.
(14) Me'mûr: Berferman, kesê ku jibo karek ferman lê hatîye kirin.
(15) Un: Hun.
(16) Welê: Wisa.
(17) Teşwîq: Hewisandin, çêkirina hewesa karek, yan jî tiştek di dilê mirovan da, ku mirov wan bihewisîne jibo wî karî, yan jî wî tiştî.
(18) Heki: Eger.

Gelî mîr û axano!(19) Heta nuho kî ji we guh daye vî emrê Pêxember! Kî ji we zarûyên xwe, birayên xwe, mirovên xwe rêkirine dane xwendin! Kî ji we gundê xwe de, bajêrê xwe de mektebek, medresekek daye çêkirin! Gelî ulemano! Un çire wan hedîsa ji mîr û axa re naxwînin!(20) Un çire cerîdeyên Erebî naxwînin, da un bizanin dinyayê de çi dibe!

Dîsa Hezretê Pêxember, eleyhîsselam, gotîye "el-kasîbu hebîbullah"; ango "mirovê kesb û karî bike, Xwedê teala hejwan dike".(21) Ew mirovê ne xwenda be, nizane cerîdeya bixwîne; ew mirovê cerîdeya nexwîne, nizane li kuderê tîcaret qenc dibe. Cerîdeyên nuho tên nivîsandin, behsa hemî tişta dikin; mirovên wan bixwînitin, wê bizanibe malê destê wî de li kuderê pera dike.

*

Van salên ha de İstanbulê mektebek hatîye çêkirin. Navê vê mektebê "Mekteba Eşîra" ye; xêrê zarûyên eşîra zarûyên kesê qebûl nakin.(22) Ji Bexda û Şamê, ji Yemenê, Şemmer û Enze hemî zarûyên xwe rêdikin İstanbulê;(23) vê mekteba eşîra de dixwînin, her sal du heyva diçin malên xwe, paşê dîsa tên. Şeş-heft sala de alimên qenc ji wan derdikevin, paşê duyîn diçin gund û bajêrên xwe.(24) Dewlet her heyv pera dide wan. Dibin me'mûr, hêdî hêdî dibin muteserrif, dibin walî.(25)

Gelî mîr û axano! Gunehê zarûyên we wê stûyê we be. Un jî zarûyên xwe rêkin bidin xwendin. Dewlemendên we bila gunda de mekteba çêkin, rîya Xwedê da xêra bikin.

Dîsa Hezretê Nebî(26) eleyhîsselam, gotîye "el-herbu xid'etun".(27)

Gelî mîr û axa û Kurmancno! Dinya zane Kurd camêr in. Lê vî zemanê ha de şer bi camêrî tenê nabitin. Top û tifingên we ecêb derketine,(28) hew qa dûr diçin, cihê mirov dengê wan nebihîst gulle û berikên wan diçin, mirova dikujin. Cihê mirov jê wek teyra dixuyî, berikên van tifinga diçe dikuje. Ev

---

(19) Awayê rast ê vê pevekê yan "gelî mîr û axan" e, yan jî "mîr û axano" ye. Lewra peyvika "gelî" bangok e, tîpa "o" jî pêveka bangê ye û karê her du yan yek e. Ji ber vê yekê, di yek pevekek da her du nayên karanîn, divê ku yek ji wan bê karanîn.

(20) Çire: Çima.

(21) Hejwan dike: Hez ji wan dike, wan dievîne.

(22) Xêrê zarûyên eşîra: Ji bil zarûyên eşîran, xeyn ji zarûyên eşîran.

(23) Şemmer û Enze: Ev du eşîrên Ereban bûne, li Sûrîyê jîyane.

(24) Paşê duyîn: Ev her du peyvik di eslê rojnamê da weha hatine nivîsîn. Bi dîtina me di wan da şaşîya rêzkirinê heye û awayê wan ê rast "paşîya dûwayîn" e, yanî "paşîya paşîn".

(25) Me'mûr: Kesê ku di karê dewletê da dixebite, karbidestê dewletê.
Muteserrif: Di dewra Osmanîyan da kargêrekî dewletê bûye, dereca wî di navbera qaymeqam û walî da bûye, cîyê ku di binê kargêrîya wî da bûye jî jê ra hatîye gotin "senceq".

(26) Hezretê Nebî: Hezretê Pêxember.

(27) "El-herbu xid'etun": Şer xapandin e, yanî "divê ku mirov di şer da dijminê xwe bixapîne, dek û dolaban li serê wî çeke, fen û fûtan lê bike û bi wî awayî wî zorbirî bike".

(28) We ecêb: Wisa ecêb.

top û tifingên ha, bê mekteb û medrese mirov ne dikare çêke, ne dikare biemilîne.(29) Loma, bê van top û tifinga, cesûrîya we wek mirovên destgirêdayî ne.

Li **Mushefa** şerîf de(30) emir bûye "cahîdû fî sebîlîllah"; ango "rîya Xwedê de şerî bikin, dişminên dîn re cîhadê bikin". Dişminê dînê we, cîranê we Mosqof e. Heta nuha Mosqof gelek der zebt kirine, Musulman File kirine. Dor wê têt Kurdistanê.(31) Heki we jî xwend, un elimîn tîcareta û sin'eta, heki un dewlemend bibin, un'ên bikaribin xwe ji şerê wî xilas bikin.(32) Heki we guh neda van nesîhetên min, heki dîsa hun şivanî û rencberîyê tenê bikin, zemanek hindik de Kurdistan wê yekcar xira bibe. Cîranê we Ecem jî berê wek Kurda bî.(33) Vî zemanê paşî ewan jî qenc zanîn bê ilm û huner nabitin. Ecema gelek mekteb û medrese henin, ewladên xwe rêdikin welatên dûr didin xwendin. Nuho jî ji begzadeyên Ecem sê-çarek İstanbulê li Mekteba Herbîyeyê de ne.(34)

Gelî mîr û axano! Qenc fekirin dora xwe!(35) Un hingî diçe feqîr û kêm dibin. Sebeb cahilîya we ye. Elhemdu lîllah gelek mekteb û medrese henin. Rîya Xwedê de(36) zarûyên xwe rêkin bidin xwendin, ji vê cahilîyê xilas bibin, dinya û axreta xwe mamûr bikin.(37) Xelk dibêjin "heki Kurd bixwînin, wê ji alemê xurttir û dewlemendtir bibin".(38)

Dîsa Hezretê Nebî, eleyhîsselam, gotîye "utlubul'l-ilme welew fî's-Sîn"; ango "ilim Çînê bitin, herin wê derê bixwazin, bielimin".(39)

Gelî mîr û axano! Ez ji we dipirsim: Kî ji we heta nuho mirovek xwe rêkirîye kuderê, da bixwînit! Elhemdu lîllah Bexdayê, Şamê, İstanbulê mekteb û medreseyên hukumetê hene, bêmesref in; heçî ji we zarûyên xwe teslîmê hukumetê biket, bê mesref wê rêkin bidin xwendin.

*

Berî du-sê sala dewleta Çîn û Japonyayê şer kirin. Eskerê Çînê deh cara ji eskerê Japonyayê zêdetir bî. Hemî şera de, Japonyayê karî eskerê Çînê.(40) Werin, vê carê sebeba vî halî bipirsin: Mirovên Çînê cahil in, miro-

---

(29) Biemilîne: Bi kar bîne.

(30) **Mushef: Qur'an.**
Mushefa şerîf: **Qur'ana** xwedîşeref a qedirbilind.

(31) Dor wê têt Kurdistanê: Dor wa ye tê ser Kurdistanê, êdî dora Kurdistanê ye, Mosqof êdî dixwaze Kurdistanê dagir bike.

(32) Un'ên bikaribin: Hun'ê bikarin, hun dê bikarin, hun dê bişên.

(33) Ecem: Îranî, Faris.

(34) Begzade: Mîrza, kurên mîran.

(35) Fekirin dora xwe: Li dora xwe bifekirin, li dora xwe binêrin.

(36) Rîya Xwedê de: Di rîya Xwedê da, jibo xatirê Xwedê.

(37) Mamûr bikin: Ava bikin, şên bikin.

(38) Dewlemendtir: Awayê rast "dewlementir" e. Lewra dema ku tîpên "d" û "t" rastê hev tên, tîpa "d" dikeve.

(39) Bielimin: Fêr bibin.

(40) Karî eskerê Çînê: Karî bi eskerê Çînê, karî eskerê Çînê zorbirî bike.

vên Çînê tişkî nizanin,(41) mirovên Çînê nizanin top û tifingên vî zemanî biemilînin.(42) Eskerê Japonyayê, top û tifingên xwe ew xwe çêdikin;(43) hemî dera re tîcaretê, kesb û karî dikin. Loma dewlemend in. Saya dewlemendîya xwe, sîlahên kêm zûka ji derên dûr kirîn û xweş xweş şerên xwe kirin, karîn dişminên xwe. Nuho hemî malên xwe rahet in,(44) kes nikare xwe bide ser wan.

*

Ez gelek dera gerîyame, nuho jî li Misrê me. Hemî dera zarûyên Çerkes û Arnawud û Ereba dibînim;(45) babên wan, birayên wan rêdikin mekteba, didin xwendin. Li Misrê, Camia Ezher de(46) rastê hin Kurdên Sora hatim; hin ji Kerkûkê ne, hin ji milê Silêmanîyeyê ne; hemî dixwînin. Ez tu cara li tu dera rastê mirovên eşîretên Kurda nehatime; ez çi qas rastê mirovên van eşîreta têm, hemî jî rencber in, jar û reben in, sin'etekî, hunerekê nizanin.

Berî şêş heyva ez nesax bîm.(47) Loma vê zivistanê ez hatim Misrê. Misir bîye bajêrek hew qas mezin û xweş,(48) heta mirov nebîne mirov nikare bi wesfa wê bizanibe. Ez hêdî hêdî ketim nêv Misrîya de, elimîm hal û sin'etê wan, kesb û kara wan.(49) Ev xelkên Misrê mirovên bêzirrav in,(50) ne camêr in, lê gelek dişixulin, nawestin; li kuderê mekteb û medresek qenc hebit, nabêjin dûr û nêzîk e, zarûyên xwe rêdikin, didin xwendin, dielimin sin'eta, dielimin hemî tişta. Nuho nêva Misrê da ji xelkê Misrê hew qas xwenda û alim hene, hew qas mirovên xweysin'et û huner hene, gelek miûzîyê bajêr ew xwe çêdikin.(51) Nêv Misrîya de mirov hene, top û tifinga çêdikin; mirov hene xanîyên pêncî mezel ava dikin;(52) nêv wan xwey-

(41) Tişkî nizanin: Tiştek nizanin.
(42) Biemilînin: Bi kar bînin, bişixulînin.
(43) Ew xwe çêdikin: Ew bi xwe çêdikin.
(44) Hemî malên xwe rahet in: Hemî li malên xwe hêsa ne.
(45) Arnawud: Neteweyekî Ewrupî. Ji welatê wî ra tê gotin "Arnawudistan", ku li jêrê Ewrupayê, li qeraxê deryaya Adrîyatîk dikeve. Di hin zimanan da ji wî neteweyî ra tê gotin "Alban", ji welatê wî ra jî tê gotin "Albanya".
(46) Camia Ezher: Ev navê zanîngeheka Misrê ye, ku tê da dersa zanyarîyên dînî tê dayin.
(47) Nesax bîm: Nesax bûm, nexweş bûm.
(48) Nivîskar li vir jibo Misrê gotîye "bîye bajêrek hew qas mezin". Lê belê, divîya ku bigota "bûye welatekî ew qas mezin". Lewra Misir welatek e, ne bajarek e.
(49) Kara wan: Peyvika "kar" li vir bi awayê mêyîn, yanî bi awaye "kara" hatîye nivîsîn. Lê belê, bi dîtina me, awayê rast li vir, awayê nêrîn e û divîya ku peyvik bi awayê "karê" bihata nivîsîn. Lewra ev peyvik dema ku bi mana "mefa û qazancê" bê, mêyîn e û pêveka "a" distîne û bi awayê "kara" tê gotin û nivîsîn; lê dema ku bi mana "mijûlayî û şixul" bê, hingê nêrîn e û pêveka "ê" distîne û bi awayê "karê" tê gotin û nivîsîn. Li vir jî wisa tê zanîn ku bi mana "mijûlayî û şixul" hatîye; ji ber wê yekê, divîya ku bihata gotin "karê wan".
(50) Bêzirrav: Newêrek, tirsonek, bêcesaret.
(51) Miûzî: Îhtîyac, tiştê ku ji mirov ra hemin pêwîst e, lazim e.
Ew xwe çêdikin: Ew bi xwe çêdikin.
(52) Mezel: Ev peyvik ji peyvika "menzel" a Erebî hatîye kurtkirin û li hin hêlên Kurdistanê bi mana "ode" tê karanîn.

sin'eta de mirov henin, rojê pêncî-şêst çerxîya distînin;(53) mal û xanîyê hemîya xweş in, hemî xweyxadim û xulam in;(54) û nêv wan de nexwendayê(55) reben jî hene, lê hindik in.

Gelî mîr û axayên Kurmanca! Ez ji we dipirsim; Ji xelkê Misrê çi kêmayîya we heye! Kurd ji Misrîya camêrtir in, hiş û aqilê wan zêdetir e, hemî texlîda Kurd ji Misrîya qenctir in.(56) Dê vêca(57) çire xelkê Misrê wê ji Kurda dewlemendtir bin! Li Misrê hin Kurmanc hene, bihîstine ku ez hatime Misrê, hemî jî hatine zîyareta min, min halê hemîya pirsî, hemî jî dergevanî û xulamîya Misrîya dikin, hemî jî binê mineta wan de ne; hina jî bêedebî kirine, ji cihê xwe derêxistine, jar û reben bîne;(58) heki xwenda bîna, heki destê wan de jî hunerek, sin'etek hebîya, holê jar û reben nedibîn; heyfa min têt, ji dergevanîyê, xulamîyê pê ve kêrê tişkî nayên.

*

Gelî ulema û mîr û axayên Kurda! Un hemî esl û neslê min dizanin. Ceddê min Hezretê Xalid îbnî Welîd e, redîyellahu teala enhu,(59) eşîra me Botan in, şuhreta nesla me Ezîzan in. Ez rîya Xwedê de dixebitim, min ev cerîde çêkir, vê rê de ez gelek pera serf dikim, zehmetê dikêşim. Meqseda min qencîya Kurda ye. Un jî ji xêra Xwedê re dest hilînin, Kurda bidin xwendin, zarûyên xwe bielimînin ilm û edebê, bielimînin sin'eta. Mirovên Musulman divê xwenda bin, divê bielimin dînê xwe.

Gelî ulemayên Kurda! Un çire camia(60) behsa xirabîya cahilîyê, qencîya ilmê nakin! Xwedê teala û Pêxember, eleyhîsselam, behsa ilm û cehlê çi emir kirine, un dizanin. Vana hemîya ji Kurda re wa'z bikin. Elhemdu lîllahî teala, eve ya dikeve para min ez dikim. Êdî ji ulemayên Kurda hêvî dikim, vê cerîdeya min ji mîr û axa û Kurmanca re bixwînin, derheqa elimandina ilmê de Xwedê teala û Hezretê Pêxember, eleyhîsselam, çi emir kirîye, ewî bikin aqilê wan de.(61) Ji mîr û axayên Kurda jî hêvî dikim,

---

(53) Çerxî: Yekîtîyeka diravan bûye, rûmeta wê pênc quriş bûye. Di wê demê da li hin hêlên Kurdistanê ji pênc qurişan ra dihat gotin "çerxî", ji pênc çerxîyan ra yanî ji 25 qurişan ra jî dihat gotin "kart".

(54) Xweyxadim: Xwedîxizmetkar, kesê ku xizmetkarên wî hene.

(55) Nexwenda: Awayê rast "nexwendî" ye. Lewra ev peyvik di rewşa erîn da pêveka "a" distîne û kesê ku xwendibe jê ra tê gotin "xwenda"; lê di rewşa neyîn da pêveka "î" distîne û kesê ku nexwendibe jê ra tê gotin "nexwendî".

(56) Texlîd: Tewir, awa. Yanî "bi hemî tewiran, bi hemî awayan Kurd ji Misrîyan qenctir in".

(57) Vêca: Vê carê, îcar.

(58) Hina jî bêedebî kirine: Wisa tê zanîn ku mexseda nivîskar li vir hin Misrî ne. Yanî xwestîye bêje ku "hin Misrîyan jî bêedebî kirîye û Kurdên ku ji wan ra dergevanî û xulamî dikirin ji cîyê xwe, ji karê xwe derxistine". Dibe ku peyvika "cih" di eslê xwe da "cem" be û bi şaşî weha derketibe. Eger wisa be, mana pevekê weha dibe: "Hinek Misrîyan jî bêedebî kirîye û Kurdên ku ji wan ra dergevanî û xulamî dikirin ji cem xwe derxistine".

(59) Redîyellahu teala enhu: Xwedayê mezin jê razî be.

(60) Un çire camia: Hun çima li camîyan, hun çima li mizgeftan.

(61) Bikin aqilê wan de: Têxin aqilê wan, bi wan bidin famkirin.

zarûyên xwe heta bibin deh-dozde salî gund û bajêrên xwe de bidin xwendin, bielimînin **Mushefa** şerîf û xwendina cerîdeya, ji wê paşê bikin mekteb û medreseyên İstanbulê, Şamê, Bexdayê, da Xwedê ji hemîya razî be, da un ji şerê dişminên xwe emîn bin, Xwedê qencî bide mileta Îslamê.

*

Nuha Sûdan û Misir şerî dikin. Mêrek Sûdanîya ji ber deh mêrên Misrîya ve ne;(62) dîsa eskerê Misrê dikare Sûdanîya. Em her roj cerîdeya de dixwînin, deh ji Misrîya tên kuştin, pêncî ji Sûdanîya tên kuştin. Sebeba vî, xelkê Sûdanê ne xwenda ne, xid'e û hîleyên şerên vî zemanî nizanin,(63) top û tifingên vî zemanî nînin, hebin jî nizanin biemilînin.

Cerîdeya paş vê, ez'ê şerê Sûdan û Misrê qenc binivîsim.

*

Par dewleta me(64) û Yunanîya şer kirin. Şikir ji Xwedê re, dewleta me karî Yunanîya; heyvekê de eskerê Îslamê şeş bajêrên mezin û ji seda bitir(65) gundên Yunanîya girtin. J'ew paşê(66) Mosqof ket nêva halî de, nehîşt em zêdetir biçin; me sulh kir.(67) Şeraitên(68) sulhê yek jî, Yunan wê çar milyon zêra bide dewleta me. Çiku hê ev pere nedan,(69) eskerê dewletê hê nêv bajêr û gundên wan de ne. Yunan wê van pera ji dewletên mezin deyn bike û bide dewleta me. Berî wî şerî, dewletên Filan gotin qey dewleta me ji bêperetî nikare tu kesî re şer bike. Şikir ji Xwedê re, dewletê çi qas vî(70) esker derêxist û karî dişminê xwe. Yunan dewleteke kiçik e.(71) Xwedê neke, heki dewletê nikaribîya Yunanî, File wê bivîna(72) yekcar dewleta Musulmanîyê ji dinyayê hilînin.(73) Lê wekî(74) heyvekê de me hew qas bajêr û gundên Yunan girtin, hemî dewlet man ecêbmayî ku hinde zû zû me karî wan.(75)

---

(62) Yanî "her mêrekî Sûdanîyan beranberê deh mêrên Misrîyan e, her mêrekî Sûdanîyan bi mêranîya xwe dihêje deh mêrên Misrîyan".

(63) Xid'e: Xap, dek û dolab, fen û fût.

(64) Mexsed ji "dewleta me", dewleta Osmanîyan e. Ji ber ku Kurdistan jî hingê parçeyek ji dewleta Osmanî bû, nivîskar weha gotîye.

(65) Bitir: Pirrtir, zêdetir. Ev peyvik li hin hêlên Kurdistanê weha, li hin hêlan jî bi awayê "pitir" tê gotin; lê li piranîya Kurdistanê bi awayê "pirrtir" tê gotin.

(66) J'ew paşê: Ji wê yekê paş ve, piştê wê rewşê, piştê wê bûyerê.

(67) Sulh: Aştî.

(68) Şerait: Piranîya "şert" e. Yanî, "yek ji şertên aştîyê".

(69) Çiku: Ev peyvikeka sazber e û ji peyvikên "çi" û "ku" hatîye sazkirin û bi mana "ji ber ku" tê. Yanî "ji ber ku hêj ev pere nedane".

(70) Çi qas vî: Çi qas vîya, çi qas xwest, çi qas daxwaz kir. Awayê rast ê vê peyvikê di dema çûyî da "vîya" ye, wek "jîya".

(71) Kiçik: Biçûk.

(72) Bivîna: Bixwestina, daxwaz bikirina.

(73) Dewleta Musulmanîyê: Mexsed jê dewleta Osmanîyan e.

(74) Wekî: Dema ku, wextê ku.

(75) Hinde zû zû: Ew qas zû zû, ew qas bi lez.

Çi qas Musulman ser dinyayê hebin, hemî arîkarîya jin û zarûyên eskerên vî şerî de hatin şehîdbîyîn, dikin.(76) Gelî Kurdno!(77) Ez we bibînim. Qasê destê we hat, pera bigîhînin hev, bidin muteserrif û walîyên we,(78) de rêkin İstanbulê. Ji hemî dera rêdikin İstanbulê. İstanbulê navê şehîda hemîya nivîsî ne, rêdikin jin û zarûyên wan re.

*

Ser dinyayê de tu qewm nemane nav û behsa Girîdê nebihîstin.(79) Ji mêj ve Girîd destê Musulmana de ye. Xelkên Girîdê, sê para yek jê Musulman in,(80) du par jî File ne. Tu cara File û Musulmanên wê derê bê şer nasekinin. Berî salekê dîsa dest şerî kirin. Vê carê şer gelek mezin bî, gelek gund û bajêr xira bîn, şewitîn, çiftlik neman,(81) yekcar xira bîn, gelek jin û zarûyên Musulmana hatin kuştin, gelek keçên Musulmana ketin destên Fila de, gelek ji wan keça bîn jinên Fila, gelek zarûyên Musulmana sê-çar salî dê-babên wan hatin kuştin, ew xwe ketin destên papazên Fila de, kirin mektebên xwe de, ev zarû hemî wê bielimin Filetîyê. Ev Fileyên ha ji cinsên Yunanîya ne. Heyfa min têt, gelek jin û zarû û mêr hatin kuştin, bîn File. Min çavê xwe(82) resma zarûkek Musulman dît, reben çar salî bî, Fila sê ciha birîndar kiribîn.

Heta nuho jî Girîdê şer ne kêm e. Çi qas Musulman hebin, gelek jê revîn welatên Musulmana. Hin jî hê mane Girîdê;(83) lê kes newêre biçe gundê xwe, hemîya xwe dane hev, bajêra de rûtînin;(84) Fila gund û zevîyên wan ji xwe re birine.(85) Nuha çi qas Musulman hebin, civîyê dikin,(86) ar(87) û cil û pera rêdikin ji Musulmanên Girîdê re. Rebena, hemî tazî û birçî mane.

*

Ez ji mîr û axayên Kurda hêvî dikim, derheqa qencîya Kurda de çi bêt bîra kî bila ji min re binivîsin, ez'ê vê cerîdeyê de binivîsim. Wek jora vê cerîdeyê min nivîsî, divê kaxizî rêkin ji min re Misrê.(88)

Li Misrê "Metbeet El-Hîlal" de tebi' bîye.(89)

(76) Hatin şehîdbîyîn: Hatin şehîdkirin, şehîd bûn. Yanî, "ew eskerên ku di vî şerî da hatin şehîdkirin, çi qas Musulman li dinyayê hene, alîkarîya jin û zarûkên wan dikin".
(77) Divîya ku yan bigota "gelî Kurdan", yan jî bigota "Kurdno".
(78) Divîya ku bigota "bidin muteserrif û walîyên xwe".
(79) Girîd: Giravek e di Deryaya Sipî da. Nuha di destê Yunanistanê da ye.
(80) Sê para yek jê: Ji sê paran yek, ji sê paran parek, ji sisîyan yek, sêyek.
(81) Çiftlik: Cotgeh, cîyê cot û xwedîkirina heywanan. Peyvika "çiftlik" Tirkî ye, li hin hêlên Kurdistanê ketîye zimanê Kurdî jî.
(82) Min çavê xwe: Min bi çavê xwe.
(83) Mane Girîdê: Mane li Girîdê, li Girîdê mane.
(84) Rûtînin: Rûdinên, dadinişin.
(85) Ji xwe re birine: Kirine malê xwe, dest dane ser wan û ji xwe ra kirine mal.
(86) Civîyê dikin: Civîn çêdikin, civat girêdidin, li hev dicivin.
(87) Ar: Ard.
(88) Awayê rast, "ji min re rêkin Misrê" ye.
(89) Yanî "li Misrê di 'Çapxana El-Hîlal' da çap bûye, hatîye çapkirin".

Herçî
bivê
kaxizek rêke,
divê rêke
Misrê
ser navê
xwedîyê
vê rojnamê
kurê
Bedirxan Paşa
Mîqdad Mîdhet Begê
*
Her car
du hezar
rojnaman
bê pere
ez'ê rêkim
Kurdistanê,
da ku bidin xelkê
*
Ji 15 rojan
carek
tê nivîsin

KURDİSTAN

1315

Kürdleri uyarmak
ve
zanaatlar öğrenimine
özendirmek için
şimdilik
15 günde bir
yayınlanır
Kürdçe gazetedir

Adres:
Mısır'da
"Kürdistan"
Gazetesi
Sahibi ve Yazarı
Bedirhan Paşaoğlu
Mikdad Midhat
*
Her baskısından
2000 tane
Kürdistan'ın
büyük valilerine
gönderilecek ve
onlar aracılığıyla
köyler ve kasabalara
dağıtılıp
yaygınlaştırılacaktır
*
Kürdistan dışında
her yer için
yıllık abone bedeli
80 kuruştur
Kürdistan içinde
özel isteyenlere
bedava gönderilir

Roja pêşemê 30 Zulqe'de sal 1315 * Perşembe 9 Nisan yıl 1314(2)

(1) Peyvên ku di serê rojnamê da jibo nasandina wê, nav û navnîşana xwedîyê wê, amanca wî ji weşandina wê û wd. li her du alîyên sernivîsara wê hatine nivîsîn, alîyek ji wan bi Kurdî ye, alîyek jî bi zimanê Osmanî ye. Jibo hêsankirina têgîhîştina van peyvan ji xwendevanan ra, me sernivîsara jimareya pêşîn a rojnamê wek numûneyek ji nû ve nivîsî; peyvên Kurdî yên ku li rexê sernivîsarê cî girtine, me ew wergerandin Kurdîyeka xwerû; peyvên Osmanî jî me wergerandin Tirkîya nû(gazetenin başında, onun tanıtılması, sahibinin ad ve adresinin, dergiyi yayınlamaktaki amacının vb. bildirilmesi için başlığın iki yanında yer alan sözlerin bir bölümü Kürdçe, bir bölümü de Osmanlıcadır. Okuyucuya bu sözlerin anlaşılmasını kolaylaştırmak için, gazetenin ilk sayısının başlığını örnek olarak aldık ve yeniden yazdık; buradaki Kürdçe sözleri sade bir Kürdçeye, Osmanlıca sözleri de yeni Türkçeye çevirdik).

(2) 1315 tarîxa Hîcrî ye, 1314 jî tarîxa Romî ye; li gora tarîxa Mîladî ev her du tarîx jî dibin 22 Nîsan 1898(1315 Hicrî tarihtir, 1314 ise Rumî tarihtir; her ikisi de Milâdî tarihe göre 22 Nisan1898 eder).

www.netewe.com

Heçî
kaxizek
vê rêke,
divê
rêket
Misrê
ser navê
xweyîyê
vê cerîdeyê
lawê
Bedirxan Paşa
Mîqdad Mîdhet Begê

*

Her car
du hezar
cerîdeya
bê pere
ez'ê rêkim
Kurdistanê,
de bidin xelkê

*

Pazde roja
carekê
têt
nivîsandin

KURDİSTAN

1315

Kürdleri îkaz ve
tahsil-i sanayiye teşvik için
şimdilik
on beş günde bir neşrolunur
Kürdçe gazetedir
(3)

Bazı ümera-i Ekradın arzularına mebnî
bundan böyle
ahval-ı cariye ve edebiyat-ı Kürdiyeden
dahi bahsolunacaktır
(4)

Gazetenin mesleğine muvafık
Arabça, Türkçe, Farisîce
mektublar
Kürdçeye bittercüme neşrolunur
(5)

(2)
Mısır'da
"Kürdistan"
Gazetesi
Sahib ve Muharriri
Bedirhan Paşazade
Mikdad Midhat

*

Her tab'ında
2000 nüsha
Kürdistan
vülât-ı izamına
irsal ve vesatetleriyle
kura ve kasabâta
neşr-ü tamim
olunacaktır

*

Kürdistan haricinde
her yer için
senelik abone bedeli
80 kuruştur
Kürdistan dahilinde
hususî isteyenlere
meccanen gönderilir

Roja pêncşemê de 14 Zulhîcce sene 1315 * Pencşembe fi 23 Nisan sene 1314(6)

(1) Nivîskar di jimareya pêşîn û vê jimareya 2'yan da peyvika "rûper" bi mana "jimare" bi kar anîye. Lê ji jimareya 3'yan pê ve li şaşîya xwe veaqilîye û êdî ew peyvik bi mana "rûpel" bi kar anîye.

(2) Gazetenin ilk sayısında ve bundan sonraki sayılarında burada "adres" demek olan Arapça "unvan" sözcüğü yer almaktadır. Ancak bu sayıda bu yer böyle boş çıkmıştır.

(3) Yukarıdaki satırların bugünkü Türkçeyle anlamı şöyledir: "Kürdleri uyarmak ve zanaatlar öğrenimine özendirmek için, şimdilik 15 günde bir yayınlanır Kürdçe gazetedir".

(4) Yukarıdaki satırların bugünkü Türkçeyle anlamı Şöyledir: "Bazı Kürd beylerinin arzuları üzerine, bundan böyle, olup biten durumlardan ve Kürd edebiyatından da sözedilecektir".

(5) Yukarıdaki satırların bugünkü Türkçeyle anlamı şöyledir: "Gazetenin tutumuna uygun Arapça, Türkçe, Farsça mektuplar, Kürdçeye çevrilerek yayınlanır".

(6) Li gora tarîxa Mîladî 6 Gulan 1898(Milâdî tarihe göre 6 Mayıs 1898).

www.netowe.com

BÎSMÎLLAHÎRREHMANÎRREHÎM

Cerîdeya ewwulî de min piçekê behsa qencîya ilm û marîfetê kiribî. Ez vê cerîdeyê sebê wê dinivîsim,(7) da ez Kurda bielimînim xwendinê, da Kurd bizanin feyda xwendinê çi qas gelek e. Hezretê Resûl, eleyhîsselam, gelek cara emir kirîye ku "bielimin xwendinê". Cerîdeya ewwulî de min hin hedîsên şerîf nivîsîn. Ez'ê vê carê jî hin hedîsên şerîf binivîsim:

Hezretê Pêxember, eleyhîsselam, gotîye "utlubu'l-ilme mînelmehdî îlellehdî"; ango "ilmê ji matikê heya tirbê bixwînin".(8) Ango divê mirov hew qas kiçik dest xwendinê biket, hê ji demê matikê heta demê tirbê.(9) Zarûyên matikê nikarin bixwînin. Lê meqsed, ango hew qas zû dest xwendinê bikin, xwendin hew qas tiştek feyde ye.(10)

Dîsa Hezretê Nebî, eleyhîsselam, gotîye "hubbu'l-wetenî mîn'el-îman"; ango "hejêkirina weten ji îmanê ye,(11) mirovên xwey'îman hej wetenê xwe dikin".(12)

Gelî mîr û axa û paşano! Ez ji we dipirsim: Kî ji we heta nuho ji wetenê xwe re çi kirîye, da em bizanin un hej wetenê xwe dikin! Hejêkirina weten ew e ku mirov nehêle dişminê mirov bikeve nêv wetenê mirov de. Hejêkirina weten ew e ku mirov wetenê xwe ava bike, mekteba û medresa, xêrata çêke. Hejêkirina weten ew e ku mirov zarûyên wetenê xwe bide xwendin, bide elimandina sin'et û marîfeta. Xwedê neke, heki dişminê we Mosqof hucûmê wetenê we bike, un'ên çawa şerê wî defi' bikin?(13) Mosqof xweytop û tifingên we ecêb e,(14) cihên mirov jê wek teyra dixuyî, gule û berikên xwe digîhîne wan dera; topên we ecêb hene, dikare pê wan topa çîya hilweşîne.(15) Hejêkirina weten ew e un jî bixebitin, bielimin ilm û marîfeta, kesb û karê tîcaretê bikin, dewlemend û xweysin'et û marîfet bibin, wek dişminên xwe bibin xweytop û tifingên vî zemanî, da un bikaribin weten ji simên espên Fila xilas bikin.

Carekê qenc bînin bîra xwe, axa wetenê we çi ye. Nê hemî ji hestî û goştê dê-babên we ne, tirbên ecdadên we ne; paş çend rojekê wê ji we re jî bibe tirb. Ne heyf e Mosqof bi espên xwe bide ser wê axê û tirba! Berî sed sala Fileyên Fransiz Misir zebt kiribîn. Xwedê zane nuho jî Misrî hîkat dikin, camî û mizgeft kirine dêr û axur. J'ew paşê Xwedê nusret da Îslamê, File revîn çûn,

---

(7) Sebê wê dinivîsim: Jibo wê yekê dinivîsim

(8) Matik: Textekî biçûk e, jibo zarûkên şîrmij tê çêkirin, ew zarûk tê da tên razandin û hejandin. Li hin hêlan jê ra tê gotin "dergûşan" jî.

(9) Tirb: Gor.

(10) Tiştek feyde ye: Tiştekî bifêde ye, tiştekî mefadar e.

(11) Hejêkirina weten: Hezkirina ji welat, evîna welat.

(12) Xwey'îman: Xwedîîman, xwedîbawerî, bawerdar.

(13) Un'ên çawa: Hun'ê çawa, hun dê çawa.
Defi' bikin: Paşta bavêjin, berepaş daf bidin, ji xwe dûr bixin.

(14) We ecêb: Wisa ecêb.

(15) Pê wan topan: Bi wan topan.

cihên xwe camî û mizgeft paqij kirin;(16) ew camîyên bîbîn dêr, elhemdu lîllah nuho Îslam tê de nimêj dikin, dixwînin.

Dîsa Hezretê Pêxember, eleyhîsselam, gotîye "uluwwu'l-hîmmetî mîn'el-îman"; ango "hîmmeta bilind ji îmanê ye".

Gelî Kurdno! Elhemdu lîllah xelk hemî dizanin ku Kurd xweyhîmmet in, Kürd camêr in, cesûr in, xwîna xwe li ser wetenê xwe dirijînin. Lê heyfa min têt ne xwenda û dewlemend in, bêmarîfet in.

Dîsa Hezretê Resûlullah, eleyhîsselam, gotîye "Îs'e li dunyake keenneke teîşu ebeden, we's'e lî axîretîke keenneke temûtu xeden";(17) ango "ji dinya xwe re we bixebite heçku tu qet namirî, ji axreta xwe re jî we bixebite heçku tu'yê sibê bimirî".(18)

Werin, vêca em bizanibin mirov ji dinya xwe re çawa, ji axreta xwe re çawa divê bixebite. Ji dinyayê re xebitandin tîcaret e, kesb û kar e, elimandina sin'et û marîfeta ye; ji axretê re xebitandin kirina emrê Xwedê teala û Pêxember eleyhîsselam e. Kurd dînên xwe de qenc in; lê çiku ne xwenda ne, qe nikarin axreta xwe re qenc bixebitin.

Gelî mîr û axano! Fekirin, yên hatin ser dinyayê, navê kî bi rehmetê têt gotin. Un jî we bikin,(19) da navê we jî bi rehmetê bêt gotin.

Xweska wî ewê xêrek kir.(20) Xêr ne nimêj û rojî ne. Nimêj û rojî deynê mirov e, bivê-nevê mirov'ê wan bike; xêr ew e ku mirov mekteb û medresa, mizgefta çêke. Fekirin zarûyên bêbab û bidin xwendin.(21) Çiku un nizanin bixwînin, un nizanin tarîxa behsa ecdadên we çi nivîsîye, kî qencî û kî xirabî dikir.

Bi îzna Xwedê teala, paş nuho ez'ê behsa tarîxa Kurda jî bikim; esl û neslê wan ji ku ye, nêv wan de çi mirovên xwenda, xweynav û deng hatine, ezê hemî binivîsim.

Mirovek xwenda, alim hebî, navê wî "Ehmedê Xanî" bî. Xwedê jê razî be, rehmeta Xwedê lê be, vî mirovî hin kitêbên Kurmancî nivîsîne. Ez'ê paş nuho hin ji wan kitêbên wî vê cerîdeyê de binivîsim.

*

Wek ez dibihîzim, ji Kurda gelek dewlemend hene. Gelî dewlemendên Kurda! Babên we bi du gaz cawê sipî çûn ber rehma Xwedê.(22) Un jî wê welê

---

(16) Yanî "Musulmanan li cîyên xwe camî û mizgeft paqij kirin".

(17) Awayê rast ê vê hedîsê weha ye: "Î'mel lî dunyake keenneke teîşu ebeden, we'mel lî axîretîke keenneke temûtu xeden". Lê belê mana vî awayî û awayê ku di rojnamê da hatîye nivîsîn, yek e.

(18) Heçku: Goya ku, wek ku, hesêb ku.

(19) Un jî we bikin: Hun jî wisa bikin.

(20) Xweska wî ewê xêrek kir: Xwezî bi wî kesê ku xêrek kir.

(21) Yanî "li zarûkên bêbav ên sêwî binêrin û wan bidin xwendin".

(22) Gaz: 1- Aletekî wek meqesê ye, lê her du serên wî çengalkî ne û li ser hev rûdinên, pê bizmar tên kişandin, tewirekî wê jî heye ku di kişandina didanan da tê karanîn. 2- Beşê mil ê ji enîşkê berjêrtir. Bi Erebî jê ra tê gotin "zîra", ku berê pîvekeka cil û caw bûye. Li vir mexsed mana diduyan e.

biçin. Lo, wan zêr û zîvên elbikên we de ne derêxin, rîya Xwedê de mekteb û medresa çêkin, zarûyên bêdê û bab bidin xwendin, da un dinya û axretê rahet bikin,(23) da Xwedê ji we razî be.

Derên ez lê gerîyabîm, min gelek mirovên dewlemend dîtine, zarûyên feqîr dane xwendin, rêkirine İstanbulê mekteb û medreseyên mezin; nuho hemî mezin bîne, hemî jî me'mûr û zabitên dewletê ne; mirovên ew dabîn xwendin, wekî wan dibînin kî kaxizek ji wan têt, Xwedê re şikir dikin ku ew bîn sebeb, saya wan de ew zarûyên reben bîn mirovên xweynav û deng, bîn mirovên alim û dewlemend. Ev mirovên ha li dinya û axretê rûsipî ne.

Elhemdu lîllah em Musulman in. Musulmanîyê de divê em arîkarîya hevûdû bikin.

*

Ez'ê behsa mulûkên Emewîye ji we re bikim;(24) xwendinê çi ji wan kir, nexwendinê çi kir:

Berî heft-heşt sedsala, milê Endelusê dewletek Musulman derket. Sultanê wan ji Emewîya bî. Çar-pênc padîşah ji wan xwenda bîn, adil û qewî, xweymarîfet bîn, hej xwendinê dikirin; sê-çar sala de gelek bajêrên Fila girtin. Yek jê, navê wî Ebdurrehmanê Salis bî.(25) Vî Ebdurrehmanê Salis pêncî sala padîşahî kir. Mirovên xwenda bîn. Wezîrên dora wan jî xwenda û alim bîn. Loma, çi bajêrên navê edaleta wan diçû'yê, bê şer teslîm dibîn. Zemanê van xunkara(26) de Îslam gelek mezin bîn, xurt bîn, dewlemend bîn, mekteb û medreseyên mezin çêkirin, camîyên hew qas mezin çêkirin ser dinyayê de wek wan hê nehatine çêkirin. Wê hingê xelîfeyê Musulmana ne ji Tirka bî, Ereb bîn.

J'ew paşê, yên bîbîn xunkar dest xirabîyê kirin, xwendin û marîfet berdan, edalet nema, dest zulmê kirin. Me'mûra dest bertîla kirin, hemî der têkilhev bîn. Heçî walîyên bajêra, her yekê go "xunkar ez im". Qeweta Îslamê ji hev veqeta. Me'mûr jî hemî wek xunkarên xwe dest bertîla, fisq û fucûrê kirin.(27) Hîkmeta "en-nasu ela sulûkî mulûkîhîm" eşkera bî.(28) Xîreta Musulmanîyê ne li xunkarên wan ma, ne li wezîr û me'mûran ma, ne xelkê ma;(29) hemî ketin derdê bertîla.

---

(23) Rahet bikin: Awayê rast "rahet bibin" e.

(24) Emewîye: Malbateka Ereb bû ku 30 sal piştê wefata Pêxember kargêrîya Musulmanan girt destê xwe û dewletek bi navê "dewleta Emewîyan" saz kir. Sazkarê wê dewletê Muawîyeyê kurê Ebû Sufyan bû. Ew dewlet ji sala 660'î heta sala 750'yî jîya û bi şorişa Ebû Muslimê Xurasanî hilweşîya. Hingê yek ji wê malbatê revîya çû Endelusê, ku navê Îspanyayê bû û di destê Musulmanan da bû, di sala 756'an da li wir "Dewleta Emewîyên Endelusê" saz kir. Ew dewlet jî heta sala 1031'ê jîya û hingê bi hucûma Fileyên cîranê Endelusê hilweşîya.

(25) Ebdurrehmanê Salis: Ebdurrehmanê Sisîyan.

(26) Xunkar: Mîr, padîşah.

(27) Fisq û fucûr: Bêexlaqî, bêrêtî, bêdînî, perçiqandina exlaq û terbîye û edebê, derketina ji rîya rast.

(28) En-nasu ela sulûkî mulûkîhîm: Ev peyveka Erebî ye, mana wê weha ye: "Mirov li ser rê û meşa mîrên xwe ne".

(29) Ne xelkê ma: Ne li xelkê ma.

Fila dora wan girt, dest şerî kirin. Îttîfaq nêv Îslamê de nema; walîyekî milekî ve, walîyê dî milê dî ve kişand. Fila karî Musulmana; gelek jin û zarû û mêr esîr bîn, gelek Musulman revîn Afrîqayê, hemî jî jar û reben bîn. Hingî çû halê wan xirabtir bî, hingî çû File xurttir bîn, Musulmana yekcar xwendin berda, marîfet û xwendin gîha Fila. Hingî çû Musulman bîn File, hêdî hêdî dewleta mulûkên Emewîye xilas bîn, dewleta Fila ket şûna wan de. Heta nuho jî li qeydên mehkemeyên wan de nav hene, paş çend baba ceddê(30) wan Musulman in. Ez'ê navek ji wan binivîsim. Ev navê ha ji qeydên mehkemeyê wan in. Ev e ew nav: "Alfons kurê Frîderîk kurê Hanrî kurê Tomson kurê Muhemmed bin Ebulqasim". Ew sê navên ewilî navên Fila ne, babê wan Fila Muhemmed bin Ebulqasim bî.

Gelî ulema û mîr û axayên Kurda! Heki mirovên hukmê we jî(31) berê un nedin xwendin, un rênekin mekteba da bielimin marîfet û sin'eta, dinya û axretê gunehê wan stûyê we ye.(32) Çawa Fileyên cîranên Musulmanên Endelusê ew der hemî girtin û Musulman kirin File, cîranê we Mosqof jî wê rojekê Kurdistanê bigire, nahêle un Musulmanîya xwe bikin, wê mizgeftên we bike dêr, wê jin û zarûyên we esîr bike; ji paşê un yekcar nikarin xwe ji destê wî xilas bikin. Nuho hê hêl(33) û qeweta we destê we de ye bixebitin, bixwînin, bielimin sin'et û marîfeta; un'ê bikaribin xwe ji şerê cîranê xwe hifz bikin.

Wan pêla(34) de dewletek Musulmana hebî, navê wan "Dewleta Selçûqîye" bî. Ji wê paşê, dewlet gîha mîrekî eşîra Tirka, ku navê wî Osman bî. Rehmeta Xwedê lê be, mirovek camêr, Musulman, adıl bî. Eşîra wî hingî çû mezin bî, xelkê hingî edaleta wî dîtin hatin dora wî, ketin binê emr û hukmê wî de. J'ew paşê ew xwe çû ber rehma Xwedê, kurê wî ket şûna wî. Ew jî wek babê xwe cesûr û mêr derket. Dewlet zemanê wî de mezintir bî. Şikir Xwedê re, Musulman dîsa bîn xweydewlet. Li jor me gotibî "en-nasu ela sulûkî mulûkîhîm". Van xunkarên ha hej xwendinê dikirin; loma mîr û wezîrên wan jî xwenda bîn, adil bîn; zemanên wan de zulm tunebî, Musulman ji şerên dişmina, Fila emîn bîn.

*

Cerîdeya berî vê de, metbeeyê de murettib, hedîsek şerîf xelet nivîsîye; rastî ho ye:(35) "Utlubu'l-ilme welew bî's-Sîn".(36)

---

(30) Cedd: Bapîr.

(31) Yanî "mirovên di binê hukmê we da jî, kesên binê hukmê we jî".

(32) Yanî "di dinya û axretê da gunehê wan li stûyê we ye".

(33) Hêl: Hêz, şîyan. Ev peyvikeka Erebî ye û di Erebî da "hewl" e, piştê ku ketîye Kurdî guherîye bûye "hêl".

(34) Pêl: 1- Koma avê ya ku bi tevgera bayê di deryayan da yan di lîçan da yan jî di çemên fire yên sekan da peyda dibe û ji alîyek ber bi alîyekî dî diçe. 2- Tevgera ku di hewayê da peyda dibe. 3- Dem, wext. Li vir mexsed mana 3'yan e.

(35) Rast'î ho ye: Rastê wê weha ye, awayê wê yê rast weha ye.

(36) Yanî "zanîn li Çînê be jî lê bigerin". Ev hedîs di jimareya pêşîn da weha derketibû: "Utlubu'l-ilme welew kane fî's-Sîn".

Min gotibî "ez'ê behsa şerê Misr û Sûdanê binivîsim". Eve ez'ê dest pê dikim:(37)

Ji mêj ve nozde hezar eskerê Sûdanê, sêzde hezar eskerê Misrê pêş muqabilê hevû dû sekinîbîn, karê şerî dikirin. Roja dî her du mila dest şerî kirin. Şer xweş bû.(38) Eskerê Misrê re gelek top hebîn. Hê ji dûr ve Misrîya Sûdanî dan ber topa, hal li wan nehîşt. Wekî piçekê nêzîkê hev bîn, Misrîya dest tifinga jî kirin. Xelkê Sûdanê, rebena çikû bêsin'et û marîfet in, top û tifingên welê wan re tunebî; destê geleka de rim û xişt û şîr(39) û mertal û tifingên çeqmaq hebîn. Heta hê nêzîktir bîn, gelek ji Sûdanîya hatin kuştin. Şer xweş bî, Sûdanîya êdî nekarî xwe li ber gule û berikên eskerê Misrê bigirin, revîn. Misrîya berdayî wan. Ji Sûdanîya sê hezar mêr birîndar û telef bîn. Ji wan sê hezara dozde mîr û axa ne, ango serekên eskerê Sûdanê ne. Çar hezar ji wan esîr bîn. Nêv van esîra de jî gelek mezinên Sûdanîya hene. Navê mîrê wan Emîr Mehmûd e, ew jî hat girtin.

Ji Misrîya heftê û pênc hatin kuştin, çar sed birîndar bîn, pazde zabit hatin kuştin û hin qewî jê birîndar in.(40)

Eve, gelî mîr û axano! Un dibînin ev şer çi ecêb e!

Sebeba vê, Misrî xwenda ne, ilmê şerî dizanin, top û tifingên wan hene, sîlehên wan nû ne; Sûdanî camêr in, lê bêsîleh in, ilmê şerên van sîlehên nû nizanin, loma mala wan xira bî, êdî paş nuho nikarin pişta xwe rast bikin.

*

Hin ji mîr û axayên Kurda kaxiz rêkirine ji min re, dixwazin ku ez vê cerîdeyê de behsa halê nuho û edebîyata Kurdî, ango hin şê'r û beytên Kurmancî binivîsim. Loma, paş nuho, bi îzna Xwedê ez'ê behsa halê nuho bikim û her car hin beyt û şê'rên Kurmancî û hîkatên qenc binivîsim.

*

Rehmeta Xwedê lê be, Xwedê gunehê wî bixefirîne, sala hezar û sed û pêncê de,(41) Cizîrê(42) Ehmedê Xanî kitêbek menzûm nivîsîye;(43) navê vê kitêbê kirîye **"Mem û Zîn".** Ev kitêb hemî beyt û şê'r in; eşkare hîkata eşqa du

---

(37) Awayê rast weha ye: "Eve ez'ê dest pê bikim", yan jî "eve ez dest pê dikim".

(38) Şer xweş bû: Şer germ bû, şer gewz bû, şer geş bû.

(39) Şîr: Şûr.

(40) Hin qewî jê birîndar in: Dibe ku mana vê peyvê weha be: "Hin pirr ji zabitan birîndar in"; yan jî weha be: "Hin ji zabitan jî birîndarên giran in, birînên wan dijwar in".

(41) Sala 1105, tarîxa Hîcrî ye. Li gora tarîxa Mîladî dibe 1695.

(42) Cizîrê: Li Cizîrê.

(43) Menzûm: Helbeskî, pirtûk yan jî tiştekî dî yê ku bi awayê helbestan tê nivîsîn, wek helbestan tê nivîsîn.

ciwana ye, batin(44) gelek meqsed û hîsse(45) û hîkmet jê tên fehmkirin. Loma, divê mirov bi dîqet bixwînitin. Her cerîdekê de ez'ê ji wê kitêbê hinê binivîsim,(46) heta xilas bibe.

Ew kitêb berî du sed û deh sala hatîye nivîsandin. Hin derê wê heşifîne,(47) nayên xwendin. Derên neyên xwendin, înşaellah ez'ê bikarim bi xwe temam bikim. Heki ji vê kitêbê destê yekê de hebitin, ez hêvî dikim ji min ra rêket, da ez ya li destê xwe de rast bikim; paşê ez'ê dîsa kitêba wî jê re rêkim. Nîyeta min, ez'ê wê kitêbê tebi' jî bikim.(48) Heçîyê vê,(49) bila nuho ve ji min re binivîse.

Ehmedê Xanî, rehmetullahî eleyhî, li wê kitêbê de ewil dest şikir û munacat û ne'ta kirîye,(50) paşê dest eslê hîkatê dike. Min ev kitêb carna hin ulemayên Tirk û Ereba re xwendîye û tercume kirîye, hemîya jî gotîye ku "vê rê de ji vê kitêbê çêtir me nedîye'.

MEM Û ZÎN

Sernameê name navê Ellah
bê navê wî natemam e wellah(51)

Ey metleê husnê işqebazî
Mehbûbê hqîqî-yû mecazî

Navê te ye lewhê nameya işq(52)
Îsmê te ye neqşê xameya işq

---

(44) Batin: Di batin da, di binî da, bi awayê veşartî.

(45) Hîsse: Par. Yanî "tiştê ku mirov wek parek ji xwe ra jê digire, para xwe jê hiltîne, jê mefadar dibe".

(46) Hinê: Hinek, parçeyek.

(47) Heşifîn: Belavbûna murekkebê nivîsînê li ser kaxid, bi awayekî wisa ku baş nayê xwendin.

(48) Tebi' jî bikim: Çap jî bikim.

(49) Heçîyê vê: Herçîyê ku divê, her kesê ku divê.

(50) Munacat: Gazî û lavayên ji Xwedê ra, ku mirov gazî Xwedê bike û lavayê wî bike. Ne't: Pesn. Li vir mexsed jê pesnê Pêxember e.

(51) Di çapa **"Mem û Zîn"**ê ya 1919'an a Stanbolê da ev her du malik weha derketine:

"Sernameê name namê Ellah
Bê namê wî natemam e wellah".

(52) Di çapa stanbolê da "namê te ye" derketîye.

Bê neqşê te neqşê xame xam e
Bê navê te navê name name(53)

Navê te ye şahê Beytê meqsûd(54)
fîhristê mukatebatê mehmûd

mezmûnê muraselatê "lareyb"
meşhûdê mukaşefatê bîlxeyb

Mehbûbê qulûbê men lehu'l-qelb!
Qelban tu dikî bi ba xwe ve celb(55)

Ma'şûq-i tu yî, bifexr û naz î
Aşiq tu yî, lêk-i bênîyaz î

Mutleq tu mufîd û mustefad î
Bê şubhe murîd û hem murad î

Nûr î tu di husnê rûyê dildar
Nar î tu di qelbê aşiqê zar

Şem' î, ne ji qismê nûr û nar î
Şems î, ji eyan tu perdedar î

Genc î tu di nêv tilîsmê alem(56)
Kenz î tu eyan ji îsmê adem(57)

Ev alem û ademî-yû meşhûd
ev mumkin û masîwayê mewcûd

Hemyan bi te ye mudare û debr(58)
Feyyazê rîyazê xelq û we'l-emr(59)

---

(53) Di çapa Stanbolê da ev malik weha derketîye:

"Bê namê te name natemam e".

(54) Di çapa Stanbolê da "namê te ye" derketîye.
(55) Di nusxeyeka desnivîsar da "bi bal xwe ve" hatîye nivîsîn.
(56) Genc: Xizne, xezîne, defîne.
(57) Kenz: Xizne, xezîne, defîne.
Adem: Mirov, însan.
(58) Hemyan: Hemîyan, giştan, tevan.
(59) Di çapa Stanbolê da ev malik weha derketîye:

"Feyyazê rîyazê xelq-i we'l-emr".

www.netewe.com

Emrê te bi lefzê "kun" du alem(60)
mewcûd-i kirin, xerez çi? Adem(61)

Adem bi xwe yek ji her duyan e
Yek herf-i ji emrê "kun", fe kane

Ew herfê heqîqeta muheqqeq
hem emr e bi qudreta te, hem xelq

*

Eşbah-i muressem in ji nasût
Erwah-i muwessem in bi lahût

Ev rûh û cesed bi cebr û îkrah
tezwîc-i bûyîn bi emrê Ellah

Nasûtî egerçi rengsefal e
lahûtî ji pertewa cemal e(62)

Herfa ku me gotî, neqşê hûr e
Lê meqsed û maneya wê hûr e(63)

Zahir te eger numaye suxra
batin ew e neqşê xame kubra

Mewcûd e di wê şehadet û xeyb
Meşhûd e di wê sîyadet û eyb

Însan bi xwe hem zelam e, hem nûr
Adem ji te hem qerîb e, hem dûr

Hindî we ku cinsê alemî ne
ew tabiê new'ê ademî ne

---

(60) Lefzê "kun": Peyvika "kun". Peyvika "kun" peyvikeka Erebî ye, mana wê "bibe" ye. Ev îşaret e bi alîyê ayeteka **Qur'anê** ve, ku Xwedê tê da weha gotîye: "Dema ku Xwedê tiştek bivê, fermana wî tenê ew e ku jê ra bêje 'bibe', ew jî hema dibe".

(61) Xerez: Amanc, daxwaz, mebest, mexsed.
Adem: mirov, însan.

(62) Ev her du malik di çapa Stanbolê û nusxeyeka desnivîsar da weha ne:

"Nasût-i egerçi rengsefal e
Lahût-i ji pertewa cemal e".

(63) Di çapa Stanbolê û nusxeyeka desnivîsar da ev malik weha ye:

"Lê meqsed û maneya wê kûr e".

Ev renge felek hemî muezzem
ev çende melek hemî mukerrem

ev karegeha ezîme, dewwar
ev baregeha bedîe, seyyar(64)

ev çende zemîn digel enasir
ev renge erez digel cewahir

ev çende he nî'met û nefais
ev renge he me'kel û malabis

ev çende he muddea û metlûb
ev renge he muşteha û mehbûb

heywan û meadin û nebatat
metlûb û meqasid û muradat

bîlcumle jibo me ra li kar in
fîlcumle jibo me ber di bar in

Heqqen ku te xweş nîzam û rewneq
tertîb-i kirin jibo me elheq

Em xafil û atil û gunehkar
mayîne di qeydê nefsê emmar

Nînin me di qelbî fikr û zikrek
nakin bi zebanî hemd û şikrek

Xanî, ku nehin bi qelbî zakir
Barî, bide wî zebanê şakir

(Paşîya wê heye)

Li Misrê "Metbea El-Hîlal" de tebi' bîye

---

(64) Di çapa Stanbolê û nusxeyeka desnivîsar da ev her du malik weha ne:

"Ev karegeha ezîm û dewwar
ev baregeha bedî' û seyyar".

www.netewe.com

Heçî
vê kaxizekî
rêke ji min re,
divê ser kaxizî
weha binivîse:
"Bî Misr
necl'ul-merhûm
Bedirxan Paşa
Mîqdad Mîdhet Beg"

*

Her car
du hezar cerîdeya
bê pere ez'ê rêkim
Kurdistanê,
de bidin xelkê

*

Pazde roja carekê
têt nivîsandin

KURDİSTAN

1315

Pazde roja carekê têt nivîsandin
cerîdeya Kurdî ye

Kürdleri tahsil-i ulûm ve
fünûna teşvik eder
nasayih ve edebiyat-ı
Kürdiyeyi hâvî
on beş günde bir neşrolunur
Kürdçe gazetedir

Gazetenin mesleğine muvafık
Arabça, Türkçe, Farisîce
mektublar
Kürdçeye bittercüme neşrolunur

Unvan:
Mısır'da
"Kürdistan"
Gazetesi
Sahib ve Muharriri
Bedirhan Paşazade
Mikdad Midhat

*

Her tab'ında
2000 nüsha
Kürdistan
vülât-ı izamına
irsal ve vesatetleriyle
kura ve kasabâta
neşr-ü tamim
olunacaktır

*

Kürdistan haricinde
her yer için
senelik abone bedeli
80 kuruştur
Kürdistan dahilinde
hususî isteyenlere
meccanen gönderilir

Roja pêncşemê de 28 Zulhîcce sene 1315 * Pencşembe fi 7 Mayıs sene 1314(2)

BÎSMÎLLAHÎRREHMANÎRREHÎM

"KULLUKUM RAÎN WE KULLUKUM MES'ÛLUN EN REÎYYETÎHÎ"

Gelî ulema û paşa û mîr û axayên Kurmanca! Ev hedîsa şerîf a min jor nivîsî, emrê Pexember eleyhîsselam e. Ango ji xunkar(3) bigirin heya şivanên gund, hemî ser hevûdû(4) ba Xwedê teala(5) mes'ûl in.(6) Ango divê yên mezin, yên

(1) Divîya ku li vir "eded 3" yanî "jimare 3" bihata nivîsîn. Lê belê di eslê rojnamê da ev goşe weha vala derketîye.
(2) Li gora tarîxa Mîladî 20 Gulan 1898.(Milâdî tarihe göre 20 Mayıs 1989).
(3) Xunkar: Mîr, padîşah.
(4) Hemî ser hevûdû: Hemî li ser hev, hemî ji ber hev ve, hemî di heqê hev da.
(5) Ba Xwedê teala: Li bal Xwedê teala, li nik Xwedê teala.
(6) Mes'ûl: Berpirsyar.

www.netewe.com

xweyqewet(7) û dewlemend, xunkar û paşa û mîr divê fekirin(8) yên li bin destên xwe de. Heki(9) ew ji şerên dişmina hifz nekirin,(10)Xwedê teala wê wan mîr û axa û hemîya mes'ûl bike.

Min cerîdeya berî vê de behsa Endelusê kiribî. Çiku(11) padîşahek ji wan, Ebdurrehmanê Salis xwenda bî, hej ilm û marîfeta dikir, zemanê wî de xelk hemî, heya hin şivan jî xwenda bîn. Hîkmeta "en-nasu ela sulûkî mulûkîhîm"(12) derket nêva halî.(13) Çiku hemî xwey'ilm û marîfet bîn,(14) zemanê wî padîşahî de dewleta Musulmana ji dewletên Frenga(15) hemîya zêdetir xweyşewket û qewet bî.(16)

Gelî warisên enbîya,(17) ulemayên Kurda! Rîya Xwedê de destên xwe hilînin, devên xwe vekin, mîr û axayên Kurmanca terxîb û teşwîqa ilm û marîfeta bikin.(18)

Eve ji hedîsa şerîf a "kullukum raîn we kullukum mes'ûlun en reîyyetîhî" aşîkar dibe ku ez jî bi emrê Pêxember eleyhîsselam me'mûr im xizmetê, qencîyê ji Kurda ra bikim, rîya qencîyê nîşanê wan bikim, wan ji xirabîyê hifz bikim. Çiku dewlet nahêle kes ji me biçe Kurdistanê, loma ez bi vê cerîdeyê, ya li ser min deyn ez dikim.(19) Xwedê arîkarîya min û Musulmana hemîya bike.

"Teleb'ul-ilmî ferîzetun ela kullî Muslimîn we Muslimetîn". Ev hedîsa Pêxember eleyhîsselatu wesselam, ango elimandina ilmê ser hemî mêr û jinên Musulmana ferz e.

Gelî mîr û axayên Kurmanca! Çawa çiku nimêj ferz e un dikin, welê elimandina ilmê jî ser we ferz e.(20) Bê ilm û xwendin nimêj û rojî temam nabin. mirov çi qas hej wetenê xwe bike, bê ilm nikare qencîyeke temam ji wetenê xwe re bike. Vî zemanî de kitêbên we qenc(21) hatine nivîsandin, behsa xweykirina dewar û pezî dike, behsa çandina genim û cehî dike, behsa hemî tişta dike. Mirovên xwenda wê bikaribin bi van kitêba dewar û pez û dexlê xwe bike rê de. Her sal kara wî du cara wê zêdetir bibe.

---

(7) Xweyqewet: Xwedîqewet, xwedîhêz, hêzdar, tuwana, kesê ku hêz û qeweta wî heye.
(8) Fekirin: Bifikirin, hesaba wan bikin, rewşa wan bidin ber çavên xwe.
(9) Heki: Eger.
(10) Hifz nekirin: Neparastin.
(11) Li jêrenota 69'an a jimareya pêşîn binêrin.
(12) Li jêrenota 28'an a jimareya 2'yan binêrin.
(13) Derket nêva halî: Derket nava rewşê, bû rewşeka rastîn û hat ber çavan.
(14) Xwey'ilm: Xwedîilm, xwedîzanîn, zanyar.
(15) Dewletên Frenga: Dewletên welatên Ewrupayê yên ne Musulman.
(16) Xweyşewket: Xwedîşewket, xwedîheybet, xwedîhêz, hêzdar.
(17) Warisên enbîya: Warisên Pêxemberan. Ev îşaret e bi alîyê hedîsek ve ku weha dibêje: "Kesên alim, kesên zanyar warisên Pêxemberan in".
(18) Terxîb û teşwîq: Hewisandin, çêkirina hewesê di dilê hin kesan da, ku mirov di heqê hin tiştan da hewes bide hin kesan, wan bihewisîne.
(19) Yanî "tiştê ku li ser min deyn û wezîfe ye, ez bi vê rojnamê tînim cî, ez bi vê rojnamê wezîfa xwe dikim û deynê xwe didim".
(20) Yanî "çawa ji ber ku nimêj ferz e hun nimêj dikin, fêrkirina zanînê û zanyarîyê jî wisa li ser we ferz e".
(21) We qenc: Wisa qenc.

"LEYSE LÎ'L–ÎNSANÎ ÎLLA MA SEA"

Ango "mirov çi qas bixebite, çi qas bişixule wê ew qas kar bike". Divê mirov ji vî emr û fermana Xwedê teala îbretê bigire. Carekê bipirsin: Hev qas Musulman henin ser dinyayê, hemî çi dikin? Hev qas Freng(22) hene, hinde dewlemend in, xurt in; ev Musulmanên ha çi dikin? Ez ji we re hîkat bikim: Exlebên Musulmana berê ve wek Kurda bîn, bêxwendin û marîfet bîn. Hingî çû, fikirîn cîranên wan Freng dielimin xwendin û marîfeta, ji wan qewettir(23) û dewlemendtir dibin. Aqilê wan hat serê wan; ewa jî dest xwendinê kirin, zarûyên xwe dan xwendin, rêkirin derên dûr da bielimin sin'et û hunera. Lê piçekê dereng man. Nuho gelek dixebitin, gelek xweyhuner(24) û marîfet ji wan hene.

Vî zemanê ha de Freng gelek xweyhuner û marîfet in. Par wekî dewleta me û Yunanîya şer kirin, dewleta me top û tifingên şerî ji Frenga kirî. Nuho hêdî hêdî Musulman jî elimîne, sîleha çêdikin. Lê nikarin wek Frenga qenc çêkin.

Gelî Kurdno! Un jî dest hilînin, bielimin ilm û hunera, da Xwedê teala û Resûlullah eleyhîsselam ji we razî be, da un bikarin dîn û namûsa xwe ji şerê dişmina hifz bikin, da un jî bikarin wetenê xwe de rûnên, da un jî ji vê rencberîyê xilas bibin. Ez gelek dera Kurda dibînim; hemî jî rencber in, jar in, gelek ji wan ji rebenîyê, ji feqîrîyê, ji xerîbîyê ditelifin.(25) Yekê xwey'ilm û huner dikare pênc sed mirova re şixula bibîne. Loma, heki çendek ji mîr û axayên Kurda elimîn huner û ilmê, wê hingê Kurd wê wetenê xwe de ji xwe re şixula bibînin, wê ne muhtac bin biçin ji der ve jar û reben rencberîyê bikin, wê gundên wan de abûrîya wan bibit.

*

Cerîdeya ewwulî de min nivîsîbî ke ez lawê Bedirxan Paşa me. Elhemdu lîllah nuha sax li ser dinyayê em deh û heft bira ne. Hemî xweyrutbe û me'mûrîyet in; em hemî jî dixwînin, dinivîsin; nêv me de paşa û zabitên eskerîyê jî hene; şikir ji Xwedê re em elimîne marîfet û ilmê. Hin me Şamê ne, hin İstanbulê ne,(26) hin jî me'mûrên welata ne.

Em ji ecdad ve mîrên Botan in, mezinên Kurmanca ne. Loma ser me deyn e, divê em qencîya Kurmanca re bixebitin; divê em wek zarûyên xwe fekirin zarûyên Kurmanca. Lewre ji xelkê Kurdistanê kî vê(27) zarûyên xwe rêket İstanbulê da bixwîne, rêkin cem birayên min İstanbulê; heçî vê rêket Misrê, divê ewwulî kaxizekî ji min re rêket. Ser kaxizî ho binivîsin:

"Bî Misr, necl'ul-merhûm Bedirxan Paşa Mîqdad Mîdhet Beg".

Ev kaxiz wê bighît destê min. Divê ez bizanim cewaba wî kaxizî ez rêkim kuderê. Loma, li kaxizî de cî û navê xwe binivîsin.

---

(22) Freng: Ewrupîyên ne Musulman.
(23) Qewettir: Biqewettir, hêzdartir, tuwanatir.
(24) Xweyhuner: Xwedîhuner, hunermend.
(25) Ditelifin: Telef dibin, dimirin.
(26) Hin me Şamê ne, hin İstanbulê ne: Hin ji me li Şamê ne, hin li İstanbulê ne.
(27) Kî vê: Kî bivê, kî bixwaze.

Dewleta Mosqof(28) bîst sal, bîst û pênc sal nabûrit, Îslamê re şerî dike. Heyfa min têt, gelek şera de dikare Îslamê.(29) Sebeba wê jî, çiku Îslam ne wek Mosqof xweysin'et û marîfet e. Ji mêj ve Mosqof derek girtîye ku navê wê derê Qazan e.(30) Dereke mezin e, Musulmanên wê derê jî gelek in. Berî sê-çar sala Musulmanên wê derê qasid rêkirin İstanbulê, hawar û meded xwestin ku Mosqof nahêle Musulmanîya xwe temam bikin, Mosqof ehkamên(31) dînê wan xira dike, divê şerîeta Muhemmedî ji nêv wan hilîne. Wek min bihîstî, İstanbulê nekarî wek vîn(32) îmdadê ji wan re bikin. Rebenan welê binê hukmê Mosqof de man. Xwedê teala arîkarîya wan bike, Xwedê teala nusret(33) û qewetê bide Îslamê! Gelek Îslam binê hukmê Mosqof de heye! Xwedê teala hemîya xilas bike!

*

Gelî mîr û axayên Kurda! Xwedê teala hema Kurdistanê hifz bike! Un jî dest hilînin, zarûyên xwe bidin xwendin da bielimin marîfet û sin'eta. Wekî Kurd bielimin marîfet û sin'eta, wê gelek kêrê mileta Îslamê bên, dewlet jî wê li pişta wan bitin. Wê hingê kes nikare xwe bide ser wan; wê hingê wê bikarin wetenê xwe, tirbên ecdadên xwe ji binê simên espên Mosqof xilas bikin.

*

Du-sê sal e Kurd û Ermenî têkilhev bîne.(34) Ev halê ha ne qenc e. Dewlet ji vî halî ne razî ye. Paş nuho ez'ê vê behsê jî binivîsim.

*

Du dewletên Frenga, navê yekê Emrîqa ye, navê yekê Îspanya ye, dest şerî kirine. Nuho şerê wan ser behrê ye. Her du mil jî xurt in. Înşaellah ez'ê vê jî binivîsim.

*

Hin Xalidî(35) hene, li Qudsa şerîf in. Yek ji van, xweyfezl(36) û kerem Şêx Yûsuf Zîyaeddîn Paşa ye. Xwedê umrê wî dirêj û ilmê wî zêde bike! Berî şeş

---

(28) Dewleta Mosqof: Rûsya.
(29) Dikare Îslamê: Dikare bi Îslamê, dişê zora Îslamê bibe.
(30) Der: Dever, hêl, herêm.
(31) Ehkam: Piranîya "hukm" e. Li vir bi mana "ferman" e.
(32) Wek vîn: Wek ku vîyan, wek ku xwestin, wek ku daxwaz kirin.
(33) Nusret: 1-Alîkarî. 2-Serketin, zafer.
(34) Têkilhev: Hin kes yan jî hin tiştên ku ketine nava hev, tevlihev bûne. Li vir bi mana "şer û pevçûn" hatîye karanîn. Yanî nivîskar xwestîye bêje ku "du-sê sal e ku Kurd û Ermenî pevdiçin, şerê hev dikin".
(35) Xalidî: Kesê ku ji nesla Xalidê kurê Welîd e, ku sehabîyê Pêxember e.
(36) Xweyfezl: Xwedîfezl, kesê ku karê baş û qenc dike, qencîkar.

sala kitêbek çêkirîye, navê vê kitêbê **"El-Hedîyyet'ul-Hemîdîyye fî'l-Luxet'îl-Kurdîyye"** ye.(37) Ev kitêb wek Erebî yi,(38) behsa qewaidên ezmanê Kurmancî dike.(39) Luxatên Kurmancî(40) hemî gîhandine hev, vê kitêbê de nivîsîye. Mala wî ava, esasek ji ezmanê Kurmanca re danî. Ez hêvî dikim ku ulema û mîr û paşayên Kurda ji vê kitêbê peyda bikin. Gelek kitêbek qenc e. Ulemayên Kurda re lazim e ku ew jî ji ezmanê xwe re tişkî(41) binivîsin.

*

Alimek ji Sora hebî. Sala dî wefat kir;(42) rehmeta Xwedê lê be, Xwedê gunehên wî bixefirîne! Navê wî Hacî Ebdulqadir bî. Ev mirov saxîya xwe de gelek xebitî; derheqa elimandina ilm û marîfetê de gelek beyt û eş'arên Kurmancî dinivîsî, rêdikir welatê xwe Sora.(43) Ezmanê wî ezmanê Sora ye.(44) Loma Kurd hemî vî ezmanî nizanin. Pişta kitêba **"Mem û Zîn"**ê de bi xetê(45) destê xwe hin beyt nivîsîne. Teberruken(46) min ew ebyat(47) li vê cerîdeyê de binivîsîn. Wekî bi dîqet bê xwendin, mana wan xweş têt famkirin:

Zemane resmî caranî nemawe
Çiraxî nazim û munşî kujawe

Le dewrî ême roman û cerîde
egerçi meqsede zanînî bawe

---

(37) Mana navê pirtûkê bi Kurdî weha ye: **"Dîyarîya Hemîdî di Zimanê Kurdî da".** Ji ber ku hingê Sultan Evdilhemîd li ser textê Osmanîyan bûye, nivîskar pirtûka xwe ji wî ra dîyarî kirîye û ev nav lê danîye.
Gerçi nivîskar li vir gotîye "berî şeş sala kitêbek çêkir"; lê belê ew pirtûk çar sal berî derketina rojnama **"Kürdistan"** hatîye çapkirin. Tarîxa çapa wê li gora tarîxa Romî 1310 e, ku li gora tarîxa Mîladî dibe 1894.

(38) Wisa tê zanîn ku ev pevek bi şaşî weha hatîye çapkirin, awayê wê yê rast weha ye: "Ev kitêbek Erebî ye".

(39) Qewaidên ezmanê Kurmancî: Bingehokên zimanê Kurmancî.

(40) Luxatên Kurmancî: Peyvikên Kurmancî, kelîmên Kurmancî.

(41) Tişkî: Tiştek.

(42) Sala dî: Sala berê, sala çûyî, parr, sala parrîn.

(43) Hozanê gewre Hacî Qadirê Koyî, ku di sala 1815'an da li Kurdistana Jêrîn hatîye dinê, di sala 1839'an yan jî 1840'î da çûye Stanbolê û li wir bûye mamostayê zarûkên Mîr Bedirxanê Botî. Di sala 1897'an da jî li Stanbolê wefat kirîye.
Divîya ku nivîskar li vir bigota "rêdikir herêma xwe Soran". Lewra Soran ne welat e; welat Kurdistan e, Soran jî herêmek ji herêmên Kurdistanê ye; wek Botan, Xerzan, Badînan, Motkan û wd.

(44) Divîya ku li vir jî bihata gotin "zarê wî zarê Sora ye". Lewra Soranî yan jî bi peyva rasttir "Kurdîya Jêrîn" ne ziman e, lê belê zarek ji zarên zimanê Kurdî ye.

(45) Xet: Nivîsîn.

(46) Teberruken: Jibo yom û bereketê, jibo ku ji me ra yom û oxir bîne û bike ku karê me li hev bê, karê me rast û xweş bimeşe.

(47) Ebyat: Piranîya "beyt" e.

Eman qedrî bizane em kitêbe
Le dunya êstekey hemtay nemawe

Le eyyamî heyatî Şêxî Xanî
le ser nusxey xetî ew nûsirawe

Le lay erbabî xoy bo qedr û qîmet
xezîney gewhere-w kîse diraw e

Le mecmûî duwel Soran û Botan
le sayey em kitêbe nasirawe

Le Kurdan xeyrî Hacî-w Şêxî Xanî
esasî nezmî Kurdî danenawe

TEQRÎZ(48)

JÎ ŞAMÊ HATÎYE

Ev cerîdeya mîrê me derêxistî hat Şamê. Min yek peyda kir. Çi qa Kurdê nêzîk henin min civandin. Wekî ev cerîde dîtin navê wê **"Kürdistan"** e, xweyîyê wê mîrê me ye, hemîyan ewwulî maç kirin, danîn ser serê xwe. Gelek şa bîn. Paşê min ji wan re xwend. We qa(49) dilê wan xweş bû, heçku te dinê daye wan. Ev nesîhet û xeberên te nivîsîn, qenc ketin guhê wan; zanîn ev tiştek qenc e. Li nav xwe de xeber dan. Paş nuho, heçîyê mezin wê xwe ji hemalîyê xilas bikin bielimin hostayîyê, bielimin çêkin û li nav xwe de dirava bidin hev, zarûkê xwe bidin mekteba, rêkin bajarê sin'et û hunera.

Ez ser Kurdê me gelek diqeherim. Xwedê du tiştê qenc re em xeliqandin:(50) Yek şecaet e, ya dî jî sexawet e.(51) Xweyîyê wan her du tiştên qenc çire holê(52) kêm mane, çire ber destê xelkê de mane! Ev qebaheta me ye, çiku em mane bêmarîfet û sin'et.

---

(48) Teqrîz: Nivîsara ecibandinê, nivîsara ku li ser kovarek yan pirtûkek tê nivîsîn û tê da ecibandina wê kovarê yan pirtûkê tê dîyarkirin.
(49) We qa: Ew qas.
(50) Xeliqandin: Afirandin, çêkirin.
(51) Şecaet: Mêranî, wêrîn, mêrxasî, fêrisî.
Sexawet: Ciwamêrî, çavfireyî, comerdî.
(52) Çire holê: Çima weha, çima bi vî awayî.

Tu vê zehmet û mesrefê ser qencîya Kurda dikişînî; te ev cerîde ji me re derêxistîye. Xwedê ji te razî bit. Tu gelek ayet û hedîsên rast, rîyên qenc nîşa me dikî.(53) Rehmet li babê te bit, Xwedê dewleta te mezin biket! Ew edl û kerema babê te kirî, nuho jî dibit sebeba rehmetê. Ew cerîde te ser qencîya Kurda derêxistî, ev jî nêzîkê wê ye.(54) Vî zemanî qencî hew qas dibit.

Xwedê û Pêxember paş nuho wê her arîkarîya te bikin. Em jî her poste hêvîya cerîda te ne. Duayên qenc, medhên(55) baş ewwulî jî, nuho jî jixwe li ser me deyn e.

Li Şamê
N.H.

TEQRÎZEK MENZÛM(56)

DÎSA JÎ ŞAMÊ HATÎYE

Pîroz ji te re hezar cara
ev dengê nuho li nav yara

Mizgînîya vê cerîdeya qenc
şabaş dibitin çi qa hebit genc(57)

Ev şuxlê mezin te kirîye bîd'et(58)
cara ewwulî te kirîye hîmmet

Ev rehbera qenc te danî binyad
Kurmanc hemî te kirine îrşad(59)

Vê marîfetê tu ca nehêle
Daîm ji te re muîn Resûl e(60)

---

(53) Nîşa me dikî: Nîşanê me didî.

(54) Ev jî nêzîkê wê ye: Derxistina vê rojnameyê jî nêzîkê edalet û kerema bavê te ye, wek edalet û qencîya bavê te rûmetbilind û hêja ye.

(55) Medh: Pesin.

(56) Li jêrenota 43'yan a jimareya 2'yan binêrin.

(57) Şabaş: Bexşîş, tiştê ku bi nîyeta bexşîşê tê dayin.
Genc: Xizne, xezîne, defîne.

(58) Şuxl: Şixul, kar, xebat.
Bîd'et: Tiştê nûderketî, tiştê ku berê tunebûye û nebûye adet û paşê derdikeve, yan jî ji alîyê kesek ve tê derxistin, tê peydakirin.

(59) Îrşad: Berdana rîya rast, ku mirov berê mirovan bide rîya rast û wan li ser rîya rast bimeşîne.

(60) Muîn: Alîkar.
Resûl: Pêxember.

www.netewe.com

Roja ku cerîde tête bajar
her der dibine mîsalê bazar(61)

Çi qa hebitin li şehrî Ekrad(62)
qewlê xweşîya te kirine mu'tad(63)

Rûhanîya bab û kal û ecdad
pey vê hunerê, te kir nuho şad(64)

Beybûnîya dewleta te geş bit
Qasê tu hebî dilê te xweş bit(65)

Lawê Şêx E. Fetah

(61) Mîsalê bazar: Wek bazar û sûkan. "Yanî her der wek bazar û sûkan gewz û geş dibe, li her derê tevger peyda dibe".

(62) Li şehrî: Li bajêr, di bajêr da. Yanî li bajarê Şamê.
Ekrad: Piranîya peyvika "Kurd" e, bi zimanê Erebî ye.

(63) Qewl: Peyv, gotin.
Mu'tad: Tiştê adetkirî, tiştê ku mirov ji xwe ra dike adet. Yanî "qal û peyva xweşî û saxîya te ji xwe ra kirine adet, adetê wan ew e ku li ser xweşî û saxîya te dipeyivin".

(64) Pey vê hunerê: Piştê vê hunerê, piştê ku te ev huner nîşan da û ev rojname derxist.

(65) Qasê tu hebî: Bi qasê ku tu bijî, heta ku umrê te hebe, heta ku tu sax bî.

www.netewe.com

MEM Û ZÎN

NÎ'METŞİMARÎ Û TEKRAR ŞİKİRGUZARÎYA BARÎ Dİ SÛRETÊ AYÎNEDARÎ Û PERDE BERDARÎYA PERWERDÎGARÎ DE DİGEL ÎXTÎTAMA BA MUNACATEK MUXTESERÊ KURDÎ(66)

Ey şikrê te cewhera zebanî(67)
Wey zikrê te seyqela cenanî(68)

Ey wahidê bêşerîk û yekta
Wey wacidê bênezîr û hemta(69)

Ey Baqîyê bêzewal ê daîm(70)
Wey Hadîyê bêfena yê qaîm(71)

Ey xaliqê erd û asîmanan
Wey xaliqê cumle îns û canan

Milk û melek û felek bi carek
bîlcumle te çêkirin, tebarek(72)

Subhaneke kulle ma xeleqte
Ehsente fe keyfe ma feleqte(73)

---

(66) Mana vê sernivîsarê weha ye: "Jimartina nî'metan û carek jî şikirkirina ji Xwedê ra bi awayê salixdan û rakirina perdeyê ji ber karên xwedayî, digel temamkirina bi dualavayeka kurt a Kurdî".

(67) Zeban: Ziman.

(68) Seyqela cenanî: Sîqalkirina dil, paqijkirin û biriqandina dil.

(69) Wacidê bênezîr: Hêzdarê ku kesekî wek wî tune, hêzdarê bêwekok.

(70) Baqîyê bêzewal: Timjîndarê ku tune nabe, yê ku tim dijî û tune nabe.

(71) Hadîyê bêfena: Rêbirê rîya rast ê ku tune nabe, yê ku rîya rast nîşanê mirov dide û tune nabe.
Qaîm: Kesê ku hebûna wî bi wî ye, di hebûnê da ne muhtacê kesek e.

(72) Bîlcumle: Hemî, giştî.
Tebarek: Ev peyvikeka Erebî ye, jibo ecibandinê tê karanîn; wek ku mirov bêje "ox ox, çi qas xweş e, maşela çi qas xweş e".

(73) Ev her du malik bi Erebî ne, mana wan weha ye: "Her tiştê ku te afirandîye ez diecibînim û jibo wî te pak didêrim, mezinatîya te teqdîr dikim. Her tiştê ku te ji tuneyîyê anîye heyîyê, her bi çi awayî te çêkiribe te xweş çêkirîye".

www.neewe.com

Herçî ku te çêkir, ey nîkûkar(74)
her yek di hedê xwe da sezawar(75)

Ev neh sedefêd-i pirmirarî(76)
durrêd-ı sefîd, şefaf û tarî(77)

hussêd-i mîsalê durrê Xeltan(78)
her şeş cîhet û çihar-ı erkan(79)

her sê weledêd-i pirmewalîd(80)
xebra û sema digel meqalîd(81)

lewh û qelem û sewabit û erş(82)
heywan û nebat û maden û ferş(83)

zahir kirin ev qeder senayi'(84)
peyda kirin ev qeder bedayi'(85)

---

(74) Nîkûkar: Karbaş, kesê ku karên baş û qenc dike.
(75) Di hedê xwe da sezawar: Di sînorê xwe da layiq, layiqê cîyê xwe.
(76) Pirmirarî: Sedefên ku gelek mirarî di wan da hene. "Mirarî" teneyên gilover ên wek morîyan in, sipî û birqok in, gelek rûmetgiran in; ji qalikên wan ra jî tê gotin "sedef", ku ew jî ji nava tewirek masî tên derxistin. Navê "mirarî"yan bi Erebî "durr" e, bi Tirkî jî "inci" ye, bi Înglîzî jî "Pearl" e. Wisa tê zanîn ku mexsed ji "neh sedef"an her neh gerok in ku li dora Rojê digerin.
(77) Sefîd: Sipî.
Şefaf: Zelal, birqok.
(78) Huss: Mirarî.
Durrê xeltan: Mirarîyên têkilhev.
(79) Cîhet: Alî.
Erkan: Piranîya "rukn" e.
(80) Pirmewalîd: Pirçêle, ên ku pir çêle diwelidînin.
(81) Xebra: Ax. Mexsed jê Goga Dinyayê ye.
Sema: Asîman.
Meqalîd: Dolab, çerxa erd û asîman.
(82) Lewh: Lewhê mehfûz ê ku Xwedê her tişt tê da nivîsîye.
Sewabit: Stêrên negerok, westayî.
(83) Ferş: Ax.
(84) Zahir: Eşkera, berçav, li ber çavan.
Senayi': Piranîya "sin'et" e, bi mana "huner" û "pîşe" ye.
(85) Bedayi': Piranîya "bedî" e, bi mana "tiştê pir xweşik ê ku bê numûne û wekok hatîye afirandin" tê.

her yek ji edem kirin te peyda(86)
îbda-i kirin te bê heyûla(87)

*

Fîlcumle çi ewwel û çi axir
elqisse çi mu'min û çi kafir(88)

her yek ji te ra we bûne mezher(89)
ew renge di wan tu bûyî muzmer(90)

bê husnê te nîne wan wucûdek(91)
bê nûrê te nîne wan numûdek(92)

Hîkmet ew e batin î û zahir(93)
qudret ew e xaib î û hazir(94)

Nînin te tecezzu' û temekkun(95)
Emma we di wan dikî tewettun(96)

goya hemî cîsmek in, tu can î(97)
goya hemî şehrek in, tu xan î

---

(86) Edem: Tuneyî.
(87) Îbda': Afirandina tiştan bê numûne û wekok.
Heyûla: Maddeya pêşîn a ku hin bîreweran gotîye "gerdûn ji wê hatîye afirandin"; lê belê bîrewerên Îslamê ev dîtin vegerandine û gotine "maddeyeka weha tune, Xwedê gerdûn ji tuneyîyê afirandîye".
(88) Elqisse: Bi kurtî.
(89) We: Wisa.
Mezher: Xuyangeh, cîyê xuyanê, cîyê xuyabûnê. Yanî "her yek ji te ra wisa bûne cîyê xuyanê, tu ji her yekê wisa dixuyî û têyî dîtin".
(90) Ew renge: Bi wî rengî, bi wî awayî, wisa.
Muzmer: Veşartî, poşayî. Yanî "tu di wan da hatî veşartin û poşan".
(91) Wucûd: Heyî, hebûn.
(92) Numûd: Xuyan, xuyabûn.
(93) Batin: Nexuyayî, veşartî.
(94) Xaib: Nexuyayî, ji çavan winda.
(95) Tecezzu': Parçebûn.
Temekkun: Cîgirtin, bicîbûn.
(96) Tewettun: Cîgirtin, bicîbûn. Yanî "tu wisa di wan da cî digirî, wisa di wan da bicî dibî".
(97) Goya: Wek ku, mirov dibêje qey ku, ji mirov we ye ku.

Husna te ye zîneta hebîban(98)
Reşka te ye xîreta reqîban(99)

Meyla te ye aşiqan dikêşit
Derdê te ye dil ji ber diêşit

Şîrîn te kire şekir li Perwîz
Ferhad-i ji rengê eşkê xûnrîz(100)

Leyla te kire bela li Qeysî(101)
Ramîn bi te ram-i bû li Weysî(102)

Yûsuf te çira numa Zuleyxa?(103)
Wamiq te kusa gîhande Ezra?(104)

Şêxê we ku pênce hec bijarî
dîn kir te jibo keça kufarî(105)

Nîluferê nazeperwerî kir(106)
ew jî te li Mîhrê mişterî kir(107)

Balayê bilind te daye serwan(108)
pabendê bela te da tezerwan(109)

---

(98) Zînet: Xeml û xêz.
Hebîb: Yar, berdilik, dilbir.
(99) Reşk: Xwezî, bijî, pêjna ku mirov bi wê xwezîya xwe bi kesek yan bi tiştek tîne.
(100) Eşkê xûnrîz: Histirên xwînrêj, histirên çavan ên xwînî.
(101) Qeys: Evîndarê Leylayê, ku jê ra tê gotin "Mecnûn".
(102) Ram bû: Hat girêdan, teslîm bû, stûxwar bû.
(103) Numa: Nîşan da, mêrand.
(104) Kusa: Çawa, bi çi awayî.
(105) Kufar: Piranîya "kafir" e. Yanî "ew şêxê ku pênce car çûbû hecê, te jibo keça kafiran ew dîn kir". Ev îşaret e bi alîyê Şêxê Sen'anîyan ve, ku bûye evîndarê keça mîrê Ermenistanê.
(106) Nazeperwerî kir: Bi naz gîhand, te ew bi naz gîhand û nazdar kir.
(107) Mîhr: Roj.
(108) Bala: Bejn.
Serw: Dareka gelek bilind e, jê ra "selw" û "sewl" jî tê gotin.
(109) Pabend: Linggirêdan, girêdana lingan.
Tezerw: Tewirek teyr e, wek mirîşkan e, lê gelek xweşik e; nikare bifire. Eslê peyvikê "tezerû" ye, li vir jibo lêkanîna qafîyê weha hatîye nivîsîn".

Sorgul te kirin ji xar-i peyda(110)
bilbil te kirin hezar-i şeyda(111)

Xweş rengî te da gîyayê sorgul
xweş dengî te da newayê bilbil(112)

Ronahî te da serê şemalan(113)
perwane kirin bi şewqê talan(114)

Mehbûb-i te çêkirin di dilkeş(115)
meczûb-i te pê kirin muşewweş(116)

Ev işq û mehebbeta di dil da
ev zulf û selasilê di mil da(117)

Aya ne te çêkirin muqabil(118)
her yek te bi hev kirin muadil(119)

---

(110) Xar: Strî.
(111) Şeyda: Evîndarê gêjbûyî, kesê ku ji ber evînê gêj bûye û hişê wî ji serê wî çûye, sews bûye.
(112) Newa: Awayê dengbêjîyê, awayê stranê.
(113) Şemal: Find.
(114) Perwane: Firfirok.
Şewq: Hewes, xwestin, daxwaz, evîn, daxwaza gîhana tiştek.
(115) Mehbûb: Yar, berdilik, dilbir,
(116) Meczûb: Kesê ku ber bi evînê tê kişandin, dikeve ber bayê evînê û nikare xwe li ber wî bayî ragire.
Muşewweş: Lihevketî, têkilhev, sews û sergêj.
(117) Selasil: Piranîya "sîlsîlet" e, bi mana "zincîr" e. Wisa tê zanîn ku mexsed ji wan "kezîyên yaran in, ku wek zincîran dirijin ser milên wan". Yan jî "ew zulf û kezîyên yaran, ku dibin wek zincîran û dikevin milên evîndaran".
(118) Ne: Ev peyvik di eslê xwe da "nê" ye û peyvikeka pîtkirinê û bîranînê ye; dema mirov bixwaze maneyek pît û zexm bike, yan jî mirov bixwaze tiştekî kifşkirî yê eşkera bîne bîra kesek, mirov vê peyvikê bi kar tîne. Wek ku mirov bêje "nê tu dizanî ku zimanê me Kurdî ye". Li vir jibo wezna malikê, bi awayê "ne" hatîye karanîn. Hozên ji Xwedê ra dibêje "nê te çêkirin", yanî "malûm e ku te çêkirin, her kes dizane ku te çêkirin, kifş û eşkera ye ku te çêkirin".
(119) Muadil: Hevta, du tiştên ku tayên hev in.

www.netewe.com

Ayîne te çêkirin mukerrer(120)
husna xwe di wan te kir musewwer(121)

Ayîne ji wan we ye ku av e
ew eks-i ji wan we ye ku tav e(122)

(Paşîya wê heye)

Li Misrê "Metbea El-Hîlal" de tebi' bîye

---

(120) Mukerrer: Çencar, li pey hev.
(121) Musewwer: Wênekirî, resimkirî.
(122) Eks: Wêne, resim, tiştê ku di avê da yan jî di neynikê da dixuye.

www.netewe.com

KURDİSTAN

1315

Heçî vê kaxizekî rêke ji min re, divê ser kaxizî weha binivîse: "Bî Misr necl'ul-merhûm Bedirxan Paşa Mîqdad Mîdhet Beg"

*

Her car du hezar cerîdeya ez'ê rêkim Kurdistanê, de belaş bidin xelkê

Pazde roja de carekê têt nivîsandin cerîdeya Kurdî ye

Kürdleri tahsil-i ulûm ve fünûna teşvik eder nasayih ve edebiyat-ı Kürdiyeyi hâvî on beş günde bir neşrolunur Kürdçe gazetedir

Gazetenin mesleğine muvafık Arabça, Türkçe, Farisîce mektublar Kürdçeye bittercüme neşrolunur

Unvan: Mısır'da **"Kürdistan"** Gazetesi Sahib ve Muharriri Bedirhan Paşazade Mikdad Midhat

*

Her tabı'da 2000 nüsha Kürdistan vülât-ı izamına irsal ve vesatetleriyle kura ve kasabâta neşr-ü tamim olunacaktır

*

Kürdistan haricinde her yer için senelik abone bedeli 80 kuruştur Kürdistan dahilinde hususî isteyenlere meccanen gönderilir

Roja pêncşemê de 12 Zulhîcce sene 1316 * Pencşembe fi 21 Mayıs sene 1314(3)

(1) Divîya ku li vir "eded 4" yanî "jimare 4" bihata nivîsîn. Lê belê di eslê rojnamê da ev goşe weha vala derketîye(burada "sayı 4" demek olan "aded 4" yazılmalıydı. Ancak gazetenin aslında burası boş çıkmıştır).

(2) Divîya ku li vir jî piştê peyvika "rûper" jimara "l"ê bihata danîn. Lê belê di eslê rojnamê da tenê peyvika "rûper" cî girtîye.

(3) Li gora tarîxa Mîladî 3 Hezîran 1898(Milâdî tarihe göre 3 Haziran 1898). Peyvika "Zulhîcce" li vir bi şaşî derketîye, divîya ku di şûna wê da "Muherrem" bihata nivîsîn(buradaki "Zülhicce" sözcüğü yanlışlıkla böyle çıkmıştır, onun yerine "Muharrem" yazılması gerekirdi).

www.notewe.com

ŞEVKETLU AZAMETLU SULTAN ABDÜLHAMİD-İ SANÎ HAZRETLERİNE ARZIHAL-İ ABÎDANEMDİR NUMRO 1

Padişahım,

Saye-i maarifvaye-i Şahanelerinde birinci defa olarak neşr-ü ihdasına muvaffak olduğum Kürdçe **"Kürdistan"** gazetesinin memalik-i mahruse-i Şahanelerine men'i duhulü, Dahiliye Nezaret-i celîlesinden tamimen icabedenlere bildirildiğinden, mezkûr gazetenin intişar ve tamimi yolunda tesadüf ettiğim müşkilât hasebiyle, Makam-ı Sadaret-i uzma ile Mabeyn-i hümayun-ı mülûkâneleri Başkitabet-i celîlesine müracaatle, müşkilât-ı mezkûrenin ref'i zımnında vuku bulan istirhamât-ı abîdanemin hâkipay-ı hümayunlarına arzını ve şayed şu istirhamâtım dahi sairleri misillu koltukaltı edilecek olursa, açık arîzelerle keyfiyeti sem'i hümayunlarına îsale çalışacağımı iş'ar emiş idim.

Aradan, cevab alınacak kadar zaman geçtiği halde bir haber alınmadığından, istirhamât-ı vakıa-i abîdanem, ilerde indelîcab isimlerini arzedebileceğim garazkâr bazı ashab-ı nüfuzun mümanaat ve haylûletine uğrayarak hatırlarına feda edilmiş mütalaasıyle, **"Kürdistan"**ın birinci sahifesiyle atebe-i ulya-i Şahanelerine arzına mecbur oldum.

Padişahım,

Malum-ı Şahaneleri buyurulduğu vechile, Kürdler, devlet-i ebedmüddet-i Osmaniyelerini teşkil eden akvamın en güzîdelerinden ve Kürdisatan dahi mevkian iki devlete(4) hemhudud ve alelhusus Anadolu tarafından tecavüz-i a'dayı mani ve hatta o cihetten düşmanı tehdid edebilmek kabiliyetini haiz olduklarından, politika âleminde mühim bir mevki işgal ettikleri ve birçok zamandan beri Osmanlı tabiiyetiyle müftehir bulundukları halde, cülûs-ı meyaminme'nûs-ı hümayunlarına gelinceye kadar bunların talim ve tedrisleriyle esbab-ı terakkîleri her nasılsa nazar-ı dikkate alınmamıştır.

Kulları,(5) ümera-i Ekradın mümtazlarından ve "küllüküm rain ve küllüküm mes'ûlün an raiyyetihi" emr-i nebevîsiyle me'mur ve mes'ûl bulunduğumdan, hisse-i abîdaneme düşen vazifeyi îfa maksadıyle, Kürdleri tahsil-i ulûm ve fünûna teşvik etmek ve zamana göre ilkaatta bulunmak üzre Kürd lisanıyle şu gazeteyi ihdas ve neşrettim.

---

(4) Sözü edilen iki devlet, İran ve Rusya idi.
(5) Yazar, "kulları" sözcüğüyle kendini kastediyor.

Çakerleri(6) ümeradan bulunmuş ve gazetenin hâvî olduğu nasayih Kürd lisanıyle taraf-ı abîdanemden icra edilmiş olmağla, Kürdlere tabiat ve kavmiyet hasebiyle fevkalâde hüsn-i te'siri mutlak olduğundan, eğer on sene mukaddem şu gazete gibi bir ceride mevcud olmuş olaydı, bunca müdahalât ve iz'acât-ı ecanibi mucib olan Kürdistan iğtişaşâtına meydan verilmemiş ve küllî bir terakkî ve temeddün âsârı hasıl olmuş olurdu.

Padişahım,

Çakerlerince şu Kürdçe gazete, Kürdistan'ca icrası iltizam buyurulan ıslahâtı tesrî' ve te'min ve bazı me'murînin irtikâb ettikleri mezalimi men'edecek esbabın birincilerinden olup, şu suret birçok alakadarlar tarafından dahi tasdik edilmekte ve esasen münderecatında muzır bir şey olmadığı gibi, tamamen hükümet-i seniyyenin tensib ve arzusuna tevfiki dahi mümkin olduğundan, herhalde Kürdistan'la Kürdlerin bulundukları mahâll-ı saireye dühulü hususuna ruhsat itasının Babıâlî'ye(7) irade ve ferman buyurulmasını hâkipay-ı hacetreva-i Şahanelerine iltica ile istirham ederim. Ol babda emr-ü ferman.(8)

(6) Yazar, "kulları, bendeleri, hizmetçileri" anlamına gelen "çakerleri" sözcüğüyle de kendini kastediyor.

(7) Babıâlî: Sözlük anlamı "Yüksekkapı" olan bu ad, Osmanlı hükümetinin yönetim merkezi olan ve Osmanlı sadrazamlarının makamının da bulunduğu bina için kullanılırdı. Bu binanın bulunduğu İstanbul'un semti de, zamanla aynı adla adlandırılmış ve bu ad günümüze kadar kullanılagelmiştir.

(8) Osmanlılar zamanında kullanılan "ol babda emr-ü ferman" sözünden maksat, "bu konuda emir ve ferman buyurulmasını dilerim" demekti. Bu söz, kimi zaman "ol babda emr-ü ferman Padişahımındır", kimi zaman da sadece "ol babda" biçiminde ve kimi zaman da yalnızca "ferman" diye kullanılırdı.

Ev xetê min jor bi Tirkî nivîsî, kaxizek e ji Hezretê Sultan Ebdulhemîd Xan re ye. Li vî kaxizî de ez hêvî dikim ku îzna cerîdeya min bide, da ez rêkim Kurdistanê.

Ji welatên ez cerîda rêdikim ji min re dinivîsin ku cerîdeyên ez rêdikim, me'mûrên hukumetê nadin xweyîya.(9) Çiku Kurmancî nizanin, dibêjin qey min derheqa wan de tiştek nivîsîye.

Heki dîsa îzin nedan ku ez cerîdeya xwe rêkim nêv Kurda, divê Kurd hemî bighîn hev, ji walîya, muteserrifa hêvî bikin, da bihêlin ez vê cerîdeyê rêkim welatên Kurda.(10)

Gelek milet henin, ne nîvê me ne; hemî xweycerîde ne, xweykitêb in, xweymedrese ne. Kurd ji hemî qewma zêdetir xweyxîret û hîmmet in; loma bêkitêbî, bênivîsandin li ser me ar e, fehêt e.(11) Wek Ehmedê Xanî gotî:

Ger dê hebuwa me îttîfaqek
vêkra bikira me înqiyadek

Rom û Ereb û Ecem temamî
hemyan ji me ra dikir xulamî

tekmîl-i dikir me dîn û dewlet
tehsîl-i dikir me ilm û hîkmet

Gelî mîr û axano! Îttîfaq bikin, bigîhin hev! Heki walîya, mutesserifa guh neda we, ji Xunkar re telgrafa binivîsin, erzihala bişînin,(12) da îzna vê cerîdeyê bidit ez ji we re rêkim.

Ev cerîdeya ez dinivîsim, min gelek xelkê re rêkirîye. Mirov hemî vê cerîdeyê pîroz dikin, Kurda tebrîk dikin. Ev cerîde wê bibe sebebê ku Kurd jî wek xelkê hemîya, dinyayê de çi dibe hemîya bibihîsin, bizanin. Hin mirov henin, navên Kurd bielimin halên dinyayê, divên her çavgirtî bimînin, tiştekî nezanin, da wek vên heqaret li wan bikin.(13) Wekî Kurd xweycerîde bin, nivîsandin bizanin, me'mûr bin ji mîr û axayan bin heçî zulm li wan kir, wê bikaribe ji min re kaxizekî binivîse.(14) Ez'ê li cerîdeyê de îlan bikim, bi vê rê de ez'ê derdê wî bighînim heya guhê Xunkar. Loma zaliman navên Kurd bibin xweycerîde, xweynivîsandin. Çi qa hêl û qewet ser min heye, ez'ê bixebi-

(9) Nadin xweyîya: Nadin xwedîyan.
(10) Awayê rast, "welatê Kurdan" e.
(11) Fehêt: Fedî, şerm, neng, tiştê ku mirov fedîkar û şermî dike.
(12) Erzihal: Daxwazname, nameya ku tê da daxwazeka resmî tê nivîsîn û ji kargêrên dewletê ra, ji meqamên resmî ra tê pêşkêşkirin.
(13) Mana vê pevekê bi Kurdîyeka vekirî weha ye: "Hin mirov hene ku naxwazin Kurd rewşa dinyayê bibihîzin û bizanin; ew dixwazin ku Kurd tim û tim çavgirtî bimînin û tiştek nezanin, da ku ew jî wek ku dixwazin heqaret li Kurdan bikin".
(14) Mana vê pevekê jî weha ye: "Eger Kurd bibin xwedî rojname û bizanin binivîsin, dema ku me'mûr yan jî mîr û axa li wan zordestî bikin, ew'ê bikarin ji min ra kaxizek binivîsin".

tim Kurda bielimînim nivîsandin û halê din ji wan re cerîda rêkim.(15) Xwedê teala emir kirîye ku "mu'min hemî bira ne". Çawa min xêra birakî xwe bivê, welê ez'ê ji Kurda re jî bixebitim.

Gelî mîr û axano! Hun li saya Kurmanca mîr û axa nin. Loma divê hun qenc fekirin wan,(16) ewan bidin xwendin, bielimînin ilm û hunera. Heki Kurmanc nebin, hun'ê mîr û axatî ji kî re bikin! Kurmancên we hingî xurt, dewlemend bin, mîr û axayên wan jî wê hew qas xweynav û deng bin. Loma, gelî mezinên Kurmanca, divê hun wek ewladên xwe fekirin Kurmanca!

Cerîdeya berî vê min nivîsî ku Hezretê Nebî(17) eleyhîsselam, emir kirîye ku "hun hemî şivan in, ewên un şivanên wan wê ji we hemîya bên pirsîn". Gelî ulemayên Kurda! Divê mana vê hedîsa şerîf hun qenc bêjin mezina, da bizanin deynê ser wan çi ye.

FAZÎLET'UL-İLM(18)

Hezretê Pêxember, eleyhîsselam, gotîye "mirovê qenc, mirovê zêde xweyfedl û kerem, mirovê alim e;(19) ku mirovên dî jê fêdê dibînin û ew muhtacê kesê nîne".

Dîsa Hezretê Nebî, eleyhîsselam, emir kirîye ku "îman tazî ye; cilên îmanê teqwa ye, zîneta wê heya ye, semereya wê jî ilm e".(20) Loma mirovên bêilm, mirovên nexwendayî nikarin semereyê ji îmana xwe bibînin.

Mirovên nêzîkê dereceya pêxemberî, mirovên alim û cahid in.(21) Ji lewre un çiku alim(22) bi ilmê xwe xelkê dielimîne emrê Pêxember û rîya rast; cahid jî bi şîrên xwe(23) emrê Pêxembera hifz dikin.

---

(15) Halê din ji wan re cerîda rêkim: Ez'ê bi awayekî dî ji wan ra rojnaman bişînim; yanî eger hukumet nehêle ez rojnama xwe rêkim jî, ez'ê bi awayekî dî wê rêkim.

(16) Fekirin wan: Li ser wan bifikirin, rewşa wan bidin ber çavên xwe.

(17) Nebî: Pêxember.

(18) Fazîlet'ul-ilm: Rûmet û başî û bilindîya zanînê, qedrê zanyarîyê.

(19) Fedl: Başî, serbilindî, serfirazî, rûmetbilindî.
Kerem: Qencî, başî, rûmetbilindî, serfirazî.

(20) Teqwa: Cîanîna fermanên Xwedê û xweparastina ji qedexekirîyên wî, ku mirov fermanên Xwedê bîne cî û tiştên ku qedexe kirine xwe ji wan biparêze.
Zînet: Xeml û xêz.
Heya: Fedî.
Semere: Fêkî, ber, hilberî.

(21) Cahid: Kesê ku di rîya Xwedê da şer dike, şerkarê xwedayî. Di eslê xwe da peyvika "cahid" bi mana "xebatkar" e, peyvika ku bi mana "şerkarê xwedayî" ye jî peyvika "mucahid" e. Wisa tê zanîn ku nivîskar bi şaşî ev peyvik di şûna peyvika "mucahid" da bi kar anîye, lê qesta wî mana wê peyvikê bûye. Lewra hema piçek li jêr gotîye "cahid jî bi şîrên xwe emrê Pêxembera hifz dikin". Kesên ku bi şûrên xwe emrê Pêxemberan diparêzin, ji wan ra tê gotin "mucahid", ne ku "cahid".

(22) Yanî "çiku hun alim, lewra hun alim".

(23) Bi şîrên xwe: Bi şûrên xwe.

Loma, gelî mîr û axano, Kurmancno! Qenc bizanibin xwendin, ilm û marîfet, dinya û axretê rûyê mirov sipî dike,(24) mirov muhtacê tu nabe.(25) Rîya Xwedê de, paş nuho zarûyên xwe bielimînin ilm û marîfeta! Hun bi xilqeta xwe şecî', cesûr in.(26) Heki hun bibin xwey'ilm, hun'ê ji dinê hemîya xurttir, dewlemendtir bibin.

Xwedê teala xîtab kirîye(27) Îbrahîm eleyhîsselam re ku "ez elîm im,(28) hej mirovên . . .(29) Loma, mirovên Xwedê dinasin divê bielimin ilm û marîfeta, da Xwedê teala ji wan razî bit.

Hezretê Nebî, eleyhîsselam, gotîye "ez çawa ji sahabekî xwe yê kiçik(30) qenctir û xweyfediltir im,(31) welê alimek ji abidekî(32) qenctir e û xweyfediltir e. Çawa şeva bedrê(33) hîv ji istêra xweyfediltir e, welê alim ji abida xweyfediltir in. Fedla mu'minê alim, heftê dereceya ji fedla mu'minê abid zêdetir e".

Ji Fexrê Alem(34) eleyhîsselam pirsîne ku "emelê qenc kîjk e?"(35) Gotîye "ilmê Xwedê teala ye". Dîsa pirsîne ku "mirad kîjan ilm e?"(36) Gotîye "elimandina Xwedê teala". Dîsa pirsîne ku "ya Pêxember, em pirsa emelên qenc ji te dikin, tu cewaba ilmê Xwedê teala didî me". Ji ew paşê eleyhîsselam ferman kir ku "bi elimandina ilmê Xwedê re, emelên hindik gelek fêdeyê didin mirov û nezanîn û cehla Xwedê teala gelek emel tu fêdeyê nadin. Loma, bê ilm gelek îbadet jî gelek fêdeyê nadit".

*

Îmamê Xezalî gotîye: "Mirov ji heywana bi ilm ferq dibin. Deve bi qeweta xwe ji însanî qewettir e, fîl bi hestîyên xwe ji însanî mezintir e, şêr bi cesareta xwe cesûrtir e, gamêşek ji însanî zêdetir dixut û zikê wê mezintir e, mêranîya çûkek(37) kiçik wek beytakê ji mêranîya însana zêdetir e; însan bi ilmê, bi zanînê ji heywanên dî ferq dibin, însan elimandina ilmê re hatine xeliqandin".

---

(24) Awayê rast, "di dinya û axretê da rûyê mirov sipî dike" ye.
(25) Yanî "mirov muhtacê çu tiştek nabe".
(26) Xilqet: Afirîn, awayê ku mirov li ser tê afirandin.
Şecî': Wêrek, fêris, egît, mêrxas.
(27) Xîtab kirîye: Gotîye, peyivîye.
(28) Elîm: Kesê pir zana. Ev, yek ji navên Xwedê ye.
(29) Li vir cîyê çend peyvikan di eslê rojnamê da vala derketîye. Wisa tê zanîn ku du peyvik ji vir ketine, ew jî ev in: "alim dikim".
(30) Kiçik: Biçûk. Ev peyvikeka Farisî ye, li hin hêlên Kurdistanê ketîye Kurdî jî. Lê belê li piranîya Kurdistanê peyvika "biçûk" tê karanîn.
(31) Xweyfedil: Xwedîbaşî, kesê ku başî û qencî dike, mirovê qedirbilind.
(32) Abid: Îbadetkar, kesê ku ji Xwedê ra tim îbadet dike.
(33) Bedr: Hîva tijî, hîva pazde şevî ku ronayîya wê pir zêde ye.
(34) Fexrê Alem: Pesnê alemê, kesê ku alem pê dipesine. Ev peyv jibo Pêxember tê gotin.
(35) Emel: Kar, karê ku mirov dike.
Kîjk e: Kîjan e.
(36) Mirad: Daxwaz, mexsed. Yanî "daxwaz û mexseda te kîjan ilm e?"
(37) Çûk: Çivîk.

Luqman gotîye kurê xwe: "Rexê alima rûne. Xwedê teala erdê çawa bi barana ewra îhya dike,(38) welê qelbên mirova jî bi nûra ilm û hîkmetê îhya dike".

Wacib teala(39) li ayeta celîle(40) ya "şehîdellahu ennehu la îlahe îlla huwe we'l-melaîketu we ulu'l-ilm"(41) de ewwulî behsa xwe, paşê behsa melaika, paşê behsa xweyîyên ilmê kirîye. Ji vê ayetê jî aşîkar dibe ku ilm ji hemî tişta qenctir e.

*

Cerîdeya berî vê min wad kiribî(42) ku ez'ê behsa şerê Emrîqa û Îspanyayê binivîsim. Ewwulî, divê ez van du dewleta ji we re piçekê tarîf bikim:

Îspanya dewletek Frenga ye. Berî heft sed sala, cihê nuho dewleta Îspanyayê lê û bajarên Îspanyayê hemî, yên Musulmana bî. Wê hingê hin ji mulûkên Emewîye wê derê xelîfe bîn. ji ew paşê xelîfeyên wan edalet berdan, dest xirabîyê kirin, ilm û marîfet nema, wezîr û walîyên wan jî dest bertîla kirin, mîr û axayan jî wek Hezretê Nebî eleyhîsselam gotî "en-nasu ela sulûkî mulûkîhîm"(43) dest zulm û xirabîyê kirin, gundî reben bîn, jar bîn. Loma Frenga karî wan, erdên wan hemî girtin; hin Musulman revîn nêv Îslamê de Afrîqayê,(44) gelek ji wan hatin kuştin, gelek jî man wê derê ber hukmê Frenga, heya nuha gelek ji wan bîne File.

Eve we piçekê zanî Îspanya çi bî û nuho çi ye.

Emrîqa jî erdek gelek mezin e, dora wê hemî behr e. Kesê ev erdê Emrîqayê nedizanî. Zemanê mulûkên Emewîye li Endelusê, saya ilm û marîfetê zanîn ku erdek weha heye. Hin qewî ji alimên wan,(45) gemîya siwar bîn, çûn keşfa Emrîqayê. Ser Behra Muhîta Atlasî geran, ji hin sebeba nekarîn gelek bigerin. Loma tu erd nedîtin, vegeran; lê hin elamet dîtin ku erdek dî ser Dinyayê heye.

Paşê 1498 tarîxa Mîladî, ango berî çar sed sala, Frengek navê wî "Qristof Qolomb" çû gelek gera,(46) ew erdê Emrîqa dît. Wekî Frenga bihîst erdek weha nû hatîye dîtin, gelek Freng çûn wê derê; fekirîn ku xelkên Emrîqayê kûvî ne, lê cihê wan gelek xweş e, axa wê de gelek zêr û zîv hene; hêdî hêdî mirov elimandin, xwe elimandin huner û marîfeta; hingî çû Emrîqa bî xweynav û deng. Kuderê medrese û mektebek qenc bihîstin, zarûyên xwe rêkirin wê derê dan xwendin. Nuho ji dewletên Frenga hemîya zêdetir xweyhuner û marîfet in. Hemî dewlet ji wan ditirsin.

Eve we zanî Emrîqa jî çi bî, nuho çi ye.

---

(38) Ewr: Hewr.
Îhya dike: Vedijîne, digîhîne jînê.
(39) Mexsed ji "Wacib teala" Xwedê ye.
(40) Celîle: Mezin, gewre, qedirbilind.
(41) Mana vê ayetê weha ye: "Xwedê şahidî da ku ji bil wî çu xweda tunin, milyaketan û kesên zanyar jî wisa şahidî dan".
(42) Wad kiribî: Wad kiribû, soz dabû.
(43) Yanî "mirov li ser rîya mîrên xwe ne".
(44) Yanî "hin Musulman revîyan û çûn Afrîqayê, nava Îslamê".
(45) Yanî "hin kesên xurt ji zanayên wan, ji nava zanayên wan hin kesên xurt û jêhatî".
(46) Gera: Gerîya.

Şerê Emrîqa û Îspanyayê li ser behrê ye. Îspanya gelek dewletek kevn e, Emrîqa nû ye. Lê saya xebitandinê, saya ilm û marîfetên xwe Emrîqayê top û tifing û waporên we mezin hene,(47) ba tu dewleta welê tunînin. Îspanya dizane nikare Emrîqayê. Lê çiku Îspanya zulmê dike, Emrîqayê divê wan mirovên mezlûm ji binê hukmê Îspanya xilas bike. Îspanya jî navê Emrîqayê têkilê şixulê xwe bike. Loma nuho şerê wan e. Hingî dest şerî kirin, waporên Emrîqayê hemî dera karîn waporên Îspanyayê şewitandin, xeriqandin. Nuho Emrîqayê, cihê wan mirovên mezlûm ku navê wê derê "Kuba" ye, gelek eskerê Îspanyayê li wê derê ye, ew der kirîye muhasereyê de.(48)

Wek em dizanin, çiku Emrîqa xweyhuner û marîfet e wê bikare Îspanyayê.

Waporên şerî yên Emrîqayê berî çend rojekê çûbîn hin cezîreyên(49) Îspanyayê bigirin. Li wê derê rastê pazde waporên Îspanyayê hatin, ku hemî jî tijî top û esker bîn. Rexa cezîreyê jî gelek topên Îspanyayê hebîn. Wekî hevûdû dîtin, ji her du mila topa dest pê kir. Mirovên çûbîn seyra şerî jî dinivîsin ku wekî şer xweş bî, ji dengê topa, ji teqandina guleya erd û esman dinala. Wekî ew guleyên du sed-sê sed huqe(50) li tabya,(51) li wapora diket û diteqa, we dengên ecêb ji wan dihat, heçku qiyamet e, erd û esman têkilhev dibin. Bi gulekê waporek mezin şewitî û not mêr derbekê de hatin kuştin. Şerî sê-çar saeta dom kir; waporên Îspanyayê hin jê şewitîn, hin jê hatin xeriqandin, hin jê xira bûn.

Li Misrê "Metbea Cerîdeya **Kurdistan**"ê tebi' bîye

---

(47) Wapor: Gemî.
(48) Muhasere: Girtina dora cîyek yan kesek yan jî hin kesan, ku dora wan bê girtin û mecala dayin-standina wan bi derve ra nemîne, pêwendîyên wan bi derve ra bên birîn.
(49) Cezîre: Girav, bejê di nava deryayek da yan golek da.
(50) Huqe: Di dewra Osmanîyan da weznek bû, beraberê kîloyek û 283 gram bû.
(51) Tabya: Kozika eskerîyê, cîyê ku esker tê da xwe vedişêre û li dijminê xwe dipê.

4'ÜNCÜ SAYININ ÇEVİRİLERİ

ŞEVKETLU AZAMETLU(52)
SULTAN İKİNCİ ABDÜLHAMİD HAZRETLERİNE
KULCA DİLEKÇEMDİR
SAYI 1

Padişahım,

Bilimlerin nasibini aldığı siz Padişahları sayesinde, ilk kez meydana getirip yayınlamayı başardığım **"Kürdistan"** gazetesinin siz Padişahlarının korunmakta olan ülkelerine girmesinin yasaklanması yüce İçişleri Bakanlığınca gerekenlere genelgeyle bildirildiğinden, söz konusu gazetenin yayınlanması ve yaygınlaştırılması yolunda karşılaştığım güçlükler dolayısıyle yüce Sadrazamlık(53) Makamı ile Padişahlarının Mabeyn-i hümayun(54) yüce Başkâtipliğine başvurarak, sözü edilen güçlüklerin ortadan kaldırılması konusunda yapılan kulca istirhamlarımın siz Padişahlarının ayakları önüne sunulmasını, ve eğer bu istirhamlarım dahi benzerleri gibi hasıraltı edilecek olursa, açık dilekçelerle durumu siz Padişahlarının kulağına ulaştırmaya çalışacağımı bildirmiştim.

---

(52) Şevketlu: Görkemli kimse, iktidardan ve güçten doğan görkemi kişiliğinde toplayan, göz kamaştırıcı görkeme sahip olan kimse. Bu sözcük "şevketmeab" biçiminde de kullanılır ve aynı anlamı verir.
Azametlu: Ulu, yüce, görkemli, göz kamaştırıcı yüceliğe ve görkeme sahip olan kimse.
"Şevketlu", "şevketmeab" ve "azametlu" sözcükleri, Osmanlı padişahları için kullanılırdı.
Bu sözcükler, Türkçede tek sözcükle tam karşılıkları bulunmadığı için, çeviride tarafımızdan aynen kullanıldı; ilerde de çeviride aynen kullanılacaktır.

(53) Sadrazamlık: Başbakanlık. Osmanlılar döneminde Başbakanlığa böyle denirdi, bazen de "Sadaret" denirdi. Bileşik olan "Sadrazamlık" sözcüğünün aslı "sadr-ı âzamlık"tır. Sözcük bileşik durumda "Sadrazamlık" biçimini almıştır. O dönemde Başbakana da "Sadrazam" denirdi.
Bu sözcük, Osmanlı Başbakanlığına özgü bir ad olduğu için, çeviride tarafımızdan aynen kullanıldı.

(54) Mabeyn-i hümayun: Osmanlılar döneminde padişah sarayı ile hükümet yetkilileri, ordu komutanları ve halkın arasında yer alıp işlev gören makam, kurum. Bazen sadece "Mabeyn", bazen de "Padişah Mabeyni" demek olan "Mabeyn-i hümayun" biçiminde kullanılırdı.
Her iki kullanılış biçiminde de Türkçede tam karşılığı bulunmadığı için, çeviride tarafımızdan aynen kullanıldı.

Aradan yanıt alınacak kadar zaman geçtiği halde bir haber alınamadığından, yapılan kulca istirhamlarım, ilerde gerektiğinde adlarını sunabileceğim bazı garaz sahibi nüfuzluların araya girip engellemelerine uğrayarak hatırlarına feda edilmiş düşüncesiyle, bu istirhamlarımı **"Kürdistan"**ın birinci sayfasıyle siz Padişahlarının yüce eşiğine sunmak zorunda kaldım.

Padişahım,

Siz Padişahlarınca da bilindiği gibi, Kürdler, sonsuza dek yaşayacak olan(55) Osmanlı devletinizi oluşturan halkların en seçkinlerinden ve Kürdistan da konum olarak iki devletle sınırdaş(56) ve özellikle Anadolu tarafından düşmanların saldırısını engellemek ve hatta o yönden düşmanı tehdit edebilmek yeteneğine dahi sahip olduklarından, politika dünyasında önemli bir yer işgal ettikleri ve birçok zamandan beri Osmanlı uyrukluğu ile övündükleri halde, siz Padişahlarının uğurluluğuna alıştığımız tahta çıkışınıza kadar bunların eğitim ve öğrenimleri ile gelişmelerini sağlayacak yol ve yöntemler her nasılsa göz önüne alınmamıştır.(57)

Kulları,(58) Kürd beylerinin seçkinlerinden olduğumdan ve Peygamber'in "hepiniz çobansınız ve hepiniz sürünüzden sorumlusunuz" emriyle görevli ve sorumlu bulunduğumdan, bir kul olarak payıma düşen görevi yerine getirmek amacıyle, Kürdleri bilim ve sanatları(59) öğrenmeye özendirmek ve zamana göre bilinçlendirmede bulunmak üzere, Kürd diliyle şu gazeteyi meydana getirip yayınladım.

Kulları beylerden olduğum ve gazetenin içerdiği öğütler de Kürd diliyle ben kulları tarafından verildiği için, doğal olarak ve ulusal nedenler dolayısıyle, Kürdler üzerinde mutlaka olağanüstü iyi etkisi olacaktır. Eğer on yıl önce bu gazete gibi bir gazete bulunmuş olsaydı, yabancıların bunca müdahalelerine ve rahatsız etmelerine yolaçan Kürdistan karışıklıklarına meydan verilmemiş ve topyekün bir gelişme ve uygarlaşma eserleri elde edilmiş olurdu.

---

(55) "Sonsuza dek yaşayacak olan" sözcükleri, Osmanlılar döneminde Osmanlı devleti için bir terim olarak kullanılan "ebedmüddet" bileşik sözcüğünün yerinde kullanılmıştır. "Süresi ebedî olan" anlamına gelen bu terimin tam karşılığı Türkçede yoktur.

(56) Sözü edilen iki devlet, İran ve Rusya idi.

(57) "Gelişmelerini sağlayacak yol ve yöntemler" sözleri, "esbab-ı terakkî" sözcüklerinin yerinde kullanılmıştır. Arapça bir sözcük olup "neden' anlamındaki "sebeb"in çoğulu olan "esbab", aynı zamanda "araç ve gereçler" ile "yol ve yöntemler" anlamına da gelir. "Terakkî" sözcüğü ise "gelişme, ilerleme" anlamına gelir. Ayrıca Osmanlıcada "ilericilik" anlamında da kullanılırdı. Kanımızca burada her ikisinin en uygun karşılıkları, "gelişmelerini sağlayacak yol ve yöntemler"dir.

(58) Yazar, "kulları" sözcüğüyle kendini kastediyor.

(59) "Sanatlar" sözcüğü "fünûn" sözcüğünün karşılığı olarak kullanılmıştır.

Padişahım,

Ben kullarının görüşüne göre şu Kürdçe gazete, Kürdistan çapında gerçekleştirilip yürütülmesi gerekli görülen reformları hem sağlayacak ve çabuklaştıracak, hem de bazı memurların işledikleri zulmü engelleyecek araçların birincilerindendir. Dıştan da görünen bu gerçek,(60) birçok ilgililer tarafından dahi onaylanmaktadır. Aslında içeriğinde zararlı bir şey bulunmadığı gibi, yüce hükümetin uygun gördükleriyle ve arzusuyle tümden bağdaştırılması dahi olanaklıdır.

Bu nedenle, herhalde, Kürdistan'a ve Kürdlerin bulundukları diğer yerlere girmesi konusunda izin verilmesi için Babıâlî'ye(61) irade ve ferman buyurulmasını, ihtiyaçların karşılandığı siz Padişahlarının ayaklarının bastığı toprağa sığınarak istirham ederim. Bu konuda emir ve ferman!(62)

(60) "Dıştan da görünen bu gerçek" sözleri, "şu suret" sözlerinin karşılığı olarak kullanılmıştır. Arapça olan "suret" sözcüğü, Osmanlıcada hem "biçim", hem de "dış görünüş" anlamında kullanılırdı. Kanımızca buraya en uygun anlam, "dış görünüş" anlamını da içeren "dıştan görünen bu gerçek" olmalıdır.

(61) Bu sayıdaki 7 numaralı dipnota bakınız.

(62) Bu sayıdakı 8 numaralı nipnota bakınız.

www.netewe.com

www.netewe.com

Eded 5 Sala ewwulî Rûper 1

KURDİSTAN

1315

Heçî vê
kaxizekî
rêke
ji min re,
divê
ser kaxizî
weha binivîse:
"Bî Misr
necl'ul-merhûm
Bedirxan Paşa
Mîqdad Mîdhet Beg"

*

Her car
du hezar
cerîdeya
ez'ê rêkim
Kurdistanê,
de belaş
bidin xelkê

Pazde roja de carekê têt nivîsandin
cerîdeya Kurdî ye

Kürdleri tahsil-i ulûm ve
fünûna teşvik eder
nasayih ve edebiyat-ı
Kürdiyeyi hâvî
on beş günde bir neşrolunur
Kürdçe gazetedir

Gazetenin mesleğine muvafık
Arabça, Türkçe, Farisîce
mektublar
Kürdçeye bittercüme neşrolunur

Unvan:
Mısır'da
"Kürdistan"
Gazetesi
Sahib ve Muharriri
Bedirhan Paşazade
Mikdad Midhat

*

Her tabı'da
2000 nüsha
Kürdistan
vülât-ı izamına
irsal ve vesatetleriyle
kura ve kasabâta
neşr-ü tamim
olunacaktır

*

Kürdistan haricinde
her yer için
senelik abone bedeli
80 kuruştur
Kürdistan dahilinde
hususî isteyenlere
meccanen gönderilir

Roja pêncşemê de 27 Muherremulheram sene 1316

*

Pencşembe fi 4 Haziran sene 1314(1)

(1) Li gora tarîxa Mîladî 17 Hezîran 1898(Milâdî tarihe göre 17 Haziran 1898).

www.netewe.com

ŞEVKETLU AZAMETLU SULTAN ABDÜLHAMİD HAN-I SANÎ HAZRETLERİNE ARZIHAL-İ ABÎDANEMDİR NUMRO 2

Padişahım,

Devlet-i ebedmüddet-i Osmaniyelerini teşkil eden akvamdan mensubu olduğum Kürd kavminin, hilkaten ve mevkian haiz oldukları ehemmiyetten dolayı şayan-ı talim ve ıslah olduklarından, Kürdistan'ca iltizam buyurulan ıslahat ve terakkiyât cümlesinden olmak ve "küllüküm raîn. . . ilh."(2) emr-i nebevîsiyle hisse-i abîdaneme düşen vazifeyi îfa etmek üzre, kulları dahi saye-i maarifvaye-i Şahanelerinde şu Kürdçe gazeteyi neşr-ü ihdas ettim.

Gazetemin hilâf-ı me'mul, memalik-i mahruse-i Şahanelerine men'i duhulü Babıâlî tarafından tamimen vilâyâta tebliğ olunduğundan, şu memnuiyetin ref'i hususunun Babıâlî'ye irade ve ferman buyurulması, dört numrolu ve fi 21 Mayıs sene 1314 tarihlu gazetemdeki arîze ile atebe-i ulya-i Şahanelerinden arz ve istirham olunmuştu. Yine hilâf -ı me'mul, memnuiyet-i mezkûre ref'edilmemiş ve hatta ellerinde gazetem görülenler tevkif edilmekte olduğu gibi, şu **"Kürdistan"** gazetesinin neşri rıza-i Şahanelerine muhalif olduğundan, hemen terkiyle Dersaadet'e(3) avdetim ve bu babdaki irade-i seniyyelerine itaat etmediğim halde, geçmiş me'muriyetlerime müteallik bir su-i muamele tasnî' ve isnad ve mahkeme-i aidesinden istihsal olunacak ilâmla hükümet-i Mısriyeden taleb olunacağım ve hükümet-i müşarünileyhanın dahi buna muvafakatle çakerlerini cebren teslim edeceği, oldukça şayan-ı itimad olması lâzım gelen ve maiyet-i celîle-i Hıdîviye(4) erkânından olup indelîcab irae edeceğim vasıta-i malume ile çakerlerine tebliğ olundu.

Padişahım,

Şu Kürdçe gazetenin muhassenâtı bütün erbab-ı maarif ve medeniyetin müsellemi olup, şu halde zat-ı hümayunlarına karşı bu babda esbab ve delail serdiyle tatvîl-i makala hacet yok ise de, memnuiyet-i maruzanın adem-i ref'i ve bi gayri hak habs-ü tevkif-i eşhasla tehdidât-ı vakıa hakkında müsaade-i seniyyeleriyle bazı istirhamatta bulunacağım. Şöyle ki:

---

(2) İlh.: Arapçada kullanılan ve Osmanlıcaya da geçen bu sözcük, "sonuna kadar" anlamına gelen Arapça "ilâ ahirihi" sözcüklerinin kısaltılmış biçimidir. Bilinen bir sözün ya da bazı sayıların yazılmak istenmesi sırasında, o sözün bir-iki sözcüğü ya da sayılmak istenen şeylerin bir-iki tanesi yazılır ve söz uzatılmadan, "sonuna kadar" anlamındaki "ilâ ahirihi"nin kısaltılmışı olan "ilh." sözcüğü yazılır. Bu sözcük, sadece yazıda kullanılır. Konuşmada ise tam olarak "ilâ ahirihi" denir.

(3) Dersaadet: "Mutluluk yeri" anlamına gelen bu ad, Osmanlılar döneminde başkent İstanbul için kullanılırdı.

(4) Hıdîviye: Osmanlılar döneminde Mısır'ı yöneten ve biçimsel olarak Osmanlı padişahına bağlı olmakla birlikte uygulamada bağımsız olan yönetim kurumu. Kral niteliğinde olan ve eski Mısır Valisi Kavalalı Mehmed Ali Paşa'nın soyundan gelen yöneticiye de "Hıdîv" denirdi.

EVVELEN

Memnuiyet-i mezkûrenin ibkası, gazetemi Kürdistan'a idhal edebilmek için münderecatının bir kısmını vesatetlerine müracaat edeceğim bazı eşhasın fikrine tevfik etmek lâzım gelecektir ki, şu suret, istemeyerek bizzarur ihtiyar olunacağından, maddî-manevî mes'ûliyetini müsebbiblerine terkederim.

SANİYEN

Habs-ü tevkif, kavanîn-i mevzuanın tayin ve tâdad eylediği ahvaldan birini irtikâb eden şahıs hakkında caiz olabilir. Ahval-ı madude-i mezkûre haricinde vuku bulacak hareket, mucib-i mes'ûliyet olamaz. Çünkü efrad-ı cemiyet, harekât ve ef'al-ı memnuayı ancak kanundan öğrenebileceklerdir. Şu halde, Kanun-ı Cezanın tayin etmediği bir maddenin mürtekibi mücrim addedilemeyeceğinden, bittabı' habs-ü tevkif olunamaz.

Binaenaleyh, "**Kürdistan** gazetesini ele almak, okumak şu cezayı müstelzimdir" diye irade-i Şahaneleriyle men' ve ilân edilmedikçe, anın ne karii, ne de hamili mes'ûl olamaz. Olursa zulmedilmiş olur ki, zalimler hakkındaki ayât-ı kerime ve ehadis-i şerifenin tayin ettiği ceza, herkesten ziyade zat-ı şevketmeabınızca malum olması lâzım geldiği ve ser-i kârda bulunan me'murînin irtikâb ettikleri mezalim aledderecât zat-ı Şahanelerinden dahi mes'ûl olacağı, "el-imamu mes'ûlun alennasi an raiyyetihi"(5) hadis-i şerifiyle ve ahkâm-ı saire-i Kur'aniye ile muhakkaktır.(6)

SALİSEN

Tehdidât-ı vakıaya dair olan tebligat-ı maruzeye tamamıyle itimad etmemekle beraber, elyevm İstanbul'da ser-i kârda bulunan bazı zevâtın malumum olan ahval ve ahlakına nazaran, gûya sadakat olmak üzre iftira gibi bir denaeti irtikâb etmeleri müsteb'ad olmadığından, ihtiyaten, îcabeden kuvve-i âdileye müracaatla hukuk ve istikbal-i abîdanemi taht-i temine aldım.

Akılsız dost kabîlinden olan bazı bendegân-ı Şahanelerinin şu irtikâb ve tenezzülleri, şevket ve azamet-i mülûkâneyi ihlâl ve hande-i ağyarı mucib olmaktan başka bir şey intac etmeyeceğini hasbessadaka şimdiden arzederim.

---

(5) Yani "insanların başındaki önder, uyruklarından sorumludur". Burada dizgi hatası sonucu böyle çıkan hadisin doğru biçimi, "el-imamu alennasi mes'ûlun an raiyyetihi"dir.

(6) Bu cümlenin sonu derginin aslında "sair-i ve ahkâm-ı Kur'aniye ile muhakkaktır" biçiminde çıkmıştır. Bunun bir dizgi yanlışlığı sonucu böyle çıktığı açıktır. Bu nedenle, biz doğru biçimini yazdık.

Bazı zevât tarafından birkaç defalar gerek çakerlerine ve gerek bazı bildiklerime, gûya taraf-ı Şahanelerinden birçok iradeler, vaadler tebliğ ve tebşir olunduğu halde hiç birinin aslı çıkmadığından ve fi 9 Nisan sene 314(7) tarihiyle, kuranadan Faik Bey kulları vasıtasıyle birinci nüshanın takdimiyle vuku bulan arz ve istirham-ı abîdaneme ehemmiyet verilmediğinden, gazetemin intişarı rıza-i Şahanelerine muhalif olduğu hakkında bazı zevâtın vuku bulan indî ihtarlarına bittabı' itimad olunmamıştır.

Padişahım,

Çakerlerinin hiç bir niyet-i fasidem olmayıp, şu gazetenin neşri, mensubiyetiyle müftehir olduğum Kürd kavm-i necîbine karşı mükellef bulunduğum vazifeyi îfa etmek maksadıyle ve daha bazı âmâl-ı meşruaya mebnî olduğuna yemin ederim.

Gazetem iki mahtan beri neşredilmekte olup, şu müddet zarfında şayan-ı itimad hiç bir vasıta ile efkâr ve iradât-ı seniyye-i Şahaneleri tebliğ edilmediğinden, müttahaz meslek dairesinde devam tabiî bulunmuş ise de, salifülarz bir numrolu arzıhal-i abîdanemde arzolunduğu vechile, gazetemi, hükümet-i seniyyenin tensib buyuracağı surette çıkarmak dahi mümkin olduğundan, memnuiyet-i vakıanın ref'iyle, bunca mesavî-i ahvala inzimamen bir de bu yüzden Kürdler hakkında hilâf-ı rıza-i Barî zulüm ve taaddî edilmemesinin Babıâlî'ye irade ve ferman buyurulmasını, adalet ve merhamet-i Şahanelerine iltica ile arz ve istirham ederim. Ol babda ve katıba-i ahvalda ferman ve ihsan, Padişahımız Efendimiz Hazretlerinindir.

Bedirhan Paşazade
Mikdad Midhat Kulları

(7) Milâdî takvime göre 22 Nisan 1898.

Ev xetê min jor nivîsî, dîsa ji Hezretê Sultan Ebdulhemîd Xan re ye. Ez hêvî dikim, da îzna cerîdeya me bidit ez eşkare rêkim Kurdistanê. Ermenî û Rom nehin nîvên Kurdan e, çire ewan bi ezmanê xwe cerîde hebin û Kurda tiştek tunînin û ji halê dinyayê bêxeber in!

Gelî ulemayên Kurda! Gelî mîr û axano! Hun jî îttîfaq bikin, bigîhin hev, telgrafekê ji Hezretê Padîşah re bikişînin, hêvî bikin da îzna vê cerîdeyê bidit ez ji we re rêkim, da hun jî bizanin dinyayê de çi dibe çi nabe!

FAZÎLET'UL-İLM

Xwedê teala emir kirîye ku "fes'elû ehlezzîkrî in kuntum la ta'lemûn"; ango "tişta hun nizanibin ji alima bipirsin".(8) Hezretê Nebî, eleyhîsselam, gotîye: "Heçî mirovê ket rîya xwestina ilmê de, Wacib teala(9) wî mirovî bike rîya cinetê de û emelên ulema ji melaikê kîram re hingî xweş tên, perên xwe li ber wan vedikin û radixin erdê. Mirovê heya sibeyê xebitî û elimî meseleyek ilmî, xêra vê xebitandinê ji xêra sed rek'et nimêja qenctir e. İlm Çînê bitin, herin bixwazin bielimin. İlm xezîne ye, mifteyên wan xezîneya pirsandin e. Tişta hun nizanin, bipirsin. Pirsandina ilmê çar mirova dike xêrê de: Yê pirsî, yê zanî, yê guh dayê û yê hej wan kirî".

Ebû Zer, radîyellahu teala enhu, rîwayet kirîye(10) ku Hezretê Nebî, eleyhîsselam, gotîye: "Mîqdarekî li meclisa ulema rûniştin, ji hezar rek'et nimêj û pirsîna halê hezar nexweşa û çûna cem hezar cenaza qenctir e, efdeltir e". Pirsîn ku "ya Resûllelah, ji xwendina **Qur'anê** jî efdeltir e?" Gotîye "ma bi xêrê ilmê(11) **Qur'an** tu fêdeyê dide! Sebê qencîya Îslamê, sebê îhyakirina Musulmanîyê(12) mirovê dixebite ku bielimit ilmê, wê hingê mirin bêt'ê,(13) li cinetê de nava wî û enbîya de derecek tenê wê hebitin".

JİBO CERÎDEYA "KURDİSTAN"Ê

Heyfa min gelek ji Kurdê me re dihat. Min roj û şev gazind dikirin, çi qa Kurmanc hene hemî mêr û jêhatî ne, çire holê bêmarîfet û sin'et mane! Nivîsandin û xwendina hemî Kurda çire nîne! Ez li nav van kul û derda jar û kal bîbîm, heyirî mabîm.(14) Nuho ji Xwedê teala şikir dikim, ew cerîdeya te li ser

(8) Awayê rast "tiştê hun nizanibin" e. Lewra peyvika "tişt" nêrîn e, peyvikên nêrîn jî di hevbendîyê da pêveka "ê" distînin; wek "bavê zarûkan", "zimanê Kurdî", "destê qelemgir" û wd.

(9) Wacib teala: Xwedê teala, Xwedayê mezin.

(10) Ebû Zer: Yek ji sehabîyên Pêxember ên pir nêzîkên wî bûye.
Radîyellahu teala enhu: Xwedê teala jê razî be.
Rîwayet: Qalkirin, guhastina peyvek yan bûyerek, neqilkirina peyvek yan bûyerek.

(11) Bi xêrê ilmê: Xeyn ji ilmê, ji bil ilmê.

(12) Seb: Jibo.
Îhyakirin: Vejandin.

(13) Bêt'ê: Bê wî, bê wî mirovî.

(14) Kal bîbîm, heyirî mabîm: Kal bûbûm, heyirî mabûm.

qencîya Kurda derêxistî ya te ji me re rêkirî, hat û ket destê min. Heçku çi qa miradê min hebîn, hasil bîn. Qencîyê li ser Dinê de hew qa dibit, mezinayî li vî zemanî hew qa çêdibit.

Wekî ew cerîde min xwend, ez derheqa dua û medhê te heyirî mam. Ez ji xwendina wê têr nebîm. Min gazî Kurd û Kurmanca kir, ji wan re xwend. Ew jî gelek şa bîn, belkî ji şabînê lal bîn. Li navbêna du-sê roja de heqê bîst cerîdeya dan hev û ji mi re anîn. Kerem bike li cerîdeya xwe de binivîse, ez rêkim kuderê? Wekî tu hêvîya me qebûl nekî, hêvî dikim tu her poste ji mi re çil-pêncî cerîdeya rêkî.

Te li cerîdeya xwe de "el-ilmu ilman, ilmul-ebdan we ilmul-edyan" nivîsîyî. Ez hêvî dikim her car derheqa wan de du-sê behsa binivîse. Kurd wê li vê derê ji siba heya êvarê li ber germê dişixulin. Paşê qenc fenakirin xwe,(15) nexweş dibin, gelek dimirin. Ev Kurdên van dera hemî Şafiî ne. Melayê Şafiîya li van dera hew qa peyda nabin. Kitêba mezhebê Şafiîya mirov li van dera nikare peyda bike. Hek(16) tu car cara ji kitêba Îbnu Hecer(17) tiştekî lazim binivîsî, ew jî wê bibe sebeba xêr û namdarîya te.(18)

Ez ji Xwedê şikr û hemdê dikim, piçekê xwendin û nivîsandin dizanim. Heke tu qebûl bikî, paş nuho ez'ê qasidîya cerîdeya te bikim.(19) Ev bajar wek bajarê Kurda lê hatîye. Her salê deh-pazde hezar Kurd li hire(20) diçin rencberîyê, dirîna dexlî dikin;(21) gelek jî paşê dimînin, xweymal û zarû dibin. Ji ber vî sebebî, ez'ê muhtacîya halê Kurda ji te re her car binivîsim, xizmetek holê kiçik ji mîrê xwe re bikim.

Edeneyê(22)
Seyid Tahirê Botî

Ez ji vê kaxiza te rêkirî, gelek memnûn bîm. Xwedê ilm û hîmmeta te zêde bike! Her cara ez'ê pêncî cerîdeya ji te re rêkim. Lê çiku hukumetê hê îzna cerîdeya min nedaye, loma ez nikarim bi posteyê rêkim. Ez'ê texlîdke dî ji te re rêkim,(23) bighînim destê te. Paş nuho jî, înşaellah ezê tarîfa mezhebê Şafiî ji Kurmanca re bikim. Heki tu her car behsa Kurmanc û halên wê derê binivîsî, ez'ê gelek minetê ji te hilînim.

---

(15) Fenakirin xwe: Li xwe nafikirin, li xwe nanêrin, guh nadin xwe, miqatê xwe nabin.
(16) Hek: Eger.
(17) Îbnu Hecer: Di mezhebê Şafiî da zanyarekî Misrî bûye, navê wî yê rastîn Ehmed bûye, jê ra hatîye gotin "Îbnu Hecerê Heytemî". Di navbera salên 1504-1567'an da jîyaye.
(18) Namdarî: Navdarî, belavbûna nav û deng.
(19) Qasidî: Birina nûçeyan yan jî fermanan yan jî daxwazan jibo kesek yan jî hin kesan, ku mirov nûçeyek yan fermanek yan jî daxwazek ji kesek yan ji hin kesan bibe nik kesekî dî yan hin kesên dî. Li vir mexsed "nûçenivîsî" ye. Yanî "ez'ê ji rojnama te ra nûçenivîsî bikim, bibim nûçenivîs, nûçeyan binivîsim û bişînim".
(20) Li hire: Li vir, li vî cîyî.
(21) Dirîna dexlî: Çinîna zad, çinîna tene, çinîna genim û ceh. Li hin hêlên Kurdistanê ji çinînê ra tê gotin "dirûn"; ew peyvik li hêla Botan bi awayê "dirîn" tê karanîn.
(22) Edene: Bajarekî Tirkîyê ye, li rojhilatê jêrîn ê Anadolê dikeve. Di Tirkîya nuhayîn da jê ra tê gotin "Adana".
(23) Texlîd: Awa, tewir. Yanî "ez'ê bi awayekî dî, bi tewirekî dî ji te ra bişînim".

MEM Û ZÎN

Neqşê te dibînin ew di avê
nakin hezerê ji av û davê(24)

Lebteşne teleb dikin zelalê(25)
Wê dane di damê zilf û xalê(26)

Meqsûd-i ku bû ji pêş ve hazir(27)
dê qesd-i bikin cemîê nazir(28)

Tûtî bi xwe ma şekir dirêjit!(29)
Herçî dibihên ewî dibêjit(30)

Wê meqsedê muxteser dibînin(31)
pabend-i dibin, gelek dimînin(32)

Meqsûd û miradê dil tu şa yî
Emma tu tudillu men teşa yî(33)

Herçî te divê bibî dalalê(34)
pabend-i dikî bi zilf û xalê

---

(24) Hezer: Parastin, ku mirov xwe ji tiştek biparêze, xwe bipê.
Nakin hezerê: Xwe naparêzin, xwe napên.

(25) Lebteşne: Lêvtî, kesê ku lêvên wî tî bûne, ji tînan lêvên wî ziwa bûne.
Teleb: Daxwaz, tiştê ku mirov dixwaze.

(26) Wê: Wa, wa ye, eva, aha. Ev peyvika balkêşîyê ye.
Dane: Danîne.
Dam: Dav, davik.
Mana vê malikê û ya berî wê pêkve weha ye: "Kesên lêvtî ava zelal daxwaz dikin. Lê belê wa ne zilf û xalê, wek tamikek di davikê da danîne".

(27) Meqsûd: Daxwaz, tiştê daxwazkirî, tiştê ku mirov qesta wî dike, dixwaze wî bi destê xwe bixe.

(28) Cemîê nazir: Hemî nihêrtox, hemî kesên ku dinêrin, mêze dikin.

(29) Tûtî: Teyrê peyvok, papaxan.

(30) Dibihên: Dibihîzin.

(31) Muxteser: Kurt.

(32) Pabend: Linggirêdayî, pêgirêdayî, kesê ku lingên wî hatine girêdan.

(33) Tudillu men teşa yî: Kesê ku tu bixwazî tu wî avarê dikî, wî dibî dalaletê, wî ji rîya rast derdixî û dixî rîya şaş. Ev peyv bi Erebî ye.

(34) Dalal: Avarêtî, şaşrêtî.

www.netewe.com

Herçî ku tu bînî ser hîdayet(35)
vêra bigirî, bikî înayet(36)

hazir wî dibî meqamê malûm(37)
ger xadim e, wî digêrî mexdûm(38)

*

Bê secde te, ey cenabê Mabûd(39)
Adem kire qiblegah û mescûd(40)

Îsa te kusa gîhande ewcan?(41)
Aya bi çi te hebande ew can?(42)

Dersa ku bi xef te gote Îdrîs(43)
elbette diçû meqamê teqdîs(44)

Îblîsê feqîr è bêcînayet
hingî te hebû digel înayet

her roj-i dikir hezar îtaet
lewra ku te da wî îstîtaet(45)

wî secde nekir li xeyrê Mabûd(46)
gêra te ji ber derê xwe merdûd(47)

yek secde nebir li pêşê exyar(48)
qehra te kire muxelledunnar(49)

---

(35) Hîdayet: Rîya rast.
(36) Vêra bigirî: Pê ra ragirî, alîkarîya wî bikî.
Înayet: Qencî.
(37) Hazir: Tavil, zûzûka, hema di wê gavê da.
(38) Xadim: Xizmetkar, xulam.
Mexdûm: Kesê ku xizmeta wî tê kirin, kesê ku xizmetkarên wî hene.
(39) Mabûd: Xwedayê ku jê ra îbadet tê kirin, Xwedê.
(40) Mescûd: Kesê ku jê ra secde tê birin.
(41) Ewc: Cîyê tewr bilind, cîyê bilintirîn.
(42) Aya: Gelo, êra.
(43) Bi xef: Bi dizî, bi awayekî veşartî, nepenî.
(44) Teqdîs: Muqeddes, qudsî.
(45) Îstîtaet: Hêz, qewet, tawan.
(46) Li xeyrê Mabûd: Xeyn ji Xwedê, ji bil Xwedê.
(47) Merdûd: Vegerandî, qewitandî, kesê ku tê vegerandin û qewitandin.
(48) Exyar: Kesên dî, kesên mixeyn, kesên xeyn ji te, kesên ji bil te.
(49) Muxelledunnar: Timîyê agir, kesê ku dê tim û tim di agir da bimîne.

Elqisse, ji hîkmeta te agah(50)
ferdek me nedî, tebarekellah

Îrfantelebêd-i sahib'îdrak(51)
derheqqê te gotî "ma erefnak"(52)

Xanî, bi nezanîya xwe derheq
gumrah-i bibit, ne dûr e, elheq(53)

Îlla ku meger muîn Xweda bit(54)
ya raheberê wî Mustefa bit(55)

Ya Rebb-i, bi heqqê Mustefa kî(56)
Xanî bi xwe ra tu aşîna kî(57)

(50) Elqisse: Bi peyva kurt, ku em bi kurtî bêjin, ku em peyva xwe kurt bibirin.
Agah: Hay, zanîna bi tiştek. Li vir mexsed jê haydar e.

(51) Îrfanteleb: Zanînxwaz, kesên ku li pey zanînê ne û dixwazin zana bibin, ji tiştan haydar bibin, serwext bibin.
Sahib'îdrak: Bîrewer, bîrbir, jîr, kesên ku bîr bi tiştan dibin.

(52) Ma erefnak: Me tu nas nekirî, me tu nenasî.

(53) Gumrah: Avarê, kesê ku ji rîya rast derdikeve û avarê dibe.
Elheq: Bi rastî.

(54) Muîn: Alîkar.

(55) Raheber: Rêbir, rênumîn, kesê ku rê nîşan dide, mirov di rîya rast da dibe.
Mustefa: Pêxember.

(56) Di çapa Stanbolê ya 1919'an da ev malik weha ye: "Ya Reb tu bi heqqê Mustefa kî".

(57) Aşîna: 1-Nas, kesê ku tê naskirin, mirov wî nas dike. 2-Zana, serwext, kesê ku tiştek nas dike û di heqê wî tiştî da serwext e, zana ye. Li vir mexsed mana 2'yan e. Yanî "tu wisa bikî ku Xanî di heqê te da zana û serwext bibe".

Dİ NE'TA QELEMÊ MES'NÛAT Û SERDEFTERÊ MEWCÛDAT Û AQİLÊ MAQÛLAT Û PÊŞEDESTÊ MEXLÛQAT HEZRETÊ SEYYİD'US-SADAT MUHEMMED'UL-MUSTEFA ELEYHÎ EFDEL'US-SELEWAT(58)

Eşya bi heseb delîl û burhan(59)
nabin çu meger wucûb û îmkan(60)

Wacib yek e, zatê Kîbrîya ye(61)
Mumkin pir e, cem'ê masîwa ye(62)

Wî wacibê mumkinat-i berqe'(63)
mumkin wî jibo xwe kirne metle'(64)

Yanî ewî vê bibit muberhen(65)
husna wî bi derkevit ji mekmen(66)

gencîneyê cewherî bibit faş(67)
sabit bibitin ji neqşî, neqqaş(68)

---

(58) Mana temamê vê sernivîsarê weha ye: "Di pesnê qelema tiştên çêkirî û serdefterê tiştên heyî û aqilê tiştên fikirandî û pêşedestê tiştên afirandî berrêzê berrêzan Hezretê Muhemmed Mustefa da, selewatên çêtirîn lê bin".

(59) Eşya: Piranîya "şey" e, ew jî bi mana "tişt" e.
Bi heseb: Li gora.
Burhan: Delîla ku tiştek pê tê îspatkirin.

(60) Wucûb: Pêwîstî, zerûret. Li vir mexsed jê pêwîstî û zerûreta hebûnê ye.
Îmkan: Mikûnî, bûyina ne zerûrî. Li vir mexsed jê nepêwîstî û nezerûrîtîya hebûnê ye.
Mana vê malikê û ya berî wê pêkve weha ye:
"Tiştên heyî, pêwîstî û nepêwîstîya hebûna wan li gora delîlan nayê îspatkirin; li gora delîlan pêwîstîya hebûnê ji hinekên wan ra, nepêwîstîya hebûnê jî ji hinekên dî ra tune; mirov neşê bi delîlan îspat bike ku hin tişt hebûna wan pêwîst e û divê ku ew hebin, hin tişt jî hebûna wan ne pêwîst e, ew hebin jî dibe û tunebin jî dibe, hebûna wan mimkun e, lê ne zerûrî ye".

(61) Wacib: 1-Tişt yan jî karê ku kirina wî pêwîst e, divê bê kirin. 2-Kesê ku hebûna wî pêwîst e, zerûrî ye, bivê-nevê ye; ew Xwedê ye. Li vir mexsed jê mana 2'yan e. Bi vê maneyê "Wacib" yek ji sifetên Xwedê ye.
Zatê Kîbrîya: Zatê gewre, Xwedê.

(62) Cem'ê masîwa: Hemî kes û tiştên ji bil Xwedê, xeyn ji Xwedê her tişt.

(63) Berqe': Perde. Yanî "ew Wacibê ku tiştên mimkun jibo xwe kirine perde".

(64) Metle': Cîyê hilatina Rojê. Yanî "tiştên dî, wek Rojê wî nîşan didin".

(65) Vê: Vîya, xwest, daxwaz kir.
Muberhen: Tişt yan jî kesê ku delîl ji hebûna wî ra hene. Yanî "wî vîya û xwest ku tiştin ji hebûna wî ra bibin delîl'.

(66) Mekmen: Veşargeh, cîyê veşartinê.

(67) Gencîne: Xizne, defîne. Mexsed jê Xwedê ye.

(68) Neqqaş: Nexşkar, nexşandox, kesê ku nexşan çêdike. Dîsa mexsed jê Xwedê ye. Yanî "ji nexşên Xwedê, ji afirandîyên Xwedê hebûna Xwedê sabit bibe, kifş bibe, bê îspatkirin".

Lê sen'etê wî Hekîmê dana(69)
neqşê ewî Qadirê tuwana(70)

ned'bû ku bibit ewî rusûmek(71)
laiq ewî dê hebit ruqûmek(72)

Herçî we ku bûne, bêreqem bû
Lew ewwelê ma xeleq, qelem bû(73)

Ev ewwel û rûh û aqlê ewwel(74)
her sê ne bi ewwelî muewwel(75)

Emma meke wan ji hev tu tefrîq(76)
ev renge ewan bigêre tewfîq:(77)

Bê "şey'ekî wahid in bi carek(78)
te'dad û teeddud î'tîbarek"(79)

Ewwel biriqî ji husnê sermed(80)
nûrek, bûye maneya Muhemmed

(Paşî heye)

Li Misrê "Metbea Cerîdeya **Kurdistan**"ê tebi' bîye

---

(69) Hekîmê dana: Hîkmetkarê zana, ew zanayê ku di karên wî da hîkmet heye. Mexsed jê Xwedê ye.
(70) Tuwana: Hêzdar, ê ku hêza wî heye, muqtedir e, dikare, dişê. Dîsa mexsed jê Xwedê ye.
(71) Rusûm: Wêne, ayîn. Li vir bi awayê mecazî bi mana "şop, eser" hatîye karanîn.
(72) Ruqûm: Piranîya "reqem" e, ew jî bi mana "jimareya nivîskî" ye. Li vir bi awayê mecazî bi mana "nivîsîn" hatîye karanîn.
(73) Ewwelê ma xeleq: Tiştê pêşîn ê ku wî afirand, afirandîyê pêşîn.
(74) Rûh: Gîyan, can.
Aqlê ewwel: Aqil û zekaya ku di afirandina mirov da heye, mirov digel wî tê dinê.
(75) Bi ewwelî muewwel: Bi pêşînîyê têwkirî, her sê tiştên pêşîn tên qebûlkirin, wisa tên têwkirin.
(76) Tefrîq: Cuda, cîyê.
(77) Bigêre tewfîq: Lêkbîne, li hev bîne, bigîhîne hev.
(78) Bê: Bêje.
Şey'ekî wahid in: Tiştekî yek in, yek tiştek in.
(79) Yanî "jimartina wan û hatina wan a jimartinê tiştekî îtîbarî ye, wisa îtîbar tê kirin, wisa tê têwkirin".
(80) Sermed: Ebedî.

5'İNCİ SAYININ ÇEVİRİLERİ

ŞEVKETLU AZAMETLU SULTAN İKİNCİ ABDÜLHAMİD HAN HAZRETLERİNE KULCA DİLEKÇEMDİR SAYI 2

Padişahım,

Sonsuza dek yaşayacak olan Osmanlı devletinizi oluşturan halklardan mensubu olduğum Kürd halkının yaradılış ve konum bakımından haiz olduğu önemden dolayı öğrenime ve reforma değer olduğundan, Kürdistan çapında gerekli görülen gelişmeler toplamının bir parçası olmak üzere ve Peygamber'in "hepiniz çobansınız"(81) diye başlayan emriyle, ben kullarının payına düşen görevi yerine getirmek üzere, kulları da, bilimlerin nasibini aldığı siz Padişahları sayesinde bu Kürdçe gazeteyi meydana getirip yayınladım.

Umulanın tersine, gazetemin siz Padişahlarının korunmakta olan ülkelerine girmesinin yasaklandığı, Babıâlî tarafından genelgeyle illere bildirildiğinden, bu yasağın kaldırılması hususunun Babıâlî'ye irade(82) ve emir buyurulması, 4 sayılı ve 21 Mayıs 1314(83) tarihli gazetemdeki dilekçe ile siz Padişahlarının yüce eşiğinden arz ve istirham olunmuştu.

Yine umulanın tersine, söz konusu yasak kaldırılmamış ve hatta ellerinde gazetem görülenlerin tutuklandıkları tarafıma bildirilmiştir. Ayrıca, şu **"Kürdistan"** gazetesinin yayınlanması siz Padişahlarının rızasına ters düştüğünden, hemen bırakıp İstanbul'a dönmem istendi. Bu konudaki yüce iradenize boyun eğmediğim takdirde, geçmiş memurluğuma ilişkin yapay olarak bir kötü işlem(84) oluşturulup bana yükleneceğini, bu konuya bakan mahkemeden alınacak kararla Mısır hükümetinden isteneceğimi ve o hükümetin

---

(81) "Hepiniz çobansınız ve hepiniz sürünüzden sorumlusunuz" anlamındaki hadisi kastediyor.

(82) İrade: Sözlük anlamı "istek, istem" olan bu sözcük, Osmanlıcada bir terim olarak "padişah emri, padişah buyrultusu" anlamında da kullanılırdı. Burada kastedilen, bu ikinci anlamdır.

(83) Milâdî takvime göre 3 Haziran 1898.

(84) "Su-i muamele" sözcüklerinin karşılığında kullanılan "kötü işlem"den, bir memurun yetkisini ve görevini kötüye kullanarak yapmış olduğu kanunsuz ve usulsüz bir işlem, bir yolsuzluk kasdedilmiştir.

de bu karara uyarak ben kullarını zorla teslim edeceğini de haber aldım. Bütün bunlar, oldukça güvenilmeye değer olması gereken ve yüce Hıdîvlik(85) maiyetinin(86) ileri gelenlerinden olup gerektiğinde göstereceğim, bilinen bir aracının aracılığıyle ben kullarına bildirildi.(87)

Padişahım,

Şu Kürdçe gazetenin iyilik ve yararları, bilgi, eğitim ve uygarlıktan anlayan kişilerin tümü tarafından kabul ve itiraf edilmektedir. O halde siz yüce Padişahlarının zatına karşı bu konudaki nedenlerin ve kanıtların ortaya serilmesiyle sözü uzatmaya gerek yoktur. Bununla birlikte, arzettiğim yasağın kaldırılmamış olması ve kişilerin tutuklanacağı yolunda yapılan tehditler konusunda, yüce izninizle bazı istirhamlarda bulunacağım. Şöyle ki:

BİRİNCİOLARAK

Söz konusu yasağın yürürlükte bırakılması durumunda, gazetemin Kürdistan'a girmesini sağlayabilmek için, içeriğinin bir bölümünü, aracılıklarına başvuracağım bazı kişilerin görüşlerine uygun biçime getirmek gerekecektir. Bu yol ve yöntem istemeyerek ve zorunlu olarak seçileceğinden, bunun maddî ve manevî sorumluluğunu buna yolaçanlara bırakırım.

İKİNCİ OLARAK

Hapsetme ve tutuklama, yürürlükteki kanunların belirleyip saydığı suçlardan(88) birini işleyen kişi hakkında uygun ve yerinde olabilir. Kanunda sayılan söz konusu durumların dışında meydana gelecek davranışlar, sorumluluk gerekçesi olamaz. Çünkü toplumu oluşturan bireyler, yasak davranış ve eylemleri, ancak kanundan öğrenebilirler. O halde, Ceza Kanununun belirlememiş olduğu bir eylemi gerçekleştiren kimse suçlu sayılamayacağından, doğal olarak tutuklanıp hapsedilemez.

---

(85) Bu sayıdaki 4 numaralı dipnota bakınız.

(86) Maiyet: Arapça olan ve sözlük anlamı "yanında olma durumu, nezdinde olma durumu" olan bu sözcük, Osmanlıcada bir terim olarak, "üst düzeydeki bir yöneticinin yanında çalışan görevli" anlamında da kullanılırdı. Sözcük, bu anlamda günümüz Türkçesinde de kullanılmaktadır.

(87) Gazetenin aslında, "yine" diye başlayan bu paragraf, başından sonuna kadar bir tek tümce olarak kaleme alınmıştır. Ancak, Osmanlıca dil yapısına uygun olan uzun tümceler, günümüz Türkçesine pek uygun olmadığından ve okuyucuyu sıktığından, biz bu uzun tümceyi bölerek birkaç tümceye ayırdık. Bundan sonra da çeviride bu yöntemi izleyeceğiz.

(88) Buradaki "suçlar" sözcüğü, yazının aslında kullanılan "ahval" sözcüğünün karşılığı olarak kullanılmıştır. "Durum" anlamına gelen "hal"in çoğulu olan "ahval", günümüz Türkçesinde "suç" anlamında kullanılmamaktadır.

Bundan dolayı, "**Kürdistan** gazetesini almak ve okumak şu cezayı gerektirir" diye siz Padişahlarının iradesiyle yasaklanıp ilân edilmedikçe, onun okuyucusu da, onu taşıyan kimse de sorumlu olamaz. Olursa zulmedilmiş olur. Zalimler hakkındaki yüce ayetlerin ve kutsal hadislerin belirlediği cezanın da, herkesten çok şevketlu zatınızca biliniyor olması gerektiği ve yönetimin başında bulunan memurların işledikleri zulüm işlerinin derecelerine göre siz Padişahlarının zatından da sorulacağı, "insanların başındaki önder, uyruklarından sorumludur" anlamındaki kutsal hadisle ve **Kur'an-ı** kerimin diğer hükümleriyle belirlenen bir gerçektir.

ÜÇÜNCÜ OLARAK

Yapılan tehditlere ilişkin olan ve yukarıda arzedilen bildirimlere güvenmemekle birlikte, bugün İstanbul'da yönetimin başında bulunan bazı zatların, bence bilinmekte olan davranış biçimlerine ve ahlaklarına uygun olarak sözümona bağlılık olmak üzere iftira gibi alçakça bir davranışa girişmeleri de uzak bir olasılık değildir. Bu nedenle ve ihtiyatlı davranmış olmak için, yetkili adalet makamlarına gereken başvuruyu yaparak, ben kullarının bukuk ve geleceğimi güvence altına aldım.

Siz Padişahlarının "akılsız dost" türünden olan bazı kullarının bu yolsuzluklarının ve alçakça girişimlerinin, siz Padişahlarının görkemini ve ululuğunu zedelemekten ve eloğullarının(89) alaylı gülüşlerine yolaçmaktan başka bir sonuç vermeyeceğini, içten bağlılığımın bir gereği olarak şimdiden arzederim.

DÖRDÜNCÜ OLARAK

Bazı zatlar tarafından birkaç kez gerek ben kullarına ve gerekse bazı bildiklerime, sözde siz Padişahları tarafından birçok irade bildirildiği ve birçok vaat müjdelendiği halde, hiç birinin aslı çıkmadı. Ayrıca, mabeyincilerden(90) Faik Bey kulları aracılığıyle 9 Nisan 314(91) tarihinde birinci sayının sunulmasıyle birlikte sunulan ben kullarının arz ve istirhamıma önem verilmedi. Bu nedenle, gazetemin yayınlanmasının siz Padişahlarının rızasına aykırı olduğu yolunda bazı zatların öne sürdükleri indî(92) uyarılarına, doğal olarak güvenilmemiştir.

---

(89) "Eloğulları" sözcüğü, gazetenin aslındaki "ağyar" sözcüğünün karşılığı olarak kullanılmıştır.

(90) Mabeyinci: Padişahın yakınında bulunan ve kendisiyle başkaları arasında aracılık yapan resmî görevli, Mabeyin dairesinde görev yapan kimse.

(91) Milâdî takvime göre 22 Nisan 1898.

(92) İndî: Herhangi bir doğru ve sağlam temele dayanmayan, sadece söyleyen kişi ya da kişilerin sübjektif kanı ve tahminlerinin ürünü olan söz, görüş ya da iddia. Arapça olup Osmanlıcaya da girmiş olan bu sözcük, Türkçede karşılığı bulunmadığı için tarafımızdan aynen kullanıldı.

Padişahım,

Ben kullarının hiç bir kötü niyetim yoktur. Bu gazetenin yayınlanmasının, mensubu olmakla kıvanç duyduğum soylu Kürd halkına karşı yükümlü bulunduğum görevi yerine getirmek amacıyle olduğuna ve daha başka bazı meşru istek ve ümitlere dayandığına yemin ederim.

Gazetem iki aydan beri yayınlanmaktadır. Bu süre içinde, siz Padişahlarının yüce görüşleri ve iradeleri güvenilmeye değer hiç bir aracı ile bildirilmediğinden, saptanan tutum çerçevesi içinde yayınının sürdürülmesi doğal görülmüştür. Bununla birlikte, daha önce sunulan bir numaralı kulca dilekçemde arzedildiği gibi, gazetemi, yüce hükümetin uygun göreceği biçimde çıkarmak da mümkündür.

Bu nedenle, konulmuş olan bu yasağın kaldırılmasıyle, bunca kötü durumlarına ek olarak Kürdlere bir de bu yüzden Tanrı rızasına aykırı düşen zulüm ve saldırıda bulunulmamasının Babıâlî'ye irade ve emir buyurulmasını, siz Padişahlarının adalet ve merhametine sığınarak arz ve istirham ederim. Bu konuda ve bütün durumlarda ferman ve iyilik, Padişahımız Efendimiz Hazretlerinindir.

Bedirhan Paşazade
Mikdad Midhat Kulları

www.netewe.com

www.netewe.com

KURDİSTAN

1315

Pazde roja de carekê têt nivîsandin
cerîdeya Kurdî ye

Kürdleri tahsil-i ulûm ve
fünûna teşvik eder
nasayih ve edebiyat-ı
Kürdiyeyi hâvî
on beş günde bir neşrolunur
Kürdçe gazetedir

Gazetenin mesleğine muvafık
Arabça, Türkçe, Farisîce
mektublar
Kürdçeye bittercüme neşrolunur

Unvan:
Genève'de
"Kürdistan"
Gazetesi
Sahib ve Muharriri
Bedirhan Paşazade
Abdurrahman

*

Her tabı'da
2000 nüsha
Kürdistan
vülât-ı izamına
irsal ve vesatetleriyle
kura ve kasabâta
neşr-ü tamim
olunacaktır

*

Kürdistan haricinde
her yer için
senelik abone bedeli
80 kuruştur
Kürdistan dahilinde
hususî isteyenlere
meccanen gönderilir

Heçî vê
kaxidekî
rêke
ji min re,
divê
ser kaxizî
weha binivîse:
"Bî Genève
necl'ul-merhûm
Bedirxan Paşa
Ebdurrehman Beg"(1)

*

Her car
du hezar
cerîdeya
ez'ê rêkim
Kurdistanê,
de belaş
bidin xelkê

Roja yekşembê de 25 Cemazîlewwel 1316 * Pazarertesi fi 28 Eylül sene 1314(2)

(1) Mana vê peveka Erebî weha ye: "Li Cenewreyê, kurê rehmetî Bedirxan Paşa Evdirehman Beg".

(2) Li gora tarîxa Mîladî 11 Çirîya Pêşîn 1898(Milâdî tarihe göre 11 Ekim 1898; burada "pazarertesi" yerine "pazar" yazılması gerekirdi, çünkü Kürdçesinde yer alan "yekşemb" günü, pazartesi değil de pazardır).

www.netewe.com

ŞEVKETLU AZAMETLU
SULTAN ABDÜLHAMİD HAN-I SANÎ HAZRETLERİNE
ARZIHAL-İABÎDANEMDİR

Padişahım

Mübtelâ olduğu illet-i sadriyeden dolayı, etıbbanın gösterdikleri lüzum üzerine, biddefeât taleb ve istirham ettiği ruhsata nail olamadığından bilâ me'zuniyet geçen kış Mısır'a azîmet ve mevsim-i sayfın hululüyle Dersaadet'e avdet eden biraderim Midhat kullarının keyfiyet-i azîmeti, bermutad istediği şekil ve surete koyarak zat-ı hümayunlarına karşı ihtiyar-ı kizb-ü düruğ ve şu suretle temin-i ikbal ve menfaat etmeyi itiyad eden Ebülhüda Efendi'nin cümle-i tedabîr-i mefsedetkâranesinden olmak, "ve lâ teziru"(3) ayet-i celîlesi hilâfında olarak Zeyd için Amr(4) mes'ûl edilmek kabîlinden olmak ve bu vesile ile dahi zat-ı hümayunları hakkındaki efkâr-ı milleti ihlâl etmek üzre, İstanbul'da bulunan biraderlerimin tazyikiyle Midhat Bey'in celbi mümkin olabileceğine dair, merkum Ebuddalal'ın(5) vasıta-i icra-i şenaati olan Osman Paşa'ya Emin Bey'in(6) tazyiki hakkında bir jurnal verdirilip, bunun üzerine Başkâtib Tahsin Bey kulları tarafından "tazyik" kelimesi hakkında Osman Paşa'dan izahât taleb olunmasıyle, Osman Paşa cevaben, "Efendimiz ferman buyururlar ise, Midhat Bey'in burada bulunan biraderlerini darb ve katl ile tahvîf ederim; anlar da şu eziyetten kurtulmak üzre Midhat Bey'i geri çağırırlar" deyu denaetkârane verdiği cevaba, Makam-ı Hilâfet-i Uzmanın Başkâtibi Tahsin Beyefendi de, "Efendimiz bunu size resmen emredemezler" deyu cevab vererek, şenaat-i maruzenin icrasına suret-i gayri resmiyede müsaade-i Şahaneleri şayan buyurulduğunu zımnen tebliğ ettiği gibi, Yaver-i Hususî Mehmed Paşa dahi bu suretle hareket muvafık-ı şan-ı sadakat olacağını ilâveten izhar etmesiyel, şenaat ve denaet-i mezkûrenin Başkâtib Bey tara-

---

(3) Bu üç sözcük, **Kur'an** ayetlerinden birinin başında yer alan üç sözcüktür. O ayetin tamamının Türkçe anlamı şöyledir: "Hiç bir yükümlü, başkasının yükünü yükümlenmez". Sorumluluğun kişisel olduğu konusundaki bu ayet, hiç bir kimsenin başkasının yaptığı işlerden sorumlu tutulamayacağını vurgulamaktadır.

(4) Buradaki "Zeyd" ve "Amr" adları, Arapça iki ad olup sembolik olarak ve örnek için kullanılırlardı; Türkçede "Hasan-Hüseyin" ya da "Ali-Veli" denildiği gibi.

(5) Ebuddalal: "Sapıklığın babası" anlamına gelen bu sözcükten maksat, yukarıda adı geçen "Ebülhüda" adlı kişidir. "Ebülhüda"nın anlamı "doğru yolun babası, hidayetin babası"dır. Yazar, o kişinin adını bir kez olduğu gibi yazdıktan sonra, onun aslında, adının anlamının tersi yönde yürüyen bir kişi olduğunu belirtmek için burada adını böyle yazmıştır.

(6) Yazarın kardeşi olan Emin Bey, ünlü Kürd dilbilimci ve yazarları Celâdet Âli Bedirhan ile Kâmran Âli Bedirhan'ın babasıdır. Adının tamamı, Emin Âli Bedirhan'dır.

fından Emin Bey'in Mabeyn-i hümayuna çağrıldığı bir günde icrası kararlaştırılarak, ta Beşiktaş'tan Kadıköyü'ne(7) kadar birtakım haşerât(8) taraflarından takib ettirildi.

*

Cereyan eden tahkikata ve esna-i vak'ada alâ meleînnas mütecasirler tarafından vuku bulan ifadâta nazaran, haşerât-ı merkume Osman Paşa tarafından tertibedildiklerini ve Emin Bey'in darbı hakkında irade-i seniyyelerinin sadır olduğunu tebliğ ettiği sabit olmasıyle, Osman Paşa hakkında dahi lâzime-i adaletin icrası umumumuz tarafından atebe-i ulya-i Hilâfetpenahîlerinden biddefeât istirham olunduğu halde, semeresi görülmek şöyle dursun, Ebuddalal'ın tesir-i nüfuzuyle istirhamâtımız dahi hâkipay-ı hümayunlarınca tesirsiz kaldığı gibi, istifsar-ı hatır zımnında saika-i şefkat ve hamiyetle Dersaadet'e gelip doğruca Mabeyn-i hümayun-ı mülûkânelerine müracaat eylemiş olan biraderim Ali Bey kulları dahi dört gün Kumandanlık dairesinde tevkif olunduktan başka, ikinci bir ihanet(9) ve hakaret olmak üzre, Ebülheva'nın(10) dest-i mel'anetpeyvestini öpmeksizin salıverilemeyeceği kendisine resmen tebliğ olunur. Bu ikinci ihanet dahi nam-ı namî-i hümayunlarına olarak icra ve irade-i katıa-i tacdarları muktazasından olduğu, Gidiş Müdîri Sansar Hacı Mahmud Efendi ve Başkâtib Tahsin Bey ve Yaver-i Hususîleri Çerkes Kabasakal Mehmed Paşa taraflarından tebliğ ve inba kılınmıştır.

Padişahım,

Bu gibi muamelât-ı denaetkârane ile tahvîf olunabilecek bir kimse var ise, o da Osman Paşa olduğuna yemin ederim. Biraderim Midhat Bey'in ifadesinden ve telgrafhane kuyudundan anlaşıldığına göre, İstanbul'a avdet edeceğine dair olan telgrafnamesi şenaat-i maruzenin vukuundan evvel olduğu cihetle, şu tehdidin avdetine taalluk ve tesiri olamayacağı aşikâr olduğu gibi, işte

(7) Beşiktaş ve Kadıköy, İstanbul'un iki semtidir. Kadıköy'ün adı, o zaman "Kadıköyü" biçiminde yazılırdı.

(8) "Haşerât"tan maksat, Abdülhamid döneminde muhalifleri izlemekle görevlendirilen ve "hafiye" diye nitelendirilen gizli ajanlardır. Arapça olan "haşerât" sözcüğü, Türkçede de kullanılan "haşere" sözcüğünün çoğuludur.

(9) İhanet: Hakaret, küçük düşürme, aşağılama, onur kırıcı tutum ve davranışlarda bulunma. Arapça olan bu sözcüğün asıl anlamı bu olduğu ve hem Arapçada, hem de Osmanlıcada bu anlamda kullanıldığı halde, günümüz Türkçesinde "ihanet" sözcüğü, yanlış olarak "hıyanet, hainlik" anlamında kullanılır olmuştur.

(10) Ebülheva: "İstek ve arzunun babası, ihtirasın babası" anlamına gelen bu sözcükten de maksat, yukarıda adı geçen Ebülhüda adlı kişidir. Bu sözcük, arzu ve ihtirasına göre davranan, ihtirası uğrunda her şeyi yapabilecek nitelikte olan kişi hakkında kullanılır. Sözcük Arap alfabesiyle yazıldığı zaman, adamın asıl adı olan "Ebülhüda"ya çok benzer ve ikisini sadece "d" ile "v" harfleri ayırır. Bu yöntemi uygulamaya, edebiyatta "cinas" adı verilir. Böylece yazar, adamın adını böyle yazmakla hem onun niteliğini belirtmiş, hem de cinas yapmıştır.

abd-ı memlûkleri dahi, bu hakikati isbat ve Ebuddalal'ın hakkımızda ittihaz ettirdiği tedbir-i sakîmin butlanını izhar için, başlıca maksad-ı çakeranem, öteden beri millet-i İslâmiyeyi ve Saltanat-ı hümayunlarını tedabir-i mefsedetkâranesiyle mahv ve şu meyanda devlet ve millete hizmetleri sebkeden ailemiz efradıyle bunca masumîni ifna ve perişan eyleyen Ebülheva'nın derece-i ihanet ve şenaatini, Midhat Bey'in ihdas eylediği **"Kürdistan"** gazetesi ve matbuat-ı ecanib vasıtasıyle ilân ve işaa ederek sem'i hümayunlarına îsal ve Ebülheva gibi habîsin tesir-i nüfuzuyle, kanunun icrasız ve adaletin mefkud ve zulmün hükümferma olduğu memalik-i Şahanenize artık avdet etmeyerek, hayatımı millet-i İslâmiyenin istihsal-ı selâmet ve saadetiyle efrad-ı ailemizin hukuk-ı mağsubelerinin istihlasına hasredeceğim maruzdur.

Bedirhan Paşazade
Abdurrahman

www.netewe.com

Hemd û şikir dikim ji wî Xwedê ra ku ev kaînat(11) danîye, mirov ba hiş(12) û zeka ji heywanên dî cuda û alî kirdiwe.(13) Ev cerîdeya ha, heta nuho birayê min Mîqdad Begê derdanî. Lakîn çiku Xunkar nehîşt ew li Misrê rûnit, vegera İstanbulê. Cerîdeya xwe nekarî İstanbulê derînit. Sebeba wê jî, çiku mirovê mezin yê dor Xunkar, hemî xain, bêesil, neseb in,(14) neyarê ciwanmerdan e.(15) Çi xasma ku yek ji wan heye, navê wî Ebulhuda ye; ew temamî esl û neseb mitirb e.(16) Çiku ew ji hemîya bêesiltir e, ji hemîya zêdetir neyarê mala Bedirxan Begê ye; ew neyarê hemî Kurda ye, navê qencî li Kurda bibe. Ew Xunkar dixapîne. Bi rastî ew ne Ebulhuda ye, Ebuddalal e;(17) fisq û hesedê de bêheval e.(18) Ew nahêle lawên Bedirxan Begê cerîdeyek holê derêxin, da qencî ji Kurda re bibit. Loma ez, ku lawê Bedixan Begê me, ji teessub û hemîyeta xwe,(19) ji milkê Xunkar derketim hatim dîyarên(20) xerîb, da ez vê xizmetê ji weten û ji miletê xwe re bikim. Ji kerema Xwedê hêvî dikim ku Kurd jî bi vê cerîdeyê ji xewa giran a kevnesale şîyar bibin.

Min vê cerîdeyê de kaxizek Romî(21) ji Xunkar Ebdulhemîd Xan re rêkirdiwe. Ez nav de(22) dibêjim çiku ewî nehîşt birayê min cerîdeya xwe milkê

(11) Kaînat: Gerdûn.
(12) Ba hiş: Bi hiş.
(13) Alî: Bilind, serfiraz.
(14) Bêesil, neseb in: Bêesl û bêneseb in.
(15) Ciwanmerdan: Ciwamêran.
(16) Esl û neseb: Bi esl û neseb, bi eslê xwe û reha xwe.
(17) Ebuddalal: Bavê avarêtîyê, bavê rîya şaş. Zilamê ku nivîskar rexne lê dixe, navê wî "Ebulhuda" bûye, ku bi mana "bavê hîdayetê, bavê rîya rast" e. Nivîskar dixwaze bide zanîn ku ew ne li gora navê xwe ye, lê çewtê navê xwe ye.
(18) Fisq: Gunehkarî, derketina ji rîya dîn, bêemrîya Xwedê û Pêxember.
Hesed: Dexesî.
(19) Teessub û hemîyet: Xîret û pêjna welatevînîyê û gelevînîyê.
(20) Dîyar: welat, herêm, hêl, cî.
(21) Romî: Tirkî, zimanê Tirkî. Ji ber ku berê di nava Kurdan da ji dewleta Osmanî ra hatîye gotin "Rom", nivîskar li vir ji zimanê wê dewletê ra gotîye "Romî". Semedê ku Kurdan ji dewleta Osmanî ra gotîye "Rom" ev bûye ku, ew cîyê ku dewleta Osmanî tê da hatîye sazkirin, yanî Anadol, wextek di destê împeratorîya Romayê da bûye û herêmek ji herêmên wê dewletê bûye. Hingê Kurdan ji wê dewletê ra gotîye "Rom". Paşê ew împeratorî parçe bûye û li hêla wê ya Rojhilat împeratorîya Bîzans hatîye sazkirin, ku jê ra hatîye gotin "Roma Rojhilat" jî û Anadol jî beşek ji wê bûye; hingê jî navê wê dewletê di nava Kurdan da "Rom" bûye. Paşê li herêma Anadolê dewleta Osmanî hatîye sazkirin û ketîye şûna împeratorîya Bîzans; hingê jî Kurdan ji wê dewletê ra gotîye "Rom". Ehmedê Xanîyê nemir jî di "**Mem û Zîn**"ê da ji dewleta Osmanî ra gotîye "Rom". Yek ji peyvên Xanî yên di heqê dewleta Osmanî da weha ye:

"Emma ji ezel Xwedê wisa kir
ev Rom û Ecem li ser me rakir"

Piştê ku dewleta Osmanî hatîye hilweşandin û di şûna wê da "Komara Tirkîyê" hatîye sazkirin jî, navê "Rom" di nava Kurdan da jibo wê dewletê hatîye karanîn. Li hin hêlên Kurdistanê jî ji dewleta Tirkan ra hatîye gotin "Roma reş" û gelê Kurd bi peyvika "reş" zulm û zordestîya wê dewletê daye zanîn. Di peyveka pêşîyan a Kurdî da jî tê gotin "bextê Romê tune". Di straneka gelî ya Kurdî da jî tê gotin "Rom xayin e".
(22) Nav de: Di nava kaxiz da, di nava nameya xwe da.

wî de derînit,(23) ez ji milkê wî derketim, da ku ez pê vê cerîdeyê qencîya Kurda re bixebitim û seyîtîya mirovê dor wî(24) jê re binivîsim.

Gelî Kurdno! Însan ji heywana qenctir in. Çiku însan biaqil û hiş in. Xwedê ji aqil çatir(25) tiştek xelq nekirdiwe. Lê aqil jî pê xwendinê kamil dibe. Mirovê nexwîne, aqilê wî gelek kêm dimîne. Loma Xwedê teala kitêba xwe de elimandina ilm û marîfetê kirdiwe.

Xwedê **Qur'ana** ezîmuşşan de ferman kirdiwe "we yerfeu. . ."(26) Lewre xwey'aqil hemû dera dibe hakimê mexlûqa. Bi qeweta aqilî, însan hakimê heywana ye. Aqil nebîya, mirov jî wek heywana bî. Ev waporên ser behrê, ev waporên li erdê ser hesinî diçin,(27) ev telgraf, ev top û tifingên hinde dûr diçin, hemî bi qeweta ilm û marîfeta aqilî ye.

Mirov aqilê xwe çi qas biemilîne,(28) wê hew qas tiştên rind û çak çêke. Gelo emilandina aqilî çawa dibe? Erê, ev pirsek mezin e; qasê destê min hat, ez'ê kurt cewaba vê bidim:

Aqil bi ilmê xweyqewet dibe. Lewre emilandina aqilî xwendin e. Hemî tiştê mirov dît, divê bizanibe ew tişt ji eslê xwe çi bû, çawa weha bû. Ev jî bi xwendinê dibe.

Hingî dinya heye, hindik mirova bi Kurmancî asar(29) nivîsîne. Heyfa min têt fenekirîne dor xwe.(30) Cîranê wan Rûs, Ecem û Rom, hemîya bi ezmanên xwe kitêb nivîsîne; çekên qenc destê wan de hene; heta yekê Kurd tifingê davêje, ew bîsta davêjin. Ev miletên ha zarwên xwe re, welatên xwe re tiştên qenc hîştine. Xwedê ilm û umrê wî zêde bike, birayê min Mîqdad Begê ev rîya qenc a cerîdeyê nîşanê me kir.(31)

Ehmedê Xanî, rehma Xwedê li wî be, kitêba xwe de nivîsîye:

---

(23) Milkê wî: Mexsed ji "milkê wî" Misr e. Wê demê Misir gerçi ji alîyê malbata Mihemed Elî Paşa ve dihat gêran û di binê nufûza Înglistanê da bû jî, li ser kaxid û di resmîyetê da parçeyek ji dewleta Osmanî dihat têwkirin û herêmek ji herêmên wê dewletê dihat hesibandin.

(24) Mirovê dor wî: Kesên dora Xunkar Ebdulhemîd.

(25) Çatir: Çêtir, baştir, qenctir. Ev peyvik yan ji alîyê nivîskar ve "çêtir" hetîye nivîsîn û bi şaşî di rojnamê da "çatir" hatîye çapkirin, yan jî ji alîyê nivîskar ve "çaktir" hatîye nivîsîn, lê li vir bi şaşî "çatir" hatîye çapkirin; "çaktir" jî bi mana "çêtir" e.

(26) "We yerfeu": Bilind dike. Ev du peyvik ji ayetek in, tê da tê gotin ku Xwedê rûmeta kesên zana bilind dike.

(27) Mexseda nivîskar ji "waporên li erdê ser hesinî diçin", trên e. Wisa tê zanîn ku peyvika "wapor" li vir bi şaşî hatîye nivîsîn. Lewra tenê ji gemîyan ra tê gotin "wapor". Dibe ku nivîskar "vagon" nivîsîbe, lê ew peyvik di rojnamê da bi şaşî "wapor" hatibe çapkirin.

(28) Biemilîne: Bi kar bîne, bişixulîne, bixebitîne.

(29) Asar: Piranîya "eser" e. Eser bi mana "tiştê afirandî" ye.

(30) Fenekirîne dor xwe: Li dora xwe nefekirîne, li dora xwe nenihêrtine.

(31) Nîşanê me kir: Nîşanê me da. Wisa tê zanîn ku nivîskar cudayîya navbera "nîşandan"ê û "nîşankirin"ê nedîtîye. Lê belê di navbera wan da cudayî heye. "Nîşandan" bi mana "numandin, mêrandin" e; mesela mirov rê nîşanê kesek dide yan jî xanîyek nîşanê kesek dide. Lê herçî "nîşankirin", bi mana "kifşkirin, veqetandin, cudakirin" tê; mesela keçek ji xortek ra nîşan dikin, kesek di cîyekî giştî da ji xwe ra cîyê rûniştinê bi awayek nîşan dike.

"Enwaê milel di xweykitêb in(32)
Kurmanc-i tenê di bêhesêb in".

Ev xeber Kurda re ar e. Divê xwe ji binê vê arê derînin. Divê Kurd jî xwey'ilm bibin.

Mehebbeta(33) min a ji miletê min Kurmanca re, ez sewq kirim(34) vê cerîdeyê de rîya qenc nîşanê Kurda dikim. Rom, cîyê Tirk lê hebit mektebên mezin datîne.(35) Hukumet pera(36) ji Kurda distîne, ji Tirka re serf dike. Kurdên reben esîrên wê hukumetê ne. Sebeba wê jî, mitirbên li Sera Xunkar in.(37) Heyfa min têt Kurmanca re, ji miletên dî zêdetir xweyaqil, weyşecaet in,(38) ji hemî mileta paşvetir mane.

Min ji kerema Xwedê teala hêvî ye, paş nuho Kurd jî aqilê xwe bînin serê xwe, ji wê xewa giran şîyar bibin, ew jî xwey'ilm bibin, bi qeweta aqilê xwe bixebitin, ji miletên dor xwe mezintir bibin. Wek Pêxember ferman kirî, "îs'e lî dunyake keenneke teîşu ebeden, wes'e lî axîretîke keenneke temûtu xeden",(39) divê mirov dinya xwe re we(40) bixebite heçku qet namirit û ji axreta xwe re we bixebite heçku wê sibê bimirit.

Gelî ulema û mîr û axayên Kurda! Wek Pêxember ferman kirî, "kullukum raîn we kullukum mes'ûlun en reîyyetîhî", roja qiyametê Xwedê teala wê Kurmanca ji mezinê wan bipirse. Ehmedê Xanî kitêba xwe de nivîsîye:

"Teb'îyyetê me egerçi ar e(41)
ew ar-i li xelqê namîdar e(42)

Namûs e li hakim û emîran
Tawan çi ye aciz û feqîran!(43)

Loma divê mezinên Kurda, kiçikên binê destê xwe de bielimînin marîfeta, ilm û hunerê. Wê demê mîr û axa jî sed car bêtir xweyqedir bibin. Nesîhet ji min, guhdan ji we. Min divê ez xwe bêm welatê xwe, xwe di rîya miletê xwe de fîda bikim. Lê hukumeta Tirkan nahêle, navê Kurd xweyfen, qewet bibin. Bi îzna Xwedê, ez'ê ji hire(44) pê vê cerîdeyê, xizmeta ser min deyn çêkim.(45) Xwedê arîkarê mirovê qenc bit!

---

(32) Awayê rast weha ye: "Enwaê milel xwedankitêb in".
(33) Mehebbet: Evîn, hezkirin.
(34) Ez sewq kirim: Ez daf dam, ez ber bi vê xebatê birim.
(35) Mexsed ji "Rom"ê dewleta Osmanî ye, mexsed ji "Tirk" jî gelê Tirk e.
(36) Pera: Peran, diravan.
(37) Sera Xunkar: Saraya Xunkar, Koşka Mîr, Koşka Padîşah.
(38) Xweyşecaet: Xwedîşecaet, xwedîcesaret, cesûr, mêrxas, fêris.
(39) Li jêrenota 17'an a jimareya 2'an binêrin.
(40) We: Wisa, welê, wilo.
(41) Teb'îyyet: Peyrewî, ku mirov bibe peyrewê kesek yan jî hin kesan.
Awayê rast, "teb'îyyetê wan" e. Yanî "peyrewîya wan, ku em bûne peyrewên wan".
(42) Namîdar: Navdar, naskirî, malmezin.
(43) Tawan: Hêz, taqet.
Awayê rast, "tawan çi ye şair û feqîran" e.
(44) Ji hire: Ji vir, ji welatê ku ez tê da me, ji vî cîyî.
(45) Yanî, "xizmeta ku li ser min deyn e, ez'ê bikim, bînim cî, pêkbînim".

MEM Û ZÎN

Ew nûr-i bi emrê Alim'ul-xeyb(46)
bû menşeê feyzê alema xeyb(47)

Erwah-i ji maneya Peyember(48)
çêbûn, mesela nebat û şekker(49)

Bû eslê esîlê cumle nefsan(50)
Nefsa sueda û nefsê nehsan(51)

Hemyan ji wî dîtine teferru'(52)
Hemyan bi wî girtine temettu'(53)

Hêja ne zemîn, ne ev sema bû(54)
ew serwerê cumle enbîya bû(55)

Xelqa felekan jibo wî ra bû(56)
Secda melekan jibo wî ra bû(57)

---

(46) Alim'ul-xeyb: Zanayê bi tiştên nedîtî, zanayê bi tiştên nexuyayî û nedîyarî. Mexsed Xwedê ye.

(47) Yanî "bû kana feyza alema nedîyarî".

(48) Erwah: Piranîya "rûh" e, ew jî bi mana "gîyan" e.
Peyember: Pêxember.

(49) Nebat: Tiştên ku şîn dibin, wek gîya û daran.

(50) Eslê esîl: Koka bingehî, koka tewr pêşîn, koka pêşîna pêşîn.
Cumle nefsan: Hemî gîyanîyan, hemî jîndaran.

(51) Sueda: Bextyaran, kesên bextyar.
Nehsan: Kesên gunehkar, kesên zexel, kesên xirab.

(52) Hemyan: Hemîyan, giştan.
Teferru': Şaxdan, şaxavêtin, ku tiştekî wek darê şax bavêje û belav bibe. Yanî "hemîyan ji wê nûrê şax avêtine û belav bûne, zêde bûne".

(53) Temettu': Zewq, kêfxweşî. Yanî "hemîyan ji wê nûrê zewq û kêfxweşî girtîye, hemî bi wê kêfxweş bûne".

(54) Zemîn: Erd, ax.
Sema: Asîman.

(55) Cumle enbîya: Hemî Pêxemberan.

(56) Xelq: Afirandin. Yanî "afirandina felekan jibo wî bû, felek jibo wî hatin afirandin". Di vê peyvê da îşaret bi alîyê hedîseka xwedayî ve heye, ku Xwedê di wê hedîsê da ji Pêxember ra weha gotîye: "Eger ne jibo te bûya, eger ne jibo te bûya, min felek nedia-firandin".

(57) Di vir da jî îşaret tê kirin bi alîyê secda milyaketan ve jibo Adem Pêxember. Yanî "dema ku Xwedê Adem Pêxember afirand, nûra Pêxember di pişta wî da biriqî. Milyaketan ku ew nûr dît, li pêşberê Adem Pêxember çûn secdê. Bi wî awayî, secda wan di eslê xwe da ji wî ra bû".

Ew rehmetê cumle alemîn bû(58)
Adem di meyanê ma' û tîn bû(59)

Pêxemberê cem'ê cuz' û kul bû(60)
Adem bi xwe hêj-i av û gil bû(61)

*

Ew pencereya cemalê Barî(62)
şemsa feleka dilêd-i tarî(63)

gava kete sûretê cîhanî(64)
Pêxemberê axiruzzemanî

Wî berzexê mumkinat û Wacib(65)
wî padîşehê li şeklê hacib(66)

mensûx-i kirin wî dîn û millet(67)
ma'lûl-i kirin elîl û illet(68)

Fikrî ku cîhan cemî'i kufr e(69)
kêşa ji nubuwweta xwe sifre(70)

xelqê ku hebûn li rûyê erdî
teklîf-i kirin hemî bi merdî

---

(58) Cumle alemîn: Hemî aleman.
(59) Di meyanê ma' û tîn bû: Di nava avê û herîyê da bû. Yanî "hêj di halê afirandinê da bû, axa wî hêj nû bi avê hatibû ecinandin û bûbû herî, lê hêj gîyan neketibû'yê, hêj gîyanî nebûbû.
(60) Cem'ê cuz' û kul: Hemî parçe û yekeran, hemî parçe û temaman.
(61) Gil: Herî.
(62) Barî: Xwedê. Yanî "ew bû wek pencereyek ku rindîya Xwedê nîşan da".
(63) Şems: Roj. Yanî "Roj çawa ronayî dide feleka tarî û wê ronî dike, Pêxember jî bû wek Rojê û ronayî da dilên tarî, dilên tarî ronî kirin".
(64) Sûretê cîhanî: Awayê cîhanîyan, awa û şeklê dinyayîyan. Yanî "berê nûr bû, gava ku hat dinyayê û ket awa û şeklê dinyayîyan û bû mirov".
(65) Berzex: Bejê zirav û kêmber ê di navbera du deryayan da.
Mumkinat: Hemî heyî, hemî afirandî, hemî tiştên ku hene.
Wacib: Xwedê.
Yanî "ew Pêxemberê ku di navbera heyîyan û Xwedê da bû wek berzexek".
(66) Hacib: Wezîr.
(67) Mensûx kirin: Rakirin, hilanîn, betal kirin, nerewayî kirin, wisa kir ku hukmê wan êdî narewe, hukmê wan rakir.
Millet: Dînê ku awa û bingehokên wî hatine berhevkirin û nivîsîn.
(68) Yanî "semed û delîlên her tiştî nîşan dan".
(69) Fikrî: Fikirî, dît, nihêrt.
Cemî': Hemî, gişt.
(70) Nubuwwet: Pêxemberî.

Xaqan bi xwe Hindûyê kemîn bû(71)
Fexfûr-i ji xwanê kase çîn bû(72)

Qeyser bi qusûrîya xwe qasir(73)
hazir gerîya bi eynî basir(74)

Şahê Erebî elem ku rakir(75)
Kesrayê Ecem eceb duta kir(76)

Rom û Ecem û Fireng û Tatar(77)
herçî ku nekir bi dîn'î îqrar(78)

naçar-i gelek bi şîr fena bûn(79)
hetta ku hinek bi dîn teba bûn(80)

Putxane bi agirî dişûştin
Ateşgede cumlekî vekuştin(81)
(82)

---

(71) Xaqan: Mîrê Tirkan, hukumdarê Tirkan.
Hindûyê kemîn: Hindûyê di kozikê da, Hindûyê veşartî.

(72) Fexfûr: Mîrê Çînê, hukumdarê Çînê.
Ji xwanê kase çîn bû: Ji ber vexwarina ji kaseya meyê xûz bûbû û bûbû wek xelekek, hingî ku mey ji kasê vedixwar wek xelekek çîn bûbû.

(73) Qeyser: Mîrê împeratorîya Bîzans, hukumdarê Bîzans.
Bi qusûrîya xwe qasir: Bi kêmayîya xwe kêm mabû, li paş mabû.

(74) Yanî "tavil bi çavê xwe gerîya bîna, tavil bi çavê xwe bîna bû, dît".

(75) Elem: Ala.

(76) Kesra: Mîrê Îranê, hukumdarê Îranê.
Duta kir: Duqat kir. Yanî "ew zorbirî kir, serê wî tewand".

(77) Di çapa Stanbolê ya 1919'an da di şûna "Ecem" da "Hebeş" e.

(78) Bi dîn'î: Bi dînê wî

(79) Bi şîr fena bûn: Bi şûr tune bûn, bi şûr hatin kuştin û tunekirin.

(80) Bi dîn teba bûn: Tevê dîn bûn, gîhan dîn, dîn qebûl kirin.

(81) Ateşgede: Îbadetxaneya agirperestan.

(82) Di çapa Stanbolê da û hin nusxeyên desnivîsar da, di navbera vê beytê û beyta hatî da pênc beytên dî jî hene, ew jî ev in:

Gava ewî dîn kir aşîkara
Dawûdî-yû Sibtî-yû Nesara

Tewrat-i ewan ji bîr kir ekser
Încîl û Zebûr-i çûn ji ezber

Îsa-yi dema dixwendî Încîl
behsa wî dikir bi wehy û tenzîl

Go "mujde didim, Resûlê emced
dê paşê me bê, bi navê Ehmed"

Da'wa xwe dikir bi dest û ezman
Destê wî bi seyf û dev bi **Qur'an**

Xweşxilqet e, hem Resûl e hem mîr(83)
Pirrhîkmet e, hem kîtab e hem şîr(84)

Naxwende sebeq, muderrisê am(85)
Bê mal û menal-i sahib în'am(86)

Bê xeyl û heşem bi xwe cîhangîr(87)
Bê tebl û elem cîhan sedagîr(88)

Herçî te didî meger her ew bû
Leşker ji cunûdê "lem terew" bû(89)

Bê xeyme û barîgah û eywan(90)
Ewran vedida li ser wî seywan(91)

Hindî ku ji pêş ve baxeber bû(92)
ew çende ji pişt ve babeser bû(93)

Sih danediket ji wî li erdan(94)
Vêkra dibihîstî sed xeberdan

Goyende dibûn digel, cemadat(95)
Pêwende dibûn digel, nebatat(96)

---

(83) Xweşxilqet: Xweşafirandî, kesê ku xweş hatîye afirandin, spehî.
(84) Pirrhîkmet: Kesê pirr zana û bîrbir, kesê pirr bîrewer.
Şîr: Şûr. Yanî "hem pirtûka wî hebû, hem jî şûrê wî hebû".
(85) Naxwende sebeq: Nexwendîyê berê, kesê ku berê nexwendîye, nexwendî.
Muderrisê am: Mamostayê giştî, mamostayê her kesî.
(86) Menal: Malhebûn, dewlemendî, serwet.
Sahib în'am: Xwedîqencî, kesê ku tişt dide xelkê, kesê qencîkar.
(87) Xeyl: Hesp.
Heşem: Debdebe, şêla hêzdarên wek mîran, rewşa wan a ku hêza wan nîşan dide.
Cîhangîr: Cîhangir, dinyagir, kesê ku cîhanê digire.
(88) Tebl: Dawil, def.
Sedagîr: Dengangir. Yanî "dengana wî cîhan girt, li cîhanê belav bû".
(89) Cunûdê "lem terew": Eskerên ku "we nedîtin". Ev îşaret e bi alîyê ayetek ve ku Xwedê tê da qala şerê Huneynê kirîye û gotîye "me jibo alîkarîya Pêxemberê xwe eskerna şandin ku we ew nedîtin".
(90) Xeyme: Kon.
(91) Seywan: Sîwan, tiştê ku sî dide ser mirov, li ser mirov sî çêdike.
(92) Baxeber: Xeberdar, haydar, agehdar.
(93) Babeser: Bîna.
(94) Sih: Sî, sîya ku li ber tavê ji tiştan û mirovan dadikeve erdê.
(95) Goyende: Peyvok, ê ku dipeyive.
Cemadat: Tiştên bêgîyan, wek kevir û daran.
(96) Pêwende: Pêwendîdar, ê ku pêwendî datîne, xwedî pêwendî.
Nebatat: Tiştên ku şîn dibin, wek gîya û daran.

Yek new'i nema ji cinsê heywan(97)
nîna bi nubuwweta wî îman(98)

Îlla ku hinek ji îbnê Adem(99)
bûn derxurê ateşê cehennem(100)

*

Elqisse, di erd û asîmanan
Hasil, di cemîê îns û canan(101)

nînin bi şerafeta wî tiştek(102)
nabit ji wî zêdetir me piştek

Ev bêmededêd-i ummeta xwe
mumtaz-i kirin bi hîmmeta xwe(103)

Wer'a wî we rengî dîn qewî kir(104)
Şer'a wî sirat-i mustewî kir(105)

Alim hemî şubhê enbîya ne
Abid hemî pêkve ewlîya ne(106)

Ferdek ji sehabeyêd-i kubbar(107)
pansed ji dîlawerêd-i kuffar(108)

ew cumle digel yekê seraser
ned'bûn bi mehabetê beraber(109)

---

(97) New': Tewir.
(98) Nîna: Nanî, neanî.
(99) Îbnê Adem: Kurên Adem, zarûkên Adem, mirovan.
(100) Derxur: Xurek, tiştê ku tê xwarin.
Ateş: Agir.
(101) Hasil: Bi peyva kurt, ku em bi kurtî bêjin.
Can: Cin, perî.
(102) Yanî "li ber şerefa wî ne tiştek in, rûmetek ji wan ra tune".
(103) Mumtaz kirin: Veqetandin, cuda kirin, bijare kirin, gerandin bijare.
(104) Wer': Pêkanîna fermana Xwedê.
(105) Sirat: Rê.
Mustewî: Dûz, rast.
(106) Abid: Îbadetkar, kesê ku tim ji Xwedê ra îbadet dike.
(107) Kubbar: Qedirbilind, rûmetbilind.
(108) Pansed: Pênsed, pênc sed.
Dîlawer: Mêrxas, fêris, şerkar.
Kuffar: Piranîya "kafir" e.
(109) Mehabet: Heybet, saw.

Xelqê heye şubheyek di dîn'î
behsê bi cedel biket ji dînî(110)

Qur'an û xeber çi mu'cizat in!(111)
Ayat û suwer çi beyyinat in!(112)

Bûbekr û Umer çi xweş qerîn in!(113)
Usman û Elî eceb guzîn in!(114)

*

Ey padîşehê bilindepaye!(115)
Xurşîdê felek nuşîn û saye!(116)

Ne'tê te bi ilmê min muhal e(117)
Meddah-i jibo te Zulcelal e(118)

Ez dê çi bibêjim, ey şehînşah!
Wessafê te ye kelamê Ellah(119)

Şaha, ji te ra xweş îsm e "Yasîn"!(120)
Taha, ji te ra tilîsm e "Tasîn"!(121)

---

(110) Cedel: Cîdal, mucadele, munaqeşe.
Ji dînî: Ji dînîtî, ji bêaqilî, ji dînîtîya xwe, ji bêaqilîya xwe.
(111) Xeber: Hedîsên Pêxember.
(112) Suwer: Sûreyên **Qur'anê.**
Beyyinat: Piranîya "beyyinet" e, ew jî bi mana "delîl" e.
(113) Qerîn: Heval.
(114) Guzîn: Bijare. Yanî "hevalên wî yên bijare ne".
(115) Bilindepaye: Rutbebilind, qedirbilind, rûmetbilind.
Hozên li vir dest pê dike deng li Pêxember dike, ber bi wî dipeyive.
(116) Xurşîd: Roj, Roja ku ronayî belav dike.
Nuşîn û saye: Cîyê rûniştinê û sî. Yanî, "Roja felekê bi qedrê xwe û rûmeta xwe ji te pirr kêmtir e, li binê te ye, wek ku ji te ra bûbe cîyê rûniştinê û tu li ser wê rûnîştî, ew wek sîya te ye".
(117) Ne't: Pesin.
Muhal: Bêmikûn, ne mimkun.
(118) Meddah: Pesindar, ê ku pesin dide.
Zulcelal: Xwedê.
(119) Wessaf: Salixdar, ê ku salix dide, her weha pesindar.
Kelamê Ellah: Peyvvên Xwedê, gotinên Xwedê.
(120) Şaha: Ey şah, şahê min.
Îsm: Nav.
Yasîn: Navek ji navên Pêxember e. Her weha di serê sûreyeka **Qur'anê** da hatîye û bûye navê wê sûreyê jî.
(121) Taha: Navek ji navên Pêxember e. Her weha di serê sûreyeka **Qur'anê** da hatîye û bûye navê wê sûreyê jî.

Her ev bes e, ey hebîbê muxtar!(122)
Barî ji te ra bi jî te sond xwar(123)

Sed car-i bi jî te, ey keremkar!(124)
ger dê me hebin guneh du sed bar

sed mertebe gerçi em xirab în
emma ji te naumîd-i nabîn(125)

Hetta bigîhîte Xanîyê jar
napak û pelîd û wacibunnar(126)

ew jî bi xirabî-yû seyînî
da'wa diketin bi ummetînî

Wî bed'emelê wekî kîlaban(127)
Barî bike peyrewê sehaban(128)

---

(122) Hebîbê muxtar: Xweşdivîyê bijare, xweşdivîyê ku hatîye bijartin û bûye bijare. Yanî "xweşdivîyê ku Xwedê ew jibo Pêxemberîya xwe bijartîye û bi wî awayî ew gêraye bijare, kesê ku Xwedê ew evandîye û jibo Pêxemberîya xwe bijartîye û bi wî awayî ew bûye xweşdivîyê bijare".

(123) Barî: Xwedê.
Bi jî te: Bi jîyana te, bi umrê te. Ev îşaret e bi alîyê ayeteka **Qur'anê** ve ku Xwedê tê da ji Pêxember ra gotîye "bi umrê te" û bi wî awayî bi umrê wî sond xwarîye.

(124) Keremkar: Qencîkar, kesê ku karê wî qencî ye, tim qencî dike.

(125) Naumîd: Bêhêvî.

(126) Pelîd: Qirêjî, lewitî, nepak.
Wacibunnar: Misteheqê agir, gunehkarê ku agirê canemê heq kirîye.

(127) Bed'emel: Xirabkar, kesê ku karên xirab dike.
Kîlab: Piranîya "kelb" e, ew jî bi mana "se" ye.

(128) Peyrew: Peymeş, kesê ku li pey kesek yan hin kesan dimeşe, direwe, tabiê wî kesî yan wan kesan dibe. Dijmana "pêşrew".

www.netewe.com

ÎSTÎD'AYÊ ŞEFAET Û ÎSTÎŞFAÊ MEXFÎRET JÎ CENABÊ SAHİBÊ SERÎRÊ ŞEFAET Dİ SÛRETÊ MÎ'RACÊ DA Bİ BAL HEZRETÊ ÎZZET(129)

Ey wasiteyê wucûdê kewneyn!(130)
Şayesteyê qurbê "qabe qewseyn"!(131)

Şahînşehê textekê Medîne!
Mu'ciz ji te ew qeder me dîne

seyra felekan li nik te gavek
fexra melekan ji te silavek

"şeqqe'l-qemer"a te yek îşaret(132)
"zaxe'l-beser"a te yek îbaret(133)

*

Ey padîşehê serîrê "Lewlak"!(134)
Rabe here asîmanî, çalak!

---

(129) Mana vê sernivîsarê weha ye: "Daxwaza şefaetê û daxwaza tikaya nuxaftina gunehan ji cenabê xwedîyê textê şefaetê, bi awayê bilindbûna bi bal Xwedayê gewre ve". Yanî "Pêxemberê ku xwedîyê textê şefaetê ye, daxwaz jê tê kirin ku bilind bibe here huzûra Xwedâyê gewre û ji me ra şefaet bike, jê tika bike ku gunehên me binuxêfe, bipoşe, bixefirîne".

(130) Wucûdê kewneyn: Hebûna her du dinyan, hebûna dinê û axretê. Hozên deng li Pêxember dike.

(131) Şayeste: Layiq.
Qurbê "qabe qewseyn": Nêzîkîya "bi qasê du kevanan". Ev îşaret e bi alîyê ayeteka **Qur'anê** ve ku tê da qala mî'raca Pêxember hatîye kirin û hatîye gotin ku Pêxember di şeva mî'racê da bi qasê du kevanan nêzîkê Xwedê bûye. Yanî "ey Pêxemberê ku tu layiq hatî dîtin ku bi qasê du kevanan nêzîkê Xwedê bibî".

(132) "Şeqqe'l-qemer"a te: Qetkirina te ya hîvê, parçekirina te ya hîvê. Ev îşaret e bi alîyê ayeteka **Qur'anê** ve, ku tê da hatîye gotin "hîv qet bû"; di tarîxa Îslamê da jî tê gotin ku ew qetbûna hîvê bi îşareteka Pêxember bûye û bûye mu'cîzeyeka wî.

(133) "Zaxe'l-beser": Şemitîna çav. Ev îşaret e bi alîyê ayetek ve ku tê da tê gotin "Pêxember şeva mî'racê Xwedê dît, çavê wî neşemitî".
Yek îbaret: Yek peyvek, yek gotinek. Yanî "jibo ku bê zanîn ku çavê te neşemitîye û bi rastî te Xwedê dîtîye, yek peyvek bes e, yek gotineka Xwedê di ayetek da bes e".

(134) Padîşehê serîrê "Lewlak": Padîşahê textê "Lewlak"ê. Peyvika "Lewlak" bi mana "eger ne jibo te bûya" ye. Mexsed ji vê peyvikê hedîseka xwedayî ye, ku Xwedê di wê da ji Pêxember ra gotîye "eger ne jibo te bûya min felek nediafirandin". Xanîyê nemir ew hedîs şibandîye bi textek û ji Pêxember ra gotîye "padîşahê li ser wî textî".

Hazir ji te ra buraq û refref(135)
şatir bi te ra firîşte ref ref(136)

da ref'i bibin ji ber te perde(137)
bê perde digel Xwedê xeber de

Bêj'ê: Tu Qedîr û Zulcelal î(138)
Bêj'ê: Tu Qedîm û layezal î(139)

Em fanî-yû jar û miştexak în(140)
Hadî ne tu bî, xwe em helak în(141)

Ewwel te jibo çi da me tazîm(142)
danî li serê me tacê tekrîm(143)

teşrîfê xîlafetê te da me!(144)
Gava te emanetê xwe da me

malûmê te bû ku em nezan în
qedrê wî emanetî nizanîn

---

(135) Buraq: Heywanekî wek hespê bûye, lê bibask û fira bûye. Dema Pêxember çûye mî'racê li wê siwar bûye.
Refref: Bask, baskên buraqê.

(136) Şatir: Beşdar, hevrê.
Firîşte: Melek, milyaket. Yanî "di vê rêwîtîya te da firîşte jî dê beşdar bibin, ji te ra bibin hevrê, digel te bên".

(137) Ref'i bibin: Rabin, hilên.

(138) Bêj'ê: Bêje wî, ji wî ra bêje, ji Xwedê ra bêje.
Qedîr: Xwedîyê hêza pirr.
Zulcelal: Xwedîyê mezinatîyê, gewre.

(139) Qedîm: Ewê ku ji berê ve heye, despêk ji hebûna wî ra tune.
Layezal: Ewê ku dê tim hebe, paşî ji hebûna wî ra tune.

(140) Fanî: Kes yan tiştê ku fena dibe, tune dibe, ji heyîyê diçe tuneyîyê.
Miştexak: Mişteax, di sewîye û tenga axê da, beraberê axê, qedirnizim, bêrûmet. Yanî "em bêrûmet in û di sewîya axê da ne, di tenga axê da ne, beraberê axê ne, rûmeta me wek rûmeta axê ye".

(141) Hadî: Rênumînê rîya rast û heq, kesê ku rîya rast û heq nîşanê mirov dide. Ev, jibo Xwedê tê gotin.

(142) Tazîm: Mezinatî, gewretî, qedirbilindî.

(143) Tacê tekrîm: Taca mezinatîyê, taca gewretîyê, taca qedirbilindîyê. Ev îşaret e bi alîyê ayetek ve ku Xwedê tê da gotîye "me kurên Adem qedirbilind kirine".

(144) Teşrîfê xîlafetê: Şerefa xelîfetîyê, şerefa wekîlîyê, şerefa wekîlîya Xwedê. Ev îşaret e bi alîyê ayeteka **Qur'anê** ve ku tê da weha hatîye gotin: "Xwedê soz da bawerdarên karbaş ku dê wan li erdê bike wekîl". Ew "emanet"ê ku di malika pey vê malikê da tê gotin, mexsed ji wî jî ev wekîlî ye.

Herçî te jibo me kir îrade(145)
yek zerre me lê nekir zîyade

Haşa ji kemalê re'feta te(146)
dûr e ji celal û rehmeta te(147)

kufr û gunehan bikî behane
laiq te bitin. Ev e şehane!(148)

Yekrû ne li nik te kufr û îman
Yeksû ne li nik te xuld û nîran(149)

Qehra xwe bikî eger tu zahir(150)
cennet li me dê bibîte agir

Wer feyz-i biket sehabê rehmet(151)
dozex li me dê bibîte cennet(152)

Ger kafir û ger gunahekar in
bîlcumle ji te umîdewar in(153)

Kes nîne ji kafir û usatan(154)
mezher nebitin jibo sifatan(155)

---

(145) Îrade: Vîn, daxwaza qutûbirr. Yanî "herçî tiştê ku te jibo me vîya, qutûbirr daxwaz kir, xwest".
(146) Kemal: Tam, bêkêmayî, ne nîvçe û kêm.
Re'fet: Merhemet, dilovanî. Yanî "haşa ji merhemeta te ya temam".
(147) Celal: Mezinatî, gewretî.
(148) Yanî "ma padîşahî û mîrîtî ev e, ma ev ji padîşahîyê ra dest dide!"
(149) Yeksû: Wek hev.
Xuld: Bihişt.
Nîran: Agir, canem.
(150) Zahir: Eşkera. Yanî "eger tu qehra xwe eşkera bikî, nîşan bidî".
(151) Wer: We eger, û eger.
Sehabê rehmet: Hewrê rehmetê. Yanî "û eger hewrê rehmeta te feyz bike, wek barana ku ji hewr dibare rehmeta te jî li me bibare".
(152) Dozex: Doj, canem.
(153) Umîdewar in: Umîdwar in, hêvîdar in, bihêvî ne.
(154) Usat: Piranîya "asî" ye, ew jî bi mana "gunehkar" e.
(155) Mezher: Xuyanek, cîyê xuyabûnê.
Sifat: Piranîya "sifet" e. Mexsed jê sifetên Xwedê ne. Yanî "ji kafir û gunehkaran kes tune ku jibo sifetên te nebe xuyanek, kes tune ku sifetên te di wî da xuya nebin û neyên dîtin".

www.netewe.com

Kafir bûyîn em bi îsmê "Qehhar"(156)
"Xeffar" e ku em kirîn gunehkar(157)

Kufrê tu meger neşî bibexşî!
Ger dê gunehan bi me binexşî

dê şad-i bibin li me şeyatîn(158)
mesrûr-i bibin gelek melaîn(159)

*

Qet xîret e, ey penahê alem(160)
qet laiq e, ey şivanê adem(161)

ev gurgê leîn ê bed serencam(162)
jêkra biketin me şubhê exnam!(163)

Elqisse, bikî ku dêwê serkeş
tenha û tenê biçîte ateş

Fîlcumle me cumle xas û aman(164)
asî-yû şeqî-yû natemaman(165)

têkra bi şefaeta xwe xas ke
vêkra me ji agirî xilas ke

---

(156) "Qehhar": Qehrkar, ê ku qehr dike, qehrkirox. Ev navek ji navên Xwedê ye. Yanî "ji ber ku navekî te Qehhar e, hinek ji me ketin ber wî navê te û bûn kafir, te qehr li wan kir loma ew bûn kafir".

(157) "Xeffar": Poşandox, nuxaftox, ê ku gunehan dipoşe, dinuxêfe, mexfîret dike, vedişêre. Ev jî navekî Xwedê ye. Yanî "em bi xêra vî navê te bûn gunehkar, da ku tu gunehên me bipoşî û bixefirînî".

(158) Şeyatîn: Piranîya "şeytan" e.

(159) Mesrûr: Kêfxweş, dilşa.
Melaîn: Piranîya "mel'ûn" e, ew jî bi mana "nalelêhatî" ye.

(160) Penah: Palgeh, ê ku mirov pê ewle dibe û pala xwe did'ê, xwe dispêr'ê. Hozên li vir dîsa berê peyva xwe daye Pêxember û jê ra gotîye ku "tu jibo alemê palgeh û sipartek î, alemê pala xwe daye te û xwe sipartîye te, pişta xwe bi te girêdaye".

(161) Şivanê adem: Şivanê mirovan, şivanê însanan.

(162) Yanî "ev gurê nalelêhatî yê ku aqibeta wî xirab e". Mexsed şêytên e.

(163) Exnam: Piranîya "xenem" e, ew jî bi mana "pez" e.

(164) Xas: Kesê qenc, kesê ku nêzê Xwedê û Pêxember e, dostê wan e.
Aman: Kesên ji rêzê, kesên ne nêzê Xwedê û Pêxember, kesên celebî.

(165) Asî: Gunehkar.
Şeqî: Bextreş, kesê misteheqê ceza, kesê xirab.
Natemam: Netemam, nîvçe, kesên kêm û rûmetnizim, kêmqedir.

Ez'ê vê cerîdeya xwe her pazde roja carekê derînim. Cerîdeya paş vê, ez'ê ji kitêba Ehmedê Xanî, rehmetullahî eleyhî, nesîhetekê binivîsim. Ew nesîhet gelek xweş hatîye gotin. Ji hemî Kurda hêvî dikim qenc guh bidin wê nesîhetê.

Metbea ''Cem'îyeta Tefaq û Qencîya Musulmana'' tebi' bîye

---

www.netewe.com

6'NCI SAYININ ÇEVİRİLERİ

ŞEVKETLU AZAMETLU SULTAN İKİNCİ ABDÜLHAMİD HAN HAZRETLERİNE KULCA DİLEKÇEMDİR

Padişahım,

Yakalanmış olduğu göğüs hastalığından dolayı hekimlerin gösterdikleri gerek üzerine, defalarca isteyip istirham ettiği izni alamadığından geçen kış izinsiz olarak Mısır'a giden ve yaz mevsiminin girmesiyle birlikte İstanbul'a dönen kardeşim Midhat kullarının bu yolculuğunun biçimini alışılageldiği gibi istediği biçime ve niteliğe koyarak, siz Padişahlarına karşı yalan dolanlar uydurmanın yolunu seçen ve bu yolla ikbal ve çıkar sağlamayı alışkanlık durumuna getiren Ebülhüda Efendi, birtakım bozguncu girişimlerde bulunmuştur. Ebülhüda'nın bu bozguncu girişimlerinden biri de, "hiç bir yükümlü başkasının yükünü yükümlenmez"(166) anlamındaki yüce ayete aykırı olarak Zeyd için Amr'ı(167) sorumlu tutmak gibi bir tutum takınmak ve bu vesileyle de siz Padişahları hakkındaki kamuoyunu zedelemektir.

Bu tutuma uygun olarak, İstanbul'da bulunan kardeşlerime baskı yapılmasıyle Midhat Bey'in İstanbul'a getirtilmesinin olanaklı olabileceğine ilişkin, adı geçen Ebuddalal'ın(168) iğrençliklerini uygulama aracı olan Osman Paşa'ya Emin Bey'e(169) baskı yapılması konusunda bir jurnal(170) verdirilmiştir. Bunun üzerine Başkâtip Tahsin Bey kulları tarafından "baskı" sözcüğü konusunda Osman Paşa'dan açıklama istenmiş, Osman Paşa da şu yanıtı vermiştir: "Efendimiz emir buyururlarsa, Midhat Bey'in burada bulunan kardeşlerini dövmek ve öldürmekle korkuturum; onlar da o güç ve sıkıntılı durumdan kurtulmak için Midhat Bey'i geri çağırırlar".

---

(166) Bu sayıdaki 3 numaralı dipnota bakınız.
(167) Bu sayıdaki 4 numaralı dipnota bakınız.
(168) Bu sayıdaki 5 numaralı dipnota bakınız.
(169) Bu sayıdaki 6 numaralı dipnota bakınız.
(170) Jurnal: Fransızca olan ve "gazete, resmî görevlilerin işe başlarken ve paydos ederken imzaladıkları günlük çalışma listesi, herhangi bir olay hakkında polisin düzenlediği rapor, günlük anı defteri" gibi anlamlarda kullanılan bu sözcük, Abdülhamid döneminde bir terim olarak, "Saraya ya da başka bir resmî makama birileri hakkında gizli ajanlarca yapılan yazılı ihbar" anlamında kullanılmıştır. Fransızcada "journal" biçiminde yazılan bu sözcük, Türkçede "jurnal" biçiminde yazılır. Abdülhamid döneminde ihbarcılık yapan kimselere de jurnalcı" ve "hafiye" denirdi. "Hafiye" sözcüğü "gizli ajan" anlamında kullanılırdı.

Onun bu alçakça yanıtına yüca Halifelik Makamı Başkâtibi Tahsin Beyefendi de, "Efendimiz bunu size resmen emredemezler" diye karşılık vermiş ve böylece, arzedilen iğrençliğin uygulanmasına siz Padişahlarının resmî olmayan biçimde müsaadenizin bulunduğunu üstü kapalı olarak bildirmiştir. Ayrıca, Özel Yaver Mehmed Paşa da, söylenenlere ek olarak, böyle davranılmasının sadakatin(171) şanına yaraşacağını açıklamıştır. Onun bu sözünden sonra, sözü edilen iğrençliğin ve alçaklığın, Başkâtip Bey tarafından Emin Bey'in Mabeyn-i hümayuna çağrılacağı bir günde yerine getirilmesi kararlaştırılmıştır. Bu karar gereğince Emin Bey, ta Beşiktaş'tan Kadıköy'e(172) kadar birtakım haşereler(173) tarafından izlettirilmiştir.

*

Yürütülen soruşturmaya ve olay sırasında buna cüret edenler tarafından açıkça ve halkın gözü önünde yapılan açıklamalara göre, sözü edilen haşerelerin Osman Paşa tarafından hazırlanıp bu işe sokuldukları ve Emin Bey'in dövülmesi konusunda sizin yüce iradenizin çıkmış olduğunun kendilerine Osman Paşa tarafından bildirildiği kesinlik kazanmıştır. Bu nedenle, Osman Paşa hakkında da adaletin gereğinin yerine getirilmesi hepimiz tarafından siz Hilâfetpenahîlerinin(174) yüce eşiğinden defalarca istirham edildiği halde, bu istirhamımızın meyvesini görmek şöyle dursun, Ebuddalal'ın nüfuzunun etkisiyle istirhamlarımız dahi siz Padişahlarının ayaklarının bastığı topraklarca etkisiz kalmıştır.

Ayrıca, hal hatır sormak için şefkat ve bağlılık dürtüsüyle İstanbul'a gelip doğruca siz Padişahlarının Mabeyn-i humayununa başvurmuş olan kardeşim Ali Bey kulları dahi dört gün Komutanlık dairesinde tutuklandıktan başka, ikinci bir aşağılama ve hakaret olmak üzere, Ebülheva'nın(175) lânetli elini öpmeden salıverilemeyeceği kendisine resmen bildirilmiştir. Bu ikinci aşağılama da, yine siz Padişahlarının ünlü adına yapılmış ve siz Padişahlarının kesin iradenizin bir gereği olduğu Gidiş Müdürü(176) Sansar Hacı Mahmud Efendi, Başkâtip Tahsin Bey ve Özel Yaveriniz Çerkes Kabasakal Mehmed Paşa taraflarından bildirilmiştir.

---

(171) Sadakat: Bir devlete ya da bir rejime ya da bir hükümdara ya da bir siyasal lidere içtenlikle bağlılık. Arapça olan bu sözcük, Türkçede tam karşılığı bulunmadığı için çeviride tarafımızdan aynen kullanıldı.

(172) Bu sayıdaki 7 numaralı dipnota bakınız.

(173) Bu sayıdaki 8 numaralı dipnota bakınız.

(174) Hilâfetpenahî: Halifeliğin dayandığı yer, Halifeliğin sığınıp korunduğu yer. Osmanlılar döneminde padişahlar için kullanılan bu unvan, bazen de "Hilâfetpenah" biçiminde kullanılırdı; onun da anlamı "Halifeliğin dayanağı, Halifeliğin koruyucusu" demekti. Arapça "Hilâfet" ile Farsça "penah" sözcüklerinden oluşan "Hilâfetpenahî" sözcüğü, Türkçede karşılığı bulunmadığından, çeviride aynen kullanıldı.

(175) Bu sayıdaki 10 numaralı dipnota bakınız.

(176) Gidiş Müdürü: Osmanlılar zamanında, padişahın bir yere gideceği zaman onunla ilgili hazırlığı yapmakla görevli olan kimse.

Padişahım,

Bu gibi alçakça davranışlarla korkutulabilecek bir kimse varsa, onun da Osman Paşa olduğuna yemin ederim. Kardeşim Midhat Bey'in anlatımından ve telgrafhane kayıtlarından anlaşılacağı gibi, İstanbul'a döneceğine ilişkin olan telgrafı, arzedilen iğrenç saldırının meydana gelmesinden önce gönderilmiş olduğuna göre, o tehdidin, Midhat Bey'in dönüşüyle bir ilgisi ya da etkisi olamayacağı açıktır.

İşte ben kullarınız da, bu gerçeği kanıtlamak ve Ebuddalal'ın hakkımızda aldırttığı yanlış önlemin geçersizliğini ortaya koymak için, ben kullarının başlıca amacıma uygun olarak, öteden beri İslâm milletini(177) ve siz Padişahlarının Sultanlığını(178) bozguncu önlemleriyle mahveden ve bu arada devlete ve millete hizmetleri geçmiş olan ailemizin bireyleri ile bunca suçsuz günahsız insanları perişan edip yok eyleyen Ebülheva'nın aşağılık ve iğrençliğinin boyutlarını, Midhat Bey'in ilk kez kurup yayınladığı **"Kürdistan"** gazetesi ve yabancı basın aracılığıyle açığa vurup yaygınlaştırmak ve siz Padişahlarının kulaklarına da ulaştırmak istiyorum. Ve Ebülheva gibi bir habîsin(179) nüfuzunun etkisiyle kanunun yürürlükte olmadığı, adaletin ortadan kaybolduğu ve zulmün egemenlik kurduğu ülkelerinize artık dönmeyeceğim; ve yaşamımı, yalnızca, İslâm milletinin esenlik ve mutluluğa kavuşması ile ailemizin bireylerinin gasbedilmiş haklarının elde edilmesi için çalışmaya vereceğimi arzederim.

Bedirhan Paşazade
Abdurrahman

(177) İslâm milleti: İslâm topluluğu. Buradaki "millet" sözcüğü "ulus" anlamında değil, "aynı dine bağlı insanların oluşturduğu topluluk" anlamındadır. Osmanlılar zamanında "millet" sözcüğü hem bu anlamda, hem de "aynı devlete bağlı insanların oluşturduğu topluluk" anlamında kullanılmıştır ve o anlamda da örneğin "Osmanlı milleti" denilmiştir.

(178) Buradaki "Sultanlık" sözcüğünün "devlet" anlamında kullanıldığı anlaşılıyor.

(179) Habîs: Çok kötü, alçak karakterli, pis, soysuz, ahlaksız. Arapça olup Osmanlıcada da kullanılan bu sözcük, Türkçede tek sözcükle karşılığı bulunmadığı için, çeviride aynen kullanıldı.

Eded 7 Sala ewwulî Rûper 1

Heçî vê
kaxidekî
rêke
ji min re,
divê
ser kaxizî
weha binivîse:
"Bî Genève
necl'ul-merhûm
Bedirxan Paşa
Ebdurrehman Beg"

*

Her car
du hezar
cerîdeya
ez'ê rêkim
Kurdistanê,
de belaş
bidin xelkê

KURDİSTAN

1315

Pazde roja de carekê têt nivîsandin
cerîdeya Kurdî ye

Kürdleri tahsil-i ulûm ve
fünûna teşvik eder
nasayih ve edebiyat-ı
Kürdiyeyi hâvî
on beş günde bir neşrolunur
Kürdçe gazetedir

Gazetenin mesleğine muvafık
Arabça, Türkçe, Farisîce
mektublar
Kürdçeye bittercüme neşrolunur

Unvan:
Genève'de
"Kürdistan"
Gazetesi
Sahib ve Muharriri
Bedirhan Paşazade
Abdurrahman

*

Her tabı'da
2000 nüsha
Kürdistan
vülât-ı izamına
irsal ve vesatetleriyle
kura ve kasabâta
neşr-ü tamim
olunacaktır

*

Kürdistan haricinde
her yer için
senelik abone bedeli
80 kuruştur
Kürdistan dahilinde
hususî isteyenlere
meccanen gönderilir

Roja yekşembê de 25 Cemazîlaxir 1316 * Pazarertesi fi 23 Teşrin-i Evvel sene 1314(1)

SULTAN ABDÜLHAMİD HAN-I SANÎ HAZRETLERİNE ARZIHALİMDİR

Padişahım,

Zat-ı hümayunlarını daima iğfale çalışmak isteyen Ebülhüda gibi bir zalimin baziçe-i zulm-ü itisafı olmaktan ve şu hale adem-i tahammülden naşi' İstanbul'u terk ile, me'va-i kadîmleri ve vatan-ı aslîleri bulunan Kürdistan'a gitmek isteyen beş biraderimi canîler gibi Taşkışla'da(2) habs-ü tevkif ederek

(1) Li gora tarîxa Mîladî 5 Çirîya Paşîn 1898(Milâdî tarihe göre 5 Kasım 1898; geçen sayıdaki gibi burada da "pazar" yerine "pazarertesi" yazılmıştır; oysa Kürdçe "yekşemb", pazartesi değil de pazardır ve bu nedenle Türkçesinde "pazar" yazılması gerekirdi).

(2) Taşkışla: İstanbul'da ünlü Taksim Meydanı yakınında bulunan ve tümüyle taştan yapılmış olan ünlü tarihsel yapı. Osmanlılar döneminde askerî kışla olarak kullanılan bu yapı, daha sonra İstanbul Teknik Üniversitesi'ne devredilmiştir.

işkence altında bulundurduğunuza dair matbuât-ı ecanib ve mahafil-i siyasiye gibi menabı-ı mevsukadan aldığım haberler, çakerlerini, biraderlerimin uğradıkları musîbet için değil, ancak adaletten başka bir şeye intizar olunmayan Makam-ı Hilâfeti Avrupa'ya karşı şu muamele-i kanunşikenanesinden dolayı dilhun etti.

Öteden beri millet uğrunda mal ve canlarını fedaya müheyya olduklarını emsal-ı müteaddide-i fi'liyesiyle isbat etmiş olan kadîm bir hanedan erkânının, her türlü meziyetten ârî ve bin türlü şenaatiyle umumun gayz-ü nefretini kazanmış bulunan Kıbtîyünneseb Ebuddalal'ın keyfine kurban edilmesi, acaba hangi adl-ü hikmete tevafuk eder?

Biraderlerimin şu suretle işkence altında bulundurulması, beni İstanbul'a getirtmek, fikir ve azmimden sarfınazar ettirmek maksadına mübtenî ise, Allah'a kasem ederim ki şu tedbir, azm-ü sebatımı takviyeden başka bir şeye hizmet etmez.

"Zahme düş oldukça şîrin pençesi şiddetlenir".(3)

Padişahım,

Osmanlı hanedan-ı saltanatı erkânından olduğunuz halde, acaba şu hakikati anlamak kabiliyetini niçin haiz değilsiniz?:

Bu gibi tedbirler, kendinize tac-ı ser ittihaz ettiğiniz Kıbtî Ebülhüda gibi cebînülkalb olanlara tesir ederse de, pederiniz cennetmekân Abdülmecîd ile harbetmiş bir kahramanın(4) oğluna hiç bir vakitte tesir edemez! Ebuddalal'ın habaset ve mel'anetine hizmet ettiği için Osman Paşa bin türlü habasetler icra eder; buna mukabil kendisine ihsanlar, rütbeler, nişanlar bahşolunur.

Genc, güzel oğlunu takdim ile Ebuddalal'ın hevesât-ı nefsaniyesine hizmet etmemiştir diyerek birçok erbab-ı namus, İstanbul sokaklarında Osman Paşa ve avenesi birtakım haşerât tarafından darbolunur; hükümet-i seniyyeniz tarafından Paşa-i müşarünileyhe sual terettub etmek şöyle dursun, zat-ı Şahanenizden değil ise de efendisi bulunan Ebuddalal tarafından kendisine birkaç bahşiş ihsan olunur.

Mübtelâ olduğu vahîm bir hastalığın tedavisi zımnında Mısır'a gitmiş olan biraderimin(5) İstanbul'a avdet ettirilmesi için Ebuddalal'ın teşvikiyle şerefsudûr eden irade-i merhametâde-i Cenab-ı Hilâfetpenahîleri üzerine,

---

(3) Bir şiir dizesi olduğu anlaşılan bu parçanın anlamı şöyledir:
"Aslana darbeler indikçe, pençesi şiddetlenir".

(4) Sözü edilen kahramandan maksat, 1830'larda ve 1840'larda Kürdistan'ın kurtuluşu için Osmanlılara karşı savaşmış, ancak yenilgiye uğrayarak önce Girit adasına ve sonra da Şam'a sürülmüş ve 1870'te orada vefat etmiş olan ve Kürdistan'da "Mîr Bedirxanê Botî"(Botanlı Bedirhan Bey) adıyle bilinen Bedirhan Bey'dir. "**Kürdistan**" gazetesini yayınlayan Mikdad Midhat ve Abdurrahman Bedirhan kardeşler, Mîr Bedirhan'ın oğullarındandı.

(5) Mikdad Midhat Bedirhan'ı kastediyor.

Makam-ı Hilâfetin Başkitabeti odasında Başkâtib Tahsin Bey, Yaveran-ı Hazreti Şehriyarîden "Kabasakal" denilmekle maruf Mehmed Paşa ve yine ferîkan-ı kiramınızdan Ferîk Osman Paşa meyanlarında cereyan eden müzakere neticesinde, en müessir bir tedbir olmak üzre, büyük biraderimiz Emin Bey'in birtakım baldırıçıplak haşerât tarafından darbine karar verilir ve bu karar mahzuziyet-i Şahanenizi mucib olduğu için Osman Paşa'nın rütbesi terfi edilir.

Osman Paşa, her biri bin kere idamını mucib muamelâtıyle bugün ferîk;(6) biraderim Ali Bey, ki her ne vakit devletin başına bir muharebe gailesi çıkmış ise heman nefsini ileri sürmüş, vatan ve milleti uğrunda defaâtla ateşler içine atılmış, düşman kurşunlarının cisminde açtığı müteaddid yaralar vücudunun bir nısfını mahvetmiş bir fedakâr ve gayûr asker olduğu halde, Ebuddalal gibi bir habîsin mel'anetine hâdim olmadığından dolayı, vatanı uğrunda akıttığı kana mukabil kendisine verilmiş olan kaimmakamlık(7) rütbesi dahi bugün elinden alınarak, mahza istid'a-i adalette bulunduğu için, muharebe meydanlarında ağarttığı ak sakalıyle, canîler gibi zindanlarda bulunduruluyor.

Padişahım,

İşte şu mezalime sebeb, Ebuddalal'dan olan havf-ü ihtirazınızdan başka bir şey değildir. Bir hanedan-ı Saltanat içinde perverişyâb-ı kemal olarak, eslâf-ı izamınız Fatih'lerin, Yavuz'ların terkettiği taht-ı âlîde oturdukça, Peygamber'in vekili, imamülmüslimîn bulundukça, Kıbtîyünneseb Ebuddalal'dan bu kadar havf-ü ihtiraz, acaba ne hikmete mübtenîdir!

Sübhane men tehayyere fi sun'ihi'l-ukul!
Sübhane men bi kudretihi ya'cizu'l-fuhul!(8)

Bedirhan Paşazade
Abdurrahman

---

(6) Ferîk: Osmanlılar döneminde, korgeneral rütbesine denk düşen askerî rütbe. Orgenerale de "birinci ferîk" denilirdi.

(7) Kaimmakamlık: 1-İlçenin başındaki yöneticinin memurluğu, görevi. 2- Osmanlı ordusunda yarbaylık rütbesi. Burada kastedilen, bu ikinci anlamdır. O görevde ya da rütbede bulunan kişiye de "kaimmakam" denirdi. Bu sözcükler bugünkü Türkçede "kaymakamlık" ve "kaymakam" biçimine dönüşmüştür.

(8) Arapça olan bu iki satırın Türkçesi şöyledir:
Tanrı ne büyüktür ki, O'nun işinde akıllar şaşkına döndü!
Tanrı ne büyüktür ki, O'nun gücü karşısında en zekiler güçsüz kalır!

Xwedê kitêba xwe de emir kirdiwe: "Mirov çi qas bixebite, hew qas dibîne". Heger un xwe bidin(9) wî emrê Xweda, bê şik un'ê dinê û axretê rihet bikin, un jî alemê de piştrast bibin, halê we jî wê xweş bibit, muhtacê kesê nabin, ji feqîrîyê xilas bibin. Carek fekirin halên xwe û halên Fila. Hun welat û zarûyên xwe dihêlin, zehmetê xurbetê dikêşin, diçin İstanbulê, Şamê, Edeneyê û hê gelek derên dûr. Çiku bêsin'et in, rencberîyê ber destê Fila dikin, li ber emrê wan de xizmetê dikin, File ser we emir dikin. Un Kurd heya merxibê(10) ax û bera(11) dikêşin, xizmeta zehmet un dibînin; roja Fila bîst qumrî ne, roja Kurda heşt qumrî ne.(12) Ev hal ji Kurda re gelek fehêt e.(13)

Elhemdu lîllah aqil û hişê Kurda ji Fila zêdetir e, hun çire ji Fila kêmtir in! Hun çire wek xelqê xweymarîfet nabin! Heger un guhê xwe bidin emrê Xwedê, piçekê xwe bidin zehmetê, betalîyê berdin hun jî xweymarîfet, xweydewlet bibin.

Bi vê cerîdeyê, qasê destê min hat ez'ê ji Kurda re binivîsim. Ez umîd dikim Kurdê me wê paş nuho bielimin sin'et û hunera, da ew jî wek xelqê hemîya dewlemend bibin, her holê jar û feqîr nemînin.

Kurd bi xilqeta(14) xwe mirovên camêr û jêhatî ne. Heger bielimin hunerên vî zemanî ew xwe jî wê rahet bikin, saya wan dewleta Îslamê jî wê xurt bibe. Ji wî rûyî,(15) dinya û axretê serfiraz bibin.(16)

*

Gelî Kurdno! Carekê fekirin halên xwe û halên cîranê xwe Mosqof. Berî hezar sala Kurd çawa bîn, îro dîsa we ne. Lê cîranên we xweymarîfet û sin'et bîne, xweydewlet bîne. Kurd jar û reben mane. Dewletên mezin hemî divên Kurdistanê bidin Ermenîya. Xunkarê me jî qet fenakire Kurda(17) û hema rihetîya xwe digere. Ev mileta Musulmana hemîya maye destê yê dor Xunkar dixapînin. Hemî wî dixapînin. Xasma ku nava wan yek heye, navê wî Ebulhuda ye; ew yekcar neyarê Kurda ye, neyarê mala Bedirxan Begê ye. Ew xwe,

(9) Wisa tê zanîn ku li vir şaşîyeka rêzkirinê heye û awayê rast "guh bidin" e.
(10) Merxib: Dema ku Roj diçe ava. Ev peyvikeka Erebî ye û eslê wê "mexrib" e, ketîye zimanê Kurdî û di Kurdî da guherîye, gerîyaye "merxib"; li hin hêlên Kurdistanê jî bûye "muxrib", li hin hêlan jî wek xwe maye û bi awayê "mexrib" tê karanîn.
(11) Bera: Beran, keviran. Li hin hêlên Kurdistanê ji "kevir" ra tê gotin "ber".
(12) Qumrî: Teyrekî wek kevokê ye, ji kevokê hûrtir e. Wisa tê zanîn ku ev peyvik di dema weşandina rojnama **"Kürdistan"** da wek navê yekîtîyeka diravan jî hatîye karanîn, wek ku "çerxî" navê pênc qurişan bûye.
(13) Fehêt: Fedî, şerm, neng, tiştê ku mirov fedîkar û şermî dike.
(14) Xilqet: Afirandin, awayê afirandinê, xwî.
(15) Ji wî rûyî: Ji wê yekê, ji ber wî semedî, ji rûyê wî semedî.
(16) Yanî "Kurd dê di dinya û axretê da serfiraz bibin".
(17) Fenakire Kurda: Li ser Kurdan nafikire, rewşa Kurdan nade ber çavê xwe, hesaba halê Kudan nake.

eslê wî mitirb e. Ewil soqaqa(18) de mitirbî dikir, heta(19) du-sê pere peyda dikir; nuho nik Xunkar bîye mirovek mezin. Xunkar hejê dike. Xunkar mirovê esîl nabe nik xwe. Çi qasî mirovên se hene, hemî dora wî ne.

De vêca nav vî halî de heger Kurd jî fenekirin xwe, rojekê dewletên dî wê welatê wan ji destê wan bistînin; hemî welatê wan, jin û zarûyên wan wê bikeve destê Fila de. Nuho dewletên mezinên Fila hemî dibêjin "çiku Kurd cahil in, bêmarîfet in, kêmhuner in, heyfa Ermenîya ye binê destê wan de bimînin; loma divê Kurdistan ya Ermenîya bit".

Vêca heger Kurd her holê cahil bimînin, ew'ê rojekê bibit.

Eve çend salek e çiku Ermenî gelek zulmê ji destê me'mûrên dewletê dibînin, exebitin hemî tişta dikin, da xwe ji zulma me'mûran derêxin. Heqê wan heye. Me'mûrên ji İstanbulê tên wan dera, gelek xirabîyê Ermenîya re dikin. Divê Kurd jî Ermenîya nekujin. Xwedê ji vî halî ne razî ye. Ermenî mezlûm e. Vêca, divê mirov pê şîrî(20) neçe ser mezlûma.

Un jî wek wan mezlûm in. Xunkar re behsa zulma mirovên wî jê re binivîsin, edaletê jê bixwazin. Bila me'mûrên qenc ji we re rêket. Herin nik mezinên xwe, ji wan re bêjin bila ew Xunkar re kaxizekî rêke. Heke guh nedan we, dîsa binivîsin. Heger dîsa guh nedan we, bila yek-du serekên we rabit bê İstanbulê, bila erzihalekê(21) bide Xunkar. Ermenî ser qencîya xwe xwe didin kuştin. Un çire xizmetek hinde kiçik(22) nakin! Kurda re ar e binê zulmê de bimînin. Loma, çavên xwe vekin, bixebitin, betalîyê berdin. Hingî mirov bixebite, hew qasî destê mirov dikeve.(23)

"EL-MU'MÎNÛNE ÎXWETUN"

Ev hedîs Pêxember eleyhîsselatu wesselam emir kirîye;(24) ango çi qas Musulman hene, bira ne.

Heçî Musulman e, divê guh bide emrê Xwedê û Pêxember, da dinê û axretê rûsipî bibe. Divê un neyarîya hevdû berdin, wek bira hej nevdû bikin, heta ji destê we têt arî hemî Musulmana bikin.(25) Heçî ji me nesax ket, jar bî, reben bî, em li nav xwe dirava, cila, xwarinê bicivînin bidin wan. Heger em vî emrê Pêxember eda nekin, em jî yek û yek jar bibin, muhtacê neyara bibin, roja qiyametê Pêxember jî ji me re şefaetê naket. Wekî em bêşefaet man, em'ê poşman bibin. Lê ew poşmanî tu ca(26) fêdeyê nadit.

---

(18) Soqaq: Kuçe, kolan. Ev peyvikeka Erebî ye û di Erebî da "zuqaq" e, bi awayê "sikak" jî tê gotin; ji Erebî ketîye zimanê Kurdî jî û di Kurdî da bûye "soqaq".

(19) Peyvika "heta" di eslê nivîsarê da bi şaşî "xena" derketibû. Me awayê wê yê rast "heta" nivîsî.

(20) Pê şîrî: Bi şûr.

(21) Li jêrenota 12'an a jimareya 4'an binêrin.

(22) Li jêrenota 30'yî ya jimareya 4'an binêrin.

(23) Yanî "mirov çi qas bixebite, ew qas bi destê mirov dikeve".

(24) Gerçi nivîskar weha gotîye, lê belê ev parçeya ku li vir kirîye sernivîsar, parçeyek ji ayeteka **Qur'anê** ye, ne ku hedîsa Pêxember e.

(25) Arî hemî Musulmana bikin: Alîkarîya hemî Musulmanan bikin.

(26) Tu ca: Tu car, çu car, qet, ji binî.

Wekî(27) em nuho ve hişê xwe bînin serê xwe, neyarîyê û bêtefaqîyê nekin, wek bira hej hevdû bikin, kes kesê nekujit, kes malê kesê talan neket, agirê fitne û fesadîyê bitemirînin, çi qa Kurmanc hene wê li dinê û axretê raht û serfiraz bibin, qedr û îtîbara wan jî gelek zêde bibit. Wekî Kurda ev hal ji xwe re girt, tu cara feqîr namînin; wê dewlemend bibin, dinya û axreta wan'ê zêdetir mamûr(28) bibe. Fekirin, Îmamê Şafiî ev beytên ha çi qa xweş nivîsîne:

"Le qed tuftu(29) fî şerq'îl-bîladî we xerbîha
we cerrebtu haze'd-dehre bî'l-yusrî we'l-usrî

fe lem ere bade'd-dînî xeyren mîn'el-xina
we lem ere bade'l-kufrî şerren mîn'el feqrî".

Ango ez li hemî memleketa geram, min halê xweş û yê nexweş ceriband; min paş dîn tu tiştek wek dewlemendîyê xweş, û paş kufrê jî tu tiştek wek feqîrîyê nexweş nedît.

Gelî Kurdno! Xwedê û Pêxember û Îmam û mirovên mezin hinde xeberên qenc, rîya rast nîşa me kirdine. Heger un guh bidin wan, aqibeta we wê her qenc bibe.

Ji Enes(30) radîyellahu teala enhu(31) rîwayet bûye ku "el-ulemau umenau'r-rusulî ela îbadîllah, ma lem yuxalitû's-sultan; fe îza feelû zalîke fe qed xanû'r-rusule, fe'hzerûhum we'tezîlûhum". Ango ulema, ser emrê Xwedê teala emînên resûlên Xwedê teala ne; wekî têkilê xunkara bîn, êdî ew dibin xainên rusulê kîram; alimên welê ji cem xwe derêxin û ji wan birevin.

Gelî ulemayên Kurda! Un emînên Pêxembera ne. Loma divê hun çi qas zehmetê bibînin, dîsa we'z û nesîhetê bidin Kurda, rîya qenc nîşanê wan bikin. Qencî û xirabîya Kurmanca, Xwedê teala wê ji we bipirse. Heyfa min têt, ez rastê hin Kurmanca hatime, ayetên nimêjê nizanin; ew guneh stûyê me hemîya ye. Heki li gunda mekteb û medrese û xoce nînin, ji Xunkar re binivîsin, da mekteb û medresa li gunda çêket. Heki me'mûrên hukumetê guh nedan we, ji min re erzihalekê rêkin, ez'ê bigîhînim huzûra Xunkar. Ez we(32) umîd dikim ku wekî ev hal malûmê wî bibe, wê mekteb û medreseyên lazim li Kurdistanê bidit çêkirin.

Hasil,(33) heta un xwey'ilm nebin un tu ca zêde nakin. Pêxember ferman kirdiwe "fedl'ul-alimî ele'l-cahilî ke fedlî ela ednakum". Ango, ez çi qas ji ye-

(27) Wekî: Eger.
(28) Mamûr: Ava, avakirî, çêkirî, gewz, geş.
(29) Ev peyvik di eslê rojnamê da bi şaşî "tufna" hatîye çapkirin. Me li vir ew bi awayê rast "tuftu" nivîsî.
(30) Enes: Yek ji sehabîyên Pêxember e, jê ra tê gotin Enesê kurê Malik.
(31) Radîyellahu teala enhu: Xwedayê gewre jê razî be.
(32) We: Wisa.
(33) Hasil: Ev peyvikeka Erebî ye, dema mirov bi dirêjî qala tiştek bike û paşê bixwaze bi kurtî jî wî tiştî bide zanîn, mirov vê peyvikê bi kar tîne; wek ku mirov dibêje "bi peyva kurt".

kê we yê kêm qenctir im, alimek hew qas ji cahilekî qenctir e. De vêca, rîya tehsîla ilmê de çi lazim be, divê un we bikin, qet nesekinin; heke ne, un'ê rojekê qurbana cahilîya xwe bin.

Arnawud(34) jî weke we bêmekteb û bêmedrese bîn. Eve pêlek e(35) ewan aqilê xwe anî serê xwe, ji Xunkar re nivîsîn, mekteb û medrese dan çêkirin, zarûyên xwe rêdikin mekteba, ilmê tehsîl dikin. Lê ewan heta ew mekteb û medrese dan çêkirin qiyamet rakirin,(36) çi qa zehmet kişandin! Divê un ji zehmetê netirsin. Çiku ez zanim yê dor Xunkar hej Kurda nakin, loma rîya qencîya Kurda de navên tu tişt bên çêkirin. Xunkar jî pê xeberên wan xaina hereket dike. Loma divê un qewî bixebitin, heta un bikaribin welatê xwe î'mar(37) bikin.

Berî çend heyvekê, aylikên(38) xoceyên mektebên Arnawuda nedabîn. Ewan her ji hukumetê xwest. Hukumetê guh neda wan. Wextê Arnawuda dît bi qencî nabe, dest avêtin zorê. Xunkar re nivîsîn: "Heger tu aylikên xoceyên me nedî, çi qas qaimmeqam û muteserrif(39) û mirovên te rêkirî hire(40) hebin, em'ê hemîya ji welatê xwe derînin; heger derneketin, em'ê wan bikujin". Hukumet ji wê xeberê tirsa, zanî hal xirab e, zûka aylik hemî dan.

De vêca Kurdno, divê un jî ho(41) bikin! Heger guh nedan xeberên we, şîrê(42) xwe hilînin, wê guh bidin şîrê we! Mirovên kêm, wek yên dor Xunkar, pê qencîyê nayên rê; lê wekî serê şîr dîtin, zû nerm dibin. Ew mekteb û medreseyên ez dibêjim we, heqê we ye. Un her sal heqê wan didin. Hukumet her sal wan pera ji we distîne.(43) Heger we pere tunebit, perê stûyê jin û zarûyên we dibe û paşê heqê we nade; ango mektebekê, tiştekî welatê we de çênake. Ew pere hemî digîhe sûtarên(44) dor Xunkar, mitirbên weke Ebuddalal. Ev hal Kurda re gelek fehêt e. Ew mektebên ez dibêjim we, heqê we ye. Mirar e,(45) fehêt e heqê xwe nik xelqê bihêlin.

Berî çend salekê, melake Kurd hatibî İstanbulê. Navê wî Mihemed bî. Melake gelek xweyfedl û ilm bî. Nav İstanbulê de melake wek wî tunebî. Ewî melayî erzihalek da Xunkar. Erzihala xwe de ji Xunkar rica kird wî biket xoceyê mekteba Bitlîsê, heyvê çar sed qumrîya bid'ê. Xunkar guh neda erzihala

---

(34) Li jêrenota 45'an a jimareya pêşîn binêrin.
(35) Pêl: Dem, wext.
(36) Di eslê rojnamê da "qiyamet rast kirin" hatîye nivîsîn. Lê, wek ku eşkera ye, ew bi şaşî wisa derketîye. Lewra di zimanê Kurdî da wisa nayê gotin, tê gotin "qiyamet rakirin". Ji ber vê yekê, me awayê rast nivîsî.
(37) Î'mar: Ava.
(38) Aylik: Meaşê ku ji mehê carek tê dayin. Peyvika "aylik" bi Tirkî ye.
(39) Muteserrif: Di dewra Osmanîyan da kargêrekî dewletê bûye, di navbera walî û qaymeqam da cî girtîye.
(40) Hire: Vir, ev der, vê derê.
(41) Ho: Weha.
(42) Şîr: Şûr.
(43) Mexseda wî ew e ku hukumet bêş ji gel distîne.
(44) Sûtar: Qeşmer, mesxere, sextekar, zexel, hîlekar.
(45) Mirar: 1- Heywanê mirî yê neserjêkirî. 2- Tiştê zişt, kirêt, genî, pîs. Li vir mexsed mana 2'yan e.

wî. Mela vegera welatê xwe. Divê Kurd, yên holê wek Arnawuda bi kutekê(46) bikin xoceyên mektebên xwe. Heger we pê rica nekarî çêkin, pê şîrên xwe bidin çêkirin. Divê un hemî hevtefaq(47) bin. Şertê ji hemîya mestir(48) tefaq e. Heta tefaq nav we de heye, neyarên we wê her binê destê we de bin, xelq hemî'yê ji we bitirsin. Heke ne, un'ê her kêmê neyarên xwe bin û un tuca zêde nakin.

GİRÎD

Welatek me heye, gelek xweş e, navê wî Girîd e.(49) Mirovê wî welatî nîvî Musulman, nîvî File ne. Ev welatê ha berî çend salekê yê Fila bî, Musulmana ji destê wan standibî. Eve hew qas sal e destê dewleta me de ye. Lê çiku(50) dewleta me guh neda wê derê, eve sê-çar sal e nav File û Musulmanên wê derê de her şer e. Musulman karin Fila. Lê çi qas dewletên Fila hene, arî Fila dikin; eskerê xwe, top û cebilxaneyê(51) rêdikin wê derê, Musulmana dikujin, arî Fila dikin. Halê Musulmanê Girîdê gelek xirab bî. Dewleta me eskerê xwe rênake wê derê, arî mirovên xwe nake. Musulman gelek jar û reben bîne. Merîyên wan gelek hatin kuştin. Jin û zarûyên wan birîndar bîn, birçî man. Xanîyên wan şewitîn. Malê wan, keçê wan ketin destê Fila de. Jinê wan bêmêr man, xizmetkarîya Fila dikin. Ewan her hawar û gazî kir, esker ji dewleta me xwestin. Dewletê tu arîkarî ji wan re nekir. Êdî ew welatê xweş heçku ji destê me derket. Heyfa min têt jin û zarûyên Musulmana binê şîrê Fila de bên kuştin.

De vêca Kurdno, aqilê xwe bînin serê xwe! Wah, heger we ha ji xwe nebit, heger un şarîya xwe nekin,(52) gelek naçe, rojek'ê ev hal bê serê we jî! De vêca ne heyfa Kurda ye Kurd jin û zarûyên xwe binê destê eskerê Rûsî de bibînin!

---

(46) Bi kutekê: Bi zorê, bi zora çovê, bi hêza xwe. Ev peyv di zimanê Kurdî da îdyomek e. Jêdera vê îdyomê ev e: Li hin hêlên Kurdistanê ji "lêdan"ê ra tê gotin "kutan". Mesela tê gotin "Memo Çeko dikute", yanî "Memo li Çeko dide". Wek ku ji aletê "birrîn"ê ra tê gotin "birrek", çova ku aletê "lêdan" û "kutan"ê ye ew jî dibe "kutek". Xanî jî di "**Mem û Zîn**"ê da peyvika "kutek" bi kar anîye û gotîye "ya dê bi kutek Memê xwe berdîn".

(47) Hevtefaq: Hevgirtî, yekbûyî, pêkve. Ev peyvik di eslê rojnamê da "hertefaq" bû. Lê belê, wek ku dixuye, bi şaşî wisa derketîye. Me li vir ew bi awayê rast "hevtefaq" nivîsî. Yanî "kesên ku digel hev tefaq çêdikin, tefaqa xwe dikin yek".

(48) Mestir: Mezintir. Ev peyvik di eslê rojnamê da bi awayê "meztir" derketibû. Lê belê ew awa şaş e. Lewra peyvika 'mezintir" li hin hêlên Kurdistanê tê kurtkirin, tîpên "i" û "n" jê tên avêtin, tîpa "z" jî bi te'sîra "t"yê tê dijwarkirin û werdigere dibe "s"; bi wî awayî peyvika kurtkirî dibe "mestir". Ji ber vî semedî, me li vir peyvik bi awayê rast "mestir" nivîsî. Divê ku peyvik yan temam bi awayê "mezintir", yan jî ku bê kurtkirin bi awayê "mestir" bê nivîsîn.

(49) Ji ber ku Kurdistan jî di nava sînorên dewleta Osmanî da bûye, nivîskar jibo Girîdê gotîye "welatek me", yanî "yek ji welatên Osmanîyan".

(50) Çiku: Çima ku, çi ye ku, ji ber ku.

(51) Cebilxane: Maddeyên teqînê yên ku bi çekên agirî tên avêtin, wek fişek û gule û bombayan.

(52) Wisa tê zanîn ku mana vê peyvê ev e: "Eger hun xwe şîyar nekin".

Mosqof devê xwe we re vekirîye, wê rojekê bê welatê we bistîne! Heger Mosqof esker rêkir ser we, dewlet esker rênake arî we!(53) Eskerê Mosqof ji we gelektir e, top û tifingên destê wan heyî destê we nîne! Heta we tifingek vala kir, eskereke wî kare bîsta vala bike! De vêca heta we yek ji wan kuşt, ew'ê bîsta ji we bikuje! Ez zanim Kurd gelek ji Mosqof mêrtir in! Lê ber wan top û tifinga, mêranîya we'yê gelek kêm bimîne!

Divê van halên ha mîr û axayên Kurda bêjin yên binê destê xwe. Ev deyn li ser mezina ye. Heger xirabîyek bibe, ya ji hemîya mestir mezina dibe.(54) Weke dî, mirovên mezin halên holê çêtir dizanin, çêtir dikarin. Loma her divê ew ji hemîya zêdetir bixebitin. Bila nebêjin "umrê min nema". Çiku(55) heger xirabî nehat serê wî, wê paş çend salekê bê serê jin û zarûyên wî. Mirovê xîret divê mulaheza jin û zarûyên xwe bike, û ev ser wan deyn e. Gunehê kiçika ser babê wan e. Paşê Xwedê teala gunehê wan zarûya, wan jin û keçikên reben ji bab û bapîrê wan bipirse. Paşê ew nikarin xwe ji ezabê wan xilas bikin.

(53) Arî we: Alîyê we, alîkarîya we.

(54) Yanî "xirabîya ji hemîyan mestir, bi kesên mezin û pêşketî dibe, xirabîya mezintirîn tê serê kesên malmezin û berçav û seremêr".

(55) Çiku: Lewra. Ev peyvika "çiku" ji "çunkî" ya Farisî hatîye kurtkirin û ketîye zimanê Kurdî. Lê belê, çêtir ew e ku mirov peyvika "lewra" ya Kurdî bi kar bîne.

www.netewe.com

ÎŞ'ARA MEDÎHETA TEWAİFÊD KURDAN E Bİ ŞECAET Û XÎRETÊ ÎZHARA BEDBEXTÎ Û BÊTALİÎYA WAN E DİGEL HİNDE SEMAHET Û HEMÎYETÊ(56)

Saqî, tu jibo Xwedê kerem ke
yek cur'eê mey di camê Cem ke

Da cam-i bi mey cîhannuma bit
herçî me îrade ye xuya bit

da keşf-i bibit li ber me ehwal
kanê dibitin muyesser îqbal

Îdbarê me wa gîha kemalê
Aya bûye qabilê zewalê

ya her wehe dê li îstîwa bit
hetta we ku dewrê munteha bit?

Qet mumkin e ev ji çerxê lewleb
tali' bibitin jibo me kewkeb?

Metbea "Cem'îyeta Tefaq û Qencîya Musulmana" tebi' bîye

---

(56) Ev, sernivîsara beşek ji beşên **"Mem û Zîn"**ê ye. Hem ev sernivîsar, hem jî ev çend malikên ku li vir di binê wê da hatine çapkirin, di jimareya 8'an a hatî da digel beşekî temam derketine. Em'ê mana vê sernivîsarê û van malikan li wir bi jêrenotan bidin zanîn. Ji ber wê yekê, û jibo ku tekrar çênebe, em mana sernivîsarê û malikan li vir nanivîsin.

www.notewe.com

7'NCİ SAYININ ÇEVİRİLERİ

SULTAN İKİNCİ ABDÜLHAMİD HAN HAZRETLERİNE DİLEKÇEMDİR

Padişahım,

Siz Padişahlarının zatını daima kandırıp yanıltmaya çalışmak isteyen Ebülhüda gibi bir zalimin zulüm ve sapkınlığının oyuncağı olmaktan ve bu duruma tahammül edememekten dolayı İstanbul'u terkedip eski barınakları ve asıl vatanları olan Kürdistan'a gitmek isteyen beş kardeşimi katiller gibi tutuklayıp Taşkışla'da(57) hapsettiğiniz ve işkence altında bulundurduğunuz konusunda, yabancı basın ve siyasal çevreler gibi güvenilir kaynaklardan öğrendim. Aldığım haberler, kardeşlerimin uğradıkları felâket için değil, ancak adaletten başka bir şey beklenilmeyen Halifelik Makamının Avrupa'ya karşı işlediği bu kanunsuz işlemden dolayı ben kullarının yüreğini kanattı.

Öteden beri millet uğrunda mal ve canlarını feda etmeye hazır olduklarını birçok örnekle fiilen kanıtlamış olan eski bir soylu ailenin önde gelenlerinin, her türlü üstün niteliklerden yoksun olan ve bin türlü iğrençlikleriyle kamuoyunun öfke ve nefretini kazanmış bulunan Çingene soylu Ebuddalal'ın(58) keyfine kurban edilmeleri, acaba hangi adalet ve hikmete uygun düşer?

Kardeşlerimin bu şekilde işkence altında bulundurulmaları, eğer beni İstanbul'a getirtmek ve düşüncelerimden, kararlılığımdan vazgeçirmek amacına yönelik ise, Tanrı'ya andiçerim ki bu önlem, kararlılığımı ve direncimi güçlendirmekten başka bir şeye hizmet etmez.

"Aslana darbeler indikçe, pençesi şiddetlenir".

Padişahım,

Osmanlı Sultanlığı soylu ailesinin önde gelenlerinden biri olduğunuz halde, şu gerçeği anlamak yeteneğine acaba niçin sahip değilsiniz?:

Bu gibi önlemler, kendinize baş tacı yaptığınız Çingene Ebülhüda gibi korkak yürekli olanlara etki yaparsa da, cennetlik babanız Abdülmecid ile savaşmış olan bir kahramanın(59) oğluna hiç bir zaman etki yapamaz. Ebuddalal'ın kötülüklerine ve lânet olası işlerine hizmet ettiği için Osman Paşa bin türlü kötülükler yapar; buna karşılık kendisine iyilikler yapılır ve ödül olarak rütbeler, nişanlar verilir.

Birçok namuslu kişi, genç ve güzel oğlunu Ebuddalal'a peşkeş çekmemiş ve böylece Ebuddalal'ın duygusal isteklerine hizmet etmemiştir diye İstan-

(57) Bu sayıdaki 2 numaralı dipnota bakınız.
(58) 6. sayıdaki 5 numaralı dipnota bakınız.
(59) Bu sayıdaki 4 numaralı dipnota bakınız.

bul sokaklarında Osman Paşa ve yardakçıları olan birtakım haşereler(60) tarafından dövülürler. Adı geçen Paşa hakkında yüce hükümetinizce soruşturma açılması şöyle dursun, bizzat siz Padişahları tarafından değilse de efendisi bulunan Ebuddalal tarafından kendisine iyilik olsun diye birkaç bahşiş verilir.

Yakalanmış olduğu ağır bir hastalığın tedavisi amacıyle Mısır'a gitmiş olan kardeşimin(61) İstanbul'a döndürülmesi için Ebuddalal'ın kışkırtmasıyle çıkan siz Hilâfetpenahî(62) Hazretlerinin merhametliliği gelenekleşmiş olan şerefli iradeleri(63) üzerine, Halifelik Makamı Başkâtipliği odasında bir görüşme yapılmıştır. Başkâtip Tahsin Bey, siz Padişahlarının yaverlerinden "Kabasakal" denilmekle tanınan Mehmed Paşa ve yine şerefli ferîklerinizden(64) Ferîk Osman Paşa arasında yapılan görüşme sonucunda, en etkili bir önlem olmak üzere, büyük biraderimiz Emin Bey'in birtakım baldırıçıplak haşereler tarafından dövülmesine karar verilmiştir. Ve bu karar siz Padişahlarının hoşnut olmasına neden olduğu için, Osman Paşa'nın rütbesi terfi ettirilmiştir.

Osman Paşa her biri bin kez idam edilmesini gerektiren davranışlarıyle bugün ferîktir. Kardeşim Ali Bey ise, her ne zaman devletin başına bir savaş derdi çıkmışsa hemen kendini öne atmış, vatanı ve milleti uğrunda birçok kez ateşler içine atılmış, düşman kurşunlarının bedeninde açtığı birçok yara vücudunun yarısını yok etmiş bir fedakâr ve gayretli asker olduğu halde, Ebuddalal gibi bir habîsin(65) mel'anetine hizmet etmediğinden dolayı, vatanı uğrunda akıttığı kana karşılık kendisine verilmiş olan yarbaylık rütbesi dahi bugün elinden alınıyor; sadece adalet isteminde bulunduğu için, savaş alanlarında ağarttığı ak sakalıyle katiller gibi zindanlarda bulunduruluyor.

Padişahım,

İşte bu zulümlerin nedeni, Ebuddalal'dan olan korkunuzdan ve çekingenliğinizden başka bir şey değildir. Bir Sultanlık soylu ailesi içinde yetiştirilip olgunluğa eriştirilerek, ulu geçmişleriniz olan Fatih'lerden, Yavuz'lardan kalma yüce tahtta oturdukça, Peygamber'in vekili ve Müslümanların önderi bulundukça, Çingene soylu Ebuddalal'dan bu denli korkmak ve çekinmek acaba hangi gizli nedene dayanır!

Tanrı ne büyüktür ki, O'nun işinde akıllar şaşkına döndü!
Tanrı ne büyüktür ki, O'nun gücü karşısında en zekiler güçsüz kalır!

Bedirhan Paşazade
Abdurrahman

---

(60) 6. sayıdaki 8 numaralı dipnota bakınız.
(61) Mikdad Midhat Bedirhan'ı kasdediyor.
(62) 6. sayıdaki 174 numaralı dipnota bakınız.
(63) 5. sayıdaki 82 numaralı dipnota bakınız.
(64) Osmanlı ordusunda korgeneral rütbesine denk düşen "ferîk" sözcüğü, o dönemde yerleşmiş bir askerî terim olduğu için, çeviride aynen kullanıldı.
(65) 6. sayıdaki 179 numaralı dipnota bakınız.

Eded 8 Sala ewwulî Rûper 1

Heçî vê kaxidekî rêke ji min re, divê ser kaxizî weha binivîse: "Bî Genève necl'ul-merhûm Bedirxan Paşa Ebdurrehman Beg"

*

Her car du hezar cerîdeya ez'ê rêkim Kurdistanê, de belaş bidin xelkê

KURDİSTAN

1315

Pazde roja de carekê têt nivîsandin cerîdeya Kurdî ye

Kürdleri tahsil-i ulûm ve fünûna teşvik eder nasayih ve edebiyat-ı Kürdiyeyi hâvî on beş günde bir neşrolunur Kürdçe gazetedir

Gazetenin mesleğine muvafık Arabça, Türkçe, Farisîce mektublar Kürdçeye bittercüme neşrolunur

Unvan: Genève'de "Kürdistan" Gazetesi Sahib ve Muharriri Bedirhan Paşazade Abdurrahman

*

Her tabı'da 2000 nüsha Kürdistan vülât-ı izamına irsal ve vesatetleriyle kura ve kasabâta neşr-ü tamim olunacaktır

*

Kürdistan haricinde her yer için senelik abone bedeli 80 kuruştur Kürdistan dahilinde hususî isteyenlere meccanen gönderilir

Roja duşembê de 5 Receb 1316 * Salı fi 18 Teşrin-i Sanî sene 1314(1)

BÎSMÎLLAHÎRREHMANÎRREHÎM

HEL YESTEWÎ'LLEZÎNE YE'LEMÛNE WE'LLEZÎNE LA YE'LEMÛNE(2)

Gelî Kurdno! Xwedê teala kitêba xwe de ferman kirîye "qet alim û cahil wek hev dibin!" Ango tu cara, tu cîya(3) cahilek nabe wek alimekî. Ji vê îrada Xwedê divê un bizanibin ku tu cara merteba alim û cahila ne wek hev e. Hemî

(1) Li gora tarîxa Mîladî 1 Kanûna Pêşîn 1898(Milâdî tarihe göre 1 Aralık 1898; bu sayıda da "pazartesi" yerine "salı" yazılmıştır; oysa Kürdçe "duşemb", salı değil de pazartesidir ve bu nedenle Türkçesinde 'pazartesi" yazılması gerekirdi).

(2) Ev sernivîsar parçeyek ji ayeteka **Qur'anê** ye, mana wê weha ye: "Ma kesên zana û kesên nezan wek hev in!"

(3) Tu cîya: Li tu cîyan, li çu cîyan, li çu deveran.

dera, dinyayê, axretê serbilind in.(4) Xwedê hej alima dike, Xwedê hej cahila nake. Alim zane Xwedê çi emir kirîye, çi nehî(5) kirîye. Cahil wan tişta nizanin. Cahil tiştekî dike, nizane ew tişt Xwedê emir kirîye an nehî kirîye. Cahil gelek cara xirabîyeke mezin dike, nizane ew xirabî Xwedê nehî kirîye. Lakîn alim zane qencî û xirabî çawa ne, çi tişt e; loma ji binê emr û nehya Xwedê dernakeve, loma cem Xwedê teala xweyqedr û îtîbar e, loma merteba wî bilind e. Alim, çawa Xwedê teala ser ebdên xwe ferz û îrade kirîye, welê emel dikin. Lakîn alim heger pê ilmê xwe emel neket, ew jî wek cahilekî bêqedr û îtîbar dimîne, tu qîmeta ilmê wî namîne. Loma, divê alim hemî pê ilmê xwe emel bikin; ango alim hemî behsa qencîya ilmê ji cahila re bêjin, divê wan bielimînin ilmê, divê fêda alima ji cahila re bibe. Wê hingê alim xweyqedr û îtîbar dibe, wê hingê alim xweyîyê medha Xwedê û Pêxember dibe.

Gelî ulemayên Kurda! Divê un her bixebitin ji ilmê xwe cahila jî xweypar bikin. Gunehê cahila ser we ye.

*

Gelî mîr û axayên Kurda! Divê un jî arî alimên xwe bikin, ew muhtacê çi bin divê un ji wan re peyda bikin, un jî pê qeweta perê xwe arî alima bikin. Wê hingê un hemî dinê û axretê rihet bikin, wê hingê Kurd jî karin rojekê xweydewlet, xweyhîkmet û marîfet bibin. Heger ne, welatê we'yê rojekê ji destê we derkeve, un'ê bibin xulamê neyarên xwe. Xunkar ha(6) ji halê we nîne, yê dor wî jî hej Kurda nakin. De vêca heger un mîr û axa guh nedin kiçikên xwe,(7) xanîyê we jî destê we derkeve. Qeweta we, pê yên binê destê we de ye;(8) heger ew tunebin, destê we de tu qewet namîne. Loma, divê un jî qedrê wan bizanin, qenc fekirin wan. Hingî ew sahibmezîyet(9) bibin, hew qas un jî xweyqewet, sahibîtîbar bibin.

Divê un gelek qedrê ulemayên xwe bigirin. Tu tişt, tu kes weke alimê qenc nik Xwedê qedir(10) nîne. Pêxember ferman kirîye: "Ulemau ummetî ke enbîyaî benî Îsraîl".(11) Xwedê teala kitêba xwe de ferman kirîye: "We yerfeullahu'llezîne amenû mînkum ve ulu'l-ilmî derecatîn".(12)

---

(4) Yanî kesên alim, kesên zana serbilind in.

(5) Nehî: Qedexekirina dînî ya di heqê hin kar û tevgeran da. Ev, peyvikeka Erebî ye û di Erebî da bi awayê "nehy" tê nivîsîn. Lê belê di Kurdî da xwendina bi wî awayî bêmikûn e. Ji ber wê yekê, me ew bi awayê "nehî" nivîsî.

(6) Ha: Hay.

(7) Kiçikên xwe: Biçûkên xwe, kesên binê destê xwe.

(8) Yanî "qeweta we bi kesên binê destê we ye, hêza we bi wan kesan e ku di binê destê we da ne, hun bi kesên binê destê xwe hêzdar in".

(9) Sahibmezîyet: Xwedîyê serbilindîyê, xwedîyê serfirazîyê, xwedîyê rewşa ku mirov serbilind dike.

(10) Qedir: Awayê rast "biqedir" e, yanî "xwedîqedir".

(11) Mana vê hedîsa Pêxember weha ye: "Alimên ummeta min wek pêxemberên kurên Îsraîl in, zanayên ummeta min wek pêxemberên zarûkên Îsraîl in".

(12) Ev parçeyek ji ayeteka **Qur'anê ye**, mana wê weha ye: "Ji we kesên ku îman anîne, Xwedê wan bilind dike û kesên xwedîilm çend derece bilind dike".

Gelî Kurdno! Ji wan emrên Xwedê û Pêxember aqilê xwe bînin serê xwe, ha ji xwe hebin, xwe ji cahilîyê xilas bikin, un jî wek miletên dî tehsîla ilm û marîfetê bikin, da un xweyîyê mal û zarûyên xwe bin; heger ne, un'ê rojekê jar û feqîr bibin. Rîya tehsîla ilmê de bêxîretîyê nekin, qenc bixebitin. Un'ê pê ilmê axreta xwe jî mamûr bikin.

Şerê Ermenîya û Kurda de ez zanim Kurda gelek Ermenîyên bêguneh kuştin. Xwedê ji wî halî ne razî ye. Kurdan ew guneh ji cahilîya xwe kir. Ewan nedizanî kuştina Ermenîya wek kuştina Musulmana ye. Parek wî gunehî jî ser alimên Kurda ye. Divê alim tişta qenc û neqenc nîşa cahila bikin, da ew jî mirovên bêguneh nekujin. Heger ne hew qas cahil bîna, hew qas mirovên bêguneh destê Kurda de nedihatin kuştin. Heger alim pê ilmê xwe cahila ji xirabîyê xilas bike, Xwedê ji wî alimî razî dibe.

Xwedê teala kitêba xwe de ferman kirîye: "Înnema yexşellahe mîn îbadîhî'l-ulemau"; ango mirovên xwey'ilm ji Xwedê teala ditirsin. Erê, mirovê dînê xwe nezanîye, ji Xwedê teala jî natirse; ferqa wî û heywanekî namîne.

Divê un nebêjin ew kiçik e, ew mezin e, ew dewlemend e, ew feqîr e; un hemî jî muhtacê ilmê ne. Çiku Pêxember ferman kirîye: "Telebu'l-ilmî ferîzetun ela kullî Muslîmîn ve Muslîmetîn".(13) Loma, qet nebe divê un şertê Musulmanîyê nîşanê jina jî bikin.

Bila kes nebêjit ez pîr im an ez kiçik im, ji min re ilim ne lazim e. Hemî dera, hemî sala de divê mirov tehsîla ilmê re bixebite. Çiku Pêxember ferman kirîye: "Utlubu'l-ilme mîn'el-mehdî île'l-lehdî"; ango ji matikê heta tirbê(14) ilmê bixwazin.

De vêca gelî Kurdno! Derheqa ilmê de hew qas fermanên Xwedê teala û emrên Pêxember hene. Heger un guh bidin wan emr û fermana, dinê û axretê un'ê piştrast bin; heger ne, un'ê axretê xesar bikin.

WE MEN LEM YEHKUM BÎ MA ENZELELLAHU FE ULAÎKE HUM'UL-FASÎQÛN(15)

Gelî ulemayên Kurda! Ev emrê ha ji hemî ulema re ye. Wekî(16) we dît welatê we de me'mûrên hukumetê ji vî emrî cuda dibin, divê un wan bînin ser rîya qenc. Heger guh nedan we, divê un nik mezinê wan şikat(17) bikin. Heger ewan jî guh neda we, divê un nik Xunkar şikat bikin, ji Xunkar re binivîsin,

---

(13) Mana vê hedîsa Pêxember weha ye: "Gera li zanînê li ser her mêrekî Musulman û li ser her jineka Musulman ferz e, li ser her mêrekî Musulman û li ser her jineka Musulman ferz e ku li ilmê bigerin".

(14) Ji matikê heta tirbê: Ji dergûşanê heta gorê. Yanî ji zarûkîyê heta mirinê.

(15) Ev parçeyek ji ayeteka **Qur'anê** ye, mana wê weha ye: "Ew tiştê ku Xwedê daxistîye, kesên ku bi wî hukum nekin, ew avarê ne".

(16) Wekî: Eger.

(17) Şikat: Gilî. Ev peyvikeka Erebî ye û eslê wê "şîkayet" e, lê di zimanê Kurdî da guherîye û gerîyaye "şikat", li hin hêlên Kurdistanê wek eslê wê bi awayê "şîkayet" jî tê gotin.

bêjin'ê "mirovên te welatê me de neheqîyê dikin". Xunkar'ê wan ezil bike.(18) heger nekir, jê re dîsa binivîsin, bixebitin heta un wan bînin ser rê. Ev deyn jî ser ulema û ser mîr û axayên Kurda ye. Mirovên binê destê we nezan in, nekar in,(19) jar in, reben in; muhafeza wan li ser we ye. Divê we ha ji wan hebit. Heger un wan muhafeze bikin, Xwedê jî we muhafeze bike; heke ne, Xwedê ji we razî nabe. Un'ê dinê û axir serfiraz bin; heger ne, wê bibe sebeba helaka we. Çiku un zanin, Xwedê ferman kirîye: "Înnellezîne yektumûne ma enzelna mîn'el-beyyinatî we'l-huda mîn ba'dî ma beyyennahu lî'n-nasî fî'l-kîtabî, ulaîke yel'enuhumullahu we yel'enuhum'ul-laînûn".(20)

*

Gelî ulemayên Kurda! Un qenc dizanin ku ev hukumet, çiku hukumeta Musulmana ye, divê tu car ji ehkamê Şer'a şerîf cuda nebit. Muhafeza Şer'a şerîf jî, ser yê dizanin, ango ser ulemaya deyn e. Lakîn heyfa min ew e, bîst sal e ke ev hukumeta me yekcar ji rê derketîye; me'mûrên hukumetê ha ji heq û edaletê nemane, hema fedikirin fêda xwe; yekê bêguneh digirin davêjin hebsê de, da pera ji wî bistînin. Şikata vî halî ser mezina ye. Divê ulema, me'mûrên welê xain bînin ser rê. Heger ne, un gunehê Xwedê û Pêxember xilas nabin. Neheqîya me'mûrên hukumetê, li we dikeve we ha jê hebe.(21) Un nikarin bêjin em nizanin. Çiku we xwendîye. Mueyyen(22) un dizanin ku ev walî, ev muteserrif, ev qaimmeqam û me'mûrên dî hemî zalim in. Mana we(23) ya binê zulma wan de, ji we re fehêt û guneh e. Meazellah, ev hal dewam bike, ev mileta Îslamê hemî'yê mehû bibe.

Loma, bes bisekinin. Dengê xwe hilînin,(24) hawar bikin, ji Xunkar edaletê bixwazin. Hezretê Umer, radîyellahu enhu(25) îrade kirîye: "Rehîmellahu îmruen ehda îleyye uyûbî".(26) Loma, çi eyba we li hukumetê dît, bêjin Xunkar. Me'mûrên zalim ji bajarên xwe derêxin, yê edil bixwazin.

Heyfa min têt, ez dibihîzim ku mîr û axayên Kurda, şûna wan me'mûrên zalim bîl'îttîfaq(27) ji welatê xwe derînin, bîl'ekis(28) ew jî dibin hevalê wan,

---

(18) Ezil bike: Ji kar derxe, dûwayî li karê wan bîne, karê wan ji destê wan bistîne.
(19) Nekar: Kesê ku nikare tiştek bike, kesê ku neşê tiştek bike, kesê neşîn, kesê netuwan, kesê bêtawan, kesê ku ji heqê tiştek dernakeve.
(20) Ev ayeteka **Qur'anê** ye, mana wê weha ye: "Ji delîlan û nîşanên rîya rast ew tiştê ku me daxist, piştê ku me ew di pirtûkê da ji mirovan ra zelal kir, kesên ku wî tiştî veşêrin, Xwedê lanet li wan tîne, kesên lanetxwaz jî lanet li wan tînin".
(21) Li we dikeve we ha jê hebe: Li we lazim e ku haya we jê hebe, li ser we wezîfe ye û pê wîst e ku hun jê haydar bin, li ser we berpirsyarî ye ku haya we jê hebe.
(22) Mueyyen: Hemin, bê guman, muheqqeq, mutleqa.
(23) Mana we: Mayina we, ku hun bimînin.
(24) Hilînin: Bilind bikin.
(25) Radîyellahu enhu: Xwedê jê razî be.
(26) Mana vê peyva Hezretê Umer weha ye: "Xwedê rehma xwe li wî kesî bike ku eyb û qusûrên min nîşanê min bide".
(27) Bîl'îttîfaq: Pêkve, bi tevayî, bi hev ra.
(28) Bîl'ekis:Çewtê vê yekê, bi çewtî.

dibin aletê fesada(29) wan; ser nîşanekê, ser rutbekê xizmeta wan me'mûrên minafiq dikin. Pê vî halî mala xwe xirab dikin, nik Xwedê rûreş dibin. Çiku Pêxember emir kirîye:(30)

De vêca heyfa min têt, ew Kurdên ciwanmêr casûsîya wan sûtarên me'mûra dikin, wan zalima re xizmeta minafiqîyê dikin.

Gelî ulemano! Un emrên Xwedê û Pêxembera wan cahila re bêjin. Ew ketine derdê dinê de; çavê wan nabîne, guhê wan nabihîze. Ew tişta ew umîd dikin ku dewlet e,(31) ji wan re eynê bela ye. Mezinayî ne pê rutba û nîşana ye. Pêxember eleyhîsselam ferman kirîye: "Seyyid'ul-qewmî xadimuhum"; ango heçîyê gelek xizmet ji mileta xwe re kir, ew mirov nav mileta xwe de ji hemîya qedirtir e.(32) De vêca bîl'ekis heçîyê xirabî mileta xwe re kir, ji hemîya kiçiktir e û dinê û axretê rûreş e. Şivanek qenc ji mîreke mufsid gelek bilind e.(33) Şivanê qenc fedikire pezê xwe, gelek ji mîr û axayê fenakire mirovên binê destê xwe qenctir e. De vêca yê fisq(34) û xeybeta(35) hevalên xwe dike, ji seyî jî kêmtir e.

(29) Fesad: Xirabî, bêrêtî.
(30) Hin cîyên vê hedîsê di eslê rojnamê da xira bûne, nehatin xwendin.
(31) Mexsed ji peyvika "dewlet" li vir, mal û malhebûn û pêşketina abûrî û dewlemendî ye, ku bi nêzîkayîya kargêrên dewletê tên peydakirin.
(32) Qedirtir e: Biqedirtir e, zêdetir xwedîqedr e.
(33) Bilind e: Awayê rast, "bilintir e" ye.
(34) Fisq: Xirabî, avarêtî, gunehkarî.
(35) Xeybet: Peyivîna li dijê mirovan li pey wan, ku kesek li pey mirovan di heqê wan da û li dijê wan bipeyive.

www.netewe.com

KAXİZEKE EREBÎ YE, JÎ ULEMAYÊN MARDÎNÊ ALİMEK XWEYFEDL Û KEREM RÊKİRÎYE(36)

Hezretê Serkarê Rojnameya **"Kürdistan"**,

Ew rojnameya we ya berçav a bi navê **"Kürdistan"** ku hun li bajarê Cenewreyê bi zimanê Kurdî derdixin û jibo derxistina wê we gelek hîmmet xerc kirîye, gîha destê min û min rûpelên wê di çavê xwe ra derbas kirin. Min dît ku ez çi bibînim! Rûpelên wê bi şîretên rast ên di cîyên xwe da û bi nivîsarên mefadar(37) dagirtî ne. Amanca wan şîret û nîvîsaran ew e ku neteweyên Kurd(38) bihewisînin(39) gera li zanînê û fêrbûnê; wan ji xelmaşîya(40) xeflet û bêkarîyê hişyar bikin; fikrên wan ên ku pêtîyên zeka û jîrîtîyê ji wan radibin, ronî û zelal bikin; hîmmet û xîreta wan a ku hemî tiştên zor li ber wê hêsan dibin û hemî stû li ber wê ditewin, têxin kar û xebatê.

Ez bi umrê xwe sond dixum ku,(41) ev rojname wisa qenc e ku hêja ye qala wê bê kirin û jibo wê sipas bê kirin.

Neteweyên Kurd, ku jimara nufûsa wan ji milyonan derbas dibe, bi fêrisî û mêrxasîya xwe, bi jîrîtî û serbilindîya xwe hatine naskirin. Ji nava wan hin mîr û sultan, fermandar û hukumdar, zanyar û welîyên wisa derketine ku, nav û dengê wan li asûyan(42) belav bûye, bi qala serhatîyên wan pel û rûpel hatine dagirtin. Li ser vê yekê şahidê mezintirîn dîrok e.

Di posta hatî da em'ê ji we ra nivîsarek bişînin. Ew nivîsar dê dûr û dirêj rewşa welatê Kurdistanê û gelê wê, tiştek ji kar û barên wê yên sîyasî û edebî û cografî, hinek ji bûyerên wê yên dîrokî, serhatî û qencîyên hin mîr û sultan û fermandar û qencên wê pêkbîne û bide zanîn.

Em'ê nuha bi vî qasî bes bikin. Xwedê xebata we bişikirîne û ji ber xebata we xêr bide we. Digel rehmet û bereketa Xwedê, silav li we be.

Xizmetkarê İlmê Şerîf
Elî Kurê Husyenê Amedî

---

(36) Ev name bi zimanê Erebî di rojnamê da hatîye çapkirin. Me ew wergerand zimanê Kurdî û wergerana wê ya Kurdî li vir weşand.

(37) Mefadar: Bifêde, tiştê ku fêde dide mirov.

(38) Neteweyên Kurd: Me ev her du peyvik di şûna peyvikên "el-umem'ul-Kurdîyye" yên Erebî da bi kar anîn. Peyvika "umem" a Erebî piranîya "ummet" e, ew jî bi mana "netewe" ye. Li gora vê yekê, divîya ku nivîskarê vê nameyê bigota "el-ummet'ul-Kurdîyye", yanî "neteweyê Kurd". Lewra neteweyê Kurd yek e, ne çend in. Belkî mexseda wî eşîrên Kurdan bûye.

(39) Bihewisînin: Hewes ji wan ra çêkin, hewes bidin wan, wan teşwîq bikin û berê wan bidin zanînê û fêrbûnê.

(40) Xelmaşî: Rewşa navbera xewê û hişyarîyê, ku mirov ne tam di xew da be û ne tam hişyar be.

(41) Ez bi umrê xwe sond dixum: Ev peyv îdyomeka Erebî ye. Wek ku mirov di Kurdî da ji kesek ra dibêje "bi serê te", di Erebî da jî adet e ku mirov bi umrê xwe sond bixwe.

(42) Asû: Cîyê ku mirov dibêje qey li wir erd û asîman yan jî derya û asîman gîhane hev, ufuq.

Ez zanim Kurd ji tarîxa Kurdistanê tu tiştî nizanin. Loma ez'ê her cerîda xwe de, kurt piçek tarîxa Kurdistanê û ya ecdadên Ezîzan(43) binivîsim.

BÎSMÎLLAHÎRREHMANÎRREHÎM

HUKKAMÊN CEZÎRETU ÎBNÎ UMER(44)

Cizîr, navê wê "Cezîretu îbnî Umer" e.(45) Ev bajar, du sed sal paş Pêxember eleyhîsselam pê hîmmeta Ebdulezîz bîn Umer El-Berqemîdî(46) hat bînakirin. Sala şeş sed û heştêyan de Mîr Silêman dora Cizîrê de hukumeta xwe danî. Mîr Silêman Kurd bî. Ew Mîr Silêman, rehîmehullah,(47) ceddê Bedirxan Begê û hemî umerayên Kurdistanê ye.(48)

MÎR SİLÊMAN BÎN XALİD(49)

Alimek xweyfedil, navê wî Şeref bîn Şemsedîn, tarîxa xwe ya Kurdistanê(50) de nivîsîye ku Mîr Silêman ji sulala Xalid bin'il-Welîd e, ji eşîra Buxtana(51) ye. Paş te'sîsa(52) dewleta xwe heta wefat kir, pê îstîqlala hukumeta xwe meşxûl bû.

MÎR EBDULEZÎZ

Mîr Ebdulezîz, lawê Mîr Silêman bîn Xalid e. Paş wefata babê xwe, hukumeta Cizîrê gîha wî. Mîr Ebdulezîz, Gurkil û bajarên dor'ê da birayê xwe Emîr Hacî(53) û kela Finikê û bajarên dor'ê da birayê xwe Mîr Ebdal. Sulaleyên ji

---

(43) Ezîzan: Malbata mîrên Botan.
(44) Hukkamên Cezîretu îbnî Umer: Hukumdarên Cizîra kurê Umer.
(45) Ev nav ji alîyê Ereban ve li Cizîrê hatîye danîn. Di nava Kurdan da navê wê "Cizîra Botan" e.
(46) Wisa tê zanîn ku ev nav li vir bi şaşî weha hatîye nivîsîn. Lewra di pirtûka dîroka Kurdan **"Şerefname"** da hatîye nivîsîn ku avakarê keleya Cizîrê Umerê kurê Ebdulezîzê Emewî ye (**Şerefname,** wergerana wê ya Erebî, cild I, rûpel 111, Qahîre-1958).
(47) Rehîmehullah: Xwedê rehma xwe lê ke.
(48) Umerayên Kurdistanê: Mîrên Kurdistanê.
(49) Bîn Xalid: Kurê Xalid.
(50) Navê vê pirtûka tarîxê **"Şerefname"** ye, nivîsîna wê di sala 1597'an da temam bûye. Nivîskarê wê Şeref Xanê Bedlîsî ye.
(51) Buxtana: Botan.
(52) Te'sîs: Sazkirin, damezirandin.
(53) Navê wî bi temamî Hacî Bedir e.

wan her du bira zêde bîn, hakimîya bajarên binê destê xwe de kirin. Mîr Ebdulezîz eyamekê Cizîrê hakimî kir, paşê wefat kir. Du law jê man. Navê wan Emîr Seyfedîn û Emîr Mecdudîn bî. Ji van her du bira, Emîr Seyfedîn cîyê babê xwe girt.

EMÎR SEYFEDÎN

Emîr Seyfedîn jî eyamekê bi edl û heqîyê hukumetê kir, paşê çend salekê azimê darê cînan bû.(54) Hukumdarî birayê xwe Emîr Mecdudîn re hîşt.

EMÎR MECDUDÎN

Emîr Mecdudîn eyamekê hukumdarî kir. Bi qencî û edaleta xwe hemî kes û hemî mîr û axa ji wî razî bîn. Paş wefata xwe, hukumdarî ji lawê xwe Emîr Îsa re hîşt.

EMÎR ÎSA

Emîr Îsa wek bab û bapîrên xwe çend salekê hukumdarî kir; paş wefata xwe, hukumdarî lawê xwe Emîr Bedredîn re hîşt.

EMÎR BEDREDÎN

Şeref bîn Şemsedîn, kitêba xwe ya li ser Kurdistanê nivîsî dibêje ku, Emîr Bedredîn wekî bî hukumdarê Cizîrê, heta wefata xwe hukumdarîke we kir ku edaletê de meşhûr bî. Ferqa tu kesê nedikir; mîr û axa, mezin û kiçik hemî li cem wî yek bû. Tuca ji Şer'a şerîf cuda nedibû; emrê Xwedê û Pêxember her cî dikir.(55) Loma, zemanê wî de Cizîr ji hemî eyama mamûrtir û qewettir bî; navê wî jî ji hemî selefên(56) wî bilindtir bî. Paş wefata xwe, lawê wî Emîr Ebdal bî xelefê wî.(57)

EMÎR EBDAL

Emîr Ebdal jî rîya babê xwe girt; ew jî ji emrê Xwedê û Pêxember cuda nedibî. Lew navek qenc hîşt. Paş wefata wî hukumdarî law'î(58) Emîr Îzedîn re ma.

---

(54) Azimê darê cînan bû: Berê xwe da bihiştê û çû, çû bihiştê, yanî mir.
(55) Her cî dikir: Her bicî dikir, tim danîya cî, tim pêkdanîya.
(56) Selef: Kesê ku berî kesekî dî di karê wî da bûye, di cîyê wî da bûye. Li vir mexsed "mîrên berî wî" ne.
(57) Xelef: Kesê ku li pey kesekî dî bê ser karê wî, bê cîyê wî. Ev peyvik dijmana "selef" e.
(58) Law'î: Lawê wî, kurê wî.

EMÎR ÎZEDÎN

Emîr Îzedîn lawê Emîr Ebdal e. Wekî Emîr Îzedîn bî hukumdar, gelek nebûrî, Emîr Teymûr(59) paş îstîla Bexdayê hat keleha Tekrîtê û derên dî ji Kurdistanê zebt kir; gelek ji wan dera xirab kir. Paşê, da Cizîrê û Mardînê jî zebt bike, gelek esker rêkir dora Mardînê. Emîr Îzedîn dît ku eskerê Teymûr gelek ji yê wî zêdetir e; zanî ku her şerî bike wê xesarê bibîne. Hinek dîyarî peyda kir, çû pêş Emîr Teymûrê Leng teqdîm kir. Emîr Teymûr ji vî halî gelek memnûn bî. Ewî jî hinek dîyarî dan Emîr Îzedîn, eskerên xwe ji dor welatê wî kişand. Emîr Îzedîn vegera cîyê xwe, dest hukumdarîya xwe kir.

Lakîn hinga(60) çûbî dîwana Emîr Teymûr, Emîr Îzedîn xwe re(61) şêxek biribî. Ewî şêxî wekî vegera, sebba(62) Emîr Teymûr kir. Teymûr ew hal bihîst, xezeb kir;(63) Mîr Îzedîn re xeber rêkir, da destê wî şêxî girê bide û jê re rêke. Lakîn Emîr Îzedîn, ji xîret û hemîyeta xwe dil neda(64) destê şêxekî girê bide, rêke nik neyarê wî. Loma guh neda xebera Teymûr. Emîr Teymûr, ser vê serhişkîya Emîr Îzedîn xezeb kir; çi qa eskerê wî heye rêkir ser Kurdistanê. Emîr Îzedîn eskerê xwe vêkda,(65) şer kir, lê mexlûb(66) bî; çû heta nav eşîreta Eruh. Ziftan(67) hat; Teymûr hew karî wan dera bimîne; rabî hin der xirab kir û eskerê xwe ji Kurdistanê kişand. Emîr Îzedîn, wê demê paş pêlekê(68) wefat kir.(69)

---

(59) Emîr Teymûr: Teymûrê Leng ê Moxolî, nevîyê Cengîz bûye. Di sala 1336'an da li bajarê Keşş ê nêzîkê Semerqendê hatîye dinê, di 1405'an da li Semerqendê mirîye. Gora wî li Semerqendê ye.

(60) Hinga: Dema, wextê.

(61) Xwe re: Bi xwe ra, digel xwe.

(62) Sebb: Peyvên dijwar û nebaş ên ku mirov di heqê kesek da dibêje yan jî li rûyê wî dibêje, çêr. Ev peyvikeka Erebî ye.

(63) Xezeb kir: Hat xezebê, hat xişmê.

(64) Dil neda: Dilê wî dest neda, dilê wî qebûl nekir, ji dilê wî nehat, dilê wî rê neda.

(65) Vêkda: Da hev, berhev kir, civand.

(66) Mexlûb: Zorbirî, kesê ku zora wî tê birin, kesê ku dijminê wî zora wî dibe.

(67) Ziftan: Zivistan. Ev peyvik di eslê xwe da "zivistan" e; lê belê li hin hêlên Kurdistanê tê kurtkirin û bi awayê "ziftan" tê gotin.

(68) Wê demê paş pêlekê: Pêlek paş wê demê, pêlek piştê wê demê, demek piştê wê demê.

(69) Nivîskar tarîxa van bûyeran nenivîsîye. Li gora ku **"Şerefname"** dinivîse, ev bûyer di salên 1393-1394'an da qewimîne.

ÎŞ'ARA MEDÎHETA TEWAİFÊD KURDAN E Bİ ŞECAET Û XÎRETÊ ÎZHARA BEDBEXTÎ Û BÊTALİÎYA WAN E DİGEL HİNDE SEMAHET Û HEMÎYETÊ(70)

Saqî, tu jibo Xwedê kerem ke(71)
yek cur'eê mey di camê Cem ke(72)

da cam-i bi mey cîhannuma bit
herçî me îrade ye, xuya bit(73)

da keşf-i bibit li ber me ehwal
kanê dibitin muyesser îqbal(74)

Îdbarê me wa gîha kemalê(75)
Aya bûye qabilê zewalê(76)

---

(70) Ev, sernivîsara beşek ji beşên **"Mem û Zîn"**ê ye, mana wê weha ye: "Eşkerakirina pesnê eşîretên Kurdan e bi mêrxasî û xîretê, nîşandana bextreşî û bêtaliîya wan e digel ew qas ciwamêrî û welatevînîyê".

(71) Saqî: Meygerîn, meygêr, kesê ku di civatek da mey digerîne, mey dide haziran.

(72) Cur'e: Qurt, qasê ku mirov di carek da vedixwe û dadiqurtîne.
Camê Cem: Qedeha Cem, ku şahê Ecem bûye. Li gora efsaneyan, kesê ku mey îcat kirîye ew Cem bûye û qedeha wî ya meyê qedeheka efsûnkirî bûye, wek dûrbînek cîhan nîşan daye û wek telesqopek stêr gişt anîne ber çavan. Ji ber wî semedî, ji wê qedehê ra hatîye gotin "camê cîhannuma", yanî "qedeha cîhannumîn, qedeha ku cîhanê nîşan dide, qedeha ku dinyayê tîne ber çavan". Dîsa li gora efsaneyan, kesê ku li wê qedehê nihêrtîye, bi xêra wê zanîye ku di pêşedemê da dê çi biqewime. Xanî, qedeha xwe şibandîye bi wê qedehê û xwestîye ku bi alîkarîya wê, rewşa Kurdan a pêşedemê bibîne û bizane.

(73) Herçî me îrade ye: Herçî me divî, her tiştê ku em dixwazin.

(74) Muyesser: Hêsan, tiştê ku bi hêsanî pêktê, bi hêsanî dikeve destê mirov.
Îqbal: Bextê vekirî, taliê baş, şans. Yanî "gelo dê taliê baş ji me ra jî bi hêsanî pêkbê, bextê me jî dê bi hêsanî vebibe?"

(75) Îdbar: Taliê xirab, bêtaliî, bextê girtî, bextreşî, bêşansî. Yanî "bêtaliî û bextreşîya me wa ye gîhaye kemalê, tam kemilîye, temam bûye, gîhaye zîrwe û tepelê".

(76) Qabilê zewalê: Tiştê ku ber bi tunebûnê diçe, dike tune bibe, dike paşî lê bê û ji meydanê rabe. Yanî "ew bêtaliî û bextreşîya me ya ku gîhaye kemala xwe, gelo êdî ber bi tunebûnê diçe, gelo dike tune bibe û êdî paşî lê bê?"

ya her wehe dê li îstîwa bit(77)
hetta we ku dewrê munteha bit?(78)

Qet mumkin e ev ji çerxê lewleb(79)
tali' bibitin jibo me kewkeb?(80)

Bextê me jibo me ra bibit yar
carek bibitin ji xwabê hişyar(81)

rabit ji me jî cîhanpenahek(82)
peyda bibitin me padîşahek

şîrê hunera me bête danîn(83)
qedrê qelema me bête zanîn

derdê me bibînitin îlacê
ilmê me bibînitin rewacê

*

Ger dê hebuwa me serfirazek(84)
sahibkeremek, suxennewazek(85)

---

(77) Îstîwa: Gîhana Rojê bo nîvê asîman di wextê nîvroyê da. Roj bilind dibe û di wextê nîvroyê da digîje nîvê asîman, paşê dadigere û ber bi avabûnê diçe, berê xwe dide avabûnê. Xanîyê nemir, bextreşîya Kurdan şibandîye bi Roja ku gîhaye nîvê asîman û dike ber bi avabûnê dakeve û dagere. Yanî "bextreşîya me ya ku kemilîye û gîhaye tepelê, gelo êdî ber bi tunebûnê diçe, yan dê tim û tim weha li cîyê xwe, li tepelê bimîne?"

(78) Dewrê munteha: Dewra paşîn, dûwayîya dinê, axirê zeman.

(79) Çerxê lewleb: Çerxa felekê.

(80) Tali' bibitin: Derkeve.
Kewkeb: Stêr. Yanî "gelo dibe ku ji çerxa felekê jibo me jî stêrek derkeve?" Wek ku tê zanîn, derketina stêrê nîşana vebûna bext e.

(81) Xwab: Xew.

(82) Cîhanpenah: Padîşahê ku ji cîhanê ra dibe sipartek û palgeh, padîşahê ku dinya xwe dispêr'ê û pala xwe did'ê, ku dinya pê ewle dibe û bawerîya xwe pê tîne.

(83) Şîr: Şûr.

(84) Mexsed ji "serfiraz" mîr e, padîşah e. Yanî "eger mîrekî me hebûya".

(85) Sahibkerem: Xwedîqencî, qencîkar.
Suxennewaz: Evîndarê peyvên xweş, kesê ku peyvên xweş ên wek helbest û çîrokan dievîne, kêfa xwe ji wan ra tîne, bi wan kêfxweş dibe.

neqdê me dibû bi sîkke meskûk(86)
ned'ma wehe bêrewac û meşkûk(87)

Herçend-i ku xalis û temîz in
neqdeyn-i bi sîkkeyê ezîz in(88)

Ger dê hebuwa me padîşahek
laiq bidîya Xwedê kulahek(89)

tayîn bibuwa jibo wî textek(90)
zahir vedibû jibo me bextek(91)

hasil bibuwa jibo wî tacek(92)
elbette dibû me jî rewacek

xemxwarî dikir li me yetîman
tînane derê ji dest leîman(93)

xalib nedibû li ser me ev Rûm(94)
ned'bûne xirabeyê di dest bûm(95)

---

(86) Neqd: Zêr û zîv. Li vir mexsed jê bêje ye, edebîyat e.
Sîkke: Çapkirina diravan, çapkirina zêr û zîv, ku zêr û zîv bi awayê diravkî bên çapkirin û bibin dirav.
Meskûk: Zêr û zîvê çapkirî, dirav. Yanî "zêr û zîv çawa tên çapikirin û dibin dirav û rûmet qazanc dikin, eger mîrekî me hebûya, peyvên me yên rûmetgiran jî dê cîyê xwe bigirtina û rûmeta xwe bidîtina, bi wî awayî em jî dê bibûna xwedîyê bêjeyek, xwedîyê edebîyatek".

(87) Bêrewac: Tiştê ku narewe, nabûre, nayê qebûlkirin.
Meşkûk: Berguman, tiştê ku guman jê tê kirin, şik jê tê kirin.

(88) Neqdeyn: Her du neqd, zêr û zîv.

(89) Kulah: Kumê mîranî, tac.

(90) Tayîn bihuwa: Kifş bibûya, bihata kifşkirin.

(91) Zahir: Eşkera.

(92) Hasil bibuwa: Bi dest biketa, pêkbihata.

(93) Leîm: Kesê nejadnizim ê çavbirçî, kesê bêesil û bêkok ê ku çavê wî li malê xelkê ye, kesê bêbav ê liştok.

(94) Rûm: Rom, dewleta Osmanî(li jêrenota 21'ê ya jimareya 6'an binêrin). Ev peyvik di zimanê Kurdî da "Rom" e, lê belê li vir jibo lêkanîna qafîyeyê digel peyvika "bûm" a dûwayîya malika hatî, bi awayê "Rûm" hatîye nivîsîn.

(95) Bûm: Kund.

mehkûmueleyhî-yû sealîk(96)
mexlûb û mutîê Tirk û Tacîk(97)

*

Emma ji ezel Xwedê wisa kir(98)
ev Rom û Ecem li ser me rakir(99)

Teb'îyyetê wan egerçi ar e(100)
ew ar-i li xelqê namîdar e(101)

Namûs e li hakim û emîran(102)
Tawan çi ye şair û feqîran!(103)

Herçî bire şîrî destê hîmmet(104)
zebt kir ji xwe ra bi mêrî dewlet(105)

Lewra ku cîhan wekî erûs e(106)
Wê hukm-i di destê şîrê rûs e(107)

---

(96) Mehkûmueleyhî: Binferman, binhukum, kesê ku di binê ferman û hukmê kesên dî da ye, kesê bindest.
Sealîk: Xizan, perîşan.

(97) Mutî': Îtaetkar, kesê ku ji hin kesên dî ra îtaet dike, li gora fermana wan tevdigere, stûyê wî li ber wan xwar e.
Tacîk: Ecem.

(98) Ezel: Dema berê, zemanê berê.

(99) Di eslê rojnamê da "di ser me rakir" hatibû nivîsîn. Lê belê wek ku eşkera ye, ew awa şaş e. Ji ber wî semedî, me li gora çapa Stanbolê ya sala 1919'an awayê rast "li ser me rakir" nivîsî.

(100) Teb'îyyet: Peyrewî, ku mirov li pey kesek yan dewletek here û têkeve binê fermana wî kesî yan wê dewletê.
Ar: Neng, eyb, şerm, tiştê ku mirov şermî dike, leke tîne ser mirov.

(101) Namîdar: Navdar, meşhûr.

(102) Hakim: Fermanrewa, hukumdar.

(103) Tawan: Hêz, taqet, şîyan, hêza ku mirov bişê bi wê karek bike.

(104) Şîr: Şûr.

(105) Zebt kir: Stand, xist destê xwe.
Bi mêrî: Bi mêranî, bi mêrxasî.
Di eslê rojnamê da ev malik "zebt kir jibo xwe bi mêrî dewlet" hatibû nivîsîn. Lê belê eşkera ye ku ew awa şaş e û wezna malikê jî pê dişike. Ji ber wî semedî, me li gora çapa Stanbolê ya 1919'an ev malik bi awayê rast "zebt kir ji xwe ra bi mêrî dewlet" nivîsî.

(107) Şîrê rûs: Şûrê rût, şûrê tazî, şûrê ku ji kalan hatîye kişandin û jibo şer hatîye amadekirin. Ev peyvik di eslê xwe da "rût" e, lê belê li hin hêlên Kurdistanê bi awayê "rûs" tê gotin; wek ku peyvika "birçî" li hin hêlên Kurdistanê bi awayê "birsî" tê karanîn.

Lê eqd û sidaq û mehr û kabîn:(108)
Lutf û kerem û eta û bexşîn(109)

Pirsî ji dinê min ev bi hîkmet:
"Mehra te çi?" Gote min ku "hîmmet"

Hasil ku, dinê bi şîr û îhsan(110)
tesxîr-i dibit jiboyê însan(111)

*

Ez mame di hîkmeta Xwedê da
Kurmanc-i di dewleta dinê da

aya bi çi wechî mane mehrûm(112)
bîlcumle jibo çi bûne mehkûm!(113)

Wan girtî bi şîrî şehrê şuhret(114)
tesxîr-i kirin bîladê hîmmet(115)

---

(108) Eqd: Ev peyvikeka Erebî ye, di eslê xwe da bi mana "girêdan" e. Lê bi awayê mecazî bi mana "erêkirina keçek ji xortek ra" jî tê. Wisa tê zanîn ku li vir bi wê maneyê hatîye karanîn.
Sidaq: Qelenê bûkê.
Mehr: Heqê marbirînê, heqê birîna mara bûkê.
Kabîn: Tiştên ku zava ji bûkê ra dîyarî dike.

(109) Lutf: Qencî.
Kerem: Ciwamêrî.
Eta: Dayin, ku mirov mal û dirav û tiştên dî bide xelkê, belav bike.
Bexşîn: 1-Dayina mal û tişt. 2-Efûkirina sûc û gunehan, ku mirov sûc û gunehên kesek yan hin kesan bibexşîne, efû bike.
Mana vê beytê û beyta berî wê bi tevayî weha ye: "Dinê wek bûkek e; hukmê wê jî di destê şûrê tazî da ye; kî xwedîyê wî şûrî be, ew ji xwe ra bûkê dibe. Lê belê qencî û ciwamêrî û bexşîn jî, qelen û heqê marbirîn û dîyarîyên bûkê ne. Nexu divê berê mirov bûkê bîne, paşê qencî û ciwamêrî bike, dîyarîyan bide".

(110) Hasil ku: Bi peyva kurt ev e ku, ku mirov bi kurtî bêje mesele ev e ku.
Îhsan; Qencî.

(111) Tesxîr dibit: Stûxwar dibe, stûyê xwe xwar dike, teslîm dibe, zorbirî dibe.

(112) Aya: Gelo.
Bi çi wechî: Bi çi awayî, bi çi semedî, ji ber çi, çima.

(113) Bîlcumle: Hemî, pêkve, bi tevayî.
Bûne mehkûm: Bûne binferman, ketine binê fermana bîyanîyan, bindest û dîl bûne.

(114) Şehrê şuhret: Bajarê şuhretê, bajarê nav û deng. Yanî "Kurd bi şûrê xwe û bi şerkarîya xwe wisa meşhûr bûne û wisa navdar bûne ku, goya ku şuhret bajarek e û wan jî bi şûrê xwe ew bajar dagir kirîye".

(115) Tesxîr kirin: Stûxwar kirin, zorbirî kirin, teslîm standin.
Bîladê hîmmet: Welatê xîretê. Yanî "Kurd wisa xîretkar in ku, goya ku xîret welatek e û wan jî ew welat zorbirî kirîye, xistîye destê xwe û tê da bûne fermanrewa".

Her mîrekî wan bi bezlê Hatem(116)
Her mêrekî wan bi rezmê Rustem(117)

Bifkir, ji Ereb heta ve Gurcan(118)
Kurmancî ye bûye şubhê burcan(119)

Ev Rom û Ecem bi wan hesar in(120)
Kurmanc-i hemî li çar kenar in

Her du terefan qebîlê Kurmanc(121)
bo tîrê qeza kirîne amanc(122)

Goya ku li serhedan kilîd in(123)
Her taîfe seddek in, sedîd in(124)

Ev qulzumê Rom û behrê Tacîk(125)
hindî ku bikin xurûc û tehrîk(126)

---

(116) Bezl: Ciwamêrî.
Hatem: Hozanekî Ereb bûye, ji êla Teyy a Yemenî bûye. Di sala 605'an da mirîye. Bi ciwamêrîya xwe navdar bûye, bûye nîşana ciwamêrîyê.

(117) Rezm: Şerkarî, mêrxasî, fêrisî.
Rustem: Şerkar û mêrxasê Kurd ê navdar Rustemê Zalê. Tê gotin ku 300 sal berî Mîladê wefat kirîye.

(118) Heta ve Gurcan: Heta bi welatê Gurcîyan, heta bi Gurcistanê.

(119) Şubhê burcan: Wek keleyan.

(120) Bi wan hesar in: Bi wan westane, bi wan sekinîne, bi wan tên parastin.

(121) Her du terefan: Her du alîyan, yanî dewleta Romê û dewleta Ecem.

(122) Tîrê qeza: Tîra tunekirinê, tîra rakirina ji meydanê, tîra kuştinê. Yanî "dewleta Romê û dewleta Ecem, qebîleyên Kurdan jibo tîrên xwe yên tunekirinê kirine amanc, berê tîrên xwe dane wan da ku wan tune bikin û ji meydanê rakin".

(123) Goya ku: Wek ku, mirov dibêje qey ku, ji mirov we ye ku.
Serhed: Sersînor, serê sînor.

(124) Taîfe: Qebîle, eşîret, êl.
Sedd: Bend, rêgir, benda ku li pêşîya avê yan li ser rê tê avakirin.
Sedîd: Zexm, pît, xurt. Yanî "goya ku Kurd li sersînorên navbera her du dewletan bûne wek kilîtan û her êleka Kurdan bûye wek rêgir û bendaveka zexm û xurt; bendavek çawa pêşîya evê digire û nahêle ku av derbas bibe, Kurd jî li sersînoran ketine navbera her du dewletan û nahêlin ku ew derbasê alîyên hev bibin".

(125) Qulzum: Ev navê Deryaya Sor e. Xanî dewleta Romê şibandîye bi wê deryayê.

(126) Xurûc: Derketin.
Tehrîk: Tevger, hereket, livîn. Yanî "ew dewleta Romê ya wek Deryaya Sor û ew dewleta Tacîkan a wek deryayek, her cara ku ji warên xwe derkevin û tevgerin, hereket bikin, bilivin".

Kurmanc-i dibin bi xwîn mulettex(127)
wan jêkve dikin, mîsalê berzex(128)

*

Ciwamêrî-yû hîmmet û sexawet(129)
mîrînî-yû xîret û celadet(130)

ew xetm e jibo qebîlê Ekrad(131)
wan dane bi şîr û hîmmetê dad(132)

Hindî ji şecaetê xeyûr in(133)
ew çende ji minnetê nefûr in(134)

Ev xîret û ev uluwwê hîmmet(135)
bû maniê hemlê barê minnet(136)

Lew pêkve hemîşe bêtefaq in(137)
daîm bi temerrud û şiqaq in(138)

Ger dê hebuwa me îttîfaqek
vêkra bikira me înqiyadek(139)

---

(127) Mulettex: Lewitî.
(128) Berzex: Bejê zirav ê ku di navbera du deryayan da cî digire û wan her du deryayan jêkve dike, ji hev diqetîne.
(129) Sexawet: Ciwamêrî, çavfireyî, merdîtî, nandan.
(130) Celadet: Mêrxasî, fêrisî, egîtî.
(131) Xetm: Mor, nîşan, îşaret. Yanî "ev wesfên ha jibo qebîleyên Kurdan hatine morkirin û bûne nîşan, her kes qebûl dike ku ev wesfên ha di wan da hene û ji wan ra bûne nîşan".
(132) Dad: 1-Edalet. 2-Dengan, nav û deng. Li vir mexsed mana 2'yan e.
(133) Şecaet: Mêrxasî, mêranî, wêrîn, cesaret, fêrisî.
Xeyûr: Xîretkar.
(134) Ew çende: Ew qas.
Nefûr: Nefretkar, nevînkar, kesê ku ji tiştek nefret û nevîn dike, ji wî tiştî dûr diçe.
(135) Uluwwê hîmmet: Bilindîya hîmmetê, pêjna hîmmetê ya bilind, parsûstûrî, nefsmezinî.
(136) Heml: Hilgirtin.
(137) Hemîşe: her tim, tim û tim, her dem.
(138) Temerrud; Serhildan, asêbûn, ku mirov li dijê dewletê yan jî li dijê hev asê bibe, serî hilde, serê xwe bilind bike û îtaet neke.
(139) Vêkra: Pêkve, bi hev ra.
Înqiyad: Çûyina li pey emr û fermana mezinan yan karbidestan, îtaeta fermana wan. Yanî "eger em li pey emr û fermana hev biçûna, me îtaeta fermana hev bikira".

Rom û Ereb û Ecem temamî(140)
hemyan ji me ra dikir xulamî

tekmîl-i dikir me dîn û dewlet(141)
tehsîl-i dikir me ilm û hîkmet(142)

temyîz-i dibûn ji hev meqalat(143)
mumtaz-i dibûn xwedankemalat(144)

Metbea ''Cem'îyeta Tefaq û Qencîya Musulmana'' tebi' bîye

---

(140) Di eslê rojnamê da di serê vê malikê da peyvika ''Rûs'' hebû. Lê belê, wek ku eşkera ye, ew bi şaşî li wir hatîye çapkirin. Lewra di çapên **''Mem û Zîn''**ê yên dî da ew peyvik tune. Li gora wezna malikê jî ew peyvik zêde ye. Ji wî semedî, me li vir ew peyvik nenivîsî.

(141) Tekmîl dikir me: Me temam dikir, me pêkdanîya.

(142) Tehsîl dikir me: Me bi destê xwe dixist.

(143) Temyîz dibûn ji hev: Ji hev cuda dibûn, ji hev kifş dibûn, ji hev dihatin veqetandin û naskirin.
Meqalat: Piranîya ''meqal'' e, bi mana ''peyv, gotin'' e.

(144) Mumtaz dibûn: Kifş dibûn, dihatin naskirin, dihatin bijartin.
Xwedankemalat: Kesên xwedîhuner, kesên hêgin, kesên xwedîqabilîyet, kesên ku karên rûmetbilind ji destên wan tên.

www.netewe.com

www.netewe.com

Eded 9 Sala ewwulî Rûper 1

KURDİSTAN

1315

Pazde roja de carekê têt nivîsandin
cerîdeya Kurdî ye

Kürdleri tahsil-i ulûm ve
fünûna teşvik eder
nasayih ve edebiyat-ı
Kürdiyeyi hâvî
on beş günde bir neşrolunur
Kürdçe gazetedir

Gazetenin mesleğine muvafık
Arabça, Türkçe, Farisîce
mektublar
Kürdçeye bittercüme neşrolunur

Heçî vê
kaxidekî
rêke
ji min re,
divê
ser kaxizî
weha binivîse:
"Bî Genève
necl'ul-merhûm
Bedirxan Paşa
Ebdurrehman Beg"

*

Her car
du hezar
cerîdeya
ez'ê rêkim
Kurdistanê,
de belaş
bidin xelkê

Unvan:
Genève'de
"Kürdistan"
Gazetesi
Sahib ve Muharriri
Bedirhan Paşazade
Abdurrahman

*

Her tabı'da
2000 nüsha
Kürdistan
vülât-ı izamına
irsal ve vesatetleriyle
kura ve kasabâta
neşr-ü tamim
olunacaktır

*

Kürdistan haricinde
her yer için
senelik abone bedeli
80 kuruştur
Kürdistan dahilinde
hususî isteyenlere
meccanen gönderilir

Roja sêşembê de 20 Receb 1316 * Salı fi 3 Kânun-ı Evvel sene 1314(1)

BÎSMÎLLAHÎRREHMANÎRREHÎM

RUTBET'UL-İLMÎ E'LE'R-RUTEB(2)

Gelî mîr û axano! Vêca merteba ilmê holê ye. Qedrê xwendinê bizanin. Mirovê xwendibî, ba Xwedê teala wek nebîya(3) xweyqedir dibe. Însan nehatîye ser dinê da wek heywana hema bixwe û vexwe; însan divê ji Xaliqê xwe re îbadet û taetê bike. Îbadet û taet, bê ilm çawa dibe! Divê însan bizanibe ku çawa,

(1) Li gora tarîxa Mîladî 16 Kanûna Pêşîn 1898(Milâdî tarihe göre 16 Aralık 1898).
(2) Yanî "rutba ilmê rutba bilintirîn e, rutba zanînê ji hemî rutbeyan bilintir e".
(3) Nebî: Pêxember.

çima xelq bûne. Ez hin Kurmanca nas dikim ku pêncî-heftê salî, sûreyên nimêjê(4) nizanin. Heyfa min ji wan re têt. Ferqa mirovên weha û heywana gelek hindik e.

Gelî mîr û axano! Hun hemî bizanibin ku gunehê van mirovên weha cahil mayin, dikeve para we jî. Roja qiyametê wê ji we jî bêt pirsîn. Wekî bêt dora şixula, hun dibêjin "em mîr û axa ne, bila Kurmanc ji me re xizmetê bikin, bişixulin". Erê, çiku ew ji we re dişixulin, çiku hukmê we ji wan dibire,(5) gunehê cahilîya wan stûyê we ye jî. Hun çawa ji xizmeta wan fêdeyê dibînin, divê hun jî welê li wan re qencîyê bikin. Li gunda mekteba bidin çêkirin, zarûyên wan rebena bidin xwendin. Hukumet ji we pera distîne. Ew perê un didin hukumetê, ser wê xeberê ye(6) ku hukumet pê wan pera ji we re xizmetekê bike, mekteba çêke. Bajarên mezin(7) mekteb û medreseyên rind hene. Bişînin wan dera, da bielimin sin'et û hunera. Wekî ew elimîn marîfeta, ji wan zêdetir fêde bikin;(8) ew jî saya we wê bibin xweysin'et û marîfeta.

Wekî hal weha be,(9) zemanek hindik de em'ê bibînin ku Kurmancên me jî wek Tirk û Ereba, Arnawuda dewlemend bibin, gund û bajarên wa jî ava bibin. Û ca welatê xwe bigirin,(10) îndellah(11) xweyqedir bibin.

---

(4) Sûreyên nimêjê: Sûreyên **Qur'anê** yên ku di nimêjê da tên xwendin.
(5) Hukmê we ji wan dibire: Wisa tê zanîn ku di vir da kêmayîyek yan jî şaşîyek heye û awayê rast weha ye: "Hukmê we jî li wan dibûre".
(6) Ser wê xeberê ye: Li ser wê yekê ye, li ser wî semedî ye, jibo wê yekê ye.
(7) Bajarên mezin: Li bajarên mezin.
(8) Fêde bikin: Fêde bibînin, îstîfade bikin, mefadar bibin.
(9) Wekî hal weha be: Eger rewş weha be.
(10) Wisa tê zanîn ku mexsed ev e ku "û cîyê welatê xwe bigirin, qedrê welatê xwe bigirin, qedrê welatê xwe bizanin".
(11) Îndellah: Li nik Xwedê, li bal Xwedê.

WELAT–WETEN

Weten, ango welatê mirov cîsmek we ye ku yên ji wî cîsmî muteessir dibin, xelkên wê derê ne. De vêca hingî mirovên welatekî xweyqewet bibin, hew qas ax û berê(12) wî welatî xweyqewet dibe.

Hingî babê min ji Kurdistanê rabî, ew me'mûrên hukumet rêdike serê gund û bajarên Kurdistanê, wek mara xwîna xelqên Kurdistanê vedixun. Ne mezina ha ji kiçika, ne kiçika ha ji mezina maye. Welatê Kurda wek cîsmek birîndar bêhal maye. Heger Kurd wê birîna me'mûrên hukumetê li wî cîsmî vekirin derman nekin, heyfa min têt ew cîsim, ango Kurdistan, ew ax û berê wî welatî, ew dar û berê wî cîyê hinde zarû mezin kirin, hinde mirov xwey kirin, wê binxak bibit.(13) Ango Mosqof'ê bêt ser wê axê rûnê; zarûyên wî welatî jar û reben bibin; Kurd'ê bibînin ku ew axa zarûyên xwe hinde delalî mezin kirî, wê bikeve nav destê bîyanîya de; ew zarûyên ser wê axê mezin bîn, wê bibin esîrên bîyanîya; ew bab û dayikên dil nadin bêjin zarûyên xwe "avekê bide min", wê bibin xizmetkarên eskerê Mosqof, wê xizmeteka şerabê ji eskerê Mosqof re bikin.

Gelî Kurdno! Halê we xirab e! Ha ji xwe hebin! Heger un deng û destê xwe hilneynin, her ho(14) bimînin, ev birîna hukumet li we vedike wê her mezin bibe, heta we dikuje! Kurd hinde ciwanmêr in, sahibxîret in, çire wek pezî nav destê me'mûrên zalim heqîr(15) û rezîl dibin! Ma un ne mirov in! Ma un ji xelqên dî kêmtir in! Un hema hevdû dikujin, qet fenakirin wan me'mûrên neyarê rûh(16) û malê we! Ew her roj çend sedeka ji we dikujin, lê we ha ji xwe nîne! Pêxember ferman kirîye ku: "Heger me'mûrek zalim hat serê we, wî pê dest û devê xwe, heger nebî pê şîrê xwe(17) ji serê xwe hilînin". Nebêjin "em nikarin". Wekî mirov vê,(18) mirov dikare.

Un qenc bizanin ku heger ji Mosqof an ji Ecem neyarek hat ser we, hukumet tu eskerî rênake ser we;(19) divê we xwe ha ji xwe hebit. Ev hukumeta vî zemanî hew qas xirab bîye ku ha ji kes nemaye. Xelqê İstanbulê jî ji hukumetê gelek aciz bîne; ew jî jar û reben bîne; fedikirin derdê serê xwe; gelek ji wan hawar û gazî kirin, şikat li nik Xunkar kirin; Xunkar guh neda dengê wan; ser rihetîya xwe gelek ji wan nefî bîn; ew dîsa natirsin, heqê xwe dixwazin.

---

(12) Ber: Gelek maneyên vê peyvikê hene, li vir mana wê ev e: Ew tiştê ku mirov ji axê, ji daran, ji heywanan, ji çem û newal û deryayan bi dest dixe û jibo abûrîya xwe bi kar tîne, jê mefadar dibe. Dema mirov dibêje "dar û ber", ew peyvika "ber" jî bi vê maneyê tê. Dema ev peyvik tê ber peyvika "xêr", tê da piçek guhartin diqewime û dikeve awayê "bêr"; hingê tê gotin "xêr û bêr".

(13) Binxak bibit: Binax bibe, têkeve binê axê, bimire.

(14) Ho: Weha.

(15) Heqîr: Bêqedir, bêrûmet, nizim.

(16) Rûh: Gîyan.

(17) Pê şîrê xwe: Bi şûrê xwe.

(18) Wekî mirov vê: Eger mirov bivê, eger mirov bixwaze.

(19) Rênake ser we: Rênake alîkarîya we, jibo alîkarîya we naşîne.

Ermenî ji zulma dewletê aciz bîn; dengê xwe hilanîn, destê xwe hilanîn heqê xwe dixwazin. Lê çiku Kurd cahil in, dest kuştina Ermenîya kirin. Kuştina wan li ser Kurda guneh e. Un ji wan mezlûmtir in; lê çiku un cahil in, we ha ji xwe nîne; un dengê xwe dernaynin. Nexu xirabîya li we dibe, li Ermenîya nabe. We dît hukumetê çi zulm li Hemawenda kir! Nuho, heçku tu Hemawend li Kurdistanê neman. Hemawend hindik bûn; loma hukumetê karî wan hemîya bigire bikuje. Lê heger un hemî bitefaq bûn, tu kes nikare we. Heger ev bêtefaqî li ser we dewam bike, qebîlên Kurdan hemî yek û yek wek Hemawenda wê Kurdistanê cuda bibin, hir de wê de(20) binê destê zulma me'mûrên hukumetê jar û feqîr bibin. Heyfa min têt, wan qebîleyê şêr ên Kurda nav sûtarên(21) wan me'mûra de mesxere dibin!

Êdî bes e; çavê xwe vekin, destê xwe hilînin, şîrên xwe bikişînin. Welatê we nav agirî de maye; un hemî nav tehlukeyê de ne; tu emnîyet(22) ji we re, jin û zarwa re nemaye. Herin dor mezinên xwe, herin dor ulemaya(23) îttîfaq bikin; xwe ji binê vê zulma me'mûra hilînin; ji we re fehêt e!

Min İstanbul terk kir, ez hatim welatê xerîba de, da vê cerîdeya xwe binivîsim, Kurda re rêkim, da pê vê cerîdeyê Kurda îqaz bikim.(24) Vêca ez hêvî dikim Kurd jî guh bidin vê cerîdeya min. Tiştê ez vê cerîdeyê de dinivîsim, hemî tiştên we ne ku Xwedê û Pêxember emir kirine. Ya Xwedê emir kirî û Pêxember emel kirî,(25) muyyen(26) ji we re xêr e.

Ez ji ulemayên Kurda hêvî dikim vê cerîdeya min ji Kurdê nexwendî re bixwînin, esbab û hîkmetên van nesîhetên min bêjin, da qenc aqilê wan bikeve. Ev li ser ulema deynek mezin e. Divê mîr û axa jî arî ulema bikin, qedrê wan bigirin, ji xeberê wan dernekevin. Çiku ulema wek enbîyan e; çawa divê mirov îtaetê ji enbîya re bike, welê divê mirov ulema re mutî' be.(27)

*

Min cerîdeya xwe ya berî vê de behsa Girîdê kiribî. Ew ax, welatê Musulmana, axir ket nav destê neyara de. Hinde welatek pê zehmetê hatî standin, gelek hêsanî ket destê neyara de. Çiku(28) mirovên wê derê nav destê me'mûrên hukumetê de jar û reben bîn; ewan me'mûra pê zulma xwe, ew erdê hinde xweş, axir avêtin nav destê neyarên me de. Îro sed hezar nufûsên Girîdê, hinde jin û zarû, ciwan û pîr nav destê neyarên File de esîr mane; xizmetkarîya wan dikin. Ewan rebena hinde hawar û gazî kir, dewletê tu arî ji wan re nekir.

---

(20) Hir de wê de: Li vir û li wir, li vê hêlê û wê hêlê, li vî alî û wî alî.
(21) Sûtar: Qeşmer, mesxere, sextekar, zexel, hîlekar.
(22) Emnîyet: Ewletî.
(23) Ulema: Piranîya "alim" e, ew jî bi mana "zanyar" e.
(24) Îqaz bikim: Hişyar bikim, têgîhîştî bikim, bala wan bikişînim.
(25) Emel kirî: Anî cî, pêkanî.
(26) Mueyyen: Hemin, bê guman, mutleqa, muheqqeq, ekîd.
(27) Mutî' be: Îtaet bike, bi peyvên wan bike, li gora şîret û peyvên wan tevgere.
(28) Çiku: Lewra.

Ewan pê destê xwe, çekên xwe dest şerî kir. Gelek xîret kirin. Lê dewletên Fila arî Fileyên wê derê kirin; top û tifingên xwe, waporên xwe ji Fila re rêkirin; eskerê wan arî Fila kir, Musulman kuştin. Musulman mexlûb bîn, hatin kuştin, esîr bîn; Xunkar ji wan Musulmana re tu arîkarî nekir.

Heger Musulmanên Girîdê berê xwe ji binê zulma me'mûrên Xunkar derêxistana, îro erdê wan, ew axa li ser mezin bîn, ew axa zarûyên xwe bi hinde delalî mezin kirî, ji destê wan nediçû. Eskerê Fila, ser kêfa xwe, wekî rastê zarûke Musulman dihat, şîrek lê dida, da bizane ka şîrê wî dibire ana na. Musulman holê destê wan de reben bîn. Ewan ev hal hemî Xunkar re nivîsî. Lê Xunkar tu rehm, tu arîkarî ji wan re nekir. Musulmanên Girîdê birçî man, tazî man; jinê wan kefîyek nedît bidin serê xwe, nav eskerê neyara de jar û reben bîn. Xunkar ev hal hemî bihîst, ji wî re xelqê hemîya nivîsî. Dîsa tu fêda xwe li wan rebena nekir. Jin û zarûyên Girîdê ji birça, ji serma mirin. Dîsa Xunkar û mitirbên dor'ê ji sefaheta xwe kêm neman.

Gelî Kurdno! De vêca qenc bizanibin, heger un nuho fenekirin halê xwe, vê meskenetê(29) bernedin, heger un dest hilneynin, heger un her holê binê zulma wan me'mûra de man, ev bela'ê rojek bê serê we jî. Wekî un dereng man, êdî hawar û gazî fêde nake. Loma divê un nuho fekirin xwe, divê we berê ve ha ji xwe hebe. Heke ne, un'ê paşê peşîman bibin. Lê ew peşîmanîya paş tu fêdeyê nake.

SEBAT'UL-MULKÎ BÎ'L-EDL

Welatek bi edaletê destê xelkê wî welatî de dimîne.

Gelî Kurdno! Un qenc bizanibin ku heger welatê we de me'mûrên serê we ji edaletê dûr ketin, welatê we destê xweyî de namîne. Nuho Kurdistan jî weke welatên di binê Tirka, binê destê Ebdulhemîd de ye; me'mûrên serê we, Ebdulhemîd rêdike. Lakîn xweyîyê Kurdistanê Kurd in. Wekî neyarek hat ser Kurdistanê, Kurd'ê xwe ser bidin kuştin. Erdê wê derê Kurd dikolin, darên wê derê Kurd diçînin; perên me'mûrên Xunkar rêdike serê we, un Kurd didin. Loma, Kurdistan ya we ye.

De vêca ji we re malûm be ku, heger me'mûrên welatê we zulmê bikin, welatê we'yê ji destê we derkeve. Muhafeza edaletê ser we ye; çiku ji zulmê un'ê zerer bikin. Xunkar, gelek welatên dî hene. Ew dibêje "heta paşayika umrê min(30) welatên di binê destê mi de têra selteneta min dikin". Loma guh nade we. Ev fikra ha, gelek fikrek muzir e. Heyfa min têt ku padîşahek vê fikrê de ye. Loma divê xweyîyê xwe(31) ha ji xwe hebit. Heger we divê Kurdistan her destê we de bimîne, heger we divê jin û zarûyên we reben, feqîr nebin, divê un me'mûrên zalim ji welatê xwe derêxin. Tirk jî ji vî Xunkarî tizî bîne;(32) fedikirin çara serê xwe.

(29) Meskenet: Miskînî, bêkêrî, bêxêrî, sistî.
(30) Yanî "heta paşîya umrê min, heta dûwayîya umrê min".
(31) Wisa tê zanîn ku mexseda wî ji "xweyîyê xwe", xwedîyê welat e.
(32) Tizî bîne: Awayê rast "tijî bûne" ye. Yanî "têr bûne".

Xwedê kitêba xwe de ferman kirîye: "Înnellahe ye'muru bî'l-edlî"; ango Xweda edaletê emir dike. De vêca heçîyê edaletê neke, asî ye;(33) heçîyê asî ye, divê serê Musulmana hukmî neket; divê Musulman xwe binê destê wî de nehêlin. Un'ê axretê gunehkar bibin û dinyayê de jî gelek xesar bikin. Fenekirin rihetîya îro. Şeva roja holê gelek reş û zehmet e; siba wê mirin e, rûreşî ye. Ew me'mûrên serê we, fedikirin we dixapînin, xwîna we vedixun; we ha ji xwe nîne. Ew rutbe û nîşanên Xunkar dide mîr û axayên Kurdistanê, ber dîn û namûsa wan ve ye. Heyfa min ji wî mîrî re têt ku dîn û namûsa xwe bi nîşaneke zaliman difiroşe; ew pê wê nîşanê şa dibe, lakîn nizane ku ew nîşan mala wî re birînek bêderman e.

EMÎR EBDAL(34)

Emîr Ebdal lawê Emîr Îzedîn e. Heta babê wî çû ber rehma Xwedê, nav eşîra Erûha de ma. Paş babê wî, hukumeta Cizîrê û dora Cizîrî gîha wî.

EMÎR ÎBRAHÎM

Emîr Îbrahîm, bî xelefê Emîr Ebdal. Wekî wefat kir, sê lawên wî Emîr Şeref, Emîr Bedir û Kek Mihemed paş wî man û her yekê rêzê ve(35) hukumetê kir.

EMÎR ŞEREF — EMÎR BEDİR — EMÎR KEK MİHEMED

Paş Emîr Îbrahîm ev her sê kurên wî bîn xelefên wî. Ji her sîya yê paşayikê(36) Emîr Kek Mihemed, gîha zemanê zuhûra(37) dewleta Aqqoyunlîya.(38) Wê demê, muessisê(39) wê dewletê Uzun Hesen(Hesenê Dirêj) Cizîr zebt kir; gelek mezinên Bohtîya kuştin(40) û Emîr Kek Mihemed û zarûyên birayê wî Emîr Mihemed û Şah Elî Beg girtin,(41) rêkir İraqê û hukumeta Cizîrê da miroveke xwe. Lakîn paşê, Emîr Şeref hinek esker vêkda,(42) dest hilanî, hukumeta bab û bapîrên xwe kir destê xwe.

---

(33) Asî: Gunehkar.
(34) Ev, despêka beşekî dî ye ji dîroka Mîrên Botan.
(35) Rêzê ve: Bi rêzê, bi dor, yek li pey yekê.
(36) Yê paşayikê: Yê paşîn, yê dûwayîn.
(37) Zuhûr: Derketin, peydabûn. Bi awayê mecazî bi mana "sazbûn" jî tê. Li vir mexsed ew e.
(38) Dewleta Aqqoyunlîyan, ku mana wê "Dewleta Pezgewran" e, dewleteka Tirkmenan bûye.
(39) Muessis: Sazkar.
(40) Peyvika "kuştin" di eslê rojnamê da baş nehatîye çapkirin û dirûbê "kirin" pê dikeve. Lê belê, pirtûka dîroka Kurdan **"Şerefname"** jî qala vê bûyerê dike û dide zanîn ku Hesenê Dirêj mezinên Botîyan kuştine. Ji ber wê yekê, me ev peyvik li vir bi awayê rast "kuştin" nivîsî.
(41) Ev peyvika "girtin" jî di eslê rojnamê da wek "kirin" derketîye. Lê me dîsa li gora **"Şerefname"**yê ew rast bi awayê "girtin" nivîsî.
(42) Vêkda: Da hev, berhev kir, civand.

EMÎR ŞEREF BÎN EMÎR BEDREDÎN

Emîr Şeref, hinga qeweta dewleta Aqqoyunlîya kêm bî, qebîlên eşîreta Bohtîya hemî vêkda û pê hîmmeta xwe hukumeta ecdadên xwe dîsa destê xwe kir. Hukumeta wî, heta zuhûra Şah Îsmaîlê Sefewî dest de ma. Hinga Şah Îsmaîlê Sefewî esker rêkir Dîyarbekir û Mosil û Sincar zebt kir, gelek cara esker rêkir Cizîrê jî. Lê nekarî tu tiştî jê bike, her eskerê wî şikest û hukumeta Cizîrê her destê Emîr Şerefedîn de ma.

ŞAH ELÎ BEG

Hinga Emîr Şeref wefat kir, birayê wî Şah Elî Beg ket şûna wî. Şah Elî Beg hukumeta Finikê dabî birayê xwe Mihemed Begê. Wê demê gelek begên Kurda teslîmê Şah Îsmaîl bîn; nav wan de Mîr Mihemed jî hebî. Şah Îsmaîl ew hemî girêdan avêt hebsê û mirovek xwe navê wî Ulaş Beg tayînê Cizîrê kir. Lakîn Şah Elî Beg wî re her şer kir, heta Ulaş Beg ji wê derê derxist. Paşê bî destebirayê Hakimê Bitlîs Emîr Şeref û her du hev re tabiîya(43) Yawuz Sultan Selîm kirin.

Sala neh sed û bîst û duduwa(44) de Dîyarbekir û welatên Kurdistanê hemî, înzîmamê welatên Sultan Selîm bûn.(45) Lakîn wê demê, walîyê Şah Îsmaîl danî ser Dîyarbekrê, ku navê wî Ehmed Efşar Beg bî, îtaetê Sultan Selîm nekir. Lakîn arî hîmmeta Şah Elî Begê,(46) ew der jî ket binê destê Sultan Selîm de. Ser vê xizmeta wan a qenc, Sultan Selîm welatên bega hîşt destê wan de û hukumeta Cizîrê ma destê wan de.

Şah Elî Begê paş xwe çihar law hîşt. Navê wan Bedir Beg, Nasir Beg, Kek Mihemed û Mîr Mihemed bî. Mezinê wan Bedir Beg, bî xelefê babê xwe.

BEDİR BEG BÎN ŞAH ELÎ BEG

Edil(47) û aqilê Bedir Begê gelek zêde bî. Loma, zemanê wî de Cizîr û dora wê gelek mamûr bî. Qasê heftê salî mîrî kir. Zemanê wî de padîşahê Tirka, Sultan Silêman bû.(48) Hinga Sultan Silêman esker kişandî ser Bexdadê û Bedir Begê gelek qencî ji Xunkar re kir û gelek carê sefera de Sultan Silêman re bî û gelek şera de ji hevalên xwe hemî zêdetir mêranî nîşa kir.(49) Loma Xunkar jî gelek hejê dikir. Lakîn ser du sebeba teweccuha(50) Xunkar ji ser wî kêm bî.

(43) Tabiî: Peyrewî, ku mirov bibe peyrewê kesek yan dewletek.
(44) Li gora tarîxa Mîladî 1516.
(45) Têkilê welatên wî bûn, tevê welatên wî bûn, bûn peyrewên wî.
(46) Arî hîmmeta Şah Elî Begê: Bi alîkarîya hîmmeta Şah Elî Begê.
(47) Edil: Edalet, dad.
(48) Yanî Sultan Silêmanê Qanûnî.
(49) Nîşa kir: Nîşan da, numand, mêrand.
(50) Teweccuh: 1-Dayina berê xwe bo cîyek yan kesek, ku mirov berê xwe bide cîyek yan kesek. 2-Nêzîkayî û dostanîya ku kesek ji kesekî dî ra nîşan dide. Li vir mexsed ev maneya 2'yan e.

Yek ji wan her du sebeba ew bî ku, hinga ser sefera Bexdadê Sultan Silêman hatî Kurdistanê, çi qa mîrên Kurdistanê hene banî cem xwe kir,(51) anî huzûra xwe de. Wekî hemî ketin huzûra Xunkar de, Hakimê Îmadîyeyê(52) Huseyn Begê, berî Mîr Bedir Begê destê Sultan Silêman maç kir û dîwana Xunkar de ser Bedir Begê rûnişt.(53) Sebebê duduwê(54) jî, Hakimê Hekarîyê Zenbîl Begê re gelek îltîfat kir.(55)

Bedir Beg ji van her du sebeba enirî,(56) ji meclisa Xunkar derket, tu îzin nexwest û hema serê hespê xwe da rê Cizîrê. Paş wî, Mîrê Hekarya Zenbîl Begê îzna xwe xwest, ket ser rê. Bedir Beg derket pêş wî û çi qa mirovê pê re hemî girtin. Zenbîl Beg mirovê Sedrê Azem(57) Rustem Paşa bî. Wê demê Rustem Paşa nekarî tiştekî ji Bedir Begê bike. Lakîn hinga cara duduwê bû Sedrê Azem, Bedir Beg ji hakimîyê(58) rakir û Nasir Beg danî şûna wî. Lakîn Bedir Begê nevî(59) Nasir Begê qebûl bike. Eskerê xwe ve çû ser Nasir Begê, wî re şer kir. Lakîn Bedir Beg mexlûb bî. Loma, Xunkar jî dora "Tor û Hêtem"ê ji Cizîrê cuda kir da Nasir Begê û dîsa hakimîya Cizîrê ma destê Bedir Begê de.

Paş wê, heta nîhayeta(60) umrê xwe hakimîya wî dewam kir. Hinga wefat kirî, sed salî bû.

---

(51) Banî cem xwe kir: Bang kir cem xwe, xund nik xwe.
(52) Îmadîye: Amedî, ku li herêma Badînan dikeve.
(53) Yanî li serîya wî rûnişt, bi ser wî ve rûnişt, li jorê wî rûnişt.
(54) Duduwê: Diduyan.
(55) Di "**Şerefname**"yê da navê vî Mîrê Hekarîyê "Zeynel Beg" hatîye nivîsîn. Wisa tê zanîn ku di rojnamê da ew nav bi şaşî "Zenbîl Beg" derketîye.
(56) Enirî: Ingirî, xeyidî.
(57) Sedrê Azem: Serekwezîrê dewleta Osmanî.
(58) Hakimî: Hukumdarî, mîrîtî.
(59) Nevî: Nevîya, nexwest.
(60) Nîhayet: Paşî, dûwayî.

SEBEBÊ NEZMA KÎTABÊ Bİ VÎ EZMANÎ Dİ SÛRETÊ ŞEKWAYA Jİ DEWRANÎ Û GİLÎYA Jİ EBNAYÊD ZEMANÎ KU Lİ BAL WAN YEKSAN E HUNERA DANAYÎ DİGEL EYBA NADANÎ
(61)

Xanî, ji kemalê bêkemalî(62)
meydanê kemalê dîtî xalî

Yanî ne ji qabil û xebîrî(63)
Belkî bi teessub û eşîrî(64)

Hasil, ji înad, eger ji bêdad(65)
ev bîd'ete kir xîlafê mu'tad(66)

Safî şemirand, vexwarî durdî(67)
Manendê durê lîsanê Kurdî(68)

---

(61) Ev, sernivîsara beşek ji beşên **"Mem û Zîn"**ê ye, mana wê weha ye: "Semedê vêkxistina pirtûkê bi vî zimanî, bi awayê gazinckirina ji felekê û gilîya ji zarûkên demê, ku hunera zanînê û nenga nezanîyê li bal wan wek hev e".

(62) Kemal: Kemilîn, gîhîştina zîrwe û tepelê, temambûn.
Bêkemalî: Negîhîştin, xavî, kêmayî, netemamî. Yanî "ji temambûna kêmayîyê, ji vê yekê ku xavîtî û kêmayî wisa zêde bûye ku gîhaye zîrwe û tepelê".

(63) Qabil: Hêgin, kesê ku hêginîya wî heye, qabilîyeta wî heye, tişt ji destê wî tên, ji heqê tiştan derdikeve. Li vir mexsed jê "qabilîyet" e, ew jî bi mana "hêginî" ye.
Xebîrî: Pisporî.

(64) Teessub: Girêdana bi dîtinek ve, bi fikrek ve, bi bîr û bawerîyek ve.

(65) Bêdad: Bêçaretî, bêhavilî, neçarî, ku mirov neçar bimîne.

(66) Bîd'et: Tiştê nûderketî yê dertore, tiştê ku nû derkeve û ji toreyên heyî der be, li toreyan neyê.
Xîlafê mu'tad: Çewtê adet û toreyan, tiştê ku ji tore û adetan ra çewt e. Ji ber ku li gora tore û adetên wê demê nivîskaran hemî bi Erebî û Farisî pirtûkên xwe nivîsîne, Xanî weha gotîye.

(67) Şemirand: 1-Berhevkirin û qatkirina hûçikan yan pancanên şal û hildana wan ber bi jor, ku mirov hûçikên xwe yan jî pancanên şalê xwe berhev bike, qat bike û berjor hilde. 2-Berdan, terkkirin, ku mirov tiştek berde, terk bike. Li vir mexsed ev mana 2'yan e.
Durd: Tiştê tîr ê ku li binê tiştekî ron ê wek şerbetê dicive û rûdinê. Li hin hêlân Kurdistanê jê ra tê gotin "tort" jî.

(68) Manend: Wek, mîna.
Dur: Mirarî.
Lîsanê Kurdî: Zimanê Kurdî.

înaye nîzam û întîzamê(69)
kêşaye cefa jiboyê amê(70)

da xelq-i nebêjitin ku "Ekrad(71)
bêmarîfet in, bêesl û binyad(72)

enwaê mîlel xwedankitêb in(73)
Kurmanc-i tenê di bêhesêb in"(74)

Hem ehlê nezer nebên ku "Kurmanc(75)
işqê nekirin jibo xwe amanc

têkda ne di talib in, ne metlûb(76)
vêkra ne muhibb in ew, ne mehbûb(77)

bêbehre ne ew ji işqebazî(78)
farix ji heqîqî-yû mecazî"(79)

*

Kurmanc-i ne pir di bêkemal in
Emma di yetîm û bêmecal in

---

(69) Nîzam û întîzam: Vêkxistin, gîhandina hev bi awayekî bidûzen, ku mirov tiştek vêkxe û têxe dûzenê.
(70) Jiboyê amê: Jibo giştî, jibo gel.
(71) Ekrad: Piranîya "Kurd" e.
(72) Binyad: Bingeh, esil, kok.
(73) Enwaê mîlel: Hemî tewir milet, hemî tewir netewe, neteweyên ji hemî tewiran, neteweyên cure cure.
Xwedankitêb in: Xwedîpirtûk in, pirtûk didêrin, pirtûkên wan hene.
(74) Bêhesêb: Bêpar, bênesîb.
(75) Ehlê nezer: Kesên bîrbir, kesên bîrewer, kesên xwedîdîtin, kesên ku dîtin û fikir li nik wan heye, bîr bi tiştan dibin.
(76) Têkda: Hemî bi carek, pêkve, giştî.
Talib: Xwestox, kesê ku tiştek dixwaze, li tiştek digere, tiştek divê, divê tiştek bi destê xwe bixe.
Metlûb: Xwestî, daxwazkirî, tişt yan kesê ku ji alîyê hinekan ve tê xwestin, daxwaz tê kirin, hinek lê digerin, îhtîyaca hinekan pê heye.
(77) Vêkra: Pêkve, hemî, giştî, hemî bi carek, tev.
Muhibb: Evîndar, kesê ku dievîne.
Mehbûb: Evandî, kesê ku tê evandin.
(78) Bêbehre: Bêpar.
İşqebazî: Evîn.
(79) Farix: vala.
Heqîqî: Rastîn, tiştê rastîn. Li vir mexsed jê evîna rastîn e.
Mecazî: Tiştê ku di mana xwe ya rastîn da nayê karanîn, bi mexsedeka taybetî di maneyeka dî da tê karanîn. Li vir mexsed jê evîna ne rastîn e, evîna di rû da ye.

Fîlcumle ne cahil û nezan in(80)
Belkî di sefîl û bêxwedan in(81)

Ger dê hebuwa me jî xwedanek
alîkeremek, letîfedanek(82)

İlm û huner û kemal û îz'an(83)
şî'r û xezel û kîtab û dîwan(84)

ev cins-i biba li ba wî mamûl(85)
ev neqd-i biba li nik wî meqbûl(86)

min dê elema kelamê mewzûn(87)
alî bikira li banê Gerdûn(88)

bîna ve ruha Melê Cizîrî(89)
pê hey bikira Elî Herîrî(90)

keyfek we bida Feqîhê Teyran
hetta bi ebed bimayî heyran

Çi b'kim ku qewî kesad e bazar
nînin ji qumaşî ra xerîdar(91)

---

(80) Fîlcumle: Hemî, pêkve, gişt.
(81) Sefîl: Xizan, belengaz, perîşan, reben.
Bêxwedan: Bêxwedî, bêkes.
(82) Alîkerem: Serbilind, serfiraz, kesê ku hîmmet û xîreta wî bilind e, kesê qedirbilind, gewre.
Letîfedan: Kesê ku bi peyvên xweş û zirav dizane, kesê zana û bîrbir.
(83) Îz'an: Fam, têgîhîştin, aqilmendî.
(84) Şî'r: Helbest.
Xezel: Tewirek helbest.
Dîwan: Pirtûka helbestan, berhevoka helbestan.
(85) Ev cins: Ev tewir, ev cure.
Mamûl: Karhatî, tiştê ku mirov wî bi kar tîne, dişixulîne.
(86) Neqd: Zêr û zîv Li vir mexsed jê bêje ye, edebîyat e.
(87) Elem: Ala, beyreq.
Kelamê mewzûn: Peyvên lêkhatî, peyvên ku mirov wan li hev datîne û li gora hinek pîvekan dinivîse. Mexsed helbest in.
(88) Alî bikira: Bilind bikira, hildaya.
Gerdûn: Çerxa felekê, Dinya, kaînat.
(89) Bîna ve: Banîya paş ve, vegeranda, bi paş ve banîya.
Ruh: Gîyan.
(90) Hey bikira: Vejanda, bigîhanda jînê, gîyanî û jîndar bikira.
(91) Xerîdar: Kirîndar, kesê ku tiştek dikire, mişterî.

www.metewe.com

Xasma di vê esrê da, ku himyan(92)
maşûq û hebîb e bo me hemyan(93)

Yanî j'temeê dirav û dînar(94)
her yek ji me ra we bûne dildar(95)

ger ilmê temam bidî bi polek(96)
bif'roşî tu hîkmetê bi solek

kes nakete mîterê xwe camê(97)
ranagiritin kesek nîzamê(98)

*

Weqtê ku me dî zeman e ev reng
fîlcumle li ser diravî bû ceng

hez kir me bibîne kîmîyager
Gava ku me dî nebû muyesser(99)

nisfiyye me pêlekê emel kir(100)
tesfiyyeê cewherê dexel kir(101)

---

(92) Esr: 1-Sedsal. 2-Dem, zeman. Li vir mexsed mana 2'yan e.
Himyan: Kîsê diravan.

(93) Maşûq û hebîb: Evandî, yar, yara xweşdivî.
Bo me hemyan: Jibo me hemîyan, jibo me giştan.

(94) Dînar: Zêrê çapkirî yê ku di kirîn û firotinê da tê karanîn.

(95) Her yek: Her yek ji dirav û dînaran, hem dirav û hem dînar.

(96) Pol: Berê yekîtîyeka diravan bûye ku rûmeta wê gelek nizim bûye, gelek rûmetketî bûye. Ji wî semedî, bûye nîşana tiştê tewr erzan û rûmetnizim. Peyvik, li hin hêlan jî bi awayê "pûl" tê karanîn.

(97) Mîter: Firîşteyê rênumîn, milyaketê rêbir ê ku rê nîşanê mirov dide; her weha jibo Rojê jî tê gotin.
Cam: Qedeha meyê. Yanî "ilm û hîkmeta ku wek qedehê ye, kes wan ji xwe ra nake firîşteyê rêbir û rênumîn, kes wan ji xwe ra nake Roj û ji ronayîya wan a wek ronayîya Rojê mefadar nabe, kes guh nade wan".

(98) Nîzam: Dûzen, vêkxistin, vêkketin. Yanî "ew dûzen û vêkketin û vêkxistina ku ilm û hîkmet ji mirov dixwaze, kes wê dûzenê ranagire, kes qebûl nake ku jibo wê dûzenê bixebite".

(99) Nebû muyesser: Pêknehat, neçû serî, nehat cî.

(100) Nisfiyye: Bi însaf.
Pêlekê: Demek.
Emel: Kar, şixul.

(101) Tesfiyye: Safîkirin, paqijkirin.
Dexel: Qelp, nesafî, têkilhev, bihîle.

Qelbê me nekir qebûlê hîle
qet bo xerezê nebû wesîle(102)

Dîn çû, û neket bi dest me dînar
paşê ji neçarî bûyne seffar(103)

Sifrê xwe yê xef me eşkera kir(104)
Qirtasiye bû, me lê dua kir(105)

Dawet gerîya bi sidq îcabet(106)
bû wasiteê qezayê hacet(107)

Ev pol-i egerçi bêbuha ne(108)
yekrû ne û saf û bêbuha ne(109)

bêhîle û xurde, û temam in
meqbûlê muamela ewam in(110)

Kurmancîye sirf e, bêguman e(111)
Zêr nîne bibên "sipîde mane"(112)

Sifrê me yê sor e, aşîkar e
Zîv nîne bibên ku "kêm'eyar e"

---

(102) Wesîle: Wasite.
(103) Seffar: Sifirkar, kesê ku firaqên sifir çêdike.
(104) Xef: Veşartî, nepenî.
(105) Qirtasiye: Kaxid, rûpel. Li vir bi mana mecazî jibo sifirê neçêkirî hatîye karanîn. Yanî "sifirê me neçêkirî bû, hêj nehatibû çêkirin, wek kaxidekî saya yê nenivîsî bû".
(106) Dawet gerîya bi sidq îcabet: Dua bi rastî û durustî qebûl bû.
(107) Qezayê hacet: Pêkhatina îhtîyacê, ku îhtîyaca mirov bê cî.
(108) Ev pol: Mexsed ev eser e, ev pirtûk e, **"Mem û Zîn"** e. Wek ku pol ji paxir, ji sifir tên çêkirin, Xanî pirtûka xwe jî şibandîye bi wan.
Bêbuha: Bêrûmet, bênerx. Yanî "ji ber ku rûmetek ji wan ra tune, mirov neşê buha û nerxek li wan dayne".
(109) Saf: Paqij, safî, xalis, netêkilhev, nedexel, neqelp.
Bêbuha: Wisa rûmetbilind in ku çu buha û nerxek li wan nayê danîn, mirov nikare rûmeta wan bipîve û buhayek, nerxek li wan dayne, rûmeta wan ji hemî pîvek û buhayan û nerxan bilintir e.
(110) Meqbûlê muamela ewam in: Ji muamela gştî ra dibin, bi kar tên, jibo kirîn û firotina gştî kêrhatî ne. Mexsed ji "muamelê" karanîn e. yanî "pol çawa ji kirîn û firotina gştî ra dibin, ev pirtûka min jî ji karanîna gştî ra dest dide, ji karanîna gel ra dibe, jibo karanînê kêrhatî ye".
(111) Sirf: Safî, xalis.
(112) Sipîde: Sipî, gewr.

Neqdê me, mebêje "kêmbuha ye"
Bêsîkkeyê şahê şehrewa ye(113)

Ger dê bibuwa bi derbê menqûş(114)
ned'ma wehe bêrewac û mexşûş(115)

Mehbûb e, bi kes ne namizad e(116)
Lew bextesîyah û namirad e(117)

Qirtasîyeya me bêpenahan(118)
bê derbê qebûlê padîşahan(119)

ma'lûl e li ba gelek elîman(120)
meqbûl e li ba gelek hekîman(121)

*

Lê hakimê weqt-i, marîfetnak(122)
mesmû'i nekir bi sem'ê îdrak(123)

---

(113) Bêsîkke: Neçapkirî, madenê ku wek diravan nehatîye çapkirin û wisa li ser rewşa xwe maye. Mexsed jê ev pirtûk e, **"Mem û Zîn"** e.
Şahê şehrewa: Şahê ku li pêşîya hemî şahan e, şahê pêşrew, şahê şahan.

(114) Derb: Lêdan, lêxistin. Li vir mexsed jê çapkirina diravan e, ku mexsed ji wê jî dîsa ev pirtûk e û bi awayekî giştî edebîyat e.
Menqûş: Nexşkirî. Dema maden tên çapkirin û dibin dirav, li ser wan hin nexşên taybetî jî tên çêkirin.

(115) Bêrewac: Tiştê ku narewe, nabûre, derbas nabe.
Mexşûş: Têkilhev.

(116) Mehbûb: Evandî, tişt yan kesê ku tê evandin, tê hezkirin.
Bi kes ne namizad e: Ne li ser navê kesek e, bi navê kesek nehatîye nivîsîn û jibo kesek nehatîye pêşkêşkirin. Ji ber ku li gora tore û adetên wê demê, nivîskaran pirtûkên xwe li ser navên mîr û hukumdaran nivîsîne û ji wan ra pêşkêş kirine, Xanî weha gotîye; bi vî awayî daye zanîn ku **"Mem û Zîn"** li ser navê çu mîrek nehatîye nivîsîn û ji çu hukumdarek ra nehatîye pêşkêşkirin.

(117) Bextesîyah: Bextreş, bêtali', bêşans.
Namirad: Bêmirad.

(118) Bêpenah: Bêpalgeh, bêsipartek, bêpiştgir, kesê ku pala xwe nede cîyek yan kesek, kesê ku xwe nespêre cîyek yan kesek, kesê ku kes piştgirîya wî neke.

(119) Mexsed ji "derbê qebûlê padîşahan" ew sîkke û çapkirin e ku padîşah bi wê diravan qebûl dikin, madenê ku bi wê çapê bê çapkirin, êdî ji alîyê padîşahan ve wek diravan tê qebûlkirin û têwkirin.

(120) Ma'lûl: Nesafî, nesax, nepak.
Elîm: Zana, kesê têrzanîn, kesê ku gelek tiştan dizane.

(121) Hekîm: Kesê ku bi hîkmet û felsefê dizane.

(122) Hakimê weqt: Hukumdarê demê, mîrê zeman.
Marîfetnak: Xwedîmarîfet, zana, serwext.

(123) Yanî "bi guhê têgîhîştinê guh neda, ji dil guhdarî nekir".

Mîrê ku bi navê Mîrîza ye(124)
mehza nezera wî kîmîya ye(125)

qelbêd-i zexel diket belorî(126)
polêd-i dexel diket filorî(127)

sed bar-i hebin fulûsê ehmer(128)
derhal-i diket bi yek nezer zer(129)

e'layî diket bi qehrê, edna(130)
ednayî diket bi lutfê, e'la(131)

paşan digirit wekî esîran
aza diketin wekî feqîran(132)

her roj-i hezar-ı bênewayan(133)
her lehze bi lutfê, sed gedayan(134)

zengîn diketin bi destê hîmmet
hîkmet ew e naketin çu minnet

---

(124) Mîrîza: Mîrza. Nav "Mîrza" ye; lê jibo ku wezna helbestê neşike, tîpa "î" di vir da lê hatîye zêdekirin.
(125) Mehza nezera wî: Tenê nihêrtina wî, tenê mêzekirina wî.
(126) Zexel: Nesafî, sexte, sextekar, qelp.
Belorî: Tiştê camîn, tiştê ku ji cam hatîye çêkirin. Bi mana mecazî, jibo tiştê zelal û paqij ê wek cam jî tê gotin. Li vir jî wisa hatîye karanîn. Yanî "dilên zexel paqij dike, dike wek dilekî belorî".
(127) Filorî: Diravê zêrîn, zêrê çapkirî yê ku di kirîn û firotinê da tê karanîn.
(128) Fulûs: Piranîya "fuls" e, ew jî bi mana diravê paxirîn e, diravê ku ji paxir tê çêkirin.
Ehmer: Sor.
(129) Bi yek nezer: Bi yek nihêrtinek, bi yek mêzekirinek.
Zer: Zêrê zer.
(130) E'la: Tewr bilind, bilintirîn. Mexsed kesê rutbebilind e.
Edna: Tewr nizim, nizimtirîn. Mexsed kesê rutbenizim e. Yanî "kesên rutbebilind bi qehra xwe nizim dike, dadixe cîyê nizimtirîn û dike kesê nizimtirîn".
(131) Lutf: Qencî, çeyî. Yanî "kesên rütbenizim jî bi qencî û çeyîya xwe bilind dike, derdixe cîyê bilintirîn û dike kesên bilintirîn".
(132) Aza: Azad.
(133) Bênewa: Xizan, belengaz, bêhêz, bêtawan.
(134) Lehze: Gav, dema kurttirîn.
Geda: Xizan, parsek.

ger dê wî nezer bida me carek
îksîrê teweccuha mubarek(135)

ev qewl-i hemî dikir'ne eş'ar(136)
ev pol-i hemî dibûne dînar

Emma nezera wî zêde am e(137)
Lew xas-i nezer ji dil neda me(138)

Ew rehmetê xas e bo ewamê(139)
Ya Reb, tu bidî wî her dewamê!

Metbea "Cem'îyeta Tefaq û Qencîya Musulmana" tebi' bîye

---

(135) Îksîr: Maddeyeka efsanewî bûye, kîmyagerên berê bi hebûna wê bawer kirine û wisa zanîne ku ew dibe dermanê her derdî, her weha bi alîkarîya wê maddeyên madenî yên wek zêr û zîv û paxir û wd. ji hev tên cudakirin û ew dikare madenên kêmrûmet ên wek paxir û hesin biguhêre û bigêre madenên rûmetbilind ên wek zêr û zîv. Xanî, teweccuh û dostanî û nêzîkayîya Mîr Mîrza şibandîye bi îksîr û gotîye "eger wî carek li me binihêrta, ew nihêrtin û nêzîkayîya wî ya wek îksîr dê ev peyvên me gişt biguhartina û bigêrana helbest, wek ku îksîr polên paxirîn diguhêre û digêre zêr".

(136) Qewl: Peyv.
Eş'ar: Piranîya "şî'r" e, ew jî bi mana "helbest' e.

(137) Am: Giştî, jibo her kesî. Peyvik Erebî ye.

(138) Xas-i nezer: Nihêrtina taybetî, mêzekirina taybetî.

(139) Ewam: Giştî.

www.netewe.com

Eded 11 Sala ewwulî Rûper 1

Heçî vê kaxidekî rêke ji min re, divê ser kaxizî weha binivîse: "Bî Genève necl'ul-merhûm Bedirxan Paşa Ebdurrehman Beg"

*

Her car du hezar cerîdeya ez'ê rêkim Kurdistanê, de belaş bidin xelkê

KURDİSTAN

1315

Pazde roja de carekê têt nivîsandin cerîdeya Kurdî ye

Kürdleri tahsil-i ulûm ve fünûna teşvik eder nasayih ve edebiyat-ı Kürdiyeyi hâvî on beş günde bir neşrolunur Kürdçe gazetedir

Gazetenin mesleğine muvafık Arabça, Türkçe, Farisîce mektublar Kürdçeye bittercüme neşrolunur

Unvan: Genève'de **"Kürdistan"** Gazetesi Sahib ve Muharriri Bedirhan Paşazade Abdurrahman

*

Her tabı'da 2000 nüsha Kürdistan vülât-ı izamına irsal ve vesatetleriyle kura ve kasabâta neşr-ü tamim olunacaktır

*

Kürdistan haricinde her yer için senelik abone bedeli 80 kuruştur Kürdistan dahilinde hususî isteyenlere meccanen gönderilir

Roja pêncşembe 24 Remezan 1316 * Pencşembe fi 28 Kânun-ı Sanî sene 1314(1)

BÎSMÎLLAHÎRREHMANÎRREHÎM

WE'TESÎMÛ BÎ HEBLÎLLAHÎ CEMÎEN WE LA TEFERREQÛ(2)

Gelî Kurdno! Xwedê teala emir kirîye ku un hemî her bitefaq bin, tuca ji hev cuda nebin. Heger un her arî hev bikin, un'ê her halxweş bin. Nebêjin "ev Tirk e, ev ne Kurd e". Ev fikir mûcibê tefrîqe dibe.(3) Tefrîqe her mûcibê perîşanî ye. Loma Pêxember jî ferman kirîye: "Yedullahî mee'l-cemaet"; ango muaweneta Xwedê cem'îyetê de heye, ango Xwedê arî mirovên bitefaq dike.

(1) Li gora tarîxa Mîladî 10 Sibat 1899(Milâdî tarihe göre 10 Şubat 1899).

(2) Ev parçeyek ji ayeteka **Qur'anê** ye, mana wê weha ye: "Hemî xwe bi werîsê Xwedê bigirin û cuda mebin".

(3) Mûcibê tefrîqe dibe: Dibe semedê cudabûnê.

www.netewe.com

De vêca heger un îttîfaq bikin, un'ê wan me'mûrên zalim serê xwe bavêjin. Heger un îttîfaq nekin, un'ê binê zulmê de welat û dîn û namûsa xwe winda bikin. Ez bêjim we, ew me'mûrên Xunkar rêdike Kurdistanê, çawa tayîn dibin, çi fikrî de ne û çi dikin:

Xunkar bîst-sih hezar zêrekê rişwet ji wezîrekî distîne, dike Sedrê Azem. Paşê ew Sedrê Azem çend hezar zêrekê rişwet distîne, wezîra dike nazir.(4) Paşê paşayek hezar zêrekê rişwet dide Sedrê Azem, dibe mesela walîyê Dîyarbekrê. Ew walî, da heyfa wan perê dayî Sedrê Azem derîne, divê rişweta bixwe; heçîyê gelek rişwet da, wî dike muteserrif.(5) ew muteserrif jî, da heyfa wê rişweta dayî walî derîne, heçîyê gelek pera bide, wî dike qaîmmeqam. De vêca qaîmmeqam jî, heyfa perên dayî muteserrif, ji Kurdên reben distîne.

*

Ez'ê mîsalekê ji we re bêjim:

Ferz bikin ku Kurdistanê, Cizîrê de mirovek heye. Navê wî Mehmo ye. Ev Mehmo, pênc sed pezê wî, jin û zarûyên wî hene. Qaîmmeqam dibihîze ku Mehmo piçekê dewlemend e; zebtîyekî(6) rêdike ser wî, xeraca dewarên wî dixwaze. Mehmo xeracê dide. Zetbîye jî kaxizekî dide destê wî, ango ewî mirovî xeraca pez û dewarên xwe daye. Lakîn ew kaxiz ne rast e, saxte ye. Zebtîye wan pera diçe dide qaîmmeqamî. Qaîmmeqam paş heyvek dî zebtîyek dî rêdike mala Mehmo, xeraca dewarên wî dixwaze. Mehmo dibêje "berî heyvekê min xeraca pezê xwe da" û kaxiza destê xwe nîşan dike. Zebtîye dibêje "ev ne tu kaxiz e, tu vira dikî, zû xeraca xwe bide". Mehmûd(7) nade, israr dike. Çunkî rebenî berî heyvekê çi qa deynê wî hebe daye. Zebtîye diçe dibêje qaîmmeqam. Qaîmmeqam wî halê Mehmo dike wesîle,(8) çend zebtîyekî rêdike ser wî, bi kutekê Mehmo tînin dikin hebsê de. Mehmo çend zemanekî hebs dimîne, jin û zarûyên wî digirîn, xanîyê wan dibe matemxane.(9)

Paş zemanekî Mehmoyê reben bêçare dimîne, qaîmmeqam mirovek rêdike nik dizî ve.(10) Ew mirov dibêj'ê "heger tu pêncî zêrekê bidî min, ez karim te xilas bikim". Mehmo pênce zêra dide wî mirovî, ew mirov wan pera dibe dide qaîmmeqam, Mehmo ji hebsê xilas dike. Lakîn ji xeyrê wan pêncî zêra, xeraca pezê wî jî carek dî jê distîne. Mehmo vedigere mala xwe. Lakîn zemanê mayî hebsê de nekarî dexlê xwe biçîne, nekarî pezê xwe, şîrê xwe bifiroşe, nekarî eşyayên lazim bikire. Loma, wê salê gelek zîyan dike; ji wî sebebî, heçku du sed zêrekê winda dike.

---

(4) Nazir: Wezîr, kargêrê ku beşek ji karên dewletê îdare dike, digêre. Ev peyvik tenê di dewra Osmanîyan da bi mana "wezîr" dihat karanîn.

(5) Li jêrenota 39'an a jimareya 7'an binêrin.

(6) Zebtîye: Wezîfedarê ewletîyê, kesê ku wezîfa ewletîyê tîne cî, wek polês û cendirman. Ev peyvik di dewra Osmanîyan da dihat karanîn.

(7) Nivîskar bi piranî navê vî zilamî "Mehmo" nivîsîye, lê çend car jî bi awayê "Mehmûd" nivîsîye.

(8) Wesîle: Destik, behane, semed.

(9) Matemxane: Şînxane, cîyê şînê, xanîyê ku tê da şîn tê danîn.

(10) Yanî "mirovek bi dizî rêdike nik wî, zilamek bi dizî dişîne bal wî".

De vêca heta qaîmmeqam pêncî zêra distîne, Mehmo sê sed zêra sala ewil winda dike. Paş salek dî, destê Mehmo de pere namînin. Loma, nikare wê ziftanê pezê xwe xwedan bike.(11) Ji pênc sed pezên wî, sê sed ji birça dimirin. Salek dî dîsa zebtîye tê, xeraca dewarên wî jê dixwaze. Vêca Mehmo, pere nînin, da xeracê bide. Zebtîye pêncî pezekê jê distîne dibe bajêr, erzan difiroşe. Paş salek dî ji dostek xwe deyn dike, lewazimatên(12) mala xwe, dewarên xwe peyda dike. Lakîn paşê nikare deynê xwe bide. Ew xwe hinek pez difiroşe, deynê xwe dide. Destê wî de sê sed pez dimînin.

Qaîmmeqam ezil dibe.(13) Çunkî mirovek dî rişwet dide muteserrif. Loma, muteserrif qaîmmeqamê berê ezil dike, yê nû datîne şûn'ê. Qaîmmeqamê nûhatî, dibihîze Mehmo sê sed pez heye; sebebekî dibîne, Mehmo tîne dike hebsê de. lakîn çiku(14) vêca Mehmo elimîye çawa ji hebsê mirov xilas dibe, çend rojek dû re Mehmo lawê xwe an birayê xwe rêdike nik mirovê qaîmmeqam, pêncî zêrekê dide wî mirovî, Mehmo ji hebsê xilas dibe. Lakîn vê carê, Mehmo pereyê hazir tunînin; loma, hemî pezê xwe firot, heta ew pêncî zêr peyda kir. Mehmo vedigere mala xwe. Lakîn desta de tu dewar namîne; feqîr dibe, jar dibe. Her sal zebtîye têt, xeraca xanîyê wî jê dixwaze. Lakîn çiku Mehmo pere nînin, perên stûyê jin û keça wî de(15) hildike dibe. Wekî ew jî nema, sîtila mala wî dibe difiroşe.

De vêca Mehmo êkcar feqîr dibe, tu tişt desta de namîne. Eve ew Mehmoyê berî çend salekê hinde halxweş, hew qas perîşan dibe; nanî nabîne ne ew bixwe, ne bide zarûyên xwe. Zarûyên wî ji birça, ji serma nesax dikevin, jar û perîşan dibin. Hinga Mehmûd dewlemend, çend mirovek şivan û gavan binê destê wî de xizmet dikirin, nanek, dewek(16) ji xwe re peyda dikirin. Lakîn çiku Mehmûd tu pez nema, îzin da wan mirova; ew jî bêeyş û emel,(17) reben man. Heger Mehmûd dewlemend bimaya, wê lawê xwe jin bikira,(18)wê keçên xwe bida mêr. Lakîn çiku feqîr ket, ji dest nayê. Eve ji wî sebebî, nufûsa Kurdistanê kêm ma.

*

Gelî Kurdno! Me'mûrên hukumet rêdike gund û welatên Kurdistanê, exleb ho ne.(19) Ew me'mûr, tedrîcî(20) welatê we xirab dikin; we ha ji xwe nîne. Ev mîsala min hire nivîsî, bînin ber çavên xwe; wê hingê un'ê bizanibin un çi halî de ne, un binê çi zulmek mezin de ne.

(11) Xwedan bike: Xwedî bike.
(12) Lewazimat: Tiştên lazim, tiştên pêwîst.
(13) Ezil dibe: Ji wezîfeyê tê derxistin, ji kar tê avêtin, wezîfe ji destê wî tê standin.
(14) Çiku: Ji ber ku, çima ku, çi ye ku.
(15) Yanî "zêrên ku di stûyên jina wî û keça wî da ne, zêrên ku wan bi ben ve kirine û avêtine stûyên xwe".
(16) Dewek: Ev peyvik di eslê rojnamê da baş nehatîye çapkirin û baş nehat xwendin. Dibe ku weha be, dibe ku tiştekî wek "xurek" be.
(17) Bêeyş û emel: Bêjîyan û kar.
(18) Jin bikira: Bijin bikira, jê ra jin banîya, ew bizewicanda.
(19) Exleb ho ne: Bi piranî weha ne, piranîya wan weha ne.
(20) Tedrîcî: Bere bere, hin bi hin, pêplûk bi pêplûk, gav bi gav.

Gelî ulemayên Kurda! Un çire dengê xwe hilnaynin, devê xwe venakin! Un alim in, un dizanin Pêxember, eleyhîsselatu wesselam, ferman kirîye: "We la yekûnu'l-mer'u alîmen hetta yekûne bî îlmîhî amîlen".(21) De vêca, heger un bi ilmê xwe rîya qenc nîşanê cahila nekin, çi faîda ilmê we dimîne! Rebenîya wan cahila ji we mes'ûl e.(22) Un dibînin ku me'mûrên zalim tên, xeracê du-sê cara ji rebenekî dixwazin, heger perên wî tunebit sîtila wî ji dest distînin. Ew perê holê hasil dikin,(23) hemî mesrûfê zewq û sefaheta me'mûrên zalim dibin. Ji wan pera welatê we mamûr(24) nakin. Un hemî qurbana mitirbên dor Xunkar dibin; un zanin ku ew pere dikevin destê casûsên Ebdulhemîd.

Gelî mîr û axayên Kurda! Un van hala hemîya dibînin; un çire huqûqê mirovên binê destê xwe muhafeze nakin! Ma un nizanin ku qencîya wan qencîya we ye jî! Ma un nizanin ku heger ew zeîf man, un jî zeîf bibin! Un tenê serê xwe nikarin tiştekî bikin. Lakîn heyfa min têt ku mîr û axayên Kurdistanê, meclûbê(25) îltîfata mitirbên dor Xunkar bîne; exlaqê wan jî hingî diçe xirab dibe; ser çend perikê(26) Ebdulhemîd, irz û namûsa xwe difiroşin; ser selteneta du rojê dinyayê, zarûyên xwe nav sefaletek musteqbel(27) dihêlin; axreta xwe xeyb dikin.(28)

*

Xwedê teala ferman kirîye: "Tu cara casûsîya hevdû nekin, derheqê hev de xirabîyê nebêjin". Lakîn perên Ebdulhemîd fesad kirîye nav we, un hemî bîne neyarên hevdû; her yek ji we dixebite hevalê xwe mehw bike. Bi wî sûretî(29) roj roj un mehw û perîşan dibin, neyar li we dikenin.(30) Me'mûrên serê we ji vî halî îstîfade dikin. Kurdên binê destê we fîdayê vî halê we dibin. Huqûqa hew qas mirova ji we mes'ûl e.

Gelî ulemano! Un zanin ku Pêxember, eleyhîsselatu wesselam, ferman kirîye: "Men keteme îlmen îndehu, elcemehullahu bî lîcamîn mîn nar". Mana vê hedîsa şerîf: Hemî alimê dibîne ku xîlafê Şerîetê muamele dibit, heger deng neket, Xwedê teala lixabek(31) ji agirî dike deva de.

---

(21) Mana vê hedîsê weha ye: "Heta ku mirov li gora ilmê xwe tevnegere û tevgerên xwe li zanîna xwe neyne, mirov nabe alim, zanyar".

(22) Ji we mes'ûl e: Ji we tê pirsîn.

(23) Hasil dikin: Bi destê xwe dixin.

(24) Mamûr: Ava.

(25) Meclûb: Kişandî, kêşayî, kes yan tiştê ku bi alîyê kesek ve yan tiştek ve tê kişandin, ber bi wî kesî yan tiştî diçe û xwe ranagire.

(26) Perik: Diravên zêrîn û zîvîn ên ku qulp bi wan ve dikin û bi enîyên keç û jinan ve tên daleqandin yan jî keç û jin wan davêjin stûyên xwe. Li vir mexsed ew nîşan û madalya ne ku Evdilhemîd dane hin malmezinên Kurdan.

(27) Musteqbel: Hatî, tiştê ku di pêşedemê da dê rastê mirov bê.

(28) Xeyb dikin: Winda dikin, berze dikin, ji destê xwe berdidin.

(29) Sûret: Awa.

(30) Awayê rast, "bi we dikenin" e.

(31) Lixab: Bizm, gem, bizmê ku li devê hespan tê xistin.

Gelî ulemano! Şarîya xwe bikin,(32) nebin masedeqê(33) vê hedîsa Pêxember; rîya qenc a we kitêbên şerîf de xwendî, nîşanê nezanya(34) bikin. Ew muhtacê ilmê we ne; mîr û axa û ulema jî muhtacê qeweta wan in. Divê un hemî arî hev bikin; ulema rîya qenc nîşanê cahila bikin, mîr û axa hemî bikevin pêşîya mirovên xwe, hemî bitefaq bin. Musulmanî ho dibit. Hew qas ayatê(35) kerîme, ehadîsê nebewîye(36) Xwedê û Pêxember ferman kirine. Ev emrên ha hemî ser seadeta însanî ye. Heçîyê pê wan emel kir, mueyyen wê dinê û axretê mes'ûd be; heçîyê emel nekir, dinê de jar û perîşan dibe, axretê rûsîn(37) dimîne; heger ew xwe dinê de sefîl nebî, muheqqeq ewlad û ehfadên(38) wî bela babê xwe dikişînin.

GİRÎD

Min cerîda berê de behsa Girîdê piçekê nivîsîbî. Eve Girîd, ew memleketê hinde xweş, ew welatê hinde bereket, nîhayet(39) ji destê Musulmana derket. Eskerê me eskerê Yunan şikandin; lakîn Xunkarê me, ji tirsa xwe û bi teşwîqa mitirbên dor xwe civandî, nekarî huqûqê xwe muhafeze bike. Loma lawê Xunkarê wan, bî walîyê Girîdê. Hingî ew bî walî, Girîd yekcar ji destê me derket; wê derê gelek Musulman hatin kuştin, irz û namûsa wan qurbana zulma Ebdulhemîd bî.

Berî Girîdê gelek welatên dî ji destê me derketin.(40) Hingî ev Xunkar hatî ser textî, roj û roj memleketê me(41) qeweta xwe xeyb dike; eve bîst sal e gelek kêm bî; heger ev hal dewam bike, wê gelek kiçiktir, zeîftir bibe; dor'ê bê Kurdistanê jî.

Vêca her yekê divê muhafeza welatê xwe bike. Muhafeza Kurdistanê ser Kurda deyn e; ew deyn jî li ser ulema û mîr û axa ye. Sebeba perîşanî û îzmîhlalîya(42) welatekî, gunehek mezin e. Heger Kurda hîşt ew me'mûrên serê wan dewamê zulmê bikin, Kurdistan jî zemanek hindik de wek Girîdê dibe. Ewil bi ewil(43) divê Kurd xwe ji binê zulma wan me'mûra derêxin; yanî Kurd hemî cemi' bibin,(44) wan me'mûra ji Kurdistanê derêxin.

(32) Şarîya xwe bikin: Xwe hişyar bikin.
(33) Masedeq: Kes yan tiştê ku peyvek li wî tê, peyvek li rewşa wî tê, ew dibe li gora wê peyvê, rewş û tevgera kesek ku dibe li gora peyvek û ew peyv li wê rewşê û tevgerê tê.
(34) Awayê rast, "nezanan" e.
(35) Ayat: Piranîya "ayet" e.
(36) Ehadîsê nebewîye: Hedîsên Pêxember.
(37) Rûsîn: Rûtîn, rût û zilût, bêxêr û sewab.
(38) Ehfad: Piranîya "hefîd" e, ew jî bi mana "nevî" ye.
(39) Nîhayet: Di paşîyê da, di dûwayîyê da.
(40) Yanî ji destê Osmanîyan derketin. Ji ber ku Kurdistan jî hingê di binê destê dewleta Osmanî da bûye û beşek ji wê hatîye têwkirin, nivîskar weha gotîye.
(41) Memleketê me: Welatê Osmanî, împeratorîya Osmanî.
(42) Îzmîhlalî: Awayê rast "îzmîhlal" e, ew jî bi mana "tunebûn, rabûna ji meydanê, windabûn û berzebûn" e. Yanî "ku mirov bibe sebebê perîşanî û tunebûna welatek, mirov wisa bike ku ew welat perîşan bibe û tune bibe".
(43) Ewil bi ewil: Berê berê, berî her tiştî, di pêşîya hemî karên dî da.
(44) Cemi' bibin: Bicivin, kom bibin.

HELAKU UMMETÎ MÎN ALÎMÎN FACÎR WE ABÎDÎN CAHÎL WE ŞERR'UL-EŞRARÎ ŞÎRAR'UL-ULEMA' WE XEYR'UL-XİYARÎ XİYAR'UL-ULEMA'

Hezretê fexrê alem(45) eleyhîsselatu wesselam, gotîye: "Alimê fasiq û facir(46) û abidê(47) cahil, dibe mûcibê helaka ummeta min; û mirovê ji hemîya qenctir, alimê emelqenc e".(48)

Gelî ulemano! Ji vê hedîsa Pêxember, eleyhîsselam, malûm dibe ku, heger alimê facir, yanî ew mirovê ku xwenda ye, ya Xwedê û Pêxember emr û nehî kirî dizane, qencî û xirabîyê ji hev ferq dike, rîya Şerîetê nîşanê me kirî nas dike; facirîyê bike, mûcibê înqîraza(49) miletê xwe û helaka ummeta Musulmana dibe. Meazellah, ji vî gunehî xirabtir tiştek nabe. Loma ku dîsa wê hedîsa şerîf de serwerê enbîya dibêje ku "dîn de mirovê alim û fasiq(50) ji hemî kesî xirabtir e". Çunkî xirabîya alim dike, mirovê cahil nikare. Loma, Mewlana Celaleddînê Romî(51) kitêba xwe de gotîye:

"Bedguher ra ilm û fen amûxten
dadenî tîxî be destî rahzen".(52)

Yanî talîma(53) mirovê bedexlaq,(54) wek dana şîrekî ye destê dizekî. Çunkî ilm û huner qewet û îqtîdar e.(55) Heger mirov bedexlaq be, wê ilm û hunerê sûê îstî'mal dike;(56) û bîl'ekis heger ew mirov sahibê exlaqê qenc be, bîtte-

(45) Fexrê alem: Pesnê alemê, kesê ku alem pê dipesine û îftîxar dike. Ev pesin tenê jibo Pêxember tê gotin.

(46) Fasiq û facir: Kesê ku ji rîya durust û rast derkeve, kesê avarê, kesê ku ji heqî û rastîyê avarê bibe, kesê gunehkar û xirab. Mana her du peyvikan yek e.

(47) Abid: Kesê îbadetkar, kesê ku tim ji Xwedê ra îbadet dike.

(48) Emelqenc: Karqenc, kesê ku karê qenc û baş dike.

(49) Înqîraz: Hilweşîn, herivîn, belavbûn, tunebûn, windabûn, berzebûn, rabûna ji meydanê.

(50) Yanî mirovê ku alim be û fasiq be jî, alimê ku fasiq be.

(51) Mutesewwifekî navdar e, sazkarê terîqeta Mewlewî ye. Di sala 1207'an da li Efxanistanê di bajarê Belxê da hatîye dinê. Paşê çûye Anadolê û li bajarê Qonyayê bicî bûye, li wir terîqeta xwe saz kirîye û di sala 1273'yan da li wir wefat kirîye. Navê pirtûka wî ya navdar a ku wî bi zimanê Farisî nivîsîye, "**Mesnewî**" ye.

(52) Mana van her du malikan weha ye:

"Fêrkirina xwîxiraban a zanînê û huneran
dişibe dayina şûr bi destê rêbirran".

(53) Talîm: Fêrkirin.

(54) Bedexlaq: Exlaqxirab, kesê ku exlaqê wî xirab e, kesê bêexlaq.

(55) Îqtîdar: Tawan, şîyan, hêza pêkanîna karek, ku mirov bişê karek pêkbîne, ew hêza mirov hebe, mirov wê şîyanê bidêre.

(56) Sûê îstî'mal dike: Xirab bi kar tîne, jibo amancên xirab bi kar tîne.

bi'(57) wê qewet û îqtîdarê husnê îstî'mal dike(58) û dibe mirovê ji hemîya xêrtir. Çunkî saya ilmê xwe, ji hemî kesî zêdetir dikare qencîyê bike. Lakîn sûretê ewil de ji hemî kesî xirabtir e. Çunkî bi ilmê xwe dikare gelek xirabîyê bike. Loma Pêxember eleyhîsselam weha gotîye.

Û abidê cahil jî muzirê(59) milet e. Çunkî tu tişt wek cehlê(60) hadimê(61) dîn û dewlet nabe. Yanî cehl hew qas xirab e ku, heger mirovê cahil abid be jî, dîsa mileta wî nikare xwe ji zerera wî hifz û hîmaye bike. Wekî em tarîxa alemê dixwînin, em dibînin ku hemî zemana de miletên cahil mexlûbê miletên alim bîne. Tu cara cem'îyetek(62) cahil paydar nabe.(63) Loma heger azayên(64) miletekî cahil in, her çi qas abid û sacid(65) in jî dîsa ew milet zemanek hindik de helak dibe; hasilê îmkan nîne, paydar nabe. Ehwalê sabîqe(66) yê miletên bûrîn hemî, vê hedîsa Pêxember tesdîq dike.

*

Vêca gelî ulemayên Kurda! Un dibînin ku hinde ayet, hinde hedîs, hinde ehwalên mazîye(67) hemî î'lam dikin(68) ku, heger un halê xwe de dewam bikin, un'ê zemanek hindik de munqeriz bibin.(69) Çunkî un alim, pê ilmê xwe emel nakin. Xizmeta Pêxember û milet ji we întîzar dike,(70) ne hema sewm û selat e;(71) ewil bi ewil divê mirov esbabê beqa miletî(72) îkmal bike. Heger ne, dijmin'ê bêt milkê we ji we bistîne. Wê hingê un nikarin selata eda bikin, zarûyên we jî paş çend salekê dînê xwe jî winda bikin. Me'mûrên serê we zalim, hadimên mileta we ne; heta ku un wan ji serê xwe navêjin, heta ku un wan dijminê milet ji welatên xwe terd û teb'îd nekin,(73) îbadeta we ne meqbûl e. Çunkî un dizanin ku weqtê şerî de ne caîz e mirov şîrê xwe dane

(57) Bîttebi': Tebîî, bi awayekî tebîî, jixwe.
(58) Husnê îstî'mal dike: Baş bi kar tîne, jibo amancên baş bi kar tîne.
(59) Muzir: Zirarde, zîyande, kes yan tiştê ku zirar dide, zîyan dide.
(60) Cehl: Nezanî, cehalet.
(61) Hadim: Wêrankar, tişt yan kesê ku avayîyek wêran dike, hildiweşîne.
(62) Cem'îyet: Koma mirovên ku bi tiştên wek ziman û çande û toreyan wek hev in û pêkve dijîn, yeker in, komel. Hin maneyên dî jî ji peyvika "cem'îyet" ra hene, lê li vir mana wê ev e.
(63) Paydar nabe: Li ser lingan namîne, tim najî, nabe xwedîyê jîyaneka timî.
(64) Aza: Lebat, endam, ferdên milet, ferdên netewe.
(65) Sacid: Secdebir, kesê ku ji Xwedê ra secde dibe, diçe secdeyê.
(66) Ehwalê sabîqe: Rewşên buhurî, rewşên derbasbûyî, rewşên ku derbas bûne.
(67) Ehwalên mazîye: Rewşên buhurî, rewşên derbasbûyî.
(68) Î'lam dikin: Didin zanîn.
(69) Munqeriz bibin: Hilweşin, biherivin, belav bibin, tune bibin, winda bibin, berze bibin, ji meydanê rabin.
(70) Întîzar dike: Dipê.
(71) Sewm: Rojî.
Selat: Nimêj.
(72) Esbabê beqa miletî: Rê û awa û wasiteyên mayina netewe, rê û awa û wasiteyên ku bi alîkarîya wan netewe dimîne, dijî, jîyana xwe didomîne.
(73) Terd û teb'îd nekin: Neqewitînin û dûr nexin.

û biçe îbadetê bike; çunkî paşê dijmin'ê xelebe bike.(74) Ewil bi ewil kuştina dijminî lazim e. Halê nuho ev milet tê de, zemanê fetret e;(75) heçku un nuho şerî de ne.

Saya ilmê xwe un dizanin xizmetên qenc bikin. Heger un nekin, un dibin ulemayên fasiq; yanî sebeba înqîraza milet; un dinya û axreta xwe winda dikin; hew qas efradê milet qurbana seyyiata(76) we dibe; un'ê çawa xwe ji binê wî gunehî derînin. Hingî destê we hat xîret bikin, mekteb û medresa vekin, mirovên cahil talîm bikin. Belkî ji nav wan, mirovên sahibhîmmet zuhûr biket; saya hîmmeta wan Kurdên reben ji binê zulmê derkevin. Ez her cerîda xwe dibêjim, eve dîsa tekrar dikim: Heger ev cehla cahilên Kurda û heger ev meskeneta(77) ulemayên wa dewam bike, Kurdistan'ê bikeve destê neyara de.

Fekirin, Ermenî çi qas sahibhîmmet û xîret in. Ew jî wek Kurda mezlûm in; lakîn hurîyeta(78) xwe re xwe fîda dikin. Cahilên Kurda nezan in, Ermenîya dikujin. Ev hal Kurda re gelek xirab e. Divê ulema bêjin Kurda ku ev hal qatilî ye. Divê Kurd xwe ji wî gunehî muhafeze bikin. Divê Kurd jî Ermenîya re bîl-îttîfaq(79) me'mûrên zalim ên Xunkar rêdike serê we, bavêjin. Şûna un biçin îmdada Ermenîyên mezlûm, un diçin wan dikujin. Ew hal gelek guneh e û gelek fehêt e; Xwedê û Pêxember ji vî halî ne razî ne. Xwedê teala kitêba xwe de ferman kirîye: "We îzzî we celalî îlx.".(80) Yanî "ez bi îzzet û celala xwe qesem dikim(81) ku, ewê mezlûmekî bibîne û neçe îmdada wî, ez'ê heyfa xwe jê bistînim".

Gelî Kurdno! Vê ayetê bixwînin û ji kuştina Ermenîya hezer bikin.(82) Çunkî ew mezlûm in; divê un biçin îmdada wan; elelxusûs(83) ku un jî wek wan mezlûm in.

---

(74) Xelebe bike: Xalib bê, zorbir bibe, zora mirov bibe.

(75) Fetret: Dewra vala ya ku di navbera dewrên du Pêxemberan da derbas dibe yan jî di navbera dewrên du mîran da derbas dibe. Li vir mexsed mana 2'yan e.

(76) Seyyiat: Xirabî, gunehkarî.

(77) Meskenet: Miskînî, bêkêrî, bêxêrî, sistî.

(78) Hurîyet: Azadî.

(79) Bîl-îttîfaq: Bi tevayî, bi tefaq, bi hevkarî.

(80) Îlx.: Ev kurta peyvikeka Erebî ye, temamê peyvikê "îlaaxirîhî" ye. Yanî "heta paşîya wê peyvê". Dema ku mirov bixwaze peyveka dirêj kurt bike û kurt bibirre, hingê mirov vê peyvikê bi kar tîne.

(81) Yanî "ez bi mezinatîya xwe sond dixum".

(82) Hezer bikin: Xwe biparêzin, xwe dûr bidin, xwe dûr bigirin.

(83) Elelxusûs: Xasma.

MÎR MİHEMED BÎN MÎR MİHEMED(84)

Paş wefata Mîr Mihemed,(85) lawê wî Mîr Mihemed çû nik Sultan Murad Xan. Sultan Murad xil'et da'yê û ba ferman îmareta Cizîrê da'yê.(86) Mîr Mihemed pênc sala hukumetê kir û sala neh sed û not û yekê de(87) wefat kir.

EMÎR EZÎZ BÎN EMÎR KEK MİHEMED

Paş Mîr Mihemed, îmareta Cizîrê gîha kurê mamê wî Emîr Ezîz. Wexta ku Wezîr Osman Paşa sala neh sed û not û şeşê de(88) çû ser Îranê, ewî Emîr Ezîz ezil kir. Emîr Ezîz muddetekê ji Cizîrê derket, çû Sincarê(89) rûnişt. Lakîn paş zemanekî hinek esker ve hat ser Cizîrê; gelek şer bî, xwîn rija. Mîr Hawind(90) Cizîrê de şûna wî îmaret dikir. Ewî Mîr Hawind idam kir; lakîn ew xwe jî wî şerî de hat kuştin.

MÎR MİHEMED BÎN MÎR EBDAL

Zemanê Mîr Hawind, hukumeta Cizîrê de gelek îxtîlal(91) hebî. Lakîn paş şerê Mîr Hawind û Mîr Ezîz, ew îxtîlal zaîl(92) û nesla her duya jî munqeti' bî.(93) Paş wan, dîsa ji sulala emîra Mîr Mihemed bîn Mîr Ebdal bî Mîrê Cizîrê. Lakîn çiku qenc îdareê hukumet nekir,(94) ezil bî û Emîr Şeref bîn Xan Ebdal ket şûna wî.

---

(84) Ev, despêka beşekî dî ye ji dîroka Mîrên Botan.

(85) Di eslê rojnamê da ev nav "Bir Mihemed" hatîye nivîsîn. Me ew bi awayê rast "Mîr Mihemed" nivîsî.

(86) Xil'et: Di dewra Osmanîyan da tewirek xeftan bûye, padîşahên Osmanîyan ew dane kesên nêzîkê xwe, bi wî awayî ew dilşa kirine.
Ba ferman: Bi ferman, digel fermanê.

(87) Li gora tarîxa Mîladî, 1583.

(88) Li gora tarîxa Mîladî, 1587.

(89) Sincar: Şengal.

(90) Dibe ku awayê rast "Hevind" be.

(91) Îxtîlal: 1-Şoriş, rabûna gel li dijê hukumetê bi amanca wergerandina wê. 2-Têkilhevî, bêdûzenî. Li vir mexsed maneya 2'yan e.

(92) Zaîl: Tiştê ku ji holê radibe, tune dibe, dûwayî lê tê, diqede. Yanî "ew têkilhevî qedîya, dûwayî lê hat".

(93) Munqeti' bî: Qut bû, birîya, hat birrîn.

(94) Çiku qenc îdareê hukumet nekir: Ji ber ku qenc kargêrîya hukumetê nekir, karên hukumetê qenc negerand, qenc îdare nekir.

(95)

Nexmê we ji perdeyê derînim(96)
Zînê û Memê ji nû vejînim(97)

Ma'lûl-i bûyin hebîb û aşiq(98)
îro he wekî tebîbê haziq(99)

derman bikim ez ewan, dewa kim(100)
wan bêmededan ji nû ve rakim(101)

Derdê di dilê Memê cegerrîş(102)
Zîna ji derûnê dil cefakîş(103)

wê perdegeya efîfe, mestûr(104)
wî bêgunehê ji tuhmetê dûr(105)

meşhûr-i bikim bi terz û uslûb(106)
mumtaz-i bibin muhibb û mehbûb(107)

---

(95) Ev beşê jêrîn, beşekî dî ji **"Mem û Zîn"**ê ye. Beşê berî vî beşî di jimareya 10'an da derketîye. Ji ber ku ew jimare di dest da tune, xwendevanên rojnamê nikarin wî beşê **"Mem û Zîn"**ê bixwînin.

(96) Nexme: Dengê ku di dema stranê da ji gewrîya dengbêj derdikeve, dengê taybetî yê stranê.

(97) Vejînim: Careka dî bigîhînim jînê, careka dî gîyanî bikim, jîndar bikim.

(98) Ma'lûl: Nesax, nexweşok,

(99) Tebîbê haziq: Doktorê jêhatî, doktorê ku dikare nexweşan baş derman bike û bigîhîne saxîyê.

(100) Dewa kim: Tedawî bikim.

(101) Bêmeded: Bêçare, bêhavil, neçar.

(102) Cegerrîş: Cegerkul, kesê ku rîş di cegera wî da hatîye, cegera wî kul bûye û kul girtîye, rîş girtîye.

(103) Cefakîş: Cefakêş, a ku cefa kişandîye, azar dîtîye. Peyvik di eslê xwe da "cefakêş" e, lê belê jibo ku li qafîya malika berîn bê, "cefakîş" hatîye nivîsîn.

(104) Perdege: Keç yan jina pişтperde, peyperde, perdekirî, ya ku xwe nîşanê mêrên bîyanî nade.
Efîfe: Keç yan jina namûskar, a ku ji alîyê exlaqî ve paqij e.
Mestûr: Nuxaftî, perdekirî.

(105) Tuhmet: Derewa ku li kesek tê kirin, îftîra.

(106) Terz û uslûb: Awayê nivîsînê, awayê salixdanê, awayê qalkirinê.

(107) Mumtaz bibin: Kifş bibin, bên naskirin, bên bijartin.
Muhibb: Evindar, dildar, aşiq.
Mehbûb: Evandî, dilbir, keça ku tê evandin.

ew reng-i bikim ji nû serefraz(108)
da bêne temaşeyê nezerbaz(109)

dîlber li Memê bikin girînê
aşiq bikenin bi derdê Zînê

hemderd-i bikin bi wan sefayê(110)
bêderd-i bikevne helwelayê(111)

xelqê ku ji sîne û ji dil saf(112)
pakîzesirişt û ehlê însaf(113)

bîlcumle bikin jibo me tehsîn(114)
bêjin ku "bi qencî hate tedwîn"(115)

Xelqê ji "yuhîbbuhum", dîgergûn(116)
herçî ji ezel bûyî "yuhîbbûn"(117)

---

(108) Ew reng: Bi wî awayî, bi awayekî wisa ku.
Serefraz: Serfiraz, serbilind.

(109) Nezerbaz: Awirbaz, kesên ku awirên wan wek awirên teyrê baz in, wek teyrê baz tûj dinêrin.

(110) Hemderd: Hevderd, hevalên derdan, kesên ku bi eynê derdan derdedar in, eynê derd hatine serê wan jî.
Sefa: Kêfxweşî, dilşayî, heng.

(111) Helwela: Gotina "la hewle we la quwwete îlla billah", ku mirov kêfnexweş û xemgîn bibe, derd û kul bên serê mirov û mirov ji neçarî bêje "la hewle we la quwwete îlla billah". Yanî "kesên bêderd jî dê ji ber derdê Memê û Zînê xemgîn û derdedar bibin û ji neçarî wisa bêjin".

(112) Sîne: Sîng.

(113) Pakîzesirişt: Xwîpaqij, kesê ku bi xwî û tebîetê xwe pak û paqij e, xirabî û dilreşî di xwîyê wî da tune.

(114) Tehsîn: Qencdêran, ku mirov karek yan tiştek qenc û baş bidêre, baş têw bike û qala wî bi qencî û bi başî bike.

(115) Tedwîn: Berhevkirin û nivîsîn, ku mirov tiştekî wek çîrokek yan jî wek dastanek ji nava gel berhev bike û binivîse; wek ku Xanîyê nemir **"Mem û Zîn"** berhev kirîye û nivîsîye.

(116) Yuhîbbuhum: Ev peyvikek ji ayeteka **Qur'anê** ye, mana wê "wan dievîne" ye. Mexsed ji wan ew kesên qenc in ku Xwedê wan dievîne û ji wan razî ye. Yanî kesên qenc û baş û xêrxwaz û dilpak.
Dîgergûn: Guhartî, kes yan tiştê ku bi alîkarîya dermanek yan karek diguhere û ji rewşa xwe ya berîn derdikeve, dikeve rewşeka dî. Yanî "ew kesên ku Xwedê wan dievîne û ji ber wê evînê guherîne, bûne mirovên qenc û baş û xêrxwaz û dilpak".

(117) Yuhîbbûn: Ev peyvikek ji ayeteka **Qur'anê** ye, mana wê jî "dievînin" e. Mexsed dîsa ew kes in ku di malika berîn da qala wan hat kirin. Di wê ayetê da tê gotin "Xwedê wan dievîne û ew wî dievînin".

da bên û bikin hîkayetê gûş(118)
hindek bikirin xwe pê feramûş(119)

hindek bikirin bi can semaê(120)
hindek bikirin ji dil wedaê(121)

*

Lê hêvî dikim ji musteîdan(122)
herfan negirin li mustefîdan(123)

Ev name eger xirab e, ger qenc
kêşaye digel wê, min du sed renc(124)

Nûbawe ye, tifl e, nûresîd e(125)
her çend-i nehin qewî guzîde(126)

Lê min ji rezan nekir temettu'(127)
manendê dizan bi kes tetebbu'(128)

---

(118) Bikin hîkayetê gûş: Guh bidin çîrokê, li çîrokê guhdarî bikin.
(119) Feramûş: Kesê ku bilîyê tiştek yan karek dibe û tiştên dî ji bîr dike, haya wî ji tiştên dî namîne.
(120) Semaê: Guhdarî, guhdan.
(121) Bikirin ji dil wedaê: Ji dil xatir bixwazin.
(122) Musteîd: Kesê têrzanîn, kesê pirr zana.
(123) Mustefîd: Şagird, xwendekar, kesê ku nû dest bi xwendinê kirîye. Xanî li vir xwe şibandîye bi şagirdek û ji kesên zana hêvî kriîye ku herfan li wî negirin, yanî lê şaş negirin û şaşîyên wî eşkera nekin. Wek ku eşkera ye, Xanîyê nemir bi wî awayî nefsbiçûkî kirîye.
(124) Renc: Azar, ezîyet, zehmet.
(125) Nûbawe: Zarûk. Mexsed jê **"Mem û Zîn"** e. Xanî ew şibandîye bi zarûkek.
Tifl: Zarûk. Mexsed dîsa **"Mem û Zîn"** e.
Nûresîd: Nûgîhîştî.
(126) Guzîde: Bijare.
(127) Nekir temettu': Îstîfade nekir, mefadar nebûm.
(128) Manendê dizan: Wek dizan. Li vir mexsed ji dizan ew nivîskar û hozan in ku li pey eserên kesên dî diçin û bi zarê wan dikin, wan teqlîd dikin, parçena ji wan digirin û piçek diguhêrin û ji nû ve dinivîsin, bi wî awayî wan tiştan wek eserên xwe nîşan didin.
Tetebbu': Peyrewî, çûyina li pey kesek yan hin kesan.
Xanîyê nemir di vê malikê û malika berî wê da daye zanîn ku, eserên edebî yên ku wek rezan berdar in, berî **"Mem û Zîn"**ê bi Kurdî nehatine nivîsîn da ku wî ji wan îstîfade bikira û wek dizên nivîsaran û helbestan ji wan parçena bigirtina û ji xwe ra bikirina mal.

Nûrestê hedîqeyê fuad e(129)
Masûm e, efîf e, xanezad e(130)

Nûbar e, eger şîrîn eger tal(131)
metbû'e ji rengê new'ê etfal(132)

Min hêvî heye ji ehlê halan(133)
teqbîh-i nekin evan tefalan(134)

Ev meywe eger ne abîdar e(135)
Kurmancî ye, ew qeder li kar e(136)

Ev tifle eger ne nazenîn e
nûbar e, bi min qewî şîrîn e

Ev meywe eger ne pir lezîz e
ev tifle bi min qewî ezîz e

Mehbûb e, lîbas û gûşîware(137)
milkêd-i min in, ne musteare(138)

Elfaz û meanî-yû îbarat(139)
înşa'û mebanî-yû îşarat(140)

---

(129) Nûreste: Nûgîhîştî, fêkîyê nûderketî, nûbar.
Hedîqe: Baxçe.
Fuad: Dil. Yanî "ev, fêkîyekî nûgîhîştî yê baxçeyê dilê min e, fêkîyekî nûderketî ye ku di baxçeyê dilê min da gîhaye".

(130) Xanezad: Zarûkê ku di mala kesek da biwelide û mezin bibe. Yanî "ev, zarûkê malê ye, zarûkê mala me ye, ne bîyanî ye, di mala me da welidîye û mezin bûye, ne zarûkê bîyanîyan e ku me ew anîye mala xwe". Ji ber ku **"Mem û Zîn"** bi Kurdî ye, Xanî ew şibandîye bi zarûkê malê.

(131) Nûbar: Fêkîyê nûgîhîştî, nûderketî.

(132) Yanî "xwîyê wî wek xwîyê zarûkan e, di xwîyê zarûkan da ye".

(133) Ehlê halan: Kesên ku ji halê mirovan fam dikin, kesên fama.

(134) Teqbîh: Xirabkirin, ziştkirin, ku mirov tiştek yan kesek xirab nîşan bide, qala wî bi xirabî bike, kêmayî û qusûran bîne ser'ê û wî ziştnîşan bide, di çavê xelkê da reş bike.
Tefal: Piranîya "tifl" e, ew jî bi mana "zarûk" e.

(135) Abîdar: Avdar, fêkîyê ku têr gîhîştîye û hundirê wî av girtîye, şîre di hundirê wî da pêkhatîye û civîyaye.

(136) Ew qeder li kar e: Ew qas bes e, ew qas têr dike.

(137) Gûşîwar: Guhar.

(138) Musteare: Emanet, tiştê ku mirov ji kesna bi emanetî distîne û paşê li xwedîyan vedigerîne.

(139) Elfaz: Piranîya "lefz" e, ew jî bi mana "peyvik" e.
Meanî: Piranîya "mane" ye.
Îbarat: Piranîya "îbaret" e, ew jî bi mana "peyv, gotin" e.

(140) Înşa': Amadekirin û nivîsîna metnek, helbestek û wd.
Mebanî: Sazkirin û lêkanîna pevekan, peyvan.
Îşarat: Piranîya "îşaret" e.

mewzû'û meqasid û hîkayet(141)
mermûz û menaqib û dîrayet(142)

uslûb û sifat û mane û lefz(143)
esla nekirin me yek ji wan qerz(144)

Bîlcumle netaicêd-i fikr in(145)
dûşîze û nûerûs û bîkr in(146)

Ya Reb, mede destê xalqê nasaz(147)
vê şahidê dilruba yê tennaz(148)

*

Ummîd-i ew e ji ehlê îrfan(149)
ew dê negirin li min çu herfan

teşnî'i nekin, wekî xeyûran(150)
islah-i bikin li mın qusûran(151)

Eshabê kemalê perdepoş in(152)
Erbabê xerez di pirxuroş in(153)

---

(141) Mewzû': Babet.
Meqasid: Piranîya "meqsed" e.
Hîkayet: Çîrok.
(142) Mermûz: Îşaretkirî, tiştê ku bi alîyê wî ve îşaret tê kirin, tiştê ku tê nîşandan.
Menaqib: Piranîya "menqibet" e, ew jî bi mana "salixdana jîyana kesek yan kesna" ye.
Dîrayet: Bîr, bîrbirin, ku mirov bîr bi tiştek bibe.
(143) Sifat: Piranîya "sıfet" e, ew jî bi mana "salix" e.
(144) Esla: Qet, ji bin.
Qerz: Deyn.
(145) Netaic: Piranîya "netîce" ye, ew jî bi mana "dûwayîk, tiştê ku ji tiştekî dî derdikeve û li dû wî dimîne" tê.
(146) Dûşîze: Keça bakîre.
Nûerûs: Nûbûk, keça ku nû dibe bûk.
(147) Nasaz: Kesê nesaz, kesê avarê.
(148) Şahid: Rind, xweşik, bedew.
Dilruba: Dilrevîn, keça ku dilên evîndaran direvîne.
Tennaz: Nazdar, cîlwekar.
(149) Ehlê îrfan: Kesên xwedîmarîfet û zana.
(150) Teşnî': Xirabkirin, ziştkirin.
Xeyûr: Xîretkar, kesê xwedîxîret, kesê bixîret.
(151) İslah bikin: Tamîr bikin, çêkin, rast bikin, dûz bikin.
(152) Eshabê kemalê: Kesên gîhîştî, kesên kamil, kesên ne xav.
Perdepoş: Perdenuxêf, kesê ku perde davêje ser tiştan wan dipoşe, dinuxêfe.
(153) Erbabê xerez: Ehlê xerezê, kesên xwedîxerez, kesên dilreş û xêrnexwaz, kesên xerezkar.
Pirxuroş: Pirqîrîn, qîrqîrok, kesê ku diqîre û tiştan eşkera dike, kesê şematekar ê ku şemate derdixe.

Me'mûl-i ew e ji ehlê razan(154)
ew dê nekirin bi min tinazan

Ez pêlewer im, ne gewherî me(155)
Xudreste me ez, ne perwerî me(156)

Kurmanc im û kûhî-yû kenarî(157)
Van çend xeberêd-i Kurdewarî

îmza bikirin bi husnê eltaf(158)
isxa bikin ew bi sem'ê însaf(159)

Eshabê xerez ku guh bidêrin
eyban bikirim, li min veşêrin

ava rûyê şairî nerêjin(160)
ger mumkin e, yêke qenc bibêjin

sehw û xeletan nekin teeccub(161)
te'wîl-i bikin jibo teessub(162)

Metbea "Cem'îyeta Tefaq û Qencîya Musulmana" tebi' bîye

---

(154) Me'mûl: Tiştê hêvîkirî, tiştê ku tê hêvîkirin.
Raz: Sir, tiştê veşartî.
(155) Pêlewer: Malfiroşê gerok, çerçî.
Gewherî: Gewherfiroş, kesê ku gewher difiroşe.
(156) Xudreste: Xwegîhandî, kesê ku bi xwe gîhaye, bê mamosta gîhaye.
Perwerî: Hînkirî û fêrkirî, kesê ku ji alîyê hin mamostayan ve tê hînkirin û fêrkirin û bi wî awayî tê gîhandin.
(157) Kûhî: Çîyayî.
Kenarî: Kesê li kenar, kesê li qerax.
(158) Bi husnê eltaf: Bi qencîya xwe, ji kerema xwe.
(159) İsxa; Guhdarî.
Sem'ê însaf; Guhê însafê.
(160) Şair: Hozan. Xanî qesta xwe dike.
(161) Sehw: Şaşî.
Teeccub: Şaşman, şaşbûn, ecêbman. Yanî "bila li şaşî û xeletîyên min ecêb nemînin, bila şaş nebin ku min ev şaşî û xeletî kirine".
(162) Te'wîl bikin: Li ser maneyeka rast dûz bikin, li ser maneyeka rast rê bidin'ê, bînin ser maneyeka rast.
Teessub: Girêdana bi dîtinek ve, bi fikrek ve, bi bîr û bawerîyek ve.

www.ketewe.com

www.netewe.com

Eded 13 Sala ewwulî Rûper 1

Heçî vê
kaxidekî
rêke
ji min re,
divê
ser kaxizî
weha binivîse:
"Bî Genève
necl'ul-merhûm
Bedirxan Paşa
Ebdurrehman Beg"

*

Her car
du hezar
cerîdeya
ez'ê rêkim
Kurdistanê,
de belaş
bidin xelkê

KURDİSTAN

1315

Pazde roja de carekê têt nivîsandin
cerîdeya Kurdî ye

Kürdleri tahsil-i ulûm ve
fünûna teşvik eder
nasayih ve edebiyat-ı
Kürdiyeyi hâvî
on beş günde bir neşrolunur
Kürdçe gazetedir

Gazetenin mesleğine muvafık
Arabça, Türkçe, Farisîce
mektublar
Kürdçeye bittercüme neşrolunur

Unvan:
Genève'de
"Kürdistan"
Gazetesi
Sahib ve Muharriri
Bedirhan Paşazade
Abdurrahman

*

Her tabı'da
2000 nüsha
Kürdistan
vülât-ı izamına
irsal ve vesatetleriyle
kura ve kasabâta
neşr-ü tamim
olunacaktır

*

Kürdistan haricinde
her yer için
senelik abone bedeli
80 kuruştur
Kürdistan dahilinde
hususî isteyenlere
meccanen gönderilir

Roja duşembê de 20 Zîlqe'de sene 1316 * Fi 20 Mart sene 1315(1)

SULTAN ABDÜLHAMİD HAN-I SANÎ HAZRETLERİNE

Diyarbekir eşrafından olup indel'îcab kendisini bildirmeye hazır olduğunu beyan eden bir zat tarafından gönderilen nazar-ı dikkati calib Kürdçe bir mektubun hasbellüzum bazı fıkralarını tayyederek, aksam-ı sairesini aynen işbu 13 numrolu **"Kürdistan"** gazetesine derc ettim. Bendegân-ı Şahaneden biri marifetiyle doğruca tercüme ettirildiği halde(2) malûm-ı Şahaneleri olacağı vechile, bîçare vatanın aksam-ı muhtelifesine tayin ve i'zam olunan

(1) Li gora tarîxa Mîladî 2 Nîsan 1899(Milâdî tarihe göre 2 Nisan 1899).
(2) "Tercüme ettirildiği takdirde" demek istiyor. Yanî "çevrildiği takdirde".

www.metewe.com

zaleme-i memurînin îka'etmekte oldukları gadr-ü itisaf neticesi olarak, birçok Kürdlerin terk-i vatan ederek Acemistan ile sair mahallere hicret ettiklerini, ve pederim merhum Bedirhan Bey'in Kürdistan'da bulunduğu zamanlarda yüz haneli olan karyelerin harab olarak elyevm ancak yigirmişer haneden ibaret kaldıklarını ve birçok aceze-i nisvan ile yetim çocukların çırılçıplak duvar diblerinde bîkes ve bîçare, aç olarak zat-ı Şahanelerinden istimdad etmekte olduklarını bir lisan-ı sûznak ile istirham etmekte olduğu anlaşılıyor. Kürdistan ile Kürdler, Rusya'nın Anadolu'ya tecavüzüne bir sedd-i sedîd olduklarından, oraya atf-ı nazar-ı adalet eylemelerini rica eyliyor.(3)

Kürdistan'ın şu zamanlarda herkes tarafından tamamıyle anlaşılabilecek bir surette tezahür eden ehemmiyeti hasebiyle, oraya müstakîm ve âdil memurlar i'zamı lüzumu, Kürdistan'dan mevrud daha birçok varakalarla ihbar edilmektedir.

Padişahım,

Esasen şu lüzum sizce dahi malum olmak lâzım geldiğinden, yalnız sarayınızın içine değil, biraz da, devlet-i Osmaniyemizin devam ve bakasına ve âlem-i İslâmiyetin taarruzdan masuniyetine medar-ı küllîsi olan ve maatteessüf elyevm her türlü âsâr-ı umrandan mahrum bulunan Kürdistan cihetlerine dahi atf-ı nazar eylemenizi istirham ederiz. Birkaç seneden beri Bulgaristan ve Girid gibi meşhud-ı çeşm-i teessüfümüz olan emsale nazaran, zaman-ı karîbde şikâr-ı ecanib olacağı veyahud cevr-ü itisaf yüzünden ahalî kısmen telef, kısmen ihtiyar-ı hicret ederek, Mısır'a gıbtabahş olan o arazî-i vesîa ve münbite insandan hâlî kalarak, Anadolu'da Sahra-i Kebîr'e müşabih bir sahra husule geleceği hêvîdardır.

Hükûmet-i Osmaniyenin bekası için Rusya'ya karşı yegâne istinadgâh olan hıtte-i Kürdistan'ın muhafazası lüzum-ı kat'î tahtinde olduğuna, elbette zat-ı Şahanelerince de kanaat-ı kâmile hasıl olmuştur. Mâruzatımız beka-i satvet-i İslâmiye arzusundan gayri bir emele müstenid olmadığından, hilâfını iddia ederek evham-ı hümayunu davetle mülkü perişan eden erazil ve eclâfe umum millet-i İslâmiye ile lânet eylemekten kendimizi alamayız.

(3) Demek istiyor ki, Diyarbekir'den mektub yazan zat, Osmanlı Padişahı Abdülhamid'den, adalet gözüyle Kürdistan'a bakmasını rica ediyor.

KAXİDEK E Jİ KURDİSTANÊ HATÎ

Elhemdu lîllah ji wî Xaliqê kewn û mekan re(4) ku Kurmanc jî li alemê dan naskirin! Xwedê ilm û umrê Mîrê me(5) zêde bike! Zemanê babê te cennetmekan(6) Bedirxan Begê, hemî Kurdistan li saya edaleta wî mamûr(7) û rahet bî! Nuha jî, elhemdu lîllah, li saya ilm û qelema we, paş nuho Kurmanc hemî wê mes'ûd û bextyar bibin!

Mîrê min,

Hun jî dizanin ku Kurmanc bi xilqeta xwe(8) new'ek(9) ji benî Ademên mumtaz in,(10) şecî' in,(11) ciwamêr in; kêmayîya wan ilm û marîfet e. Saya we, bi îzn û kerema Xwedê teala paş nuho wê meyla ilm û marîfetê jî bikin.

Ev du-sê hîv e cerîdeya **"Kürdistan"**ê têt welatên me. Lê me'mûrên hukumetê nahêlin em serbest bixwînin; digirin; destê kî bibînin, wî mirovî hebs û eza(12) dikin. Dîsa jî, Kurmanc hemî gelek meyla cerîdeyê dikin, ji wê nabûrin. Vê rê de em'ê gelek tişta fîda bikin, heta wek qewm û miletên dî em Kurmanc jî sahibê tereqqî(13) bibin. Ez we(14) umîd dikim ku Sultan Ebdulhemîd qencîya me divê. Lê ev walî û qaîmmeqam û mudîr, hasilî çi qas me'mûrên rêdike li serê me, gelek zalim û bêînsaf in; ewan Kurdistan xirab kir; tu hal kesî nema. Weqtê babê te gundên sed xanî, deh mal nemane; ew jî reben û jar in. Gelek Kurmanc ji Kurdistanê hîcret dikin. Hin diçin nêv Ecem, diçin nêv Tirka; hin jî ji rebenîyê mehw dibin, ji birça ditelifin.

Em Kurd ji te hêvî dikin ku tu cerîdeya xwe de bi Tirkî ji Xunkar re binivîsî, da fekire halê Kurmanca, da bizane Kurdistan xirab dibe. Vê(15) Musulman hemî bizanibin ku, wekî Kurmanc ne li milê(16) Kurdistanê bîna, heta Mosqof hatî Anadol zebt kiribî; wê hingê Musulmanîya Anadolê, halê Tirka wê yekcar xirab bibîya. Loma, divê vî halî ji Xunkar re erz bikin, da mem'ûrên rast û adil rêke Kurdistanê. Heki ev halê ha weha dewam bike, Kurd jî hew vê zulmê re tehemmul dikin; wê bibin havalê Ermenîya, wê bi hev re esbabên edaletê bixwazin.

---

(4) Kewn: Heyî, hebûn.
Mekan: Cî: "Kewn û mekan" pêkve, bi mana "gerdûn, kaînat" tê gotin.
(5) Mexsed ji "Mîrê me", Evdirehman Bedirxan e.
(6) Cennetmekan: Cîbihişt, kesê ku mirov daxwaz dike ku di bihiştê da be.
(7) Mamûr: Ava, avakirî, şên, geş, gewz.
(8) Xilqeta xwe: Afirandina xwe, çêbûna xwe, xwîyê xwe.
(9) New'ek: Tewirek.
(10) Mumtaz: Bijare.
(11) Şecî': Wêrek, mêrxas, fêris.
(12) Eza: Ezîyet, îşkence.
(13) Tereqqî: Pêşketin, pêşveçûn.
(14) We: Wisa.
(15) Vê: Divê, pêwîst e, lazim e.
(16) Mil: Li vir bi mana "alî" ye.

Ez hêvî dikim vê jî binivîse ku, van nêzîkîyan derên ji destê Xunkar derketin, wek Bulgaristan û Girîdê, hemî sebeba zulma me'mûra bî. Ev malûmê alem e ku edalet li kî milî be, mirov xwe dide wî milî.

Bêje Xunkar "el-edlu esas'ul-mulk".(17) Heyfa min têt me'mûrên wî ne adil in, zalim in, xain in, bêînsaf û mirwet in; her nef'a xwe, li felaketa me digerin.(18)

Bêje Xunkar ey Emîrulmu'minîn, (19) Hezretê Pêxember emir kirîye ku: "El-îmamu mes'ûlun elennasî en reîyyetîhî".(20) Çire vî emrê Pêxember cî nakî! Heki tu fenekirî halê tebeeyên(21) xwe, tu jî îndellah(22) mes'ûl î; cezayê te'yê ji hemîya zêdetir bit!

Bêj'ê ey Padîşah, tu zanî "edlu saetîn xeyrun mîn îbadetî seb'îne seneten".(23)

Bêj'ê ey Xelîfe, fekire paş xwe, eslaf(24) û ecdadên te çi kirine, dinya ricifandine. Ecdadên te şîr li destê wan, diketin pêşîya eskerî; ew xwe diçûn, welatên xwe digeran; lawên xwe rêdikirin tehqîqa ehwalên xelqê. Tu çira ji sera xwe dernakevî! Tu hema fedikirî li dora xwe; tu hema camia li dor sera xwe çêdikî; kuderê bêeslek hebit, tu wî tînî mezin dikî! Carekê serê xwe hilîne, piçekê dor xwe fekire, da tu bibînî ebdên Xwedê teala çi zulm û xedrê dibînin, çawa dinalin; da tu bibînî çavên yetîm û jinebîya çawa barana dibarin;(25) da tu Kurdistanê bibînî, heçku Cengîz û Teymûr tê re bûrîne, heçku zelzele bîyî xanî xirab bîne, ji umranê(26) eser nîne; ew jin û zarû li ber dar û beran digerin, tazî birçî mane! Bêj'ê ey Xelîfe, huqûqê van ebdên Xwedê isparê te ye!(27)

Îmza

Ji Eşrafên Dîyarbekrê
Ş. M.

---

(17) Yanî "edalet bingehê milk e".
(18) Yanî "her li menfeeta xwe û li felaketa me digerin".
(19) Emîrulmu'minîn: Serekê Mu'minan, serekê Musulmanan.
(20) Yanî "pêşrewê mirovan ji kesên binê kargêrîya xwe berpirsyar e".
(21) Tebee: Peyrew, kesên li pey pêxemberek yan mîrek, yan serekek.
(22) Îndellah: Li nik Xwedê.
(23) Yanî "edaleta saetek, ji îbadeta heftê salî çêtir e".
(24) Eslaf: Kesên berî mirov, pêşîyên mirov.
(25) Awayê rast, "dibarînin" e.
(26) Umran: Avayî.
(27) İsparê te ye: Sipartîyê te ye, bi te hatîye sipartin.

ULEMAYÊN KURDA RE XÎTABEK(28)

Gelî ulemano! Un hemî dizanin ku padîşah ser însana hakim û ulema jî ser padîşaha hakim in. Ez dibînim ku ulemayên Kurda ne hakimê Padîşah, lakîn mehkûm û esîrê me'mûrên Padîşah in. Un dibînin ku ew me'mûr ji edl û Şerîetê cuda ne. Lakîn un ser îqbala xwe, ber wan zelemeyê(29) me'mûra stûyê xwe xwar dikin. Un dibînin ku ji wî halî un bednam dibin;(30) dîsa dengê xwe nakin. Heta ev meskenet(31) li we heye, un her çend ku haizê ilm in,(32) tuca un nailê mukafat nabin.(33) Çunkî un emrê Xwedê û Pêxember îcra nakin(34) û bîl'ekis un ji hemî kesî zêdetir şayanê teqdîr in.(35) Un ku wereseyê enbîya ne,(36) çawa wan me'mûra re îtaet dikin! Hew qas mezellet(37) li ser çend pereke dinyayê ne. Un qet îstîqbala zarûyên xwe, wetentaşên(38) xwe naynin ber çava; un qet tirsa Xwedê teala naynin bîra xwe.

Ulema dikarin hemî tişta li padîşaha bidin îcrakirin. Çunkî heger padîşah îcra neket, efradê milet dide îcrakirin. Çunkî ew Xwedê teala, ku padîşahê padîşahan e, kitêba xwe de hinde ulema medh û sitayiş kirîye.(39) Hemî Musulman dizanin ku emrên wê kitêbê ji emrên hemî padîşaha gelek muessir(40) û mu'tebertir e. Bînaen'eleyh,(41) heger ulema hîmmet bikin, wan emrên Xwedê tefhîmê milet bikin,(42) milet'ê mutîê ulema bibe.(43) Wê hingê milet'ê ji bela cehlê xilas bibe; wê bizanibe ku Padîşah çi ye, merteba ulema çawa ne, huqûqê efradê milet çawa muhtacê hîmaye ye.(44) Lakîn heger milet cahil bimîne, ulema jî bi ilmê xwe emel nekin, yanî heger ulema ji ulemayê sû'(45) bin, xeyrê sefaletê tu tişt ne me'mûl e.(46)

---

(28) Xîtab: Peyva ku mirov ji kesek ra yan ji hin kesan ra dike, dibêje.
(29) Zeleme: Piranîya "zalim" e.
(30) Un bednam dibin: Hun navxirab dibin, navê we xirab dibe, navê we bi xirabî derdikeve, hun bêrûmet dibin.
(31) Meskenet: Miskînî, bêkêrî, bêxêrî, sistî.
(32) Haizê ilm in: İlm û zanînê didêrin, xwedîyê ilm û zanînê ne, zana ne.
(33) Nailê mukafat nabin: Nagîjin mukafatê, nagîjin qencî û xweşîyê, nagîjin xêr û xweşîyê.
(34) Îcra nakin: Naynin cî, bicî nakin, narewînin, nameşînin.
(35) Şayanê teqdîr in: Hêjayê teqdîrê ne, hêja ne ku bên teqdîrkirin, hêja ne ku rûmet ji we ra bê dayin û qedrê we bê girtin.
(36) Wereseyê enbîya ne: Warisên Pêxemberan in.
(37) Mezellet: Bêşerefî, nizmî, stuxwarî, sistî.
(38) Wetentaş: Hevwelat.
(39) Medh û sitayiş kirîye: Bi qencî qala wan kirîye, pesnê wan daye.
(40) Muessir: Te'sîrkar, bite'sîr, xwedîte'sîr.
(41) Bînaen'eleyh: Li gora vê yekê, li gora vê peyvê, ji ber vê yekê.
(42) Tefhîmê milet bikin: Bi milet bidin famkirin, bidin zanîn.
(43) Milet'ê mutîê ulema bibe: Milet dê ji ulemayan ra îtaetkar bibe, stûyê xwe li pêşberê wan bitewîne, ji wan ra îtaet bike, li pey wan here.
(44) Hîmaye: Parastin.
(45) Ulemayê sû': Alimên xirabîyê, zanayên ku di rîya xirabîyê da ne, zanayên avarê.
(46) Ne me'mûl e: Ne hêvîkirî ye, nayê hêvîkirin.

Un Îmamê Birkewî Mihemed Efendî dinasin. Kitêba wî fîlealimî(47) vekin bixwînin; der heqê ulemayê sû' de çi dibêje. Kitêba Huccetulîslam(48)Îmamê Xezalî, rehîmehullah,(49) bixwînin; fekirin ewî der heqa ulemayê sû' de çi ayet, çi hedîs zikir kirdiwe.(50) Un dizanin ku Îmamê Xezalî, destek wî we hemîya dihêje. Loma umîd dikim ku nesîhetên wî te'sîrê we biket. Ew îmam îro sax bîya, wê meskenet û minafiqîya we hukum bikira û ew hukum Pêxember tesdîq û Xwedê teala qebûl bikira.

Un dibînin ku ew me'mûrên Xunkar rêdike serê we, hemî casûs û xefîye(51) ne; daîm meqseda wan îfsadê efrad e.(52) Çunkî bi wî sûretî(53) efradê milet her binîfaq in,(54) îttîfaq nakin. Hingî efradê milet binîfaq in, ji qeweta îttîfaqê mehrûm in; bînaen'eleyh, zeîf in. Hingî milet zeîf e, hukumet li ser wî dikare îcrayê zulm bike. Hasilî, bi wî halî un dibînin ku me'mûrên li serê we mufsid in.(55) Xwedê teala kitêba xwe de gotîye "el-fîtnetu eşeddu mîn'el-qetlî".(56) De vêca malûm dibe ku ew me'mûrên un ji wan re hinde bi meskenet û cebanet(57) îtaet dikin, ji qatila şerîrtir in, mezherê xezebê îlahî ne.(58)

Min berî çend rojekê kaxidek ji xelqê Dîyarbekrê stand. Min ew kaxid vê cerîdeyê de nivîsî. Ji munderecata(59) wî kaxidî malûm dibe ku ji şerê fitne, fesada me'mûrên serê we li meyanê we îlqa dikin,(60) Kurdistan roj û roj xirab dibe, gelek xelq mecbûrê hîcretê(61) dibin.

Mufessirên kîram(62) tefsîra ayeta ser fitneyê de dibêjin ku: "Fitne, yanî ewa ji we memleketê we(63) nefî û texrîb dike,(64) muzir e; un wê fitneyê ji memleketê xwe derêxin, nefî bikin".

(47) Fîlealim: Alimê wek fîl, alimê gewre.
(48) Huccetulîslam: Delîl û nîşana Îslamê.
(49) Rehîmehullah: Xwedê lê bê rehmê.
(50) Zikir kirdiwe: Qal kirîye, gotîye.
(51) Xefîye: Kesê ku bi dizî dixebite, nepenî kar dike. Ev peyvik, wek navekî resmî û sîyasî di zemanê Sultan Hemîd da jibo polêsên wî yên nepenî hatîye karanîn.
(52) Îfsadê efrad: Xirabkirina ferdan.
(53) Bi wî sûretî: Bi wî awayî.
(54) Binîfaq in: parçebûyî ne, dubend in, ji hev cuda ne, ne hevgirtî ne.
(55) Mufsid in: Xirabîkar in, xirabîxwaz in, karê wan xirabî ye, xirabî dixwazin û xirabî dikin.
(56) Yanî "fitne ji kuştinê dijwartir e, xirabtir e".
(57) Cebanet: Tirsonekî, tirsokî, newêrekî.
(58) Şerîr: Xirab, xirabîkar, xirabîxwaz.
Mezherê xezebê îlahî ne: Cîyê xezeba Xwedê ne, misteheqê xişma Xwedê ne.
(59) Munderecat: Têdayî, tiştê ku di nameyek, pirtûkek, kovarek yan jî rojnameyek da cî girtîye.
(60) Li meyanê we îlqa dikin: Davêjin nava we.
(61) Hîcret: Cîhilbûn, rabûn û barkirina ji cîyê xwe.
(62) Mufessir: Zanayê ku maneya **Qur'anê** dinivîse, dide zanîn.
Kîram: Qedirbilind, rûmetbilind.
(63) Awayê rast, "ewa we ji memleketê we" ye.
(64) Nefî: Rakirina ji cî û şandina bo cîyekî dî, ku hukumet kesek yan hin kesan ji cîyê wan rake û bişîne cîyekî dî.
Texrîb: Şandina bo cîyekî xerîb, ku hukumet kesek yan hin kesan bişîne cîyekî xerîb, cîyekî bîyanî.

De vêca ew me'mûrên serê we, qatilên we ne. Wekî we dît yek hat we bikuje, un dest davêjin şîrê xwe; divê un bi eynê sûretî(65) wan me'mûrên serê xwe bi şîrê xwe defi' bikin. Heger ne, ew'ê we bikujin. Ew her roj we dikujin, we ha ji xwe nîne. Hetta ew we bi ezîyet dikujin. Çunkî Pêxember, eleyhîsselam, "we men qetele mu'mînen muteemmîden fe cezauhu îlx.".(66) Yanî "nefya mu'minekî musawîyê qetla wî ye".(67) Ez umîd dikim ku çi qasî ayet û hedîs hene, un emînê sihheta(68) wan in. Heger qelbê we jî tesdîq dike, çire bi îcaba wan ewamira(69) hereket nakin! Heger un ji wan zelemeê me'mûra ditirsin, tirsa Xwedê mueyyen(70) ji tirsa wan ezîmtir e.(71) Heger un faîdekê ji wan xeddarên me'mûra umîd dikin, mueyyen faîda Xwedê ya ji hemîya ezîmtir e. Mirovê kor û kerr waqifê vê heqîqetê ye.(72) Gelî ulemano, çire un wê heqîqeta hinde aşîkar nabînin! Heta kengê un'ê vê xefletê de bimînin! Însaf bikin!

(65) Bi eynê sûretî: Bi eynê awayî, bi wî awayî.

(66) Nivîskar ev peyv wek peyveka Pêxember nîşan daye, lê belê ev parçeyek ji ayeteka **Qur'anê** ye, mana wê jî bi tevayî weha ye: "Kesê ku bi zanîn û amadekirin mu'minek bikuje, cezayê wî canem e, tê da ebedî dimîne, Xwedê lê tê xişmê û lanet lê tîne û jê ra ezabekî mezin amade dike". Despêka ayetê jî ne "we men qetele" ye, lê belê "we men yeqtul" e.

(67) Musawî: Beraber, hevteng, tiştê ku di tenga tiştekî dî da ye.

(68) Sihhet: Li vir bi mana "rastî" ye.

(69) Ewamir: Piranîya "emr" e, ew jî bi mana "ferman" e.

(70) Mueyyen: Hemin, muheqqeq, ekîd, bê guman.

(71) Ezîmtir: Mezintir.

(72) Waqifê vê heqîqetê ye: Haydarê ji vê rastîyê ye, ji vê rastîyê haydar e, bi vê rastîyê dizane.

www.netewe.com

BEDİRXAN BEG(73)

Bedirxan Beg sala 1250(74) de bî Hakimê Kurdistanê. Paş çend salekê weqta ku bî şerê Nizîbê,(75) Ebdulmecîd muraceetê muawenetê(76) wî kir. Bedirxan Beg jî gelek esker ve çû şerî, xizmet û sedaqet îbraz kir.(77) Paş wî şerî vegera Kurdistanê.

Wî zemanî Kurdistan nav destê me'mûrên hukumetê talan dibî. Me'mûr hemî çavên xwe ser emwalên(78) Kurda vekiribîn; heçîyê rişwet(79) nedida me'mûra, bi îftîrakê nefî û hebs dibî. Weqta ku Bedirxan Beg ji şerê Nizîbê ewdet kir,(80) Kurdistan vî halî de bî; yanî destê zelemeê me'mûra perîşan dibî. Lakîn weqta ku Bedirxan Beg cihê xwe rûnişt, çi qas qebail û eşairên(81) binê destê wî hebîn, ji wê zulma me'mûra xilas kir; nehîşt tu me'mûr li ser efradên binê destê wî tu nufûzê îcra bikin(82) û bi edalet eşairên xwe îdare kir.

Ev edl û asayişa(83) li nav qebailên Bedirxan Begê, mesmûê eşairên cîwar bî.(84) Heçî axayê ev emn(85) û asayişa Bedirxan Begê bihîst, hat îltîhaqê wî kir(86) û bi wî halî gelek eşîretên dî îltîhaqê Bedirxan Begê bîn û xwe ji zulma me'mûra xilas kirin. Ji wî sebebî, nufûz û hakimîya Bedirxan Begê jî gelek tewessu' kir.(87) Kurdistan hemî, heta di welatê Hekarya ket binê hukmê wî de.

---

(73) Ew, bavê nivîskar bûye; nivîskar navê wî weha nivîsîye; lê belê, ew di nava gelê Kurd da bi navê "Mîr Bedirxan" hatîye naskirin. Carna jê ra weha dihat gotin, carna jî dihat gotin "Mîr Bedirxanê Botî". Lê belê di nava Kurdan da jê ra qet nehatîye gotin "Bedirxan Beg". Ji ber vê yekê, divîya ku li vir jî navê wî bi awayê "Mîr Bedirxan" bihata nivîsîn.

(74) Li gora tarîxa Mîladî 1835.

(75) Şerê Nizîbê: Şerê ku di navbera leşkerê Osmanî û leşkerê Misrê da qewimî. Leşkerê Misrê, ku di binê fermandarîya Birahîm Paşa yê kurê Walîyê Misrê Mihemed Elî Paşa da bû, leşkerê Osmanî zorbirî kir û heta nêzîkê Stanbolê ew reqand. Paşê di navbera her du alîyan da peymana aştîyê hat îmzakirin. Hingê Sultan Evdilmecîd li ser textê dewleta Osmanî bû.

(76) Muawenet: Alîkarî.

(77) Sedaqet: Rastî û durustîya bi kesek ra yan jî bi dewletek ra.
Îbraz kir: Nîşan da.

(78) Emwal: Piranîya "mal" e.

(79) Rişwet: Bertîl.

(80) Ewdet kir: Vegerîya, zivirî.

(81) Qebail; Piranîya "qebîle" ye.
Eşair: Piranîya "eşîret" e.

(82) Nufûz: Te'sîr, hukum, fermanrewayî.
Îcra bikin: Bicî bikin, bajon.

(83) Edl: Edalet, dad.
Asayiş: Ewletî, dûzena komelê û welêt.

(84) Mesmûê eşairên cîwar bî: Ji alîyê eşîretên cîran ve hat bihîstin, eşîretên cîran ew dad û ewletî bihîstin.

(85) Emn: Ewletî.

(86) Îltîhaqê wî kir: Tevê wî bû, bû peyrewê wî, bû hevalbendê wî.

(87) Tewessu' kir: Fire bû.

Lakîn çiku me'mûra nedikarîn rişweta ji eşairên binê destê Bedirxan Begê bistînin û çiku(88) gelek eşair îltîhaqê Bedirxan Begê kirin, me'mûrên hukumetê ji wî halî mutezerrir dibîn;(89) yanî bi zulm û xebaseta(90) xwe nedikarîn pera ji Kurda bistînin. Loma, dest şikata Bedirxan Begê kirin. Bînaen'eleyh, Walîyê Mosilê Es'ed Paşa û gelek walîyên dî Sultan Ebdulmecîd re nivîsîn ku "Kurdistan hemî ket binê destê Bedirxan Begê de, ev hal dewletê re muzir e,(91) loma divê Bedirxan Begê ji wê derê rakin". Ser vê îş'arê(92) Walîyê Helebê Osman Paşa bî Muşîrê Ordûya Anadolîyê(93) û hat ser Bedirxan Begê. Osman Paşa eskerê xwe re Dîyarbekir ordû îttîxaz kir.(94) Sih hezar esker û çil pare(95) top ve ji Dîyarbekrê rabî, çû ser Cizîrê.

Hê ordûya Osman Paşa negîhayî Cizîrê, ji İstanbulê Sultan Ebdulmecîd Mela Efendî rêkir ji Bedirxan Begê re, da bêt İstanbulê. Mela Efendî ji berê ve Bedirxan Beg dinasî. Weqta ku Mela Efendî gîha nezdîkê(96) Cizîrê, go Osman Paşa ku "ez ji terefê Xunkar diçim nik Bedirxan Begê, belkî bi nush û pend,(97) bê şer Kurdistanê terk biket; heta ez cewabê nedim te, newe ser Cizîrê" û fermana Sedrê Azem Reşîd Paşa jî îbraz kir. Ew emirname, **"Muherrerat-i Nadîre"** nam kitêb de metbû'e.(98)

Osman Paşa arzû dikir ku Bedirxan Begê re şerî bike û bi xalibîyeta(99) xwe şan û şerefê îstîhsal bike.(100) Loma, nagîhanî(101) xebera Mela Efendî hîddet kir(102) û Mela Efendî hebs kir. Lakîn çiku nediwêrî yekcarî ji me'mûrîyeta wî meni' bike, ji hebsê derêxist û rê da'yê. Mela Efendî hat nik Bedirxan Begê. Lakîn Osman Paşa jî elel'ecele(103) ordûyê ve hat ser Cizîrê, întîzara(104) cewaba Mela Efendî nekir û dest tecawuzê(105) kir. Mela Efendî ji vî halî muteheyyir ma û mexcûlen(106) ji Bedirxan Begê cewabê hat or-

---

(88) Çiku: Li vir her du jî bi mana "ji ber ku" ne.
(89) Mutezerrir dibîn: Zirardîtî dibûn, zirar didîtin, dixesirîn.
(90) Xebaset: Xirabî.
(91) Muzir: Zirarde, tiştê ku zirar dide, xesar tîne.
(92) Îş'ar: Haydan, ku di heqê kesek da yan tiştek da hay bê dayin, xeber bê dayin.
(93) Muşîr: Mareşal.
(94) Awayê rast, "ordûgah îttîxaz kir" e. Yanî "ordûgah girt, ji ordûya xwe ra kir merkez, ji leşkerê xwe ra kir bargah".
(95) Pare: Tene.
(96) Nezdîk: Nêzîk.
(97) Nush û pend: Şîret.
(98) Nam kitêb de metbû'e: Kitêba ku bi vî navî ye, tê da hatîye çapkirin; pirtûka ku navê wê ev e, ev ferman tê da hatîye çapkirin.
(99) Xalibîyet: Zorbirin, ku kesek zora kesek bibe yan leşkerek zora leşkerek bibe, wî zorbirî bike.
(100) Îstîhsal bike: Bi destê xwe bixe, deshatî bike, desketî bike.
(101) Nagîhanî: Ji nîşka ve.
(102) Hîddet kir: Hêrs bû.
(103) Elel'ecele: Bi lez û bez, tavil.
(104) Întîzar: Payin, ku mirov tiştek yan kesek bipê, li benda wî be, çavê mirov li rîya wî be û mirov çavnêrîya wî bike.
(105) Tecawuz: Desdirêjî.
(106) Mexcûlen: Bi awayekî fedîkar, şermî.

dûya Osman Paşa.(107) Osman Paşa qebaheta xwe dizanî. Loma, ketmê qebahet re(108) îftîra li Mela Efendî kir, mewqûfen(109) rêkir İstanbulê û Xunkar re nivîsî ku "ev mirov muttefiqê(110) Bedirxan Begê ye, xayinê dewlet e". Xunkar jî bîla tedqîq û tehqîq(111) Mela Efendî nefyê Wanê kir.

*

Her du mila dest şerî kir. Mîqdarê çiharde şera mabeyna(112) her du eskera de bî. Şerek gelek mezin li Çemê Zeytûnê bî. Wê derê eskerê Osman Paşa gelek şikest. Kurda gelek top zebt kir; lakîn nedizanîn biemilînin.(113) Axir Bedirxan Begê dît ku eskerê Osman Paşa ji yê wî mucehheztir e,(114) loma tehessunê qela Ewrexê kir.(115) Lakîn ev tehessun bêfaîde bî. Topên ordûya Osman Paşa di zemanek hindik de qele texrîb kir.(116) Eskerê Bedirxan Begê ji topa gelek muteessir dibî. Nîhayet eskerê Bedirxan Begê gelek şikest, qeweta wî gelek zeîf bî. Loma teslîm bî, ordûya Osman Paşa ve hat(117) İstanbulê. Aîla wî hemî jî wî re hat. Weqta ku gîha İstanbulê, nefyê Girîdê bî. Paş pazde sala Sultan Ebdulezîz ban'î kir,(118) hat İstanbulê. Xunkar jê re teklîf kir bike walî li Rûmîlîyê.(119) Lakîn Bedirxan Begê qebûl nekir, ruxset(120) xwest da biçe Şamê. Xunkar rutba "Mîrê Mîran"îyê tewcîh kir(121) û ruxset da'yê. Bedirxan Begê paş çend salekê wê derê wefat kir. Weqta ku wefat kir şêst û sê salî bî. Çil û duyek nefer zukûr û înas ewladên wî hebîn.(122) Ewladên wî re çûna Kurdistanê qet'îyyen memnû'e,(123) hukumet nahêle.

---

(107) Li vir kêmayîyek heye. Wisa tê zanîn ku awayê rast divê weha be: "Digel cewabê hat ordûya Osman Paşa".

(108) Ketmê qebahet re: Jibo ketma qebahetê xwe, jibo veşartin û poşan û nuxaftina qebahetê xwe.

(109) Mewqûfen: Girtî, bi girtin, tewqîfkirî.

(110) Muttefiq: Hevalbend.

(111) Bîla tedqîq û tehqîq: Bê lêgerîn û lêkolan, bê ku lê bide gerîn û bide kolan ka ew tişt rast e yan na.

(112) Mabeyn: Navber.

(113) Biemilînin: Bi kar bînin, bişixulînin.

(114) Mucehhez: Têrçek û têrrext û têrfişek.

(115) Tehessun: Asêbûn, ketina cîyekî zexm û berxwedana di wir da.
Ewrex: Keleyeka kevn e li hêla Botan.

(116) Texrîb kir: Xira kir, hilweşand, wêran kir.

(117) Di eslê rojnamê da ev peyvik bi awayê neyîn "nehat" derketîye. Lê belê, wek ku eşkera ye, ew awa şaş e. Lewra Mîr Bedirxan çûye Stanbolê. Ji ber vê yekê, me peyvik bi awayê rast û erîn "hat" nivîsî.

(118) Ban'î kir: Bang wî kir, bang kir wî, ew xund nik xwe. Her du peyvikên "bang wî" hatine kurtkirin û ketine awayê "ban'î".

(119) Rûmîlî: Axa Osmanîyan a li Ewrupayê. Di Tirkîya nuhayîn da jê ra tê gotin "Rûmelî".

(120) Ruxset: Destûr.

(121) Tewcîh kir: Da, da wî.

(122) Zukûr: Kur, zarûkên kurîn.
Înas: Keç, zarûkên keçîn.

(123) Qet'îyyen memnû'e: Qutûbirr qedexe ye.

Gelî Kudno! Un ji vî tercumeê halê(124) Bedirxan Begê dibînin ku ji kengê ve me'mûrên hukumet rêdike li serê we, Kurdistanê texrîb dikin. Bedirixan Begê ji xîreta xwe nehîşt xelq zulmê li efradên binê destê wî bikin. Walî bê rişwet man; loma îftîra lê kirin, ordû kişandin li ser. Heger wê hingê ve Kurda bîl'îttîfaq umûmen(125) dewamê şikatê bikira, me'mûrên zalim qebûl nekirana, heta nuho ev hal dewam nedikir û îro un Kurd'ê gelek bextyar bîna. Lakîn meskeneta li we, maniê seadeta(126) we ye.

Çiku Ermenî waqifê vî halî bîne, ew dixebitin, da xwe ji binê zulma me'mûra derêxin. Hinde ji wan hatin kuştin, hinde telef bîn, dîsa xîreta xwe dewam dikin. Divê Kurd jî wan re îttîfaq bikin. Çunkî Ermenî jî, Kurd jî mezlûmê Ebdulhemîd, in. Lakîn Kurd cahil in, vê heqîqetê nizanin; loma Ermenîya dikujin. Lakîn ev halê Kurda dînen, aqlen, adeten(127) ne caîz e. Heger Kurd û Ermenî îttîfaq bikin, me'mûr nikarin zulmê li Kurdistanê îcra bikin. Sed heyf(128) ku qebailên Kurda hemî neyarê hevdû ne. Me'mûr jî bi wê ze'f(129) û nîfaqa wan, her li serê wan bela ne.

---

(124) Tercumeê hal: Çîroka jîyanê.
(125) Bîl'îttîfaq: Bi tevayî.
Umûmen: Bi gişt, pêkve.
(126) Maniê seadet: Rêgirê bextyarîyê, tişt yan kesê ku rê li bextyarîya kesek yan hin kesan digire, nahêle ew bextyar bibin.
(127) Dînen: Ji alîyê dîn ve, li gora dîn.
Aqlen: Ji alîyê aqil ve, li gora aqil.
Adeten: Ji alîyê adet û toreyan ve, li gora toreyan.
(128) Heyf: Xebînet, mixabin.
(129) Ze'f: Zeîfî, kêmayî.

www.netewe.com

ÎNTÎBAH(130)

Gelî ulemayên Kurda! Hingê min ev cerîda "**Kurdistan**"ê neşir kirî, gelek mirovên ecnebî(131) ji Alman, ji Nemçe(132) û ji Înglîza, cerîda min îştîra dikin,(133) dixwînin. Elelxusûs(134) yekê Alman heye, navê wî Mösyö "Martîn Hartman" e;(135) ekserê lîsanê Şerqê(136) dizane, hetta lîsanê Kurda jî teellum dike.(137) Ez umîd dikim ev xîreta ecnebîya, Kurda re mûcibê întîbah bit.(138)

ÎŞTÎRAKÊ HEMÎYET(139)

Ji Dîyarbekrê : 200 quriş
Ji Silêmanîyê : 121 "
Ji Edeneyê : 120 "

Min ev perê ha standin. Min kaxiza Şêx Mihemed stand, min cewab jî nivîsî; belkî kaxiz wasil nebit.(140) Muteşekkirê(141) xîret û hemîyeta Şêx Mihemed im. Umîd dikim ku wê we'dên(142) xwe temamen îcra bike.

*

Ş. M. — Eve min kaxiza te bi vê cerîdeyê î'lan kir.(143) Min hin fiqer jê teyy kir.(144) Esbabê wê, ez'ê xusûsî ji te re binivîsim.

---

(130) Întîbah: Hişyarî, balkêşî.
(131) Ecnebî: Bîyanî.
(132) Nemçe: Awusturya, Nemsa.
(133) Îştîra dikin: Dikirin.
(134) Elelxusûs: Xasma, bi taybetî.
(135) Martîn Hartman, nivîskar û zanyarekî Alman bûye, di sala 1904'an da "**Dîwan**"a hozanê Kurd ê nemir Melayê Cizîrî li Berlînê çap kirîye û jê ra pêşkêşîyek bi zimanê Almanî nivîsîye.
(136) Ekserê lîsanê Şerqê: Piranîya zimanên Rojhilat.
(137) Teellum dike: Fêr dibe.
(138) Mûcibê întîbah bit: Bibe semedê hişyarîyê, wan hişyar bike.
(139) Îştîrakê hemîyet: Beşdarîya pêjna welatevînîyê, beşdarîya ku weltevînîya beşdarên xwe nîşan dide, îspat dike.
(140) Wasil nebit: Negîje, negîje destê kesê ku jê ra hatîye şandin.
(141) Muteşekkir: Sipaskar, kesê ku sipas dike.
(142) We'dên xwe: Sozên xwe.
(143) Î'lan kir: Ragîhand, eşkera kir.
(144) Fiqer: Piranîya "fiqret" e, ew jî bi mana "parçe" ye.
Teyy kir: Derxist, nenivîsî.

(145)

Ebrû ji kemanê qewsê eflak(146)
Mujgan bê guman ji sehmê semmak(147)

Sermayeyê wehşeta cunûnan(148)
mermûz e di dehşeta uyûnan(149)

Mebhût-i dibûn di turfetul'eyn(150)
keşşafê rumûzê hîkmetul'eyn(151)

Cebhet dinuma ji terfê îklîl(152)
goya li ufuq cenahê Cîbrîl(153)

westayî li îstîwa ye daîm(154)
xurşîd-i di xizmeta wê qaîm(155)

---

(145) Ev beşê jêrîn, beşekî dî ji **"Mem û Zîn"**ê ye. Beşê berî vî beşî, di jimareya 12'an da derketîye. Ji ber ku ew jimare di dest da tune, xwendevanên rojnamê neşên wî beşê **"Mem û Zîn"**ê bixwînin. Di vî beşî da pesnê rindîya Zînê û Sitîyê tê dayin, ku her du jî xuşkên Mîrê Botan Mîr Zeydîn bûne.

(146) Kemanê qewsê eflak: Kevanê felekan. Yanî "birûyên Zînê û Sitîyê dişibîyan kevanê felekê".

(147) Mujgan: Bijang.
Sehmê semmak: Tîrên rast. Yanî "bijangên wan wek tîrên rast bûn".

(148) Sermayeyê wehşeta cunûnan: Sermayeyê kûvîtîya dînîtîyan, kana kûvîtîya dînîtîyan.

(149) Mermûz: Tiştê ku tê îşaretkirin, îşaretkirî.
Dehşeta uyûnan: Dehşeta çavan, tirs û qurfa ku ji çavên wan dirijîyan. Yanî "ew tirs û qurfa ku ji çavên wan dirijîyan û belav dibûn, îşaret bû jibo sermayeyê kûvîtîya dînîtîyan, kesê ku li çavên wan ên bitirs binihêrta, dîn dibû û kûvîtî lê peyda dibû".

(150) Mebhût: Şaşmayî, heyirî.
Turfetul'eyn: Tavil, derhal, bi qasê ku mirov çavê xwe bigire û veke.

(151) Keşşaf: Kesê ku tiştan keşif dike, derdixe meydanê.
Rumûzê hîkmetul'eyn: Îşaretên hîkmet û semedên tiştan. Yanî "ew kesên ku hîkmet û semedên tiştan keşif dikin û derdixin meydanê û bi binê tiştan dizanin, ji çavên wan tavil şaş dibûn û heyirî diman".

(152) Cebhet: Enî.
Terf: Alî, teref.
Îklîl: Tac.

(153) Goya: Wek ku, mirov digot qey ku.
Ufuq: Asû.
Cenahê Cîbrîl: Baskê Cebraîlê firîşte. Yanî "enîyên wan ji alîyên tacên wan bi awayekî wisa dixuyan ku, mirov digot qey baskên firîşte Cebraîl in, dişibîyan baskên wî".

(154) Westayî li îstîwa: Sekinî li nîvê asîman, sekinandî li nîvê asîman.

(155) Xurşîd: Roj. Yanî "mirov digot qey Roj li nîvê asîman westayî ye û tim di xizmeta enîyên wan da ye û ronayî dide ser wan".

Herçî bidîya rux û bîna gûş(156)
fîlhal-i bi der dida jibo hûş(157)

Gerden, te digo di destê saqî
qarûre ye, pirşerabê baqî(158)

yan şubhetê şîşeya nebatê(159)
yan menbeê kanîya heyatê(160)

Serpence û naxunê muhenna(161)
rencîdeyê xatirê muhenna(162)

Xelqê ku didîtin ew kemergah(163)
hazir dikirin ji xewrê dil "ah"(164)

Zahir dikirin ku zend û bazin(165)
êdî nediman gilî û gazin

*

Herçend-i ku her du şubhê can bûn
ew her du bi husnê tew'eman bûn(166)

---

(156) Rux: Rû.
Bîna: Bibîna, bidîta.
Gûş: Guh.

(157) Fîlhal: Tavil, di wê gavê da.
Jibo: Jibo rû û guhên wan.
Hûş: Hiş. Yanî "her kesê ku rû û guhên wan bidîtina, tavil jibo wan hişê xwe bi der dida û bêhiş dibû".

(158) Qarûre: Şûşe.
Pirşerab: Têrmey, şûşa ku têr mey tê da heye.
Baqî: Ebedî, meya ebedî.

(159) Nebat: 1- Gîya. 2- Tewirek şekir, şekirê nebat. Li vir mexsed mana 2'yan e.

(160) Menbeê kanîya heyatê: Serçavîya kanîya ava jînê, serçavîya wê kanîya ku ava heyatê jê diherike, ava ku vexwaroxê wê timjîndar dimîne, namire.

(161) Serpence: Sertilî.
Naxun: Tilî.
Muhenna: Henekirî.

(162) Rencîde: Azarde, tiştê ku azar û êş dide, tiştê ku dêşîne.
Xatir: Dil. Hin maneyên dî jî jê ra hene, lê li vir bi vê maneyê ye.
Muhenna: Geş, kêfxweş. Yanî "sertilî û tilîyên wan ên henekirî, êş û azar didan dilên geş û kêfxweş, kesên dilgeş û kêfxweş dema ew tilî û sertilîyên henekirî didîtin, ji ber evînê êş diket dilên wan".

(163) Kemergah: cîyê ku kemer lê tê bestin, newq.

(164) Xewrê dil: Kûrana dil, kûrayîya dil.

(165) Zahir dikirin: Nîşan didan, dinumandin, eşkera dikirin.

(166) Tew'eman: Cêwî.

Herçend-i Sitî we nazenîn bû(167)
Lê Zîn ji mîsalê horîîn bû(168)

Herçend-i Sitî stêreweş bû(169)
Lê Zîn bi ruxan heyîvegeş bû

Herçend-i Sitî wekî qemer bû(170)
Zîn mihresifet, zîyade ter bû(171)

Ev her du wekî du şebçiraxan(172)
gava dimeşîne bax û raxan(173)

nalan dikirin cemad û heywan(174)
talan dikirin nebat û însan

Kofî ji cewahiran mukellel(175)
Koter ji netrikan muselsel(176)

Serbendê qeseb didan cebînê(177)
aşiq dimirin ji dest evînê

Ev zînet û xeml û qişt û henbel(178)
ez pêş û pes û yemîn û qenbel(179)

---

(167) We: Wisa
(168) Horîîn: Horîya bihiştê ya bijare, serhorî.
(169) Stêreweş: Wek stêrê, mîna stêrê.
(170) Qemer: Hîv.
(171) Mihresifet: Wek Rojê, di sifetê Rojê da.
(172) Şebçirax: Çiraya şevê, çiraya ku bi şev tê pêxistin û ronayî dide.
(173) Rax: Baxçeyê li lehfê çîya, li bintara çîya.
(174) Nalan dikirin: Dinalandin, bi nalînê dixistin.
Cemad: Tiştê bêgîyan, tiştê nejîndar.
(175) Mukellel: Xemilandî.
(176) Koter: Gerdenî.
Netrik: Tiştekî xemlê ye.
Muselsel; Zincîrkirî. Yanî "gerdenîyên wan bi tiştên xemlê hatibûn zincîrkirin, tiştên xemlê wek zincîran bi gerdenîyên wan ve hatibûn girêdan".
(177) Serbend: Serê bendika kofîyê.
Qeseb: Bendika kofîyê. Bi qasê tilîyek fire ye, keç û jin wê bendikê di binê çena xwe ra derbas dikin û serê wê li ber cênîga xwe davêjin qulpek. Bendik kofîyê li ser serî dihêle, digire, nahêle bikeve.
(178) Qişt û henbel: Du tiştên xemlê ne, du xişr in.
(179) Ez pêş: Ji alîyê pêşîn ve, ji pêş ve.
Pes: Paş, ji alîyê paşîn ve, ji paş ve.
Yemîn: Alîyê rastê.
Qenbel: Alîyê çepê.

gava dimeşîn perî digel wan(180)
walih dikirin welî di xelwan(181)

*

Ger şêx in û ger mela û mîr in
derwêş û xenî û ger feqîr in(182)

kes nîne ne talibê cemalê(183)
kes nîne ne raxibê wîsalê(184)

Hin raxibê husnê layezal in(185)
hin talibê qalibê betal in(186)

Lakîn hemîyan yek e yeqîn dost
Ferqa ku heye ji mexzê ta post(187)

Metbea ''Cem'îyeta Tefaq û Qencîya Musulmana'' tebi' bîye

---

(180) Digel wan: Digel wan tiştên xemlê, digel wan xeml û xêzên xwe.
(181) Walih: Gêj, sersem, sews, bêhiş.
Welî: Dostê Xwedê, kesê ku ji Xwedê ra tim îbadet dike.
Di xelwan: Di xelwetxanan da, di xelwetxaneyên ku welî di wan da ji Xwedê ra îbadet dikin.
(182) Xenî: Dewlemend, zengîn.
Feqîr: Xizan.
(183) Talib: Xwestox, lêger, kesê ku tiştek dixwaze, li tiştek digere.
Cemal: Rindî.
(184) Raxib: Xwestox, daxwazkar, kesê ku daxwaza tiştek dike.
Wîsal: Gîhana evîndaran û yaran, ku evîndar û yar bigîjin hev.
(185) Husnê layezal: Rindîya neqedîyayî, rindîya ku naqede û dûwayî lê nayê, rindîya timî û ebedî.
(186) Qalibê betal: Laşê tewş û bêfêde. Yanî ''hin kes tenê laşê tewş daxwaz dikin, li laşê bêfêde digerin, daxwaza rindîya ebedî û timî nakin''.
(187) Mexz: 1- Mejî. 2- Eslê tiştek, cewher û heqîqeta tiştek. Li vir mexsed mana 2'yan e. Yanî ''ferqa navbera esl û post çi ye, kesên ku li rindîya timî digerin û kesên ku li laşê tewş digerin, ferqa navbera wan jî ew e''.

13'ÜNCÜ SAYININ ÇEVİRİLERİ

SULTAN İKİNCİ ABDÜLHAMİD HAN HAZRETLERİNE

Diyarbekir ilerigelenlerinden olup gerektiğinde kendisini bildirmeye hazır olduğunu bildiren bir zat tarafından gönderilen dikkat çekici Kürdçe bir mektubun, öyle gerektiği için bazı bölümlerini atlayarak, öbür bölümlerini **"Kürdistan"** gazetesinin bu 13. sayısında aynen yayınladım. Siz Padişahlarının kullarından biri aracılığıyle doğruca çevrildiği takdirde, siz Padişahlarınca bilineceği gibi, çaresiz yurdun değişik bölgelerine atanıp yollanan zalim memurların işledikleri acımasızlık ve zulmün sonucu olarak birçok Kürdün yurdunu terkedip İran'a ve başka yerlere göç ettiklerini ve babam merhum Bedirhan Bey'in Kurdistan'da bulunduğu zamanlarda yüz hanelik olan köylerin yıkıntıya dönerek bugün ancak yirmişer haneden ibaret kaldıklarını ve birçok düşkün kadının ve öksüz çocuğun çırılçıplak duvar diplerinde kimsesiz ve çaresiz olarak siz Padişahlarının zatından yardım istemekte olduklarını, mektubun yazarının dert yanan dokunaklı bir dille istirham ettiği anlaşılıyor. Küridistan ile Kürdler, Rusya'nın Anadolu'ya yapabileceği saldırıya karşı sarsılmaz bir engel olduklarından, siz Padişahlarının oraya adalet gözüyle bakmalarını rica ediyor.

Kürdistan'ın şu zamanlarda herkes tarafından tümüyle anlaşılabilecek bir biçimde ortaya çıkan önemi dolayısıyle, oraya, doğruluktan ayrılmayan adaletli memurların gönderilmesi gerektiği, Kürdistan'dan gelen daha birçok mektupla haber verilmektedir.

Padişahım,

Bu gereğin aslında sizce dahi bilinmesi gerektiğinden, yalnız sarayınızın içine değil, biraz da Osmanlı devletimizin süreklilik ve kalıcılığına, bir de tüm İslâm dünyasının saldırıdan korunmasına dayanak olan ve ne yazık ki bugün her türlü bayındırlık eserlerinden yoksun bulunan Kürdistan taraflarına da bakışlarınızı çevirmenizi istirham ederiz. Birkaç yıldan beri Bulgaristan ve

Girit gibi üzüntülü gözlerimizce gördüğümüz örnekler gibi, yakın bir bölümü yok olup giderek, bir bölümü de göç etmeyi tercih ederek, Mısır'ı bile imrendirecek nitelikte olan o geniş ve verimli toprakların insanlardan boşalacağından ve Anadolu'da Büyüksahra'ya benzer bir çölün meydana geleceğinden kaygı duyulmaktadır.(188)

Osmanlı hükümetinin sürekli yaşaması için Rusya'ya karşı tek dayanak olan Kürdistan ülkesinin korunmasının kesin olarak gerekli olduğuna, elbette siz Padişahlarının zatı tarafından da tam bir kanı getirilmiştir. Arzedilen bu dileklerimiz, İslâm dininin gücünün sürekli yaşaması arzusundan başka bir amaca dayanmadığından, bunun tersini iddia ederek siz Padişahlarının kuşkulanmasına yolaçan ve böylece ülkeyi perişan eden rezillere ve ayaktakımına, bütün İslâm milletiyle(189) birlikte lânet etmekten kendimizi alamayız.(190)

(188) Yazının aslında burada Kürdçe "hêvîdar" sözcüğü kullanılmıştır ki o sözcük "ümit edilir, umulur" anlamına gelmektedir. Ne var ki Kürdçede o sözcük daha çok olumlu durumlarda ve sevindirici konular için kullanılır. Burada ise önemli bir kaygı dile getirilmektedir. Bu nedenle biz o sözcüğün karşılığında "kaygı duyulmaktadır" sözcüklerini kullandık.

(189) Buradaki "millet" sözcüğü, "aynı dine bağlı olan insanlar" anlamındadır.

(190) Yazarın bu yazıda sözünü ettiği Kürdçe mektubu Türkçeye çevirip aşağıya aldık.

KÜRDİSTAN'DAN GELEN BİR MEKTUP

Evrenin Yaratıcısına hamd olsun ki Kürdleri de dünyada tanıttı! Allah Beyimizin(191) bilgisini artırsın ve kendisine uzun ömürler versin! Yeri cennet olsun babanız Bedirhan Bey zamanında, O'nun adaleti sayesinde tüm Kürdistan bayındırdı ve huzur içindeydi! Şimdi de, Allah'a hamd olsun ki sizin bilgi ve kaleminiz sayesinde, bütün Kürdler bundan sonra mutlu olacaklar!

Beyim,

Siz de biliyorsunuz ki Kürdler, yaradılış olarak, Ademoğullarının seçkin topluluklarındandırlar, yiğittirler, merttirler; bir eksiklikleri varsa, o da bilgi ve kültür alanındadır. Sizin sayenizde, yüce Allah'ın izniyle bundan sonra bilgi ve kültüre de eğilim gösterecekler.

İki-üç aydan beri **"Kürdistan"** gazetesi yurdumuza geliyor. Ne var ki hükümet memurları, O'nu özgürce okumamıza olanak vermiyorlar; bizden alıyorlar; kimin elinde görürlerse o adamı hapse atıyorlar, işkence yapıyorlar. Yine de bütün Kürdler gazeteye eğilim gösteriyorlar, ondan vazgeçmiyorlar. Biz Kürdler de diğer halklar ve uluslar gibi kalkınmamızı gerçekleştirinceye kadar, bu yolda çok şey feda edeceğiz. Ben öyle ümit ediyorum ki Sultan Abdülhamid bizim iyiliğimizi istiyor. Ne var ki şu valiler, kaymakamlar, müdürler, kısacası onun başımıza gönderdiği ne kadar memurlar varsa, hepsi zalim ve insafsızdırlar; onlar Kürdistan'ı yıkıntıya çevirdiler; hiç kimsede güç ve takat kalmadı. Babanızın zamanında yüz hanelik olan köylerden şimdi on hane bile kalmamış; kalanlar da zavallı ve zayıf kimselerdir. Birçok Kürd Kürdistan'dan göç ediyorlar. Bazıları İran'a gidiyorlar, bazıları da Türklerin oraya gidiyorlar;(192) kimileri de zavallılık ve çaresizlikten dolayı yok oluyor, açlıktan ölüyorlar.

Biz Kürdler, senden, gazetende Padişaha Türkçe olarak yazmanı rica ediyoruz; böyle yazmalısın ki Padişah Kürdlerin durumunu düşünsün ve Kürdistan'ın harabeye dönmekte olduğunu bilsin. Tüm Müslümanların bilmesi gerekir ki, eğer Kürdler Kürdistan tarafında bulunmasalardı, Moskof şimdiye kadar gelip Anadolu'yu ele geçirmiş olacaktı; o zaman Anadolu'nun Müslümanlığı ve Türklerin durumu tümüyle kötü olacaktı. Bu nedenle, bu

(191) "Beyimiz"den maksat, **"Kürdistan"** gazetesini yayınlayan Abdurrahman Bedirhan'dır.

(192) Mektubun Kürdçe aslında burada "nêv Tirka" sözcükleri kullanılmıştır. Kürdçede göçten sözedilirken kullanılması olağan olan bu iki sözcük tam olarak Türkçeye çevrildiği takdirde "Türklerin arasına, Türklerin içine" anlamını verir. Oysa Türkçede bu olağan değildir ve kullanılmaz. Bu nedenle biz de burada çeviride, "Türklerin oraya" sözcüklerini kullandık; yani "Türklerin bulunduğu yöreler, Türk ülkesi, Türklerin yaşadığı yerler".

durumu Padişaha arzetmelidirler ki Kürdistan'a, doğruluktan ayrılmayan adaletli memurlar yollasın. Eğer bu durum böyle sürerse, Kürdler artık bu zulme dayanamayacaklar ve Ermenilerle birlik olup onlarla birlikte adaletin yol ve yöntemlerini arayıp isteyecekler.

Şunu da yazmanı rica ediyorum: Bu yakınlarda Padişahın elinden çıkan Bulgaristan ve Girit gibi yerlerin elden gitmesinin nedeni, hep memurların zulmüydü. Bütün dünyaca bilinmektedir ki hangi yönde adalet varsa insan o yöne gider.

Padişaha de ki "adalet mülkün temelidir". Yazığım geliyor ki onun memurları adaletli değillerdir, zalim ve haindirler, insafsızdırlar ve insanlıktan yoksundurlar; hep kendi çıkarlarını ve bizlerin felâketini isterler.

Padişaha de ki ey Emirülmüminin,(193) Hazreti Peygamber emretmiştir ki: "İnsanların başındaki önder, yönetiminin altındakilerden sorumludur". Peygamber'in bu emrini niçin yerine getirmiyorsun! Uyruklarının durumunu düşünmezsen, Allah katında sen de sorumlu olacaksın ve senin cezan hepsininkinden fazla olacaktır!

Kendisine de ki ey Padişah, biliyorsun ki "bir saatlik adalet, yetmiş yıllık ibadetten daha hayırlıdır".

Kendisine de ki ey Halife, dön de biraz arkana bak, senin seleflerin ve ataların neler yapmışlar, nasıl dünyayı titretmişler. Ataların, ellerinde kılıçları, askerin önünde yürüyorlardı; onlar bizzat gidip ülkelerinde dolaşıyorlardı; halkın durumunu soruşturmak için oğullarını gönderiyorlardı. Sen niye sarayından hiç çıkmıyorsun! Sen sadece çevreni düşünüyorsun; sadece kendi sarayının çevresinde camiler yaptırıyorsun; nerede bir soysuz varsa onu getirip yüceltiyorsun! Biraz başını kaldırıp azıcık çevrene bak da yüce Allah'ın kullarının nasıl zulüm ve gaddarlık altında inlediklerini gör; öksüzlerin ve dulların gözlerinden nasıl yağmur gibi gözyaşları akıyor, onu da gör; ve Kürdistan'ı da gör, sanki Cengiz ve Timur oradan geçmiş gibi, ya da deprem olmuş da tüm evler yıkılmış gibi bayındırlıktan iz bile kalmamış; kadın ve çocuklar hep aç ve çıplak kalmışlar, ağaç altlarına sığınmışlar!

Kendisine de ki ey Halife, hani Allah'ın bu kullarının hak hukuku sana bırakılmıştı!

İmza

Diyarbekir Eşrafından
Ş. M.

---

(193) Emirülmüminin: Müminlerin emiri, inananların yöneticisi, Müslümanların başındaki halife.

Eded 14 Sala ewwulî Rûper 1

Heçî vê kaxidekî rêke ji min re, divê ser kaxizî weha binivîse: "Bî Genève necl'ul-merhûm Bedirxan Paşa Ebdurrehman Beg"

*

Her car du hezar cerîdeya ez'ê rêkim Kurdistanê, de belaş bidin xelkê

KURDİSTAN

1315

Pazde roja de carekê têt nivîsandin cerîdeya Kurdî ye

Kürdleri tahsil-i ulûm ve fünûna teşvik eder nasayih ve edebiyat-ı Kürdiyeyi hâvî on beş günde bir neşrolunur Kürdçe gazetedir

Gazetenin mesleğine muvafık Arabça, Türkçe, Farisîce mektublar Kürdçeye bittercüme neşrolunur

Unvan: Genève'de **"Kürdistan"** Gazetesi Sahib ve Muharriri Bedirhan Paşazade Abdurrahman

*

Her tabı'da 2000 nüsha Kürdistan vülât-ı izamına irsal ve vesatetleriyle kura ve kasabâta neşr-ü tamim olunacaktır

*

Kürdistan haricinde her yer için senelik abone bedeli 80 kuruştur Kürdistan dahilinde hususî isteyenlere meccanen gönderilir

Roja pêncşembê de 9 Zîlhîcce sene 1316 * Fi 7 Nisan sene 1315(1)

BÎSMÎLLAHÎRREHMANÎRREHÎM

"ULUWW'UL-HÎMMETÎ MÎN'EL-ÎMAN"

Ewê Xwedê teala ev alem ser wî(2) xelq kirî, ewê Xwedê serê me me'mûr kirî da rîya qenc nîşanê me bike, vê hedîsa xwe de heqîqetek nîşanê me kirîye; gotîye ku: "Hîmmet ji îmanê ye"; ango mirov çi qas xweyxîret be, çi qas dinya xwe re, axreta xwe re zêde bixebite, hew qas îmana wî zêde dibe. De vêca malûm dibe ku ji nav we heçîyê welatê xwe re bixebite, heçîyê xwe û zarûyên xwe ji binê zulma me'mûra derêxe, hew qas cem Xwedê teala xweyqedir dibe.

(1) Li gora tarîxa Mîladî 20 Nîsan 1899(Milâdî tarihe göre 20 Nisan 1899).
(2) Ser wî: Li ser xatirê wî, jibo wî, jibo xatirê wî. Mexsed Pêxember e.

Gelî Kurdno! Un dibînin ku Xwedê û Pêxember muhafeza huqûqê îbad re hinde rên qenc nîşanê me kirine. Heçîyê wan emra îcra bike, dinê û axretê mes'ûd û bextyar dibe.

Ez cerîdeyên Awrupayê de dixwînim ku çiku çar merîyê Kurd bûrîne ser hudûdê Rûsyayê, hukumeta Rûsyayê xeber ji Xunkarê me re rêkirîye ku heger Xunkar ceza wan çar mêra nede, ew xwe'yê eskerî rêke nav Kurdistanê, wan te'dîb bike.(3)

*

Gelî Kurdno! Ji cerîda min a ewwilî heta ya paşayikê(4) ez her dinivîsim ku, heger Kurd hişyarîya xwe nekin(5) Kurdistan'ê zemanek nezdîk(6) de bikeve destê Mosqof. Ev cewaba Rûsyayê ser wan çihar merîyê Kurd Xunkarê me re rêkirî, da'wa min yekcarî tesrîh û tesdîq dike.(7) Çunkî hukumeta Rûsyayê bi vî terzî divê sebebekî bibîne, eskerê xwe rêke nav Kurdistanê. Wekî carekê hema eskerê Rûsyayê ket nav welatê we, un muheqqeq bizanin ku êdî hew ji wê derê derdikeve; un nikarin ji nav xwe derêxin û Ebdulhemîd jî tu eskerî, tu cebilxaneyî ji we re rênake. Ewî hema ha ji sera xwe tenê heye, muhtacê tiştek dî nîne; îro Kurdistan hemî bikeve destê Mosqof, Kurd hemî bên kuştin, jin û zarûyên Kurda bibin xizmetkarê eskerê Mosqof, ew(8) qet'îyyen muteessir nabe. Ew dizane ku heta ew xwe umir bike, ev dewleta Îslamê têra wî dike. Paş wî bila hemî mehw û perîşan bibe; ewî muhtacî pê nîne. Eve Girîd ji destê wî derket. Zulm û xedra Fileyên Girîdê li Musulmana kirî, tu cîya nebîye; Ebdulhemîd dîsa deng nekir.

Berî culûsa(9) vî Xunkarî, me hinde waporên(10) qenc hebîn. Lakîn roja ev Xunkar hatî ser textî ve, ewî ew wapor hemî anîn wî halî ku êkcar bêwec(11) man. Çunkî ditirsa ku milet bi wan wapora wî ji textî bavêje. Ser vê wehmê,(12) hukumeta me tu wapor neman. Loma, hinga bî şerê Yunan, me nekarî weqtê de eskerî rêkin li ser hudûd. Heta esker gîha hududî, Yunanîya gelek ji Musulmana kuştin. Yunan waporên xwe rêkir, gelek welatên me(13) yên ber behrê da ber topa, texrîb kir. Paşê ewî zirhlîyên(14) xwe rêkir ber Girîdê, ew der da be topa. Me dîsa nekarî zirhlîyekê rêkin. Nîhayet Girîd ji des-

(3) Te'dîb bike: Terbîye bike, ceza bide wan.
(4) Paşayik: Paşîn, dûwayîn.
(5) Hişyarîya xwe nekin: Xwe hişyar nekin.
(6) Nezdîk: Nêzîk.
(7) Tesrîh û tesdîq dike: Eşkera dike û rast derdixe, tîne ber çavan û rastîya wê îspat dike.
(8) Ew: Xunkar, Evdilhemîd.
(9) Culûs: Rûniştina padîşahek li ser textê dewletê.
(10) Wapor: Gemî.
(11) Bêwec: Em rastê mana vê peyvikê nehatin. Dibe ku awayê wê yê rast "pûç" be û ew peyvik bi şaşî weha hatibe çapkirin.
(12) Wehm: Guman.
(13) Mexsed ji "welatên me", welatên împeratorîya Osmanî ne. Ji ber ku Kurdistan jî hingê di binê destê Osmanîyan da bûye, nivîskar weha nivîsîye.
(14) Zirhlî: Gemîyên şer ên zirxkirî, yên ku bi pola hatine qabkirin, hatine parastin.

tê me çû; ew welatê hinde xweş, hinde mezin qurbana wehma Xunkar bî. De vêca xîlafeta wî, Îmamulmuslîmînîya wî li ku dimîne!(15)

Gelî ulemano! Un çire van heqîqeta nabêjin cahilên nav destê we! Ev deyn li ser we ye. Divê mîr û axa tiştên holê bipirsin. Xunkar divîya hin dera ji nav Arnawudistanê(16) bide Yunanî. Arnawuda dest hilanîn, nehîştin. Un nuho ve şarîya xwe bikin.(17) "Îlacî waqie, pîş ez wuqû' bayed kerd".(18) Wekî zeman bûrî, hîmmet û xîret fêde nake; divê hemî tişt li zemanî be, da muessir be.(19)

*

Min bihîst ku ji wan ulemayên nav Remezanê diçin welata waz û nesîhet dikin, yek ji wan sahib hemîyet(20) çûye Rûmîlîyê;(21) wê derê, paş waz û nesîhetên axretê, ji xirabîya vî Xunkarî, bi vê zulm û seyyiatên(22) mirovên Ebdulhemîd û sebeba ev feqîrî û perîşanîya hukumeta me(23) kirîye,(24) paşê jî tehluka li ber me hemîya tesrîh û beyan kirîye.(25)

Gelî ulemayên Kurda! Ez umîd dikim ku van nezdîka de gelek ji we welatên xwe de heqîqetên holê î'la bikin.(26)

Tarîxa alemê de em tesadufê hin padîşaha dikin ku nefret û edaweta tebeeyên xwe celb kirine.(27) Lakîn em tu hukumdara nabînin ku neyarên welat û mileta xwe teltîf kirî.(28) Xunkarê me, paş şerê Yunanî gelek îhsan û nîşan û rutbe dan mirovên dor xwe. Ev îhsanên ha bê sebeb bîn. Çunkî şerî de waqia(29) eskerê me xalib bî; lakîn bi tedbîra wan erazilên(30) Serayê de Girîd ji destê me çû. Lakîn tiştek wî(31) heye, ew êkcar mûcibê heyret e.(32) Çunkî min cerîdeyên Awrupayê de xwend ku Xunkar nîşan daye qumandanekî navê wî "Qawara" ye. Evî qumandanî Musulmanên Girîdê dabî ber topa.

De vêca Kurdno! Qenc bizanibin ku heger neyarek hat ser we, ew neyarê we jî mezherê îltîfata Ebdulhemîd bibe.(33) Çunkî qibtîyên dor wî holê şîreta didin.

---

(15) Xîlafet: Xelîfetî.
Îmamulmuslîmînî: Pêşrewîya Musulmanan.
(16) Arnawudistan: Li jêrenota 45'an a jimareya pêşîn binêrin.
(17) Şarîya xwe bikin: Xwe hişyar bikin.
(18) Yanî "çare û havila bûyeran, divê ku berî qewimîna wan bê dîtin".
(19) Da muessir be: Da ku te'sîr bike, kar bike, fêda bide.
(20) Sahib hemîyet: Xwedîxîret, xîretkar.
(21) Li jêrenota 119'an a jimareya 13'an binêrin.
(22) Seyyiat: Piranîya "seyyiet" e, ew jî bi mana "xirabî" ye.
(23) Mexsed ji "hukumeta me", hukumeta Osmanî ye.
(24) Li vir kêmayîyek heye. Divîya ku bigota "qal kirîye" yan "behs kirîye".
(25) Tesrîh û beyan kirîye: Eşkera kirîye, anîye ber çavan.
(26) Holê î'la bikin: Weha bilind bikin.
(27) Edaweta tebeeyên xwe: Dijminîya peyrewên xwe, dijminîya pêgirtîyên xwe.
(28) Teltîf kirî: Qencî li wan kirîye, xelat daye wan.
(29) Waqia: Di eslê xwe da, bi rastî.
(30) Erazil: Piranîya "rezîl" e.
(31) Wî: Xunkar, Evdilhemîd.
(32) Mûcibê heyret e: Semedê şaşbûnê ye, semedê şaşmanê ye.
(33) Yanî teqdîra wî qazanc bike, ji alîyê wî ve bê ecibandin û teqdîrkirin.

EV KAXİDA HA Jİ ULEMAK KURD Jİ MARDÎNÊ Jİ MİN RE HAT, E Jî HİRE DERC DİKİM(34)

Mîrê min,

Ew cerîda ku we dest pê kirî her pazde roja carekê derdêxin, carna tê welatê me; nadîren(35) digîhe destê me, em dixwînin. Un hemî ku lawên Bedirxan Begê ne, mîrê me Kurdan in. Ji mîrên wek we, her qencîyê em întîzar dikin. Qencîya xizmeta babê te, welatê me gelek bîye. Ev hîmmeta, mucibê şukrana me ye.(36) Hema Xwedê hewe muweffeq bike. Ev xizmeta we înşaellah li nik Xwedê û Pêxember jî meqbûl e. Bi vê cerîdeyê, heta dinê heye te navê xwe îbqa kir.(37)

Ez benî, tu me li mearifê teşwîq û terxîb dikî.(38) Qencîya mearifê tiştek we ye ku kes nikare înkar bike; mearif nûrek we ye ku kor xweyçav dibin. Lakîn çi çare ku esbabê tehsîlê(39) li nik me tunîne. Kes nîne li me bipirsit. Xwdê çavê xaina kor bike.

Heçî ku Ebdulhemîd e, vêca me zanî ku heçîyê xêra Kurda re ye, ewî navê. Çi qas rezîl û bed'esil(40) hene, ewî dane dor xwe. Sehhar û mitirb nedîm û muşawirên wî ne.(41) Loma roje-roj halê me xirab dibe. Yê xebera Kurda bipirsit, bes lawên Bedirxan Begê mane.

Ez benî, ne hedê min e, lakîn te jî dereng dest pê kir; çire berî deh bîst salekê we ev cerîde îhdas nekir? Ev me'mûrên li serê me, zulmê li me dikin, malên me talan dikin. Lakîn ji lutf û kerema Xwedê umîd dikim ku paş nuho ev hal gelek dewam neke. "El-umûru merhûnetun bî ewqatîha".(42) Em we umîd dikin ku înşaellah ji îro pê ve, demê îqbal û seadeta(43) Kurda jî hat.

Tiştek heye em emîrandine,(44) ew jî ev e ku cerîdeyên dest ketin, min

---

(34) E jî hire derc dikim: Ez jî li vir bicî dikim, cî didim'ê, çap dikim.

(35) Nadîren: Pirr kêm, kêm caran.

(36) Mûcibê şukrana me ye: Semedê sipasa me ye, dibe semedê ku em ji te ra sipas dikin.

(37) Îbqa kir: Mayox kir, nemir kir, te wisa kir ku navê te bimîne, navê te neyê bîrkirin, nemire.

(38) Teşwîq û terxîb dikî: Dihewisînî, şewq û hewesa wê dixî dilê me.

(39) Esbabê tehsîlê: Rê û îmkanên xwendinê, çare û havilên fêrbûnê.

(40) Bed'esil: Esilxirab, kesê ku eslê wî xirab e, kesê bêesil.

(41) Sehhar: Sêrbaz, sêrkar.
Nedîm: Kesê nêzîkê mîr û padîşahan.
Muşawir: Şêwirdar, kesê ku pê dişêwire.

(42) Ev peyveka Erebî ye, mana wê weha ye: Tişt bi demên xwe ve girêdayî ne. Yanî "her tiştek wextê wî heye, her tiştek dema wî heye".

(43) Seadet: Bextyarî.

(44) Em emîrandine: Peyvika "emîrandine" di eslê rojnamê da weha derketîye. Lê belê guman tune ku şaşîyek di nivîsîna peyvikê da heye. Lewra di zimanê Kurdî da peyvikeka weha tune. Yan awayê wê yê rast "heyirandine" ye, yanî "em xistine heyretê, em şaş kirine, em ecêbmayî kirine" yan jî awayê wê yê rast "enirandine" ye, yanî "em ingirandine, em xeyidandine, em dilgiran kirine".

xwendin; hemî nafi'ê(45) milk û milet e; hun ji edaletê re çi qenc be wî dibêjin, ji tereqqîya(46) Kurda re çi hebe ewî dinivîsin. De vêca çire cerîda hewe meni' dikin, nahêlin bê welatê me! Qey Sultan Ebdulhemîd ji qencîyê înhîraf dike!(47) Em dibihîsin ku hemî dera mekteb hatine înşakirin,(48) esbab tehyie bîne.(49) Welatê me, hê tu eserê tereqqî nîne. Ji vî halî malûm dibe ku Xunkar navê(50) Kurd tereqqî bikin; divê her em ji hemîya kêm bimînin. Her(51) Kurda li ser kuştina Ermenîya tehrîk dike.(52) Me vêca zanî ku Ermenî mezlûm in. Me meqseda wî(53) zanî; ewî divê em her li halê wehşetê de bimînin, her Ermenîya re şerî bikin. Lakîn bila emîn be ku ji nuho pê ve lê heram be, nabîne.(54)

Em bi hîmmeta mîrên xwe de, hingî ji destê me bê em'ê paş nuho xizmeta însaniyetê bikin. Me vêca zanî ku hemî sebeba bela me Kurda fesad û xebaseta(55) qibtîyên Serayê ne. Heyfa min têt ku hinde hezar Kurd li İstanbulê hene, yek ji wan rojekê derbekê li wî mitirbê Ebulhuda nade, wucûda wî qibtîyunnesebî(56) mehw nake. Ez dimînin heyirî ku padîşahek çawa musexxerê(57) mitirbekî bîye.

Ez benî, vê carê ez ho dinivîsim. Înşaellah paş nuho ez'ê ji halê Kurdistanê gelek ji te re binivîsim. Lakîn ez nizanim ev tehrîrata(58) min wê bigîhît destê mîrê min. Ez ji kerema mîrê xwe umîd dikim ku wê cewabekê bide min.

Mela Salihê Cizîrî

---

(45) Nafi': Mefadar, tiştê ku mefa dide, fêde dide.
(46) Tereqqî: Pêşketin.
(47) Înhîraf dike: Avarê dibe.
(48) Înşakirin: Avakirin, çêkirin.
(49) Esbab tehyie bîne: Rê û wasiteyên pêşketinê hatine amadekirin, hatine hazirkirin.
(50) Navê: Naxwaze.
(51) Her: Tim, her dem. Ji vê peyvikê ra çend maneyên dî jî hene, lê li vir mana wê ev e.
(52) Tehrîk dike: Fît dike.
(53) Meqseda wî: Mexseda Evdilhemîd.
(54) Yanî "ew tiştê ku dixwaze, bila ew tişt lê heram be, ew wî tiştî nabîne, em li gora mexsed û daxwaza wî tevnagerin, em mexseda wî naynin cî".
(55) Xebaset: Xirabî.
(56) Qibtîyunneseb: Kesê bi eslê xwe Cengene, qibtî.
(57) Musexxer: Stûxwar, binferman, kesê ku di binê fermana kesek da be, jê ra stûyê xwe xwar bike, li gora daxwaza wî tevgere.
(58) Tehrîrat: Nivîsar.

BEDİRHAN BEY

Bedirhan Bey bin iki yüz elli altı senesinde(59) Kürdistan'ın zimam-ı idaresini elde ettiği zamanda, oraca müstahdem olan vülât ve memurînin gözleri bilinhisar ibadullahın emvalına dikilmiş ve kimi zengin görürler ise soyup soğana döndürmeyi ve tereddüd edenleri birer tehlikeye düşürmeyi her memur âdet-i cariye ittihaz etmiş olduğundan, her birisi eben an ceddin bulundukları mahallerde merci-i ahalî olan Kürd beylerinin, Mehmed Reşid Paşa'nın Diyarbekir valiliğinden mukaddem tutmuş oldukları meslek-i salabet ve mukavemet, Vali-i müşarünileyhin ekser-i umerayı Rumeli'ye teb'îd ettirmesiyle zail ve nicelerinin hanümanları muzmahil olmuş idi.

Vaktiyle hademât-ı cihadiyede ordu-i hümayunların kuvvetuzzahîri ve her ferdi meydan-ı harb ve vağanın şîr-i ner gibi birer dilîri olan ümeranın sonraları zaleme-i memurîn yüzünden tesadüf eyledikleri felâketler sıralarında, her aşiret ve nahiyeye, tahsisât-ı seneviye-i örfiyelerinden fazla vali, kaimmakam, divan kâtibi, kethüda, mühürdar ve kavasbaşı gibi daire takımlarına mahsus ve hizmet namıyle meşhur ağır teklifler dahi tahmîl olunarak, bu tekliflerin makadir-i fahişesi buyuruldular. Zahrlarında işaret ve şu işaretler üzerlerine "sahh" bile keşîde olunur idi.(60) Binaenalazalik,(61) her kaza ve aşiret ve nahiye, mahsusât-ı mîriyelerinin ez'afı tekâlîf-i munzamma ve gayri meşrua altında ezilerek, ve bununla da kanaat edilmeyerek zenginlerin müsadere ve tecrîm suretiyle de tesadüf etmedikleri felâket kalmazdı.

*

Bedirhan Bey merhumun, pederinin vefatından sonra zimam-ı idareyi elde etmesi, mezalim-i mezkûrenin şiddetle hüküm sürdüğü vakitler idi ki, bir valinin ve belki bir kaimmakamın garaz-ı şahsîsi uğrunda nice muteberanın bir işaretle boyunları urulur ve hanümanları tarümar edilir idi.

Bedirhan Bey ise, şu hali tecvîz edemediğinden, aşair ve kabailinin muhafazasını bililtizam, zalemenin aşair ve kabail-i mezkûreye tecavüzât-ı gayri meşrualarına bir sedd-i hail olmuş ve şu ahalînin mazhar oldukları hürriyet etraf ve civarındaki mahaller ahalîsine gıbtabahşa olarak, her şahısda, o daireye dühul ile mezalimden kurtulmak arzusu peyda olduğundan, Bedirhan Bey'in nüfuzu yürüdüğü mahaller, artık Cizre ve Bohtan havalîsine münhasır kalmayıp, Kürdistan kıtasının Hakkâri cihetine kadar tevessü' etmiş idi.

---

(59) Milâdî takvime göre 1841. Yazar, gazetenin 13. sayısındaki Kürdçe yazıda bu tarihi 1250 olarak vermişti. O da Milâdî takvime göre 1835 eder.

(60) Sahh: Arapça olan bu sözcük, "doğrudur" anlamına gelmektedir. Osmanlılar zamanında bu sözcük çeşitli alanlarda ve çeşitli konular için kullanılırdı. Öyle anlaşılıyor ki Kürdistan'daki görevlilere verilen ayrıcalıklara ilişkin kararlara, bu ayrıcalıkların yanlış olmadığının belirtilmesi için "sahh" damgası vurulmuştur.

(61) Binaenalazalik: Buna göre, bu nedenle, böylece, bunun üzerine.

Şu serbestî esnasında Musul ve Diyarbekir ve Van eyaletleri vülât ve memurîni, kıta-i mezkûre marbutâtına tesir-i nüfuz ettirmediklerinden, şu halin bekası Mîr-i müşarünileyhin daire-i nüfuz ve istiklalini gittikçe tevsî' ettireceği ve bilahare devlete büyük bir gaile açılacağı, eyalât-ı mütecavire valileri tarafından bilmüzakere ve o sırada Musul Valisi bulunan müteveffa(62) Esad Paşa'nın Dersaadet'e(63) vuku' bulan arzı ve vülât-ı mütecavire(64) valileri tarafından teyid olunmağla, bin iki yüz altmış üç senesi(65) şehr-i Şabanında Haleb Valisi Osman Paşa, Anadolu Ordusu müşîrliğine bittayin, Bedirhan Bey ile harb eylemesi hakkında kendisine canib-i padişahîden emir i'ta buyuruldu.

*

Bedirhan Bey'in üzerine sevk olunacak asakir-i nizamiyenin mahall-i ictimaı Diyarbekir olmaktan naşi', Müşîr-i müşarünileyh Diyarbekir'e azimetle, tecemmü' eden otuz bin kadar asakir-i nizamiye ve on beş bin nefîriam(66) ve kırk pare kadar topları bilistishab Cezire'ye doğru azîmet etmezden mukaddem, Kürdistan muharebesinin esbab ve evamirini hâvî ferman-ı âlî(67) Diyarbekir'in haricinde ve "Cirîd Meydanı" denilen mesîrede okunup birkaç bin ahalî istima' etmiş ve kıraatından sonra Diyarbekir Müftîsi Derviş ve mütehayyizan-ı hanedandan Hafız Mustafa ve Yusuf Necib Efendiler, Bedirhan Bey'i temin ile celb için Cezire'ye gönderilmişler idi. Avdetlerinde, kendisi devlete asî olmayıp her bir emre mutî' olduğunu ve fakat vatanını terkedemeyeceğini söylediği cevabını getirmelerini müteakib, Müşîr-i müşarünileyh, Bedirhan Bey'in muhalefette sebatını mumaileyhimin iğfalâtına ve beyinlerindeki münasebet ve hukuk-ı kadîmeden naşi' muhafaza-i istiklali için muavenetlerine atf ile keyfiyeti Dersaadet'e bilinha, Derviş Efendi Müftîlikten azl ile Hafız Mustafa Efendi Şam-ı şerife ve Yusuf Necib Efendi Van'a nefyedildiler.

---

(62) Müteveffa: Vefat etmiş olan kimse, ölmüş olan kimse, ölü kimse. Arapça olup "vefat"tan gelen ve "vefat etmiş olan kimse" anlamını taşıyan bu sözcük, burada yerinde kullanılmamıştır. Çünkü Arapçadan Osmanlıcaya geçen "müteveffa" sözcüğü, Osmanlılar döneminde bir terim olarak, Müslüman olmayan ölüler için kullanılırdı; Müslüman ölüler için ise, "rahmetli, rahmete gitmiş olan kimse" anlamına gelen "merhum" sözcüğünün kullanılması gelenekleşmişti. Gerçi sözlük anlamı yönünden burada kullanılması yanlış değildir ama, terim olarak Müslüman olmayanlar için kullanılması gelenekleştiği için, burada bir Müslüman için kullanılmış olması yerinde değildir; bunun yerine "merhum" kullanılması yerinde olacaktı.

(63) 5. sayıdaki 3 numaralı dipnota bakınız.

(64) "Komşu valiler" anlamına gelen bu iki sözcüğün yanlış dizgi sonucu olarak gazetede böyle çıktığı, doğrusunun "komşu iller" anlamına gelen "vilâyât-ı mütecavire" olduğu anlaşılmaktadır.

(65) Milâdî tarihe göre 1847 yılı.

(66) Nefîriam: Osmanlılar döneminde gereksinim duyulduğu zaman halktan oluşturulan silâhlı güç, bir çeşit milis gücü.

(67) Ferman-ı âlî: Yüce emir, padişah emri.

Osman Paşa Cizre'ye(68) gideceği sırada, Yusuf Efendi'nin kayınbiraderi olup Dersaadet'te bulunan ve Bedirhan Bey merhum ile muarefe-i kadîmesi olan Melâ Efendi, Babıâlî'ye(69) müracaatle, şu zat devlete isyan eder takımdan olmadığını ve esbab-ı tevahhuşunu beyan ile, beyhûde devletçe teklîfât-ı azîme ihtiyar ve birkaç yüzyıllık bir hanedan imha olunmaksızın, temine taraf-ı devletten kendisi memur edilir ise bilikna derdevlete(70) getireceğini arzetmekle, Efendi-i mumaileyh, kendisine verilen name-i hümayunu bilistishab Cizre'ye azîmet etmiş idi. Böyle bir emirname, **"Muharrerât-ı Nadire"**(71) nam kitabda münderic ve matbu'dur.

*

Melâ Efendi'nin Cizre canibine tekarrubu, Müşîr Osman Paşa'nın ordu-i hümayunla Cizre'ye birkaç saat mesafeye vâsıl olduğu bir sıraya tesadüf edip, temine memur olduğunu ve avdetine kadar ordu-i hümayunun ileriye sevki icab etmeyeceğini bilifade, Müşîr-i müşarünileyhe bu babda istihsal ettiği irade-i şahaneyi dahi ibraz etmiş ise de, Osman Paşa, bunca tekellüfle Cizre'ye yaklaşmış olduğu ve bir iş görüp de bir büyük şan kazanmak arzusuna düşmüş iken Melâ Efendi'nin bağteten zuhurüyle bu yolda ifadâtı, ye's-ü hiddetini mucib olup, kemal-i tehevvürle Efendi-i mumaileyhi tekdir etmiştir. Lakin memuriyetinden men'etmeye de cür'et edemediğinden, yol verip Cizre'ye göndermiş idi.

Melâ Efendi Bedirhan Bey'in nezdine bilvusul name-i hümayunu Bedirhan Bey'e ita ve teminat-ı lâzimeyi îfa etmesine mukabil, Bedirhan Bey ordu-i hümayuna uğramamak ve doğruca Dersaadet'e gitmeye niyet etmiş ise de, işin şu suretle hitampezîr olmasını arzu eylemeyen Osman Paşa, keyfiyetten haberdar olunca hemen askerle hücum ve muharebeye mübaşeret ve Bedirhan Bey dahi Osman Paşa'nın şu hareketi üzerine izhar-ı mukabele ve mukavemet eyledi. Osman Paşa Melâ Efendi'yi bittevkif, Bedirhan Bey ile ittifakını ve ordunun tehirine sebebiyet verdiğini ve temin bahanesiyle Bedirhan Bey'e vakit kazandırmak hizmetinde bulunduğunu Dersaadet'e arz ile, o dahi Van'a nefyedildi.

Hafız Mustafa Efendi Şam'da ve Melâ Efendi Van'da menfiyyen vefat ederek, Yusuf Necib Efendi birkaç sene sonra ıtlak olundu ise de, musadef olduğu mazarrat-ı azîme ve sekteden naşi', vefatına kadar muzayaka ve perişanî-i hal ile ömrünü geçirmiştir.

---

(68) Yazar bu adı kimi yerde Arapçadaki okunuş biçimiyle "Cezire", kimi yerde de Türkçedeki okunuş biçimiyle "Cizre" olarak yazmıştır. Kürdçede ise bu ad "Cizîr" biçiminde yazılır ve okunur.

(69) 4. sayıdaki 7 numaralı dipnota bakınız.

(70) Derdevlet: Devletin bulunduğu yer, devlet merkezi, başkent.

(71) "Nadir Yazılar, Az Bulunan Yazılar, Seyrek Bulunan Yazılar" demektir.

Lâkin ol vakit **"Takvim-i Vakayi"**(72) nüshalarında, lisan-ı resmî ile, Bedirhan Bey'in devam-ı isyanına ve biddefaât vuku' bulan teminatı adem-i kabul ile muhalefette ısrarına mebnî, üzerine asker sevk olunduğu muharrer ve mündericdir. Halbuki Mîr-i müşarünileyhin lisanından olmak üzre, "355" numrolu **"Takvim-i Vakayi"**e derc olunan ifadât derunundaki "vukuattan bir gün evvel bile böyle şeyleri mütalâa etmez idim" fıkrası, öyle eskiden isyana devam üzre olmadığına delildir.

"343" numrolu **"Takvim-i Vakayi"**de, Müşîr Osman Paşa'nın verdiği teminatı Bedirhan Bey adem-i kabul ile ordu-i hümayun üzerine alelacele hücum ve harbe cesaret etmiş iken bilmukabele mağluben ric'at ettiği ve iki gün sonra Serdar-ı Esbak Ferîk Ömer Paşa'nın kumandasındaki asker üzerine hücum ederek, sabaha kadar tarafeynden iş'al-ı naire-i harb ve kıtal eylediği ve birkaç meydan muharebesinden sonra bozulup Ewrex kalesine çekildiği ve sonra "Çemê Zeytûn"(73) denilen nam mahalde sabahtan akşama kadar devam eden yine bir meydan muharebesinde ibtida Bedirhan Bey muzaffer ve ordunun birçok mühimmatını ve birkaç pare topu zabt etmiş ise de, neticede yine eşya-i mezkûreyi terke ve Ewrex kalesinde tahassuna mecbur olduğu ve maiyeti serdarlarından Han Mahmud dahi Botan suyu kenarında harben münhezim olduğu tafsîl olunmuş; ve "345" numrolu **"Takvim-i Vakayi"**de, Bedirhan Bey kale-i mezkûrede tahassun eylediği halde, Osman Paşa civar-ı kaleye ledelvusul verdiği temini yine kabul ettiremediğinden, kaleden ve siperlerden asakir-i nizamiyeye top ve tüfeng endahtına ibtidar etmiş ve Ferîk Mustafa Paşa, Ferîk Ömer Paşa ve Sabri Paşalar, Osman Paşa kumandasıyle top ve havan ve humbara(74) ve tüfenglerle on üç gün kaleyi muhasara ve tazyik ettikten sonra, Bedirhan Bey istîman ve Müşîr Paşa dahi kendisine ita-i re'y-ü aman ederek orduya dehalet etmiş olduğu tafsîl edilmiştir.

Bilahare Bedirhan Bey, tekmil efrad-ı ailesiyle beraber İstanbul'a azîmet ettikten sonra Girid'e ikamete memur edilmiş ve bilahare Şam-ı şerife azîmetle, bin iki yüz seksen altı senesinde(75) orada irtihal-ı dar-ı beka etmiştir.(76) Rahmetullahi aleyhi!(77)

---

(72) "Olaylar Takvimi" anlamına gelen **"Takvim-i Vakayi"**, Osmanlı devletinin resmî gazetesinin adıydı.

(73) Ewrex: Botan bölgesinde yer alan eski bir kaledir. "O kenar, o taraf" anlamına gelmektedir. Türkçede "Evrah" biçiminde okunur.
Çemê Zeytûn: Zeytin Irmağı. Bu, Botan bölgesinde bulunan bir ırmaktır.

(74) Humbara: Eskiden havan topu ile atılan bir çeşit iri mermi.

(75) Milâdî takvime göre 1871 yılında.

(76) İrtihal-ı dar-ı beka etmiştir: Ebedî eve göçmüştür, öbür dünyaya göç etmiştir; yani vefat etmiştir.

(77) Rahmetullahi aleyhi: Allah'ın rahmeti O'nun üzerine olsun, Allah O'na rahmet etsin.

www.netewe.com

manî li Misrê xelîfeyê dewleta Fatimîye bî. Selahedîn jî li nik mamê xwe bî muawin.(104) Wê salê de mamê wî Esedudîn Şêrko wefat kir. Loma, Selahedîn ket şûna mamê xwe, bî wezîr. Zemanê wezareta(105) xwe de, Misrê çi qas alim, edîb(106) muharib(107) xelq heye, hemîya gelek hez Selahedîn kir. Loma şûna wî(108) bî Melîkê Misrê. Wekî Selahedîn bî Padîşahê Misrê, xutbe li navê Musteidbînûrîllah,(109) ku wî zemanî ji xulefayê Ebasîye bî, da xwendin û mezheba Şîî hilanî, qazîyên Şafiî nesb kir.(110) Weqta ku Îmadedîn wefat kir, xita Şamê(111) jî hemî ket binê hukmê wî de. Paşê milê Kurdistanê jî Cizîr û Diyarbekir ji hakimên Mosilê stand, û paşê nevîyê xwe Tûran Şah rêkir li ser Yemenê, ew der jî hemî îlhaqê hukumeta xwe kir.(112)

Selahedîn bîst û du sala hukumet kir. Sala pênc sed û heştê û notî(113) li Şamê pêncî û heft salî wefat kir. Ew xwe cesûr, adil, kerîm(114) û xweymerhemet bî. Hemî ulûm(115) û heta ilmê tib tehsîl kiribî. Îro Awrupa hemî, navê wî bi gelek îhtîram yad dike.(116) Ew mirov, mûcibê îftîxara hemî Musulmana ye.(117)

Ez hêvî ji Xwedê dikim ku nav Kurda du-sê mirovê dî wek wî sultanî peyda bibin, da Kurda ji wê tehluka ew û hemî Musulman tê de ne, xilas biket!

---

(104) Muawin: Alîkar.
(105) Wezaret: Wezîrî.
(106) Edîb: Nivîskarê edebîyatê, kesê ku bi edebîyatê mijûl dibe.
(107) Muharib: Şerkar.
(108) Şûna wî: Di şûna xelîfeyê dewleta Fatimîye, Adududînîllah da.
(109) Awayê rast "Mustedî'bînûrîllah" e.
(110) Nesb kir: Tayîn kir, wezîfe da wan.
(111) Xita Şamê: Hêla Şamê, herêma Şamê.
(112) Îlhaqê hukumeta xwe kir: Têkilê hukumeta xwe kir, da ser axa hukumeta xwe, tevê hukumeta xwe kir.
(113) Ev tarix di eslê rojnamê da weha derketîye. Lê belê eşkera ye ku ev şaş e. Tarîxa wefata Selahedînê Eyûbî li gora teqwîma Hîcrî 589 e, ku li gora teqwîma Miladî dibe 1193.
(114) Kerîm: Qencîkar, kesê ku qencî li xelkê dike.
(115) Ulûm: Piranîya "ilm" e, ew jî bi mana "zanyarî" ye.
(116) Îhtîram: Rêzdarî.
Yad dike: Bi bîr tîne, qal dike.
(117) Yanî "îftîxara hemî Musulmanan heq kirîye, hêja ye ku hemî Musulman pê îftîxar bikin û bipesinin".

TEHSÎNA QUMAŞ Û KALAYÊ WALAYÊ HUSNA HEBÎBAN E UMÛMEN TARÎZA CEWHER Û BUHAYÊ CEMALA SİTÎ Û ZÎNAN E MEXSÛSEN(118)

Herçî ku di qeyserê di dinya(119)
vêk dane Xwedê meta'û kala(120)

mecmûê xezainêd-i Qeyser(121)
hetta vigî duxmeya Skender(122)

durrê di defainêd-i Xaqan(123)
le'la ku di xatema Silêman(124)

herçend-i zîyade têrbuha bin(125)
bîlcumle bi cuz'ê husnê nabin(126)

*

Husna li ruxê Sitî û Zînê(127)
bû behreke ateşê evînê(128)

---

(118) Ev sernivîsara beşek ji **"Mem û Zîn"**ê ye, mana wê weha ye: "Qala qencîya qumaş û malhebûna bilind a rindîya dilbiran e bi awayekî giştî, nîşandana cewher û buhayê rindîya Sitî û Zînan e bi awayekî taybetî".

(119) Qeyser: Bi giştî bi mana "împerator" e, bi taybetî jî jibo împeratorê Bîzansê hatîye karanîn.

(120) Vêk dane Xwedê: Xwedê dane hemîyan, giştan.
Meta'û kala: Eşya û mal, tişt û malhebûn, serwet û dewlemendî.

(121) Yanî "temamê xizneyên împeratorê Bîzansê, xizneyên wî gişt".

(122) Vigî: Bigîje, bigîhe.
Duxmeya Skender: Ayîneya Eskenderê Romî ya ku wek radarek ji dûr ve gemî dîtine û kifş kirîye ku gemîyên dijmin in yan na.

(123) Durr: Mirarî.
Defain: Piranîya "defîne" ye, ew jî bi mana "xizne" ye.
Xaqan: Mîrê Tirkistanê, hukumdarê Tirkan.

(124) Le'l: Kevirekî rûmetgiran û têrbuha yê sor e, jibo rewşê û xemlê tê karanîn.
Xatema Silêman: Gustîla Silêman Pêxember, ku di eynê demê da wezîfa morek dîtîye û wek morek hatîye karanîn.

(125) Zîyade: Zêde, pirr.

(126) Bîlcumle: Hemî, pêkve.
Cuz'ê husnê: Parçeyek ji rindîyê, parçeyek ji xweşikîyê. Yanî "hemî bi qasê parçeyeka rindîyê tunin, hemî pêkve nahêjin parçeyeka rindîyê û xweşikîyê".

(127) Rux: Rû.

(128) Ateş: Agir.

Pêla ku digirte pêl û mewcan(129)
roja dikete hedîd û ewcan(130)

sed can û dil û ceger disotin(131)
xelqê bi mesel ji wan digotin(132)

Şems û qemeran qiran e pêkve(133)
Lew mişterî ev cîhan e pêkve

Seyyadê cemalê wan xezalan(134)
seyyatê sedayê wan delalan(135)

dellal-i sifet, gelek sifet şêr(136)
j'efxan û ji nalîyan nebûn têr(137)

Rojan û şevan gelek dinalîn
hetta ku digel, melek dikalîn

*

Husna nebitin çu hedd û xayet(138)
nabit jixwe aşiqan nîhayet(139)

Lê aşiq û bulhewes cuda ne(140)
Hin faîdexwaz û hin fîda ne

---

(129) Peyvika "pêl" a pêşîn bi mana "dem" e, peyvika "pêl" a 2'yan jî bi mana "pêla avê, pêla deryayê" ye. Yanî "dema ku wê deryayê pêl dida".
Mewc: Pêl.

(130) Hedîd: Cîyê nizim, cîyê daketî.
Ewc: Cîyê tewr bilind, cîyê bilintırîn, tepel, zîrwe. Yanî "ew deryaya agirê evînê, roja ku wek ava deryayê pêl dida û pêlên wê carna nizim dibûn û carna jî bilind dibûn û digîhan tepelê".

(131) Disotin: Dişewitandin.

(132) Yanî "xelkê wek çîrokan qala wan dikir, li ser wan dipeyivî".

(133) Şems û qemer: Roj û hîv. Mexsed Sitî û Zîn in.
Qiran: Li nik hev, digel hev, bi hev ra.

(134) Seyyad: Nêçîrvan.

(135) Seyyat: Bangkar, kesê ku bang dike û qala tiştek dike.
Seda: Dengan.

(136) Dellal sifet: Wek bangkaran, wek kesên ku bang dikin û qal dikin.
Sifet şêr: Wek şêran.

(137) Efxan: Fîxan, qîrîn, zarîn.

(138) Xayet: Paşî, dûwayî.

(139) Nîhayet: Paşî, dûwayî.

(140) Bulhewes: Heweskar, kesê ku hewesa tiştek dike.

Cananteleb in hinek jibo can(141)
hin canteleb in jiboyê canan(142)

Hin weslehebîn, ji rengê Tacdîn(143)
hin derdeguzîn, wekî Mem û Zîn(144)

ETFÊ ENAN Û LİCAM Bİ SER ENCAMÊ KELAM(145)

Da bêne bi ser hîkayeta pêş:
Xelqê ku ji derdê işqê dilrêş(146)

herçend-i ku bêhed û qiyas bûn
amî û xewadim û xewas bûn(147)

lakîn ji xewadimêd-i mumtaz(148)
sed lawê sehîqed û serefraz(149)

her yek di meqamê husnê, Rojek(150)
her yek bi kelamê, sînesojek(151)

her yek bi kemalê, bedremahek(152)
her yek bi cemalê, sedreşahek(153)

---

(141) Cananteleb: Yarxwaz, kesê ku daxwaza gîhana yara xwe yan yarê xwe dike.
(142) Canteleb: Canxwaz, gîyanxwaz, kesê ku canê xwe jibo yara xwe yan yarê xwe dixwaze.
(143) Weslehebîn: Kesê ku divê bigîje yara xwe yan yarê xwe.
(144) Derdeguzîn: Derdbijêr, kesê ku derd dibijêre, dibe derdedar, xwedîderd.
(145) Mana vê sernivîsara **"Mem û Zîn"**ê weha ye: "Vegerandina hevsar û bizmê bi ser dûwayîka peyvê ve". Yanî "wek ku siwarek hevsar û bizma hespê xwe bi alîyek ve vedigerîne, em jî hevsar û bizma babetê xwe bi alîyê dûwayîka peyva xwe ve bizivirînin û dûwayîka peyvê binivîsin".
(146) Dilrêş: Dilrîş dilkul. Ji ber ku peyvika paşîn a malika berîn "pêş" e, jibo lêkanîna qafîyê ev peyvik jî "dilrêş" hatîye nivîsîn; ne ku "dilrîş", digel ku eslê peyvikê wisa ye jî.
(147) Amî: Kesên ji rêzê, kesên adetî, kesên celebî.
Xewadim: Piranîya "xadim" e, ew jî bi mana "xizmetkar" e.
Xewas: Kesên pêşketî, kesên li pêş, kesên giregir.
(148) Mumtaz: bijare.
(149) Sehîqed: Bejndirêj, bejnbilind.
(150) Di meqamê husnê: Di cîyê rindî û spehîtîyê da, bi spehîtîya xwe.
(151) Bi kelamê: Bi peyvê, bi peyva xwe.
Sînesoj: Kesê ku sînga mirov, dilê mirov dişewitîne.
(152) Bedremah: Hîva tijî, hîva 14—15 şevî.
(153) Sedreşah: Sîngên şahan, wek wan xemilandî û spehî û xweşik.

Ew jî hemî aşiq in di talib(154)
ew jî hemî talib in di raxib(155)

Lakîn ne bi dîtin û şehadet(156)
belkî bi bihîstin û rîwayet(157)

Bîlcumle di xizmeta Emîr bûn
fîlcumle ji sirrê hev xebîr bûn(158)

*

Serhelqeyê wan perîmîsalan(159)
sertacê ewan melekxisalan(160)

Tacdîn-i digotin'ê ciwanek
Guhderzê zemane, pehlewanek

Nesl û neseb û heseb eyan bû
serdefter û serwerê kuran bû

Babê wî, digotin'ê Skender
Lakîn Ereban digo Xezenfer(161)

Lewra ku bi şêrî, şubhê şêr bû
roja şerî ew hezar-i mêr bû

Tacdîn du bira hebûn di qellaş(162)
manendê du şahîbazê cemmaş(163)

Daîm dilê dijminan disotin
Yek Arif û yek Çeko digotin

---

(154) Talib: Xwestox, daxwazkar, kesê ku tiştek dixwaze.
(155) Raxib: Heweskar, dilxwaz.
(156) Şehadet: Çavdîtin.
(157) Rîwayet: Gote-got, tiştê ku nehatîye dîtin, lê tê gotin, tê qalkirin.
(158) Sirr: Raz, tiştê ku tê veşartin û xwedîyê wî navê ku ew eşkera bibe.
Xebîr: Haydar, kesê ku haya wî ji tiştek heye, pê dizane.
(159) Serhelqe: Serxelek, kesê ku di serê rêzê da ye, serwer e.
Perîmîsal: kesê wek perîyan xweşik û spehî.
(160) Melekxisal: Kesê wek milyaketan, wek firîşteyan.
(161) Xezenfer: Şêr.
(162) Qellaş: Dekzan, kesê ku bi dek û dolaban dizane.
(163) Manend: Wek.
Şahîbaz: Teyrê baz.
Cemmaş: Nikulxûz, teyrê baz ê ku nikula wî xûz e.

Emma wî ji cumle xas û aman(164)
j'ew çend-i bira û bab û maman

lawek kiribû bira jibo xwe
Nê, ez xelet im; çira jibo xwe

Roja ku ewî bira nedîta
teşbîhê şeva çira nedîta

dinya li wî têk dibûye tarî(165)
Roj bû ku li wî dikir tewarî(166)

Enbazê fereh, şerîkê xem bû(167)
Sergeşteyê xem bi navê Mem bû(168)

Mem jî li wî aşiqek temam bû
ne şubhê bira û bab û mam bû

Herçend-i birayê axiret bû
te d'go ku dinê û axiret bû

Tacdîn weledê Wezîrê Dîwan
Mem jî xelefê Debîrê Dîwan(169)

Ew her du ciwan, we lêk-i aşiq(170)
ew her du bira, we pêkve sadiq(171)

yek Qeysê zeman e, yêk-i Leyla(172)
yek Wamiqê esr e, yêk-i Ezra(173)

---

(164) Xas: Kesê li pêş, kesê pêşketî, giregir.
Aman: Kesên ji rêzê, kesên adetî.
(165) Têk: Bi carek, peve, giştî, hemî.
(166) Dikir tewarî: Winda dibû, diçû ava.
(167) Enbazê fereh: Hevalê kêfxweşîyê.
(168) Sergeşte: Serlêgerîyayî, kesê ku derd û bela tên serê wî û serî lê digere, serê wî dikeve derdan û gêj dibe.
(169) Xelef: Jêmayî, kesê ku ji kesekî dî dimîne, kur yan keça kesek.
Debîr: Kargêr, karbidest.
(170) Lêk aşiq: Li hev aşiq. Mexsed ji "aşiq" îyê dostanî û hevalî ye, hezkirina di navbera dost û hevalan da ye. Yanî "ji hev hez dikirin".
(171) Sadiq: Rast, durust, kesê ku bi hevalê xwa ra rast û durust e.
(172) Qeys: Mecnûnê evîndarê Leylayê.
(173) Esr: Dem, zeman, sedsal.

Ew yarê ji dil, ne serserî bûn
Rehşubhetê Mihr û Mişterî bûn(174)

*

Yarî û birayî û muwaxat(175)
nabit bi riyayî û meqalat(176)

Yarî ne hêsanî ye, cefa ye
Meqsûd-i ji yarîyê wefa ye(177)

Axir tu eger nekî wefayê
ewwel mede ber xwe wê cefayê

Metbea ''Cem'îyeta Tefaq û Qencîya Musulmana'' tebi' bîye

---

(174) Yanî ''wek Rojê û stêra Mişterî bûn''.
(175) Yarî: Dostanî.
Muwaxat: Biratî.
(176) Riyayî: Riyakarî, şalûzî, durûtî, sextekarî.
Meqalat: Gotinan, peyvan. Mexsed peyvên vala yên bênaverok in.
(177) Meqsûd: Amanc, mexsed.

www.netewe.com

www.netewe.com

Heçî vê kaxidekî rêke ji min re, divê ser kaxizî weha binivîse: "Bî Genève necl'ul-merhûm Bedirxan Paşa Ebdurrehman Beg"

*

Her car du hezar cerîdeya ez'ê rêkim Kurdistanê, de belaş bidin xelkê

KURDİSTAN

1315

Pazde roja de carekê têt nivîsandin cerîdeya Kurdî ye

Kürdleri tahsil-i ulûm ve fünûna teşvik eder nasayih ve edebiyat-ı Kürdiyeyi hâvî on beş günde bir neşrolunur Kürdçe gazetedir

KÜRDİSTAN
Adresse: Rue de Carouge, no 7
GENÈVE (Suisse)

Gazetenin mesleğine muvafık Arabça, Türkçe, Farisîce mektublar Kürdçeye bittercüme neşrolunur

Unvan: Genève'de **"Kürdistan"** Gazetesi Sahib ve Muharriri Bedirhan Paşazade Abdurrahman

*

Her tabı'da 2000 nüsha Kürdistan vülât-ı izamına irsal ve vesatetleriyle kura ve kasabâta neşr-ü tamim olunacaktır

*

Kürdistan haricinde her yer için senelik abone bedeli 80 kuruştur Kürdistan dahilinde hususî isteyenlere meccanen gönderilir

Roja duşembê de 16 Rebîulewwel sene 1317 * Fi 24 Temmuz sene 1315(1)

ÎTÎZAR

Vê carê cerîda min gelek dereng ma. Sebeba wê jî: Welatê ez cerîda xwe lê dertînim, welatek Frenga ye.(2) Wê derê ser îstîqbala miletî(3) sê cerîde derdikevin; hin cara jî kitêb tebi' dibin.(4) Ew cerîde û kitêbên derdikevin, hemî bi lîsanê(5) Tirkî ne; ya min tenê bi lîsanê Kurmancî ye. Van roja hin qewî ki-

(1) Li gora tarîxa Mîladî 6 Tebax 1899(Milâdî tarihe göre 6 Ağustos 1899).
(2) Freng: Ne Musulman.
(3) Mexsed ji "milet" miletê Osmanî ye.
(4) Tebi' dibin: Çap dibin, tên çapkirin.
(5) Lîsan: Ziman.

têb(6) tebi' bîn. Loma meşxûliyeta murettibî(7) nehîşt cerîda min weqtê de derkevit. Ez îtîzar dikim; umîd dikim ku qariînê(8) cerîda, uzra min meqbûl bibînin û min mazûr û muaf(9) bigirin. Çunkî vî welatî de tu murettibên dî nînin. Ew murettibê hir jî, bi sewqa(10) hemiyet û xîreta xwe terkê welat kirîye; seadet û îstîqbala welatê xwe re, li hire dixebite.

*

Heçîyê Musulman e, divê ku Dewleta Osmanîye baqî bimîne.(11) Wekî me dît ku cîsmê dewletê ji sûê îdareyê merîz e,(12) divê em wî cîsmî tedawî bikin, esbabê merezê îzale bikin.(13) Saxîya dewletê saxîya me ye, mirina wê mirina me ye. Wekî me dît ku canewerek tê ser me, em xwe hifz dikin, bi hemî tedbîra wî canewerî helak dikin.(14) Lakîn gelek canewer hene ku em nabînin û yaxud em dibînin, lakîn mezerreta(15) wî his nakin. Ez an cumle,(16) padîşahek zalim ji hemî canewera muzirtir e.(17) Çunkî canewer yek yaxud du-sê mirova helak dike; lakîn padîşahê zalim miletekî mehw û îfna dike.(18) Mirovên nexwendî, nedîtî, wexameta padîşahê neadil nabîne; mexlûbê hîle û desayisên(19) wî dibe. Lakîn mirovê alim heqîqetê dizanin, dibînin. Îmdî(20) çawa mirov nefsa xwe ji marekî muhafeze dike, welê divê mirov dewleta xwe ji amir û me'mûrên xirab hîmaye biket.

Dewleta me "Dewletê Osmanîye" ye; eve eyamek e(21) ji sûê îdara Padîşahî, gelek zeîf û zebûn(22) bîye. Heger em, ku efradên dewletê ne, îlacekî nekin, la semehellah, înqîraz melhûz e.(23)

---

(6) Wisa tê zanîn ku mexsed ji "qewî kitêb" yan "gelek pirtûk" in yan jî "hin pirtûkên stûr" in.

(7) Murettib: Rêzkar, kesê ku di çapxanan da karê rêzkirinê dike, tîpên pirtûk û rojname û kovaran jibo çapkirinê rêz dike.

(8) Qariîn: Piranîya "qari" e, ew jî bi mana "xwendevan" e.

(9) Muaf: Efûkirî, bexşandî.

(10) Sewq: Dafdan.

(11) Baqî bimîne: Bijî, li ser lingan bimîne, jîyana xwe bidomîne.

(12) Cîsmê dewletê: Laşê dewletê.
Sûê îdare: Kargêrîya xirab, îdarekirina nebaş.
Merîz: Nexweş.

(13) Îzale bikin: Tune bikin, ji holê rakin, hilînin.

(14) Helak dikin: Tune dikin, dikujin, dimirînin.

(15) Mezerret: Zîyan, xesar.

(16) Ez an cumle: Ji vê celebê, ji vî tewirî, yek ji van tiştên ku em qala wan dikin.

(17) Muzirtir: Zîyankartir, tişt yan kesê ku zêdetir zîyan dide.

(18) Îfna dike: Tune dike, ji holê radike.

(19) Desayis: Piranîya "desîse" ye, ew jî bi mana "dek û dolab" e.

(20) Îmdî: Li gora vê rewşê, madem ku wisa ye, ji ber vî semedî. Ev peyvik, bi Tirkî ye.

(21) Eyamek e: Demek e, pêlek e.

(22) Zebûn: Ketî, qelsketî, kêmketî, bêhêz.

(23) La semehellah: Xwedê neke.
Înqjîraz: Tunebûn, wêranbûn, hilweşîn, rabûna ji holê.
Melhûz: Tiştê ku tê payin, mirov li hêvîya wî ye, mirov wî dipê.

Feqîrîya mileta me gelek zêde ye. Destê xelqê tu tişt nemaye; Padîşah wezîrên xwe ve tu tiştî destê efradê milet nahêle. Destê me de hinde erazîyê wesîe(24) hene ku ji feqîrîyê xeyrê mezrû'(25) mane. Heger Padîşah nîvê serweta xwe li wê rê serf bike, ew erazîyên ji feqîrîya milet şore(26) mayî wê mamûr û musmir(27) bibe, îhtîyaca ehalî teswîye bibe.(28) Lakîn sed heyf ku Padîşah ji sefaheta miletê muteellim, muteessir nabe.(29) Milet ji birça dikeribit,(30) yetîmên miletê ji serma nesax dibin, dinalin, histir ji çavan dibarin; lakîn Ebdulhemîd Sera xwe ya bilind de wan nabihîze, nabîne. Wekî bîlferz(31) yek feryada xwe gîhand'ê, Xunkar dienire. Dibêje "tu min reht dikî",(32) wî hebs dike, nefî dike. Ser te'mînê îstîqbala xwe(33) heyvê çil-pêncî hezara dide her wezîrekî; ser wehma(34) xwe meblexên dide xefîyeyên xwe, layuedd e.(35) Lakîn heçîyê bihemîyet û selabet e, mehrûmê nîmet, marûzê nîkbet e.(36)

Ebdulhemîd pera ji miletê xwe hildike dide banqeyê, faîza wan pera distîne. Heçîyê Musulman e, faîz li ser wî heram e. Ebdulhemîd dibêje "ez xelîfeyê Pêxember im"; paşê faîza pereyên ji mileta mezlûm û yetîm standî, dixwe. Heger dewleta me husnê îdare bibe,(37) wê ji hemî dewletên dî têrpere û mamûrtir bit. Lakîn îro ev dewleta hinde biqabiliyet, ji îhtîyac û zerûretê nalan e.(38) Sebeba vî halî, mueyyen Padîşah û umenayên wî ne.(39)

---

(24) Wesîe: Fire.

(25) Xeyrê mezrû': Neçandî, axa ku nehatîye çandin.

(26) Şore: Beyar, neçandî.

(27) Mamûr: Ava, avakirî. Li vir mexsed jê "axa çandî" ye.
Musmir: Berdar, ax yan dar yan karê ku ber dide xwedîyê xwe.

(28) Ehalî: Gel.
Teswîye bibe: dûz bibe, bê cî, pêkbê.

(29) Sefahet: Wisa tê zanîn ku ev peyvik di eslê rojnamê da bi şaşî weha derketîye û awayê wê yê rast "sefalet" e. Lewra "sefahet" bi mana "heng û kêf û zewq" e, ew jî li babetê vê nivîsarê nayê; lê belê herçî "sefalet" bi mana "xizanî û belengazî" ye, ew li babetê nivîsarê tê.
Muteellim: Azardîtî, êşayî, kesê ku ji ber tiştek azar dibîne, dêşe.

(30) Dikeribit: Bêhnteng dibe, xemgîn dibe.

(31) Wekî: Li vir bi mana "eger' e.
Bîlferz: Em wisa ferz bikin, em wisa qebûl bikin, em bêjin ku.

(32) Reht dikî: Diwestînî, diteebînî, dibetilînî.

(33) Ser te'mînê îstîqbala xwe: Li ser saxkirina pêşedema xwe, jibo ku pêşedema xwe sax bike, ewle bike, garantî bike, ji talukê biparêze.

(34) Wehm: Guman, gumana ku ji mirov ra çêdibe, li mirov peyda dibe.

(35) Meblex: Mîqdar, qas.
Xefîye: Polêsên nepenî, veşartî, ajan.
Layuedd: Bêjimar, tiştê ku nayê jimartin, ji jimarê zêde ye.

(36) Bihemîyet: Kesê welatevîn, kesê ku pêjna welatevînîyê pê ra heye.
Selabet: Zexmî, bawerîya zexm û xurt.
Marûzê nîkbet e: Bextreşî û alûzî û felaket tên pêşîya wî, pêşkarê wî dibin.

(37) Husnê îdare bibe: Baş bê îdarekirin, kargêrîya wê baş bê kirin, kargêrîya wê baş bibe.

(38) Ji îhtîyac û zerûretê: Ji ber îhtîyac û tengayîyê, ji rûyê îhtîyac û xizanîyê.

(39) Mueyyen: Hemin, bê guman, muheqqeq, ekîd.
Umenayên wî: Emînên wî, kesên ku ew bi wan emîn û ewle ye, kesên ku wî bawerîya xwe bi wan anîyê û bi wan ewle ye.

Warîdatên(40) dewleta Înglîz ji nisfê(41) warîdatên dinê hemîyî zêdetir e. Bi hinde serwet û samana(42) xwe ve, meblexa hukumta Înglîz ji hukumdarê xwe re texsîs kirî, gelek ji texsîsata hukumdarê me kêmtir e. Îmdî wek gelek halên dî, ev sefaheta(43) Xunkar jî wî xel' dike.(44) Yanî hukumeta me bêhukumdar e; bînaen'eleyh, mêja înê fasid e. Îsrafa li Sera(45) Xunkar dibit, naqabilê tarîfe e.

*

Rojekê, zemanê Îmam Elî redîyellahu enhu(46) xelîfe, mirovek çû li nik, tiştek jê pirsî. Îmam Elî cewab da'yê. Weqt şev bî. Weqta ku ewî mirovî cewaba lazim stand, dest hikatên afaqî(47) kir. Wê hingê Îmam Elî find temirand. Her du tarîyê de man. Ewî mirovî sebeba vî halî ji Îmam pirsî. Îmam Elî go: "Ewil wekî tu hatî, suala te û cewaba min ser şixulê ummetê bî. Loma heqê min hebî ez finda beytulmal(48) dide, bişixulînim. Lakîn paşê ser suhbeta nefsa me, ez nikarim eşyayê beytulmal ser şixulê ummetê dide min, serf bikim".

Gelî Musulmano! Aha xelîfe divê ho bit.(49) Ehwalên xulefayê raşîdîn(50) hemî ho bî.

Ji xulefayê Emewîye Umer bin Ebdulezîz rojekê nesax bî. Jina wî tenê xizmeta wî dikir; kesek dî tunebî. Rojekê birayê jina wî çû ser halxweşîya Umer bin Ebdulezîz. Ewî dît ku kirasê Xelîfe gelek rêqin(51) bî. Xweha xwe de enirî ku çire kirasê mêrê xwe holê rêqin dihêle. Xwehê cewaben(52) go: "Kiras'î(53) yek tenê ye, mimkun nebî bişot".

*

Gelî Kurdno! Carekê van hala teemmul bikin(54) û paşê ev debdebe û îhtîşam,(55) ev îsrafa Sera Xunkar tesewwur bikin. Wekî mirov halê Sera Xunkarê me dibîne, mirov ji Xwedê ditirse ku bêje ew xelîfe ye. Ji ecdadên vî Padîşa-

(40) Warîdat: Hatina abûrî, tiştên wek diravan ku ji kesan ra yan dewletan ra tên.
(41) Nisf: Nîv.
(42) Saman: Ew jî bi mana "serwet" e.
(43) Sefahet: Heng, kêf, zewq, jîyana bi kêf û zewq û hengê.
(44) Xel' dike: Ji xelîfetî û hukumdarîyê derdixe, dûwayî li xelîfetîya wî tîne, wî ji text dadixe.
(45) Ev her du peyvik di eslê rojnamê da bi şaşî weha hatibûn çapkirin: "Îsra li serafa". Me ew rast wergerandin tîpên Latînî.
(46) Redîyellahu enhu: Xwedê jê razî be.
(47) Hikatên afaqî: Qalkirina tiştên cure cure yên ku pêwendîya wan digel wî babetî tune, tiştên tewira-tewir.
(48) Beytulmal: Xizna dewletê, malîye.
(49) Divê ho bit: Divê weha be.
(50) Xulefayên raşîdîn: Xelîfeyên li ser rîya rast, ku Ebûbekir û Umer û Usman û Elî ne.
(51) Rêqin: Qirêjî, qilêrî.
(52) Cewaben: Di bersîva wî da.
(53) Kiras'î: Kirasê wî, kirasê Xelîfe.
(54) Teemmul bikin: Bifikirin, bidin hişê xwe.
(55) Îhtîşam: Jîyana bi nîşandan, debdebe.

hî sultan Osmanê Ewwel wekî wefat kir, tereka(56) wî ji tereka mirovek feqîr kêmtir bî. Lakîn bi tereka Ebdulhemîd, ev mileta hinde jar û feqîr hemî karin dewlemend bibin.

Sera Xunkar de hinde hezar keçên Çerkesa hene; halê wan keça ji halê esîra xirabtir e. Ew keçên Musulmana kiçik(57) dikevin Serayê de, wê derê de pîr dibin, dimirin; tu ca ji Serayê dernakevin. hew qas keç bêmêr, bêzarû dimînin. Ev hal hemî ser şewket û îhtîşama Ebdulhemîd e. Şûna Ebdulhemîd wan holê(58) hebs bihêle, heyata wan mehw û îfna bike,(59) wan hemîya bide mêran, efradên mileta xwe zêde bike, wan keçên yetîm(60) ji wî halê hebsê xilas bike, Xwedê û Pêxember û milet, hemî kes jê razî bibe.

Axura wî de hinde esp hene, emelmande dixun, vedixun, milet tu faydeyê ji wan nabîne; bîl'ekis mesrefa wan ji pişta miletî derdikeve. Şûna Xunkar wan heywana bi ser îhtîşama xwe ya saxte welê bê mehel xwedan bike,(61) wan bide eskerê xwe, zabitên xwe, wê gelek qenctir bike.

Lakîn Xunkar edl(62) û qencîyê berdaye, dest avêtîye sefahet û saxtekarîyê. Aqilmendên wî, şîretkerên wî mitirbên dor wî ne. Mitirbên dor wî her wehmê îlqayê wî dikin.(63) Ew jî we qas wehham(64) bîye, kî virekê bêj'ê bawer dike. Mirovên Serayê her wî ditirsînin, dibêjin'ê "milet'ê te bikuje". Ew jî ji tirsa xwe hema pera dide xelqên dor xwe. Ji wê rû,(65) menabi'ê serwet hişk kir.(66) Şûna bi edaletê nefsa xwe te'mîn bike,(67) bi îhsan û numayişa(68) divê xwe muhafeze biket. Lakîn nefsa bi edaletê hifz nebî, bi tu halî te'mîn nabit. Xunkar ji tirsa xwe ji Serayê dernakeve; bêna wî teng dibe, lew(69) de halê xwe piçekê xweş bibûrîne gelek zêde pera nefsa xwe re serf dike. Îstîqbala miletî yekcarî serê xwe re avêtîye.(70) Da seetekê xwe meşxûl bike, kare hezar zêra îsraf bike. Lakîn nefsê tu cara ji ezwaqê(71) şeytanî têr nabe; hingî mirov

---

(56) Tereke: Jêmayîya mirîyan, tiştê ku ji mirîyan dimîne.
(57) Kiçik: Biçûk.
(58) Holê: Welê, wisa.
(59) Îfna bike: Tune bike, ji holê rake.
(60) Yetîm: Sêwî.
(61) Bê mehel xwedan bike: Bê sebeb xwedî bike, tewş xwedî bike.
(62) Edl: Edalet, dad.
(63) Her: Tim, her dem.
Wehm: Guman.
Îlqayê wî dikin: Didin wî, dixin dilê wî.
(64) Wehham: Gumankar, kesê ku ji her tiştî û ji her kesî gumanan dike.
(65) Ji wê rû: Ji rûyê wê yekê, ji ber wê yekê.
(66) Menabi': Serçavî, jêder, kan.
Hişk kir: Ziwa kir, çikand, miçiqand.
(67) Te'mîn bike: Ewle bike, têxe ewletîyê.
(68) Îhsan: Qencî.
Numayiş: Nîşandan, numandin, ku mirov xwe nîşan bide.
(69) Lew: Loma, ji ber wê yekê.
(70) Yekcarî: Bi carek, bi tevayî, yeker, bi giştî.
Serê xwe re avêtîye: Ji serê xwe avêtîye, ji aqilê xwe avêtîye, ji hişê xwe derxistîye.
(71) Ezwaq: Piranîya "zewq" e.

nefsa xwe, zêhna xwe bide tiştên holê, yanî hingî mirov metbû'ê(72) hewayê nefsa xwe bibe, hew qas zêde esîrê nefsa xwe dibe.

Şûna Xunkar bi nesîhetên Qibtî Ebuddalal(73) nav fisq û fesadê de(74) umrî bibûrîne, mileta xwe nav sefaletê de bihêle; wan hala birevit, nedîmên xwe ji ciwanmêra întîxab biket(75) û mitirbên dor xwe ji Serayê teb'îd bike,(76) ehwalên xulefayê raşîdîn tedqîq biket, teqlîdê halê wan biket,(77) nefsa wî, seadeta wî, îstîqbala wî û ya miletî gelek mehfûz û mes'ûdtir bit.(78)

*

Ev halên ha îro malûmê alemê bîye. Tirk wan hala dizanin. Loma gelek cerîde îro hene, da van hala malûmê mirovên nezan bikin. Kurd dûrê İstanbulê ne. Ez bi vê cerîdeyê mecbûr im ku malûmê Kurda bikim. Wekî malûm bî, ji hemî Musulmana re ferz e ku dermanekî wî derdê muhlik(79)re peyda biket. Çunkî ev derd hadimê heyatê milet, muxribê weten û muzirê namûs e;(80) ji xirabîya Xunkar her milet mutezerir dibe.(81) Îhtîmal gelek ulema, gelek beg û axa vî halî dibînin, divên men' bikin; lakîn ser zewqa dinya xwe navên şurû' bikin.(82) Ser çend rojek zewqa xwe xizmetek hinde ferz îhmal dikin. Bila ev mirovên ha ji bîr nekin ku Pêxember "e. s."(83) ferman kirîye: "Hubbuddunya re'su kullî xetîetîn".(84)

---

(72) Metbû': Pêşrew, kes yan jî tiştê ku li pêşîya mirov e û mirov li pey wî diçe. Dijmana vê peyvikê jî "tabi" e, ew jî bi mana "peyrew" e; yanî "kesê ku li pey pêşrewek diçe, li pey kesek yan tiştek diçe". Wisa tê zanîn ku nivîskar li vir peyvika "metbû" bi şaşî di şûna peyvika "tabi" da nivîsîye. Lewra daxwaza wî ew e ku "hingî mirov li pey hewayê nefsa xwe here". Li gora vê yekê jî mirov dibe "tabi'ê hewayê nefsa xwe", ne ku dibe "metbû'ê hewayê nefsa xwe". Nefs dibe "metbû".

(73) Li jêrenota 17'an a jimareya 6'an binêrin.

(74) Fisq: Bêexlaqî, avarêtî.
Fesad: Xirabî, bêrêtî.

(75) Nedîmên xwe: Kesên li dora xwe, hevkarên xwe.
Întîxab biket: Bibijêre.

(76) Teb'îd bike: Dûr bixe.

(77) Tedqîq biket: Di çavê xwe ra derbas bike, li ser hûr bifikire, bi awayekî hûr û kûr bide ber çavê xwe.
Teqlîdê halê wan biket: Wek halê wan tevgere, rewşa wan ji xwe ra bike numûne û li gora wê tevgere.

(78) Mehfûz: Parastî, tişt yan kesê ku tê parastin.
Mes'ûdtir: Bextyartir.

(79) Muhlik: Tunekar, tiştê ku mirov dibe helakê, tune dike.

(80) Hadim: Wêrankar, ruxandox, tiştê ku tiştan wêran dike, diruxîne.
Muxrib: Ew jî bi mana "wêrankar" e.
Muzir: Zirarde, tişt yan kesê ku zirar dide mirov, mirov dixesirîne.

(81) Mutezerir dibe: Zirar dike, zirar dibîne, dixesire.

(82) Şurû' bikin: Dest pê kin, yanî dest bi têkoşînê bikin.

(83) Ev her du tîp kurtkirîyên du peyvikên Erebî ne, ew jî "eleyhîsselat" in, mana wan jî "selewat li ser be" ye. Ev peyv jibo Pêxember tê karanîn.

(84) Mana vê hedîsa Pêxmber weha ye: "Evîna dinyayê serê hemî xetayan e".

De vêca heçîyê ser zewqa dinya xwe hemîyeta xwe tatîl û îbtal bike, mueyyen wê ne axretê tenê, hetta li dinyayê xesar bike. Heger ne, zarûyên wî zerera wî bibînin. Seadeta me her li nav emrê Xwedê û Pêxember de ne. Weqta ku padîşahên me ev ewamir dustûrul'emel kird,(85) em li ser dinyayê xalib bîn. Lakîn hingê ewan ew hal terk kir, em kêmtirê alemê bîne. Padîşah li qasê îqtîdara xwe, efradê milet jî li dereca qeweta xwe mecbûr e wezîfa xwe cih bike.

Lakîn nav lefza(86) "hubbuddunya"yê de xêzek(87) heye ku muhtacê dîqet e. Yanî ya şerîet nehî û zem dike(88) hubbê dunya ye, ne dinya xwe ye. Dinya mezrea(89) axretê ye. Xwedê dinyayê de hinde nîmet dane me, divê em şikra wan eda bikin. Xwedê hinde enbîya(90) rêkirine li dinyayê. Loma, dinya xwe ne mezmûm e, lakîn hubba wê mezmûm e.(91) Zîra(92) mubtelayê hubbê dinyayê çi qas sahibê mal û menal(93) bibe, nikare tu qencîyê li kesê bike. Bîl'ekis(94) ji hirs û temea xwe(95) xirabîyê dike. Heçîyê ne mubtela, malê dinê hemî bikeve dest, ne şayanê muaxeze ye.(96) Kesbê mal û menal ne mezmûm e. Pêxember gotîye "el-kasibu hebîbullah".(97) Divê mirov dinya xwe de her bişixule. Şixul, mûcibê seadet e.(98) Wekî bi şixulê xwe mirov xweyserwet û saman bî, ew ne eyb e, ne guneh e. Bîl'ekis şayanê teqdîr û tehsîn e.(99) Zîra ew mirovê holê dewlemend bîyî, ledel'îcab(100) hemî malê xwe rîya milet û wetenê xwe serf dike; ji wî halê wî malûm dibe ku ew mirov ne mubtelayê hubbê dinê ye.

---

(85) Ewamir: Piranîya "emr" e.
Dustûrul'emel: Bingehoka kar, bingehê ku mirov karê xwe li ser wî saz dike.

(86) Lefz: Peyvik.

(87) Ev peyvik di eslê rojnamê da bi awayekî xerîb, wek "cîrek" yan "cêrek" derketibû. Me ew bi awayê rast "xêzek" nivîsî.

(88) Nehî: Tiştê ku Xwedê û Pêxember qedexe kirine.
Zem dike: Li dijê wî dipeyive, xirabîya wî dibêje.

(89) Mezree: Cotgeh, cîyê cotkirinê.

(90) Enbîya: Piranîya "nebî" ye, ew jî bi mana "pêxember" e.

(91) Mezmûm: Tiştê xirab ê ku qala wî bi xirabî tê kirin.
Hubb: Evîn, hezkirin, ku mirov tiştek yan kesek bievîne, jê hez bike.

(92) Zîra: Lewra.

(93) Menal: Malhebûn, serwet, dewlemendî.

(94) Bîl'ekis: Li çewtê vê yekê.

(95) Hirs: Daxwaza bêsînor jibo qazanckirina malhebûnê yan jî jibo gîhana amanceka sîyasî.

(96) Ne şayanê muaxeze ye: Ne hêjayê lêgirtinê ye, ne hêja ye ku mirov lê bigire û ji ber wê yekê wî sûcdar bidêre, wî gunehkar bike, li qusûra wî binêre.

(97) Mana vê hedîsa Pêxember ev e: "Kesê ku bi xebata xwe mal qazanc bike, ew xweşdivîyê Xwedê ye". Yanî "Xwedê jê hez dike".

(98) Şixul: Kar, xebat.
Mûcibê seadet e: Semedê bextyarîyê ye, mirov bextyar dike.

(99) Teqdîr: Zanîna qedrê tiştek yan kesek, ku mirov qedrê tiştek yan kesek bizane, rûmet bide wî tiştî yan wî kesî.
Tehsîn: Qencdêran, qencdîtin, ku mirov tiştek yan kesek qenc bidêre, qenc bibîne, qala wî bi qencî bike.

(100) Ledel'îcab: Dema pêwîstîyê, dema ku pêwîst be.

Hingî dewleta me(101) ketîye tehlukeyê de, gelek dera de eshabê hemîyet(102) gelek cem'îyet teşkîl dikin.(103) Yek ji wan cem'îyeta ku li Trablus-şamê ye,(104) ji min re kaxidek rêkirin. Eve ez wî kaxidî eynen li hire derc dikim.(105)

(101) Mexsed ji "dewleta me", dewleta Osmanî ye.
(102) Eshabê hemîyet: Xwedîyên pêjna welatevînîyê, kesên ku pêjn û hissa welatevînîyê bi wan ra heye, kesên welatevîn.
(103) Cem'îyet: Komele.
Teşkîl dikin: Saz dikin, dadimezirînin. Peyvika "teşkîl" di eslê rojnamê da bi awayê "teşekkul" derketibû. Ji ber ku ew awa şaş e, me bi awayê rast ew "teşkîl" nivîsî.
(104) Li jêrenota 78'an a jimareya 14'an binêrin.
(105) Li hire: Li vir.
Derc dikim: Bicî dikim, cî didim'ê.

www.netewe.com

Jİ XWEDÎYÊ ROJNAMA "KURDİSTAN" RA Lİ CENEWREYÊ(106)

Silav li te!

Rojnama we ya ronî ya ku li Cenewreyê di 15 rojan da carek bi navê **"Kurdistan"** derdikeve, me bi kêfxweşî û rêzdarîyeka temam ew dît û naveroka wê fam kir. Me dît ku ew rojname, bi hin peyv û nivîsaran xemilandî ye, ku ew hemî, ciwamêrîya we û xîretkarîya we ya neteweyî nîşan didin. Xwedayê ku çêtirînê daxwazjêkirîyan e, em jê daxwaz dikin ku karê we li hev bîne, hîmmeta we ya nemir û xîreta we ya bidûzen bişikirîne! Hun tim û tim bi çavê parastina xwedayî bên parastin!

Ev eşkerakirina kêfxweşîya me ye, li ser derketina zatên weha xîretkar di nava miletê Îslamê da di zemanê me da. Em ji Xwedê hêvî dikin ku ew'ê jibo pêşketina Îslamê bibe despêka serbilindîyê.

Komeleya me bêçareyan a ku ji pênc alimên Trablusşamê pêktê, amanca wê başkirin e(107) û rakirina zulmê ye, ku muxalifên fermanên Xwedayê mezin û gewre wê zulmê li rûyê erdê dibarînin. Ji ber vê yekê, em îftîxar dikin ku ji nuha pê ve dayin-standina me digel we hebe û em hin wa'z û nesîhetan di rojnama we da belav bikin. Em hêvîdar in ku Xwedê di vê yekê da karê me li hev bîne.

Ev, jibo hevnasînê û jibo sipaskirina ji we ra nameyeka despêkê ye. Di pêşedemê da em'ê tiştên pêwîst pêşkêş bikin.

Trablusşam, 5 Muherremulheram 1317(108)

Serokê Komeleya Başkirinê li Trablusşamê
Şêx Hesen

(106) Ev name bi Erebî hatîye nivîsîn û di rojnamê da jî bi Erebî derketîye. Me ew wergerand Kurdî û wergerana wê ya Kurdî li vir çap kir.
(107) Me peyvika "başkirin" di şûna peyvika "islah" a Erebî da nivîsî.
(108) Li gora tarîxa Mîladî 1899.

www.neteweb.com

HEWADÎS

Em hemî dizanin ku eve eyamek e(109) gelek gund û bajarên wetenî(110) ketin destê dewletên dî de. Wekî derek gîha dewleteke dî, gelek xelqên wî welatî nikarin terkê dar û dîyar(111) bikin; bîttebi' tabiê dewleta fatih dibin.(112) Wê rojê kaxidek ji Bosneyê hat.(113) Wî kaxidî de behsa halê Musulmanên wê derê dikin. Loma ez'ê, ji wan hinde welat û bajarên eve bîst sal e Xunkar dayî neyara, ez'ê vê cerîdeyê de halê Bosneyê binivîsim.

Vî kaxidî de dinivîsin ku hingî Bosne ketî destê dewleta Awusturyayê, zahîren(114) muhacereta(115) Musulmanên wê derê meni' dike; lakîn bi ef'al(116) û muameleyên xwe Musulmana mecbûrê hîcret dike. Çunkî Musulman û tebeeyên(117) dî Bosneyê de yeksan(118) nagire. Huqûqên Fila(119) gelek ji yên Musulmana zêdetir e. Hingî diçe Musulmana tezyîq dike,(120) da Musulman wê derê yekcar texlîye bikin.(121)

Ser wê meqsedê, ewil dest çiftlika(122) kir. Musulmanên wê derê ekserî(123) sahibê çiftlik in. Halek we kir nav eshabê erazî û emlak(124) ku daîm baisê nîza' û sida' dibe.(125) Emlakên Musulmana nav rencberên Awusturyayî de parve kir; şûna wan erazîyên ji wan standî, hukumetê buhak gelek

---

(109) Eyamek e: Demek e, pêlek e.
(110) Mexsed ji "weten", axa binê destê dewleta Osmanî ye.
(111) Dar û dîyar: Cî û welat, hêwir û herêm, cîyê mirov.
(112) Bîttebi': Tebîî, bi awayekî tebîî, jixwe.
Tabi: Peyrew, kesê ku li pey kesek yan vêkxistinek yan jî dewletek diçe.
Dewleta fatih: Dewleta ku ew der fetih kirîye, xistîye destê xwe.
(113) Bosne: Welatek ji welatên Ewrupayê ye. Li jêrê Ewrupayê, li hêla Balqan, li qeraxê deryaya Adrîyatîk dikeve. Di rewşa îroyîn da komarek ji her şeş komarên Yugoslavyayê ye. Di zimanên Ewrupî da jê ra tê gotin "Bosnie-Hertzégovine". Di dewra Osmanîyan da eyaleteka dewleta Osmanî bû û navê wê bi zimanê Osmanî "Bosna-Hersek" bû. Piranîya gelê wê Musulman in. Navê serbajarê wê "Sarajevo" ye, ku Osmanîyan jê ra digot "Saraybosna". Li gora Peymana Berlînê ya 1878'an ji destê Osmanîyan derket û ket binê fermanrewayîya Awusturyayê. Piştê Şerê Cîhanî yê Pêşîn, di sala 1918'an da dema dewleta Yugoslavyayê hat sazkirin, ew welat jî ket binê destê wê dewletê.
(114) Zahîren: Di rû da, bi çavdîtin, li ber çavan.
(115) Muhaceret: Cîhilbûn, rabûna mirovan ji cî û warên wan, barkirin. Peyvika "hîcret" jî bi vê maneyê ye.
(116) Ef'al: Piranîya "fî'l" e, ew jî bi mana "kar, karkirin" e.
(117) Tebee: Piranîya "tabi" e, ew jî bi mana "peyrew" e.
(118) Yeksan: Wek hev, bi tengek ra, yekteng.
(119) File: Kesên li ser dînê Îsa Pêxember.
(120) Tezyîq dike: Zordestî li wan dike, zor dide wan, wan diguvêşe.
(121) Texlîye bikin: Vala bikin.
(122) Çiftlik: Cotgeh, cîyê ku tê da cot tê kirin û heywan tên xwedîkirin.
(123) Ekserî: Piranî.
غزته مك خلاف مأمول ممالك محروسهٔ شاهانه لرينه منع دخولى باب عالى طرفندن تعميماً ولايانه تبليغ اولندينندن شو ممنوعيتك رفعى خصوصنك باب عالى يه اراده وفرمان بيورلمسى درت نومرولو وفى ٢١ مايس سنه ١٣١٤ تاريخلو غزته مده كى عريضه ايله عتبهٔ عاليلرى شاهانه لرندن عرض واسترحام اولنمشدى . بينه خلاف مأمول ممنوعيت مذكوره رفع ايدلمامش وحتى الرنده غزته م كورىلانلر توقيف ايدلمكده اولديغى كبى شو كردستان غزته سنك نشرى ، ضاى شاهانه لريه مخالف اولديغندن همان تركيله درسعادته عودتم وبو بابده كى ارادهٔ سنيه لريه اطاعت ايتمديكم حالده بكمش مأموريتلرمه متعلق بر سوء معامله تصنيع واسناد ومحكمهٔ عائده سندن استحصال اولنه جق اعلامله حكومت مصريه دن طلب اولنه جغم وحكومت مشار اليهانك دخى بوكا موافقتله چاكرلريمى جبراً تسليم ايده جكى اولدقجه شايان اعتماد اولمسى لازم كلان ومعيت جليلهٔ خديويه اركانندن اولوبه صدد الايجاب ارائه ايده جكم واسطهٔ معلومه ايله چاكرلريمه تبليغ اولندى .

پادشاهم ! شوكردجه غزته نك محسناتى بتون ارباب معارف و مدنيتك مسلمى اولوب شوحالده ذات همايونلرينه قارشو بوبابده اسباب ودلائل سرديله تطويل مقاله حاجت يوغيسه ده ممنوعيت معروضه نك عدم رفعى وبغيرحق حبس وتوقيف اشخاصله تهديدات واقعه حقنده مساعدهٔ سنيه لريله بعض استرحامده بولنه جغم . شويله كه :

جريده يا بري قي من وعد كربي كو ازي بخاشرا امريقا واسپانيايي بنڤيسم . عولي دڤي از ڤان دو دولتا ژوهره بچكا تعريف بكم: اسپانيا دولتك فرنگايا بري حفت صد سالا جهي نهو دولتا اسپانيايي لي اوبا ژيرين اسپانيايي خي بين مسلما تابي وي هنگي هن ژماوكين اموبه وي دري خليفه بين ژوپاشي خليفه بين وان عدالت بردان دست خرابي ي كرن علم ومعرفت نه ما وزير ووالي بين وان ژي دست برطيلا كرن مير وآعايان ژي ولك حضرت بي عليه السلام گوتي : « الناس على ملوك ملوكهم » دست ظلم وخرابي ي كرن گوندي، ربن بين ژار بين لوما فرنگا كاري وان عردين وان حي گرتن هن مسلمان رڤين ئيف اسلاميده افريقايي گلك ژوان هاتن كوشتن گلكژي مان وبدري برحكم فرنگا حيانها گلك ژوان بينه فله. اڤه وه بچكي ظان اسپانيا چه بي ونهو چه يه.

امريقاژي: عردلك گلك مظنه دوراوي حي بحره كسي اڤ عرد امريقايي نه دظاني زماني ملوكين اموبه له اندلسي سايا علم ومعرفتي ظانين كو عردلك وهاهيه هن قوي ژعالمين وان گي يا سوارين چون كشفا امريقايي سر بحرا محيطا اطلاسي گران ژهن سببا نه كارين گلك بگرن لوما تو عرد نه دين فكران لي هن علامت دين كو عردلك دي سر دنيايي هيه.

پاشي ١٤٩٨ تاريخا ميلادي انكوبري، چار صد صالا فرنگك ناڤ وي، (قرستوف قولومب) چو گلك گرا آو عرد امريقا ديت وكي فرنكا بهيست عردلك وها نو هاتي يه دين گلك فرنك چون وي دري فكرين كو خلكين امريقايي كو ڤنه لي جه وان گلك خوشه آخاويده گلك ظير وزيڤ هنه هيدي هيدي مروڤ علما ندن خوه علماندن هنر ومعرفتا هنكي چو امريقايي خوي ناڤ ودنك . كو دري مدرسه ومكتبك قنج بهيستن ظاروبين خوه ريكرن وي دري، دان خوندن نهو ژدواتين فرنكا جيا زيده تر خوي هنر ومعرفتن .حي دولت ژوان درسن . اڤه وه ظاني امريقا ژي، چه بي نهو چه يه.

شر امريقا واسپانيايي له سر بحري يه اسپانيا گلك دولتك كۆنه امريقا نويه لي سايا خپاندني سايا علم ومعرفتين خوه امريقايي طوپ وتفنگ وواپورين وه مظن هنه باتو دولتا ولي تينن .اسپانيا دظانه نكار دامريقاي لي چه كو اسپانيا ظلمي دكه امريقاي دڤي وان مروڤين مظلوم ژبن حكم اسپانيا خلاص بكه اسپانيا ژي ناڤي امريقايي، تيكل شغل خوه بكه لوما نهو شر وانه هنكي دست شري كرين واپورين امريقايي حمي دراكارز واپورين اسپانيايي شوطاندن غرقاندن نهو امريقايي جه وان مروڤين مظلوم كو ناڤ وي، دري، (كوبا) يه گلك عسكر اسپانيايي له ويدري، يه اودر كريه محاصره بيده. ولك امدظالان چه كو امريقا خوي هنر ومعرفته وي بكاربه اسپانيايي .

واپورين شري بين امريقايي بري چند روژكي چوين هن جزيره بين اسپانيايي بگرن لويدري راستي پازده واپورين اسپانيايي هاتن كو حمي ژي تژي طوپ وعسكر بين رخاجزيره يي ژي گلك طوپين اسپانيايي هبين وكي هڤ و دو ديتن ژهر دوملا طوپا دست پيكر مروڤين چوبين سيرا شري ژدنڤيسن كو وكي شر خوش ي، ژدنگي طوپا ژتقاندنا گله يا عردو عسمان دنالا وكي او گله بين دوصد سه صد حقه لطايا لواپورا دكت ودتقا وه دنگين عجيب ژوان دهات حچكو قيامته عردو عسمان تيكل هڤ دبن بگله كي واپورك مظن شوتي ونوط مير دربكيده هاتن كوشتن شري، سه چار ساعتا دوم كر واپورين اسپانيايي هن ژي شوطين هن ژي هاتن غرقاندن هن ژي ره خرا بون.

* لمعصري مطبعا جريده يا كردستاني طبع بيه *

گلی میر و آغانو هون لسایا کرمانجا میر و آغانن . لوما دڤی هون قنج فکرن، وان اوان بدن خوندن بعلمینن علم وهنرا هکی کرمانج بن هوئین میر و آغاتی ی ژ کیره بکن کرمانجین وه هنکی خورت دولمندین میر و آغایین وان ژی وی حوقاس خوی ناڤ ودنك بن لوما گلی مظنین کرمانجا دڤی هون ولك اولادین خوه فکرن کرمانجا . جریده یا بری ڤی من نڤیسی کو حضرت نبی علیه السلام امر کریه هون حمی شڤانن اوین اون شڤانین وان وی ژوه حمیا بین پرسین . گلی علمایین کردا دڤی معنا ڤی حدیثا شریف هون قنج بیژن مظنا دا بظانین دین سروان چه یه .

فضیلة العلم

حضرت پیغمبر علیه السلام گوتی یه . مروف قنج مروف زیده خوی نضل و کرم مروف عالمه ، کو مروڤین دی ژی فیدی دبین وا و محتاج کسی نابه .

دیسا حضرت نبی علیه السلام امر کریه کو ایمان طازی یه جلین ایمان تقوایه زیاتا وی حیایه ثمره یا وی ژی علمه لوما مروڤیین بی علم مروڤین نه خوندایی نکارن ثمره یی ژ ایمانا خوه بین .

مروڤین نیزیك درجه یا پیغمبری ی مروڤین عالم وجاهدن ژلوره اون چکو عالم بعلم خوه خلکی دعلمینه امر پیغمبر وربا راست . جاهد ژی بشیرین خوه امر پیغمبرا حفظ دکن لوما گلی میر و آغانو کرمانجو قنج بظانین خوندن علم و معرفت دنیا و آخرتی روی مروف سپی دکه مروف محتاجی تو نابه ریا خدیده پاش نهو ظاروبین خوه بعلمین علم و معرفتا هون بخلقتا خو شجیع جسور ژ هکی هون بین خوی علم هون بن ژدنی حمیا خورت تر دولمندتر بن .

خدی تعالی خطاب کریه ابراهیم خلیله السلام مره کو « از عالمیم حژ مروی لزما مروڤین خدی دناسن دڤین بعلمن علم و معرفتا دم تعالی ...

حضرت نبی علیه السلام گوتی یه « از چاوه ژ صحابه کی خوی چکك قنجتر وخوی فضل ترم ولی عالمك ژ عابدکی قنج تره خوی فضل تره . چاوه شڤا بدری هیڤ ژ اسطیرا خوی فضل تره ولی عالم ژ عابدا خوی فضل ترن فضلا مؤمن عالم حفتی درجه یا ژ فضلا مؤمن عابد زیده تره .

فخر عالم علیه السلام پرسینه کو عمل قنج کیژکه گوتی یه علم خدی تعالی یه . دیسا پرسینه کو مراد کیژان علمه گوتی یه علما ندا خدی تعالی . دیسا پرسینه کو یا پیغمبر ام پرسا عملین قنج ژ ته دکن توجوابا علم خدی تعالی ددی، مه ژو پاشی علیه السلام فرمان کر کو بعلما ندا علم خدیره عملین هندك گلك فیدی بی ددن مروف و نظانین وجهلا خدی تعالی گلك عمل توفیده بی نادن . — لوما بی علم گلك عبادتی گلك فیده بی نادت .

امام غزالی گوتی یه :

مروف ژ حیوانا بعلم فرق دن دوه بفوتا خوه ژ انسانی قوت تره فیل بهیزی بین خوه ژ انسانی مظن تره . شیر بجسارتا خوه جسور تره کامیشك ژ انسانی زیده تر دخوت وزکی وي مظن تره میرانیا جوگلك چکك ولك بیتا کی ژ میرانیا انسانا زیده تره انسان بعلمی بظانی ژ حیوانین دي فرق دن انسان علماندنا عامیره هاتنه خلقاندن .

***

لقمان گوتی یه . کرخوه رخ علما رو نه خدی تعالی عردي چاوه ببرا تا نور حکمه تا دکه ولی قلبین مروڤا ژی بنورا علم و حکمتي احیا دکه .

واجب تعالی لآیتا جلیله یا « شهد الله انه لا اله الا هو والملائکة واولوا العلم » ده عولی بخاخوه پاشی بخا ملائکا پاشی بخا خوبین خدی کریه ژو آیت ژی اشکار دبه کو علم ژ همی تشتا قنج تره .

وفنونه تشویق ایتمك وزمانه کوره القا آنده بولنمق اوزره کردلسانیله شوغزته یی احداث ونشر ایتدم .

چاکرلری امرادن بولنمش وغزته نك حاوی اولدیغی نصائح کردلسانیله طرف عیدانه مدن اجرا ایدلمش اولمغله کردلره طبیعت وقومیت حسیله فوق العاده حسن تأثیری مطلق اولدیغندن اکراون سنه مقدم شوغزته کبی برجریده موجود اولمش اولایدی . بونجه مداخلات وازعاجات اجانب موجب اولان کردستانك اغتشاشاتنه میدان ویرلمه مش وکلی برترقی وتمدن آثاری حاصل اولمش اولوردی .

پادشاهم چاکرلرنجه شوکرد جه غزته کردستانجه اجراسی التزام بیوریلان اصلاحاتی تسریع وتأمین وبعض مأمورینك ارتکاب ایتدکاری مظالمی منع ایده جك اسبابك برنجیلرندن اولوب شوصورت برچوق بلافه دارلر طرفندن دخی تصدیق ایدلمکده واساساً مندرجاتنده مضمر برشی اولمادیغی کبی تماماً حکومت سنیه نك تنسیب وآرزوسنه توفیقی دخی ممکن اولدیغندن هر حالده کردستانله کردلرك بولندقلری محال سائره یه دخولی خصوصنه رخصت اعطاسنك باب عالی یه اراده وفرمان بیورلمسنی خاکپای حاجتروای شاهانه لرینه التجا ایله استرحام ایدرم . اولبابده امروفرمان

اف خط من ژور بترکی ئاسی کاغذ که ژحضرت سلطان عبد الحمید خانه یه . ئافی کاغذیده ازهیئی دکم کوراذنا جریده یامن بده دا از ریکم کردستانی .

ژولاتین ازجریدارید کم ژمنره دئیسن کوجریده یین ازریدکم مأمورین حکومتی نادن خویا . چه کو کرمانجی نظانن دیژن ق من درحقا وان ه تشتك ئیسی نه .

هکی دیسا اذن ندان کو ازجریده یا خوه ریکم نیف کردا دئی کردحی بگهین هف ژوالیا متصرفا هیئی بکن دابهیلن از ئی جریده یی ریکم ولاتین کردا .

گلك ملت هنن ئه نیئین مه نه حی خوی جریده نه خوی کتیبن خوی مدرسه نه . کرد ژحی قوما زیده تر خوی غیرت وهمتن لوما بی کتیبی بی ئیساندن لسرمه عاره فهیته .

ولك احمد خانی گوتی :

کردی هبوا مه انصافك ه فیکرا بکرامه انقیادك
روئی وعجم وعرب تمامی ه حیا ژمه ره دکر غلامی
تکمیل دکرمه دین ودولت ه تحصیل دکرمه علم وحکمت

گلی میر وآغانو اتفاق بکن بگهین هف هکی والیا متصرفا گه بداوه ژختکاره تلغرافا بئیسن عرضحالا بشینن دا اذنا ئی جریدیی بدت از ژوره ریکم .

اف جریده یا از دئیسم من گلك خلکیره ریکریه مروف حی ئی جریدیی بیروز دکن کردا تبریك دکن . اف جریده وی به سبب کو کردژی ولك خلکی حیا دنیایده چه دبه حیا بهیسن بظانین . هن مروف هنن ئافین کرد بعلمن حالین دنیانی دئین سر چاك گرتی بمینن تشکی نظانین داولك ئین حقارت لوان بکن . وکی کرد خوی جریده بن ئیساندن بظانین مأمور بن ژمیر و آغایان بن حجبی ظلم لوان کر وی بکاریه ژمنره کاغذکی بئیسه ازی جریده یده اعلان بکم بشر ریده ازی دردوی بگهینم حیا گه ختکار . اوما ظالما ئافین کرد بین خوی جریده خوی ئیساندن چقا حیل وقوت سرمن هیه اری بخیتم کردا بعلمیم ئیساندن وحالی دن ژوانره جریدا ریکم .

خدی تعالی امر کریه کو مؤمن حمی برانه چاوه من خیرا براکه خوه بئ ولی ازی ژکردا ردژی بخیتم .

حچي ڤي كاغذكي ريكه
زمنره دڤي سر كاغذي
وها بشيسه :
بمصر نجل المرحوم بدرخان
پاشا مقداد مدحت بك
هر جار دو هزار جريده با
ازي ريكم كردستاني
ده بلاش بدن خاكي

كردستان

١٣١٥

كردلري تحصيل علوم وفنونه تشويق ايدر مصائب وادبيات كرديه يي حاوي

غزتهدر

عنوان
معمرده (كردستان) غزتهسي
صاحب ومحرري بدرخان
پاشا زاده
مقداد مدحت
هر طبعده ٢٠٠٠ نسخه كردستان
ولات عظامه ارسال و وساطتلريله
قرا وقصبات شهر وتعميم اولنه جقدر
كردستان خارجنده هر بر
ايچون سنه لك ايونه بدلي
٨٠ غروشدر
كردستان داخلنده خصوصي
استيارله مجاناً كوندريلور

پازده روزاده جاركي تيت نشيساندن جريده يا كردي

اون بش كونده بر نشر اولنور كرنجه غزته در

غزتهلك مسكه موفق عربجه تركجه فارسيجه مكتوبلر كردجه يه بالترجمه نشر اولنور

روزا پنجشمبي ده ١٢ ذو الحجه سنه ١٣١٦ پنجشنبه في ٢١ مايس سنه ١٣١٤

شوكتلو عظمتلو سلطان عبد الحميد ثاني
حضرتلرينه عرضه حال عبيدانه مدر . نومرو ١

پادشاهم سايهٔ معارفوايهٔ شاهانه لرنده برنجي دفعه اولهرق نشر واحداثنه موفق اولديغم كردجه (كردستان) غزتهسنك ممالك محروسهٔ شاهانه لرينه منع دخولي داخيه نظارت جليله سندن تعميماً ايجاب ايدنلره بيلديرلديكندن مذكور غزتهنك انتشار وتعميمي يولنده تصادف ايتديكم مشكلات حسبيله مقام صدارت عظما ايله مابين همايون ملوكانه لري باش كتابت جليلهسنه مراجعتله مشكلات مذكوره نك رفعي ضمننده وقوعبولان استرحامات عبيدانهمك خاكپاي همايونلرينه عرضني وشايد شو استرحاماتم دخي سائرلري مثلاو قولتوق آلتي ايديلهجك اولورسه آجيق عريضه لره كيفيتي سمع همايونلرينه ايصاله چاليشه جغمي اشعار ايتمش ايدم .

آره دن جواب آلنه جق قدر زمان كچديكي حالده بر خبر آلنه مديغندن استرحامات واقعهٔ عبيدانهم اليريده عند الايجاب اسملريني عرض ايده بيله جكم غرضكار بعض اصحاب نفوذك ممانعت وحيلوانتنه اوغرايه رق خاطرلرينه فدا ايدلمش مطالعه سيله « كردستان »ك برنجي صحيفه سيله عتبهٔ عليهٔ شاهانه لرينه عرضنه مجبور اولدم .

پادشاهم معلوم شاهانه لري بيور لدغي وجهله كردلر دولت ابد مدت عثمانيه لرينې تشكيل ايدن اقوامك اك كزيده لرندن وكردستان دخي موفقاً ايكي دولته هم حدود وعلى الخصوص اناطولي طرفندن تجاوز اعدايي مانع وحتي او جهتدن دشمني تهديد ايده بيلمك قابليتي ده حائز اولدقلرندن پولتيقه عالمنده مهم بر موقع اشغال ايتدكاري وبرچوق زمانلردنبري عثماني تابعيتله مفتخر بولندقلري حالده جلوس ميامن مأنوس همايونلرينه كلنجه يه قدر بونلرك تعليم وتدريسلريله اسباب ترقيلري هر نصلسه نظر دقته آلنامشدر .

قولاري ، امراي ، اكرادك ممتازلرندن و (كالكم راع وكلكم مسئول عن رعية) امر نبويسيله مأمور ومسئول بولندقلرندن حصهٔ عبيدانه مه دوشن وظيفه يي ايفا مقصديله كردلري تحصيل علوم

سر قنجيا كردا دريغستي اڤ زي نيرك وي يه في زماني قنجي هوڤاس دبت

خدي و پيغمبر پاش نهو وي هر آري كاريانه بكن ام ژي هر پوسته هيڤيا جريدانه نه دعاين قنج مدحين باش

ئوليژي نهو ژي ژخوه لسرمه دينه له شامي

ن ح.

تقريضك منظوم ديما ژشامي هاتي يه

پيروز ژته ره هزار جارا ... آڤ ذنكك نهو ئاڤ يارا
مژگينيا في جريده يا قنج ... شاباش دبن چڤا هبت گنج
اڤ شغل مظن ته كريه بدمت ... جارا عوڤلي نه كريه همت
اڤ رهبرا قنج ته داني بنياد ... كرمانج حمي ته كرنه ارشاد
في معرفتي تو جا نه هيله ... دائم ژ ته معين رسوله
روژا كو جريده تيته بازار ... هر در دبنه مثال پازار
چڤا هبتن لشهري آكراد ... قولي خوشياته كرنه معتاد
روحانيا باب وكال واجداد ... پي في هنري ته كرنهو شاد
پيونيا دولتا ته گش بت ... قامي تو هبي دلي ته خوش بت

لاو شيخ ا. فتاح

﴿ م وزين ﴾

نعمت شماري وتكرار شكر وگذاريا ماري دصورتي آيه داري و پرده بردار با پرورد كاريده دكل اخبانابا مناجانك مختصر كرد (١) ري

آيْ شكرِ ته جوهرا زبانى ... وَيْ ذكرته صيقلا جنانى
آيْ واحد بى شريك يكتا ... وَيْ واجد بى نظير وهمتا
آي باقي بى زوال دائم ... وي هادي بى فناي قائم
آي خالق ارض وآسمان ... وي خالق جمله انس وجانان
ملك وسلك وفلك بجارك ... بالجمله ته چيكرن تبارك
سبحانك كما خلقت ... احسنت فكيف ما فلقت
هر چيكونه چيكراى نكوكا ... [illegible] بزوار

(١) آو دَر حرفكي -

آڤ نه صد فيدپر مراري ... درودشيد شفاف وطاري
حصتيد مثال درّ غلطان ... هر شش جهت وچهار اركان
هر سي ولد يدپر موليد ... غبرا وسماد كل مقاليد
لوح وقلم وثوابت وعرش ... حيوان ونبات ومعدن وفرش
ظاهر كرن اڤ قدر صنائع ... پيدا كرن اڤ قدر بدائع
هر يك ژعدم كرن ته پيدا ... ابداع كرن ته بي هيولا
اي الجمله چه اول وچه آخر ... القصه چه مؤمن وچه كافر
هر يك ژته راوه بونه مظهر ... اوونك وان تو وي مضمر
بي حسن ته نينه وان وجودك ... بي نور ته نينه وان غودك
حكمت اوه باطني وظاهر ... قدرت اوه غائبي وحاضر
زينن ته تجزؤ تمكن ... اماوه دوان دكى توطن
گويا هى جسمكن توجاني ... گويا هى شهركن توخاني
حسناتيه زينتا حيبان ... رشكانيه غيرتا رقيبان
ميلانيه عاشقان دكيشت ... دردي تيه دل ژ برد ايشت
شيرين ته گره شكر لپرويز ... فرهاد ژونك اشك خونريز
ليلا ته گره بلا لقيسى ... رامين بته رام بولويسى
يوسف ته چرانا ز ليخا ... وامق ته كسا گها نده عذرا
شيخي وه كو پينجه حج ژاري ... دين كرته ژ بوكجا كفاري
نيلوفر ناز پروري كر ... آو ژي ته لهر مشتري كر
بالاي بلند ته دايه سروان ... پايند بلا ته دا تذر وان
سورگل ته كرن ژخاري پيدا ... بلبل ته كرن هزار شيدا
خوش رنگي ته داگياي صورگل ... خوش دنگى تبدا نواي بلبل
روناهى ته داسري شمالان ... پروا نه كرن بشوق نالان
محبوب ته چيكرن دِلكش ... مجزوب نه پي كرن مشوّش
اڤ عشق ومحبتا دَدِلدا ... آڤ زلف سلاسليد ملدا
آيانه ته چيكرن مقابل ... هر يك ته بهف كرن معادل
آينه ته چيكرن مكرر ... حسناخوه دوان ته كر مصوّر
آينه ژوان ويه كو آڤه ... او عكس ژوان وبه كو طاڤه

« پاشي به وى هبه »

لمصرى مطبعا (الهلال) ده طبع بيه

كرد بعلمن معرفت وصنعتا وي گلك ِكر ملتا اسلامى بين دولتژي وي لپشتا وان بتن وي هنگى كس نكاره خوه بده سر وان وي هنگى وي بكاربن وطن خوه تربين اجدادين خوه ژ بن صمين اسپين موسقوف خلاص بكن

دوسه ساله كرد وارمني تيكل هف ينه آف حال ها نه قنجه دولت ژ في حالي نه راضي به پاش نهو ازي في بحثيژي بنقيسم

دو دولتين فرنكا ناف يكي امريقا به ناف ِيكي اسپانيايه دست شري كرنه نهو شر وان سر بحري يه هردو مَل ژي خورتن . انشاء الله ازي في ژي بنقيسم

هن خالدي هنه لقدسا شريفن يك ژڤان خوى فضل وكرم شيخ يوسف ضياء الدين پاشا يه خدى عمر وى دريژ وعلم وى زيده بكه . برى شش سالا كتيبك چيكريه ناف في كتيبى (الهدية الحميدية في اللغة الكردية) يه اف كتيب وك عربي ى بحثا قواعدين عزمان كرمانجى دكه لغاتين كرمانجى حمى گهاندنه هف في كتيبيده نقيسى به مالاوى آقا اساسك ژ عزمان كرمانجاره دانى . از هيڤي دكم كو علما ومير وپاشايين كردا ژ في كتيبى پيدا بكن گلك كتيبك قنجه علمايين كرداره لازمه كو آوْ ژى ژ عزمانين خوه ره تشكى بنقيسن

عالمك ژ سورا هى سالا دي وفات كر رحمتا خدى ليه خدى كتيبى وى بغفرينه ناف وى حاجي عبد القادر بى اف مروف صاغيا خوه ده گلك خيتي درحقا علماندنا علم ومعرفتيره گلك بيت واشعارين كرمانجى دنقيسي ريدكر ولاتِ خوه سورا عزمانِ وى عزمانِ سورا يه لوما كرد حمى في عزماني نظانن . پشتا كتيبا م وزينيده بخط دست خوه هن بيت نقيسينه تبركاً من او ابيات لقي جريده بنقيسين وكي بدقت بى خواندن معنا وان خوش تيت فهم كرن

زمانه رسم جارانى نماوه چراغ ناظم ومنشي كژاوه
له دور ايه رومان وجريده اكر چه مقصده زانين باوه
امان قدرى بزانه ام كتيبه له دنيا استه كي همتاي نماوه
له ايام حيات شيخ خاني له سر نسخهٔ خط آو نوسراوه
لهلاي ارباب خوى وقدروقيمت خزينه گوهره وكيسه دراوه
له مجموع دول سوران و بوتان له سايهٔ ام كتيبه ناسراوه
له كردان غير حاجي وشيخ خاني
اساس نظم كردى داناوه

تقريض

ژشامى هاتيه

اف جريده يا ميرمه دَر يخستي هات شامى من يك پيدا كر چقا كردى نيزيك هنن من جثاندن وكي اف جريده ديتن ناڤي وي كردستانه خويِ وى ميرمه يه حميا عوْلي ماج كرن دانين سر سرِ خوه گلك شابين پاشى من ژوانره خوند وقادلى وان خوش بو حچكوته دني دايه وان اف نصيحت وخبرين نه نقيسين فنج كتن گُهِ وان ژانين اف تشتك فنجه ناف ِخوه ده خبر دان پاش نهو حچي بي مظن وى خوه ژ حمالي خلاص بكن بعلمن هوستايى بعلمن چكين نو ناف ِخوه ده در آقا بدن هف زار وكي خوه بدن مكتبا ريكن باژارى صنعت وهنرا . از سر كردي مه گلك دقهرم خدي دو تشتى فنجره ام خلقاندن يك شجاعنه يا دريژي سخاوته خوي وان هر دو تشتين فنج چره هولى كيم مناه چره بر دستى خلكيده ماله اف قباحتامه يه چگو ام مانه بي معرفت وصنعت . تو قي زحمت ومصرفى سر فنجيا كردا دكشيني نه اف جريده ژمه ره در يخستي به خدى ژنه راضى بت تو گلك آيت وحديثين راست ربين فنج نيشا مه دكي رحمت لباب ِنه بت خدي دولتانه مظن بكت او عدل وكرَما باب ِنه كري نهو ژي دبت سببا رحمتى او جريده تا

خوندا وی بکار بن بڤان کتیبا دَوار وَپزودَخلِ خوه بکه ریده هر سال کارا وی دو جارا وی زیده‌ترْ بیه

« لیس للانسان الاّ ما سعی »

انکو مروف چه قاس بخته چه‌قاس بشغله وی حوقاس کار بکه دڤی مروف ژڤی امر وفرمان خدی تعالی عبرتي بگره جارکی بپرسن حققاس مسلمان هنن سر دنیایی حی چه دِکن حققاس فرنك هنه هنده دولمدن خورتن اڤ مسلمانین ها چه دِکن . از ژوه‌ره حکمت بکم اغلبین مسلمانا بریشه وك کُردا بین بی خوندن وممرفت بین هنگی چوفکرین جیرانین وان فرنك دِعلمن خَوندن وممرفتا ژوان قوت تر ودَوامند تر دین عقل وان هات سَروان اوا ژی دست خوندنی کرن ظارو بین خَوه دان خوندن ریکرن دربن دور دا بعلمن صنعت وهنرا لی پچکی درنك مان نهو گلك دخیتن گلك خوی هنر وممرفت ژوان هنه

ڤي زماني هاده فرنك گلك خوی هنر وممرفتن . پار وکي دولتامه ویونانیا شرکرن دولتامه طوپ وتفنگین شری ژ فرنکا کري . نهو هیدي هیدی مسلمانژی علینه سلحا چیدکن لی نکارن وك فرنکا قنج چیکن.

گلي کردنو اوژي دست هِلانن بعلمن علم وهنرا دا خدے تعالی ورسول الله علیه السلام ژوه راضي به دا اون بکارن دین وناموساخوه ژ شرِ دشمنا حفظ بکن دا او ژي بکارن دین وطنین خوه ده رونن دا اوژی ژڤی رنجبري ی خلاص بین از گلك درا کردا دینم حیژی رنجبرن ژارن گلك ژِوان ژِ رَبني ی ژِ فقیري یِ ژِ غربي یِ دِتلفن . بك خوی علم وهنر دِکاره پنج صد مروڤاره شغلا بینه لوما هکي چ دك ژ میر وآغایین کردا علمین هنر وعلی وی هنگی کرد وی وطنین خوه‌ده ژ خوه‌ره شغلا بینن وی نه محتاجین بچن ژ دَرڤه ژارا وربن رنجبري ی بکن وی جه وکُندبن وانده عبوریا وان بیت

جریده یا عوثمانیه من نقیسیي که از لاو بدرخان پاشامه الحمد لله نها صاغ لسر دنیایی أم دَه وحمت برانه حمي خوي رتبه ومأمورین ام حیژي دخونن دنقیسن زِڤ مه‌ده پاشا وضابطین عسکریژي هنه شکر ژ خدره ام علینه معرفت وعلی هن مه شامیه هن استانبولینه هژي مأمورین ولاتانه ام ژ اجدادڤه میرین بوتان مظنین کرمانجانه لوما سَرَمه دینه دڤی ام قنجیا کرمانجاره بخپتن دڤی ام وَك ظارو بن خوه فکرن ظارو بین کرمانجا لوره ژ خلکین کردستاني کي ڤي ظارو بین خوه ریکت استانبولی دا بخونه ریکن جم برابین من استانبولی حچي ڤی ریکت مصری دڤی عوثلي کاغذکي ژمنره ریکت . سر کاغذی هو بنقیسن : (بمصر نجل المرحوم بدرخان باشا مقداد مدحت بك) اف کاغذ وی بگهیت دست من دڤی از بظانیم جوابا ڤی کاغذی از ریکم کودری لوما لکاغذیدم جه وناڤ خوه بنقیسن

دولتا موسقوف بیست سال پیست وپنج سال نابورت اسلامیره شری دکه حیفا من تیت گلك شراده دکاره اسلامی سبیا وی ژی چه کو اسلام نه وك موسقوف خوی صنعت وممرفته . ژمیژڤه موسقوف درك کرتی یه کو ناڤ وی دری قزانه درکه مظنه مسلمانین وبدرْژی گلکن . بری سه چار سالا مسلمانن وي‌دری ڤاصد ریکرن استانبولی هاوار وامداد خوستن کو موسقوف ناهیله مسلمانیا خوه تمام بکن موسقوف احکامین دین وان خرا دکه دڤی شریعتا محمدی ژ نِڤ وان هانه . وك من بیستی استانبولی نکاری وك ڤین امدادي ژوانره بکن رَبّنان ولی بن حکم موسقوفدمان خدي تعالی آری کاریا وَان بکه خدي تعالی نصرت وقوتي بده اسلامی . گلك اسلام بن حکم موسقوفدمه هیه خدي تعالی حیا خلاص بکه . گلی میر وآغایین کردا خدي تعالی هما کردستاني حفظ بکه اوژي دست هلنن ظارو بین خوه بدن خوندن دا بعلمن معرفت وصنعتا وکي

كردستان

۱۳۱۵

حچي ڤي كاغذكي ريكه ژمنوه دڤي سرْ كاغذى وها بنڤيسه (مصر نجل المرحوم بدرخان پاشا مقداد مدحت بك)

هر جار دُوهزار جريده يا بي پَرَه آزمے ريكم كردستانى ده بدين خلكى يازده روژا جاركي تيت تڤيساندن

* يازده روژا جاركي تيت تڤيساندن جريده يا كردي به *

كردلري تحصيل علوم وفنونه تشويق ايدر نصائح وادبيات كرديه‌يي حاوي

اون بش گونده بر نشر اولنور كردجه غزته‌در

غزته‌نك مسلكه موافق عربجه تركجه فارسجه مكتوبلر كردجه‌يه بالترجمه نشر اولنور

عنوان

مصرده « كردستان » غزته‌سي صاحب ومحرري بدرخان پاشا زاده

مقداد مدحت

هر طرفده . . . « كردستان » غزته‌سنه ولايات عثمانيه ارسال ووساطلريله قراوقصانه نشر ايتمم اولنه جقدر

كردستان خارجده هر بر ايچون سنه‌لك اعونه بدلي ۸۰ غروشدر

كردستان داخلنده خصوصي استيمالره مجانًا كوندريلور

روژا پنجشمبه ده ۲۸ ذوالحجه سنه ۱۳۱۵ پنجشنبه في ۷ مايس سنه ۱۳۱۴

بسم الله الرحمن الرحيم

« كلكم راعٍ وكلكم مسئول عن رعيته »

گلي علمالو پاشا ومير وآغايين كرمانجا اف حديثا شريفا حق ژور نڤيسي امر پيغمبر عليه السلامه انكو ژخنكار بگرن حيا شڤانين گوند حي سرهف ودو يا خدى تعالى مسئولن . انكو دڤي بين مظن پين خوي قوت ودولند خنكار و پاشا ومير دڤي فكرن پين لبن دستين خوده هكي فنكرين وان هكى بجي شغلين وان نديتن هكى اوندان خوندين هكي اوژشرين دشمنا حفظ نكرن خدى تعالى وى وان مير وآغا وحبا مسئول بكه

من جريده يا برى فيده بحثا آندلسى كربي چه گو پادشاهك ژوان عبدالرحمن ثالث خوندابي حژ علم ومعرفتا ذكر زمان ژيده خلك حي حيا هن شڤانژي خوندايين حكمنا (الناس على سلوك ملوكهم) دزكت نيڤا حالى چه گو حي خوين علم ومعرفت بين زمان وى پادشاهيده دولتا مسلمانا ژدولتين فرنگا حبا زيده‌تر خوي شوكت وقوت بي . گلي وارثين انبيا علمايين كردا ريا خديده دستين خوه هلدن دڤين خوه فكن مير وآغايين كرمانجا ترغيب وتشويقا علم ومعرفتا بكن

آفه ژحديثا شريفا (كلكم راعٍ وكلكم مسئول عن رعيته) آشكارا دبه كو از ژى بامر پيغمبر عليه السلام مأمورم خدمتى قنجي ژكُردارا بكم ريا قنج نشان وان بكم وان ژخرابي حفظ بكم چه كو دولت ناهيله كس ژمه پچه كردستانى لوما از بڤي جريده‌يي يا ليسرمن دين از دكم حدى آرى كار يا من ومسلمانا حبا بكه

« طلب العلم فريضة على كل مسلم ومسلمة » . آف حديثا پيغمبر عليه الصلوة والسلام انكو علماندنا على سر حي ميرْ وژنين مسلمانا فرضه . گلي مير وآغايين كرمانجا چاوه چه گو نمژ فرضه اون دكن ولى علماندنا عليژي سر وه فرضه . بى علم وخوندن نمژ وروژى تمام نابن . معروف چه قاس حزوطن خوه بكه بي علم نكاره قنجيكه تمام ژ وطن خوه‌ره بكه . ڤى زمانيده كتيبين وه قنج هاتنه تڤيساندن بحثا خوبى كرنا دوار و پيزى دكه بحثا چاندرنا گنم وجهي دكه بحثا حي تشنا دكه . مروڤين

هن ژميروآغاپين كردا كاغذ ريكرنه ژ منه دخوازن كو ازڤي جريده پيده بحثا حال نهو وادبياتا كردى انكو هن شعر وپيتين كرمانجى بنڤيسم لوما پاش نهو باذنا خدى آزى بحثا حالى نهو ژى بكم وهرجار هن بيت وشعرين كرمانجى وحكاتين قنج بنڤيسم

رحمتا خدي لى به خدي گنه وي بغفرينه سالا هزار وصد وپنجيده جزيرى احمد خاني كتيبك منظوم ڤيسى يه ناف ڤى كتيبى كريه (م وزين) اف كتيب حمي بيت وشعرن اشكاره حكاتا عشقا دو جوانا يه باطن گلك مقصد وحصه وحكمت ژي تين فهم كرن لوما دڤى مروف بدقت بخوينن. هر جريده كيده آزي ژوي كتيبي هنى بنڤيسم حتى خلاص بيه

آو كتيب بري دو صد ودە سالا هاتيه نڤيساندن هن درين وي حشفينه ناپين خوندن درين نه بين خوندن انشاء الله ازي بكارم بخره تمام بكم. هكي ژڤى كتيبى دست بكيد. هيڤن ازهيڤي دكم ژمنرا ريكت دا از بالدست خوه ده راست بكم پاشي آزي ديسا كتيباوي ژيره ريكم. نيتامن ازي وي كتيبى طبع ژي بكم حجي ڤى بلا نهوڤه ژمنره بنڤيسه

احمد خاني رحمة الله عليه لوي كتيبيده عوڤل دست شكرو مناجات ونعتا كريه پاشى دست اصل حكاتي دكه. من آف كتيب جارنا هن علما پين ترك وعرباره خونديه وترجمه كريه حيا ژي كونى به كوتى ربده ژڤي كتيبى چه ترمه نه ديه

﴿ م وزين ﴾

سرنامهٔ نامه ناف الله — بي ناف وى ناتمامه والله
اى مطلع حسن عشقبازى — محبوب حقيقي ومجازي
ناڤي تيه لوح ناميا عشق — اسمى تيه نقش خاميا عشق
بي نقش ته نقش خامه خامه — بى ناف ته ناف نامه نامه
ناڤى تيه شاه بيت مقصود — فهرست مكاتبات محمود
مضمون مراسلات لا ريب — مشهود مكاشفات بالغيب
محبوب قلوب من له القلب — قلبان تودكي باخوه ڤن حلب
معشوق تويي بفخر ونازي — عاشق تويي ليك بي نيازي
مطلق تو مفيد ومستفادي — بى شبه مريد وهم مرادي
نوري تود حسن روي دلدار — ناري تودد قلب عاشق زار
شمعي نه ژقسم نور ونارى — شمسى ژعيان تو پرده داري
كنجي تود نيف طلسم عالم — كنزي توعيان ژاسم آدم
اف عالم وآدمي ومشهود — اف ممكن وما سواي موجود
هميان به تيه مداره ودبر — فياض رياض خلق وولامر
امري ته بانظ كن دو عالم — موجود كرن غرض چه آدم
آدم بخوه بك ژهر دو انه — يك حرف ژ امر كن فكان
أو حرف حقيقتا تحقق — هم امره بقدرته هم خلق
اشباح مرسمن ژناسوت — ارواح موسمن بلاهوت
اف روح وجسد بجيروا كراه — تزويج بوين باس الله
ناسوتى اكرچه رنك سفاله — لاهوتي ژپرتو جماله
حرفا گومه گوتي نقش هوره — لى مقصد ومعناوى هوره
ظاهرته اگرنما به صفرا — باطن اوه نقش خامه كبرا
موجوده دوي شهادت غيب — مشهوده دوى سيادت وعيب
انسان بخوه هم ظلامه هم نور — آدم ژته هم قريبه هم دور
هندي وه گوجنس عالي نه — او تابع نسوع آدمي نه
اڤرنگه فلك همى معظم — اڤجنده ملك همي مكرم
اڤكار كيا عظيمه دوار — اف باركيا بديعه سيار
اڤجنده زمين دكل عناصر — اڤرنكه غرض دكل جواهر
اڤجنده نعمت ونفائيس — اڤرنگه ما كل وملابس
اڤجندهه مدعاو مطلوب — اڤرنگه مشتها ومحبوب
حيوان ومعادن ونباتات — مطلوب ومقاصد ومرادات
باجمله ژبومرا لكارن — في الجمله ژبومه بر دبارن
حقا گوته خوش نظام ورونق — ترتيب كرن ژبومه الحق
ام غافل وعاطل وكنه كار — ماينه دڤيد نفس امار
نيان مه دقلبى فكر وذكرك — ناكن به زباني حمد وشكرك
خاني گونهن بقلبى ذاكر — باري بده وي زبان شاكر

« پاشي به وى هبه »

لمصرى مطبعا (الهلال) ده طبع بيه

ولك خنكارين خوه دست برطيلا فسق وفجوري كرن حكمنا (الناس على ملوك ملوكهم) امتكارى عيرنا مسلمانيى نه لخنكارين وان ما نه لوزير وماًموران مانه خلكى ما حمي كتن دردي برطيلا فلاً دوراوان گرت دست شرى كرن اتفاق نيف اسلاميده نما واليكي ملكيثه والى دي ملى ديثه كشاندفلاً كاري مسلمانا گلك ژن وظارو ومير اسير بين گلك مسلمان رقين افريقايي حمزي ژارورين بين هنگي چوحالِ وان خراب تر بي هنگي چوفله خورتر بين مسلمانا بكجار خوندن بردا معرفت وخرندن گها فلاً هنگي چومسلمان بين فله هندى هيدي دولتا ملوكين اميه خلاص بين دولتا فلاً كت شونا وانده حتى نهوژي لقيدين محكه بين وانده ناڤ هنه پاش چند بابا جدّوان مسلمانن آڤه ازي ناڤك ژوان ينڤيسم آڤ ناڤ ها ژقيدين محكمهٔ وانن آڤه او ناڤ (آلفونس كورِ فريده ريك كورِ هانري كورِ تومسون كورِ محمد بن ابو القاسم) آو سه ناڤين عوڤلي ذڤين فلاًنه باب وان فلاً محمد بن ابو القاسم بي ٠ گلي علما ومير وآغايين كردا هكي مروڤين حكمِ وه ژي برى اون ندن خوندن اون رينكن مكتبا دا بعلن معرفت وصنعتا ڤانيا وآخرتى گنهي وان سطوي وهيه چاوه فلهبين جبرانين مسلمانين آندلس آو دَرحمي گرتن ومسلمان كرن فله جيرانوه موسقوف ژي وي روژكى كردستانى بگره ناهيله اون مسلمانيا خوه بكن وي مزگفتين وه بكه دير وي ژن وظارو بين وه اسير بكه ژ پاشي اون بكجار نكارن خوه ژ دستِ وي خلاص بكن نهو هى حيل وقوتاوه دستوهدهيه بخپتن بخونن بعلن صنعت ومعرفتا اوَنى بكارن خوه ژشرِ جيرانِ خوه حفظ كن ٠ وان پيلاده دولتك مسلمانا ٠ هبى ناڤِ وان دولتا سلجوقيه بي ژ وپاشى دولت كها ميرك عشيرا تركا كو ناڤِ وي عثمان بي رحمتا خدي لى به مروڤك جامير مسلمان عادل بي عشيراوي هنگي چومظن بي خلكى هنگي عدالتاوي ديتن هاتن دوراوي كتن بن امر وحكمِ ويده ژو پاشي آو خوه چو بَر رحما خدي گورِ وي كت شوناوي اوژنى وَك باب خوه جسور ومير دركت دولت زمان ويده مظتر بي شكر خديره مسلمان ديسابين خوى دولت لژور مه گوتبى (الناس على سلوك ملوكهم) ڤان خنكارين ها حژ خوندنى دكرن لوما مير وزيرين وانژي خواندا بين عادل بين زمانين وانده ظلم تنبى مسلمان ژشرين دشمنا فلاً امين بين

جريده يا برى وبده مطبعه بيده مرتب حديثك شريف غلط نقيسي به راستي هويه (اطلبوا العلم ولو بالصين)

من گوتبي ازي بحثا شرِ مصر وسودانى بنقيسم اڤه ازى دست پى دكم:

ژميژوه نوزده هزار عسكر سودانيِ سيزرو هزار عسكر مصري پيش مقابل هڤ و دو سكنين كارسه شري دكرن روژا دي هر دو ملاً دست شري كرن شرخوش بي عسكر مصريره گلك طوپ هين هي ژدورڤه مصريا سودانى ران برطوپا حال لوان نهشت وكي پچكي نيزيك هڤ بين مصريا دست تفنگا ژي كرن خلكي سوداني ربنا چه كو بي صنعت ومعرفتن طوپ وتفنگين ولى وانره تنه بي دست گلكاده رُم وخشت وشيرومرتال وتفنگين چقماق هين حتى هي نيزيك تربين گلك ژ سودانيا هاتن كوشتن شرخوش بي سودانيا ايدي نكاري خوه پرگله و بركين عسكر مصري بگرن رقين مصريا بردايى وان ژ سودانيا سه هزار مير بريندار وتلف بين ژوان سه هزارا دوزده مير وآغانه انكو سركين عسكر سودانى نه چار هزار ژوان اسير بين نيف ڤان اسيراده ژي گلك مظنين سودانيا هنه ناڤِ مير وان (امير محموده) آو ژي هاتِ گرتن

ژ مصريا حفتى وپنج هاتن كوشتن چار صد بريندار بين بازده ضابط هاتن كوشتن وهن قوژي بريندارن

آڤه گلى مير وآغانو اون دينن اڤ شر چه عجيب يه سبيا ڤي مصري خواندانه علم شري دڤانن طوب وتفنگين وان هنه سلحين وان نونه ٠ سودانى جامير لى بي سلحن علم شرين ڤان سلحين نو نڤانن لوما مالاوان خرابي ايدي پاش نهو نكارن پشتاخوه راست بكن

موستوف ـ ياسپين خوه‌ڤه بده مر وى آخ وتر باه بري صد سالا فله‌پين فرنسز مصر ضبط ـ كرپين خدى ظانه نهوژى مصرى حكات دكن جامع ومزگفت كرنه دير وآخور ٠ ژو پاشي خدى نصرت دا اسلامى ـ فله رڤين چوپ جعين خوه جامع ومزگفت پاژ ـ كرن آو جامعين بي پين دير الحمد لله نهو اسلام تيده ئيژ دكن درخونن

ديسا حضرت پيغمبر عليه السلام گوتي يه « علوالهمة من الايمان » انكو همتا بلند ژ ايماني يه ٠ گلي كردنو الحمد لله خالك حي دظانن كوكرد خوى همتن كرد جامبرن جسورن خوانخوه لسر وطن خوه دريژينن لى حيفامن تيت نه خونداو دولندن بي معرفتن

ديسا حضرت رسول الله عليه السلام گوتى يه « اعمل لدنياك كأنك تعيش ابدًا واعمل لآخرتك كأنك تموت غدًا » انكو ژدنيا خوه ره وه بخته حچكو نُوَمت نامرى ژ آخرتا خوه ره ژى وه بخته حچكو نتوى صبه بمرى ٠ ورن ڤيجا ام بظانين مروف ژدنيا خوه ره چاوه ژ آخرتا خوه ره چاوه دڤى بخته ژدنيا پيره خپتاندن تجارته كسب وكاره علماندنا صنعت ومعرفتا يه ژ آخر تيده خپتاندن كرنا امر خدى تعالى و پيغمبر عليه السلامه الحمد لله كرد دينين خوه ده قنجن لى چه گونه خوندانه فنكارن آخرتا خوه ره قنج بخپتن

گلى ميرو آغانو فكرن پين هاتين سر دنيايي ڤه كي برحمتي تيت گوتن اون ژى وه بكن داناڤ وه ژى برحمتي بيت گوتن خوسكاوى اوى خيرك كر ٠ خير نه نميژ و ر وژ ينه نميژ و ر وژى ديني مروڤه نمى نڤى مروڤى وان بكه خير آوه كو مروف مكتب ومدرسا مزگفتا چيكه فكرن ظارو پين بي باب و بدن خوندن چه كواون نظانن بخونن اون نظانن تاريخا بخا اجدادين وه چه نڤيسي يه كي قنجى وكي خرابى دكر ٠ باذنا خدى تعالى پاش نهو آزى بخا تاريخا كرداژى بكم اصل ونسل وان ژ كويه ليڤ واندە چه مروڤين خونداخوى ناڤ ودنگ هاتنه آزي حي ي بنڤيسم ٠ مروڤك خونداعالمهبى ناڤ وى « احمد خاني » بي خدى ژى راضي به رحمتا خدى لى به ڤى مروڤى وين كيبين كرمانجى نڤيسينه آزى پاش نهو هن ژوان كتيبين وى ڤى جريده پيده بنڤيسم

وك از دبهيسم ژ كردا گلك دولند هنه گلى دولندين كردا بابين وه بدوكاز جاوى سپي چون بر رحما خدى اوژى وى ولى بجن لوان ظيرو زيڤين علبكين وه ده دريخن زيا خديده مكتب ومدرسا چيكن ظارو پين بي دى و باب بدن خوندن دا اون دنيا وآخرتى راحت بكن دا خدى ژوه راضي به ٠ درين آزلى گرايم من گلك مروڤين دولند ديتنه ظارو پين فقير دانه خوندن ريكرنه استانبولى مكتب ومدرسه پين مظن نهو حي مظن بينه حي ژى مأمور وضابطين دولتينه مروڤين آو دابين خوندن وكي وان دينن كي كاغذك ژوان تيت خدير شكر دكن كو او بين سبب سابا والده آو ظارو پين رَبن بين مروڤين خوى ناڤ ودنك بين مروڤين عالم ودولند ٠ آڤ مروڤين ها لدنيا وآخرتى روسپي نه الحمد لله آم مسلمانك مسلماني پيده ڤى آم آرى كار با هڤ ودو بكن

آزى بخا ملوكين امويه ژوه ره بكم خوندني چه ژوان كر نه خوندني چه كر ٠ بري حفت هشت صد سالا مل آندلسي دولتك مسلمان دركت سلطان وان ژامويه يابي چار پنج پادشاه ژوان خونداپين عادل وقوي خوي معرفت بين حژ خوندني دكرن سه چار سالاده گلك باژيرين فلاً گرتن يكژي ناڤ وي عبد الرحمن ثالث بي ڤي عبد الرحمن ثالث پنجي سالا پادشاهي كر مروڤين خونداپين وزيرين دوراوانژي خونداو عادل بين لوماچه باژيرين ناڤ عدالتا وان دچويى بي شرٰ تسليم دپين زمان ڤان خنكار اده اسلام گلك مظن بين خورت بين دولند بين مكتب ومدرسه پين مظن چه كرن جامعين حوقاس مظن چه كرن سر دنيا پيده وَك وان هى نه هاتنه چه كرن وى هنكى خليفهٔ مسلمانا نه ژ تركابي عرب بين ژ و پاشي بين بي پين خنكار دست خرابي ي ـ كرن خوندن ومعرفت بردان عدالت نما دست ظلى كرن وزير و مأمورا دست برطيلا كرن حي در تيكل هڤ بين حچي والى بين باژيرا هر يكي گل خنكار آزم قوتا اسلامى ژهڤ ڤقتا مأمور ژى حي

كردستان

١٣١٥

حجي كاغذك ڤي ريكه
دڤي ريكت مصرى سَرْ
ڤاڤ خويي ڤي جريده يي
لاو بدرخان پاشا
مقداد مدحت بكى
هرجار دُوهزار جريده يا
بي پَرَه آزي ريكم
كردستانى ده بِدِن خلكى
پازده روژا جاركي تيت
نڤيساندن

* كردلري ايقاظ وتحصيل صنايعه تشويق ايچون شمديلك *

اون بش گونده بر نشر اولنور كردجه عزتهدر

بعض امراي آكرادك ارزولريله مبني بوندن بويله احوال جاريه وادبيات كرديه‌دن دخي بحث اولمه‌جقدر . غزتهنك مسلكه موافق عربجه تركجه وفارسجه مكتوبلر كردجه‌يه مالترجمه نشر اولنور

مصرده «كردستان» غزتهسي صاحب ومحرري بدرخان پاشا زاده
* مقداد مدحت *

مرتبنده ... ٢ نسخه كردستان ولايت عطائيه ارسال ووساطتيله قرارو قصاته نشر وتعميم اولنه جقدر

كردستان خارجده هر بر ايچون سكسان اوره بدلي ٨٠ غر وشدر
كردستان دائره خصوصي استيلما ، مجاناً كوندريلور

* روژا پنجشمبه ده ١٤ ذوالحجه سنه ١٣١٥ پنجشنبه ڤي ٢٣ نيسان سنه ١٣١٤ *

بسم الله الرحمن الرحم

جريده‌يا عوثليده من پچكي بحثا قنجيا علم ومعرفتي كِرِيي آزڤي جريده‌يي سب وى دنڤيسم دَا آزكردا بعلمينم خوندِنى داكرد بظانين فَيدا خوندنى چه قاس گلكه . حضرت رسول عليه السلام گلك جارا امر كريه كو بعلمين خوندنى جريده‌يا عوثليده من هن جديثين شريف نڤيسيين آزى ڤيجاريژى هِن حديثين شريف بنڤيسم :

حضرت پيغمبر عليه السلام گوتى يه « اطلبوا العلم من المهد الى اللحد » انكو على ژماتكي حسيا تِرْبى بخوازن انكو دڤي مروف حوقاس كچك دست خوندنى بكت هى ژدَمى ماتكى حتى دڤي تربى . ظاروبين مانكى نكارن بخوزن لى مقصد انكو حوقاس زو دست خوندنى بكن خوندن حوقاس ئشتك فيده‌يه

ديسا حضرت نبي عليه السلام گوتى يه « حبُّ الوطن من الايمان » انكو حِرْى كرنا وطن ژ ايمانى يه مروقين خوى ايمان حژ وطن خوه دكن . گلى مير وآغا وپاشانو آز ژوه دپرسم كي ژوه حتى نهو ژ وطن خوه‌ره چه كريه دا آم بظانين اُون حِژ وطن خوه دِكن حرْى كرنا وطن آوه كو مروف نهيله دشمن مروف بكُفْه نيف وطن مروڤده حِرْى كرنا وطن آوه كو مروف وطن خوه آڤا بكه مكتبا ومدرسا خيراتا چيكه حرْى كرنا وطن آوَه كو مروف ظاروبين وطن خوه بده خوندن بده علماندنا صنعت ومعرفتا . خدى نكه هكي دشمن وه موسقوف هجوم وطن‌وه بكه اُونين چاوه شِروي دفع بكن موسقوف خوى طوپ وتفنگين‌وه عجيبه جهين مروف ژى وك طيرا دَخوبى گله وبرِكين خوه دگهينه وان درا . طوپين وه عجيب هنه دكاره بى وان طوپا چيا هلوَشينه حِرْى كرنا وطن آوه اونژى بِخِتِن بِعلمِن علم ومعرفتا كسب وكارى تجارتى بكى دُوْلند وخوى صنعت ومعرفت بين وَك دشمنين خوه بين خوى طوپ وتفنگين ڤي زماني دا اون بكاربن وطنِ ژِ صمين اسپين فلاً خلاص بكن

جاركى قنج بينن بيراخوه آخا وطن‌وه چه‌يه نه‌حى ژِ هستي وگوشتِ دى بابين وه‌نه تربين اجداد بين‌وه‌نه باش‌چند روژكى وى ژوه‌ره ژى بيه تربْ نه حيفه

دا خدی ژمیاراضي به دا اون ژشر دشمنن خوه‌امین بن خدي قنجي بده ملتا اسلامي

نها سودان ومصر شری دِکن میرك سودانیا ژبرَدَه میرین مصریا څه نه دیسا عسکری مصری دِکاره سودانیا اَمْ هر روژ جریده باده دِخونن دَه ژ مصریا تین کوشتن پنجی ژسودانیا تین کوشتن سببا ڤي خلکی سودانی نه خوندانه خدعه وحیله بین شرین ڤي زمانی نظانن طوپ وتفنگین ڤي زماني نین هبن ژي نظانن بعلبنن · جریده یا پاش ڤي ازی شر سودان ومصري قنج بنفیسم

پار دولتامه و یونانیا شرکرن شکرژخدیره دولتامه کاری یونانیا هیڤکیده عسکر اسلامي شش باژیرین مظن وژصدا بتر گوندین یونانیا گرتن · ژو پاشي موسقوف گت نیڤا حالیده نهشت ام زیده تر بچن مه صلح کر · شرائطین صلحي یکژی یونان وی چار ملیون ظلیرا بده دولتامه · چه گوهی اڤ پره ندان عسکر دولتي ڤي نیڤ باژیر وگوندین وانده نه · یونان وي ڤان یرا ژدولتین مظن دین بکه وبده دولتامه · بری ڤی شري دولتین فلاً گرتن ڤي دولتامه ژبی پره‌تي نکاره تو کسیره شربکه شکر ژخدیره دولتی چه‌قاس ڤي عسکر دریخست وکاري دشمن خوه · یونان دولتکه کچکه · خدی نکه هکي دولتي نکار بیا یونانی فله وی بڤینا یکجار دولتامسلماني ي ژدینایي هلان لی وکي هیڤکیده مه حوقاس باژیر وگوندین یونان گرتن حمي دولت مان عجبایي کوهنده زو زو مه کاری وان

چه قاس مسلمان سر دنیاي هبن حمي آري کاریا ژن وظارو بین عسکرین ڤي شریده هاتین شهید بي بین دکن · گلي کردنو آز وه بیڤم قاس دست وه‌هات پرا بگهین هڤ بدن متصرف ووالي‌بین وه دریکن استانبولی · ژحمی درا ریدکن استانبولی · استانبولی ناڤ شهیدا حیا نڤیسینه زیدکن ژن وظارو بین زانه

سر دنیا بید تو قوم نمانه ناڤ وبحثا گریدي نبیستن · ژمیژوه گرید دست مسلمانادە یه خلکین گریدي سه پارا یکژی مسلمانن دوبارژي فلهنه · توجارا فله ومسلمانین ویدری بی شر ناسکنن بري سالکي دیسا دست شری کرن ڤي جاري شر گلك مظن بی گلك کوند وباژیر خرابین شوطین چفتلك نمان یکجار خرابین گلك ژن وظارو بین مسلمانا هاتن کوشتن گلك کچین مسلمانا کتن دستین فلاّده گلك ژوان کچابین ژنین فلاً گلك ظارو بین مسلمانا سه چار سالی دي بابین وان هاتن کوشتن او خوه کتن دستین بابازین فلاّده کرن مکتبین‌خوه‌ده · اڤ ظارو حمي وي بعلن فله‌ڤي يي آف فله‌بین ها ژجسین یونانیا نه · حیفا من تیت گلك ژن وظارو ومیر هاتن کوشتن بین فله · من چاو خوه رسما ظاروگك مسلمان دیت رَبن چار سالی بي فلاً سه‌جها بریندار کربن · حتی نهو ژی کریدی شرنه کیمه چه‌قاس مسلمان هبن گلك ژسه رڤین ولاتین مسلمانا هنژسه هی مانه گریدي لی کس نویره بچه گوند خوه حیا خوه دانه هڤ باژیراده روتینن فلاً کوند وزڤي بین وان ژخوه‌ره برنه نها چه قاس مسلمان هبن جڤي دکن آر وجل وپرا ریدکن ژ مسلمانین گریدیره · رَبنا حمي طَازي وبرجي مانه

از ژبیر وآغایین کردا هیڤی دکم درحقا قنجیا کرداده چه بیت بیراکي بلا ژمنره بنفیسن ازي ڤي جریده‌بیده بنفیسم · وك ژورا ڤي جریده‌بی من نڤیسي دڤی کاغذي ریکن ژمنره مصري

لمصری مطبعة (الهلال) ده طبع یه

بري دوسه سالا دولتا چين و ژاپونيايي شركرن عسكر چيني ده جارا ژعسكر ژاپونيايي زيده‌تر بي حي شراده ژ اپونيايي كاري عسكر چيني . وَرِن ڤيجارى سبباً فى حالي بيرسن : مروڤين چيني جاهلن مروڤن چيني تشكي نظانن مروڤين چيني نظانن طوپ وتفنگين فى زماني بعملين عسكري ژاپونيايي طوپ وتفنگين خوه آو خوه چيدكن حي دَراره تجارتي كسب وكاري دكن لوما دولمندن سايا دولمنديان خوه سلاحين كيم زوكا ژدَرين دوركرين وخَوش خَوش ثَرين خوه كرن وكارين دُشمنين خوه نهو حي مالين خوه راحتِنْ كس نكاره خوه بده سروان

آز گلكْ درا گرانيه نهوژي لمصريه حي درا ظارو بين چركس وارنوود وعربا ديبم بابين وان برابين وان ريدكن مكتبا ددن خوندن لمصرى جامعا ازهرده راستي هنْ كردين صورا هاتم هنژكركوكينه هن ژمِلِ سليمانيه بينه حي دخونن . آز توجارا انودرا راستى مروڤين بوطا غرزان شيروان هكاريان نه هاتمه از تو مكتبا راستي مروڤين عشيرتين كردا نه هاتمه از چه قاس راستي مروڤين ڤان عشيرا تيم حي ژي رنجبرن ژارو رَبنِنْ صنعتكى هنركى نِظانِنْ

بَري شش هَيوا آز نصاغ بيم لوما ڤى زڤستاني آز هاتم . مصري مصريه باژيرك حَوقاس مظن وخوش حتى مروف نبينه مروف نكاره بوصفاوى بِظانيه آزْ هيدي هيدي كتم ئيف مصر يادە عليم حال وصنعتين وان كسب وكاراوان . آف خلكين مصرى مروڤين بيظراڤين نه جاميرن لى گلكْ دشُغلن ناوَستنْ لكودرى مكتب ومدرسەك قنج هبت نايژن دور ونيزيكه ظارو بين خوه ريدكن ددن خوندن دعلن صنعتا دعلن حي تشتا . نهو نيڤا مصريده ژخلكى مصرى حَوقاس خوندا وعالم هنه حوقاس . روڤين خوى صنعت وهنر هنه گلك . موزيى باژيرا وخوه چيدكن ئيف مصريادە مروف هنه طوپ وتفنگا چيدكن مروف هنه خانى بين پنجي مزل آڤادكن ئيف وان خوى صنعتاده مروف هنن روژى پنجي شيست جرخيا دسطين مال وخانيِ حميا خوشن حي خوي خاده غلامن وزڤ واندەنه خوندانى رَنْ ژى هنه لى هندركز

گلي مير وآغايين كرمانجا از ژوه دپرسم ژ خلكى مصرى چه كيماژوه هيه . كرد ژ مصريا جامبرترن هش وعقل وان زيده‌تره حي نميدا كرد ژمصريا قنجترن . ده ڤيجا چره خلكى مصرى وى ژكردا دولمندترين . لمصرى هن كرمانج هنه بپستنه كو ازهاتمه مصرى حي ژي هاتنه زبارنا من من حال حميا پرسي حي ژي دركڤاني وغلاميا مصريا دكن حي ژي بن منتا وان ده نهنا ژي بي ادبي كرنه ژجه خوه دربخستنه ژار وربن بينه هكي خوندا بيا هكى دست واندە ژي هنرك صنعتك هبيا هولى ژارو ربن نه دبين حيفا من تيت ژدركڤاني ي غلامي ي پيڤه كر تشكي نابن .

گلي علما ومير واغايين كردا اون حي اصل واصل من دظانن جد من حضرت خالد ابن وليده (رضي الله تعالى عنه) عشيرامه بوطانن شهرتا نسلامه عزيزانن از رياخديده دخيتم من آڤ جريده جيكر تي ريده از گلك پرا صرف دكم زحمتي دكشينم مقصدا من قنجيا كردايه اون ژي ژخيرا خديره دست هانن كردا بدن خوندن ظارو بين خوه بعلمين علم وادبي بعلمين صنعتا مروڤين مسلمان دڤى خوندا بن دڤى بعلم دبن خوه گلى علمايين كردا اون چره جامعا بحثا خرابيا جاهلى ي قنجيا علي ناكن .

خدى تعالى و پيغمبر (عليه السلام) بحثا علم وجهلى چه امر كرنه اون دظانن ڤانا حميا ژكرداره وعظ بكن الحمد لله تعالى آڤه يادگڤه بارامن ازدكم ايدي ژعلمايين كردا هيڤي دكم ڤي جريده يامن ژميرواغا وكرمانجاره بخوزن درحقا علماندنا عليده خدى تعالى وحضرت پيغمبر (عليه السلام) چه امر كريه اوي بكن عقلى واندە ژميرواغايين كردا ژي هيڤي دكم ظارو بين خوه حتى بين ده دوزده سالى گوند و باژيرين خوه ده بدن خوندن بعلمين مصحفا شريف وخوندنا جريده يا ژو پاشي بكن مكتب ومدرسه‌بين استانبولى شامى بغداي .

ديسا حضرتِ پيغمبر عليه السلام گوتي يه « العلم علمان علم الابدان وعلم الاديان » آنكو علم دِدونه يكرى علم بدنايه يكرى علم دين وايمانى يه علم بدنا حكيمي يه ٠ گلي مير وآغانو حتى نهو كى ژوه گوه دايه ثى امر پيغمبر كي ژوَه ظارو پين خَوه براپين خَوه مروڤين خوه ريكرنه دانه خَوَدِن كى ژوَه كوندِ خوه ده باژير خوه ده مكتبك مدرسه كك دايه چيكرن ٠ گلي علمانو اُون چره جريده پين عربي ناخونن دا اُون بظانن دنيايده چه ديه

ديسا حضرتِ پيغمبر عليه السلام گوتي يه « الكاسب حبيب الله » آنكو مروڤى كسب وكارى يكه خُدى تعالى حز وان دِكه ٠ اَو مروڤِ نه خوندايه نظانه جريده يا بخونه اَو مروڤِ جريده يا نه خونه نظانه لكودري تجارتِ قنج ديه جريده پين نهو تين شيساندن بحثا حي تشثا مركن مروڤين وان بخونتن وى بظانيه مالِ دستِ ويده لكودَري پرا دكه

ڤان سالين هاده استانبولى مكتبك هاتي يه چيكرن ناڤِ ثى مكتبى مكتبا عشيرايه غير ظارو پين عشيرا ظارو پين كسي قبول ناكن ژبغدا وشامى ژيني ثمر وعنزه حتى ظارو پين خوه ريدكن استانبولى ثى مكتبا عشيراده دِخونن هر سالِ دو هَيوا دچن مالين خوه پاشي ديسا تين شش هفت سالا ده عالمين قنج ژوان دَرْدِكڤن پاشي دوين دچن گوند وباژيرين خوه دولت هر هَيوْ پرا دِدَه وان دين مأمور هيدي هيدي دين متصرّف دين والي ٠ گلي مير وآغانو گُنهِ ظارو پين وه وى سطوى وه يه اُون ژي ظارو پين خوه ريكن بدن خوندن دولندين وه بلا گونداده مكتبا چيكن ريا خديده خبرا بكن

ديسا حضرتِ نبي عليه السلام گوتي يه « الحرب خدعة » گلي مير وآغا وكرمانجنو دنيا ظانه كرد جامير لى ثي زمانِ هاده شِر بجاميريِ تني نابتن طوپ وتفنگين وه عجيب دَركتنه حَوڤا دور دچن جهى مروڤ دَنگِ وان نهيست گُلّهْ دَبِركين وان دچن مروڤا دكوژن جهين مروڤ ژي وَكْ طيرا دخوه پي بركين ڤان تفنگا دچه دِكوژه آڤ طوپ وتفنگين هاپي مكتب ومدرسه مروڤ نه دِكاره چيكه نه دِكاره بمليته كوما پي ڤان طوپ وتفنگا جسور ياوه وك مروڤين دست كريدا ينه

لمصحفا شريفده امر يه « جاهدوا في سبيل الله » آنكو ريا خديده شرى بكن دشمنين دينِ جهادي بكن دُشمنِ دين وه جيرانِ وه موسوڤه حتى نها موسوڤ گلكْ دَرْ ضبطِ كرنه مسلمان فلّه كرنه دُور وى تِتْ كردستانى هكي وه ژي خوند اُون عَلمين تجارتا وصنعتا هكي اُون دَولندِ بين اونين بكار بن خوه ژشروي خلاص بكن هكي وه گوه دا ڤان نصيحتين من هكي ديسا هون شڤاني ورنجبريِ تنى بكن زمانك هندكده كردستان وى يكجار خرا يه ٠ جيرانِ وه عجم ژى برى وَك كردابي ثى زمانى پاشي اوان ژى قنج ظانين بى علم وهنر نابتن عجما گلك مكتب مدرسه هنن اولادين خوه ريدكن ولاتين دور ددن خوندن نهو ژى ژيك زاده بين عجم سه چارك استانبولى لمكتبا حربيه ييده نه گلي مير وآغانو قنج فكرن دُوراخوه اُون هكي دچه ڤقير وكيم دبن سبب جاهلياوه يه الحمد لله گلك مكتب ومدرسه هنِ ريا خديده ظارو يين خوه ريكن بدن خوندن ژڤى جاهلييِ خلاص بين دنيا واخرانه خوه معمور بكن خلك ديژن هكي كرد بخونن وي ژ عالي خورت تر دولمندتر بين

ديسا حضرتِ نبي عليه السلام گوتي يه « اطلبوا العلم ولو كان في الصين » آنكو علم چينى بتن هرن وبدري بخوازن بعلمن ٠ گلي مير وآغانو از ژوَه دپرسم كي ژوه حتى نهو مروڤك خوه ريكري يه كودري دا بخونت ٠ الحمد لله بغدايِ شامى استانبولى مكتب ومدرسه ڤين حكومتي هنه بى مصرفن حجي ژوه ظارو پين خوه تسليم حكومتى بكت بي مصرف وى ريكن بدن خوندن

رُوپَر ۱ سالا عوثلي عدد ۱

كردستان

۱۳۱۵

حچي كاغذك ڤي ريكه
دڤي ريكت مصرى سَر
ناڤ خوبي ڤي جريده يي
لاو بدرخان پاشا
مقداد مدحت بكى
هر جار دُوهزار جريده يا
بي پَرَه آزى ريكم
كردستانى ده بدِن خلكى
پازده روژا جاركي تيت
نڤيساندن

عنوان
مصرده «كردستان» غزته سي
صاحب ومحرري بدرخان
پاشا زاده
مقداد مِدحَت

هر طبعنده ۲۰۰۰ نسخه كردستان
ولات عظامنه ارسال ووساطر يله
قراوقصاصانه نشر وتعميم اولنه جقدر

كردستان خارجده هر بر
ايجون سنه لك ابونه بدلي
۸۰ غروشدر
كر سان داخلنه خصوصي
استيلره مجانًا كوندر يلور

كردلي ايقاظ وتحصيل صنايعه تشويق ايچون ثمديلك

اون بش گونده بر نشر اولنور كردجه غزته در

روژا پنجشمي ده ۳۰ ذوالقعده سنه ۱۳۱۵ پنجشنبه ڤي ۹ نيسان سنه ۱۳۱۴

بسم الله الرحمن الرحيم

صد هزار شكر وحمد ژ خُدى تعالى ره آم مسلمان خلق كرن . وظاڤينا علم ومعرفتيره هش وزكا دامه . درحقا عَلِماندِنا علم ومعرفتيره گنك آيتين جليله واحاديث شريفه هَنِ دنياپيده چقاس مسلمان هبن گُوندِ وباژيرين حَمياده مكتب ومدرسه وجريده هَنَ دنياپيده چه دِبه چه نابه جريده دِنڤيسن . حيفامن تيت ژكرداره كُرد ژگلِكْ قَوْما زيده تر خويَ هش وزكانه جامبرن دبنين خوده راست وقَوينه خُورتن وديسا وَكه قَومين دي نه خوَندانه نه دَولمدن دنياپيده چه دِبه چيران وان موسقوف چاوه يه وى چه بكه نِظانن لَوْما ريخُديده من آف جريده ياها نڤيسي بِاذنا خُدى تعالى پاش نهو هر پازده روژاده جاركي آزي جريده كي بنڤيسم . ناڤ ڤي من كريه (كردستان) ڤي جريده يده آزى بجثا قنجيا علم ومعرفتا بكم لِكودَري مروف دِتعلمه لِكودرى مدرسه ومكتبن قنج هنه آزي نيشا كردا بكم لكودري چه شر دبه دولتبن مَظن چه دكن چاوه شر دِكن تجارت چاوه دِبه ازي حميا حكمات بكم حتى نهو كسي جريده كي هولي ننڤيسي يه آف جريده يا مناها يا عوثلي يه لوما وي گيلِكْ كيايي هبتِنْ . ازهيڤي دِكم كيايا جريده يي ژمنره بنڤيسن حمي تِشتْ وَكي نو چه دِبن كِين پاشي هِنكي دِچه دكوَه ريده آڤه ايدي آزي دست مقصدى بكم . (ومن الله التوفيق)

حضرتِ پيغمبر عليه الصلوة والسلام گوتي يه «العلماء ورثة الانبياء» آنكو علما وارثين انبيانه ژ طرفِ خُديده مامورن وعظ ونصيحتى بِدِن خَلكى ريا قَنج نيشا وان بِكِن لَوْما گلي علمايين كردا چاوَه اُون وَعظ ونصيحتا نِبِرى د دِن ولى دڤي اُون مير وآغا وكرمانجين دناسن وان تشويقا ظانينا علم ومعرفتى بِكِن ريا قَنج نيشا وان بِكِن هَكي اُون وي نِكِن گُنهى حميا سطُوى وه يه

www.netewe.com

رُوبَر ۱ سالا عوّلي عدد ۱

كردستان

۱۳۱۵

حچي كاغذك في ريكه
دڤي ريكت مصرى سَز
ناف خويي ڤى جريده يى
لاو بدرخان پاشا
مقداد مدحت بكى
هر جار دُوهزار جريده يا
بى بَرَه آزے ريكم
كردستانى ده بِدِن خلكى
پاژده روژا جاركي تيت
نڤيساندن

عنوان
مصرده «كردستان» غزته سي
صاحب ومحرري بدرخان
پاشا زاده
مقداد مِدحَت
هر طبعنده ۲۰۰۰ نسخه كردستان
ولاث عظامنه ارسال ووساط اريله
قراو قصباته نشر وتعميم اولنه جقدر
كردستان خارجده هر بر
ايجون سنه لك ابونه بدلي
۸۰ غروشدر
كر سنان داخلنده خصوصي
استيلاره مجانًا كوندريلور

كردلي ايقاظ وتحصيل صنايعه تشويق ايچون شمديلك

اون بش گونده بر نشر اولنور كردجه غزته در

روژا پنجشمبه ده ۳۰ ذوالقعده سنه ۱۳۱۵ پنجشنبه في ۹ نيسان سنه ۱۳۱۴

www.neteve.com

ISBN 91-88246-01-9